NEZÎR AKAT

Di berbanga rûdanên dawîn yên dinyayê de

# PARADÎGMAYA PÊLA 3'YEM

## û Pirsgirêka Kurdistanê



Di berbanga rûdanên dawîn yên dinyayê de

# PARADÎGMAYA PÊLA 3'YEM

## Û Pirsgirêka Kurdistanê

NEZÎR AKAT

zibeq

**Weşanên Zîbeq: 4**
*Di berbanga rûdanên dawîn yên dinyayê de*
*Paradîgmaya Pêla 3'yem û Pirsgirêka Kurdistanê*
NEZÎR AKAT

**Editor**
Mesut Örnek

**Redaksiyon**
Çiya Mazî

**Wêneyê Bergê**
Salvador Dali

**Berg/Rûpelsazî**
Şemal Medya
semalmedya@gmail.com

Çapa Yekem: Zivistan 2012

ISBN: 978-605-62668-5-0
Sertîfika No: 23186

**Çap/Baskı**
Enderun Matbaacılık
Haraçı Mah. Sazlı Bosna Cd. No: 145/1
Arnavutköy İSTANBUL
Tel: 0549 501 62 06

**Weşanên Zîbeq**
Örnek Eğitim Basın Yayın Ltd. Şti
Mardin Caddesi No: 45/A
Kızıltepe/MARDİN
Tel: 0482 312 62 64

Di berbanga rûdanên dawîn yên dinyayê de

# PARADÎGMAYA PÊLA 3'YEM

## Û Pirsgirêka Kurdistanê

NEZÎR AKAT

zibeq

*Ez vê pirtûka xwe,*
*ji bo xuşka xwe Xetîce Akat û hemû kesên*
*ku ji bo mafê bidestxistina dîroka veşartî,*
*giyanên xwe ji dest dane, dikim diyarî.*

## NAVEROK


DÎROKA HATIYE DIZÎN ... 13
ÇEND GOTIN ... 15

**I- ROJHİLATA NAVÎN ... 19**
Rohilata navîn li ku derê ye? ... 20
Di dîroka mirovahiyê de Rojhilata Navîn ... 21
Ji Dîroka Neolîtîk ber bi Emperyalîzm û Mirovayetiyê ve ... 24
Bazirganî û Emperyalîzm ... 26
Ramanên Ewropayî ... 28
Emperyalîzma Industriyel ... 28
Projeya Rojhilata Navîn ya mezin û Bakurê Efrîkayê ... 31
Helwesta me li himber vê projeyê divê çawa be? ... 33
Nûjeniya projeya Rojhilata Navîn ... 36
Pêvajoya Rûxandina struktura Netewe-dewletê ... 37
Demokrasiya Emperyal û Mûsewîtî ... 42
Bingeha vê guherînê du hêzên serke ne: ... 42
Paradîgmaya pêla 3'yem, Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê ... 45
Rewşa çend dewletên Ereban ... 46
Ji aliyê dîrokî ve Îsraîlî ... 52
Rojhilata Navîn û du hêzên sedemî. ... 54
Îsraîl ... 54
Sedemên netewe-dewletên Erebî ... 57
Di Rojhilata Navîn de pêvajoyeke cuda
û destpêka alternatîfeke nuh ... 58
Filistîn û Kurdistan ... 63

**II- ŞÎROVEKIRINA PARADÎGMAYA PÊLA 3'YEM ... 67**
Ez paradîgmaya pêla 3'yem dikim du beş an. ... 69
Sûriye ... 69
Tevgera Xoybûnê 1927-1932 ... 71
Îran ... 72
Nasnameya Farisî ... 72

Nasnameya siyasî ya Farisî ........ 78
Dîroka Îranê ya kevn û Faris û Kurd ........ 81
Di derbarê dîrokê de çend gotin ........ 84
Dîroka Îranê ........ 87
Dîroka Medan ........ 89
Karektera Medan ya Etnîkî ........ 91
Zimanê Medan ........ 93
Alfabeya Mîxî ........ 93
Alfabeya Yewnanî û Aramî ........ 94
Alfabeya Bînû Şad û Masîsûratî. ........ 94
Alfabeya Avestayî ........ 95
Ola Medan ........ 95
Gelên Medan Çawa û kengî hatine vê herêmê ........ 96
Dema Med-Pers'an ........ 99
Partî ........ 100
Sasanî ........ 101
Samanî; destpêka nasnameyeke nû ........ 103
Piştî Med-Pers'an, Kurd ........ 104
Pehlewî Kîne û kengî derketine rojevê ........ 105
Ber bi şerê cîhanî ve Îran ........ 109
Ji bo çi Îngilîzan alîkariya Farisan kiriye ........ 112
Dîktatoriya Şah Riza Pehlewî ........ 117
Şerê cîhanê yê duyem û dagirkirina Îranê ........ 118
Rûxandina Komara Azarbeycan û Kurdistanê ........ 120
Şoreşa Îslamî ........ 121
Çend gotin li ser Îslama siyasî ........ 122
Çend gotin li ser Komara Kurdistanê ya Mahabadê ........ 123
Rewşa navxweyî ya rojhilatê Kurdistanê çawa bû? ........ 125
Dîroka Îranê çi radestî me dike? ........ 127
Iraq ........ 129
Sedemên Iraqa alozkirî ........ 133
Li Iraqê rûdanên dîrokî ........ 134
Di dîrokê de Iraq ........ 136
Di dema Îslamê de Iraq ........ 137

Xaçperest û hêzen Îslamê ........ 141
Şerê Safewiyan û Osmaniyan ........ 144
Di dema şerê yekemîn yê cîhanî de Iraq ........ 145
Netewayetiya Erebî li Iraqê ........ 150
Çend gotin li ser hukmê leşkeriya Iraqê û Başûrê Kurdistanê ........ 152
Darbeya leşkerî ya 1958'an ........ 154
Tecrûbeyên darbeya leşkerî ya 1958'an ........ 155
Tevgera Ebdulselamê Barzanî ........ 156
Biryarên civîna eşîrên Kurdan ya bi Şêx Ebdulselam re ........ 158
Tevgera Şêx Mahmûd ........ 160
Em pirsa serhildana Şêx Mahmûd dewam bikin. ........ 162
Vegera Şêx Mahmûd ji Hîndîstanê ........ 166
Iraq ji bo çi Girîng e û em ê çi sudî jê wergirin? ........ 171
Tirkiye ........ 172
Li Rojhilata Navîn pêvajoya avakirina dewleta Tirk ........ 172
Dewleta Osmanî û statuya Kurdistanê ........ 175
Mewlana Idrîsê Bitlîsî ........ 177
Peymana Kanûnî Sultan Suleyman a bi Mîrekên Kurd re ........ 178
Êla Rojkiyan û yekîtiya wan ........ 181
Destpêka yekgirtinê ........ 185
Yekîtiyeke pirçandî ........ 187
Şaristanî û dadweriya yekîtiya Rojkiyan ........ 189
Bandora Mîrektiyê berdewama nasnameya neteweyî ye ........ 190
Navdarên Rojkiyan ........ 192
Gotina dawîn ........ 194
Rûxandina dewleta Osmanî ........ 196
Encama Şerê Rûs û Osmaniyan û destpêka Şerê Cîhanî ........ 202
Şerê Balkaniyan, dawiya sedsala 19'an û şerê cîhanî ........ 203
Dawiya şerê cîhanî û awakirina netewe-dewleta Tirk ........ 206
Di dema Osmaniyan de tevgera Kurd ........ 209
Bi kurtî Kurd û dîroka Kurdistanê ........ 209
Tevgera Mîr Bedirxan ........ 214
Tevgera Şêx Ubeydullahê Nehrî ........ 214
Berî şerê cîhanê yê yekem ........ 217

Sedemên sedaman ..... 218
Netewayetiya Kurdan û perçebûna Osmaniyan ..... 219
Piştî şerê cîhanê yê yekem û Konferansa Fransayê ..... 220
Konferansa Sewrê ..... 221
Peymana Sewrê ..... 222
Bakurê Kurdistanê ..... 226
Armanca Mustafa Kemal (Ataturk) ..... 227
Koçgirî: ..... 227
Tevgera Kurd ya ji sala 1960'î ..... 234
Ronakbîriya Kurd bi du aliyan ve berfireh bûye ..... 236

**III- DI BERBANGA RÛDANÊN DAWÎN YÊN DINYAYÊ DE PARADÎGMAYA PÊLA 3'YEM ..... 241**

Lê erêniyên vê pêvajoyê ji neyêniyên wê bêtirin ..... 243
Bi vê pêvajoyê ve dû prosesan dest pê kir. ..... 246
Şerê cîhanê yê duyem û paradîgmaya pêla 2'em. ..... 247
Paradîgmaya pêla 3'yem ..... 251
Nimûneyên paradîgmaya pêla 3'yem ..... 254
Li Fransayê Baskî ..... 256
Li Fransayê pirsgirêka Korsikayê ..... 257
Meclîsa korsîkayê ..... 257
Minakên din yên Ewropayê ..... 258
Ewusturya ..... 260
Pêvajoya paradîgmaya pêla 3'yem ..... 262
Pêla 3'yem û herdû pêvajoyên wê ..... 262
Pêvajoya duyem ya, paradîgmaya pêla 3'yem çi ye? ..... 263
Dewleta demokratik ya kozmopolit û neteweperestî ..... 267
Dewleta kozmopolît çi ye? ..... 268
Nêrîn û helwestên civata pircandî û du çavkanî: ..... 271
Lîberalîzm û pirsa civata pirçandî ..... 273
Lîberalî, nasyonalî û civata pirçandî ..... 281
Du kampên îdeolojî yên lîberalîzmê: ..... 282
Di çareseriya pirsgirêka neteweyan de rûdanên nû û rûxandina sosyalîzmê. ..... 283

Netewe û girêdana yekgirtina siyasî yan jî
peymana siyasî ya Neteweyên Yekbûyî ........ 284
Dikare bûyerên Iraqê bi Tirkiyê re miqayese bike. ........ 288

**IV- ÎSPANYA ........ 293**
Rewşa Îspanya ya îro ........ 293
Dîroka Îspanyayê ........ 295
Şerê cîhanê yê yekem ........ 296
Zimanên Ispanyayê ........ 296
Ol ........ 297
Netewe û kêmneteweyên li Îspanyayê ........ 297
Destpêka neteweya Baskî ........ 298
Di dema Franko de Baskiyan ........ 299
ETA ........ 300
Tevgera ETA'yê ........ 301
Batasuna ........ 302
Rewşa Baskiyan ya îro ........ 303
Welat, ziman û netewe ........ 304
Sermayedarî û neteweperweriya Baskiyan ........ 305
Dîroka Baskiyan ya berî netewayetiyê ........ 307
Netewayetiya Baskiyan ........ 308
Helwesta li dijî dewletê ........ 311
ETA û helwesta wê ........ 313
Helwesta dewleta Îspanî ........ 314
Partiyên siyasî ........ 314
Welat û nûfusa Baskiyan ........ 317
Makzagona Ispanyayê û ya Baskiyan ........ 317
Rewşa Îspanya ya îro ........ 320
Catalunya (Katalonya) ........ 321
Çend gotin li ser dîroka Katalîniya ........ 322
Katalonyaya serdemî ........ 323

**V- PÊVAJOYA DUYEM A PARADÎGMAYA PÊLA 3'YEM ........ 325**
Netewayetî û pirsa ava kirina dewleta serbixwe ........ 329
Mafê netewe yê avakirina dewleta serbixwe ........ 331

Kosowa ... 333
Pirsgirêka Kosowa yê ... 337
Di çerçoweya peymanên navneteweyî de
dîroka Kosowayê û statuya wê ... 339
Pêvajoya nû û pirsgirêka Kosowayê ... 339
Di çareseriya pirsgirêka Kosowayê de Pêvajoyeke nû ... 341
Ev biryar bi pirsa Kurdistanê ve çawa pêwendîdar e: ... 342
Tîmora Rojhilat ... 344
Bi kurtî dîroka Tîmora Rojhelat ... 344
Kolonyalîzma Portekîzê ... 344
Çend nimûneyên cuda ... 348
Hevbeşiya bingehîn ku wan nêzî hev dike çi ye? ... 349
Netewe-dewlet û pirsa etnîkî ... 351
Şîrovekirina Dîrokê û pirsa Etnîsîte ... 351
Neteweperestî û sembolên wê ... 352

**VII- KURDISTAN ... 355**
Nasnameya Kurdî ya neteweyî ... 357
Neguherîna mêjûyî ya siyaseta nasnameya Kurdî ... 360
Serdemiya netewayetî û nasnameya netewayetiya Kurdî ... 362
Nasnameya Kurdî berê û îro ... 365
3 (sê) tiştan alîkariya Tirkan kir. ... 367
Di dema Osmaniyan de nasnameya Kurdî ... 368
Nasnameya Kurdî ya îro ... 371
3- Nasnameya serdemî, neteweyî û demokrat ... 373
Di berbanga rûdanên dawîn yên li başûrê
Kurdistanê de nasnameya Kurdî ... 374
Du aidiyetên nasnameya Kurdî henin ... 375
Giyaniya hevbeşiya Kurdan ... 376
Nameya Kurdan ya di 24/01-1923'yan de ji
konferansa Lozanê re ... 378
Gotina dawîn ... 380
Ji bo jiyaneke bi hevremayinê gotina demokrasiyê têr nake ... 380

# DÎROKA HATIYE DIZÎN

Devjeniyên dema me yên li ser teoriya civakê û siyasetê bi teoriyên sivil ve têne xemilandin. Lê ji vana hemûyan bêhtir, teorî û siyaseta avakirina civata pirçandî ku bingehiya xwe ji civata sivîl werdigire, lê bi hêza tevgera gelêrî hemû xetên sor ên netewe-dewletê û îdeolojiya wê pûç dikin û sînorên wê yên strukturî dixin nava devjeniyên baldêr û biryardêr, sereke ye.

Ev teorî û siyaseta biryardêr, nasnameya desthilatdariya siyasî ya netewe-dewletê xistiye nava qeyraneke strukturî û civakî. Ev qeyran, bi rakirina rûpoşkên nasnameya desthilatdariya netewe-dewletê ve bi encam dibin.

Yek ji rûpoşkên vê îdeolojiyê, pirsa dîrokê ye. Lewra ev îdeolojî, li ser bingeha dîroka veşartî jiyana xwe didomîne. Ev raman û felsefeya vê îdeolojiya netewe-dewletê, ji aliyekî din ve di gel hemû hewildanên xwe yên ji bo jibîrkirina mêjûya dîrokî, bi ser neketiye û têk çûye.

Hemû gotin û nivîsên sererastkirina dîrokê, weke benê sêdarka dizên dîrokê û îdeolojiya wan ya netewe-dewletê bi lêv dibin. Her gotineke sererastkirina dîrokê, mecalên kişandina stûnên hîmên rûxandina netewe-dewletê berdest dikin.

Dîroka Kurdan, ji wan hatiye dizîn. Neteweya Kurd bi vê diziyê re, ji kesayetiya xwe bi dûr ketiye. Mejî û ramanên dîrokî yên Kurdan aloz bûne. Di hemû kûrahiya dîrokê de, ked û berhemên tu neteweyî weke yên Kurdan nehatine dagirkirin, înkarkirin û alozkirin.

Weke Abbas Valî dibêje; "Kurd di bêdengiyê de diaxivin, lê divê Kurd, daxwazên xwe, bi têkoşîna ji bo bidestxistina mafê dîroka ji wan hatiye dizîn" bi dengekî bilind bi lêv bikin.

Îro, Kurd ne tenê bi dengên bilind, herwiha bi serbilindiya dîroka ji wan hatiye dizîn, daxwazên xwe bi hemû kêmasiyên xwe ve, dixemilînin û ji bo rûmet û rêzgirtina ji dîroka xwe re weke neteweyeke serdemî têdikoşin.

# ÇEND GOTIN

Çawa dîroka pirs û pirsgirêka neteweyî kevn e, herwiha bi vê dîrokê ve girêdayî, çareseriyên vê pirsgirêkê jî kevn in. Çareseriyên vê pirsgirêkê piralî û pirrengî ne. Dîrok bi çareseriyên vê pirsgirêkê ve tije û dewlemend e.

Di sedsalên 18-19'an de, çareseriya vê pirsgirêkê weke avakirina dewleta neteweyî ya serbixwe, di rojeva tekoşîna neteweyan de cîh girt. Vê pêvajoyê heta sedsala 20'an berdewam kir. Ev çareserî li Ewropayê di asta bilind de derket pêş û ji bona gelek neteweyan bû minaka yekta. Di vê pêvajoyê de "**pirsa neteweyên têgihiştî**" ket rojevê û loma jî ji bilî neteweyên Ewropayê, neteweyên Asyayî, Efriqî, Latîn Emerîkî ji vê çareseriya yekta bêpar man. Lewra ew weke neteweyên têgihiştî nehatin dîtin. Teoriya neteweyên têgihiştî/netêgihiştî, bingeha kolonyalîzma Ewropayê ya sedsala 20'an bi xwe ye.

Di vê sedsalê de, ji aliyekî ve împaratoriyên pirnetewî dihatin rûxandin û ji nava vê rûxandinê jî, neteweyên cûda cûda dewletên xwe yên netewî û serbixwe ava dikirin. Ji aliyekî din ve van dewletên neteweyî ku weke dewletên serbixwe dihatin avakirin, piraniya wan weke dewletên navendî xwe organîze dikirin û di vê organîzekirinê de jî bi gelemperî mafê neteweyên cûda binpê dikirin. Di nava vê organîzeya serdemî de, bi navê moderniteyê, dewleta neteweyî ji bo meşrûiyeta xwe bi darê zorê weke dewleta navendî, neteweyên cûda, grûbên etnîkî yên cûda înkar dike û weke çareseriyê jî dest diavêje metoda asîmîlasyonê. Înkar û asîmîlasyon dibû weke du têgehên bivênevê yên dewleta navendî ya netewe-dewletê. Lê vê zilma fizîkî û zihnî cîh negirt. Siyaseta wan dewletên navendî, unîter û yekrengî bû sede-

ma serhildanên neteweyî û etnîkên cûda. Netewe-dewlet bi serhildan û têkoşînên neteweyên bindest ve rû bi rû ma.

Netewe-Dewlet yên ji nava Împaratoriyên weke girtîgehên netewan, Awusturya-Macarîstan, Rûsya û dewleta Osmanî yan derketin û dewletên xwe yên neteweyî ava kirin, vê carê jî rû bi rûyî nakokiyên navxweyî hatin. Nakokiyên wan dewletana yên sereke nakokiyên neteweyên cûda bûn.

Pirsgirêka netewan di qada navneteweyî de, bi şerê cîhanê yê yekem re weke pêvajoyeke nû di rojeva siyasî ya cîhanî de cîh girt. Di vê pêvajoyê de çareseriya pirsgirêka neteweyî, weke mafê çarenûsî derket holê. Ji aliyekî ve dewletên serbixwe û ji aliyekî din ve jî dewletên pirnetewî weke dewleta Sowyetê hatin ava kirin. Yekîtiya Sowyetê weke mînaka dewleta federal, bû nûmûneyeke sereke. Li vê derê neteweyên cûda, bi peymaneke siyasî jiyana bi hev re, kirin siyaseta sereke. **Ez vê pêvajoyê weke paradîgmaya pêla yekem bi nav dikim.**

Mînaka Sowyetê bandoreke mezin li ser tekoşîna neteweyên bindest hişt. Di pirsa mafê çarenûsî de biryarên Kongreya Emerîkayê yên Wilsonî, bandoreke erênî li ser siyaseta Sowyetê kir û Sowyetê jî ji bo bi cîh kirina vî mafî, bi awayên cûda ve, bandoreke erênî li ser siyaseta navneteweyî kir. Avakirina dewleta sosyalîst ya federal weke Sowyet, pêşiya pêvajoyeke nû li cîhanê vekir. Lê weke min li jor jî aniye zimên, mixabin pirê neteweyan li hemû aliyên dinyayê, nikaribûn vê derfetê bikar bînin û weke neteweyên bindest man. Di vê pêvajoyê de li Rojhilata Navîn, etnîkên ne weke netewe bûn, li ser xaka netewyên binecîh dewletên xwe yên dewlet-Netewe ava kirin. Li vê derê rola dewletên mezin pir bi eşkereyî neyinî ye. Di kişandina nexşeya Rojhilata Navîn de bêdadweriyeke nedîtî derket holê û mafê gelek neteweyan binpê bû.

Vê bêdadweriya dewletên emperyal û dewletên mezin di şerê cîhanî yê duyem de jî berdewam kir. Neteweyên bindest li gelek aliyên dinyayê rû bi rûyî vê siyaseta bêdadwerî man. Sîstema sosyalîst hate avakirin. Bi avakirina vê sîstemê re gelek welatên nuh derketin, lê mixabin nexşeya Rojhilata Navîn nehate guhertin. Bêdadweriya şerê cîhanê yê yekem piştî şerê cîhanê yê duyem jî li vê herêmê berdewam kir. Kurdistan yek ji wan welatan û Kurd jî yek ji wan netewayên ku di

herdu şerê cîhanî de bi vê siyaseta bêdadwerî re rû bi rû bûye û ji mafê xwe yê neteweyî bêpar maye. **Ez vê pêvajoyê jî weke paradîgmaya pêla duyem bi nav dikim.**

Di salên 90'î de pêvajoyeke nû li cîhanê dest pê kir. Sîstema sosyalîst rûxiya. Bi rûxandina sîstema sosyalîst ve proseseke nû li cîhanê peyda bû. Piştî rûxandina sîstema sosyalîst Rûsyayê xwe ji nû ve vejand. Federasyona Rûsyayê pejirand û bi yasayeke nû Federasyona Rûsyayê şîrove kir. Bi dehan dewletên serbixwe ji nava Federasyona Sowyetê derketin, lê çend dewletan jî weke Federasyona Rûsyayê bi makzagoneke nû Federasyona Rûsyayê ava kirin.

Makzagona Federasyona Rûsyayê, Federasyona Rûsyayê wiha şîrove dike: "Federasyona Rûsyayê, pirneteweyî ye û em gelên Federasyona Rûsyayê, me qedera xwe li ser xaka xwe bi hevre girê daye" "Di federasyona Rûsyayê de 23 komardewletên federatîf, 7 eyalet, 7 herêmên otonom û du bajarên federatîf -Moskova û Sanktpetersbug, û gelek otonomiyên çandî henin".[1]

Assembleya Gelên Rûsyayê vê pêvajoyê wiha şîrove dike: "Pirneteweyî ji bo Rûsyayê nîmeteke mezin e; meziyeteke wê ya gelekî mezin e; girîng e ku bi şêweyeke aqilane û hostayî lihev bê ragirtin"[2]

Dewleta Federal ya Yogoslawyayê piştî ruxandina sîstema sosyalîst rû bi rûyî nakokiyên mezin yên neteweyan ma. Di dema me ya serdemî de şerê neteweyan di nava Ewropayê de dest pê kir. Destêwerdana navneteweyî ket rojevê. Di vê pêvajoyê de neteweyên ku xwe bindest didîtin ji bona şerê serxwebûnê têdikoşiyan û bi alîkariya hêzên navneteweyî, dewletên xwe yên serbixwe ava kirin.

**Ez vê pêvajoya nû jî weke paradîgmaya pêla 3'yem** bi nav dikim û navê pirtûka xwe jî dikim paradîgmaya pêla 3'yem. Pirsgirêka Kurdistanê jî di vê beşê de tînim zimên.

Paradîgmaya pêla 3'yem bi du beşan ve şîrove dikim. Her du beş jî girîng in û di tekoşîna neteweyên bindest de weke tecrubeyên girîng dinirxînim.


---

1 Fewzî Namlî *Tevkurd* kovara siyasî û fikrî, zivistan 2010, sal 2. hejmar 4.r.25

2 Berhema navborî r.25

Tecrûbeyên çareseriyên dinyayê yên pirsgirêka neteweyî, ji bo me Kurdan gelekî girîng in. Lê çareseriya Başûrê Kurdistanê girîngtir e. Divê ronakbîrên Kurd li ser vê çareseriyê rawestin, erênî û neyiniyên vê tecrubeyê ji bo perçeyên din yên Kurdistanê şîrove bikin. Hêvîdarim ev pirtûk bibe encama devjeniyeke nû ji bo çareseriya pirsgirêka Kurdistanê. Ji bo paradîgmaya pêla 3'yem bête fêmkirin, ezê ji Rojhilata Navîn dest pê bikim, derbasî minakên dinyayê bibim û teoriya paradîgmaya pêla 3'yem ango, avakirina dewleta pirçandî û pêvajoya nû ya avakirina dewleta serbixwe bînim zimên. Ezê dûre jî çend gotinan li ser nasnameya Kurd û çareseriya pirsa Kurdistanê bêjim.

**Nezîr Akat**



# I
# ROJHİLATA NAVÎN

Rojhilata Navîn, rojhilata nêz û ya dûr, çend bêje û têgehên çêkirî ne. Li gor kuderê Rojhilata Navîn, yan jî ya nêz? Ev bêje ji aliyê Îngilîzan ve hatiye peydakirin. Li gor vê bêjeyê navenda dinyayê Îngilîstan e û hemû aliyên din yên dinyayê peykên Îngilîstanê ye. Ji bo cîhê Îngilîstanê û Ewropayê bê xûyakirin navên perçeyên din yên dinyayê bi bêjeyên nû anîne zimên. Di vê bêjeyê de ya sereke, navenda dinyayê Ewropa ye û navenda Ewropayê jî Îngilîstan e. Îngilîzan bêjeya Mezopotamya, Anatoliya, Kurdîstan, Aryan, Erebîstan û gelekên din dane jibîrkirin. Loma jî navê nû li herêman kirine. Rojhilata Navîn jî yek ji wan navên çêkirî yên Îngilîzan e. Ev bêje ya Îngilîzan bi xwe ye.

Nerîneke din jî heye ku ya rastî jî ew e; rojhilata nêz weke herêma Kurdistan û Ermenistanê bi hinek ciyê dinê ve bi nav bûye ku ew bi xwe jî ji aliyê Bîzansiyan ve bilêv bûye. Bingeh dîsa Ewropî ne. Ewan xwe di navenda dinyayê de dîtine û hemî herêmên din li gor xwe weke nêz, dûr, navîn binavkirine. Ev rastiyeke dîrokî ye, lê ezê tenê

ji bo têgihîştinê Kurdistanê di nava Rojhilata Navîn de, weke îro tê bilêvkirin, bînim zimên. Ev rastiya dîrokê naguherîne.

**Rohilata Navîn li ku derê ye?**

Ew jî bûye alozî. Îro gava di medyaya Ewropî de pirsgirêka Rojhilata Navîn tê zimên, weke pirsgirêka Filistînê tê fêmkirin. Lê Rojhilata Navîn ji Filistînê gelekî mezintir e.

Ev bêje ji bilî bêjeya Bîzansiya, bi rûxandina Împaraotoriya Osmanî ve dertê rojevê. Welatê Balkanî yên di bin serweriya Osmaniyan de bûn, temamiya wan weke rojhilata nêz hatiye binavkirin. Mezopotamya û Anatoliya hetanî Hindîstanê jî weke Rojhilata Navîn hatine bi nav kirin. Piştî Balkanî ji Osmaniyan azad bûn, êdî ev nav ji ser wan rabû. Lê bêjeya Rojhilata Navîn berdewam kir.

Rojhilata Navîn, ji welatên Asyayê yên başûr û rojava ve pêk tê. Li dinyayê tu herêm weke vê herêmê aloz nebûye. Lê dîsa jî welatên Rojhilata Navîn bi çandên xwe ve nêzî hev in û van welatana bi çanda xwe ve weke bêjeyeke erdnigarî tê şîrovekirin. Ev herêm ji Deryaya Sipî hetanî Pakîstanê û Nîvgirava Erebîstanê di nava xwe de dihewîne. Lê ezê bixwazim rojhelata navîn derveyî Hindîstan û Nîvgirava Erebîstanê binav bikim. Dewletên Rojhilata Navîn, bi şerê cîhanê yê yekem û dawî jî bi şerê cîhanê yê duyem ve, bi destên dewletên emperyal hatine avakirin û demografiya vê herêmê ya sedsalan ji hevdû xistine.

Hemû dewletên Rojhilata Navîn weke netewe-dewlet hatine ava kirin, lê di rastiya xwe de berevajî vê, dewletên pirnetewî yên navendî û unîter in. Lê yek ji van dewletana ne weke dewletên pirçandî, pirnetewî hatine avakirin. Pakîstan û Hîndîstan heta radeyekê weke dewletên piçandî hatine avakirin, lê wan dewletana jî pirsgirêkên neteweyî çareser nekirine. Ji bilî van herdû dewletana ku ew jî heta radeyekê, tu dewletên Rojhilata Navîn weke dewletên bi demokrasiya xwe ve bê naskirin tune ye. Li hemû dewletan nakokiyên mezin hene û nakokiyên wan dibe sedemên şer û pevçûnên mezin. Aramî tu caran ne hatiye vê herêmê. Ev herêm ji dîrokê de heta îro bûye qada şerên olî, qewmî, qebîleyî, eşîrî û dawî jî bûye qada şerê navbeyna împaratoriyan û neteweyan. Piraniya van dewletana bi dîktatoriyên leşkerî ve têne

îdarekirin. Li piraniya wan welatana mafê mirovan, mafê jinan, mafê neteweyan, kêmneteweyan, mafê ol û çandên cûda binpê dibin. Ji vîn û hestê mirovan re, rêz nayê girtin. Li gelekan hê jî eşîr û qabîle serwer in. Piraniya wan dewletana ji dadweriyê bêpar in. **Piraniya van dewletana weke dîrokî û dadwerî ne, li ser xaka netewa xwe hatine avakirin. Bi dagirkirina xaka neteweyên cûda û li ser înkara wan hatine avakirin.** Ji van dewletana yek tenê jî bi aboriyeke bi dadwerî tune ye. Feqîrî li van welatana bûye qedera wan. Piraniya serjimara van welatana birçî ne. Ev welatên Rojhilata Navîn cenneta elîteke bijarte ya leşker û ya brokrasiya dewletê ne. Îşkence, zulim, zîndan, cezayê bê dadwerî, weke pirsgirîkên sereke ne li van welatana.

Di vê erdnîgariya dîrokî de şaristaniyên mezin hatine avakirin. Rojhilata Navîn di pêşveçûna mirovahiyê de gavên dîrokî avêtiye û bûye qada jiyana şaristaniyê. Rojhilata Navîn weke dergûşa şaristaniyê tê bilêvkirin û ev nav jî bi dîroka xwe ve heq kiriye. Lê bi dîroka xwe ya nêz ve mixabin ji vê dergûşê bi dûr ketiye û dergûşa xwe şikandiye.

Rojhilata Navîn di nexşeya dinyayê de herêma herî dewlemend e. Petrol, gaza xwezayî û av, bingeha dewlemendiya Rojhilata Navîn in. Ji dîrokê ve hetanî nuha hemû şaristaniyên dinyayê ji bo dagirkirina Rojhilata Navîn proje çêkirine û şerê Rojhilata Navîn kirine. Şaristanî, dewlemendî û çanda Rojhilata Navîn bi zorê bi çanda şaristaniyên dagirker ve tûle bûne û bûne bela serê neteweyên Rojhilata Navîn. Dewlemendiya wan bûne sedemên feqîriya wan.

### Di dîroka mirovahiyê de Rojhilata Navîn

Dema mirov navê Rojhilata Navîn tîne zimên, yekser Mezopotamya û şaristaniyên wê têne bîra mirov. Dîroka Mezopotamyayê çiqasî balkêş be ewqasî jî tevlihev, aloz, kûr û hûr e. Loma ez ê bixwazim bi kurtî jiyana mirovahiyê, sermayedariyê û kolonyalîzmê bînim zimên û pê re jî derbasî Rojhilata Navîn bibim.

Divê mirov berê bibêje ku dîroka Rojhilata Navîn (Mezopotamya, Kurdistan, Anatoliya), hetanî salên 1900'î jî binxak bû û lêkolînên ciddî nehatibûn kirin. Lê ji salên 1900'î û virde li ser dîroka Rojhilata Navîn lêkolînên ciddî hatine kirin û têne kirin. Lê dîsa jî hê dîroka

Rojhilata Navîn tenê biqasî % 10'an ji bin axê hatiye derxistin. Loma jî dîroka Rojhilata Navîn hê jî aloz e. Lewra ji ber van sedemana em nikarin ji sedî sed dîrokê li gor zanetiya xwe ya dîroknivîsa îro şîrove bikin û ramanên xwe tenê weke rastiyê bidin pêş. Ev qaîde weke moral divê ji bona hemû dîroknas, siyasetmedar û nivîskaran derbas bibe. Loma divê em bi qasî ku em dizanin îdîayên xwe bikin û di şîrovekirina dîrokê de bikaribin vê rewşa aloz bidin ber çavan.

Di dîroka Rojhilata Navîn de cîhê Sumeran girîng e. Tu kîjan nivîs û berhemên dîroknasekî bixwîne tu yê bibînî ku navê Sumeran di gotinên wî/wê de derbas dibe. Lê dîrok û şaristaniya Mezopotamyayê ne bi Sumeran dest pê kiriye û ne jî bi wan dawî hatiye. Hê berî Sumerî werin vê deverê, li kontarên Çiyayên Zagrosan (400 km dirêj û 200 km jî firehiya Çiyayên Zagrosan e) Bingeha şoreşa şaristaniyê û şoreşa çandiniyê û kedîkirina heywên ya Mezopotamyayê dest pê kiribû[3]. Keşifkirina genim di vê şaristaniyê de cîhekî sereke werdigre. Li gor dîroknasên dinyayê bingeha vê şaristaniya candiniyê û keşifkirina genim bi destê Kurdan bi cîh bûye. Kurd weke gelên çiya hatine binavkirin.

Bi şoreşa çandiniyê re kedîkirina bizinan û heywanên din dîsa para gelên Zagrosê ketî ye. Kurd yek ji wan qewmên Zagrosê ne ku di dîroka şaristaniya Mezopotamyayê de cîhekî girîng werdigrin. Piştî van şoreşên girîng yên qewmên binecîhên Zagrosê, him gelên çiyayî û him jî gelên deryayî û herwiha bi dehan gelên din di nava herdu çemên -Dîcle û Firat- mezin de ango Mezopotamyayê de (nava du çeman), şaristaniyên mezin ava kirine. Şaristaniyên Mezopotamyayê ne tenê îro, lê herwiha di wê serdemê de jî bûye sedama şer û dijberiyên mezin. Mîtanî, Elamî, Sumerî, Akadî, Babîlî, Asûrî, Medî, Aramî, Partî, Sasanî, Makedonî, Romî, Artukî, Selçûkî, Eyyubî, Ereb, Moxol, Tatar û Osmanî, weke ol jî; Zaradustî, Yehûdî, Isewî û Mislimanî li vê herêmê şaristaniyên cûr be cûr ava kirine û şaristaniyên wan bûne sedemên şerê navbeyna wan şaristaniyana. Hemû kesan xwestiye Mezopotamyayê têxe bin serweriya şaristaniya xwe. Moxolî, Tatarî

3 *Irak'ı Anlamak* William R. Polk Çapa Duyem *"Understanding Iraq"* Weşanên NTV, 2007, r.8

ev herêm kirine qada xwînê. Selçûkiyan ev herêm dagir kirine û ev herêm tevlihev kirine. Herî dawî jî Osmaniyan ev herêm dagir kirine û li ser mîrata bi hezar salan rûniştine û serweriya xwe ya bi sedsalan berdewam kirine. Serweriya Osmaniyan bi şerê cîhanê yê yekem ve bi dawî hatiye û dewletên îro li Rojhilata Navîn hene di wê demê de bi destê Ingilîz û Fransizan ve li ser sînorên bê dadwer, ango li ser xaka neteweyên cûda hatine ava kirin.

Dixwazim li vê derê perantêzekê vekim û bi kurtî be jî çend gotinan li ser fîlozofên Grekî bînim zimên. Lewra fîlozofî, astronomî, nivîsîna dîrokê, bi destê fîlozofên Grekî derbasî Ewropa bûye û nêrînên wan bûne bingeha şaristaniya Ewropayê. Ji Herodot ku bavê dîroka nivîskî tê nasîn, Plato, Herekles, Pausania (berî zayînê 468), Sofokles berî zayinê 400, Euripides berî zayinê 400, Marcellius berî zayinê 330-400 û bi dehan fîlozofên din yên Grekî bi kûrahî li ser dîrok û şaristaniya Îranî, Kurdistanê, Mezopotamyayê û Anatoliyayê rawestiyane û ji van şaristaniyana sûd wergirtine. Van fîlozofên Grekî, bêtir di bin bandora şaristaniya Zaradustra de mane û gelekan ji wan bi kûrahî ev şaristanî şîrove kirine. Îro digel hinek nêrînên wan yên nerast de jî dîsa em dîroka neolîtik bi gelek awayî ji van fîlozofan fêr dibin. Di dema Dara û Xerxes de alimên Magu/î ku di dema MED'an de serkêşên Ola Zarduştiyê dikirin bi xezeba herdû serokên Med û Axamenîda yî re rû bi rû mane. Pirsa Dara (Dariyûs) aloz e. Ew ne Ahamenîd bûye. Ew bi xwe weke tê gotin Medî ye. Lê gelek dîroknas wî weke Persî xuya dikin.

Alimên Magî koçberî Anatoliyê kirine û fîlozofên Grekî dîtine. Ji xwe Med-Pers heta Yûnanîstanê berfireh bûne. Fîlozofên Grekî ji vê şaristaniyê sûd wergirtine û ji nivşekî radestî nivşekî din kirine û kirine weke çand û şaristaniya rojava. Dema mirov li nêrînên van fîlozofan dinêre mirov dibîne ku her ku ew nêzîkî vân şaristaniyana bûne û wan ji nêz ve nas kirine nêrîn û helwestên wan jî hatine guhertin. Di navbera vê pêvajoyê de van fîlozofana sîstema fîlozofiya xwe guhertine. Di serencema vê guherînê de bandora felsefeya şaristaniya Zaradustra–Zaraduşt, biryardêr e. Vê felsefeya van fîlozofana ya ku ji dema neolîtik ya Mezopotamya û ya ji hêrêmên Aryaniya wergirtine bingeha şaristaniya Ewropayê ye. Di nav van fîlozofanan de yê herî

ciddî ev felsefe û şaristaniya Magiyan naskirine fîlozofê mezin Theopompus, berî zayinê 338 e. Ewî di pêvajoya nasîna felsefeya Magiyan de sîstema felsefeya xwe guhert û bi baweriyeke mezin ev felsefeya Zaraduştiya xist xizmeta mirovahiyê. Ji aliyekî ve, ev helwesta fîlozofên Grekiyan bi erênî xizmeta mirovahiyê kiriye, lê ji aliyekî din ve jî ev felsefeya wan ketiye xizmeta şaristaniya Ewropiya ku ji bo kolonyalîzma cîhanî bikar anîne.[4]

## Ji Dîroka Neolîtîk ber bi Emperyalîzm û Mirovayetiyê ve

Berî ku ez dest bi dîroka neolîtîk ya Rojhilata Navîn- Mezopotamyabikim dixwazim bi çend gotinan li ser dîroka perçên din yên dinyayê rawestim. Weke tê zanîn, bezirganî, şer, dagirkerî û kolonyalîzmî weke çend bêje û têgehên girîng yên sedemên guherîna ekolojiya global ya cîhanî ne. Guherîna ekolojiyê ya global, bûye encama pêwendiyên şaristaniyên dinyayê û gelên binecîh. Vê pêwendiya dîrokî guherîneke nedîtî di jiyana mirovahiyê de afirandiye û bûye sedem û encamên şer û pevçûnên nava gelan.

Di nava van şaristaniyên dinyayê de Ewropayê ciyekî biryardêr wergirtiye. Ewropa Perçeyek, beşekî biçûk e, lê guherîna dinyayê ya ekolojiya global bi destê Ewropayê hatiye kirin. Serwerî û hakîmiyeta Ewropiyan, di van 500 salên dawîn de di jiyana mirovahiyê de guherîneke mezin pêk aniye. Di van 500 salan de Ewropa dewlemend bûye û beşên dinyayê yên din feqîr bûne. Ango dewlemendiya Ewropayê serencama feqîriya Asya, Efriqa û Latîn Emerîka bi xwe re anî ye. Ger mirov bikaribe bersiva vê pirsa "çawa Ewropa wiha dewlemend bû?" bide dê mirovî bikaribe bersiva pirsgirêkên îro yên dinyayê jî bide. Lewra pirsgirêkên dinyayê yên îro, yên van 500 salên dawî yên dewlemendiya Ewropayê bi xwene. Hemû alozî ji bona dewlemendiya Ewropayê pêk hatine. Hemû dewlemendiyên dinyayê ketîne xizmeta berjewendiyên dewlemendiya Ewropayê.

Bersiv û teoriyên li ser vê pirsê gelek in. Yek ji van teoriyan jî ev e: Tê gotin ku serkevtina Ewropayê encama sîstema kapîtalîst ya xwedî

---

4 Siraç Bilgin, *Zarathuştra*, Berfin Yayınları, Çapa Düyem 2003, Çapa Berfirehkirî, Çapa Yekem 1995.

kapasîteyeke leşkerî, aborî, olî û siyasî ye. Di pêvajoya vê teoriyê de rola zanistî, ciyekî girîng werdigire. Ji bilî van sedemana mirov nikare bi awayekî zelal bersiva vê pirsê bide. Ewropa bi vê kapasîteya xwe ve desthilatdariya perçeyên mezin yê dinyayê kiriye ku 20 caran ji Ewropayê mezintirîn e. Ewropa di demeke zû û nêzîk de, ne tenê bi aborî û leşkerî herwiha bi xwe, fizîkî jî li van deverana bicîh bûye û bûye serwerê van deverana.

Berî keşîfkirina erdnigarî yên ronesansê, di sedsalên 1400-1500'î de pêwendiyên Ewropayê bi beşên din yên ji Ewropayê dûr tunebûn yan jî gelekî kêm bûn. Pêwendiyên Ewropiyan bi giravên mezin re jî tunebû. Pêwendiyên Ewropayê herwiha bi Efrîka û Asyayê re jî kêm bû. Lê dem hat û Ewropiyan van deverên dinyayê keşif kirin. Ewropiyan berê xwe dan van deverana û gah bi rêya şer, gah bi rêya olî û gah jî bi rêya bezirganiyê van deverana girtin destên xwe. Îro, Emerîkaya Bakur û ya Başûr, Zeelanda Nû, Ewosturalya bi bêjeya "neoeuropa" têne binav kirin.

Berî gera Columbus ya Emerîkayê (1492), û berî keştiya yekemîn ya Ewropayê ya ku di 1788'an de derbasî Ewosturalyayê bû, gelên Ewropayê kêm kesan dest ji Ewropayê berdabûn û çûbûn welatên din. Bi keşîfa yekemîn ve gelek Ewropî koçbar nekirin, lê bi keştiya Ewropî ku çû Ewosturalyayê ve koçberî ji Ewropayê bi girseyî dest pê kir. Kolonyalîzma Ewropayê bi van herdû bûyerên mezin ve dest pê kir û berfireh bû. Beriya herdû keşîfên xaçperestên Romî xwestine bên Mezopotamyayê û Anatoliyê, lê bi ser neketine. Sedema biserneketina wan jî girêdayî şaristaniyên van herêmanan bû. Ewropiyan ji bilî şer û kuştinê nikaribûn tiştekî din radestî van herêmana bikirana. Loma jî tenê bi şer nikarîbûn li van herêmana rawestin û van herêmana bi tevayî dagir bikin. Hewildanên Ewropiyan ji bo dagirkirina Mezopotamyayê û Rojhilata Navîn heta îro jî berdewam e.

Piştî herdû bûyeran, kolonyalîzma Ewropî zû belav bû û li van welatên neoeuropî zû bicîh bû. Di salên 1800'î de li Emerîkaya Bakur, ji bilî Mexîkoyê, 5 mîlyon neviyên Ewropiyan hebûn. Îro hejmara wan 250. Milyon e. Li Emerîkaya Başûr (Latîn Emerîka) wê demê 500 hezar neviyên wan dijiyan. Îro ji 200 milyonan zêdetir in. Li Ewosturalyayê 10.000 Ewropî dijiyan lê îro 15 milyon in. Vê hakîmiyeta Ewropiyan

û kolonyalîzma wan li ser tunekirina gelên binecîh pêk hatiye. Zeelanda Nû û Ewosturalya îro %99 Ewropî ne. Navê wan welatana jî weke Neoeuropa tê bilêvkirin. Emerîka Bakur %80, Brazîl û Arjantîn %,90 welatên Emerîka yên din jî di navbeyna % 70 û % 80 de ne. Li gor agahiyên jorê piraniya van dewletên dinyayê Ewropî ne û weke welatên Neoeuropî binav dibin.

Di navbeyna 1820-1930'î de, nêzî 50 mîlyon Ewropî koçberî van welatana kirine. Vê koçberiya ha bersiva giştî nade. Ewropiyên koçber, berevajî Ewropiyên binecîhên Ewropayê, çend caran zêdetir zarok çêkirine. Îro serjimara Ewropiyên dereke, ên li derve, çend caran ji yên binecîhên Ewropayê zêdetir in. Di demeke zûtirîn de ji Ewropayê, binecîhên dereke yên Ewropî, dest bi zireetê û xwedîkirina heywên kirine. Îro 5 welatên Neoeuropî USA, Arjantîn, Uruguay, Ewosturalya û Zeelanda Nû, ji 1/3 (ji 3'yan 1) ê bersiva pêdiviyên cîhanê yên zireetê û goşt didin.[5]

## Bazirganî û Emperyalîzm

Di dema Ronesansê de, Ewropiyan keşîfa welatên aliyê deryayê yên din kirin. Piştre bi daxwazeke mezin ew welatana dagir kirin. Ji van welatana cewher, kevirên bi nirx, hestiyê Fîlan, Baharat û kole anîn welatên xwe. Ji vê bûyerê re bazirganî digotin. Bazirganiya mirovan di vê demê de cîhekî girîng werdigre. Di vê bûyera mezin de rola doktirîn û stratejiya Markantî biryardêr e. Doktirîna Markantî bingeha xwe ji teorî û stratejiya ku, divê welatek hetanî bikaribe xwe ji îtxalatê (hawirde) biparêze û ji dêvla Îtxalkirinê (hawirdekirinê) divê bala xwe bêtir bide îxracatê (derxistinî, hinarde), û bi riya îxracê jî dewlemendiya welatê xwe zêde bike, digire. Ji bo ku welatek bikaribe di vê diyardeyê de bi ser bikeve divê, ji zanist, tecrûbe û dewlemendiyên dinyayê îstifade bike. Vana hemûyan têxe xizmeta berjewendiyê, afirandinê û dewlemendiya welatê xwe. Di vê fenomenê de armanca sereke; bidestxistina bazara dinyayê ye. Ewropiyan jî wiha kir û bazara dinyayê xistin destên xwe.

5 Den Ekologiska Imperyalismen Europas Biologiska Expension 900-1900, Alfred W.Crosby, SNS förlag Kristianstad Boktryckeri AB-Kristianstad Sverige 1999.

Aliyekî din yê vê fenomenê jî heye. Yên li jorê hatine gotin tenê aliyekî vê pêvajoyê ye. Ewropî ji bona li dinyayê belav bibin û dinyayê têxin destên xwe, mîsyonerên olî yên Îsewî bikar anîne. Ola Îsewî di vê koledariya aliyekî dinyayê de roleke neyinî wergirtiye û bûye sedemên gelek xerabiyan. Hînê di dema Columbus de Ewropiyan girîngiyeke mezin dane vê pêvajoya mîsyonertiyê û ev jî di destê Ewropiyan de bûye diyardeyeke mezin. Kabral bi kurtî wiha digot; **Ew bi încîlê hatin ba me. Em bûn xwedî încîl ew jî bûn xwedî xak.** Ewropiyan bi rêya Mîsyoneran ve di demeke zû de dibistanên olî li Latîn Emerîkayê vekirin. Li vê derê dibistanên olî zû berfireh bûn. Dû re bi rêya deryayê berê xwe dan Efrîka û Asya jî. Li Efrîka bi gelemperî bi ser ketin û dibistanên wan berfireh bûn. Lê li Asyayê weke li Efrikayê bi ser neketin. Ji bo çi li Asyayê bi ser neketin? Sedemên wê gelek in. Lê sedema yekemîn, dewlemendiya şaristaniya Asyayê bi xweye.

Di vê pêvajoyê de Protestanî û Anglo-Saksonî bi hêz bû û di vê pêvajoyê de, neteweya Ingilîz bû neteweyeke sereke û xwest êdî serweriya dinyayê bike. Di salên 1800'î de rola Ingilîzan li cîhanê bû rola sereke. Li vêderê balkêşiya mezin ev e ku çawa mal, milk, dewlemendî û tecrûbeyên şaristaniyên din kirin malê xwe, her wiha ola Îsewîtiyê jî kirin malê xwe. Bê gûman rola Fransizan, ya îspanyoliyan, Hollandiyan, Vikinga ji ya Îngilîzan ne kêmtir in. Nasnameya xwe li Îsewîtiyê xistin û ji çanda Rojhilata Navîn bi dûr xistin. Lewra Îsewîtî jî weke olên din bingeha xwe, rehê xwe û teoriya ola xwe ji Rojhilata Navîn werdigre. Lê ji wê demê û virde, ola Îsewîtî bi nasnameya Ewropî ve tê binav kirin. Îsewîtî ji vê demê û virde li dijî gelên binecîh hatiye bikaranîn û gelek neteweyan ji çanda wan ya neolotîk bi dûr xistiye. Li Efrîka, Latîn Emerîka, Ewosturalya û li aliyekî Asyayê ev bi eşkereyî xuya dibe. Raman, adet û çanda gelek neteweyan bi vê rêyê ji holê rakiriye û çanda ola Îsewîtî bicîh kiriye. Di vê bicîhkirina ola Îsewî de ne tenê ol, herwiha awayên jiyana Ewropî jî xistiye nava wan gelan. Lewra Ewropî bi rêya van gelên asîmîlekirî beşdarî nava siyaset, ewlekarî û karê wan yên rojane bûne û bûne serwerên wan. Ango Ewropiyan ne tenê bi darê zorê welat dagir kirine her wiha bi rêya asîmîlasyonê jî ev bûyer bi ser xistine.

## Ramanên Ewropayî

Di vê pêvajoya li jor hatiye ziman, hemû raman û çandên ne Ewropayî, weke çand û ramanên hoviyane hatine bi nav kirin. Şer û têkoşîneke nedîtî li dijî çand û ramanên ne Ewropî hatine li darxistin. Aloziyên mezin di nava gelên binecîh de afirandine. Ew berra hev dane û bi destê wan, ew bi hev dane kuştin. Eşîr û qabîleyên gelên binecîh bera hev dane û bi vî awayî jî serweriya wan kirine destên xwe. Di vê pêvajoyê de Ewropiyan girîngiyeke mezin dane ramanên Ewropî. Jiyana Ewropayî weke jiyana pêwist û modern derxistine pêş û her dem di rojevê de hiştine. Lê mecalên ku gelên binecîh bikaribin beşdarî vê jiyanê bibin pêşkêşî wan nekirine. Li vir rastiyeke dertê holê. Ewropiyan girîngiyeke mezin dane zanistiya modern. Keşifkirin û bidestxistina pûsûlayê, pêşvebirina çapxaneyê, weşana pirtûkan û teknîka modern ya avakirina keştiyan û teknîka industrî ya modern bûye malê Ewropiyan. Ev hemû xistine xizmeta afirandina jiyaneke nû ya Ewropî û bi nasnameya Ewropî ve dane nasîn. Cara yekem di 1800'î de "Miqrob" hate keşif kirin û dermanê dijî Mîqrobê hate dîtin û zû hate bikaranîn. Ev jî bû sedema ku Ewropayî bikaribe zêde bijîn û li dijî nexweşiyan zêde bikaribin rawestin. Vê keşîfa dermên civata Ewropî ji ya din bi dûr xist û bû sedemên berxwedana mezin ya Ewropiyan ya ku dijî gelên binecîh û bû sedemên bihêzbûyina Ewropayê.

## Emperyalîzma Industriyel

Ger em ji ramanên Marx û ji perspektîva ekolojiya Marxîzmê bi rê kevin emê, weke Marx gotiye vê bûyerê şîrove bikin. Li gor ramanên Marx û Marxîzmê, pêdiviyên kapîtalîzmê yên madeyên xam, kapîtalîzm ber bi kolonyalîzmê de biriye. Nêrînên Marx rastin, lê ne tenê yek sedem e. Marx, di vê nêrîna xwe de girîngiya şert û mecalên xwezayî nedaye ber çavan. Keşîfkirina deverên din û bidestxistina dewlemendiya serdema neolîtîk ku vana, bi xwedi perspektîva pêwendiyên ekolojîk yên dîrokê de, roleke mezin di serweriya Ewropayê de cîh wergirtiye, neyên eşkere kirin, mirov tenê nikare bi pêdiviyên kapîtalîzmê ve vê serketina Ewropayê ronî bike. Lê pêwendiyên kapîtalîzmê em nedin ber çavan emê dîsa jî nikaribin tenê bi awayine din vê pêvajoyê şîrove

bikin. Ji bona mirov bikaribe bersiva vê pirsê bide divê mirov dîroka mirovahiyê ya 200 mîlyon salan bide ber çavan.

Di vê pêvajoya dîrokî ya mirovahiyê ya neolîtîk de, li perçeyên dinyayê prosesên jiyanê yên cûda dest pê kiriye. Her deverek li gor şert û mercên rewşa xwe ya xwezayiyê, rêya xwe û metodên jiyanê keşif kirine. Dî vê pêvajoyê de em dibînin kedîkirina heywanên cûda li dinyayê dest pê kiriye. Jiyana xwezayiyê, keşifkirina şênkayiyê jî cûda hatine bikaranîn. Vê jiyana cûda cûda li dinyayê, mirovên cûda cûda jî afirandiye. Vê pêvajoyê bi xwe re merheleyên jiyanê ji hev cûda kiriye. Îro hê jî em bingeha cûdahiya wê demê di nava perçeyên dinyayê de bi eşkereyî dibînin. Çand û awayên jiyanê bi rêya zimên ji nifşekî radestî nifşekî bûye û weke çanda gelêrî hetanî îro radestî me bûye. Ji van çand û zimanana gelek wenda bûne û tenê di nav rûpelên dîrokê de cîh girtin e. Lê herwiha gelek çand û zimanan jî jiyana xwe bi awayên cûr be cûr berdewam kirine û heta îro hebûna xwe parastin e. Çawa merheleyên jiyanê hene herwiha merheleyên çandê jî hene. Pêşveçûna mirov û çanda civakî, ta radeyekê ji hev cûda be jî, dîsa bi girêdaneke dîrokî ve bi hevre pêşde çûne. Him mirovahî û him jî çanda civakî gelek carî bi hevre hatine veguherîne. Hewildanên meşa mirovahiyê weke tê gotin; berî 750 hezar salan, berê ji Efrîkayê ber bi Avrasyayê, Rûsyayê, Çînê û Ewropayê dest pê kiriye. Bi texmînî 100 hezar sal berê, mejiyê mirov weke yê îro mezin bû. Ji vî nifşê mirovan re Homo Eroctus tê gotin. Ji nifşê mirovên îro re jî Homo Sapîens tê gotin ku berî 40 hezar salan merheleya xwe ya mirovahiyê bi dawî aniye.

Bi guherîna merheleyên mirovahiyê ve girêdayî, xwezayî jî hatiye veguherîn. Di guherîna xwezayê de nifşê gelek heywan û şênkayiyê bi dawî hatine. Dema mirovan cîhê xwe guherîne, bi xwe re xwezayî jî guhertine. Berjewendî û pêdiviyên mirovan guherîna xwezayê pêwist kiriye. Lewra mirovan di meşa xwe ya cîh guherînê de çanda xwe ya xwezayiyê jî guherînin. Lê gelek caran jî çanda xwe ya kevn li ciyê nû bikar anîne û xwezayiya ciyê nû guhertine.

Di dema Ewropiyan de ku Emerîka û Ewosturalya keşif dikirin û dixwestin van devrana dagir bikin, li aliyekî din yê dinyayê weke Avrasya û Rojhilata Navîn û ta radeyekê li Asyayê dîrok û jiyan bi awayekî berfireh pêşde çûbûn. Wê demê li van herêmana teknîk pêşde çûbû.

Li Mezopotamyayê û li çiyayê Zagrosê û li der û dora kendavê mirovan ji dema neolîtîk de dewlet ava kiribûn. Çek çêkiribûn, Çandinî û kedîkirina heywanan bi berfirehî mezin bûbû. Ev jiyana ha ya Rojhilata Navîn bi texmînî 10 hezar sal berê dest pê kiriye. Li vê derê astronomî hatibû keşîfkirin û merheleya nivîsê dest pê kiribû. Serdemiya binecîh û avakirina waran dest pê kiribû. Bajarên modern hatibûn ava kirin. Di vê şaristaniyê de em avakirina dewletê bi eşkereyî dibînin. Di belgeyên wê serdemiyê de hebûna brokrasî, serweriya dewletê, zanistiya nivîskî, feylesofiyê dibînin.

Di vê dema ku Ewropiyan lingê xwe diavêtin nava jiyana serdemî, weke mînak bajarekî Rojhilata Navîn, Baxda di dema Harun-î Reşîd de dewleta xelîfe ya herî bi hêz û mezin bû. Baxda navenda şaristaniyê bû. Di wê demê de 1000 tabîbên bi dîploma, nexweşxaneyên bê pere, xizmeta posteyê, Banke, kanalîzasyon û şebekeya ava vexwarinê ya modern, fabrîkeya kaxez çêkirinê, hebû û jiyanê bi serdemî ve berdewam dikir. Piştî mirina Harun-î Reşîd Baxda serobinî hev bû. Minakeke din; dema Ewropî ber bi bakur ve dihatin hînê li ser çermê heywên gotinê xwe dinîvîsandin. Ewropiyan li Suriyê fêrî çêkirina kaxezê ya ku ji kayê çêdibû, bûn.

Rojhilata Navîn, weke li jor jî min aniye zimên bi hatina gelên dereke ve aloz bûye. Ewropiyan ji vê şaristaniyê îstifade kirine û ev tecrûbe li aliyên dinyayê yên din ji bona berjewendiya xwe bikar anîne. Gelên Rojhilata Navîn ev teknîk û tecrube radestî dagirkerên hovane kirine û wan jî ev tecrube û zanistî bin ax kirine û bela wela kirine. Rojhilata Navîn ji dema Makedoniyan hetanî îro tu carî aşitî nedîtiye. Hemû deman bi dijberiya gelên dagirker yê dereke ve meşxûl bûne. Çand û tecrûbeya Mezopotamyayê, bi destê ol û gelên dereke yên dagirker ve heram bûye û ji xemla xwe ketiye. Îro ciyê dagirkerên dereke bi awayekî din, di bin rewş û mercên cûda de, Emerîka berdewam dike. Berê Ingilîz û Fransizan ev herêm tevlihev kirin e, dijminahiya nava gelên binecîh gûr kirine, bi destên hinekan girtine û bera ser serê hinekên din dane. Hinek kirin hevalbendên xwe û hinek jî kirin dijminên xwe. Gelê Kurd li vê herêmê herdem bûye hêza sereke ya êrîşên dereke. Îro Emerîka bi projeyeke din beşdarî vê **prosesa paradîgmaya nû ya pêla**

**3'yem** dibe. Neteweyên Rojhilata Navîn, kedkar û hejarên Rojhilata Navîn wê çawa bikaribin ji vê projeyê sûd wergirin?

## Projeya Rojhilata Navîn ya Mezin û Bakurê Efrîkayê

Sala 2011'an, bû sala serhildanên gelêrî yên Bakurê Efrîkayê û yên Rojhilata Navîn.Tevgerên gelêrî li welatên Bakurê Efrîkayê weke mîlad têne binavkirin. Êdî weke bêje-têgin: "berî Tahrîrê û piştî Tahrîrê" dest bi lêkolîn û şîroveyên serhildanên gelêrî dibin. Tahrîr ciyê serhildana Misrê bû.

Li Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê demeke nû dest pê kiriye. Hemû desthilatdariyên dewlet û tevgerên van herêmana di bin bandora vê dema nû de xebata xwe û desthilatdariyên xwe di ber çavan re derbas dikin û helwestên nû derdixin pêş. Serhildanên gelêrî jî bi berfirehî didomin. Ev dem, dema rûxandina hemû bendên tirsa ji dîktatoran e. Êdî tu qeyd û merc nema karin dest û lingên gelan bi zincîhrên esaretê ve girê bidin. Neteweya Kurd, desthilatdariya Kurdistana Başûr û hemû tevgerên Kurdan, bi gelemperî tevgera Kurd ya neteweyî jî di bin bandora vê demê de dimînin.

Îro projeya Emerîkayê ya bi navê "Projeya Rojhilata Navîn Ya Mezin" di qada rojeva siyasî de cîhekî girîng werdigre. Ger bi eşkereyî nayê zimên jî ev proje heye. Ev çi proje ye ku hemû dîktator, şowen, nîjadperest, statukoperest, olperest û sosyalîstên Rojhilata Navîn li dijî wê radiwestin û hevdu bi alîkariya vê projeyê ve tawanbar dikin? Projeya Emerîkayê bi şerê dijî dîktatoriya Seddam re bêtir eşkere bû û bêtir di rojeva siyasî de cîh girt.

Îro bi eşkereyî tu hêz vê projeyê naparêzin. Li Rojhilata Navîn parastina vê projeyê weke gunehkariyeke mezin bi nav dibe. Bi ya min ev bi xwe serketina propagandeya Îslamiya siyasî û ya dîktator, zordar û statukoperestên Rojhilata Navîn in. Ezê bi kurtî vê projeyê bînim zimên.

Ev stratejiya Emerîkayê ya leşkerî, siyasî, aborî û jeoplîtîk e. Ev weke, **"projeya berfirehkirî ya Rojhilata Navîn û ya Bakurê Efrîkayê"** tê bi nav kirin. Ev stratejiya Emerîkayê ya di dema şerê sar de hatiye amade kirin, bi pêvajoya 11'êlona 2001ê ve bi eşkereyî derketiye rojevê

û weke projeyeke nû hatiye hûnandin. Piştî şerê Iraqê dengê vê projeyê wekî berê dernakeve, lê ev nayê maneya ku ev proje bi dawî hatiye. Ev proje di rojeva dewleta Emerîkayê de weke pirsa sereke ye û hemû hewildanên Emerîkayê û yên sermayedariya global ji bo amadekirina bicîh anîna vê projeyê ye. Di Rojhilata Navîn de navenda vê pirojeyê bê gûman Kurdistan e.

Îdîayên Emerîkayê yên vê projeyê bi cîhkirina demokrasiyê û guherîna statukoyê ye. Lê yên ku li dijberî vê projeyê radiwestin berevajî vê îdîa dikin. Bi ya min herdû alî jî rastiyê ji raya giştî vedişêrin. Sosyolog Saida Bêdar, wiha dibêje "Bi vê projeya Rojhilata Navîn ya mezin û global ve stabilîzasyon û ewlekariya vê herêmê, bi pêwendiyên aboriya kendavê ve û bi nêrîna vekirina deriyê Asyaya navîn ve weke projeyeke plankirî ya reformên dezgehî û ya serweriyeke baş tê bilêvkirin".[6] Emerîka vê projeya xwe ya global, di dema bi dawîhatina şerê sar û afirandina dinyayeke yek alî de ji bo berdewamiya bi cîhkirina bandora xwe û parastina berjewendiyên xwe yên aborî û jeostratejîkî, di rojeva dinyayê ya siyasî de weke derfeteke dîrokî binav dike û di rojevê de dihêle. Bush armanca vê projeyê bêyî ku nav bide wiha anîbû zimên: **"Dîroka ne hatiye nivîsîn wê ji aliyê me ve bête nivîsîn"**. Ev îdiayek û armanceke mezin e. Îngilîzan bi vê îdiayê Rojhilata Navîn tar û mar kirin. Ji vê tar û marê bêtir êdî xerabî nabe.

Rexneyeke sereke ji bona vê projeyê tê kirin. Serkêşiya vê rexneyê dewletên Ereban, Tirkiye û Îran dikin. Espiriya van dewletên dagirker tîne ba hev, ya parastina statukoya Rojhilata Navîn ya îro ye. Bingeha vê hevkariyê jî berdewamiya dagiriya Kurdistanê ye û dijberiya guherîna statukoya bê dadwerî ye. Ev rexne bi gelemperî wiha ye: **"Emerîka li Rojhilata Navîn ji dêvla ku bi eyalet û bi perçekirina etnîka ve alîkariya perçekirina Rojhilata Navîn bike, divê berî her tiştî pirsgirêka sereke ya Filîstîniyan çareser bike û aştiyê di nava Filîstîn û Îsraîlê de ava bike. Ev jî derfeteke ji bona bawerî bi Emerîkayê diafirîne. Divê perspektiva vê porojeyê li Rojhilata Navîn ne guherîn be lê divê aştî be"**. Rexneyên vê hêza dagirker û

6 Sosyolog Saida Bedar, *Kim Korkar 21. Yüzyıldan*, Lêkolîn-Lêgerîn, Weşanên NTV.

statukoperest pir eşkere ye. Hêzên ji Emerîkayê ji dêvla ku guherîna Rojhilata Navîn, aştiyê dixwazin rast nabêjin. Di bingehiya daxwazên vê hêza durû de parastina statukoya îro ya Rojhilata Navîn û parastina serweriya neteweperestî heye. Ji xwe espiriya vê projeyê ya sereke guherîna statukoyê ye. Heger vê guherînê nikaribe pêk bîne ji armanca xwe bi dûr dikeve û êdî nabe projeyeke nû.

### Helwesta me li himber vê projeyê divê çawa be?

"Projeya Rojhilata Navîn ya mezin" weke doktirîna Eisenhower ya ku bi navê "parastina îstikrar û aştiya Rojhilata Navîn" dihate nasîn, ku di 1957'an de weke biryara kongreyê tê nasîn, tê bilêvkirin. Emerîka bi vê projeyê re, ji rojava ve Fas û Morîtanya, ji Rojhilat ve Asyaya Navîn û Moxolîstan, ji bakur ve Kafkasya, Tirkiye, Iraq, Suriye, Îran, ji başûr ve cîhana Erebî û Somaliya bi hevdû ve girê dide û erdnîgariyeke mezin dide pêşiya vê projeyê. Bi vê projeyê ve Emerîka, li vê erdnigariya mezin bi armanca stratejiyeke dirêj ya ku bi aborî, siyasî, dadwerî û ewlekariyê ve pêçayî, bingeha guherîneke nûjen amade dike. Îro hêdî hêdî, berhemên vê projeyê derdikeve rojeva siyasiya dinyayê. Li Tunisê û li Misrê şoreş bi ser ketin. Dîktatorê Tunisê û yê Misrê serweriya xwe wenda kirin. Li welatên Ereban serhildanên nûjen dest pê kirine. Li Lîbyayê jî mixalefeta desthilatdariyê bi alîkariya destêwerdaneke navnetewî bi ser ket. Li Sûdanê, guherînên girîng dest pê kirine. Başûrê Sûdanê çû referandûmê û dewleta xwe ya serbixwe ava kir. Li Efrîkayê dewleteke din ya serbixwe hate avakirin û sînorên ku nedihatin guhertin hatine guhertin. Ev û hemû buyerên weke vana bi vê pêvajoya nûjen ve girêdayî pêk tên. Ez nabêjim hemû bi destên Emerîkayê pêk tên, lê di vê pêvajoyê de rola Emerîkayê û rola sermayedariya navneteweyî girîng e. Lê ya herî girîng têkçûna sîstema netewe-dewletê û struktura wê bi xwe ye. Lewra struktura netewe-dewletê û zordariya wê bi serhildanên gelêrî ve encam didin. Ezê li jêrê netewe-dewletê û alternatîfa netewe-dewletê bînim zimên.

Emerîka armanca vê projeyê, bi avakirina demokrasiyê li Rojhilata Navîn ve şîrove dike. Ango wê ev proje serweriya kraliyet û dîktatoran bi dawî bîne û wê bi vejîneke nû bêdadweriyê birûxîne û wê sînorên bêyî vîna gelan hatiye kişandin, bi sînorên nexşeyeke nû ve,

wê bêne kişandin. **Lê em dizanin ku armanca sereke ya vê projeyê, vê erdnîgariya mezin bi sîstema navneteweyî ve entegre kirin e.** Ger ev entegrasyon bibe encama demokratîzekirina Rojhilata Navîn û bibe encama guherîna struktura nû ya dadwerî wê ev proje bi alîkariya hêzên guherparêz û lîberalên herêman ve bi ser bikeve. Lê ev proje weke îro tê şîrovekirin tenê bibe encama bidestxistina dewlemendî û çavkaniyên enerjiyê yên Rojhilata Navîn, wê ev proje bi ser nekeve û dijberî xwe hêzeke bêhempa lidarbixwe.

Ev proje weke projeyeke demî tê bilêvkirin. Dema vê projeyê, li gor hinek çavkaniyên Emerîkî 10-20 sal e. Ger ev dem rast be vê projeyê dema xwe dagirtiye û divê bi dawî bê. Lê xuya ye ev proje ne projeyeke demî ye. Projeyeke stratejîk ya dûr û dirêj e. Di vê erdnîgariya mezin de li kîjan herêmê bingeha wê amade bibe li wêderê wê bi cîh bibe. Cîhê ne amadene ji nava vê projeyê dernayên û xebata bingeha bicîh kirina wê li wan herêmana tê kirin. Bi vê projeyê ve Emerîka bi watiniyên gelekî zahmet û demdirêj ve xwe amade dike.

Şerê sar di salên 90'î de bi dawî bû. Serkêşên vê pêvajoya nû, berê bi navê **"Hûnandina Nû ya Dinyayê"** ev proje amade kirin. Paşê ev proje bi navê **"Projeya Rojhilata Navîn ya Mezin"** ve hate bilêvkirin. Hemû bûyerên di çerçoweya vê projeyê de rû didin xuya dikin ku armanca sereke ya vê projeyê, bidestxistina çavkaniyên enerjiyê û stabilîzasyona herêmê ye. Lê weke tê gotin tenê armanc ne bidestxistina çavkaniyên enerjiyê ye. Ji nuha ve çavkaniyên enerjiyê yên vê herêmê 40% wê dest guhertiye. Lê ji bona bicîhkirina vê projeyê parastina demokrasiyê û parastina mafê mirovan bivê nevê ye. Weke mînak, tê gotin ku Emerîka ji bona petrolê midaxeleyî Iraqê kir, ne ji bona gelên Iraqê. Belkî rastiyek di vê gotinê de hebe, lê vê midaxeleyê em tenê bi pirsa petrolê ve girê bidin emê armanca vê projeyê ji ber çavên xwe bi dûr bixin. Bi ya min heger weke tê gotin armanca Emerîka bidestxistina petrola Iraqê bûya, bawerim Seddam jî dikaribû ev kar bikiraya û belkî ji îro çêtir jî dê bikira. Lê armanca Emerîkayê û ya Ewropayê ne tenê bidestxistina çavkaniyên enerjiyê ne. Ev bêje ji bo alîkariya NY (Neteweyên Yekbûyî) û NATO'yê, ji bo Lîbyayê jî tê gotin. Lê ji rastiyê dûr e. Lê enerjî, di helwesta Emerîka û sermayedariya global de cîhekî girîng werdigre.

Ji bona bikaribin enerjiyê bi aramî bighînin dinyaya rojava, li Rojhilata Navîn aramî pêwîst e. Aramî jî bêyî guherîna vê struktura bê dadwerî pêk nayê. Guherîna struktura Rojhilata Navîn, bi bidestxistina mafê netewî û mirovahî yên netewe û kêmneteweyên vê herêmê ve girêdayî ye. Bêyî guherîna strukturê aramî nayê Rojhilata Navîn. Ji salên 1990'î ve Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê weke bombeyên di dest de, ji serhildanan re amade bûn. Emerîka, Ewropa û sermayedariya global ev rastiya han baş xwendin û li gor pêwistiyên vê herêmê projeya Rojhilata Navîn di ber çavan re derbas kirin û pêdiviyên civata van herêmana rast xwendin. Lê li hemû welatan pêdiviyên gelan wekî hev nînin. Ev proje bêyî zerar û ziyanê bide berjewendiyên wê û yên Îsraîlê bicîh dibe.

Ji dervî rawestandina li dijî sînorên dagirkeriyê û parastina mafê neteweyan û kêm neteweyan ev proje nikare bi rastiyê wergere. Ger projeyek li Rojhilata Navîn vejandina sînoran bixwaze, ger mafê neteweyan û kêmneteweyan biparêze wê gavê bivê nevê wê li dijî statukoya heyî jî raweste. Bi vê rawestanê ve yên ku vê projeyê dixwazin û yên naxwazin ji hev cûda dibin û eşkere dibin. Lê na, ger ev proje tenê ji bona armanca xwe ya sereke ya parastina çavkaniyên enerjiyê têbikoşe wê bi ser nekeve û wê ev cudahî jî bi zelalî eşkere nebe. Îro prosesa vê projeyê di navbeyna herdû aramancan de dihere û tê.

Guherîna statukoya Rojhilata Navîn, di berjewendiyên neteweyên bindest ên weke Kurd, Azerî, Ermenî, Belucîh, Flistînî, Suryanî, Keldanî û wekî din de ye. Di berjewendiyên hejar û burjuwaziyên lîberal de ye. Di berjewendiyên karger û gundiyên van herêmana de ye. Di prosesa bicîhkirina vê projeyê de, hêz û tevgerên li jor hatine nivîsîn yên aliyên avakirina civatên pirçandî, aştîxwaz û demokrat û hemû aliyên dadweriyê diparêzin, divê tekoşînên xwe bi hêz bikin, da ku bikaribin vê guherînê bi berjewendiyên xwe ve bi encam bikin. Loma projeya Rojhilata Navîn ya mezin, dikare bi encamên erênî bicîh bibê. Ger îro dewletên statukoperest , dîktator, şovenîst, nîjadperest û kraliyetên vê herêmê li dijî vê projeyê radiwestin, ji bona vê projeyê bi berjewendiyên xwe ve girêdanekê nabînin. Loma jî li dijî vê projeyê radiwestin. **Weke watiniyên xwe, heta ev proje li dijî berjewendiyên me bicîh nebe, pêwîst nîne ku em li dijî vê projeyê rawestin. Ar-**

**manca me ya ku em di prosesa bicîhkirina vê projeyê de, li aliyê vê projeyê rawestin ne dagirkirina mafê tu kesî ye. Lê vê prosesê weke derfet dîtin û bi kar anîna ji bona bidestxistina mafê xwe ez weke helwesteke rast şîrove dikim. Ev helwest ji bo hemû hêzên li jorê hatine binav kirin derbas dibe.**

### Nûjeniya projeya Rojhilata Navîn

Piştî serhildana Îraqê "Projeya Mezin ya Rojehelata Navîn û Bakurê Efrîkayê" bi hêza leşkerî bi cîh nabe. Ji dêvla vê helwesta leşkerî, têgeheke nû bikar tê. Navê pêvajoyê, serokomarê berê yê Rûsyayê Pûtîn, weke "demokrasiya bi kontrol" bi lêv kiribû.

Lê ev proje ji aliyê stratejîstên Emerîkayê ve weke "demokrasiya emperyal" tê binavkirin. Ev bi xwe tê wateya ku wê demokrasî li van welatana bi hêza emperyalîzmê û bi kontrola emperyalîzmê ve bi cîh bibe. Ev jî xuya dike ku stratejiya projeyê ya guherîna Rojhilata Navîn, ku bi hêza leşkerî dabû pêşiya xwe, hatiye guherîn û bi stratejiyeke nû, vê guherînê bi cîh dike.

Bûyerên Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê xuya dikin ku ev proje berdewam dike û bi stratejiya **"demokrasiya emperyal"** ve bi cîh dibe. Bi van bûyerên dawîn yên li Rojhilata Navîn ve, ev stratejiya nû tê tecrubekirin û li welatên Efrîkayê yên Ereb bi cîh dibe. Di vê tecrubeyê de hêza sereke, hêza nevxweyî ye û alîkariya derve werdigre.

Ev bi xwe serkeftineke dîrokî ye. Lewra ev tecrubeya kevnare ya bi hêza leşkerî ve bi cîh dibû hêzeke gelêrî jî li dijî xwe peyda dikir. Lê bi tecrubeya stratejiya nû, êdî hêzeke berbiçav li dijî xwe dernaxîne û serhildan bi encam bidawîn tên.

Ev nimûne wê li vê herêmê nesekine û wê berdewam bike. Ev tecrube dikare bibe weke pêleke şoreşgerî û bibe nimûneya gelên bindest. Ev bi xwe beşeke ji paradîgmaya pêla 3'yem e. Lewra di bingehiya van tevger û serhildanên gelerî de, daxwaza guherîna struktura netewedewlet û stratejiya wê ya aborî û siyasî heye. Li vir dixwazim bêjim êdî pêwîstî bi projeya Rojhilata Navîn ya bi hêza leşkerî namîne. Ji xwe rêya rast jî ev e.Vê tevgera gelêrî wê li hemû cîhanê berfireh bibe. Lê dive tu carî neyê jibîrkirin ku, pêwîstî bi hêza leşkerî hebe wê ew jî

ji aliyê sermayedariya global ve bête bikaranîn, weke li Lîbyayê hate bikaranîn. Lê êdî ev helwest ne ya sereke ye. Helwesta sereke bi hêza navxweyî ve pêkanîna guherînê ye.

Ev dibe nimûneya şoreşên gelêrî yên ji bo bicîhkirina demokrasiyê û guherînên strukturî. Di vê pêvajoyê de tenê rola yek îdeolîjiyekê tuneye. Ev bi xwe pêvajoya hêza guherparêziyê ye û îfadeya hêza global e. Di vê pêvajoyê de ji lîberalên demokrat heta sosyalîst û olperestan hêzeke pirrengî û pirdengî cîh digre.

Li Ewropayê bêyî serhildanên mezin, guherîneke berfireh pêk hatiye û ev guherîn didome. Efrîka û Rojhilata Navîn herêmên dawîn yên dinyayê ne ku îro ji bo guherînên netewe-dewletê dest bi serhildanan kirine. Ev serhildan û tevgerên gelêrî bandoreke mezin li ser hêzên navneteweyî dikin û dibin sedemên guherînên nuh li dinyayê.

## Pêvajoya Rûxandina struktura Netewe-dewletê

Îro netewe-dewlet weke sîstem di nava krîza strukturî de dema xwe ya dawîn dijî. Hemû bûyer û kiryarên dinyayê xuya dikin ku ev struktur û sîstema netewe–dewletê dema xwe dagirtiye û rûxandina wê her dem di rojeva gelên cîhanê de ye. Li her aliyê cîhanê li dijî vê struktura netewe-dewletê têkoşîna gelan gûr dibe û krîza strukturî kûr dibe. Serdemiya me ya îro rûxandina struktura netewe-dewletê ye û ji nûve vejandin û avakirina struktura desentralîzasyonî û avakirina civatên pirçandî û pirneteweyî ye.

Boutros Ghali, sekreterê giştî yê Neteweyên Yekbûyî yê berê (1992-1996) di hevpeyvîneke xwe de wiha dibêje: **"Siyaseta Rojava (Ewropa, Emerîka. N.A.) li Rojhilata Navîn nikare bicîh bibe" weke sedem jî wiha dibêje" Efrikî, ji hukumetên xwe bêtir ji eşîrên xwe bawer dikin. Ev rastî** ji bo Ereban û ji bo welatên Asyayî jî derbas dibe" Rojnameya Metroyê 3/3-11.[7]

Emê Netewe- dewletê çawa li pênûsê bidin û alternativa netewe-dewletê çi ye ?

Netewe-dewlet, îdeolojî û modeleke strukturî ya Rojavayê Ewropayê ye. Li Rojhilata Navîn netewe-dewlet bi awayên cuda hatine ava kirin.

7 *Metro Günlük* gazetesi- Tidningen Stockholm/İsveç 03/03-11

Dewletên Rojhilata Navîn bi hemû teybetmendi- yên xwe ve dîsa jî weke netewe-dewlet hatine avakirin.

Teybetmendiyên van dewletana bêtir nasnameya desthilatdarî, ya dewletê ye. Li van dewletana nasnameya eşîrî, Melekî, olî yan jî neteweyî (etnîkî) pirsa sereke ye.

Netewe-dewletên Rojhilata Navîn berhemên şerê cîhanê yê yekem û yê duyemîn in. Berhemên berjewendiyên dewleta Ingilîz, Fransiz û dawî jî yên Emerîkayê ne. Ev dewletên netewî li ser xaka netewe û kêmneteweyên cuda hatine avakirin. Weke struktur, dewletên navendî ne. Cudahiyên herêmî, ziman, ol û çandên cuda ji sîstema dewletê bi dûr ketine. Neteweyên cuda hatine înkarkirin. Dewletên Rojhilata Navîn yan bi destên Emperyalîzmê yan jî bi alîkariya wan hatine avakirin. Li van welatana siyaseta plural cîh negirtiye. Ji aliyê siyasî û Îdeolojî ve Lîberalîzm li van welatan bi cîh nebûye. Elîteke bûrjûwazî li ser dewlemendiya ser xak û bin xakiya welat, weke parazîtê mezin bûye. Bûrjûwazî bi destê dewletê hatiye afirandin. Sermayedariyeke lîberal û însanî li van welatan çênebûye.

Weke dewletên navendî, bi şîdeta artêşa dewletê ve li ser lingan mane û desthilatdariya xwe jî dîsa bi alîkariya vê artêşa zordar ve domandine. Serweriyeke gelêrî tu carî pêk nehatiye. Mafê jinê, li van welatan nebûye pirseke berbiçav. Hemû pirsgirêk û nakokiyên civatê radestî zordarî û serweriya leşkerî kirine. Şîdet li van welatana weke rêya tek û tenha hatiye dîtin. Elîteke bijarte dewlemendiya welat xistiye destê xwe û vê dewlemendiyê bi hemwelatiyên xwe re payê nekiriye.

Netewe-dewletê, li Rojhilata Navîn potansiyeleke mezin li dijberî xwe afirandiye. Lê mixalefeta desthilatdariya netewe-dewletê li Rojhilata Navîn di nava bêdengiyê de mezin bûye. Mûxalefet ji alternativeke siyasî bêpar e. Hêzek bi tendensa çerçoweya projeya Rojhilata Navîn hebe jî, rola Îslamê di nava mûxalefetê de girantire. Bi gelemperî gel, hêzên guherparêz yên bûrjûwazî, yên lîberal, hêzên sosyalîst, hêzên olperest, netewe û kêmneteweyên cuda, çand û herêmên cudahiyên xwe didin pêş, potansiyela mûxalefetê bi xwe ne. Nexweşî û nerazîbûna li dijî netewe-dewletê, li dijî îdeolojî û struktura wê bi xweye.

Îro bingeha serhildanên gelêrî yên Rojhilata Navîn û Bakurê

Efrîkayê dijberiya netewe-dewletê bi xwe ye. Îro niqaşeke berfireh li ser van serhildanan didomîne. Encamên van serhildanan bi zelalî xuya nakin. Rola projeya Emerîkayê di van serhildanan de ne pir eşkere ye. Dengên bêtir derdikevin dengên olperestiya Îslamî ye. Rola projeya Emerîkayê û bêistîqrariya wê di van serhildanan de bi berjewendiyên Îsraîlê ve zêde girêdayî derket holê. Vê bêistîqrariya wê jî helwesteke bêîstîqrar peyda dike. Dijberiya diktatoran rast dibîne, lê di derbareyê guherîna struktur, îdeolojî û siyaseta rejîmî de bêîstîqrar e. Sedemên mezin yên vê bêîstîqrariyê, bêpariya alternatifa siyasî û helwestên hêza Islamî ye.

Lê desthilatdarî çi dibe bila bibe rê li ber rûxandina struktura netewe-dewletê vedike. Hemû desthilatdarên guherparêz bêgûman ne alternatifên netewe-dewletê ne. Desthilatdariyeke Îslamî weke ya Îranê nikare bibe alternatifa netewe-dewletê. Lewra ew bi xwe netewe-dewleta Îslamî ye. Desthilatdariya leşkerî jî ne alternatifa desthilatdariya netewe-dewletê ye.

Li van welatana, ji aliyê siyasî, lîberalizm û ji aliyê aborî ve jî sermayedariyeke însanî û berhemdêr pêwîst e. Li van welatana pêkhatina van hêzan wê bi salan bajo û îro alternatîfeke wiha ne mumkun e. Lê serhildanên îroyîn dikare bi encama alternatîfeke siyasî ku bikaribe rêya afirandina vê alternatifa demokrat veke bicîh bibe.

Pirsa sereke ya netewe-dewletê guherîna nasnameya desthilatdariya siyasî ye. Desthilatdariya siyasî divê li gor rewşa civatê weke pirnetewî, pirolî, pirçandî bête hunandin û struktura dewletê jî li gor pirdengiya civatê pêk bê. Dewlet ji sîstema navendî (merkeziyet) bête rizgarkirin. Di çerçoweya sîstema desentralîzasyonkirina dewletê de, erk, watinî û pêdiviyên herêmî bibin sereke. Avakirina civata sivîl, hêza tevgera gelêrî û sermayedariya însanî û berhemdar, bibe bingeha avakirina civatê. Bi van awayan ve avakirina dewleta dadwer bibe armanca sereke. Li vir ya girîng payêkirina desthilatdariya siyasî ye û guherîna struktura netewe-dewletê ye.

Êdî di vê serdemiya me de struktur û giranbihayên dema sîstema netewe-dewletê, di nava raya giştî ya cîhanî de weke kevneşopî, dîktatorî, nîjadperestî binav dibe u dijberiyeke globalî li dijî xwe peyda dike. Her wiha di nava hemû netewe-dewletan de alternatîfên

siyasî û yên desthilatdarî derdikevin rojevê. Lê bêgûman ji sîstemekê derbasbûna sîstemeke nuh ne yekcar pêk tên û ne jî li hemû cîhanê wekî hev dest pê dikin û berfireh dibin. Lê hevbeşiyeke sereke di nava hemû serhildanan de heye ew jî, serencem û serkevtina têkoşîna ramanên li dijî netewe-dewlet û helwesta wê ya kevneperestî û strukturî ye.

Hemû bûyerên li dinyayê rastiyekê derdixin ber çavê raya cîhanî. Êdî gelên dinyayê naxwazin di nava vê sîstema kevneperest û strukturel de bijîn û desthilatdarên vê sîstemê jî êdî nema dikarin weke berê di nava vê girtîgehê de desthilatdariya xwe bidomînin û serweriya gelan bikin. Vê pêvajoyê li Rojhilata Navîn jî dest pê kiriye û bi hemû coşiya xwe ve berdewam dike. Bûyerên Rojhilata Navîn û yên Bakurê Efrîkayê bûyerên paradîgmaya pêla 3'yem in.

Di dema rûxandin û guherîna netewe-dewletê de, desthilatdariyên nû û tevgerên serkêşa vê pêvajoyê dikin, bê gûman pirrengîn û pirdengîn in. Li gor dîrok, siyset û aboriya civatê, li her welatekî bi awayekî cuda dest pê dike û bi reng û dengên cuda ve jî desthilatdariyên nû têne avakirin. Her hêzek li gor daxwaz û hêviyên xwe beşdarî vê pêvajoyê dibin û li gor daxwaz û nasnameyên xwe jî di nava desthilatdariya nû de cîh digrin. Guherînên civakî, aborî û strukturî li gor bersiva pêdiviyên civatan pêk tên.

Di hin civatan de guherînên bi helwestên zorê û bi destêwerdanên global-navneteweyî di pêwendiyên civatê de nakokiyên aborî, civakî û siyasî diafirîne. Li vê derê girînge ku dema guherînê ji jêr ber bi jor ve bi beşdariya hemû aliyên civatê ve bête amade kirin. Hêzên guherparêz divê li himber nêrîn û daxwazên cuda xwedî tolerans bin. Serhildan û tekoşîna gelêrî divê bikaribe hemû nêrînên civatê himbêz bike.

Heta nuha guherînên Rojhilata Navîn bi serweriyên artêşî ve bi encam bûne. Lê îro vê helwesta leşkerî di nava helwest û tevgerên gelêrî de lawaz dibin û weke helwestên bêdadwerî û dîktatorî bilêv dibin. Em dikarin vê helwesta gelan ya nû weke helwesta şoreşgerî bi nav bikin. Ji xwe paradîgmaya pêla 3'yem şoreşa dema me ye.

Bingeha guherînên vê pêla 3'yem çi nin? Bersiva vê pirsê zahmet e. Lewra bersiva vê pirsê tenê ne yek bersiv e. Berî her tiştî struktura van welatana bi metodên desthilatdariyeke kevneşopiya dîktatorî û bi ramanên nîjadperestî û şovenî berdewam dike. Ev sîstem hatiye xeti-

mandin û êdî nikare bersiva aborî, civakî û siyasî ya pêdiviyên civatê bide. Hin nêrîn henin ku van daxwazên guherînê tenê bi kirîza sîstema kapîtalîzmê ve girê didin. Lewra sîstema netewe-dewlet sîstema dewleta kapîtalîst e. Ev nêrîn bi tevayî ne çewt e, lê ev nêrîn bi serê xwe tenê bersiva van guherînên pêvajoya pêla 3'yem nadin. Lewra ev guherîn tenê ne di nava dewletên sermayedarî de dest pê kir, herwiha dewletên di nava sîstema sosyalîzma reel de cîh digirtibûn jî para xwe ji vê pêla 3'yem girtin. Ji xwe mirov dikare bêje pêla 3'yem ji rûxandina sîstema sosyalîst ve dest pê kir û bû sedema kirîza aborî û strukturî ya dewletên sermayedarî jî. Lewra ev kirîz tenê ne kirîza dewletên sermayedarî ye. Dewletên sosyalîst yên bi federasyonên neteweyan ve hatibûn avakirin, mixabin di demeke dirêj de nikaribûn bersiva gelên nava federasyonan bidin û struktura dewletê bi destên desthilatdariya elîtekî birokratîk ve bi rê ve çû û bersiva pêdiviyan nedan.

Sîstema netewe-dewletê êdî tenê bersiva gelan û neteweyên cuda nade. Ev struktur û sîstema vê dewleta kevneperest êdî bersiva sermayedariya global ya navneteweyî jî nade. Lewra îro palpiştê vê guherînê, hêza sermayederî ya global e. Hêza global êdî bi reformên nava netewe-dewletê ve berjewendiyên xwe dide pêş û seferberiyeke mezin li dar dixe. Neteweyên bindest, hêzên lîberal û sosyalîst û ta radeyekê hêzên olperest jî di nav de bi daxwaza guherîna struktura sîstema netewe-dewletê ve ji bo berjewendiyên xwe têdikoşin û li gelek cihî jî bi ser dikevin. Hemû guherîn li gor daxwaza sermayedariya global bi encam nabin. Hêzên navxweyî di pêvajoya guherînê de roleke sereke digrin û gelek carî encama serhildanan ne weke hêviyên hêzên global bi dawî dibin. Di vê prosesê de rêkxistinî û daxwazên zelal û hevkariya hêzên guherparêz him girîng in û him jî biryardêr in. Hêzên dereke êdî nikarin tenê berjewendiyên xwe bidin pêş û loma jî daxwazên hêzên guherparêz didin ber çavan.

Hêza navneteweyî ku bêtir serê wê Emerîka û Ingilîz û bi gelemperî Ewropa dikşînin, piştî destêwerdana Iraqê, heta bikaribin bi hêza leşkerî, guherînê pêk naynin. Piştî Iraqê, Emerîka bêtir projeya Rojhilata Navîn ya mezin guhertiye û bi şêweyine cuda ve, vê projeyê birêve dibe. Guherîna desthilatdariyên dîktator û guherînên strukturên netewe-dewletan, xuyaye êdî wê ne weke guherîna Iraqê,

Yugoslawyayê û Afganîstanê bi hêza leşkerî ve pêk bên. Dema şêweya guherîna bi zorê êdî ne li gor berjewendiyên hêzên globale jî. Bawerim ger pêwîst nebe wê hêzên global ji nuha û pêve wê bi riya hêzên navxweyî ve vê guherînê pêk bînin. Lê pêvajoyên guherînê li hinek ciyan dikare bibe sedemê destêwerdaneke leşkerî. Weke nimûne Libya. Hêzên global ji van herdû şêweyan re jî amade ye. Bi kurtî êdî hemû şert û mercên rûxandina sîstema netewe-dewletê bi cîh bûye û rûxandina vê struktura kevneperest di rojeva gelan de bûye pêngava sereke ya serdemiya me. Êdî gelên dinyayê di vê dema internetê de ku bandoreke mezin li ser hunandina civatan û li ser nivşên dahatûyê dike, wê struktura netewe-dewletê û desthilatdariya wê ya statukoperest û dîktator qebûl nekin.

### Demokrasiya Emperyal û Mûsewîtî

"Demokrasiya Emperyal" li cîhanê û nemaze li Rojhilata Navîn bêyî hêza sermayeya navneteweyî, hêzên navneteweyî û sermayedariya Yahûdiyan nayê şîrovekirin. Çawa di avakirina netewe-dewltên Rojhilata Navîn de rola wan girîng bûn, îro jî di guherîna wê de rola wan mezinin.

### Bingeha vê guherînê du hêzên serke ne:

**1**-Hêza gelêrî û netewe û kêmneteweyên bindest in. Aliyekî din yê vê hêza gel jî heye ku ew xwe weke oldarê Îslamî binav dikin. Yên guherîna Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê bi dil û can dixwazin ev hêzên gelêrî ne. Bêyî van hêzan guherîna Rojhilata Navîn pêk nayên. Ev hêza sereke dijî struktura netewe-dewletên Rojhilata Navîn di nava hewildanên girîng de ne. Di nava vê hêzê de rola tevgera neteweyî û demokratî ya Kurd serekeye. Bêyî tevgera Kurd guherîn li Rojhilata Navîn bi cîh nabe. Ji hemû hêzan bêtir di guherîna vê herêmê de berjewendiyên gelê Kurd heye. Bêyî guherîna struktura Rojhilata Navîn yekîtiya neteweya Kurd xewn e. Herwiha bêyî gelê Kurd jî guherîna struktura Rojhilata Navîn pêk nayê. Lewra şerê giran li ser xaka Kurdistanê pêk tê.

**2**- Hêza sermayedariya global e. Serkêşên vê hêzê jî sermayedariya Emerîka, nemaze ya Ingilîz û tevayî ya Ewropayê ye. Di destêwerdana

Iraqê, Afganîstanê û hemû hewildanên guherîna Rojhilata Navîn de destê vê hêza mezin heye. Bêgûman serkêşên vê hêza global ya sermayedariya Yahûdî ye, yan jî di bin bandora sermayedariya hêza Yahûdiyan de ye.

Du sedemên daxwaza guherîna vê hêzê ya Rojhilata Navîn heye. Ya sereke parastina netewe-dewleta Yahûdî Îsraîl e. Hêzên Yahûdiyan ji dîrokê ve ji bo dewleta Yahûdî xebat kirine û îro jî naxwazin vê dewleta Yahûdî ji dest berdin.Ya duyem jî bicîhkirina desthilatdariyên nêzî hêza sermayedariya global, yan jî hêza ku ji bo sermayedariya global re nebe asteng e. Ev hêza global daxwazên gelên Rojhilata Navîn yên guherîna herêmê jî didin ber çavan û dizanin bêyî vê hêza gelêrî guherîna Rojhilata Navîn zahmet e. Îro nakokiyeke mezin di nava desthilatdariyên sermayedariya global û sermayedariya neteweyî de bi hêz dibe. Sermayedariya neteweyî bi eslê xwe tune ye. Ev sermayedarî bi xwe li ser dewlemendiya xwezayî ya dewletê, bi hevkariya brokrasiyê û hêza artêşî ya elîtekî bijarte ve weke hêzeke kevneperest, serweriya xwe ya sermayedarî û desthilatdarî didomîne. Ev dewlemendiya dewletê bi gel re payê nake û dibe astengê pêşiya sermayedariya global jî. Ev hêz li Rojhilata Navîn xurt e.

Ji nava hêzên navneteweyî dixwazim du nava bidim. Yek ji wan tevgereke Îngilîzan e û navê wê, jî RIIA ye (Royal Institute of International Affairs), û ya din jî ya Emerîkayê ye ku di nava wê dezgehê de bijarteyên dinyayê jî cîh digrin. Navê vê dezgehê jî, CFR ye (Council of Foreign Relations). Her du dezgeh bi hevre di nava hevkariyekê de xebata xwe didomînin. Her du dezgeh jî, ji şerê cîhanê yê yekem ve vê xebata xwe ya navneteweyî bi rêve dibin. Evan her du dezgehan alîkariya bi dehan diktator, kraliyet, darbeyên artêşî û dewletên navendî yên netewe-dewlet kirine. Li dijî dewletên sosyalîst alîkariya tevgerên olî yên Îslamî kirine. Li dijî tevgerên azadiyê rawestiyane û alîkariya dîktatoran kirine. Bandora wan li ser Neteweyên Yekbûyî (NY), li ser Yekîtiya Ewropayê (YE), li ser Nato yê biryardêr e. Li der û dora wan her du dezgeha bi dehan dezgehê, sivîl, aborî, zanyarî û siyasî henin. Bi destên wan dezgehan jî, li ser rêvebiriyên dewletan bi bandor kar dikin.

Dixwazim hûnandina dezgeha Emerîkayê, CFR'yê bînim zimên. CFR, ji nava 500 şîrketên mezin yên emerîkayê û yên dinyayê, % 37,

ji nava 100 şîrketên herî mezin % 70, ji nava 25 şîrket û dezgehên herî mezintirîn jî % 92, ji nava 25 bankeyên herî mezin 21, ji nava 25 şîrketên ewlekariyê yên herî mezin 16 endamên vê dezgeha Emerîkayê ne. Ew bi xwe hêzeke navneteweyî ye. Di nava serkêşên vê dezgehiyê de, bi dehan endamên dezgehên navneteweyî cîh digirin. Desthilatdarên şîrketên dinyayê, serokên Emerîkayê yên kevn, elçî û wezîrên derve, serokên borsayên mezin, elîtên leşkerî yên Natoyê, dadwerên pispor, serokên medyayên mezin, rektorên unîversîteyên mezin in û bi dehan dezgehên navneteweyî idare dikin.[8]

Lê xuyaye ji salên 90'î û virde nemaze piştî rûxandina sîstema sosyalîst van hêzên navneteweyî, bi stratejiyeke nuh dest bi kar dikin. Nêrînên wan yên gelemperî yên guherîna struktura netewe-dewletê mirov dikare bi erênî bipejirîne. Bêgûman dev ji berjewendiyên xwe bernedane. Lê berjewendiyên xwe ji berê cudatir, li gor hin daxwaz û hêviyên gelan bi cîh dikin. Lewra ew daxwaz û xebatên gelan yên ji bo guherînan û rûxandina dîktatoran baş dibînin û stratejiyên xwe jî li gor rewşa nuh ji nû ve dinirxînin. Di stratejiyên hêzên navneteweyî de guherîneke berbiçav xuya dike.

Yek ji wan dezgehên dora CFR'ê jî, NED e (National Endowment For Democracy). Ev dezgeh çerçoweya xwe ya di derbareyê "project democracy" yê de wiha şîrove dike: "Li gelek welatan pêşveçûna hêzên democrat li ser nêrîn û helwestên parvekirina desthilatdariya dewletên merkezî ve mezin dibin. Radestkirina erkên desthilatdariya dewleta merkezî ji bo desthilatdariyên herêmî, helwestên guherînan bilez dikin. Van helwestana ji bo herêmên xweser (otonomî), û ji bo desthilatdariyên şaredariyên herêmî,(ku divê ew xwe, bi xwebi rêve bibin), derfetên bingehîn ava dikin."[9]

Ev dezgeh li Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê bi dehan cara konferans, semîner û lêkolîn kiriye. Bi hezaran kesan û nûnerên dezgehên dewletan di nava perwerdeya wan de cîh girtinin. Ji bo

---

8 Mustafa Yildirim, "Project Democracy", *Sivil Örümceğin Ağında*, 16.basım, Ulus Dağı Yayınları, Ankara 2007, r.395

9 Mustafa Yildirim, "Project Democracy", *Sivil Örümceğin Ağında,* 16. basım, Ulus Dağı Yayınları, Ankara 2007 r.395.

Misrê, Tirkiyê, Îranê, Iraqê û bi dehan dewletên din lêkolînên mezin û konferansên mezin li dar xistinin. Bi hevkariya hêzên navxweyî yên sivîl û perwerdeyî weke unîversîteyan, weke navendên lêkolîner, weke navendên ji bo demokrasiyê, navendên karbidestan û navendên kargeran di nava perwerdeya wan de cîh girtinin. Weke vê dezgehê, bi dehan dezgehên Ewropî jî vî karî dikin. Alîkariya dezgehên jinan, dezgehên civakî yên xortan,di nava xebata çerçoweya van dezgehan de cîhekî girîng werdigrin. Alîkariya YE û NY jî girîng in. Lewra alîkariyên wan bi riya van dezgehan ve bi cîh dibin û rola wan ya îro erênî ye.

Ji van dezgehên navneteweyî, min navê NED'ê dabû. Ez dixwazim bi kurtî be jî xebata wê ya ji bo Tirkiyê raxim ber çavan. NED bi alîkariya xwe ya ji bo dezgehên sivîl, pizişkî, pêşeyî û dezgehên siyasî ji sala 1988'an heta sala 2005'an, di navbera 17 salan de bi alîkariya hêzên Emerîkî yên sivîl û siyasî û bi alîkariya banke û dezgehên Ewropayî ve mesrefa kiriye dixwazim binav bikim. Ev tenê yên ji bo Tirkiye ye. Lê herwiha li welatên Ereban weke Misrê, Îraqê, Lubnanê, herwiha ji bo Îranê û welatên Qafkasî jî ne ji yên Tirkiyeyê kêmtirin.

Di nav 17 salan de mesrefa van dezgehan ya bi destê NED'ê hatiye kirin ji bo Tirkiyeyê:

**204 milyon 954 hezar 214 Euro û 8.milyon 510 hezar 962. dolar e.**

### Paradîgmaya pêla 3'yem, Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê

Destpêka paradîgmaya pêla 3'yem dikare ji salên 70'yî bête dîtin. Lê ev paradîgma bi rûxandina sîstema sosyalîst ve bêtir goşt girtiye û ango di salên 1990'î de bûye pêvajoyeke navneteweyî.

Alîgirên vê paradîgmayê, ango hêzên navneteweyî, yên Emerîkayê û yên Ewropayê, bi mebesta dijî sîstema sosyalîst, destên desthilatdariya siyasî ya netewe-dewletên Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê girtine û alîkariya wan ya leşkerî û aborî kirine. Ev dem, dema dijberî û berberiya nava blokên siyasî ye ku bi navê şerê sar dihate bilêvkirin. Di vê pêvajoyê de tevger û hêzên guherparêz, demokrat, lîberal, sosyalîst û ta radeyekê jî hêzên olperest hatine qedexekirin. Li van dewletana dîktator, neteweperest, nîjadperest bûne desthilatdar û bi vî awayî jî stabîlîzasyona herêmê pêk anîne. Di vê demê de ji bo wan

stabîlîzasyona herêman ji demokrasiyê girîngtir bû. Lewra bingeha nêrîna stabîlîzasyona herêman, ji tekoşîna dijî sosyalîzmê dihat. Demokrasî, wekhevî, azadiya derbirînê ji bo van hêzên navneteweyî ne cîhên mijara devjeniyê bûn. Li ser navê stabîlîzasyonê li gelek cîhî hêzên Îslamî yên dijî Îsraîl ji desthilatdariya dewletan dihatine bidûrxistin. Ev bi xwe dibû sedama bihêzbûyina hêzên Îslamî yên fûndamental ku weke hêzên terorîst, ji bo hemû kesî dibûn xeternak.

Piştî rûxandina sîstema sosyalîst helwesta hêzên navneteweyî hate guhertin. Sedemên guherîna helwestên wan hêzên navneteweyî bê gûman gelek in. Lê serkêşên sedeman rûxandina sosyalîzmê û mezinbûyina dijberiya dijî hêzên navneteweyî, ango Emerîka û Ewropa bi xwe nin. Bi 11'êlona 2001'ê ve helwesta Emerîkayê hate guhertin. Ji 19 elemanê operasyonê 15 kes ji Saudî Erebîstan bûn. Saudî yek ji wan dewletên hevkarê Emerîkayê bû û alîkariya El Qaide kiribû. Ji xwe bingeha El Qaîdeyê Saudî û melekiya wê ye.

Di nava dewletên Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê de, nexweşî û kirîza siyasî mezin dibûn. Li dijî desthilatdariyên dewletên herêmê, dengên gelan ji berê bêtir derdiketin. Bi rûxandina sosyalîzmê ve, hêzên Îslamî yên fundamental bihêz dibûn. Hêzên Îslamî dibûn hêviyên gelan. Helwestên li dijî desthilatdariyan, dibûn hêzên kanalîzekirî yên li dijî Emerîkayê, Îsraîl û Ewropayê, ango li van welatan, Antî-Emerikanîzm û antî- semîtîzm dibû hêza sereke. Evan sedem û çend sedemên li jêr hatine nivîsîn û herwiha encama 11'êlonê, nêrînên demokratîzekirina van herêmanan derxistin pêş.

Rejîmên nemeşrû, desthilatdariyên xwe tenê bi zordariya leşkerî ve didomandin. Di dema cîhana global de, êdî gelan diwêrîbûn dengên xwe bilind bikin. Kêm be jî deng û daxwazên hêzên lîberal, hêzên jinan, lawan, û gelên bindest derdiketin û eşkere dibûn. Di nava dewletên Ereban de hêzên guherparêz, gelên bindest êdî nema bêdengî qebûl dikirin.

### Rewşa çend dewletên Ereban

**Misir, weke nimûne:** Serjimara Misrê 10 caran ji ya Îsraîlê bêtir e. Lê salane biqasî 1/10ê (ji 10 a 1 ) ê Îsraîl, pirtûkan derdixe û belav

dike. Yûnanîstan salane 10 caran, ji hemû cîhana Erebî bêtir, pirtûkên tercumekirî û yên bi Yunanî derdixe. Li hemû cîhana Erebî %1.6 xwedî internet in. % 1,8 kompîturê bikartînin.

Avakirina şîrketên bezirganî û afirandêrî li Rojhilata Navîn û cîhana Erebî ne biqasî welatekî ewropayê ye. Ji bo kesekî bikaribûya destûra avakirina şîrketê werbigirtaya divabû, di nava 10 prosesên brokrasiya dewletê de derbas bibûya. Ew jî bi qasî hatina salekê pere digirt. 10 belgeyên brokrasiya dewletê, deh gendelî pêwîst dikir.

Di pêşiya Export och Împortê de astengên brokrasiya dewletê mezin bûn. Îxracata hemû dewletên Ereban, ji bilî petrolê, tenê biqasî Finlandiyayê ye. Ji sala 1980'yî ku wê gavê îxracata wan % 13.5 bû, daketiye % 4. Ji nava 1 miljar û 300 milyon serjimara dewletên Îslamî, yên sermayeguzariyê dikin tenê bi qasî Swêdê ne.

Dezgehên afirênder, hemû di destên brokrasiya dewletan de ne. Xweserîkirina dezgehên afirênder yên xweser, pir dereng bi cîh dibin. Karger û memûrên dewletê û yên van dezgehan weke sadiq dostên brokrasiyê û yên desthilatdariya dewletan bikar tên. Dewletên Ereban yên xwedî petrol, serjimareke mezin ji nava gel kiriye koleyên xwe. Ew weke hemwelatiyên sadiq yên desthilatdariyên dewletan têne binavkirin. Ew û eşîrên wan weke depoya dengdanan bikar dianîn. 355 mîlyon Ereb bi qasî dewleta Îspanî afirênderin (produktiv). Nêzîkî 50'î milyon bêkar henin. Ji vana jî % 51 ciwan in. % 50 dixwazin ji welat koçber bibin.

Derbirîn bi awayekî eşkere ne mimkun e. Lewra derbirîn bi awayên nehênî, û bi dezheg û tevgerên nehênî ve bi cîh dibin. Mizgeft û medreseyên olî tenê weke cîhê bê kontrol dihatine dîtin, û loma jî cîhê derbirînê mizgeft in. Bi vi awayî jî ramanên fundamental û yên terora bi navê Îslamê xwe dikare bi rêkxistin bik in. Bi vî awayî derfetên mezin ji bo Îslamiya siyasî hate peydakirin. Welewkî li gelek dewletan qedexe bin jî dîsa yên bi hêz dibin ew in.

Evana çend nimûneyên astengiyên bicîhbûna demokrasiyê û pêşdeçûyina sermayedariyê û dezgehên afirendêr in. Bi vî awayî jî lawaziya hêzên lîberal û ramanên lîberal bi xwe re tînin. Ji xwe bicîhbûna demokrasiyê ya herî zahmet e. Ev rewşa welatên Bakurê Efrîkayê,

tunebûna çîna burjuwaziyê (sermayedarê) navendî bi xwe re peyda dike, ku bêtir yê nêzî lîberalîzmê ye.

Ev rewşa welatên Bakurê Efrîkayê, bi xwe re dijîtiya Emerîkayê mezintir kiriye. Lewra Emerîka alîgirê van desthilatdariyan e û alîgirê Îsraîlê ye. Bihêzbûna Hemasê, Hizbûllahê, û terora Îslamî ji xwe vê rewşê radixe ber çavên raya giştî. Li gelek dewletan hînê jî mafê dengdanê ji bo jinan tune ye. Dewletên dîktator, fundamental, kevneperest, melekî, bi awayekî eşkere û nehênî alîkariya van hêzên kevneperest dikin. Îran, Suriye, Yemen, Saudî, Tirkiye, Pakîstan serkêşên vê helwesta dijî Emerîkayê û Ewropayê ne. Evana hemûyan ji bo hêzên navneteweyî, yên aborî û siyasî weke xeternakî bilêv dibin.

Di destpêka salên 2001-2002'yan de dewletên G8'an bi serokatiya Emerîkayê, ji bo reformên dewletî, ji bo avakirina civatên sivîl (medenî), û ji bo reformên aborî ku pêşiya avakirina dezgehên aborî yên afirendêr vedikin, ultîmatom dane dewletên Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê.

Destêwerdana Efganîstan û Iraqê bû mîlada destpêkirina guherîna van herêmana. Welewkî bi van destêwerdanan ve teror û fundamentalîzm bi hêz jî bûye, dîsa jî rêya guherînê vekiriye. Yekîtiya Ereban (YER) bi beşdariya serokdewletên Ereban ve di 2004'an de civiya û biryar wergirt ku dest bi reforman bikin û ji bo demokrasiyê kar bikin, lê ew biryar li wir bê xwedî ma.

Di serî de Îraq û destêwerdana Emerîkayê dijberî xwe hêz peyda kir. Lê azadiya siyasî û makzagona hevbeş ku bi dengdana gel ve hate pejirandin, bandoreke mezin li welatên Ereban kir. Ev derfet ji bo hemû Rojhilata Navîn pêngaveke mezin bû. Iraq di gel hemû nexweşiyên strukturî, civakî, aborî û siyasî ve dîsa bû navenda bezirganiyê. Hemû nêrîn û helwestên siyasî derfeta derbirînê bidest xistin. Azadiya Başûrê Kurdistanê helwesta Rojhilata Navîn guhert. Başûrê Kurdistanê bû navenda bezirganî û navenda siyasî ya Rojhilata Navîn. Êdî li gelek cîhî Iraq weke nimûne dihate rêdan. Bi hemû zordarî û tehdîdên terorîstan jî gelên Îraqî % 60-70 dengên xwe didin û li dijî terorîzmê cîh digrin.

Di vê navberê de li welatên Ereban derfetên bikar anîna înternetê, kompîturê zêde bû. Ev bi xwe yek ji armancên hêzên navneteweyî bûn.

Wan li hemû welatên Ereban hewildanên bikaranîna internetê weke bingeha guherînê didîtin û loma jî girîngiyeke mezin didan bikaranîna kompîturê. Ji xwe satelîtên asoyî jî rê li ber gelek ramanên nuh vedikirin. Al Cezîre (kanala TV), ya Qatarê rêbertiya hêzên guherparêz dike. Bi sedan minaqeşe, rapor û zirûfên navneteweyî di ekranên Al Cezîre de tên weşandin. Astengiyên hemû dewletên Ereban bi awayekî teknîkî dişikîne û xwe digîhîne hemû deveran.

Rojnamevanê di TV ya Misrê de rexne li mubarek kir, ji kar hate avêtin lê Al Cezîre wî girt kar û hemû pîsîtiyê Mubarek raxist ber çavên raya giştî ya Ereban. Al Cezîra him rayên dijî Emerîka û yên dijî Îsraîl diweşîne him jî yên dijî dewletên Ereban. Loma jî gelên Rojhilata Navîn êdî bi nûçe û çavkaniyên Al Cezîre bawer dikin. Al Cezîre rê dide hemû nêrîn û helwestên cuda. Al Cezîre bi serjimara 30 mîlyon Temaşevanên xwe ve bandoreke mezin li ser guherînan dike. Niha jî Al Arabiye û Al Cezîre bi balkêşanên mezin pirsa reformên siyasî û aborî berê xwe didin temaşevanên hugerparêz, lawan, jinan û weke nêrîn jî lîberalîzmê. Van hêzên binavkirî hemû xwe di van kanalan de tînin zimên. Dijî terorê, fundamentalîzmê roleke mezin dileyizin. Iraq, Lubnan, Filistîn, Maroccoko, Urdun mafê kanalên xweser henin û ev bi xwejî rê ji gelek nêrînên cuda re vedikin. Îro 150 kanalên Erebî henin û bi milyonan li wan guhdar dikin. Êdî astengkirina agahdariyê ne mumkun e. Partiya Lîberal li Misrê weke sembol, rengê porteqalî bikar anî. Ev bi xwe ji serhildana porteqalî ya Ukranyayê wergirtibû. Bêtir daxwaz û hêviyên gel bi zimanê ingilîzî xuya dibin. Bala xwe bêtir didin derveyî cîhana Erebî.

Li Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê pirsgirêka sereke mafê derbirîna azad e. Sekularîzm, mafê jinê, reformên dewletî yên aborî û siyasî, mafê netewan, kêmnetewan û mafê olî jî dem bi dem weke pirsgirêkên sereke di rojeva siyasî de cîh girtine.

Li dijî terora bi navê Îslamê, dijî dîktatoriyê û statukoperestiyê, weke pêş tedbîr, xebata ji bo bicîhkirina demokrasiyê, di nava helwestên hêzên navneteweyî de weke çareserî hate dîtin û alîkariya hêzên guherparêz kirin. Helwesta xwe piştî şerê Iraqê û Efganîstanê guhertine û hêzên guherparêz weke bingeha serhildanan dibînin. Hêzên

guherparêz jî bi alîkariya hêzên navneteweyî, vê helwesta xwe tînin zimên û bi dengên bilind yên bê tirs xwe derdibirînin.

Min li jorê mesrefa NED ê ya tenê ji bo Tirkiyê anîbû zimên. Di vê nivîsê de jî dixwazim minakên din jî bidim. Ez naxwazim navên dezgehên navneteweyî bidim lewra bi sedan in. Lê weke min berê jî aniye zimên dîsa dixwazim bahsa NED ê bikim.

Ji hêzên navneteweyî tenê dixwazim alîkarî û xebata NED'ê bînim zimên.

Ji bo Tirkiyê di nava 17 salan de, tenê mesrefa NED'ê, 204 milyon 954 hezar 214 Euro û 8 milyon 510 hezar 962 dolar e. Ger mirov Îstatîstîka hemû dezgehên navneteweyî derbixe dighêje milyaran. Ev alîkarî ji bo welatên din jî derbas dibin.

Lê dixwazim bêjim ku helwestên hêzên navneteweyî, ji bo dewlet û hêzên Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê, ne yekdengî ye. Helwesta wan ya li himberî Suriyeyê, Lîbyayê, Tirkiyeyê, Saûdî Erebîstanê, Bahreynê, ne wekî hevin. Li vir berjewendiya wan sereke ye. Naxwazin hêzên fundamental, û yên Îslamî bibin desthilatdar. Ev jî cudahiya helwestên wan derdixin rojevê.

Dixwazim tenê navê çend dewletan li jêr bidim.

***Li gor dewletan: tenê di sala 2009'an de: alîkariya NED ê***

| | |
|---|---|
| Misir: | 1. 418. 926 dolar e |
| Libya: | 196. 700 dolar e |
| Tunis: | 191. 500 dolar e |
| Tirkiye: | 975. 300 dolar e |
| Suriye: | 298. 800 dolar e |
| Yemen: | 630. 436 dolar e |

(Bi dehan dewletên din yên alîkarî wergirtine henin, lê min evana tenê weke nimûne nivîsîne.

Ji bo bêtir agahiyê hûn dikarin binêrin malpera NED'ê.)

Di nava perwerdeya NED'ê ya van dewletan de mijarên weke, bikaranîna înternetê, facebook, mafê jinê, Îslam û aborî, desthilatdariyên herêmî, civatên pirrengî, lîberalîzm û civat, Îslam û demokrasî û wekî din, cîh girtinin.

Meclîsa neteweyî ya Îraniyan û Emerîkiyan, Tevgera Mamosta ya Iranî û Weqfa Demokrasiyê ji bo Îran û bi dehan dezgeh û kesên ronakbîr di nava perwerdeya NED'ê de cîh girtine û alîkarî ji NED'ê wergirtine.

Van dezgehana bi dehan semîner, konferans, lêkolîn li dar xistinin. Bi hezaran ciwan perwerde kirinin. Bi hezaran jin beşdarî perwerdeyê kirinin. Mijarên sereke yên perwerdeya wan, reformên yasayî, desthilatdariyên herêmî, xebat û desthilatdariyên şaredariyan, demokrasî û Îslam, mafê jinan, mafê mirovan, demokrasî û nasname, bazara azad û Îslam, perwerdeya milletwekîliyan, xebata partiyên siyasî û dezgehên sivîl weke mijarên sereke bûne.[10]

Di nava van dezgehên navneteweyî de rola sermayeya Yehûdiyan mezin e. Rola sermayeya Yehûdiyan di nav van dezgehan de ji bo Rojhilata Navîn roleke neyinî ye. Lewra di nava berjewendiyên sermayeya navneteweyî de, berjewendiyên dewleta Yehûdî ya Îsraîl dide pêş û carinan jî nakokiya di nava van dezgehan de peyda dike. Rola Îsraîliyan di guherîna struktura netewe-dewletên Rojhilata Navîn û dewletên Ereban de neyînî ye. Ji bo ewlekariya xwe alîgirê dîktatoran e û loma jî gelek caran bêîstîqrariya van dezgehên navneteweyî bi vê mebestê dertên holê. Bêîstîqrariya van dezgehan, ji helwesta wan ya li ser tevgerên Îslamî û ji berjewendiyên dewleta Îsraîl tên. Lê ne Îsraîl û ne jî van hêzên navneteweyî êdî nema karin daxwaz û hêviyên gelan ji ber çavan bidûr bixin. Loma jî bi awayekî erênî bi destêwerdanên navneteweyî dixwazin demokrasiyeke li gor berjewendiyên wan bête ava kirin û bi awayekî jî aramiyê li van herêm û deveran peyda bikin. Lewra îro, him li Rojhilata Navîn, him li Bakurê Efrîkayê û him jî li welatên Asyayî û nemaze yên Qafqasî, dengên hêzên demokrat bilind dibin, daxwzên gelan mezin dibin û serhildanên gelêrî jî dest pê dikin. Kîjan ji van hêzên navneteweyî dikarin van bûyerana piştguh bikin. Îsraîl bi xwe jî mecbûr e van bûyerana bibîne û bi helwestên erênî tevbigere ku li dijî xwe hêzên mezin peyda neke û ewlekariya xwe ewle bike. Lê Îsraîl baş dizane ku guherîna struktura Rojhilata Navîn, derfetên guherîna struktura netewe-dewleta Îsraîl jî bi xwe re peyda dike. Lewra netewe-

10 Ji bo bêtir agahiyan binêre; Mustefa Yıldırım, Project Democracy.

dewlet bêyî dijmin û bêyî hêzên dijber nikare bijî. Lewra jiyana xwe li ser teoriya konspîratîv û dîroka bi derewan ava kiriye û loma jî pêwîstiya wê herdem bi dijminekî heye. Îsraîl bêyî dijminahiya Îslamiya siyasî, nikare vê struktura xwe ya netewe-dewletê bidomîne.

Li Rojhilata Navîn hêza dijî îdeolojiya Yahûdiyê mezin e. Ev dijberî ji dîroka kevnare de berdewam dike. Ji xwe ev dijberiya navneteweyî û nemaze dijberiya Rojhilata Navîn,Yahûdiyan civandiye ser hev. Vê civîna olî, bi îdeolojiya avakirina dewleta Yahûdî ve bûye yek. Hêza olperestî û hêza sermayedarî ya Yahûdiyan bi yek armancê ve mezin bûye. Netewayetiya Yehûdiyan weke ya Kurdan bi bûyerên dijî inkarê ve hatiye avakirin. Her du netewe jî li dijî desthilatdariyên zorker ve netewayetiyên xwe li dar xistine. Lê divê neyê jibîrkirin ku alîkariya hêza navneteweyî ya Yahûdiyan û Kurdan ne wekî hev in. Hin nêrîn Yahûdiyan weke netewe qebûl nakin hene lê li derveyî daxwaza me, îro Yahûdî bûne xwedî netewe-dewlet. Ev hêza guherparêz, wê bibe sedemê guherîna netewe-dewleta Yahûdiyan bi xwe jî.

## Ji aliyê dîrokî ve Îsraîlî

Hazretî Îbrahîm û Hazretî Mûsa ji ber zilmê koçber bûn. Her dû Pêxemberan tovên îdeolojiya olî ya Yahûdiyê avêtine xaka Rojhilata Navîn û li vir cîh girtîne.

Bi êrîşên Asûr ve bêhêz ketine û koçber bûne. Di nava Babîl de di bin nîrê zordariyê de jiyane. Ji Ewropayê koçber bûne û xwe avêtine bextê Anatolyayê. Li Ewropayê belav bûne û li Ingîltereyê, li Fransayê û li welatên din yên Ewropayê bûne xwedî sermaye. Li Elmanyayê bûne hêza biryardêr ya sermayedariyê. Bi qetlîamên Nazîstan ve dîsa koçberiya wan dest pê kiriye û li hemû Ewropayê cîh girtine. Hemû sedemên li jorê hatine nivîsîn, yekîtiya hêza Yahûdiyê û sermayedariya wê kiriye yek.

Di dema dawiya Împaratoriya Med'iya de pêwendiyên Medan û Yahûdiyan pêk hatiye. Padîşahê Medan yê dawîn Med-Dariyûs, bi xwarziyê xwe Qoreş ê (Pers) ve êrîşî ser Babîlê kiriye û ev împaratorî xistiye nava konfederasyona Med-Pers'an. Dariyûs li Babîlê weke padîşahê duyem yê konfederasyonê dibe desthilatdar. Struktura Babîlê

diguhere û bi 120 waliyan ve desthilatdariya xwe bi cîh dike. Serkêşên van 120 waliyan jî 4 waliyên desthilatdar bi cîh dibe. Yek ji wan her 4 serkêşan, weke ku Tewrat dinivîse, Pêxember Daniyel e. Daniyel Yahûdî ye û di nava Babîlê de serkêşiya ola Yahûdiyê dike. Daniyel, dibe xwedî desthilatdariyeke mezin li Babîlê. Waliyên Med'yayê ji vê helwesta Dariyûs aciz dibin û diwazin desthilatdariya Dariyûs bi dawî bînin. Berê Daniyel digrin û wî davêjin nava şêran. Lê Dariyûs wî azad dike û hemû waliyên xwe dikuje û gelek olperestên Magûyan û Zaraduştiyan koçberî Anatoliyê û Hindîstanê dike.[11]. Yahûdî li Babîlê bihêz dibin. Ev hêza wan heta dema Sasaniyan berdewam kiriye. Vê hêza wan di dema Mûhemed pêxember de jî xuya dike. Pêxember, dadweriya Îslamê bi peymana bi Yahûdiyên Erebîstanê re bi hêz dike. Lewra wê demê jî Yahûdî di Rojhilata Navîn û Efrîkayê de xwedî hêza bezirganiyê ne û loma jî Mûhemed vê hêza wan daye ber çavan. Wê demê Mûhemed jî bezirganî dikir. Lê êrîşên Îslamê piştî li Rojhilata Navîn bi hêz bûne, wê demê him Zaraduştiyan û him jî Yahûdiyan koçberî Hindîstanê û Anatolyayê kirine.

Yahûdiyên ku li Ewropayê cîh girtibûn, piştî gelek bûyeran hêza wan ya mezin li Ingîltereyê kom bû. Ev hêza Yahûdiyan bi serweriya Loceyên Masonî ve li Ingiltereyê û li Ewropayê xurt bûye. Di nava vê hêzê de îdeolojiya Yahûdiyê û sermayedariya Yahudiyê biryardêr e. Lê ciyê gotine ye ku, van loceyên Îngilîzan, di dema serweriya Îngilîzan li Hindîstanê bi Yehûdî û Zaraduştiyên Îranî ve pêwendî danîne. Armanca van loceya guherîna struktura Rojhilata Navîne û gîhiştina Qudusê ye. Armancên Îngilîzan bi xwe tenê vê hêza Masona mezin kiriye. Dewleta Şahinşahî ya Farisan, Iraq û ta radeyekê dewleta Tirk bi vê armancê hatine ava kirin. Piştî Îranê jî Iraq herdem di rojeva Yahûdiyan de bûye ciyekî girîng.

Îro piştî hewqas bûyerên Yahûdiyan, ewlekariya dewleta Îsraîl ya netewe-dewletê sereke ye. Loma divê rola Yahûdiyan di vê pêvajoya guherîna Rojhilata Navîn û Bakurê Efrikayê de bê dîtin.

Pirsgirêkên bi zordariya netewe-dewletê ve peyda bûne, weke pirsgirêkên netewî, etnîkî û olî tenê di nava sîstema demokrasiyê de

11 *Împaratoriya MED*, Ayhanê Bêrtî, Weşanxaneya Han, sal 2008.

dikarin xwe derbibirînin. Loma jî "Îro demokrasî ji bo gelên Rojhilata Navîn weke nan û avê pêwîst e. Lewra ji bilî demokrasiyê, tu bijarteyeke din ku bikaribe gelan şad bike tuneye.

Ger guherîna struktura Rojhilata Navîn ji bo dewleta Îsraîl nebe xeter, guherînên Rojhilata Navîn wê bi encam bi dawî bên. Guherînên Rojhilata Navîn yên bêyî îradeya Îsraîl bi cîh dibin wê bibin sedem û encamên guherîna dewleta Îsraîl ya netewe-dewltê û wê bibe bicîhkirina pêwendiyên Îsraîl bi Filistîniyan.

**Rojhilata Navîn û du hêzên sedemî.**

Ezê bi du nûmuneyan dest pê bikim. Nimuneya yekem ji Suriyeyê ye. Michel Aflaq weke nimûne dinivîsînim.

Damezrênerê partiya Baasê ye. Nimûneya duyem jî ji Tirkiyê ye. Lê herdû nimûne ji bo hemû dewletên Rojhilata Navîn derbas dibin.

Gotinek heye ku bi rastî li netewe-dewletên Rojhilata Navîn tê. Şer, hebûna netewe-dewletê ye. Li gor Aflaq, şer, zîrekiya me, hêza me û mêraniya me derdixe holê. Şaristaniya ku em dixwazin ava bikin, tenê bi rêya şerê çekdarî ve dikare bicîh bibe û bijî. Şaristaniya ku Aflaq tîne zimên ya partiyên Baasê ye. Ji xwe pêwîstî bi şîrovekirinê namîne. Hemû kes wan û kiryarên wan nas dikin êdî. Ew bi xwe jî bû qurbaniya vê şaristaniyê.

Li gor Kemalîstan jî, şoreş, heger bêyî dujmin bimîne dikeve xeterê. Heger dujminê şoreşê neminin, ji bo serketinê û ji bo li jiyanê bimînê divê dujminan peyda bike. Şoreşa Kemalîstan darbeyên artêşîn e. Lewra Kemalîstan hemû darbe weke şoreş bi nav kirine. Her du dewlet jî berhemên valahiya şerê cîhanê yê yekemînin. Em vegerin ser mijara xwe. Du hêzên sedem; Yehûdî û Kurd.

**Îsraîl**

Avakirina dewleta Îsraîl, di 1948'an de, li Rojhilata Navîn weke mîlad hatiye binav kirin. Lewra piştî û berî Yehûd binav dibe. Bingeha netewayetiya Erebî dujminahiya Yahûdiyan bi xweye. Gelek carî Ereb netewayetiya xwe bi hebûna yekîtiya neteweya Erebî tînin zimên, lê ew bi xwe ji rastiyê dûr e. Bingeha netewayetiya Erebî serhildanên

Filistîniyan e û bi van serhildanan ve girêdayî jî şerê dewletên Ereban û dewleta Îsraîl in. Bi şerê cîhanî yê yekem ve xewna Împaratoriya dewleta Erebî ber bi avê çû. Lewra her xanedaneke Ereb bû xwedî dewlet û gelekan jî bi lez û bez dest bi avakirina netewe-dewletê kirin û yên dinê înkar kirin. Asta herî mezin ya yekgirtina Ereban ya dewleta Suriye û ya Misrêye ku ew jî bi ser neketiye û xewnên neteweperestên Ereban yên dewleteke yekgirtî tu carî nebûye bingeha siyaseteke realîst. Di beşa Iraqê de min aniye zimên. Bingeha şerê Qewmiyê û Weteniyê yê Ereban jî ev bi xwe ye.

Avakirina dewleta Îsraîl ne tenê helwesta dewletên Îslamî tenê guhert, lê herwiha helwesta dewletên mezin yên emperyal weke Ingilîz, Fransiz, Emerîkayê jî guhert. Helwesta dewletên mezin ya mandatiya Ereban, helwesteke Erebî ya neteweyî peyda kiriyê, lê ne bihêz bûye. Di 1928'an de piştî şerê cîhanê, tevgera Exwan, ji aliyê Hassan El Benna ve hatiye avakirin lê nebûye hêzeke mezin. Ew bi xwe ji valahiya nasnameyê peyda bûye. Dewleta Osmanî ya xelîfe ji holê rabûye, li cîhê wê netewe-dewleta Tirk hatiye avakirin. Dewletên Ereban di bin nîrê dagirkeriyê de ne. Navê Exwan hînê di dema Osmaniyan de, di sala 1912'an de li Saudiyê, li herêma Necd ê ji bo ewlekariyê û dûre jî ji bo bidestxistina erka dewletê ji aliyê xanedana Saud ve hatibû bikaranîn. Hêzeke ya mîlîsan bi navê Exwan (Biratî) bû. Ew bi xwe di sala 1920'an de dikeve bin bandora Îngilîzan û di sala 1930'yî de jî hebûna xwe wenda dike. Weke min li jorê jî aniye zimên, tevgera Exwan ji nuh ve weke alternatif bi nasnameyeke nuh derket rojevê, lê cîh negirt.

Dixwazim bêjim ne netewayetiya Erebî, ne jî hêza Îslamî heta avakirina dewleta Îsraîlî nebûye hêzeke berbiçav.

Piştî şerê cîhanî, avakirina dewleteke Yahûdî di nava rojeva dewletên Emperyal de dibe mijareke girîng. Fransa berê dixwaze li Efrikayê dewleteke ji Yehûdiyan re ava bike. Lê Yehûdî berê xwe didin Filistîn û dest bi kirîna xak û xaniyan dikin. Tevgerên Yahûdiyan jî vê helwesta wan rast dibînin û alîkariya wan dikin. Şerê Yehûdiyan û yên Ereban dest pê dike. Lê Erebên şerên Îsraîliyan dikin xanedanên Ereban in û bi navê Îslamê dijî Îsraîliyan derdikevin. Sûriye yek ji wana ye. Xanedanên Ereban yên Helebê, Humus û Hemayê dijî Yahûdiyan serî hildidin. Sûriye di bin mandata Fransizan de ye wê demê.

Sûriye di 1943'an de bi nav û fiîlî jî di 1946'an de serbixwe dibe. Ango ji bin mandatiya Fransayê derdikeve. Netewayetî li Sûriyeyê ne bi hêz e. Generalê artêşa Sûryeyê yê Kurd, Husnû Zaim, piştî vegera xwe ji Filistînê, bi darbeyeke artêşî ve lê bê kujerî, tê ser hukum. Ji vê demê û pêve heta sala 1970'yî, Sûriye bi darbeyên artêşî ve hatiye îdarekirin. Piştî demeke kurt, general Samî El Himewî bi darbeyeke din ya artêşî ve tê ser kukum û generalê Kurd îdam dike. Piştî avakirina dewleta Îsraîl, di sala 1949'an de darbeyeke din pêk tê Edîp çîçeklî tê ser hukum û Samî El Himewî direve û dihere Lubnanê. Li wê derê ji aliyê çekdarên Kurdan ve tola general Zeim hildigrin û wî dikujin.

Di 1954'an de Partiya Baas xurt dibe. Partiya Komunîst, Partiya Gel, Partiya neteweyî jî xurtin û balanseke siyasî peyda dikin. Lê di 1956'an de partiya Baas'ê, bi darbeyekê tê ser hukum û dest bi avakirina yekgirtina dewleta Erebî ya Sûrî û Misrê dike. (Sala 1958-1961.). Di 1961'ê de dîsa darbeyeke mezin pêk tîne û ji Yekîtiya Erebî vedikşe. Di 1963'an de Hafiz û merivên xwe bi darbeyekê ve têne ser hukum, lê darbeya esasî ya 1970'î yî ye ku heta îro didome. Aflaq, damezrênerê Baasê direve dihere Iraqê û li wê derê alîkariya partiya Iraqê dike. Ew jî dibe qurbana tundrewiya Baasê ya ku wî bi xwe ava kiribû. Malê wî bû bela serê wî.

Partiya Baas bi şerê dijî Îsraîl, bi navê netewayetiya Erebî ve li Sûriyê, ji bilî mezheba Elewiyan, li ser bingeha dijberiya hemû olan û hemû netewan û kêmnetewan hatiye avakirin. (Evana; Kurd, Suryanî, Yezîdî, Xiristiyan in û mezheba Sunna ne). Di 1963'an de Baasê Kurd weke biyaniyan binnav kir û nasnameya dewletê ji wan girt û xaka wan radestî Ereban kir. Kemera Erebî ava kir û bi zilmeke mezin siyaseta erebîtiyê li Kurdistanê bicîh kir. Li Sûrî , li Iraqê, li Misrê hemû mixalefet weke sîxurên Îsraîlê dihatin binavkirin û şerê dewletê yên dijî mixalefetê weke şerê dijî Îsraîl dihate dîtin.

Min Sûriye weke nimûne nivîsî ye. Lewra Misir, Îraq, Urdun, Lubnan, Cezayir (1960), Tunis, Lîbya jî kêm zêde weke Sûriyê bi darbeyên artêşî ve lê bi helwesta dijî Îsraîl hatine îdarekirin û li dijî hemû cudahiyên welat rawestiya ne. Min li jêr, Tirkiye, Îran û Iraq nivîsiye. Naxwazim careke din binivîsim.

**Sedemên netewe-dewletên Erebî**

Gelek balkêş e ku van dewletên ku min anîne zimên yên Ereban, ji yên din bêtir ji bilî, Yemenê dijî Îsraîl rawestiyane. Yek jê cîranê Îsraîl e û bi şerê navbeyna dewletan ve xaka xwe ji dest dane. Sûriyeyê, Lûbnan, Urdun. Ya duyem jî weke dîrokî ev dewletana li ser xaka neteweyên cuda hatine avakirin û xebata wan ya sereke ji bo neteweyeke nuh ava bikin. Ereb avakirina dewleta Îsraîl bi Nekbet binav dikin ango felaket. Ev felaket netewayetiya Erebî bi hêz dike. Hêzên neteweperest yên Ereb ji bo nikaribûn dijî Îsraîl û dewletên emperyal rawestin, hêzên xwe berbi navxwe ve xurt kirine û dujminê xwe desthilatdariyên dewletên xwe dîtine. Di nava hêzên neteweperestên Ereban de sewr, ango şoreş bûye bingeha avakirina neteweyê. Tekoşîna dijî Îsraîl tenê bi riya rûxandina desthilatdarên "kevneperest" yên Ereban ve bi nav kirine. Vê helwesta netewayetiyê ji bo hemû dewletên Ereban derbas dibe lê bêtir yên hatine binavkirinin. Li Iraqê mixalefeta desthilatdariyê weke sîxurên Siyonîzmê bi nav bûne û li nava Baxdayê li pêş çavên gel bi sedan hatine îdamkirin. Bingeha şoreşa Cezayirê dîsa dijberiya Îsraîl e. Doza Filistîniyan di nava desthilatdariya dewletên Ereban de bûye metoda dijî gelan û mixalefeta dijî desthilatdariyê.

Dewletên Ereban hata salên 80'yî, bi desthilatdariyeke dijî Îsraîl, dijî hemû netewan, dijî hemû awayên mixalif, bi navê şoreşa neteweyî li ser hukum manin. Li van dewletên min anîne zimên, bêtir artêş serwer in û bêtirîn jî bi yek partiyê, yek mezhebiyê têne îdarekirin. Dîktatoriya takekesayetî, li van dewleta biryardêr e.

Di salên 60 î de bi şerê sar yê navbeyna bloka sosyalît û sermayedar ve him dewletên Ereban û him jî dewletên Misliman yê Rojhilata Navîn bûn du beş. Îran, Tirkiye, Saudî di nava bloka emperyalist de cîh girtin û dewleta Sûriye, Îraq, Misir jî di nava bloka dewletên sosyalîst de cîh girtin. Saudî bi hebûna petrola xwe ve derket pêş û bû mutefîkê Emerîkayê. Di sala 1932 de bi hinek xanedanê Ereban re Qraliyeta Saudî ava bû. Heta îro jî weke mitefîkê Emerîkayê tevdigere. Tirkiye ji avakirina xwe heta salên 2011'yan di bin bandora wesayeta artêşa kemalîst de dijiya. Îran jî ji salên 1941'ê heta hukumeta Musadiq bi dehan hukumet guhertiye, lê îstîqrarek peyda nekiriye. Dîktatoriya

Şah û Sawakê heta şoreşa Îslamî domandiye. Îro jî yek ji wan astengên pêşiya demokrasiyê ye.

Neteweyetiya Faris li Îranê û netewayetiya Tirk, li Tirkiyê jî weke dewletên Ereban dijî tevger û hebûna Kurdan û neteweyên cuda hatine ava kirin. Li vir cudahiyek heye divê em binav bikin. Îran yek ji wan welata ye ku di dema Şah de hevalbendiya Îsraîlê kiriye.

## Di Rojhilata Navîn de pêvajoyeke cuda û destpêka alternatîfeke nuh

Piştî avakirina Exwan ku nikaribû biba hêz, ji salên 50'î ve nêrîn û helwestên hêza Îslamî li Rojhilata Navîn bi awayên cuda derketin rojeva siyasî. Di sala 1951'ê de, Şêx Kerbela El Gazalî bi nêrîna sosyalîzma Îslamî ve ku hînê ji sala 1948'an ve bi damezrandina dewleta Îsraîlê ve şerê dijî Îsraîl organîze dikir, di rojeva civata Îslamî de cîh girt. Bingeha tevgera Îslamiya siyasî li Misrê hate avêtin û li dijî Îsraîl jî di nava Ereban û di nava dewletên Misliman de belav bû. Her deh salan nêrîn û tevgereke Îslamî derketiye. Nêrînên wan cuda û helwesta wan jî cudanin. Lê bingeheke vê tevgerê heye ku ew jî di demên ku civat bê hêvî dimînin, valahiyeke siyasî peyda dibe û civat bêyî alternatifa dimînin dijî Îsraîl, derdikevin rojevê.

Di nava vê aloziyê de tevgera Filistînî xurt dibe. Şerê dijî îsraîl gûr dibe. El Fetîh (Ku Yaser Arafat bû), di sala 1957'an de hatibû avakirin. Vê tevgerê eniya Filistin ava kir. Di sala 1969'an de Arafat bû serokê eniyê û tevgera Filistîn bihêz bû. Di nava eniya Filistînî de tevgerên din yên ji El Fetîhê radîkaltir jî hebûn. Eniya Demokratîk, Eniya Gel ya Demokratîk weke du tevgerên nimûne nin. Tevgera Filistîn li Urdunê, mezin bû û bû nakokiyeke mezin ji bo dewleta Urdunê. Sûiqasta dijî kral Husên bû sedama şerê navbeyna Filistîniya û Urdinê. Salên 70'yî bi qetlîamên Filistîniyan ve tê nasîn.

Tevgera Filistîn ji bo tekoşîna neteweyî û ya çep li cîhanê weke nimûne dihate pîvan. Tekoşerên dinyayê beşdarî tevgera Filistîn dibûn û alîkariya Filistîniyan dikirin. Doza Filistîn bû doza navneteweyî. Alîkariya kampa sosyalîst jî doza Filistîn bihêztir dikir. Li hawirdorê dinyayê tevgerên weke TRF. (Tevgera Rizgariya Filistîn) nê dihatin

avakirin. Li dijî sermayedariyê û dijî mêtingeriyê û kolonyalîzmê şerê çekdarî û çepîtî weke alternatifa sereke bû. Tevgera çep, ya Îslamî û ya neteweperest, desthilatdariyên xwe tawanbar dikirin û ji bo rûxandina wan tevdigeriyan. Desthilatdarên netewe-dewletan jî li dijî van helwestana bi dijwarî radiwestiyan û pêşiya tevgera şoreşger digirtin. Kampên Lubnanê bûn weke ciyê perwerdeya siyasî û eskerî ya navneteweyî. Ho Shimîn, Mao jî dibûn îdolên tevgera cîhanî. Li hemû Rojhilata Navîn û li hemu cîhanê di salên 60-70'yî de tevgera radîkal bihêz dibû. Îran û Tirkiye jî para xwe ji vê hêzê digirtin. Pirsa ka divê em çi bikin? Li hemû cîhanê bi bersiva şerê çekdarî ve dihate dayinê. Vê pêvajoyê li hemû dewletan qehremanên xwe derdixist û tevger bihêz dibûn.

Bihêzbûyina tevgera radîkal ya çep ve, tevgera Îslamî û ya neteweperest lawaz bû. Li Rojhilata Navîn tevgera Îslamî tenê mabû. Ji aliyekî desthilatdariyên dewletan, ji aliyê din ve tevgera radîkal û hêzên navneteweyî pêşiya tevgera Îslamî girtibûn. Di vê navberê de, di destpêka salên 80'yî de, Emerîka dest avêt, tevgera Îslamî û xwest li dijî tevgera sosyalîst, radîkal û dewletên sosyalîst bikar bîne. Pêwendiyên Emerîka bi dewleta Saudî re li ser vê bingehê bihêz bû.

Nêrînên Seyid Kutûb, di nava aloziya cîhanî de cîh negirtibû, lê aliyekî mezin yên Îslamî li ser riya Seyid Kutûb tev digeriyan. Kutûb şîroveyên nuh ji bo tekoşînê pêşkêş dikir. Li gor raya Kutûb, tevgera Îslamî divê ji bo desthilatdariyê têbikoşe û bikar anîna tundrewiyê jî rewa dibîne. Di serî de dijî tundrewiyê radiweste lê dawî nêrînên wî têne guherîn û metodên şîdetê rewa dibîne. Di sala 1966'an de li Misrê hate îdam kirin. Ew bi xwejî bû qurbana şîdetê.

Li Îranê tevgera Îslamî ya şiie bihêz dibû. Ji xwe hata sala 1979 a jî hêza Îslamî li cîhana Îslamî de marîjînal e. Lê li Îranê avakirina komara Îslamî pêvajoyeke nû li Rojhilata Navîn vekir. Vê tevgerê rê dida ku Îslam dikare bibe rejîma dewletê. Ji aliyekî din va jî rê dida kû, netewe-dewleta sermayedarî ne çare ye û tenê "bi têbikoşîna Îslamî ve desthilatdarên zordar dikarin bêne rûxandin." Dîsa 1979'an de dagirkirina Afganîstanê ya ji aliyê sowyetê ve, hêza Îslamî xurt kir û Emerîka jî alîkariya tevgera Îslamî ya sunne kir. Ayetullah Xumeynî dixwaze şoreşa Îslamî îxracî nava dewletên Îslamî bike. Hebûna dewleta Îslamî ya Îranê bi vê helwestê ve girê dide. Bûyereke din, ku gelek giring bû,

ew jî di sala 1979'an de pêk hat. Enwer Sedat bi îsraîlê re li Washîngtonê peymana Kamp Dawîdê îmze kir. Ev bi xwe pêvajoyeke nuh di Rojhilata Navîn de peyda kir. Dewleta Saudî, bi koordînasyona Pakîstanê ve, bi alîkariya Emerîkayê, ve hêza Îslamî derdixe pêşiya Sowyetê. Li Lubnanê şerê xirîstiyan û Mislimana herwiha şerê navbeyna artêşa Lubnanê û hêzên Filistîniyan, Kuştina Kemal Canpolad, bû sedemê Îsraîl di 1982'an de Lubnanê dagir bike. Bi vî awayî jî şerê Sûriye û Îsraîl derbasî Lubnanê dibû. Li Lubnanê kaoseke ewlekariyê peyda bibû.Salên 1982-85'an Lubnan dibe ciyê şerê dijî Îsraîl û di sala 1985'an de ji aliyê Îranê ve Hızbullah tê avakirin. Şerê navxweyî yê Lubnanê bu sedema bi sedhezaran kuştî. Weke tê gotin 150.000-200.000 kuştî, 300.000 birîndar, 700.000 koçber dibin. Ango Lubnan ji hêzên Îslamî re vala dibe.

Ev hemû bûyerên dinyayê tevgera Îslamî bihêz kir. Îslamiya radîkal û ya nerm bi awayekî cuda li dewletên cuda derdiketin rojeva siyasî ya desthilatdariya dewletên Misliman. Li Misrê, Sûriyê, Iraqê, Lubnanê, Urdûnê, Afganîstanê, Îranê tevgerên Îslamî weke tevgerên radîkal, xuya dikirin. Li Tirkiyê jî di navbeyna 80-90 î de tevgera Hizbullahê ji aliyekî tundrewî bikar dianî ji aliyekî din va jî hêza Îslamî bi riya parlementoyê têdikoşiya.

Li Misrê, di sala 1981'de Enwer Sedat hate kuştin û şerê dijî peymana Kamp Dawidê mezin bû. Tevgera Îslamî li Sûriyê, ya Exwana li dijî dewletê serî hilda. Lê bi awayekî tundrewî, hate rûxandin. Tevgera Îslamî piştî çend sala bê deng ma. Li Iraqê Şîîe bi alîkariya Îranê serî hildan û xwîn hate rijandin. Li Afganîstanê hêza Îslamî bihêz dibû. Lê hemû bûyer û tevgerên Îslamiya lokal diman û dihatine temisandin.

Di salên 80'ê yî de, li Rojhilata Navîn, xuya bû ku netewe-dewlet êdî nikarin siyaseteki berhemdar biafirînin. Siyaseta wan ya dijî emperyalîzmê derew derket. Dijîtiya wan ya îsraîl ne dibû ciyê baweriyê. Li Rojhilata Navîn, lêgerîneke nuh dest pê kiribû. Dewletên Rojhilata Navîn êdî bersiva pêdiviyên civatê nedidan. Ji xwe tu carî jî nedanin. Cudahiyên civatan pir bi eşkereyî xuya dikir. Daxwazên gelan bêtir derdiket rojeva siyasetê. Zordariya dewletan, jî di vê pêvajoyê de mezin dibû. Di vê navberê de tevgera şoreşger li Rojhilata Navîn lawaz dibû. Hêzên çepgir jî nema bersiva pêwîstiyên civatê didan û gel bê hêvî dibûn.

**Tevgera Îslamî dixwest nobedariyê ji tevgera çepgir werbigre**

Civatên Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê, li nasnameyeke nuh digeriyan. Tu îdeolojî û hêzan ev valahiya civatê tije nedikir. Helwest û daxwazên Îslamiyan bandora xwe li ser civatê dikirin. Lê hînê jî lawaz bûn. Li Cezayir, Tunis, Lîbyayê, Fasê taze derdiket nava civatê. Li Misrê bihêz e lê bêdeng maye. Li Sûriye û Iraqê hatiye temisandin. Li Filistînê bihêz dibe lê nabe alternatif. Li Îranê bi hêz e û di şerê bi Iraqê re xurt bûye. Li Tirkiyê tenê temsîla grubeke biçûk dike. Darbeya eskerî zilma xwe didomîne.

Di nava vê rewşê de hêza Îslamî li Rojhilata Navîn bi deng û rengên nuh ve dest bi xebatê kir. Dervî xwe hêzên din yên guherparêz dibînin, mafê mirovan diparêzin (ji berê bêtir binav dikin). Her dû hêzên Îslamî, Şîa û sunna bi du awayan ve xebata xwe didomînin. Metodên tundrewî lawaz dibe û metodên din bihêz dibin. Li gor cîh û zilma dewletê helwesta wan jî tê guherîn. Bi vi awayî hêzên Îslamî xurt bûn lê wekî berê bi aletên tundrew ve ranebûn. Hêzên çep lawaz dibûn û hêza dewletê û zilma wê mezin dibû. Civatê bersivên xwe di riya Îslamê de didîtin. Li Lubnanê Hizbullah di nava salên 90-91'ê de bihêz bû. Hemû kesên li hêviya hatina demokrasiyê li Rojhilata Navîn dipan, xwe di nava hêzên Îslamî de dîtin. Dewletên zordar êdî bingeha meşrûiyeta xwe wenda dikirin. Nikaribûn hêzên guherparêz, di nava xwe de bicîh bikin. Li dijî deng û rengên cuda bi helwesta tundrew ve bersiv didan. Dewletên weke dewleta artêşê dihatin binavkirin. Bi guherîneke biçûk ve dewlet dixistin bin bandora Îstixbaratê û bi navê guherînê dewleta îstîxbaratê ava dikirin. Dewleta Îstîxbaratê bi armanca ku bikaribe tevgera gel binçav bike û ji hevde bixe dihate avakirin. Lê dewletên Rojhilata Navîn ne bûn dewletên artêşî û ne bûn dewletên Îstîxbaratî. Di nava her du yan de dihere û tê û nikare sentezekê derbixe.

Salên 90'î, bû mîlada hêzên guherparêz. Iraqê Kuweytê dagir kir. Bi midaxeleya hêzên navneteweyî ve ji Kuweytê derket lê desthilatdariya xwe domand. Hêzên navneteweyî, nemaze Emerîkayê bi tirsa avakirina dewleteke Şîa ve desthilatdariya Seddam ne rûxand. Lê li Iraqê Kurd û Şîa ji aliyê Emerîkayê ve hatin parastin. Ji aliyekî ve Emerîka dest bi projeya xwe ya mezin kiriye, ji aliyekî din ve li dijî vê projeya xwe tevdigere û alîkariya desthilatdarên zordar dike. Îsraîlê

diparêze, ji pirsa Filistîn û Kurdistanê re çareseriya nabîne, û helwesta wê ya demokrasiyê jî bê bawerî dimîne. Li Cezayirê tevgera Îslamî bihêz dibe û bi riya dengdan û helbijartinê bi riya aştiyane ve piraniya dengan werdigre û dixwaze hukumetê ava bike. Lê hêza Artêşê hemû dengdanan îptal dike û dijî Îslamiya darbeyê çêdike. Belavbûna federasyona Yugoslawyayê pirsa Bosnayê derxist rojevê. Zilma li ser Mislimanan hemû alema Îslamî xist nava nerehetiyeke mezin. Rûxandina sowyetê jî pirsa Çeçanan afirand û zilma li ser wan jî bû mijara Mislimanên dinyayê. Bi gelemperî rûxandina Yugoslawyayê û ya Sowyetê pêvajoyeke nuh li dinyayê peyda kir. Li hemû aliyê dinyayê lêgerînên nuh dest pê kirin. Tevgera neteweyên bindest bi hêz bûn, gelek dewletên nuh hatine avakirin. Struktura bi dehan dewleta hate guhertin. Mafê mirova û pirsa demokrasiyê bû pirsa sereke ya gelên cîhanê. Mafê netweyên bindest, mafê grubên cuda, mafê ziman û olên cuda di qada siyaseta cîhanê de ciyekî biryardêr girt. Siyaseta dîktatorî û ya netewe-dewletê îflas kir.

Hemû bûyer û kiryarên nuh li dinyayê, bandoreke mezin li ser hêza Îslamî kir. Ji salên 2000'î ve êdî tevgera Îslamî li gelek welatên Rojhilata Navîn, dev ji bikaranîna şîdetê berda ye û bi metodên aştiyane desthilatdariyê dixwazin. Neteweperestî di vê pêvajoyê de lawaz bûye lê ji holê ranebûye. Dewletên Ereban hînê jî bi neteweperestiyê dixwazin desthilatdariyên xwe bidomînin. Li Rojhilata Navîn tevgera Îslamî, hêzên guherparêz dibîne, mafê neteweyên bindest dibîne, olên cuda zimanên cuda dibîne lê mixabin hînê jî, xwe ji helwestên netewayetiya desthilatdar ve azad nekiriye. Ji bo ku îro nikare bibe alternatif, sedema sereke ku hînê jî bi navê neteweya serdest ve tevdigere û netewayetiya serdest diparêze. Ango ev hêza Îslamî ji nuh va îdeolojiya neteweayetiya Îslamî diafirîne. Îro bûyerên Rojhilata Navîn û yên Bakurê Efrîkayê bi vê aloziyê ve didome û li çareseriyan digere. Bêyî hêzên dereke gelên Rojhilata Navîn bi serê xwe nikarin bi ser bikevin. Sedema sereke jî ew e ku, netewe-dewletê, hêzên dîktator mecalên avakirina alternatîfan nehiştine. Neyêniya sereke di vê pêvajoyê de lawaziya hêzên demokrat û lîberal in. Mixabin ger Îsraîl nebûya demokratîzekirina Rojhilata Navîn asantir dibû. Lê Îsraîl heye, hêzeke mezin e û divê hêzên guherparêz bi qebûlkirina hebûna vê hêzê ve paşeroja xwe bibînin.

Tevgera Îslamî heta demokrasiyê û wekheviya netewan neparêze, wê nikaribe li Rojhilata Navîn di nava hêzên guherparêz de ciyekî sereke werbigre. Bikaranîna şîdetê li dijî hêzên guherparêz (demokrat, sosyalîst, neteweyî), wê hêzên Îslamî marjînal bike.

Dewlet û hukumeta Tirk jî, bi xewn û xeyalên kevnare, yên Osmaniyan ve; bi destên olperestên Exwanan ve û bi metodên antîsemîtîzmê ve dixwaze li Rojhilata Navîn bibe hêza sereke. Serxwebûna Filistîn dixwaze lê li himber daxwazên Kurdan bi tundrewî radiweste. Siyaseta Îslamiya durû ji dewletên Ereban re ne bû mal, ewê ji Tirkan re jî nebe mal.

### Filistîn û Kurdistan

Salên 80'ê yî ne tenê hêzbûyina ramanên Îslamî bi xwe re anî, herwiha hêzên welatperwer, yên neteweyên bindest jî bihêz bûn. Di vê dema valahiya nasnameya neteweyî de, hêzên Îslamî xwestine li vê dozê xwedî derkevin û bibin serkêşên wê. Xwestine pirsên vê pêvajoyê bi aîdiyetên olperestî ve bersiv bidin. Ev bi xwe jî dibe senteza navbera pêwîstiya nasnameyê û pêdiviyên serdemê. Rûxandina sîstema sosyalîst bi xwe re ne tenê olperestî bi hêz kir, her wiha bayê tekoşîna netewan, kêmnetewan, çand û zimanên cuda jî bi hêz kir. Perspektifên nuh derxist rojeva cîhana serdemî. Bu sedema ji nuh va geşkirina hemû hêviyên şikestî yên neteweyên bindest.

Bihêzbûyina hêza Îslamî ya Filistîn ji du sedeman va pêk tê. Dewletên Ereban yên derveyî Filistîn, êdî bersiva daxwaz û hêviyên Filistîniyan nadin û doza Filistîn firotine hêzên navneteweyî. Dewletên Ereban pirsa Filistînê tenê ji bo berjewendiyên xwe bikar tînin ku ev rastî êdî xuya bûye. Ya din jî hêza neteweyî ya Filistînê ya derveyî hêza Îslamî, ku bi dewletên Ereban û bi hêzên navneteweyî ve hevkarî dikir û ji doza Filistîn bidûr diketî ve hatiye. Ev bi xwe jî bûye sedema jihevketin û aloziya daxwaz û tekoşîna neteweya Filistîn. Filistîn ji doza wê ya bingehîn bidûr dixe û wê di nava dijberiya Îsraîliyan de xwedî dike ku ew bi xwe xeter û metirsiyeke mezine li Rojhilata Navîn.

Li vir dixwazim nasnameya olperestên Kurdan bînim zimên. Berê dixwazim bêjim îro bi ya min tevgera bakur bi gelemperî bersiva daxwaz û hêviyên netewa Kurd nade. Lewra ev pêvajo pêşiya tevgera Kurd

ya olperest vedike. Ger olperestên Kurd weke li jêrê tînim zimên refê xwe berbi daxwazên netewa Kurd ve hilbijêrin dem dema wan e. Tevgera olperesta Kurd, îro di pêvajoya hilbijartina aîdiyetên xwe de bê perspektiv dimîne. Divê neqandina xwe zû helbijêre. Helwesta xwe eşkere, ronî û zelal bike. Dema me, dema ji hev cuda bûyina pêwîstiyên manewî û girêdana aîdiyetê ye. Tevgera Îslamî ya Kurd di nava herdû pêdiviyan de divê tercîha xwe bi zelalî bike.

Bawerim dema ku em çanda ola Îslamî tînin zimên em bandora çanda Erebî ji bîr dikin. Lewra biqasî Îslamê bandora xwe li ser Ereban kiribe ewqasî jî Ereban bandora xwe li ser Îslamê kiriye. Ji xwe Îslam li erdnîgariya Ereban bicîh bûye, ji wê derê berbi dinyayê ve belav bûye û bûye berhema çanda erdnîgariya Ereban. Bi zimanê Erebî xwe derbiriye, û bi zimanê Erebî hatiye nivîsîn. Welew ku îro Faris,Tirk, Kurd jî li vê olê xwedî derdikevin, lê ola Îslamê bi çanda Erebî ve hatiye hunandin. Her dû ji hev nayên cudakirin. Li gor raya min Ereban li gor jiyana xwe olek ava kirine û xistine xizmeta hêza çanda xwe. Hemû desthilatdariyên netewe-dewletên Rojhilata Navîn ola Îslamî ji bo berjewendiyên xwe bikar anîne.

Îro hêzên Îslamî yên li himber dewletên rojava ne, ne tenê ji bo ew Îsewî nin, lê herwiha ji bo ew serdest in, dewlemend in û xwedî bandor in. Dem û bûyerên li jorê hatine nivîsîn yên hêzên Îslamî, ne tenê ji hestên Mislimanî hatine, ewana herwiha helwest û hestên xwe ji jiyana rojane ya zilma zaliman, ji serhildanên dijî zaliman yên demên xwe yên derveyî hêzên Îslamî ve jî girtine. Bûyerên salên 60-70-80 bi van helwest û hestan ve tije ne. Bandora ol li ser civatê, û bandora civatê jî li ser olê xwezayî ye. Di nava dewletên Ereban de netewayetî, gelek carî ola Îslamî bikar aniye, lê bi metodên ne olî ve berfireh bûye. Mihaweleyên hêzên Îslamî ji salên 1920'î ve di nava pêvajoya netewayetiya Erebî de xwestiye cîh bigire lê heta salên 90'î jî bi awayeke berfireh cîh negirtiye. Hemû kesên dijî zordariyê, li Rojhilata Navîn, li nasnameyeke cuda geriyane pêrgî hêzên Îslamî hatine. Lê Îslam jî weke gelek ideolojiya, bi sedemên sînorkirina mafê mirovahî, azadiya kesayetî û gelek pêdiviyên civakî ve nebûye hêza sereke. Lê desthilatdarên dijî hêzên Îslamî rawestiyane, mixabin ew bi xwejî, ji îdeolojiya Îslamî bêtir dijî van mafên însaniyetê rawestiyane. Lewra

ewana moderníteyê bi awayekî nerast bi rê ve birine, û xistine xizmeta dijî Îslamê û mafê mirovan yên xwezayî. Lewra moderníteya wan bûye sedema desthilatdariya zordarî û dîktatorî.

Pirsgirêka Kurdistanê li Rojhilata Navîn pirsa sereke ye. Lewra hemû dewlet û desthilatdarên weke dagikerên Kurdistanê têne dîtin, zilma wan, yek rengî û yek dengiya wan, kevneperestî û fundamentalîteya dewletên wan, ji pirsgirêka Kurdistanê tên. Tirsa pirsgirêka Kurdistanê wan ber bi dîktatoriyê û kevneperestiyê ve dibe. Ew bi vê helwesta xwe ve dibin dijberê neteweya xwe jî. Ew dibin astengên gilobalîzekirina dinyayê. Lewra ew bi xwe hînê jî di nava pêvajoya avakirina neteweya dewletê de diherin û tên û tu çareseriyan pêyda nakin. Avakirina dewleta federe ya Başûrê Kurdistanê, hemû dewletên Rojhilata Navîn yên dagirker xistiye nava tirseke mezin. Kurd êdî li Rojhilata Navîn hêzeke demokrat, guherparêz in û bêyî neteweya Kurd li Rojhilata Navîn aramî û demokrasî pêk nayê. Hêzên Îslamî yên dewletên dagirker, hînê weke desthilatdariyên xwe mafê neteweya Kurd napejirînin. Bêyî hêza Kurdan tevgera Îslamî li Rojhilata Navîn bi ser nakeve û nikare desthilatdariya xwe bidomîne.

Azadiya Kurdistanê û ya Filistînê, hebûna tevgera Îslamî, hebûna netewe-dewletê, hebûna dîktator û desthilatdariya takekesayetiyê dixe xeterê, û rê ji gelên Rojhilata Navîn re vedike ku li welatên xwe bikaribin demokrasiyê û dadwerî bi cîh bikin.

# II
# ŞÎROVEKIRINA PARADÎGMAYA PÊLA 3'YEM

Çand, weke tê zanîn pêşeroja netweyekê ye. Ger mirov neteweyekê ji çanda wê bi dûr bixe, mirov wê gavê damarên jiyana wê jê digre û wê bê ruh dihêle. Netewe-dewlet çanda neteweyên cuda qedexe kiriye û bi rêya asîmîlasyonê jî wan ji nasname û kesayetiya wan bi dûr xistiye. Lê weke îro di jiyanê de xuya dike netewe-dewlet di vê armanca xwe de bi ser neketiye. Îro li cîhê netewe-dewletê, civatên pirçandî weke alternativên sereke dertên holê. Dewletên pirçandî weke nimûneyên demokrasiyê derfetên bêhempa di nava civatan de peyda dikin. Rêya bicîhkirina demokrasiyê vedikin. Lewra **"demokrasî sîstema yekta ye ku gel, di bingehiya çanda xwe de bi azadî û wekhevî dikare bijî."**[12] Pirsgirêkên bi zordariya netewe-dewletê ve peyda bûne, weke pirsgirêkên neteweyî, etnîkî û olî, tenê di nava sîstema demokrasiyê de dikarin xwe derbibirînin. Loma jî **"Îro demokrasî ji bo gelên Rojhilata Navîn weke nan û avê pêwîst e. Lewra ji bilî demokrasiyê, tu bijarteyeke din ku bikaribe gelan şad bike tuneye"**[13]

Îro netewe-dewlet weke sîstem di nava krîza strukturî de dema xwe ya dawîn dijî. Hemû bûyer û kiryarên dinyayê xuya dikin ku ev struktur û sîstema netewe-dewletê, dema xwe dagirtiye û rûxandina wê her dem di rojeva gelên cîhanê de ye. Li her aliyê cîhanê li dijî vê struktura netewe-dewletê têkoşîna gelan gûr dibe û krîza strukturî kûr dibe. Ev serdama me ya îro rûxandina struktura netewe-dewletê ye û

12 *Avrupa Kürt Demokratik Halk Meclisleri* Mezopotamya Yayınları, 2009. r.21

13 Berhema navborî r.34

ji nû va vejandin û avakirina struktura desentralîzasyonî û avakirina civatên piçandî û pirneteweyî û avakirina demokrasiyê ye.

*Şîrovekirina vê bêjeyê, yan jî vê têgehê bi şîrovekirina statukoya dinyayê ya 20-30 salên dawîn ve girêdayî ye. Lê mixabin guherînên dinyayê bandoreke erênî li Rojhilata Navîn nekiriye. Destpêka pêvajoya guherînên statukoya Tirkiyê, ku îro bi berfirehî têne minaqeşekirin, şoreşên gelên Tûnisê, Misrê, Libnanê, Suriyeyê, Yemenê, Sûdanê, Lîbyayê, Bahreynê û yên Iraqê yeko yeko serhildan û daxwazên paradîgmaya pêla 3'yem in.*

*Serhildan û daxwazên gelên Ewropayê yên di dema kirîza aborî û siyasî de dertên rojevê jî perçeyên vê pêvajoyê nin. Bandora guherînên dinyayê, ango bandora paradîgmaya pêla 3'yem weke hayûleya tirsa dîktator û statukoperestên dinyayê li hawirdor berfireh dibe.*

*Destêwerdana Emerîka û Ingiltereyê ya Iraqê, bidestxistinên Başûrê Kurdistanê û avakirina demokrasiya siyasî ya li Iraqê jî, vê bandora paradîgmaya pêla 3'yem li Rojhilata Navîn bi hêztir kiriye. Belkî ji aliyekî ve lawaz kiribe jî, weke nimûne destêwerdana bi awayên leşkerî, lê bi encama xwe ve bi hêz kiriye.*

*Berê ezê dest bi dîrok, statuko û helwestên dewletên dagirkerên Kurdistanê yên Rojhilata Navîn bikim û dûre ezê dest bi vejandina pêla 3'yem bikim. Ji bona ez bikaribim vê paradîgmaya pêla 3'yem şîrove bikim ezê dest bi guherînên dawîn yên dinyayê bikim û ezê bixwazim bi van guherînên dawîn yên dinyayê ve vê pêla 3'yem jî şîrove bikim.*

*Bi vî awayî û bi vê metodê wê xwendevan bikaribin muqayeseyeke dîrokî di navbeyna rûdanên dinyayê û rûdanên Rojhilata Navîn de bikin. Ji bona em bikaribin miqayeseyeke dîrokî û serdemî di nava van minakên ku ezê bînim zimên (ku piraniya wan dewletên Ewropî ne û çend dewletên Asiyayî û Efriqî jî di nav de hene) û dewletên dagirkerên Kurdistanê de bikin divê em bi kurtî be jî bizanibin ka van guherînên ku em tînin zimên çi guherîn in û emê çawa bikaribin ji wan guherînan sûd wergirin.*

*Lewra di têkoşîna azadî ya neteweya Kurd û gelên Kurdistanê de zanîna dîrokê çawa girîng be têgihîştina pêşveçûna minakên çareseriyên pirsgirêkên neteweyan jî bi qasî wê girîng in. Raste tu mînak li gor rew-*

*şa civata me ya siyasî û civakî tune ye. Lê bawerim em dikarin ji her minakekê sûd û tecrûbeyên cûda werbigirin. Di çareseriyên pirsgirêka neteweyan de muqayese cîhekî berbiçav digire. Ji xwe ne mumkun e ku hemû çareserî weke hev bin. Lê divê em bizanibin ku ka li dinyayê pirsgirêkên neteweyan çawan û bi kîjan şêweyan hatine çareserkirin. Ezê bi kurtî guherînên dinyayê yên van 30-40 salên dawîn ku heta îro jî berdewam dikin bînim zimên û ezê çend mînakan bi berfirehî şîrove bikim.*

### *Ez paradîgmaya pêla 3'yem dikim du beş an*

***Beşa yekem:*** *Di vê beşê de pêvajoya desentralizasyona dewletên navendî ku xwe weke federatîf, konfederatîf, federatif ya asîmetrîk û gelek awayên din ve binav dikin tînim zimên. Di vê beşê de ez dê bi kurtî gelek minakên dinyayê bînim zimên, lê pirsgirêka BASK û ya Katalonya bi berfirehî şîrove dikim. Vê pêvajoyê weke pêvajoya paradîgmaya pêla 3'yem ya beşa yekem binav dikim. Ev pêvajo, pêvajoya avakirina dewlet û civatên pirçandî ne. Yan jî nûjenkirina dewletên unîter in ku îro piraniya wan xwe weke dewletên pirçandî binav dikin. Ji Ewropayê hetanî Asyayê dinya bi minakên vê beşê ve dewlemend e.*

***Beşa Duyem:*** *Di vê beşê de jî pêvajoya paradîgmaya pêla 3'yem beşa duyem tînim zimên. Ev pêvajo pêvajoya avakirina dewleta serbixweye. Çend minakên dawîn yên dinyayê tînim zimên. Lê serxwebûna KOSOWA û ya Bosniyayê û herwiha ya Welatê Tîmorê bi berfirehî şîrove dikim. Nimûneyên vê beşê dewletên serbixwene lê dewletên paradîgmaya pêla 3'yem in û wana weke dewletên pirçandî, pirneteweyî bilêv dikim. Evana ne dewletên, netewe-dewlet in.*

*Her du mînak û pêvajoyên dinyayê ji bona çareseriya pirsgirêka Kurd û Kurdistanê minakên berbiçav pêşkêşî me dikin. Hêvîdarim emê bikaribin ji van minakan sûdê wergirin.*

### Sûriye

Min li jorê bi kurtî rewşa Sûriyê nivîsiye. Dixwazim bahsa Rojavayê Kurdistanê bi kurtî be jî bikim. Rojavayê Kurdistanê ji bo hêzên beşên din bi salan bûye cîhê penaberên Kurdan. Li gor lêkolînên hatine ki-

rin qeneeteke biryardêr peyda bûye ku, netewayetiya Kurd li rojavayê Kurdistanê bi bandora tevgera bakurê Kurdistanê ve dest pê kiriye. Ji xwe tu carî pêwendiyên bakur û rojava ji hev nehatine qetandin. Hêzên Kurdan di gel hemû astengiyên sînorî de jî pêwendiyên xwe qut nekirine. Di dema Osmaniyan de herêma Cizîrê, ango rojavayê Kurdistanê bi serjimara xwe ve kêm be jî, bûye cîhê koçberiya Kurdên bakur. Ev helwesta Kurdan di dema avakirina dewleta Tirk û Sûriyê de jî domandiye. Ango rojavayê Kurdistanê di dîroka Kurdan de cîhekî girîng e. Weke tê zanîn berî tevgera Seîdê Pîranî, bi tevgera Koçgiriyê ve penaberiyeke modern ji bakurê Kurdistanê ber bi rojavayê Kurdistanê ve dest pê kiriye û heta dema me jî domandiye.

Lê piştî serhildana Şêx Seîdê Pîranî, bandora bayê netewayetiya Kurd li rojavayê Kurdistanê bi hêz bûye. Bi dehan koçberên Kurd derbasî bin xetê bûne û li wir û li Lubnanê karê tevgera neteweyî birêve birine. Bayê netewayetiya Kurd li bakurê Kurdistanê ji sala 1919'an ve heta îro bandoreke mezin li ser rojavayê Kurdistanê hiştiye.

Di dema mandatiya Fransayê de, di destpêka avakirina dewleta Sûriyeyê de Kurdan bi girseyî daxwaza mafên xwe yên neteweyî kirin. Cîhê gotinê ye ku Kurdan di wê demê de daxwazên xwe bi mafê xweseriyê (otonomiyê) û gelek carî jî bi navê otonomiya çandî ve bilêv kirine. Kurdan mandatiya Fransayê bi erênî didîtin û ji bo bicîhkirina mafên xwe jî serî li hêzên Fransayê di dan. Hêzên Ereban ku wê demê Bi destê Kral Feysel ve dihate organîzekirin di navbeyna salên 1918-1920'an de desthilatdariya Ereban di bin serweriya Fransayê de ava dikir, Kurdan weke hevkarê Osmaniyan didît û li dijî Kurdan tevdigeriya. Ji ber vê helwesta Ereban jî hêzên Kurdan bi hatina Fransayê ve bêtir hêvîdar dibûn. Eynê Feysel, li Iraqê bi destê Îngilîzan dîsa li dijî Kurdan helwest girtiye. Kral Feysel yek ji wan kesê dujminê netewa Kurd e.

Bi hatina Fransayê ve li devera Kurdan geşepêdaneke mezin dest pê kir. Di sala 1919'an de Qamişlo û Hesekê weke du navendên tîcarî, zîraî û leşkerî bi destên Fransayê hatine ava kirin. Dewleta Fransayê pêwendiyên xwe berevajî Îngilîzan, li Sûriyê li gel Mislimanên ne Sunna û li gel etnîkên ne Ereb, weke Durziyan, Elewiyan Îsewiyan û Kurdan ve xweş dikir. Vê helwesta Fransayê dibû astengeke berbiçav ji bo netewayetiya Erebî.

Weke tê zanîn Fransa yek ji wan dewletên emperyalîst e ku berî Îngilîzan pêwendî bi Kemalîstan re daniye. Pêwendiyên wan di sala 1920'an de xurt bû û di 1921'ê de jî peyman çêkirin. Piştî şerê cîhanê yê yekem, bi peymana Londrayê ve di sala 1921'ê de sînorê Sûriyê-Tirkiyê hate kişandin. Cara yekemîn Fransayê perçekirina Kurdistanê xistiye rojevê û bi Kemalîstan re li hev kiriye. Ev sînor çiqas nẹ weke îro zahmet be jî bandoreke neyînî li ser neteweya Kurd hiştiye.

## Tevgera Xoybûnê 1927-1932

Tevgera Xoybûnê weke berdewama tevgera neteweyî ya bakurê Kurdistanê di 1927'an de li Lubnanê hate avakirin. Xoybûn, di dema netewayetiya Kurd li Rojhilata Navîn berfireh dibû hate damezrandin. Ew bi xwe bersiva netewayetiya Kurd ya modern ya sedsala 20'an e. Bandora netewayetiya ewropayê li ser vê tevgera Kurd sereke ye. Fransa, rê dida Xoybûnê ku li Rojhilata Navîn kar bike. Li Şamê, Helebê Hesekê, Parîsê, Iraqê Londrayê û li gelek cîhên din liqên xwe ava kiribû. Tevgera neteweya Kurd ya yekemîn e ku serbixwebûna hemû Kurdistanê daniye pêşiya xebata xwe.

Serok, damezrîner û xebatkarên vê tevgerê bêtir ji zarok û merivên tevgera bakur ya serhildanên Kurdan ve pêk dihat. Bi damezrandina vê tevgerê ve pêvajoyeke nû ya neteweyî li Kurdistanê dest pê kiriye. Di dema damezrandina vê tevgerê de serhildana Araratê dest pê dikir û Xoybûn weke berdevkê siyasî ya vê serhildana Kurdan tevdigeriya. Îhsan Nûrî Paşa di 1928'an de "Komara Kurdistanê ya Araratê" ava kiriye û heta 1930'î ev komar jiyana xwe domandiye. Em bi zelalî dibînin ku civata Kurdistanê ne di wê asta ku bikaribe di armanca Xoybûnê de têbighêje û bi girseyî beşdarî xebata wê bibe. Netewayetiya Kurd heta wê demê jî lawaz e û di nava berberî û berjewendiyên eşîrî de nehatiye fêhmkirin. Elîta serokên Kurdan bawer dikirin ku tevgereke wiha modern wê li hemû Kurdistanê cîh bigre û bibe berdevkê siyasî ya hemû beşên Kurdistanê. Lê mixabin nakok û berjewendiyên Kurdan li beşên din weke nimûne, başûrê Kurdistanê alîkariyeke ciddî nedan vê tevgerê. Di destpêka serhildana Araratê de di sala 1928'an de Fransa û Îngilîzan bi Kemalîstan re helwesteke mezin li dijî Xoybûnê girtin. Min li gelek cîhî aniye zimên, li vir jî dixwazim bêjim, di dema

hevpeymanên navneteweyî bi dawî hatibûn, tevgera Kurdî dest bi serhildanan kiriye û loma jî ji aliyê tu kesî ve nehatiye pejirandin.

Aliyekî din yê Xoybûnê heye ku, dernakeve pêş. Ew jî Pêwendiyên Xoybûnê û yê Ermeniyan e. Pêwendiyên Ermeniya weke berdewama peymana Sewrê, bi kêmahî be jî domandiye. Tevgara Ermenî ya Taşnakî, di 1923'an de li Ermenîstana Sowyetê ji aliyê Bolşewîkan ve hatibû qedexe kirin. Ew tevger di nava Ermeniyên koçber de li Sûriyê û li Lubnanê bi hêz bûn. Xoybûnê, yên bi Taşnakê re, Mislimanên Kurd xistibûn nava Gûmanan. Propagandeya Tirkan û ya Ereban jî neyêniyeke mezin li ser hêza Kurdan hiştiye ku alîkariya Xoybonê nekin.

Xoybûn, tevgereke neteweyî û modernîteyê weke bingeh girtiye. Ji bo Xoybûnê eşîr, ol û mezheb û herêmî girîng be jî, bingeha tevgerê netewayetiya yekgirtî ya Kurdistanî ye. Li gelek cîhî serok eşîran di nava tevgerê de cîh girtibin jî (weke haco Axa, Bozan Axa), nebûne kevirine bingehîn. Lewra Xoybûn bi îdeolojiya xwe ve pir di pêşiya civata Kurd de bû. Balanseke di nava nêrîn, helwest û rastiya civata Kurd de peyda nekir. Helwesta wê ya netewayetî eşîrên Kurdan qanih nekiriye. Netewayetiya Kurd li rojavayê Kurdistanê, encama damezrandina Xoybûnê ye.

### Îran

Ezê ji Îranê dest pê bikim. Bawerim dîroka Îranê yek ji wan dîrokên alozkiriye ku heta niha pir bi zelalî nehatiye zanîn. Dîroka Îranê ne weke dîroka Iraqê û ya Tirkiyê û ya Suriyê ji bona Kurdan zelal e. Ev pirtûk tenê ne li ser dîroka wan welatana hatiye nivîsîn. Lewra dîroka wan welatana bi kurtî hatiye nivîsîn. Mebesta nivîsîna dîroka wan welatana ji bona ronîkirina paradîgmaya pêla 3'yem e. Belkî ji aliyekî din ve jî bibe encama lêkolînên berfireh. Loma jî dîroka Îranê pir bi kurtî hatiye nivîsîn.

### Nasnameya Farisî

Îran ji bilî Farisan, ji gelek etnîkên ne serwer in pêk hatiye. Weke serjimar, etnîsîteya Azeriyan ya herî mezin e. Kurd etnîsîteya mezin ya

duyeme. Li dijî etnîsîteya serwer, di qada tekoşîna siyasî de, etnîsîteya Kurd yekemîn e.[14]

“Berevajî makezagona Tirkiyê, makzagona Îranê ya Îslamî, etnîsîteyên cuda erê dike. Îran weke civateke pirçandî tê bilêvkirin. Qebûlkirina etnîsîteyên cuda di qada yasayî de jî xuya dike. Ev bi xwe tê maneya qebûlkirina hebûna etnîsîteyên ne serwer. Makezagona Îranê, hebûna etnîsîteyên ne serwer, tenê bi pirsa hebûna çandên cuda ve şîrove dike. Etnîsîteya sereke ya fermî û ya serwer jî, etnîsîteya Faris tê qebûlkirin... Di makezagona Îranê ya Îslamî de, hebûna etnîsîteyên cuda, tenê weke hebûna çandên cuda bi cîh bûye. (ne weke etnîsîte yan jî neteweyên cuda. N.A) Di qada siyasî, dadwerî û îdarî de, etnîsîteyên cuda ne xwedî maf in. Di makzagonê de nasnameya serweriya siyasî û nasnameya desthilatdar tenê etnîsîteya Faris e.”[15]

Weke li jêrê di dîroka Îranê de hatiye zimên, Îran ji dîrokê ve weke mîrat, hunandina dewletê bi sîstema eyaleta ve pêk hatiye. Îro jî Îran ji eyaletan û ji herêman ve pêk hatiye. Herêma Farisan ya başûrê Îranê, Farisîstan, Li Bakurê-Rojhilata Îranê herêma Parta ku weke herêma Horasan binav dibe, li başûrê-rojhelatê Îranê herêma Belucîhstan, li bakurê rojavayê Îranê jî eyaleta dîrokî ya Med'an Ezarbeycan û li bakurê-rojavayê Îranê li ciyê Med'an û Elaman û Lulu'yan weke mîratgirê wan Kurd û welatê wan Kurdistan û cîhê Ereban Xozîstan, cîhê Gilekiyan Gîlan, Xezeriyan Xezar, Mazenderiyan Mazenderan û wekî din bi dehan herêm û wîlayet henin. Kurdistan, Ezarbeycan, Belucîhstan, Xozîstan weke eyaletên mezin têne qebûl kirin. Îro li Rojhilatê Kurdistanê bi fermî Kurdistan û waliyê Kurdistanê heye. Li Îranê mafê çandî yê netewa bi yasayî heye lê ev maf bi cîh nabe û tenê weke mafê çandî binav dibe.

Li gor raya hinek dîroknasan weke minak Aygun Attar Haşîmzade, bingeha Pan-Farsiyê, Musewiyê Îranî danîne. Yek ji wana jî, musewiyê Îranî ku dawî Misliman bûye, Firugî ye. Gelek balkêş e gava dewleta Îsraîl di 1948'an de hate damezrandin, dewleta Îranê yek ji wan dewletên dinyayê yê yekemîn bû ku dewleta Îsral bi fermî nas kiriye.

---

14 Kovara *Bîr*, makaleya Abbas Vali

15 Berhema navborî

Weke tê zanîn di wê demê de Emerîka li Îranê bi hêz bû. Ev bûyer bi xwe bandora Yehudiyan ya li Îranê pir bi eşkereyî xuya dike.

Îro li Îranê Musewî û Ermenî xwedî hinek maf in. Dibistanên wan hene û bi zimanê xwe dixwînin. Rewşa ermeniyan jî li Îranê cuda ye. Li gor çavkaniya Attar îro 29 dibistanên Ermeniyan li Îranê henin. Demî be jî radio û tv ên bi zimanê Ermenî hebûn. Nemaze di dema Pehlewiyan de. Îro jî li Îranê Ermenî bi zimanê xwe di qada medyayê de xwedî maf in.[16]

Bi destxistina mafê kêmnetewî weke Ermen û mafê Kurdan weke netweya xwedî xak li Îranê ne wekî hev in. Em dibînin li Îranê mafê Kurdan ji 1962'an ji dema pehlewiyan û virde dem bi dem ketiye rojeva dewletê. Di van deman de em dibînin ku bi Kurdî weşana radyoyê li Kurdistanê dest pê dike. Di 1990'î de bi lehçeyên Kurmancî û Soranî radyo û tv weşanê dikin. Ji 1996'an ve jî li Kurdistanê unîversîte hene û li wan unîversîteyan perwerdeya Kurdî heye. Lê ev universîtana weke agahiyên hene, naxebitin û perwerdeya bi zimanê Kurdî bi devkî heye.

Li Îranê 90 grûbên etnîkî hene. Lê nasnameya Farisî ji dêvla nasnameya Îranî di qada fermî de weke nasnameya hemû etnîkên Îranî tê nasîn. Ev nasname weke nasnameya Fars-Îranî tê zanîn. Ango nasnameya Îranî û nasnameya Farisî bûne weke yek nasnameyê. Ev helwest jî divê ji serî de mirov bêje çewt e û ne rast e. Lewra Îran heta sala 1920'î weke dewleteke hevbeş ya çend grûbên etnîkî dihate nasîn. Ji bilî neteweyên sereke weke Faris, Kurd, Azerî jî hinek mafên bingehîn ji bona grûbên etnîkî yên din jî hebûn. Heta şerê cîhanê yê yekem Iran weke dewleteke pirolî, pirneteweyî tê xuya kirin. Lê rewşa Îranê ji sala1920'î û virde di nava guherîneke şovenî de berdewam dike. Şoveniya Farisî serweriya xwe li Îranê bicîh kiriye û ji vê demê û pê ve armanca dewletê ya sereke di bingehiya yek zimanî, yek neteweyî de bûye afirandina neteweya-dewletê û heta îro berdewam dike.

Di dema Sasaniya de navê Farisî weke ziman hatiye bilêvkirin ku îro em tê dighêjin ku ew bi xwe weke zimanê Pehlawa bûye. Di nava

16 *İran'ın Etnik Yapısı, Yakın Dönem ve Günümüzde*, Prof.Dr.Aygün Attar (Haşimzade) Ankara 2006. Divan Yayıncılık, r.5

Sasaniyan de Persî û Pehlawî weke du herêmên otonom bûn. Herwiha di brokrasiya Sasaniyan de jî em rola Pehlawiyan dibînin. Mirov dikare zimanê Farisiyan qedîm weke zimanekî Pehlawiyan di nava Sasaniyan de şîrove bikin. Ev bi xwe weke zimanê beşa duyem tê binavkirin. Ev jî Pehlewî ye. Di dema Sasaniyan de di nava brokrasî û serkêşiya dewletê de asilzadayên Pehlewiyan bi hêz bûne. Pehlawa weke gelek derebegî û xanedanên din ew jî di nava Sasaniyan de weke herêmên xweser serwer bûne.

Mirov dikare dewleta Sasanî weke dewleteke pirçandî, pirolî û pirgelî binav bike. Dewleta "Sasanî bi çar (4) eyaletan ve hatibû hunandin. Xorasan, Adarbeycan, Part û Iraq"[17] Piştî demeke kurt dewleta Sasanî hunandina xwe bi navê Sepehbuda binav kiriye. "Sepehbuda Maxrib, Sepehbuda Nîmroz, Sepehbuda Yemen û Sepehbuda Hazar. Her Sepehbudek jî di nav xwe de bi vîlayetan ve hatibûn hunandinê. Weke mînak tenê di nava Sepehbuda Hazarê de 13 (sêzdeh) welat hebûn.[18] Lê zimanê Pehlawa heta sala 1925'an weke nasnameyeke etnîkî, neteweyî ne hatiye bikaranîn. Rast e zimanê Pehlewî bihêz bû, lê tucaran di qada siyasî de nebûye weke nasnameyeke neteweyî ya Farisî. Ji xwe Pehlewî û Farisî ji bilî çend bêjeyan dûrî hevin. Ango pehlewî û Farisî du zimanên cuda nin. Farisiya kevn, ya navîn û ya nû dûrî hevin û ez bi xwe vê dabeşbûnê rast nabînim. Ger em vê dabeşbûnê rast bibînin ji serî de em zimanê Farisî ya Îro bêyî devjeniyekê berdewama Persî û Pehlewî dibînin ku ev bi xwe ji rastiyê dûre. Lewra weke tê gotin Hewremanî, Zazakî, Kurmancî, Lurî ji, Farisiya îro bêtir nêzî zimanê Pehlewa ne. Loma jî vê dabeşbûnê bêhna aloziyên zimanzanên Ewropiyan û dîroknasên Farisan tê. Lewra îro ev dabeşbûn bêyî devjeniyê li hawirdorî cîhanê tê qebûlkirin, lê bi ya min ew nayê maneya rastiya wê. Farisîtî **"Cara yekem ji sala 1925-1979'an dewleta Şahinşahî ya Pehlewiyan dest pê kiriye. Ya din jî ji sala 1979'an û virde ya komara Îslamî ye".**[19]

---

17 *İran'ın Etnik Yapısı, Yakın Dönem ve Günümüzde*, Prof.Dr.Aygün Attar (Haşimzade) Ankara 2006. Divan Yayıncılık, r.33

18 Berhema navborî, r.34

19 Berhema navborî, r.165

Gelek Şaristaniyan zimanê Farisî weke zimanê dewleta xwe bi kar anîne. Persî, Ahamenîşî, Sasanî, Pehlewî Selçûkiyan (farisî) û heta Osmaniyan zimanê Farisî weke zimanê dewleta xwe bi kar anîne. Di dema wan de zimanê Farisî-Tacikî weke zimanekî hevbeş dihate bikaranîn. Loma îro şovenên Farisî, Îran, Afganîstan û Tacikîstanê weke welatên yek neteweyî binav dikin û weke Farisiya mezin tînin zimên. Farisiya wê demê û Farisiya îro gelekî dûrî hev in... Farisiya îro di bin bandora Erebî de maye û Farisî-Tacikî ya kevn, Persî û Pehewî ji hole rabûye.

Zimanê Farisiya îro, di dema Pehlewiyan de weke zimanê fermî derketiye holê. Ji salên 1925'an de dest pê kiriye û di sala 1930'î de jî ev ziman li Iranê weke zimanê dewleta Şahinşahî fermî bûye.

Di sala 1920'an de Riza Pewhlewî bi alîkariya Ingîlîzan di serweriya hukumeta nû de cîh digire. Di sala1925'an de serdestiya Pehlewiyan li Îranê bi cîh dibe û hemû netewe û kêmneteweyên Îranî têne înkar kirin. **"Riza Şah Pehlewî damezrînerê dewleta neteweyî ya Farisî ye"**[20] Şah weke pêngava yekem zimanê Farisî weke zimanê fermî yê dewletê bi zorê bi qebûlkirin daye. Ji bona afirandina neteweya Farisî ango neteweyeke nûjen li Îranê hemû grûbên etnîkî hatine înkarkirin. Hemû perwerdeyên bi zimanê cûda qedexe kiriye. Navên herêma guhertine û Îran weke "Ostan"a binav kirine. Em herwiha mînakên vê helwesta Pehlewiyan ya li Îranê, li Tirkiyê, li Iraqê û li Sûriyê jî dibînin. Ev helwesta Pehlewiyan bi alîkariya Îngilîzan ve xurtir bûye.

Îran weke dewleteke dagirkirî di destê Îngilîzan de serweriya xwe ya neteweya Farisî berdewam kir. Berî vê demê hemi grûb bi herêm, bi navên xwe dihatin bilêv kirin.

Li vî welatî jî weke li Tirkiyê dîrok li ser bingeha înkarê û derewan hatiye avakirin. Dîrok li vî welatî jî bûye bingeha perwerdeya nîjadperestiyê û înkarê. Lê divê em bi zelalî bêjin ku ev nîjadperestiya Pehlewiyan tu caran nebûye weke ya Kemalîstan û dewleta Tirk. Digel hemi şovenîzma Farisî de jî dîsa navên herêman weke Kurdistan, Belucîhstan, Xuzistan, Ezarbeycan bi navê wan tê bilêvkirin. Ango li Îranê binavkirina van herêmana weke li Tirkiyê ne tabû ye. Hebûna wan qebûl dike lê wan weke perçeyek ji netewa Faris bi nav dike. Vê

20 Berhema navborî, r.171

dema hanê, dema berfirehî û cîhgirtina netewayetiya Farisî ye û hetanî şerê cîhanê yê duyem berdewam dike.

Di şerê cîhanê yê duyem de Şahinşahî li aliyê Elmanya yê cîh girt. Ev helwesta Şahinşahî li hesabê Îngilîzan nehat. Bi pêşniyara Hîtler navê Pers-Ecem- di sala 21/03-1935'an de roja newrozê, bi navê Îran hate guherîn. Ji wê demê û virde navê Îranê fermî bû. Ev gaveke erênî bû û Îran weke welatê Aryaniyan hate dîtin. Lê Persan, Eceman ev helwesta Riza Şah bi şoveniyeke Farisî ve rexne dikirin. Bawer im Riza Şah di dîroka xwe de pêngava herî rast avêtiye ev e. Îro ev nav dikare weke navekî hevbeş yê hemû neteweyên Îranî bête qebûlkirin. Pêwendiyên Elman û Îranê Ingilîz-Sowyetê tirsandibû. Ingîlîzan û Sowyetê di 25/8-1941'ê de Îran dagir kirin û serweriya Riza Şah Pehlewî ruxandin. Sowyetê Ezarbeycan û Kurdistan dagir kir. Riza Şah ji welat hate qewirandin. Piştî şerê cîhanê yê duyem di peymana aştiyê de (1946) Sowyetê hêzên xwe ji Îranê kişand. Piştî wê jî Emerîka û Îngilîzan serweriya xwe ya li Îranê berdewam kirin.

Di sala1950'yî de li Îranê pêvajoyeke nû dest pê kir. Nûnerê burjuwaziya neteweyî Musaddik dibe desthilat. Musaddik weke serokê Eniya neteweyî hate ser hukum û dest bi neteweyetiya petrolê kir. Petrol ji destên şîrketên biyanî hate derxistin. Lê ev rewşa siyasî ya Musaddik nehat hesabê Emerîkayê û bi destê CÎA ê di sala 1953'an de hukumeta Musaddik bi darbeyeke leşkerî hate ruxandin. Şahinşahê koçber Muhammed Riza Pehlewî ji nû ve bi alîkariya Emerîkayê serweriya xwe dubare kir.

Di dema serweriya Şah de nîjadperestiya Farisî bi hêz bû. Bi destê emperyalîzmê serweriya xwe ya yek neteweyetî û yek zimanî bi cîh kir. Lê Îslamiya siyasî li Îranê bihêz bû. Di sala1979'an de şoreşa Îslamî serweriya şah bi dawî anî. Serweriya şah bi dawî hat lê serweriya nîjadperestî û şoveniya Farisî bi navê Îslamê berdewam kir. Îro dewleta Îranî dibin nîrê zordariya Îslam-Farisî de bi mezheba şîa berdewam dike.

Îro ji hemû deman bêtir netewe û kêmneteweyên cûda li Îranê ji mafê xwe yên rewa bêpar in. Berê bi navê pehlewî- Farisî îro jî bi navê Îslam-Farisî vê zordariya wan berdewam dike. Îro Îran weke dewleteke statukoperest bi fundamentaliya Îslamiya siyasî mafê hemû neteweyan

û kêmneteweyan binpê dike û statukoya dewletê li ser bingeha Îslam-Farisiyê bihêz dike.

Gelekî balkêş e ku bi şerê cîhanê yê yekem ve çawa neteweya Tirk hate afirandin herwiha neteweyeke ji tuneyî, ya Faris jî hate holê. Emperyalîzmê him li Iraqê û li Suriyê û him jî li Îranê û Tirkiyê ji neteweyên tune netewe-dewlet ku bi ya min dewlet-netewe ne, ava kirin.

Piştî şerê cîhanê yê yekem, Faris ne weke neteweyekê bi lêv dibûn. Neteweya Faris bi zordariya dewletê û bi alîkariya Îngilîzan ve pêk hatiye. Bi asanî em dikarin bêjin dewleta Îranê weke dewleta Tirk dewleta kêmneteweî ye. Ger netewe û kêmneteweyên Îranê bêne jimartin weke nifus û hejmara Farisan, hejmara kêm e û weke kêmnetewe dikare bête binavkirin. Mînaka vê rewşa Farisan li Îranê mînaka Tirkan li Tirkiyê bi xweye. Ji xwe ne Iraq û ne jî Surî, weke dewletên neteweya Erebî ne.

## Nasnameya siyasî ya Farisî

Li Iranê nasnameya Farisî ya siyasî" ji sedsala 20'an ve dest pê dike. Nasnameya Farisî heta wê demê tenê weke diyardeyeke zimanî hatiye bilêv kirin. Piştî Îngilîzan Hindistan dagir kir, bêjeya Farisî jî weke bêjeyeke netewayetî derket rojevê. Farisîtî di bingehiya xwe de li Hîndîstanê hatiye afirandin. Li gor baweriya Attar, bêjeya Farisî, li Hîndîstanê weke helwesteke çandî hatiye hunandin û bi destê Îngilîzan ve jî li Iranê weke nasnameyeke çêkirî, ya ramana netewayetî bi cîh bûye. Navê Farisî û nasnameya Farisî weke nav û nasnameya Persî û Pehlewî nasnameyeke ne zelal e. Weke mirov ji hemû grûb û neteweyên di nava sînorên dewleta Selçûkiyan û Osmaniyan de dijiyan weke diyardeyeke siyasî bi navê neteweya Selçûkiyan yan jî neteweya Osmaniyan binav bike ku bêjeyeke wiha filozofiya cîhanî tevlihev dike. Nasnameya Farisî heta wê demê ewqasî ne zelal û aloz bû.

"Heta îro jî, hînê bersiva bêjeya etnîka Farisî ya di berdewamiya dîrokê de hatiye bilêv kirin, bi zelalî ji bo kê hatiye gotin, nehatiye dayîn û nehatiye ronîkirin."[21] Bersiva vê pirsê tenê weke diyardeye-

---

21 *İran'ın Etnik Yapısı, Yakın Dönem ve Günümüzde,* Prof.Dr.Aygün Attar (Haşimzade) Ankara 2006. Divan Yayıncılık, r.21

ke dîrokî hatiye bilêvkirin. Tê gotin ku nasnameya Farisî di sedsala 9'an de di avakirina dewleta Samaniyan de weke nasnameya Farisî hatiye bikar anînîn. Dewleta Samanî di sedsala 9'an de li Xorasanê û li Meweraunnehrê hatiye avakirin. Li gor dîroknasên Iranî, ku nasnameya Farisî weke nasnameya Iranî bilêv dikin, neteweya Farisî berdewamiya Parsiyan rêdidin ku ew ji rastiya dîrokê dûr e.

Şirovekirina nasnameya Iranî weke nasnameya Farisî bilêvkirin ji rastiya dîrokê û ji rastiya îro jî dûr e, çewt e û ne rast e. Lê nasnameya Îranî weke nasnameyeke hevbeş ya neteweyên vê herêmê bê binavkirin raste û di cîh de ye. Lewra nasnameya Îranî bi nasnameya Farisî tenê nabe bê gotin. Îran divê weke herêmeke coxrafî ya têkel ku hemû neteweyên vê deverê di nava xwe de dipêçe, bête bilêv kirin.

Li herêma ku îro weke Îran tê binav kirin bi dehan şaristanî hatine ava kirin. Bi dehan qewm, gel û netewe li vê herêmê weke binecîh jiyan in. Elamî li vê herêmê herî binecîhên kevnare ne. Berî zayinê bi 3 hezar sal li Kurdistanê û li Xuzistanê şaristaniyeke berbiçav ava kirine. Berî zayinê 600 salan ev şaristanî bi dawî hatiye û şaristaniya Medan ev şaristanî xistiye nava Imparatoriya xwe û Ahamenîşî'ya jî ji vê şaristaniyê sûd wergirtine. Ango Med û Ahamenîda ji van şaristaniyan tecrûbe wergirtine û li ser mîrasa Elamiyan û yên berî Elamiyan şaristaniyên xwe ava kirine.

Zimanê Ahamenîşî û zimanê Medî zimanên taybetmend in. Îro em nikarin yek ji zimanê li vê herêmê têne axaftin, zimanê Farisî jî di nav de tenê bi serê xwe weke berdewamiya van zimanan nîşan bikin. Lê dema mirov li belgeyên Zaraduştiya û yên Medan dinêre mirov tendensên zimanê Kurdî bidin. Lê mirov di zimanê Partan û yê Pehlewiyan de jî tendensa zaraveyên Kurdî dibîne û him jî tendensa van zimanên dîrokî bi xurtî dibînin. Di Farisî û Dariya îro de jî mirov tendensên Partan û Medan û Pehlewiyan dibîne. Xuyaye ev zimanên têne binavkirin weke mîrat di nava şaristaniyên vê herêmê de belav bûne. Lê rastiyeke din jî heye ku em dibînin Ahamenîşiya ji bilî zimanê xwe, zimanê Babîlyoniyan jî weke zimanê dewleta xwe bikar anîne. Li vir bi eşkereyî zimanê Persna û yê Ahamenîşiyan weke du zimanên cûda ji aliyê Ahamenîşan ve hatine bikaranînîn.

Ji bilî Ahamenîşiyan û berî Ahamenîşa, Elamî, Mîtanî, Gutî, Lolî, Kassî, Kaspî, Partî (pars), Medî, weke binecîhê vê herêmê şaristaniyên xwe ava kirine. Lê herwiha Sasanî û duvra jî Makedonî, Ereb, Abbasî, Romî, Selçûkî, Moxolî weke dagirker derbasî vê herêmê bûne,vêderê dagir kirine û him ji tecrûbeyên şaristaniyên vê deverê sûd wergirtine û him jî şaristaniyên vê deverê têk birine û wêran kirine. Van qewmên dereke ji rojava bigire heta Rojhilat yên hatine vê herêmê û xwestine bibin serwer, bi asanî cîh negirtine. Darê zorê, tundrewî, kotek û qetliam bikar anîne. Ji ber ku şaristaniya vê herêmê wiha pêşde bû ku van qewmên hov û şervan nikaribûn wan li hev rabigirin û serkêşiya wan bikin. Lewra ew gelekî ji van qewmên binecîh paşdetir bûn û mirov dikare bêje hov bûn. Lewra jî dema ewana hatine vê herêmê (Kurdistan, Îran, Mezopotamya) berî her tiştî şaristaniyên wan rûxandine û wan tirsandine.

Dîrok li Îranê weke li welatên din yên mezopotamya û Kurdistan û Anatolyê bi dagirkeriya van qabîleyên hov û zordar ve aloz bûye.

Şaristaniyên ku Kurd xwe weke berdewamiya wan nîşan didin, Gutî, Mîtan, Lulî, Kassî, Lorî, Medî, Partta, Sasaniyan, hemû weke qewmên Elam-Zagrosî têne binavkirin û vana ji Pers û Pehlewiyan bêtir li vê deverê hukum kirine. Weke van şaristaniyan gelekî din jî hene ku Gilekî, Mazenderanî, Azerî, Belucî, Tirkmen xwe berdewamiya wan nîşan dikin, li vê deverê jiyane û şaristanî ava kirine. Van qewm, Gel û neteweyên hatine binavkirin hemû jî xwedî ziman û xwedî dîrok in. Evana li vê herêmê rehên jiyana xwe yê dîrokî dibînin û li van rehên jiyana bapîrên xwe xwedî derdikevin. Ev mafa, mafê hêmî van gelên hatine binavkirin. Bê dadweriyeke mezin e ku îro tenê Faris li van şaristaniyana xwedî derkeve û neteweya Faris weke berdewamiya van şaristaniyan gişan bilêv bibe.

Navê Persan, Medan di belgeyên nivîskî yên Ahamenîşiyan de heye. Dema Ereb hatine vê deverê jî Persî weke Farisî tercume kirine. Ji xwe Ereban navê gelek şaristaniyan tevlihev kirine. Partt piştî Med û Parsan di dema dawiya împaratoriya Med-Pers de, hatine vê herêmê û dûre jî Xanedana Ahamenîşiyan ku weke prensê Persan bûn, derketine rojevê. Weke li jor jî min aniye zimên Ahameniyan zimanê xwe yê taybetmend hinek dîroknas weke zimanê Partî binav dikin,

bikaranîne. Lê divê bê gotin ku Parttî û Farisî ne zimaneke. Ji hev cûda ne. Lê di nexşeya şaxa ziman de weke Kurdî, Farisî û Darî nêzî hevin. "Part bi zimanê Medî ye û bi maneya "dereke" ye. Ango Med` Part´ weke biyanî binav kirine.[22]

## Dîroka Îranê ya kevn û Faris û Kurd

Ezê bi teorî û nêrînên cuda yên filozof û dîroknasên dinyayê ve dîroka Medan û Persan bînim zimên. Bawer im ji bo xwendevanan wê giran be. Lê dixwazim aloziya dîroka Kurdan-Persan(Farisan) raxim ber Çavan. Piştî me aloziya vê dîrokê nas kir, wê gavê emê dest bi dîroka ku bêtir nêzî rastiyê ye bikim û bi kurtî bînim zimên.

Min li jorê navê gelên Zagrosê anîbû zimên. Weke berdewamiya gelên Zagrosê,"Berdewamê van gelan ji rojavayê Îranê û hetanî Zagrosê şaxeke din ji malbata Hindî-Ewropayî, Îranî ango Medî û Persî hatin vê herêmê. Li gor raya hinek dîroknasan Persî (Parsa), berî Medan (Mada) hatine vê herêmê. Beriya ew berê xwe bidin rojavayê Îranê, 300 salan li vê herêmê jiyan in. (Rastiya van 300 salan pirsa lêkolîneke ciddî ye. Bi ya min ji rastiyê dûr e. Navê wan cara yekem di dema serokê Asuriyan Şalmeneser III de, di belgeyên salên 833, 829 û 828'an de derbas dibe û bi ihtîmala herî mezin cîhê wan teqabulî herêma Banê (ku îro di nava xaka Rojhilatê Kurdistanê de ye dike ku ji wan re Parsuoş dihate gotin. Ji aliyekî din ve, berevajî vê ramanê belkî yê ev nav li wan kiriye Parsuaş e.

Mixabin Medan weke Sumeran, Babîlan, Asuran û Persan belgeyên nivîskî li dû xwe nehiştin in. Ger hebin jî hayê me jê tune ye."[23] Di bîranînên salane yên Şalmeneser III yê sêyem de, berî zayinê di sala 836'an de di nûsxeyekê de cara yekem di dîrokê de navê Medan derbas dibe.

"Ez ji Parsua(Pers. NA) çûm; ez çûm welatê Messî cîhê Amadia, welatê Arazîaşa xaka Harharê. Harharê li paşiya Sîrwanê dikeve."[24] Ezê

---

22 I. M. Dyakovov, *İran'ın Etnik Yapısı, Yakın Dönem ve Günümüzde*, Prof. Dr.Aygün Attar (Haşimzade) Ankara 2006, Divan Yayıncılık. r.29.

23 *Kürtler, Türkler ve Araplar, Kuzey Doğu Irak'ta Siyaset, Seyahat ve İnceleme-* 1919-1925 C.J.Edmonds, Weşanên Avesta 2003. r.21

24 Berhema navborî, r.22

li jêrê bilêv bikim lê li vir dixwazim bêjim ku Messî (navê qebîleyeke Medan e ku îro weke eşîreke Kurdan bi nav dibe. "Ji bilî Kurdan tu miletekî dî "Alfabeya Bînû Şad û Masîsûratî" nexebitandiye. Bînû Şad û Masîsuratî du eşîrên Kurd in. Kitêba herî kevin ku behsa vê alfabeya Kurdan a taybet dike, kitêba erebî ya bi navê "*Şewqu'l-Musteham Fî Ma'rifeti Rumûzi'l-Eqlam*" e. Nivîskarê vê kitêbê Ehmed kurê Ebubekir kurê Wehşiye ye (Mamoste Qedrî. Kovara Bîr.)[25] Lewra gelek dîroknas navê Medan weke Madîa bilêv dikin. Lê biqasî ez dizanim dîroka Medan û ya Persan bihev hatiye girêdan û loma jî bi aloziyeke mezin têne şîrovekirin. Lê mirov kijan dîroknas û Rojhilatnasî/ê bixwîne mirov dikare bibîne ku, Medan weke bapîrên Kurdan nîşan didin. Hinek jî Persan weke şaxekî Medan nîşan didin. Çiqasî rast e nizanim.

"Navên di sedsala 8'an de di belgeyên Asuriyan de derbas dibin dirûvê navên Îraniyan didin û ji aliyê prensên Medan ve hatine bikaranîn. Medî Piştî Persan ji aliyê bakurê Îranê ve ji cîhekî hatine û ber bi rojava û başûr ve çûne. Gava demjimar berî zayinê 650'yî xuya dikir, ew li Zagrosê serwer bûn. Him Medan û him jî Persan li ser nufûseke ji ol û zimanê cuda, weke hêzên aristokrat dewlet ava kirine. Lê bi ihtimala mezin wan zimanên xwe û olên xwe li ser wana ferz kirine."[26] Gava em vê jêgirê şîrove bikin, emê bêjin Med û Persan şaristaniyên berî xwe asîmîle kirine. Ango ew bi xwe jî li ser şaristaniyên cuda hatine avakirin. Ango li ser xaka Elamiya, Babîlyona, Asûra, Hûriya, û wekî din desthilatdariyên xwe ava kirine. Ev ji bo dema neolîtîk, ji bilî Asûriya şîrovekirineke weha asîmîlasyonî ji bo kesî din nahatiye kirin.

"Di salên 843'an de Medî ji du beşan pêk dihat. Medya Raghai û Medya Atropatan (Adarbeycan). (Li vir û li gelek cîhî gava mirov dîroka Îranê dixwîne Atrapatan-Azarbecan weke şaxekî Medan tê dîtin N.A). Bi vî awayî jiyana binecîh ya Proto Kurdan û ya Proto Farisan şekil girt. Herdû qewman bineciyên vê deverê yên berî xwe asîmîle kirine û berfireh bûne"Medên li vê herêmê bi cîh bûne ne weke

25 Kadri Yıldırım-Mamoste Qedrî, Kovara *Bîrê*.

26 *Kürtler, Türkler ve Araplar, Kuzey Doğu Irak'ta Siyaset, Seyahat ve İnceleme* 1919-1925 C.J.Edmonds, Weşanên Avesta 2003. r.22

qewmekî tenê xuya dikir. Herodot berî zayinê 400 salî dinivîsîne ku Medî ji 6 şeş eşîran pêk dihatin. Busaî, Struxades, Paritakioni, Bodioi, Arisantoi û Magî."[27] Magî weke serkêş ên Medan yên olî û brokrasiya dewletê xuya dikin.

"Herzfeld (1947). Eşîrên binecihên Medan weke 5'an bi nav dike: Hamadan, Nihawend, Isfahan, Ray û Adarbaijan" Rastiya gotinên Herzfeld cîhê devjeniyê ye. Lê dîsa jî Azarbeycan weke perçeyekî di nava xanedana Medan de derdikeve rojevê. Li vir pirsa sereke Isfahan e. Em têdighêjin ku Medî hetanî Isfahanê jî welatê xwe berfireh kirine"[28], ango ev dever dagîr kirine.

"Di salên 900'î yên berî zayinê de, Qabîleyên Aryanî li vê herêmê bûne hêz. Weke grubekê hatin vê herêmê. Saraxşiyê weke rê bikar anîne. Dema ev grup di çiyayê ber bahra Hazarê de derbas dibûn bûne du beşan. Beşa yekem weke Partan (divê ev Pers be) û beşa duyem weke Medan hatin vê herêmê, hatin başûrê Îranê û bûne cîranê Asûr û Babîlan"[29] Nêrînên Birêz Sîraç Bilgin û yên Edmons nêzî hevin. Lewra "Di salên 843'yan de. Di tabletên Asûriyan de di dema Şalmanazar yê sêyem de navê Parsua derbas dibe... herwiha di 843'an de navê Medan jî tête gotin ku Medan serweriya Asûr qebûl nekiriye û Şalmanazar hucûmî ser Medan kiriye... Dûre dîsa di tabletên Asûran de, di dema V. Şemsî Adad de navê vî gelî weke Med-Madaî derbas dibe.[30] Ev jî xuya dike ku herdu beş jî –Pers û Med- ya di demekê de yan jî bi hevre hatine yan jî di demeke kurt de li dû hev hatin in vê herêmê..

Rastiya ku Med ji ku hatine jî ne zelal e. Bawer im tu dîroknas jî di vê mijarê de ne zelal in. Bi ya min Medî bi xwe weke berdewamiya qabîleyên gelên Zagrosê ku berî zayinê 3. hezar sal li vê herêmê bicîh bûbûn û şaristanî avakirine, ji aliyê Qafkasyayê berbi vê herêmê ve hatine. Lê ji bona hê jî dîroka Medan bi gelemperî veşartî maye, mirov nikare sedî sed biryarekê li ser hatina wan û binecîhtiya wan bide.

---

27 Sıraç Bilgin. *Zarathustra* Berfin Yayınları, Çapa Duyem 2003 Çapa Berfirehkirî, İlk baskısı 1995. r.26-27

28 Berhema navborî, r.26-28

29 Berhema navborî, r.25-26

30 Berhema navborî, r.24-26

"Berî zayinê di 617-612'an de Kurê Phraortes (Kşhathrita) yê Medî Cyaxares, (Kyaksar), Med jî di nav de weke Mîrekê coxrafiyeke mezin ku weke dewleteke konfederalî tê qebûlkirin, tê nasîn." "Cyaxares bi Babîlona re peyman pêk anî û di sala 612'an de dawiya împaratoriya Asûr anî. Hududê Medan baş ne zelale. Lê Herodot (72 û 74), hududê Medan di vê demê de ji aliyê rojava ve piştî şerê bi Lidyayê (împaratoriyeke Anatolî bûye.) re ji Çemê Halysê ve dest pê dike (Kizilirmak- avçemê sor) navê Ekbatan û HeMedan nayê nivîsîn. Lê em dizanin ev der cîhê paytexta Medan bû ye. Ji vî alî de jî hududê Medan heta Rojhilatê Ekbatanê ye û Persan serweriya Medan qebûl kirine."[31]

Li vir jî mirov bi rehetî dikare bêje Persî, weke binecihên vê herêmê di nava împaratoriya Medî de jiyane û dûre jî ew împaratorî xistine destên xwe. Persan jî serweriya wan qebûl kirine. Teoriyeke din; di dema Persan de Medî jî hebûne û bi serê xwe di nava Împaratoriya Med-Pers de jiyane." Li gor raya Herodot, berî zayinê di 550'î de CyRûs yê Persî, kurê Cyaxaresê Medî Astyages ji textê wî daxistiye û serweriya Medan bidawî aniye. Ji vê demê pêde jî serweriya Axemeniya (Ahmenîşî) dest pê kiriye."[32] Ez vê mijarê di beşa Med û Persan de bi dirêjî izah dikim.

Împaratoriya Axemeniya hebûna xwe heta Darîusê III ve berdewam kiriye û di şerê bi Îskender re li Erbelayê (Erbîla îro-başûrê Kurdistanê) têk çûye û serweriya wê bi dawî hatiye."[33] Vê mijarê jî di beşa Med û Persan de emê bikaribin bixwînin. Evan teorî, nêrîn û şîroveyên cuda cuda dinivîsînim ji bo ku dîroka Med û Persan bi alozî hatiye nivîsîn û li aliyê gelek dîroknasan ve jî, nav, cîh û dem çewt hatine nivîsîn.

### Di derbarê dîrokê de çend gotin

Weke min li jorê gotiye dîroka Med-Pers a pir bi alozî hatiye nivîsîn. Ya duyem jî dîroka Medan, biyaniyan nivîsîne, ne Medan bixwe. Lê

31 *Kürtler, Türkler ve Araplar, Kuzey Doğu Irak'ta Siyaset, Seyahat ve İnceleme* 1919-1925 C.J.Edmonds, Weşanên Avesta 2003. r.22

32 Berhema navborî, r.23

33 Berhema navborî, r.23

îro dîroka herdû qewman ji berê bêtir zelal bûye. Ezê di derbarê van lêkolînên derketine, dîroka Medan û Persan bi kurtî be jî binivîsînim û derbasî mijara xwe ya Îrana îroyîn bibim. Ji serî de divê ez bêjim, ji Ereban û ji Tirkan bêtir dîrok, ziman, ol û çanda Kurdan û Farisan nêzî hev in. Çavkaniya dîroka wan, cîhê jiyan û çanda wan yek e. Di kuraniya dîrokê de, bi hev re berê xwe dane çiyayê Zagrosê û vê derê ji xwe re kirine cîh û war. Bingeha vê dîroka hevbeş ya Kurdan û Farisan, çanda Împaratoriya Med û Împaratoriya Med-Pers e. Di nava herdû împaratoriyan de, herdû gel bi hevre jiyane. Li dijî hev şer lidar xistine û ji bo desthilatdariyên împaratoriyan jî di nava bobelat û sosretên cuda de cîh girtine. Ger di Rojhilata Navîn de em bixwazin neteweyên birayên hev bi nav bikin emê berî her kesî Kurdan û Farisan bînin ba hev. Ji aliyê çand, ziman, ol û dîrokê ve Kurd, dûrî Ereban û dûrî Tirkan e. Hevbeşiyên Kurdan, Tirkan û Ereban, tenê diyardeyek e. Tirk û Ereb bi zorê hatine devera Kurdan û li ser xaka Kurdan- Kurdistanê dewletên xwe avakirine.

Ez dixwazim di beşa Îranê de, merivantiya Kurdan û Farisan bînim zimên. Emê herwiha bixwazin di vê dîroka dirêj û hevbeş de, bêdadwerî û zilma li ser Kurdan jî raxin ber çavên raya giştî.

Nivîsîna dîrokê tenê ne ji bo têgihîştin û zindîkirina pêşerojê ye ew herwiha di siyaseta rojane û di tekoşîna neteweyî de roleke sereke werdigre. (Bi gelemperî nivîsîn û têgihîştina dîroka neteweyî ger bibe beşek ji pêvajoya tekoşîna siyasî, wê gavê manîdar dibe. Hamit Bozarslan.)[34] Ango ew dikare bibe sedemeke berbiçav ya pêvajoya daxwazên zelal yên siyasî û neteweyî. Ew herwiha ji bo seferberiyeke giştî ya ji bo guherîna rewşa îro jî diyerdeyeke giranbiha ye. Li dewletên dagirker nivîsîna dîrokê beşa sereke ya avakirin û birêvebirina netewe-dewletê ye.

Li van dewletana dîrok bûye perçeyek ji jiyana siyasî, aborî, civakî, dadwerî û çandî. Lewra nivîsîn û têgihîştina dîrokê, ji bo meşrû û nemeşrûiyeta serweriya siyasî, ji bo hunandina netewe-dewletê û ji bo meşrûiyeta daxwazên neteweyî û siyasî mecalên civakî peyda dike. Ji

34 *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, Abbas Vali, Avesta, Çapa yekem: Ji meqaleya Hamit Bozarslan r.37

bo Kurdan nivîsîna dîrokê û analîzekirina dîrokê, nemaze di dîroka neteweyî de têgihiştîn, dikare bibe encama hişyariya ronakbîrên giyanî û evîndar. Dikare bibe zindîkirina hevbeşiya netewayetiya Kurd ku bikaribe li ser lingê xwe raweste û bi dîroka xwe ve serbilind be. Abdullah Cewdet wiha dibêje: "Neteweyên li ser paşerojên (derbasbûn) xwe ne hukumran bin, nikarin bibin xwediyê serxwebûnê"[35]

Birêz Hemit Bozarslan dema rûxandina dewleta Osmanî analîz dike wiha dibêje: "ronakbîrên Kurdan dema derfet ji wan re peyda bû, di dema valahiya serwerî û siyasî de, berhemeke dîrokî neafirandin". Pir rast dibêje. Weke nimûne, derfeta di navbeyna salên 1919-1923'an de weke demeke pir kurt bû. Di vê demê de ji bilî şerîf Paşa, ew jî ta radeyekê, serokekî Kurd yê xwediyê vizyoneke dîrokî tunebû. Ji bilî van sedemên li jorê hatine nivîsîn bi sedan sedemên din yên nivîsîn û têgihîştina dîroka neteweyî heye.

Ji ber van sedemana ez dixwazim dîroka neteweyên dagirkerên Kurdistanê bi kurtî be jî binivîsînim. Lewra van neteweyana li ser xaka neteweyên cuda, bi alîkarî û bi destên hêzên biyanî, bêtir bi destê dewletên emperyal ve netewe-dewletên xwe yên nîjadperest û statukoperest ava kirine û mafê neteweyên cuda û jiyana civata pirçandî û pirneteweyî ji holê rakirine û civatên yek neteweyî, yekçandî, yek zimanî, yek olî ava kirine.

Di vê pêvajoya ku derfet ji gelek netewan re peyda bû ku bikaribin dewleta xwe ya serbixwe ava bikin, netewayetiya wan neteweyên îro serdestin ne stewiya bû. Vana piştî dewlet ava kirin, xwestin neteweya dewletê jî ava bikin. Ev helwesta wan jî bû sedema şer û pevçûnên bêdawî. Vê helwesta neteweyên serdest bêyî hêza leşkerî, darê zorê û asîmîleyê nikaribû bi ser biketaya. Van kiryar û ramanên nîjadperestî yên dewletê jî bûye sedema bêaramiya dehsalan.

Ji bo netewayetiya Kurd jî çend gotinan pêwîst dibînim. Weke tê zanîn, ramanên netewayetî di berbanga sermayedariyê de, peyda bûye û li cîhanê belav bûye. Netewayetiya Kurdî jî, weke tê xuya kirin kêm zêde di van deman de dest pê kiriye. Li Kurdistanê dawiya sedsala 1800'î destpêka netewayetiya Kurd e. Li ser vê mijarê ramanên cuda

35 Berhema navborî, Sernivîsa Hemit Bozarslan.

henin. Ev bi xwe dewlemendiyeke ramanî ye û divê ev devjeniya li ser netewayetiya Kurd berdewam bike. Kesên netewayetiya Kurd ji demên kevnare ve destpêkirî dibînin gelek in. Piraniya wan vê netewayetiya Kurd bi ramanên nivîskî yên Ehmedê Xanî ve girê didin. Bi rastî jî ramanên Ehmedê Xanî gelekî balkêşin. Lê ez mijara netewayetiya Kurd bi berbanga sermayedariyê û bi tekoşîna neteweyên bindestê dewleta Osmaniyan ve girê didim. Ewana Ermenî, Tirk, Ereb, ji aliyê din ve Faris, Azerî û neteweyên Balkaniyan e. Min ev mijar di beşa netewayetiya Kurd de aniye zimên.Em mijara dîroka Îranê bidomînin. Kêm be jî min dîroka Îranê ji aliyê gelek dîroknasan ve anîbû zimên.

## Dîroka Îranê

Ji bo ku em bikaribin di dîmenên îroyîn ên dewleta Îranê de têbighêjin, divê em çend dîmenên dîrokî raxin ber çavên raya giştî. Îro gelek çavkaniyên dîrokî rewşa Îranê û gelên Aryanî ronî dikin. Van çavkaniyên ku ez bahs dikim, ev in: Pirtûka Pîroz Tewrat, Bavê dîrokê nivîskarê Grekî Herodot, Belgeyên kevirî yên Asur û Babîl, Tabletên kevirî yên Med û Persan, dîrokzanê cihû, Flavius Josephus, Rojhilatnas û dîroknas Vladîmîr Mînorsky. Lê ji bilî wan belgeyan bi sedan dîroknas li ser dîroka Kurdan û Farisan rawestiyane û encam jê derxistine. Di nav vana de dîroknas û siyasetmedarên Kurdan jî henin. Neteweyên îro li Îranê dijîn bermayên kîjan şaristaniyên neolîtîkin?. Bersiva vê pirsê tenê dîroka nivîskî dikare radestî me bike.

Beriya ez dest bi dîroka Îranê bikim dixwazim bi kurtî be jî bahsa hinek şaristaniyên Rojhilata Navîn bikim. Ezê bêtir navê eşîrên Aryanî ku ew berî Med û Persan hatine herêma Kurdistan û Mezopotamyayê û li vê derê bicîh bûne bikim. Elamî, Hûrî, (Mîtannî), Lulu, Gotî û mirov dikare bêje Urartû jî di nav de weke çend qewmên Arayanî ne. Îro li gor hinek dîroknasan bermayên Ûrartûyan Ermenî ne. Bermayên Hûriyan (Mîtanniya), Gotiyan, Luluyan û Elamiyan jî Kurd û Faris xuya dikin. Evana hemûya berî Medan û Persan hatine vê herêmê û bûne xwedî dewlet. Evana hemû ji Sumeran û Asuran fêrî nivîsîna mîxî bûne. Di elfebeyên xwe de hinek guherîn çêkirine û li gor dengên zimanên xwe kêm-zêde kirine. Li gor nêrîna hinek dîroknasa zimanê Hûriya nêzî zimanê Ûrartûya ye. Lê ev nehatiye Îsbat kirin. Navê Împaratoriya

wan Mîtannî ye (1475 berî zayinê). Hinek dîroknas jî dibêjin, "Navên piraniya padîşahên Hûriyan weke navên gelên îndo Ewropî ne-îndo-Arî bûne."[36] Împaratoriya Mîtannî, berî zayinê di sala 1263'yan de ji aliyê dewleta Asûr ve bi dawî hatiye.[37] Piştî rûxandina Mîtannî, Asûr, xelkê Hûrî û yên din ku di nava Mîtanniyan de dijiyan surgûnî cîhê dûr kirine û ji wan cihên dûr jî xelkên wê derê anîne herêma Hûriyan. Bi vî awayî Asûr xwestiye herdû aliya jî asîmîle û perçe bike ku ji bo careke din nebin serêşiya wan. Bi vî awayî gelê Hûrî li herêmê belav kirine.

Elamî jî, "li herêmên îro weke Kurdistan, Îran û Loristan aliyên Başûrê rojavayê Îranê jiyane."[38] Paytexta wan bajarê şûşa bûye. Asûr û Babîlan wan weke Elmatû binav kirine. Grekiyan ji wan re Elîmaîs yan jî Susian (şûşîan) gotine. Îmaparatoriya Elam di 2300'î de hatiye damezrandin û di sala 1150 î de jî di bin serokatiya şîlhak (şûşînak) I de, ji nû va hatiye vejandin. Welatê Elaman bi 23 herêman ve hatiye lihev ragirtin. Babîl jî wê demê bûye yek ji wan herêman. Lê di dema Nabûqatnezar ê yekemîn de ji bin destên Elaman azad bûye. Sûmeran ji wan re gelê çiya gotiye. Wan jî di nivîsînên xwe de elfebeya Mîxî bikar anîne. Heta hinek dîroknas dibêjin belkî wan bi xweev elfebeyê icad kiribin. Di sala 635'an de berî zayinê, Padîşahê Medê Kiyaxses piştî Asûr têk dibe Elamiyan jî di sala 629'an de dixe nava Împaratoriya xwe. (Justin V. Prasek.)[39]

Bi kurtî li gor çavkaniyên Îroyîn em dikarin bêjin Elamî, Hûrî, Mîtannî, Lulu jî di nava wan de weke eşîrên Arayanî ne. Ew jî ji aliyê Asyaya navîn, Kafkasyayê di ser Rûsiyayê re yan jî di ser Hazarê re derbasî vê herêmê bûne. Em dikarin vana weke qewmên îndo-Aryanî binav bikin. Di demên ku van qewman, li Zagrosê, Mezopotamyayê dewlet ava dikirin, Med û Pers weke qewmên koçerî berê xwe dabûn vê herêma ku wan qewmên berî wan lê jiya bûn, ango xaka ku jê re Kurdistan tê gotin. Bi texmînî di sala 1550'î de berî zayinê gelê MED'ê û gelê Pers ji aliyê

36 *Imparatoriyên Berî Zayinê*, c. duwem, Weşanxaneya Hanê, 2009 Ayhanê Bêrtî, r.134

37 Berhema navborî, r.140

38 Berhema navborî, r.77

39 Berhema navborî, Ayhanê Bêrtî.

kafkasyayê ber bi vê herêmê de hatine. Demeke dirêj bi gel, qewm û eşîrên cuda re jiyane û dawî jî hatine li vê herêmê bicîh bûne.

Hinek dîroknas dibêjin Persî berî Med'a hatine vê herêmê. Lê xuyaye ev raman raste. Lê ne weke tê gotin 300 salî berî wan hatine wir. Lê hatina wan hemûya jî tenê texmîn in. Gelên Aryanî pir in. Ji wana MED, PERS û HINDÎ 3 beşên bingehînin. Her sê beş li der û dora Hazarê yan jî li dora Kafkasyayê ji hev veqetiyane û her yekî ji wana berê xwe dane cîhekî. Lê qedera Med-û Persan dîsa piştî bi sedsalan li herêma Pers û Medan (Farisîstan û Kurdistanê) bûye yek. Eşîrên Hindî yên çûne Hindîstanê, li jêrê dinivîsînim ku careke din bi eşîrên Aryaniyan re têne ba hev. Ger em bixwazin bapîr û dapîrên Kurdan û Farisan têbighêjin, divê em li ser dîroka Med û Persan rawestin û encama jê derbixin.

## Dîroka Medan

C.J Edmond, di pirtûka xwe ya bi navê Kurd, Tirk û Ereban de dibêje ku, Kurd û Pers ji aliyê Rûsyayê, hatine vê herêma ku îro weke Med û Med-Pers hatiye bilêvkirin. Tewrat (Pirtûka Muqedes) û dîroknasên Grekî, nemaze Herodot bi nêrînên xwe ve, ne tenê dibin çavkaniyên Edmond. Ew dibin çavkaniyên gelek dîroknasên cîhanî. Di gelek belgeyên Asûr û Babîl de jî em dîroka Med û Persan dibînin. Belkî bi saya serê van çavkaniyên girîng Kurd û Pers bi kêmasî be jî, di dîrokên xwe de têdighêjin.

Li gor hemû dîroknasan Medan weke Persan, Asûr û Babîlan dîrokeke nivîskî li dû xwe nehiştine. Lê ev tenê ramanek e. Lewra em dizanin dîroka Rojhilata Navîn hînê jî binxake. Gotinên îro yên weke rastiyê têne nivîsîn sibê bi lêkolînên nuh va dikarin nerast derkevin. Divê di serî de ez bêjim, Dîrokzan Arnold Wilson di berhema xwe ya bi navê Mezopotamyayê de nivîsiye ku, netewa Kurd, paşmaya gelê MED e. Zimanê wan, zimanê rojavayê Îranî ye. Herwiha John Bulloch û Harver Morris jî weke Arnold gîhiştine qeneeta ku Kurd bermayên Medan e. Hetanî îro li gor çavkaniyên dîrokî mirov dikare bêje Kurd bermayên Medan e. Lê çavkaniyên dîrokî her roj zêde dibin û belge û tabletên nûjen derdikevin ser rûyê erdê. Vê pêşveçûna dîrokî gelek

ramanên dîrokzanan çewt derdixe û rastiya dîrokê kêm be jî derdixe holê. Lê divê dîsa jî mirov sererast sernişîvî newala dîrokê nebe û zû biryara xwe nede. Ez li gor belgeyên hetanî îro hatine nivîsîn tevdigerim û dibêjim ji Kurdan pê ve neteweyeke din yê bikaribe weke bermayên Medan bêne binavkirin nabînim. Welewkî di derbareyê zimanê Medan û etnîkiya wan de tevliheviyeke dîrokî hebe jî dîsa neteweya herî nêzî Medan dîsa Kurd bi xwene.[40]

**Cîhê Medan**

Li gor erdnîgarên Ermeniyan, Med Împaratoriyeke bi (11) yazdeh herêman ve hatiye ava kirin. Atropatana (Ezarbeycan), Rhea, Gîlan,(Gîllînîa), Mcama, Dîlûmîa, Amatanîa (Hamadan), Dambarîa, Sparastaanî, Amîla, Cheososia, Rhovanîa ne. Ptolemy jî, herêmên Medan weke 8'an rêdide. "Erdnîgarên klasîkî jî, herêmên Medê, weke du (2) herêman dinivîsin. Herêma Atropatan(Ezarbeycan) û herêma Medya-Magna ku herêma Iraqa Ecem, Zagros û Erdelan ve pêk tê dibînin"[41] Xuyaye herdû herêmên kilasîkî wê di dema avakirina Medê de rast bin.

Weke li jorê jî hatiye nivîsîn, belgeyên Medan yên nivîskî kêm in. Lê xuyaye Medan hetanî dawiya împaratoriya xwe bajarên mezin ava nekirine. Yên ava kirine jî pir bi asanî rûxiya ne û wenda bûne. Wan bêtir li ser xaka xwe ya fireh gund ava kirine û bêtir li gundan jiyane. Bajarên avakirine jî ne wan bajarên heta dema me mane.

Med di dîroka xwe ya nêzî 190 salî de ji Kapadokya, Ermenîstan, Ezarbeycan, Hazar, Asûr, Babîl, Ûrartû, Mîtannî, Elam û Pers xistine nava împaratoriya xwe. Med weke dewletek konfederal hatiye avakirin û heta dawiyê jî bi vê strukturê berdewam kiriye. Carina navendîparêzên padîşahên Medan derketibin jî vê struktura wan ne hilweşandine. Dixwazim ji bajarên Med ku lê serwer bûne çendikan bi nav bikim. Paytexta wan **Ekbatana** bûye. Dîroknas navê wê bi vî awayî bilêv dikin. Lê rastiya wê **Ha gma tana** ye (bi maneya cîhê civînê ye) ango eşîrên Medan berî dewletê ava bikin weke cîhê

40 Berhema navborî, Ayhanê Bêrtî, r.267

41 *Medya Krallığı*, Doz, 2006, 1. Baskı, Prof. George Rawilinson. r.23

şêwirmendiya serokeşîran ev der bikar anîne. Weke ciyekî navendî bûye. Hinek dîroknas û nivîskar yên Kurdan jî di nava wan de vî navî weke navekî bi Farisiya kevn bilêv dikin. Ez ji vê bêjeyê acizim. Lewra Farisiya kevn têgeheke berfireh e. Ji Farisiya kevn, qesda wan çi ye ne diya re. Lewra Farisiya kevn, ezê li gelek cîhî bahs bikim, ne zelal e. Kîjan kevnî tê bilêv kirin jî aloz e.Weke Zend-Avestayî, Pers-Tacikî, Sasanî, Pehlewî, Ahamenîdî, hemû jî weke Farisiya kevn têne binav kirin ku ji rastiya dîrokê dûr in. Îro navê paytexta Medan **Ha ma dan** (Hamadan) e û li Rojhilatê Kurdistanê ye. **Kirmanca** bajarekî din yê Medan e. Îro navê wê **Kirmanşa** yanjî **Kirmanşah** e. Ango bi maneya xaka **Kirmanca** ye. **A(Med)** bajerê din yê Medan e. Bi maneya **a med** aye ango cîhê Medan e. Îro jê re Diyarbekir tê gotin. **Arap(f)xa** bajarekî bi nav û deng yê Medan ye ku îro jê re Kerkuk tê gotin. Berê di destê Asûr de bûye û dawî jî ketiye destê Medan. Ji wê demê û virde hemû bajarên min binav kirine Bajarên Kurdan e. Xaka Med bi qasî 1.295.000 km2 bûye. Bi kurtî bi qasî Birîtanya Mezin, Fransa,Îspanya û,Porugal(Portekîz), bûye.[42]

Li gor agahiyên George Rawilnson nivîsiye, bajarekî dinê jî heye ku navê bajêr Rage'ye. "ev nav di dema serhildana Medan ya Dariûs Hystaspis de bilêv dibe. Di Zend-Avestayê de weke cîhê eşîrên Medan yê yekemîn û weke bajarê duyemîn yê mezin hatiye nivîsîn. Plotemiy jî navê bajarekî din yê Medan Aspadan dide, ku ev bajar Isfahan bi xwe be. Ev herêm di bin desthilatdariya qabîleya Medan ya Paraetacenî de bûye. Bi vî awayî em têdigihêjin ku Mediyan heta Isfahanê welatê xwe berfireh kirine."[43]

## Karektera Medan ya Etnîkî

Li gor nêrînên dîroknas û lêkolînerên heta îro, êdî bêgûman karektera etnîkî ya Medan hatiye xuyakirin. Herodot karektera etnîkî ya Medan û Persan weke du nîjadên Hindî-Ewropî yên Aryanî binav dike. Zimanên wan, kevneşopiyên wan, ola wan nêzî hevin. Dîrokeke dirêj bi hev re jiyane. George Rawilson jî, di pirtûka xwe ya bi navê Kraliyeta

42 Berhema navborî, Prof. George Rawilinson.

43 Berhema navborî, r.35-40

Medan de dibêje: "Med û Pers ji milê Aryaniya weke du milên etnîkî ne. Mirov êdî nikare her du etnîka ji hev cuda bike." "Herwiha Persên modern(Faris), yên ji dûndana kevnare ya Aryaniyan tên, îro weke bermayên wan yên dejenekirî ne." Kurd û Lor bêtir dişibin Medên kevnare". Şervaniya tîr û kevan ya Medan derbasî aliyê Persan û dûre jî derbasî aliyê Partta Bûye.[44]

Dîrokzan Arnold Wilson, di pirtûka xwe ya bi navê Mezopotamyayê de nivîsiye ku gelê Kurd, paşmayên Medan e û zimanê wan jî zimanê Rojavaya Îranî ye. John Bulloch û Hervey Morris jî gotinên Arnold teyid dikin û ew jî dibêjin Kurd bermayên Medan e. (Binêre Dîroka Îmaparatoriya Med . R.267 Ayhanê Bêrtî.) Ji bilî van dîroknasa bi dehan dîroknas û Rojhilatnasên din jî vê rastiyê teyid dikin.

Li gor pirtûka pîroz Tewratê jî, Med ji Dûndana Medany'in ku ew lawê Yafet ê neviyê Nuh pêxember e. Li gor dîroknasê cihû, Flavius "Medany piştî tûfanê di sala 2370 yî de ji dayik bûye"[45]

Weke min li jorê jî aniye zimên, Bermayên Medan heta îro tenê Kurd xuya dikin. Piraniya lehçeyên zimanê Kurdî jî ji qewmên Aryanî yên di nava Medan de cîh girtine û weke qewmekî bi hevre di nava împaratoriyekê de bi hevre jiyane tê. Ola Kurdan ya kevnare, kevneşopiya wan û çanda wan ji hemû neteweyan bêtir nêzî Medan e û zimanê wan jî zimanê Rojavaya Îranî ye.

"Di vê demê de Kurdan, di pêvajoya konfederasyona Medan de û bi ramaniya Zaraduştî ve roleke navneteweyî bicîh kirine. Li dijî zilma Asûr, hêza azadîxwaziya Rojhilata Navîn ava kirine. Newroz bersiva vê pêvajoyê ye. Bi ramana feylesofiyê ve riya şoreşa vînê li dar xistine. Ramana Feylesofiyê ber bi rojavayê ve birine û bi vî awayî jî bingehiya pêşveçûna şaristaniya rojavayî bi cîh kirine. Li bakur jî sîstema koledariyê lawaz kirine."[46]

---

44 Berhema navborî.

45 *Împaratoriya Med*, Ayhanê Bêrtî, Weşanxaneya Hanê 2008. r.141

46 *Kürt Sorununda Çözüme Doğru–Demokratik Özerklik*, Bilim Aydınlanma Komitesi, Weşanxaneya Serxwebûn-146 Çile-2009, r.28

## Zimanê Medan

Li gor nêrînên Rawilson" Di belgeyên Kralên Axamenî de yên bi elfebeya Mîxî hatiye nivîsîn de bêgûman zimanê Persan yê kevn e. Zend-Avesta, ku rastiya wê Avesta û Zend e, zimanê wê yê gelê Medan bi xwe ye"[47] Zimanê Medî yê ku em nasdikin, weke maka zimanê Persiya Kevn e."[48] "Ji belgeyên Asûriyan em têdighêjin ku hunermendiya nivîsê li ba Medan hebûye û vê hunera xwe jî bikar anîne".[49]

Medan elfebeya zimanê xwe ya nivîskî ji kê girtine? Ew berê pêrgî ziman û elfebeya Ermeniya Kevn û dawî jî rastî zimanê Asûrî ku weke zimanê Samî ye hatine. Wê demê herdû jî zimanê nivîsê bûn. Zimanê herduyan ne wekî hev bûn lê herduyan jî elfebeya Mîxî bi kar dianîn. Medan elfebeya Asûr wergirtiye. Lê elfebeya Asûr ji jor bi serberjêr dihate nivîsîn. Ewana, ango Medan, weke elfebeya Asûr lê ji elfebeya wan asantir ji çepê ber bi rastê ve elfebeyek ji xwe re afirandin û li ser elfebeya Asûr hinek herfên din zêde kirin. Li gor dengên zimanê xwe herf peyda kirin. Elfebeya ku dawiyê Persan (Farisan) jî bikar aniye elfebeya Medan bi xwe ye. Elfebeya wan ya naskirî ji 23 herfa pêk dihat lê bi 37 resim û şekla ve bi kar anîne.[50]

## Alfabeya Mîxî

Kadri Yildirim (**Qedrî Xoce**) lêkolînerekî Kurd yê hêja ye. Ew di nivîseke xwe de li ser elfabeyên kevnare rawestiyaye û di vê babetê de wiha dibêje: "Van qewmên Aryanî nivîsa mîxî ya Sumeran ji 3000 sal beriya zayînê heya 600 sal beriya zayînê ji aliyê gelek miletên dinyayê ve hatiye şixulandin. Kurdistaniyên berê yên mîna **Hurrî, Mîtannî, Kaşî** û qewmên **Med,** ev nivîs xebitandine û li gor fonetîka xwe hejmara tîp û dengên wê kêm an jî zêde kirine. **Bo nûmûne Medan gava dest bi xebitandina vê nivîsê kirine tîpên wê 36 bûne. Wan li gor fonetîka xwe 6 tîp lê zêde kirine, bi vê zêdekirinê hejmara tîpan gihaştiye 42'an. Nivîsa mîxî hema hema ji tevayî dengên Kurdî re**

---

47 Medya Krallığı, Doz, 2006, 1. Baskı, Prof. George Rawilinson. r.127

48 Berhema navborî, r.138

49 Berhema navborî, r.138

50 Berhema navborî, r.141-143

**bi kêr hatiye. Ango pêşiyên Kurdan ev sîstem li gor tevayî dengên xwe xebitandine.**

Li gor ku Hazim Hacanî di kitêba xwe ya Erebî ku bi navê "***Sefehatun Min Tarîxi'l-Kurd we Kurdistan***" (Çend Pel Ji Dîroka Kurd û Kurdistanê) de neqil dike, qismek ji belgeyên herî kevin ku bi nivîsa mîxî bi zimanê Kurdî hatine nivîsandin û gihaştine roja me hinek keval in ku behsa tofana Nuh dikin. Ev kevalên han niha di "Muzeya Londonê" de tên muhefezekirin û di vî warî de di rojnameya "*Sewtu'r-Rafideyn*" (Dengê Mezopotamyayê) de di hejmara 53. sala 1984'an de meqaleyek jî hatiye weşandin.[51]

## Alfabeya Yewnanî û Aramî

Li gor Cemal Reşîd Ehmed, Kurdan piştî hilweşîna "Împaratoriya Ixmînî" (Axamenîd.N.A) di dawiya sedsala 4'an a beriya zayînê de dev ji nivîsa mîxî berdane û dest bi xebitandina alfabeya Yewnanî û Aramî kirine. Tekstên Kurdî yên ku bi van alfabeyan hatine nivîsandin û gihaştine roja me "*Nivîstekên Hewramî*" ne. Di sala 1909'an de li Hewramanê di şkeftekê de hinek nivîstekên bi Kurdiya Hewramî, bi alfabeya Yewnanî û Aramî (hatine nivîsîn), hatine dîtin. (pistî lêkolîneke dûr û dirêj girîngiya wan hatine fêmkirin.) Nivîstek ji peymaneke bazirganiyê pêk tê. Tê de behsa kirîn û kirêkirina rez û baxçeyan tê kirin. Navê kesên ku bûne şahidê vê peymanê jî yek bi yek tê de cih digirin.

## Alfabeya Bînû Şad û Masîsûratî.

Ji bilî Kurdan tu miletekî dî "Alfabeya Bînû Şad û Masîsûratî" nexebitandiye. Bînû Şad û Masîsuratî du eşîrên Kurd in... Kitêba Erebî ya bi navê "Şewqu'l-Musteham Fî Ma'rifeti Rumûzi'l-Eqlam" e. Nivîskarê vê kitêbê Ehmed kurê Ebubekir kurê Wehşiye ye (Îbnû Wehşiye). Keldanî ye Lê Kurdî dizane. Kitêba xwe di sala 241'ê koçî/856'ê zayînî de nivîsandiye...wiha dibêje: "Kurdên Bînû Şad û Masîsuratî temamê berhemên xwe yên zanistî û hunerî bi vê elfabeyê nivîsandine. Tîp û şiklên ku di vê alfabeyê de ne pir xerîb û kevnar in û di alfabeyên din de

51 Kadri Yildirim, Kovara Bir

nayên dîtin. Min li Bexdadê di nav meqberên Îsewiyan de 30 pirtûkên ku bi vê alfabeyê hatine nivîsandin dîtin û du heb ji wan niha li Şamê li bal min in. Yek jê di *derbarê edilandina rezên tirî û xurmeyan de*, yek jî derbarê derxistina avê ji bin erdê de ye. Ji bo ku însan jê îstifade bikin min viya ji zimanê Kurdî wergerand zimanê erebî.

## Alfabeya Avestayî

Avesta bi zimanekî ku gelek nêzîkî Kurdiya Mukrî ye hatiye nivîsandin. Loma, ji Kurdiya Mukrî re "Diyalekta Avestayî" jî tê gotin. Alfabeya Avestayî ji 44 tîpan çêbûye. Ev alfabe ne bi tenê malê komeleyekê ye. Belkî digel Kurd û Farisan komeleyên Îranî bi gelemperî ev alfabe xebitandine."[52]

Agahiyên li ser ziman û elfebeya Medan xuya dike ku zimanê Medan bi xwe zimanê Kurdî ye. Bermayên wî zimanî îro bi asanî mirov dikare bêje Kurdiya îroyîn e. Lehçeyên Kurdî weke Hewremanî, Zazakî, Mukrî, lorî, Feylî û ta radeyekê Kurmancî û Soranî jî di nava wan de bermayên Medan bi xwe ne. Bêgûman zimanê Farisî, Afganî, Belûcî, Gilekî, Pehlewî, Persî-Tacikî jî nêzî zimanê Medan in. Lewra van ziman û lehçeyan bi sedsalan bi hevre jiyane û bandoreke mezin li ser hevdû hiştine. Qedrî Xoce, navê Masîsûratî eşîra Kurdan binav dike û dibêje; ji Kurdan pê ve tu neteweyî bi elfebeya wan nivîs nenivîsîne. Imparatorê Asûr, Salmanaser jî, di tabletekê de dibêje ez ji jor ji welatê Massisuratan daketim jêrê. Li jêrê qesda wî Asûr e. Ez vê mijarê li jêrê dinivîsînim. Ev belge bi xwejî xuya dike ku Kurd, weke min bahs kir herî nêzî Medan in.[53]

## Ola Medan

"Beriya nîjada Ariyan bi du milan ve ji hev cuda bibin, ango beriya bi Rojhilat û rojava ve bibin du beşan, beriya ku weke Hindî û Aryanî'yan ve ji hevdû veqetin, û beriya baweriya xwe bi ola Zaraduştî û Brahmayî'yê bînin" ola wan ya kevnare hebû.[54]

---

52 Kadri Yildirim, Kovara Bir

53 Binêre li berhema navborî.

54 Medya Krallığı, Doz, 2006, 1. Baskı, Prof. George Rawilinson. r.88

Weke tê gotin, baweriya wan bi dûalîzmê dihat û ew bawerî jî weke Magû/î dihate bilêvkirin.Di dema meşa xwe ya ber bi Kurdistanê ve eşîrên Med pêrgî eşîrên Zaraduştiya bûne. Biqasî agahdariyên hene Zaraduştiya hemû qaîdeyên Magû/î ya qebûl kirine. Ev qebûlkirin li gor raya George, di dema damezrandina Medyayê de pêk hatiye. Weke tê zanîn eşîra Magû/î yek ji 6 (şeş) eşîrên Medan e. Di nava Mediya de çîna olî bêtir ji vê eşîrê hatiye û loma jî navê ola wan bilêv bûye. Padîşahên Medan jî bêtir ji vê eşîrê derketine.

Di dema imparatoriya Medyayê de ola Magû ji aliyê hemû eşîrên Aryaniyan ve hatiye qebûlkirin. Ola Magû weke ola hemû qabîleyên Arayaniya ya kevn ya berî Zaraduştiya tê binavkirin. Ola Magû û ola Zaraduştiya bi hevre konfederasyona Medan ava kirine. Bi avakirina vê konfederasyonê ve ola Med bi nivîsîna Zend-Avestayê (pirtûka muqedes) ve form girtiye. Bingeha Zend-Avestayê dûalîzm e. Îbadeta wan jî Soma ye ku bi xwe ji ola Aryanî ya kevn tê û di ola Brahmayê de cîh girtiye.

Zend-Avesta ji heyşt pirtûk yan jî ji heyşt beşa pêk hatiye. Bingeha wê weke min li jorê nivîsiye Dûalîzm e û ew jî weke baş û nebaş (xerab) hatiye bilêvkirin. Ahûra Mazda xwedayê tenhaye û yê baş e. Angro-Maînyo- Ahrîman, jî dijî xwedayê Ahura Mazda ye û nebaş e. Dûalîzma Avestayê, di beşê Avestayê yê kevn, Gathayan de hatiye nivîsîn.[55] Motîvên Avestayê di olên yekxwedayî de, weke Musewî, Îsewî û Islamê de pir bi zelalî xuya dike.

### Gelên Medan Çawa û kengî hatine vê herêmê (Kurdistanê)

Bi texmîni di sedsala 1550'î berî zayinê de, Medî weke eşîrên Aryaniyan, ji aliyê Qafqasyayê berbi bakurê Îranê ve hatine û li vê derê bicîh bûne. Ew berê weke koçeran derketine vê gera xwe. Piştî gera xwe li herêma ku lê bicîh dibin, qabîleyên din yên Arayanî nas dikin. Dijî Asûr û dijî imparatoriyên din alîkariya van eşîrên Aryanî dikin û nêzî wan bicîh dibin. Weke tê gotin li der û dora Hemedanê cîh ji xwe re digirin. Bicîhbûna wan demeke dirêj digre. Wan û Gotiyan, Lûlûyên berê, li hev nekirine û şerê hevdû kirine. Di wê demê de eşîrên Medan

55 Medya Krallığı, Doz, 2006, 1. Baskı, Prof. George Rawilinson r.99-109

ne li ser hev bûne. Hawirdorî wan imparatoriyên mezin hebûne. Elam, Asûr, Babîl, Ûrartû hebûn û zilma wan dijwar bû.

Cara yekem Imparatorê Asûr Salmanasser III di tabletên xwe de navê Medan tîne zimên. Mêjû, berî zayinê 858-824'e. Wê demê eşîrên Persan jî li vê deverê cîranê Medan e. Ji ber zilm û êrîşên dewletên cîran eşîrên Medan di nava xwe de peymanekê pêk tînin. Li gor vê peymanê eşîrên Medan li dijî êrîşên dewletên cîran diviyabû alîkariya hevdû bikrana. Lewra her carê li gundekî Medan civînên xwe yên şêwirmendiyê lidar dixistin. Justîn Prasek, dibêje vê peymana Med li ser linga hiştine. Justîn V.Prasek di şerên navbeyna Medan û Asûr de ji tabletên Tiglatî III, navên çend eşîrên Medan dinivîsîne. Herodot ji bona vê demê dibêje ku wê demê Medan hînê jî bajar ava nekiribûn. Med gundî bûne. Lê Asûr gundên wan weke bajara binav kiriye. Di şerê navbeyna Asûr û Cihûyan de Medî bîhneke bê şer derbas dikin. Asûr weke dezgeheke leşkerî Cihûyan sirgûnî nava Medan dike. Di nava Medan de Dadgerekî mezin û naskirî heye ku weke tê gotin ji eşîra Magû/î ye û navê wî Dayêgos e. Medan ji wî re rêz girtine û li wî gohdarî kirine. Bi hevbeşiya eşîrên Medan cara yekem Dayêgos weke padîşahê eşîrên Medan berî zayinê di 728'an de hatiye helbijartin. Dayêgos Ekbatana(Hemedan) dike paytexta Medan. (Herodot, Historîen.)

Padîşahê duyemîn lawê Dayêgos e û navê wî Fraortes e. Di sala 675'an de ciyê bavê xwe digre. Dayêgos 53 salan Padîşahî kiriye. Herodot dibêje cara yekem di dema Fraortes de eşîrên Persan dikeve bin serweriya Medan. Dema wî dema berfirehbûyina Medan e û cîranên xwe yên Aryaniyan di nava Medê de dicivîne û dijî Asûr serî hildide. Lê Fraortes di şerê dijî Asûr de li derdora Nînowayê tê kuştin. Sal berî zayinê 653 ye. Ew jî 22 sala weke padîşahê Medan serwer dimîne.

Lawê Fraortes Kiyaxses di sala 653'yan de dibe padîşahê Medan. Dema Kiyaxses dema Medan ya herî mezine. Gava sal 563 xuya dikir, Elam û Babîl xistiye nava Medan. Dijî Asûr dest bi şer dike û paytexta Asûr, Nînowayê dorpêç dike. Beriya Nînowayê, Arrapha (Kerkuk) û Tabîrşû (Şerîf-xan) dixe destê xwe û dawî jî Nînowayê dixe destê xwe û Asûr ji holê radike. Piştî Asûr tu kesê dî ku hêza xwe li himber Medan bigire namîne. Ermenîstanê, Lîdyayê, Îranê, Araratê, Ûrartû û

yên li der û dora Gola Wanê bicîh bûn û Îskîtan dixe nava imparatoriya Medan. Kiyaxses jî 68 salan weke serwerê Medan dijî.

Piştî mirina Kiyaxses, lawê wî Astiyages ku zavê Lîdya ye, di sala 585'an de dibe padîşahê Medan. Dema Astiyages dema têkçûna dewleta Medyayê ye. Di derheqê Astiyages de agahiyên cuda hene. Li gor hinek dîroknasa lawê wî tune ye. Li gor hinek dîroknasên din lawê wî Darîus e. Dema serweriya wî bi mêjû û bi dîroka Medan ya vê beşê aloz û tevlihev e. Nezelaliyek di vê demê de heye û hetanî nuha jî nehatiye zelalkirin. Keçeke wî heye û navê wê Mandane ye. Wê demê Persî dibin serweriya Medan de dijîn. Astiyages xewnekê dibîne û ji bo vê xwena xwe keça xwe dide lawê prensê Persan Kambîses ku ew bi xweji qabîleya Ahamenîda ye. Kambîses lawê Qoreşê I (yekemîn) e. Armanca Astiyages ew e ku nebiyê wî nikaribe serweriya wî ji holê rake. Li gora xewna wî, wê ji keça wî re lawek çêbibe û wê ew lawik serweriya wî bidawî bîne. Lewra keça xwe dide prensê Persan û ji devera xwe bidûr dixe. Lê weke dîrokzan dibêjin nebiyê wî çêdibe. Astiyages dixwaze wî bikuje. Keça xwe, berî zaroka wê çêdibe wê tîne ba xwe û gava zaroka wê çêdibe jî, fermana kuştina wî dide. Navê zarok jî Qoreşê II (duyem) e. Lê serleşkerê wî Hapagos vî lawikî nakuje û radestî şivanê Medan dike. Duvra ew lawik mezin dibe û dibe bela serê Astiyages. Serleşkerê Astiyages alîkariya Qoreşê II dike û ew jî dibe padîşahê MED-PERS'an. çîroka wî dirêj e.[56]

Lê dîroknasê cihû Flavius Josephus û pirtûka pîroz Tewrat tenê bahsa Dariyus dikin. Li gora wan çavkaniyan Dariyus lawê Astiyages e. Dema Qoreşê II, yê xwarziyê Medan dibe serwer, wê demê bi Dariyus (Xalê Qoreşê II) ra li dijî Babîlan şer kirine. Dariyûs dibe padîşahê Medan yê devera Babîlê û Asûr. Ev dem dema federasyona Med-Pers e. Du padîşahê Med-Persan hebûne. Qoreşê II (Xwarziyê Medan) û Dariyûsê Medî (xalê Persan).

Dariyûs sîstema walîtiyê li Babîlê bi kar tîne û 120 waliya tayin dike. Dîroknasekî dinê jî dibêje, Dariyûs bi Qoreşê II re Babîl xistiye destê xwe. Mêjû bi texmînî sala 539'an nîşan dikin. Dariyûs alimekî cihû aniye ba xwe û kiriye serokê hemû waliyên Medan. Waliyan jî vê helwesta wî

56 Medya Krallığı, Doz, 2006, 1. Baskı, Prof. George Rawilinson.

qebûl nekirine û li dijî wî serî hildane. Ewî ev serhildan serkut kiriye û hemû walî û hevkarên wan kuştiye. Wî di vê demê de gelek filozofên Magû/î ya surgûnî Lidyayê kiriye. Lewra gelê Medî ji wî nexweş in. Ewan bawer dikir ku Dariyûs dev ji ola Magû/ Zaraduştî berdaye û bûye cihû. Lê weke tê gotin Dariyûs bi Ahûra Mazda bawer dikir lê bi Zaraduşt bawer nedikir. Li gora ku ez têgihîştime ewî bawerî bi ola Medan ya kevnare aniye û Zaraduştî qebûl nekiriye. Lê ev nêrîn jî ne zelale. Piştî mirina Dariyûs Qoreşê II (xwarzê) dibe padîşahê Med-Pers. Dema Medan weke serweriya dewletê bidawî tê. Medê biqasî 189 salan serweriya xwe domandiye. Lê di nava federasyona Med-Pers'an de weke serwerên herêma xwe dimînin. Li gor Herodotî guherîna serweriya dewletê ji aliyê gel ve nehatiye têghiştin. Di qada dewletê de Med-Pers weke hev serwer bûne û zilmeke berbiçav ji tû alî nehatiye.[57]

## Dema Med-Persan

Dema Med-Pers'an ji dema Qoreşê II em (Xwarziyê Medan) ve dest pê dike. Mêjû bi texmîni sedsala 539'an berî zayinê ye. Ev dem dema mirina kralê Medan yê dawîn Dariyûs e. Med û Pers bi hev re di nava federasyonekê de dijîn. Ji xwe di dema Dariyûs de Pers-û Med bi hev ve hatine girêdan. Loma jî dîroka wê demê aloz e. Axamenîd û Magî/û dibin merivên hev û her du gel nêzî hev dibin. Hemû Padîşahên Persan ji qabîleya Ahamenîda hatine û xwarziyê Medan'nin. Persî jî weke Medan qabîleyên Aryanî ne û ew jî ji aliyê Qafqasya yê hatine vê herêmê û li vir bi cîh bûne. Bi texmînî di sedsala 1450'yî berî zayinê de berê nêzî Ûrartû û Asûran bûne lê ji wan tirsiyane û berê xwe dane devera Elamiyan, Gotiyan û Luluyan. Li devera nêzî Elamê bi cîh dibin û bajarê Şûşê dikin paytexta xwe. Ev dem weke mêjû sala 685 a xuya dike.

Federasyona Med-Pers ji Asiya, Ewropa û hetanî Efrîka mezintir bûye. Di dema Darayos'ê III'yem de bi hatina Îskenderê Makadonî ve bi dawî tê. Mêjû berî zayinê 330 ye. Ez li Jêrê bahsa imparatoriyên berdewama Med-Persan hetanî dema me dikim.

---

57 Medya Krallığı, Doz, 2006, 1. Baskı, Prof. George Rawilinson û - Împaratoriya Med. Ayhanê Bêrtî, weşanxaneya Hanê 2008.

**Partî**

Gelê Part di demên pir kevin de weke beşeke eşîrên Skîtana ku ji wan re Parner(Parnî) hatiye gotin li der dora Xazarê dijiyan.

Ji vê deverê koçî Rojhilata Îranê kirine û ev herem ji xwe re kirine cîh û war.[58]

Weke tê zanîn berî Partî bêne vê herêma Kurdistan, Mezopotamya û Îranê, li vê herêmê şaristaniyên mezin Weke, Med, Pers, Babîl, Asûr, Elam hatibûn ava kirin û hatibûn rûxandin. Berî Part bêne herêma Med û Persan, gelên van deverana di şerê dijî makedoniya de westiya bûn. Herêm aloz û kavil bibû.

Hêza Partan bi xurtî beşdarî vê pêvajoyê bûye û li dijî Makedoniya dest bi şer kiriye. Partan di sedsala 247'an de berî zayinê bi ola Medan bawerî dianîn. Şerê wan û yê makedoniyan di sala 250'yî de dest pê kiriye. Bi serokatiya Arsakes I de di sala 247'an de berî zayinê dewleta xwe ya Partan ava kirine. Îrana îroyîn, Mezopotamya, û aliyekî Asyaya navîn xistîne destên xwe.

Împaratoriya Parta heta dawiya dewleta xwe bi Makedoniya re şer kiriye. Dema wê ya herî mezin di dema serokatiya Mitradates I deye ku ew di sala 171-138'an de weke serokê Parta serwer bûye. Ewî berevajî Med û Persan Iraq- Ktesîfone- kiriye paytexta xwe. Lê di sala 130 berî zayinê de di şerê dijî Grekiyan de, xaka xwe ya Medê û ya Mezopotamyayê ji dest berdaye. Lê Partî bi vê şikestinê ve dev ji şerê dijî Grekiya bernedane. Lê dewleta xwe berbi Asyayê ve fireh kirine. Di dema Mitradates II de ji Çînê hetanî Firatê xakeke mezin ketiye destê Partan. Demjimar sala 123 berî zayinê ye.

Di sala 57'an berî zayinê de serokê Partan Phraates III, ji aliyê herdû lawên xwe ve tê Kuştin û împaratoriya Partan di nava herdû lawê wî de perçe dibe. Lê Mitratades III ji aliyê birayê xwe Oroades II'yem ve tê kuştin û hemû xaka împaratoriyê dixe bin serweriya xwe. Orodes II ji nû ve dibe serokê hemû Partan.

Bi kurtî dîroka Partan weke li jorê hatiye nivîsîn. Gelek nivîskar, dîroknas û zimanzan Parta û Persan tevî hev dikin. Gelek ji wana Parta

---

58 Albrech Weber, Imparatoriyên Berî Zayinê, cilda duwem Weşanxaneya Hanê, 2009 Ayhanê Bêrtî. r..242

û Persan weke yek qewmî bilêv dikin. Ev bi xwe çewtiyeke dîrokî ye. Lewra ji bilî nêzîkbûna navên wan û belkî çend bêjeyên zimên pê ve pêwendiyeke Persan û Partan bi hev re tuneye. Gelek dîroknas Partan weke qabîleyên Aryaniyan nîşan didin. Xuyaye ev nêrîn jî raste.

Partan di dema serweriya xwe de elfebeya Medan û ola Medan bi kar anîne. Di nava Partan de pirensên Medan û Persan di herêmên xwe de jiyane. Dîroka Medan bandoreke mezin li ser vê herêmê kiriye. Ola wan, zimanê wan û elfebeya wan di nava Partan û Sasaniyan de bi berfirehî bi kar hatiye. Zimanê Partan yê ku îro em dizanin nêzî zaravayê Zazakî (kirmanckî) û hewremanî ya îro ye. Ji aliyê etnîkî ve ew jî Hindî Ewropî, Arayanîne û xuyaye yek ji beşa qabîleyên Aryaniyan e ku piştî demeke dirêj wana jî dane ser riya Med û Persan û berê xwe dane cîhê wan. Lê ev bi xwe tenê weke texmînekê heye. Zazanî yan jî Sasanî li gor hinek dîroknasa yek qewm in. Lê xuyaye ev ne rast e. Sasanî, weke tê gotin ji navê Sasan hatiye û ne Zazanî ye. Du teoriyên cuda nin.

Zimanê Parta yê fermî, ew zimanê li Îranê bi berfirehî hatiye bikaranîn e. Ango Pehlewî ye. Pehlewî yek ji zimanên şaxa Îranî ye. Lê hetanî niha weke etnîk, yên vî zimanê Pehlewî temsîl dikin kî nin, bi zelalî nehatiye xuyakirin.

Ango etnîkek bi serê xwe weke etnikekî homojen nikare li vî zimanî xwedî derkeve. Lewra zimanê Pehlewî û Farisiya li ser çermî hatiye nivîsîn ji bilî hinek gotina pê ve pêwendiyeke lungîstîkî tune ye. Zimanê Pehlewî zimanê Parta yê zikmakî ye. Lewra weke îro Faris xwedî li ziman, nasname û çanda pehlewî derdikevin û nasnameya Farisî weke berdewama Parta nişan didin, ne raste. Ango Pers û Part du qabîleyên cuda ne û çênabe etnîkek berdewama wan herdûyan be. Loma jî nasnameya Farisî nasnameyeke aloz û tevliheve.

### Sasanî

Serweriya Partan ji aliyê Sasanî ve bi dawî hatiye. Sasaniyan xwedî li ziman û bermayên Parta kirine. Îran jî weke nav tê gotin ku di dema Sasaniyan de bi kar hatiye. Nasnameya Sasaniyan weke îmaparatoriyên berî xwe bi nasnameya zaraduştiyê ve fermî bûye.

Sasanî li der û dora Ûrmiyê di nava Partan de bicîh bibûn. Di sala 211'an ya piştî zayinê de bi serokatiya Ardeşêr yê I'em ve dijî împaratoriya Partan serhildan li dar xistine û împaratoriya Partan bidawî anîne. Li gor baweriya dîroknas Erich **"împaratoriya xwe bi nave "împaratoriya Zazanî" di sala 226'an de ava kirine û împaratoriya Partan jî bi vî awayî bi dawî hatiye.**[59] Îro bo navê Partan tu qewmek li dinyayê tuneye. Lewra lêkolînerekî Kurd bi nave Qedrî Mamoste (Kadrî Yildirim), zimanê Sasaniyan yê fermî, yê dewletê, Kurdiya Feylî nişan dike. Min ev belgeya Qedrî Mamoste li jorê nivîsiye. Naxwazim careke din binivîsînim. Lê bawerim zimanê Sasaniyan û yê Partan dibe weke Xoce dibêje zaravayê Kurdiya Feylî be lê bawerim bêtir nêzî zaravayê zazakî û hewremanî ye û ne dûr e ku Zazakî ya kevn bi xwe be. Lê zimanê Sasaniyan weke zimanê Pehlewiyan cîh girtiye. Devjenî li ser zimanê pehlewî ye. Weke tê gotin pehlewî ji Farisiya îro bêtir nêzî hewremanî û Zazakî ye. Lê weke min li jorê jî aniye zimên evana tenê texmîn in. Lewra ji Partan, Medan û Persan bêtir li ser Sasaniyan belge henin. Lê ev belgeyên henin jî ji aliyê dîroknasên Farisan ve hatine tahrîb kirin. Belgeyên îro henin ne li gor îhtîşama Sasaniyan e. Dîroknas vê rewşê bi destêwerdanên Erebên Misliman ve girê didin. Ango dibêjin Mislimanan belgeyên Sasaniyan ji hole rakirine.

Belgeyên îro yên rewşa Sasaniyan tînin zimên bêtir, belgeyên ji destê duyem ve û bêtir ji orîjînalên berhemên Hindîstanê hatine tercumekirin û hatine tahrîbkirin, gîhiştine serdemiya me. Zimanê Sasaniyan ku weke Pehlewî tê binavkirin, weke cisrekî di nava Persî û Farisiya nuh de, weke Farisiya navîn tê bilêv kirin. Bi vî zimanî hinek belgeyên bi alfebeya Aramî hatine nivîsîn, weke agahdariyên Attar dide, gîhiştine heta dema me. Belge û berhemên di dema Sasaniyan de hatine nivîsîn, Avesta jî di nava wan de bi dehan berhemên bingehîn ji orijînalên Hindî, di serdemiya sedasala 9'an de ji nuh va hatine tercume kirin û hatine nivîsîn. Ev hemû berhem weke berhemên Pehlewî hatine binav kirin. Pehlewîne yan jî Hindî ne ew bi xwe mijareke bingehîn e...

59 Erich Kettuhoten, Imparatoriyên Berî Zayinê, cilda duwem Weşanxaneya Hanê, 2009 Ayhanê Bêrtî.

**Samanî; destpêka nasnameyeke nû**

Dewleta Samanî (874-1000) bi beşdariya Ereb, Sogd, Part, Kurd, Tacik û bi dehan etnîkên din, hatiye avakirin û dewleteke pirçandî ye. Nasnameya Samaniyan ango nasnameya dewletê ne bi navê etnîkekê bikar hatiye. Di Brokrasiya dewletê û di dîwana dewletê de Pehlewî bi hêz in lê dewlet ne ya Pehlewiyan e. Zimanê Farisî bi kar anîne lê ziman tenê têra dewleteke etnîkî nake. Di dema Samaniyan de Kurdan ji bilî beşdariya dewleta Samanî bibin, dewletên xwe jî avakirine. Dewleta Husnewî (961-1015) yek ji wana ye. Di bin serokatiya xanedana Berzikaniyan de, berê li Kermanşa (Karmasîn-Kurmanca) dû re jî li Kurdistanê bi berfirehî cîh girtiye û dewleta xwe ava kiriye.

Dewleta Şeddadî: Li der û dora Gêncê, Aran û Aniyê dewleta xwe ava kirine. (951-1174) Li Başûrê Kurdistanê û li herêma Luristanê Annaziya dewleta xwe ava kirine. (1008-1114)

Her wiha gelê kevnare Buveyhî ku dawî li Iraqê bi cîh bûne û weke gelê kevnare yê Mezopotamyayê têne qebûl kirin, di nava salên 932-1052'an de li bakurê rojava û başûrê Îranê serwer bûne. Her wiha li Aliyê Ezarbeycanê, Gilanê, Hazarê jî gelên cuda serweriya xwe di vê demê de domandine.

Weke li jor jî xuya dike li ser xaka Îranê ya wê demê ne tenê Samanî hebûn. Lê Samaniyan ji Tacik-Farsa, Tatar û gelek gelên din, li dijî Abbasiyan, bi nasnameyeke hevbeş serî hildane û bi hevra dewleteke têkel ava kirine. Serkêşên vê dewletê bi zimanê Farisî diaxivîn û dîwan û brokrasiya dewletê bi rê ve dibirin. Lewra zimanê Farisî ne weke zimanê yek etnîkekî lê weke zimanê ferhengî xurt bû û loma jî farisî weke zimanê dewletê bikar hatiye anîn. Evê hêzê, bi dehan etnîkên cuda di nava Tacik-Farisî de bi cîh kirine. Di nava wan de, Sîstanî, Hindî, Kurd, Ereb û Azerî hebûne. Dema Samaniyan yek ji wan demên geşepêdana ziman û çanda Tacik-Farisî ye. Weke berê jî min nivîsiye Firdewsî yek ji wana ye.

Weke tê zanîn, Persîs-î Bastan, Furs-î Qedîm yan jî, Fûrs-î Hahamenîşî, ango Persiya Qedîm, di dema Hahamenîşiyan de berî zayinê 550-331,weke zimanê dewletê di asteke bilind de bi kar hatiye û bûye zimanê çandê. Ev ziman ji Tacik-Farisî û ji Farisî ya nû cudatir e û

pêwendiyeke wan, ji bilî kêmbêjeya pêve tuneye. Van zimanên qedîm ne weke zimanê etnîkî, ango etnîka Faris hatiye bikaranîn.

Farisiya nû, ji şaxa zimanên Sogdî û Hotanî ku weke lehçeyên Asyaya navîn têne qebûl kirin, derketiye holê. Farisiya nû di bin bandora Tacikî de maye û di dema Samaniyan de jî bûye zimanê dîwanê û Sarayê. Weke çavkanî jî, bi zimanê tacik-farisî di dema Samaniyan de, bi zimanê Farisî helbest hatine nivîsîn. Ebû Hafsî Sogdî (ji Sogdî ya ye), Ebu-l Abbasî mervazî (Yehûdiyê–Misliman e). Di vê demê de Farisî di bin bandora Erebî-Îslamî de maye, elfabeya erebî bi kar aniye û ji Farisiya çermî bidûr ketiye. Di sedsala 13'an de nêviyê Farisî êdî erebî ye û bi awayê lingustî jî ji Farisiya kevn bi dûr ketiye.

Hetanî îro, li Îranê, weke nimûne, hêzeke bi navê Farisî, bi çand û folklora Farisî bi awayên sosyolojîk hatibe qebûlkirin tuneye. Weke Attar Haşimzade dibêje." Heta îro li Îranê tenê gundek jî bi nasnameya Farisî nehatiye dîtin.

## Piştî Med-Persan, Kurd

"Kurdistan piştre di nava van şaristaniyana de cîh girtiye. Part berî zayinê 247 û pistî zayinê 226. Sasanî, pistî zayinê, 226-636. Xelifeyên Ereban, pistî zayinê 636-1258. (Herwiha Selçûkiyan N.A), Moxoliyan û Tirkmen (Tatarî.N.A) piştî zayinê 1258- 1509. Dûre di nava dewleta Osmaniyan û Sefawiyan de cîh girtîne."

"Navê *Gordyene* ku bi maneya Kurdiyan yan jî Kurdan ve tê şîrovekirin, îdîayên ku xwediyê vê xakê ne (Kurdistan) bihêztir dike. (Gelek dîroknasan vî navî weke karduk, kardoxiyan jî binav kirine, N:A.) Dagirkerên Romî, Partî û Yewnanî vegeriyane vê derê û careke dî li van newal û deştên bê merhamet têk çûne. Ew gelê bi sembolên weke serhildan, cesaret (Mêrxasî) û hestên kovî ve têne nasîn, (Kurd) ku xwedî vîn e û tu caran ji aliyê gelên demî (muweqet) ve nehatiye zeptkirin, ecêb e û xerîb e ku bi xwe negîhiştiye asta wan gelan, Bêgûman ji bilî Medan".[60]

---

60 *Mezopotamya ve Kurdistana Gizli Yolculuk*, Avesta Yayınları. 2007-E.B Soane. r. 77, Soane ji destpêka sedsala 1907 an heta 1913 an Li Kurdistanê Geriya ye. Yek ji serleşker û dîplomatên Ingilîz e ku di 1913an de weke Cîgirê Konsolosê Ingilîstanê yê Kasrî-Şîrîn kar kiriye. Pirtûka xwe li ser Kurdan

Li gor van ramanan, berî zayinê heta 550'yî li Mezopotamyayê û li Iranê Medan hukum dikirin. Hukmê Medan di dîrokê de weke împaratoriya herî mezin tê binav kirin, weke dewleteke Kurdî jî tê nasîn. Persî di vê demê de di nava dewleta Medî de weke eşîran bi serokatiya Ahamenîda ve dijîn. Dema Persan ya herî girîng di dema dawiya dewleta Medî ya dema Dara (Dariyûs) yê yekemîn de ye.

Hukmê Medan di dema Dara (Darîûsê III) yê Axamaenîdî de bidawî hatiye. Lê Med ji holê ranebûye. Med bi ziman, ol û qabîleyên xwe ve di nava Ahamenîda de mane û gelek caran jî li dijî Ahamenîdan serî hildane. Di dema Dara û kurê wî Xerxez de ola Zaraduştî lawaz bûye. Lewra Darayê Axamenîdî dest bi zilma li ser Magûyan kiriye (Magû prensê Medan bûne) û dema Xerxez jî bûye dema koç beriya Ezîzên ola Zaraduştiyan ango Magûyan. Hemû Magûyên (Mazdî, Mîtharî, Daeva-Yasnî) ji ber zilma Xerxez koçberî Anatolya yê, Mezopotamya yê, Kapadokya yê û Lidyayê kirin."[61] Ev cara duyem e ku filozofên Magû/î bi surguna çandî ve rû bi rû mane. Lewra Ola Zaraduştî ango ola Bahdînî li Medya di bin serweriya Ahamenîda de lawaz bû û hate guherîn. Xerxez û brokrasiya Ahamenîda êdî bawerî bi ola Medan ango Bahdînî nedianîn û dijî vê olê helwest werdigirtin. Xerxez bi Ahura Mazda bawerî dianî lê dijî Zaraduşt bi helwest bû. Ewan Mazdî weke ola Bahdînî (Navê Magûyan yê naskiriye N.A) didîtin û dijî wan derdiketin. Vê helwesta Xerxez dibû sedemê şer û pevçûnên navbeyna Mazdan û Ahamenîdan. Vê dijberiya Persan ya dijî Magû/î ya hînê ji dema Dariyûsê Medî ve dest pê kiribû û heta dawiya împaratoriya Med-Persan berdewam kiriye.

## Pehlewî Kîne û kengî derketine rojevê

Berî ez dest bi Pehlewiyan bikim dixwazim bi kurtî li ser dîroka berî wan rawestim. Împaratoriya Sasanî di dema Yazdgerd yê sêyem (III) de, ji aliyê xelîfeyên Îslamî ve bi dawî hatiye. Umayyadî sed salî li ser xaka Sasaniya serwer dimînin. Erebî dibe zimanê dewletê û Îslam

---

û li ser toreya wan ava kiriye. Ev pirtûk rewşa Kurda ya dema beriya şerê cîhanê yê yekem xweş tîne zimên.

61 Siraç Bilgin, berhema navborî, r.149

dixe cîhê Zaraduştiyê. Bi van herdû bûyera ve pêvajoyeke nû li Îranê û li Kurdistanê dest pê dike. Lê gelên Îranê çanda xwe û zimanê xwe bi kar tînin û li dijî zilma Umeyyediyan radiwestin. Lê di vê demê de jî koçberî çêdibe. Sala 750 p.z. Umayyediya hemû xaka dagirkirî ji dest didin û Abbasî cîhê wan digrin û xelîfetiyê ji wan distînin. Pêwendiyên Abbasiyan û Sasaniyan pir xweş bûye. Abbasiyan paytexta xwe birine Îranê, bajarê Mervê. Di wê demê de bi serokatiya Al Mumîn, di sala 819'an de Samaniyan (Faris dibêjin ew berdewama Samaniyan e) xanedana xwe dadimezrînin. Piştî dagirkeriya Îslamê, cara yekem bûye ku Sasaniyan li Îranê careke din xanedane ke xwe ava bikin. Samanî zimanê xwe û çanda xwe bikar tînin. Firdewsî, wê demê Şahname'ya xwe dinivîsîne sal (1008 e). Firdewsî pirtûkên xwe bi zimanê Tacikî nivîsî ye û ne bi zimanê Farisî. Îro Tacik bi Firdewsî serbilindin û wî weke destpêka netewayetiya xwe binav dikin. Lê şovenîstên Farisan vê rastiyê ji raya giştî re vedişêrin. Ew bi xwe Tacikîstan, Efganîstan û Îranê weke Nîştîmana Farisan binav dikin.

Piştî Samaniyan Selçûkî têne vê herêmê û ji sala 1037'an heta 1219'an li ser vê herêmê serwer bûne. Piştî Selçûkiyan jî Moxol û Tatar hatine vê herêmê. Di dema Ak-koyuniyan de Şah Îsmaîl ji aliyê Ezarbeycanê ve dest bi şer dike û xanedana Ak-koyuniya bi dawî tîne. Dema Sefawiyan dest pê dike û dewleta Qaçar-Sefawî mezin dibe. Îran, Iraq, Afganîstan,Kurdistanê dixin nava împaratoriya xwe. Osmanî dijî wan radiwestin û bi şerê çaldiranê yê 1514 a ve berdewam dike. Dema Sefawiyan heta sala 1722'an berdewam kiriye.

Di sala 1722'an de Petroyê mezin yê Rûsî Îran dagir kiriye û Osmaniyan jî alîkariya Rûsan kiriye. Di dema Nadir Şah ê Qaçarî de serweriya Sefawiyan bi dawî tîne û dema Qaçaran dest pê dike. Dema wan heta sala 1921'ê dewam dike.

Di sedsala 1795'an de, Axa Muhammed şah Qaçarî, li tevayî ya Îranê serwer bû. Lê di şerê bi Rûsyayê yê di salên 1804-1813'yan de bi peymana Gulistanê û di şerê salên di 1826-1828'an de bi peymana Turkmençayê ve lawaz bûbû û li her derê Îranê tevgerên guherparêz bihêz dibûn.

Di wê demê de, di dawiya sedsala 19'an de, li Îranê sê hêzên bingehîn hebûn:

1-Hêza demokrat ku ji hemû etnîkan pêk dihat hêza sereke û ya bihêz bû. Heta dawiya xanedana Qaçaran, îdareya dewletê di destê

vê hêzê de bû. Bi alîkariya Îngilîzan ve serweriya xwe didomand. Di sala 1920'an de ev hêz bû du serî. Nakokên navbeyna vê hêzê bi du şêweyan dihate bilêvkirin. Hêza yekem, dewleta Îranê weke dewleteke pirneteweyî, pirolî, pirzimanî û pirçandî dianî zimên û dixwest bi vî awayî bidome. Dr.Musadiq ku serweriya wî weke serweriya lîberalên demokrat dihate bilêvkirin, berdewamiya vê hêzê bû.

Hêza duyem jî Panfarisî bû û hemû etnîkên Îranî weke yekneteweyî ya Faris bi navdikir.

2-Hêza olperest bû. Ew jî bi du beşan ve dihate binavkirin.

a)Hêza yekem Îslamên lîberal bûn. Yekîtiya hêzên Îslamî diparastin. Ev hêz dijî serweriya Îngilîzan radiwestiyan û di şerê cîhanî yê yekem de li ba Osmaniyan û Elmanya cîh girt.

b)Hêza duyem jî hêza Ulemayê şîia bû. Bi şoreşa 1905-1911'an ve lawaz ketibe jî dîsa bingeha şoreşa Îslamî ya 1979'an ava kiriye.

3-Hêzên sosyalîs û demokrat bûn. Sosyalîstên wê demê di bin sîwana Partiya Dadwer de civiyabûn ku dawî weke partiya Tudeh dihate binavkirin û bi ser Moskowa bû. Ji nava vê hêza sosyalîs bi dehan tevgerên çep derket. Hêza duyem jî xwe weke neteweperest bi nav dikir û dijî Ingilîz û Rûsan hevalbendiya Elmanan dikir. Piştî pêwendiyên Kemalîstan û Bolşewîkan bicîh bû, ev hêz bêyî alîkariya derve ma û ji holê rabû.

Di wê demê de hêzên sosyalîst yên bi ser Bolşewîkan ve li Ezarbeycanê, li Gîlanê, li Hazarê û li Kurdistanê jî bihêz dibûn. Lê hêzên sereke ku qedera Îranê di destên wan de bûn yên li jorê hatine nivîsîn.

Di nava vê tevliheviya siyasî, aborî û ewlekariyê de, di sala 1921'ê de, bi darbeya dewletê ve, li Îranê, Ingilîz û Rûs bêtir bihêz bûn. Serweriya dewleta Qaçarî lawaz bû û di demeke kurt da hate rûxandin. Herwiha bi vê darbeyê ve garantoriya Bolşewîkan li ser Îranê hatibû qebûlkirin. Lê Îran bi tevayî di bin hêza Îngilîzan de bû. Nakokiyên Îngilîzan û Rûsan li ser serweriya Îranê didomand. Di 1923'an de bi destê Ingilîz û Rûsan ve hukumeta Seyid Ziyaedîn hate avakirin. Ziyaedîn weke yek ji damezrênerên tevgera Panfarisî tê zanîn.

Cara yekem Riza Pehlewî, weke wezîrê şer (parastinê) beşdarî avakirina hukumetê bû. Di 1923'an de Riza Pehlewî, bû serokwezîr. Di

1925'an de jî weke xanedana Pehlewiya hate ser hukum û xwe weke Şahê Îranê binav kir. Ji wê demê û virde li Îranê prosesa Panfarisî weke îdeolojiya dewletê ya fermî bi alîkariya Îngilîzan ve dest pê kiriye û bûye sedemên bingehîn yê avakirina netewe-dewleta Farisî.

Weke min li gelek cîhî bilêv kiriye, zimanê Farisî di 1930'yî de bi destê nîjadperestên Farisî, Riza Pehlewî ve weke zimanê fermî yê dewleta, netewe-dewleta Farisî bi cîh bûye.

Zimanê Farisî yê ku di wê demê de hate fermîkirin, weke lehçeya Tehranê binav dibû. Ev lehçe dûrî zimanê Tacikî-Farisî ye û orijîna xwe wenda kiriye. Lewra Tehran, hînê di dema Qaçaran de ji 1897'an ve, weke paytexta dewletê û herwiha weke navenda çand û siyasetê bû. Bi vî awayî jî zimanê Tehranê bûye zimanê fermî yê Îranê.

Di dawiya sedsala 1900'î de li Îranê di nava xanedana serwerên Îranê yên Qaçariyan de nexweşiyeke siyasî dest pê kiribû. Weke tê gotin dewleta Qaçariyan dewleteke pirolî û pirneteweyî bûye. Gelek dîroknasên Tirk vê xanedanê weke xanedaneke Tirk bilêv dikin. Dibêjin bidawîhatina vê xanedanê serweriya Tirkan li Îranê bi dawî bûye. Nivîskarên Tirk ne tenê Qaçariyan lê hemû şaristaniyên vê deverê weke şaristaniyên Tirkan dibînin û li pênûsê didin. Weke nimûne Ezarbeycan.

Tirk dibêjin "yek netewe du dewlet". Dereweke bi terriye. Zimanê Azeriyan yê îro, ne zimanê wan yê dîrokî ye. Ev ziman dawiyê ji Moxola derbasî Azeriyan bûye. Zimanê Azeriyan yê Îro, ji Moxolî, Farisî û Kurdî ve pêk hatiye û pêwendiyeke vî zimanî bi zimanê Azeriyên (atropatan) dîrokî ve tuneye.

Prof.dr. Attar Haşimzade di pirtûka xwe ya bi navê hunandina etnîkên Îranê di rûpela 258'an de wiha dibêje : "Zimanê Azerî ji şaxa zimanê Pehlewî lê ji zimanê Pehlewî cudatir, weke zimanekî herêmî yê gelên vê navçeyê, bi piranî yê gelên Tatî hatiye bikar anîn. Bi vê rewşa xwe ve tu pêwendiya zimanê Azerî û tu pêwendiya navê Azerî, ne ji dûr û nejî ji nêz ve bi Turkan û bi zimanê Tirkî ve tuneye." Herwiha Attar, di rûpela 231 an de jî wiha dibêje:" Ezarbeycan bi maneya erdnîgarî ve, navê beşa xakekê ye û ji aliyê etnîkî ve bi Tirkan re tu pêwendiya wê tuneye"

Di dema Nadir şah de, ji aliyê mistek "zimanzan"ên Farisî ve, Zimanê Azerî weke "Zeban-î Turkan" hatiye bilêv kirin. Mistek zimanzanên Îngilîzan jî vê çewtiya Farisan weke rastiya zanistî bikar anîne û ew çewtî heta îro didome. Bi vî awayî jî Azerî weke lehçeya Tirkî hatiye nasîn. Ango ev çewtî bêyî ku li ser bi kûranî bê lêkolîn, ji destekî radestekî din bûye. Bingeha berfirehbûyina vê çewtiyê jî, zimanzan û dîroknasên Tirkan û yên nezan yên Ewropiyan bi xwe nin. Bingeha zimanê Azerî yên îro bi derewan hatiye nivîsîn û bi derwan jî di nava zimanzanên cîhanê de belav bûye. Ango derewa Azeriyan jî weke derewa Qaçariyan bi destên van dîroknasan ve hatiye nivîsîn.

Di dema Qaçariyan de li herêma Kurdistanê û li herêma Ezarbeycanê tevgerên milî dest pê kiribûn, herwiha li Gilan û li Kaspiyan jî tevgerên mezin derdiketin rojeva siyasî. Îran di bin serweriya Qaçaran de, di nava kirîzeke siyasî de derbas dibû. Îran di bin hîmayeta Îngilîzan de li dijî wan tevgerana şer dikir. Hinek hêzan ji Osmaniyan alîkarî werdigirtin û li dijî Îngilîzan şer dikirin. Lewra Osmaniyan destê Elmanya digirt û dijî helwesta Ingilîz û Rûsan radiwestiyan.

## Ber bi şerê cîhanî ve Îran

Hînê di sala 1850'yî de bi destê dewletê ve xwendevan diçûn derveyî welat. Xwendevanên Îranî li derveyî welat tevgerên Masonî nas dikin. Tevgera yekemîn ku tevgereke Masonî ye û bi ser Îngilîzan ve hatiye avakirin, "Cemiyeta Ademî" ye. Damezînerê wê Mîrza Xan e û bi xwe Ermenî ye. Li derveyî welat, û li welatê Osmaniyan, tevgerên Îranî pirtûk û rojname derdixistin û li Îranê belav dikirin. Di 1895'an de Osmaniyan bi Îranê re li hev kirin û gelek ji wana radestî Îranê kirin. Hêzên Masonî li Îranê bihêz dibûn. Ji gelek etnîkan hêzên têkel dihatin avakirin. Hêzên sosyalîst jî dijî dewletê serî hildidan. Salên 1905-1911'an Îran dibe cîhê serhildanên mezin. Şah makzagona dewletê derdixe û meclîsa dewletê tê avakirin. Monarşiya makzagonî bicîh dibe. Lê şerê navxweyî didomîne. Di nava vê aloziyê de Îran beşdarî nava şerê cîhanî bû. Îran bê layan ma lê hêzên alîkariya Îttîhadên Tirkan û Elmana dikirin li her derê Îranê, ku hêzên sosyalîst jî di nava wan de hebûn, li dijî Rûs, Ingilîz î Fransizan serî hildidan. Rûs û Îngilîzan ev rewşa Îranê dijî berjewendiyên xwe bi nav dikirin û dijî van hêzan radiwestiyan. Piştî şerê cîhanê Ingilîz û Rûsan bi

darbeya dewletê ve Îran dagir kirin û dijî hêzên bi ser Osmanî û Elmanya ve rawestiyan. Masonên Îngilîzan ji van hêzan, hêza Farisî axêv girtin û alîkariya wan kirin. Amadehiyên Masonan hînê ji salên 1890'î ve dest pê kiribû. Bingeha etnîka Farisî li Îranê bi hêz dibû. Di dawiya sedsala 19'an de xebata Farisîtî êdî radestê entelektuelê Îranî kiribûn. Di nava wan de ji etnîkên din jî takeks hebûn. Hêzeke têkel bû û bi Farisî diaxivîn. Weke tê gotin heta destpêka sala 1979'an, dewleta Îranê di bin serweriya vê hêza Masonîde bûye.

Di sala 1921'ê de xanedana Qaçarî û hukumeta wê berevajî daxwazên Îngilîzan tev liviyan û ev jî bû sedema darbeya leşkerî ya Îngilîzan dijî xanedana Qaçarî. Qaçarî yek ji avakirê dewleta Safewî têne qebûl kirin. Qaçarî ev dever di 1795'an de xistine destê xwe û şerê wan û Rûsan û dû re jî yê Îngilîzan dest pê kiriye. Ev xanedan di sala 1921'ê de ji aliyê Îngilîzan ve bi alîkariya Rûsan ve hate rûxandin. Ev rûxandin bû destpêka netewayetiya Farisî. Netewayetiya Farisî bi navê. Pehlewîtiyê derketiye rojeva siyasî û xwe weke berdewamiya hemû şaristaniyên vê deverê bi lêv kiriye. Ciyê gotinê ye ku nasnameya Pehlewî ji aliyê Îngilîzan bi xwe ji nuh ve alîkariya hêza Masonên Îranî kiriye û şah derxistine pêş.

Di sala 1920'an de hêzên demokrat û netewî yên cûda ji bona Îraneke hevbeş têdikoşiyan. Lê piştî ruxandina xanedana Qacarî, hevkarên Ingilîz û Rûsan xanedana Pehlewiyan ji bona Îraneke Farisî têdikoşiya û ev jî dibû sedemên şer û pevçûnên cûr be cûr. Di vê demê de ulema ya Îranî jî weke hêza sêyem xurt dibû û li gelek cîhî weke hêza yekem xuya dikir. Ulemayê olî li Îranê cîhê gotinê ye ku "di şerê yekemîn de li ba Osmaniyan û Elmanan cîh girt û li dijî Rûs û Îngilîzan şer kir."[62]

Riza Xan bi şîara avakirina dewleta komarî ve dest bi siyasetê kir lê dawî, xwe weke Şahê Îranî û Pehlewî bi nav kir û xwe weke Şah destnîşan kir. Şah di kiryarên xwe de alîkariya Îngilîzan wergirt. Di vê demê de ya herî balkêş ku Şah Pan-Îranîzmê weke Pan-Farisiyê bi şowenîzmeke dijwar dewlet bi rê ve bir. Pan-Farisî bû îdeolojiya

62 *İran'ın Etnik Yapısı, Yakın dönem ve günümüzde*, Prof.Dr.Aygün Attar (Haşimzade) Ankara 2006. Divan Yayıncılık, r.91

dewletê. Vê helwesta Pehlewiyan li dijî statuya Îranê ya ku bi sedsalan hatibû hunandinê bû. Lewra heta wê demê Îran weke dewleteke pirneteweyî ku bi dehan netewe û etnîkên cûda ve dihate hunandin, êdî weke dewleteke navendî bi şoveniya etnîka Farisî û bi taybetî bi alîkariya Îngilîzan ve ji nû ve dihate vejandin. Ango dewleteke pirçandî, pirneteweyî dihate rûxandin, û dewleteke nîjadperest ango netewe-dewlet dihate avakirin.

"Şah Riza Xan, weke leşkerekî Ingilîzî li Gîlanê dijî tevgerên neteweyan û yê komunistan şer kir. Nezan bû, ji ber ku ne xwendevan bû. Ji aliyê îstixbarata Îngilîzan ve du salan weke dostê Ingîltereyê hate perwerdekirin. Di dema hukumeta Seyid Ziyad de pêwendiyên hukumetê û Îngilîzan ne xweş bû û vêya jî rê ji şah re vekir. Piştî serokwezîriya wî di sala 1923'yan de, gava mezin di sala 1925'an de avêt. Şah parlemen civand û parlemena Îranê ya wê demê, wî weke Şahê Îranê binav kir."[63]

Hooman Majd, di pirtûka xwe ya bi navê "Du ruyê Iranê" de, di rûpela 155'an[64] de vê mijarê tesdîq dike û wiha dibêje; "Riza Şah Pehlewî, weke serokê dawîn yê xanedana Qacariyan, serleşkerekî nezan (cahil) bû û nikaribû binivîsîne û bixwîne. Heyranê Elmanyayê bû, ewî Elmaniya ji bo Rojhilata Navîn ji Ingilîz û Rûsan baştir didît. Ewî nasyonalîzma Hîtler diparast û miroveki faşîst nasyonalîst bû.(Nasyonalîstê Fars).

Navê Îranê weke "ÎRAN" hînê ji dema Sasaniya de heye. Ango welatê Aryaniya, di sala 226'an berî zayinê de ev nav bilêv bûye. Di 1936'an de Pers-Fars, bi Îranî hate guheztin û bala Elmanan kişand. Lê vê mijarê qet bala Îraniyan nekişand, lewra Îran ji bo Îraniya herdem Îran bûye. Tenê misteke bazirganên Farsa vî navî weka Pers-Fars bi kar anîne."[65] Di "Du rûyê Iranê" de, di rûpela 155. Hooman Ji bo Ayetullah Xumeynî jî wiha dibêje:

---

63 Berhema navborî r.94

64 The Ayatollah begs to differ - The paradox of modern Iran. Irans Dubbla Ansikte. Hooman Majd. 06/10-2010. Ordffront Förlag-Sverige. r.155

65 The Ayatollah begs to differ - The paradox of modern Iran. Irans Dubbla Ansikte. Hooman Majd. 06/10-2010. Ordffront Förlag-Sverige, r.155

Di destpêka sedsala 1800'î de bavê Ayetullah Xumeynî ji Hindîstanê kocberî Îranê kiriye. Ronakbîr û entellektuelên ji wî hez nakin, dibêjin ew ne Îranî û ne jî Fars e. Hinek ji wan kesan jî wî weke "kesê xwîna wî ne pak" wî weke "Hindî" bi nav dikin û weke ajanê Îngilîzan bilêv dikin. Weke Sedem jî, serweriya Îngilîzan li Hindîstanê nîşan dikin. Lewra navê kalê wî bi xwe Hindî bûye.[66]

Piştî vê helwesta Şahê Pehlewî li Îranê hemû etnîkên cûda bi etnîka Farisî ve dihate girêdan û bi vî awayî jî %80 serjimar ya etnîkên cûda dihatine inkar kirin. Di vê helwesta Pehlewiyan de siyaseta avakirina dewleta neteweyî (ya yek neteweyî ) sereke ye.

Di sala1921'ê de peymana bi Sovyetê re pêk hatibû, mafê destêwerdana Îranê dida Sovyetê. Lewra garantoriya Sovyetê li ser Ezarbeycanê û Kurdistanê hebû. Li dijî her destêwerdaneke leşkerî mafê Sovyetê yê midaxeleyê hebû. Lê bi gelemperî serweriya Îngilîzan li Îranê xurt bû.

Di vê demê de Pehlewiyan di avakirina netewe-dewletê de gavên mezin avêtin. Yek ji wan jî di sala 1930'yî de hate avêtin ku zimanê Farisî weke zimanê dewletê yê fermî bi yasayî hate qebûlkirin. Di qada Mediya û di perwerdeyê de ji bilî zimanê Farisî, hemû zimanên cûda hatine qedexekirin. Di vê pêvajoyê de hemû neteweyên cûda diviya bû xwe bi nasnameya Îran-Farisî bianîna zimên.

## Ji bo çi Îngilîzan alîkariya Farisan kiriye

Ji sedsala 1700'î heta sala1800'î locayên FraMasonî( Mason) li Hindistanê kar kirine û bingeha serweriya Îngilîzan ava kirine. Berî van loceyan mîsyonerên Ewropiyan dihatin vê deverê lê projeyên ciddî pêşkêş nekiribûn. Serkêşên van loceyan kesên sermayedar bûn. Bi dehan loceyên Masonî ava kiribûn û berê xwe didan welatên musilmanan. Bingeha van loceyan li Ingîltereyê hatibûn avêtin û li cîhanê belav dibû. Armanca sereke ya van loceyên Masonî bicîhkirina serweriya sermayedariya Îngilîzan e. Loceyên Îngilîzan li Hindîstanê bi hêz bûn. Dixwestin vê hêza xwe berbi dewletên Islamî ve bibin. Gelek balkêş e ku yekemîn hêza musilmanan ya bi Masonan re xwestiye kar

66 Berhema navborî r.161

bikin, hêza Pehlewayan ya Farisan e. Loma jî pir bi asanî mirov dikare bêje bingeha edebiyata Farisî Hindîstan e û li Hindîstanê ji loceyên Îngilîzan e.

Balkêşe ku Pehlewiyan bi hemû dagirkerên Îranê re hevkarî kirine. Gava Selcûqî hatine vê herêmê bi Samaniyan re (Pehlewî xwe berdewama wan xuya dikin) hevkarî kirine, Gava Rûs hatine bi wan re hevkarî kirine, Ingilîz hatine bi wan re hevkarî kirine, di şerê cîhanê yê duyem de jî bi Elmanyayê re hevkarî kirine. Herî dawîn jî bi Emerîkayê re hevkarî kirin. Weke tê dîtin vê hêza Pehlewiyan xwe weke hêzeke dereke, biyanî dîtine û bi hevkariya biyaniyan re li Îranê serweriya xwe berdewam kirine. Li vê derê minakên Tirkan, Ereban û Farisan nêzî hev in.

Cara yekemîn bi Farisiya îroyî di sala 1780'yî de li Hindîstanê van loceyan pirtûk derxistine. Di wê demê de li Îranê bi Farisî pirtûkên ferhengî nehatine çapkirin. Mîsyonerên Ewropiyan nemaze yên Îngilîzan li Hindîstanê hêzên Persî, Medî, Partî, Sasanî nas kirin.

Evana Zaradûstiyên ji êrîşên Ereb-Islamê reviyabûn û çûbûn Hîndîstanê. Hêzeke mezin bûn. Tê gotin ku evana bi xwene yên Avesta ji nûve dane hev. Li vê derê dixwazim perantêzekê vekim û bi çend gotinan dawiya dewleta Sasaniyan bînim zimên.

"Zimanê dewleta Partan yê fermî ku wê demê li Îranê bi gelemperî û berfirehî hatiye bikaranîn, weke zimanê Pehlewî tê binavkirin. Pehlewî yek ji zimanên Îranî ye, lê zumreya ku bi vî navî xwe binaskirin dide, ne weke zumreyeke homojen tê xuyakirin. Lewra zimanê Pehlewî û Farisiya li ser çerm hatiye nivîsîn ji bilî çend gotinên hevbeş pêve tu pêwendiyên wan tuneye."[67]

Dewleta Sasanî ji aliyê hêza Islam-Ereb ve di sala 648'an de bi dawî hatiye. Lê heta sedsala 11'an jî di nava xwe de bi azadî him zimanê (Kurdiya Feylî- û Kurdiya Zazakî, Hewremanî) xwe û him jî ola xwe ya zaraduştî ( Manî û Mezdak weke du mezhebên ola Zaradustî ku di dema Sasaniyan de bi reformên navxweyî ve ji hev hatibûn cûdakirin) bikar aniye. "Lê piştî Yezîd hate ser hukum (681-683) Emewiyan dest bi siyaseta Ereb-Islamî kirin û bi zorê islamiyet weke ola dewletê bi

67 *İran'ın Etnik Yapısı, Yakın Dönem ve Günümüzde,* Prof.Dr.Aygün Attar (Haşimzade) Ankara 2006, Divan Yayıncılık r.32

navê Erebîtiyê belav kirin"[68] Zimanê Sasaniyan yê fermî di gel hinek zimanê din weke Parttî, Persî zaravayê Kurdiya Feylî ye. Bawer im zimanzan ku lêkolîneke ciddî bikin ewê bibînin ku zimanê weke Farisiya kevn têne qebûlkirin, yan jî weke zimanê Pehlewiyan bilêv dibe wê rastiya wan derkeve rojevê û emê bibînin ku ew bi xwe lehçeyên Kurdî ne. Li jêrê nimûneyekê dinivîsînim û min li jor jî çend nimûne anîbû zimên. Evana hemûyan xuya dikin ku ne tenê dîroka Kurdan weke dîroka veşartî maye herwiha dîroka çand û zimanê Kurdan jî wiha veşartî maye. Dîroknas û zimanzaneyên Ewropiyan û yên Ereban yên ji bin zahmetiya cudabûna van lehçeyên Kurdî derneketine, wana weke Farisiya kevn yan jî Pehlewî bilêv kirinê.

**Alfabeya Pehlewî weke min li jorê nivîsiye elfebeya Medan ya ku derbasî Persan bûye û dûre bi elfebeya Erebî berdewam kiriye."** Kurdiya Feylî (Ji Feylî bêtir dibe Hewremanî be.N.A) di dema dewleta Sasaniyan de zimanê fermî bûye. Di navbera sedsalên sêyemîn û heftemîn ên zayînî de gelek kitêb û arşîv ên mîna *Zend Avesta, Dînkerd, Bondhîşin, Pendna- Megî Zaraduşt* û *Mînokî Xired* bi vê diyalektê hatine nivîsandin. Li gor Cemal Reşîd Ehmed van kitêbên ku navê wan li jêr derbas dibin jî di dema Ebasiyan de ji diyalekta Feylî bo erebî hatine wergerandin lê eslê wan bi şaşîtî wekî Farisî hatine qebûlkirin: *Sîndbadê Behrî, Hezar û Yek Şev, Xudayname, Karname, Ayinname, Kereteke û Demeneke* (Kelîle û Dîmne).[69]

Di vê demê de gelek Zaraduştî ji ber zilma Ereb-Islamê reviyane û çûne Hindîstanê. Di nava wan de etnîkên cuda cuda henin. Piştî vê helwesta Emewiyan, Zaraduştiyên Îranî û Elewiyên dijî Emewiyan hêzên xwe kirine yek û bi serokatiya Ebû Muslim ve serweriya Emewiyan bidawî anîn û dema Abbasiyan dest pê kir, sal 750'yî ye. Di vê navberê de di dema Emewiyan de Zaraduştiyên ji ber zilma Islam-Ereban reviyabûn û çûbûn Hindîstanê ew in yên min li jorê anîne zimên. Evana xwe bi navê Pehlewiyan anîne zimên û bi Loceyên Masonî yên Îngilîzan yên li Hidîstanê re hevkarî kirine û bi alîkariya wan careke din vegeriyane Îranê û bi alîkariya Îngilîzan jî li Îranê bûne serwer.

---

68 Berhema navborî, r.37

69 Kadri Yıldırım-Mamoste Qedrî, Kovara *Bîr*.

Pistî vê buyerê, Îngilîzan bala xwe dane ser vê grubê û xwestine bi navê Pehlewî- Farisî ber bi dewletên Islamî ve biçin. Bingeha avakirina dewleta etnîk a Farisî di vê demê de ji aliyê Îngilîzan ve hatiye avêtin. Pirtûk, diwan û destanên weke bingeha Farisiyê têne dîtin di wê demê de hatine afirandin. Weke minak mirov dikare " Leylê û mecnûn ya Hatifî(1788), Nasîhatname ya Sadî Sîrazî (1788), Dîwan a Hafiz (1791)"[70]

Di vê pêvajoyê de edebiyata Farisî ya li Hindîstanê dihate afirandin dewlemend bû. Herwiha ev edebiyat bi ramanên Zaraduştî ve pêwendîdar bû û di nava vê hêza Faris-Zaraduştî de nasnameya Farisî bi hêz bû.

Piştî van bûyerana ji nûve di sedsala 1800'î de edebiyata Farisî û dîrokeke Îranî-Farisî ya çêkirî di nava Îranê de belav dibû. Vê xebatê heta sala 1850'yî bi awayekî zindî û bi stratejiyeke zanistî ve berdewam kiriye. Bi sedan dîwan, dîrok, helbest yên ku îro jî têne nasîn di wê demê de li Hindîstanê hatine nivîsîn û li Îranê hatine belavkirin. "Yusuf û Zuleyha ya Camî", jî di vê demê de hatiye çapkirin. Di nava ronakbîriya Farisî ya li Îranê de rola van pirtûkan sereke ye. Lewra zimanê Farisî weke zimanê medreseyan di wê demê de zimanê sereke û yê biryardêr e. Lê heta wê demê jî hînê navê grûbekê weke etnîka Farisî nehatiye zanîn. Zimanê Farisî yê edebî bingeha avakirina etnîka Farisî bi xwe ye. Di çapkirina van pirtûkan de û di afirandina zimanekî nuh da, herwiha bi vê ve girêdayî di afirandina nasnameya etnîkeke nuh ya Farisî de rola van Loceyên Masonî sereke ye. Di sedsala 19 û 20'an de êdî ronakbîrên Farisî yên ji Ermenî, Yehudî, Suryanî û Kurd ku bi Zaraduştiyê ve dihatin nasîn û Mason bûn di serweriya dewletê de cîhê girîng wergirtin.

Di sedsala 20'an de şagirtên Masonî yên Îranî, li felsefe, lîteratur, ziman û nasnameya ku Îngilîzan li ser sifreyê ji wan re pêşkêş dikir xwedî derdiketin. Bingeha vê felsefeyê bi nîjadekî nuh, ji bona afirandina ziman û nasnameyeke etnîkî ya nuh bû. Vê stratejiya Îngilîzan li Îranê bi hêz bû û şagirtên Masonî di burokrasiya dewletê de cîh girtin.

---

70 *İran'ın Etnik Yapısı, Yakın Dönem ve Günümüzde*, Prof.Dr.Aygün Attar (Haşimzade) Ankara 2006, Divan Yayıncılık r.98

Loceyên Masonî, rehên xwe di nava dewletê de bicîh kirin. Weke (di destpêkê de) di serê vê makaleyê de jî min aniye zimên, Alî Firuqî ku bi eslê xwe Yehûdî ye yek ji wan biyaniyên bi nasnameya Farisî tev dilive, di nava serkêşên loceyên Masonî de dibînin. Li gor Attarî afirandêrên nasnameya Farisî bi xwene Farisî nin. Di destpêka sedsala 20'an de, heta nîvê sedsala 20'an, piraniya serkêşê dewleta Farisî, endamên Loceyên Masonî ne. Piraniya wan Şah Riza Pehlewî jî di nav de ne Faris in. Ango bi asanî mirov dikare bêje nasnameya Farisî bi destê Loceyên Îngilîzan yên Masonî û bi destên dehan kesên ne Faris, ku endamên Loceyan bûn û weke berdevk û hevkarên Îngilîzan tev diliviyan, lê xwe bi nasnameya Farisî bi lêv dikirin hatiye avakirin.

Vê ramana nûjen ya Peydakirina neteweya Farisî, ji Loceyên Hindîstanê dest pê kiriye û xwedî li nasnameya Part, Sasan, Pehlew û Samaniyan, yan jî Persan derketiye. Ji bona ev nasname nasnameyeke aloz û ne zelal bû, li ser bingeha inkara neteweyên cûda hatiye ava kirin. Xwedî li Part-Persan derketin tenê ne mafê Farisan bi xwe ye. Bi dehan netewe dikarin vî mafî ji bo xwe rast bibînin. Lewra etnîka Farisî, ne tenê berdewamiya etnoya Parta yan jî ya Persan e. Ji xwe tu pêwendiyên Farisan bi Partan û Sasaniyan tuneye. Du nasnameyên cuda nin. Sasanî berdewamiya Parta nin û nasnameya Partî û ya Sasanî dûrî nasnameya Farisî ye.

Nasnameya Pehlewîtiyê li ser vê felsefe, raman, stratejî û nasnameya li jorê hatiye zimên, derketiye rojevê û nasnameya Farisî weke pêlik bi kar aniye.

Dema Pehlewiyan di sala 1925'an de dest pê kiriye. Çiqasî berî sala 1925'an jî di serweriya dewletê de cîhê Pehlewiyan hebe jî, bingeha Pehlewîtiyê di sala 1925'an de bi destnîşan kirina Riza Şah Pehlewî weke Şahinşahê Îranî û nasnameya Îran-Farisî ve dest pê kiriye. Nasnameya Pehlewîtiyê bi afirandina zimanê Farisî û bi fermîkirina zimanê Farisî ve girêdayî bi cîh bûye. Zimanê Farisî piştî Şah xwe weke Şahinşah ilan kir, di sala 1930'yî de weke zimanê dewletê yê tenha û yê fermî hatiye qebûlkirin. Nimûneya Riza Şah Pehlewî û nimûneya Pehlewî-Farisiya weke nimûneya Kemal Ataturk û Tirkan bi xweye. Li ser bingeha nerastiyeke dîrokî ava bûye û ji bo bi cîh bibe jî dujminahiya hemû etnîk, netewe, kêmneteweyên cuda û zimanên

cuda kirine. Bi hêzên biyanî re, bi dewletên bêdadwer re li hev kirine, bi hêza leşkerî û bi darê zorê, bi hêza dewletê ve girêdayî cîh girtine, serweriya xwe ya etnîkî bi nîjadperestiyeke nedîtî ve bûne bela serê neteweyên Rojhilata Navîn.

## Dîktatoriya Şah Riza Pehlewî

Pehlewiyan di serweriya xwe de girîngiyeke mezin dane geşepêdana endustriyê û pêşveçûna sermayedariyê û sermayeguzariyê li Îranê. Gavên mezin di qada siyasî-etnîkî û perwerdeya bi zimanê Farisî de avêtine. Di vê pêvajoyê de Pehlewiyan xwe rêber û afirandêrê nasname, çand û zimanê Farisî dîne û bi vê helwestê jî serweriya xwe bicîh kirine. Ewan bi vê helwestê lê bi zorê, neteweyeke nuh afirandine. Pehlewiyan piştî şerê cîhanê yê yekem heta şerê cîhanê yê duyem, serweriya xwe bi nîjada Îran-Farisî (Aryanî), bi şovenîzmeke zordar û bi hevkariya Îngilîzan ve berdewam kiriye. Di vê pêvajoyê de hemû netewe û kêmneteweyên Îranê, weke perçeyek ji neteweya Farisî hatine dîtin û bi vî awayî jî wana weke neteweyên cûda inkar kirine.

Weke hemû dîktatoran Şah jî, xwediyê xwe dem bi dem guhertiye. Di destpêka sedsala 1940'î de navbeyna Ingilîz, Sowyet û Îranê ne xweş bû. Şah ji helwesta wan aciz bubû û li xwediyekî nuh digeriya. Elmanyayê bala xwe dabû Îranê. Sermayeya Elman li Îranê bi hêz dibû û bicîhbûna xwe ve Ingilîz û Sowyet tehdît dikir. Pêwendiyên Şah û Hîtler xweş bû û Îranê di şerê cîhanê de cîh li ba Elmanya girt. Ji sala 1940'î heta 1945'an li Îranê sermayeya Elmanî, leşkerên Elmanî weke hêzeke sereke dihate xuya kirin. Bi vê helwesta Elmanya û Îranê û herwiha bi bûyerên dinyayê ve girêdayî, Îngilîzan û Sowyetê biryara dagirkirina Îranê dan û Îran dagir kirin.

Di van salan de ji aliyekî ve tevgera Ulema ya Şia li Îranê bi hêz dibû, ji aliyekî din ve jî, bi geşepêdan û pêşdeçûna sermayedariyê ve tevgera karger û zahmetkêşan jî bi hêz dibû. Partiyên siyasî yên çînî, û netewî dihatin damezrandin. Tekoşîna neteweyî li Kurdistanê, Ezarbeycanê, Gîlanê û li gelek ciyên din berdewam dikir. Şah dijî tevgerên netewî, berê bi alîkariya Îngilîzan û dûre jî bi alîkariya Elmanya bi dijwarî radiwestiya û şerê wan dikir. Bi gelemperî Îran di sala 1940'î de di nava

qirîzeke siyasî û aborî de dijiya û ev rewşa nû li Îranê dibû berbanga guherînên berbiçav.

Helwesta Pehlewiyan ya bi Elmanya re, ne dihat hesabê Îngilîzan û Sowyetê. Lewra Îranê bi Elmanyayê re gelek peyman çêkiribû û li Îranê hêza leşkerî, aborî û siyasî ya Elman bi hêz dibû. Şah bi vê helwesta xwe ve peymana navbeyna Sovyet, Ingilîz û Îranê têk dibir û rê li ber dagirkirina Îranê vedikir.

## Şerê cîhanê yê duyem û dagirkirina Îranê

Sowyetê di 25/8-1941'ê de bi destêwerdaneke leşkerî ve "Leşkerê sor" xaka Ezarbeycanê, Gîlanê û Kurdistanê dagir kir. Sowyetê bi navê peymana sala 1921'ê ve Îran dagir kir.

Îngilîzan jî li gor peymana sala 1923'an, weke Rûsan çend aliyên Îranê dagir kir. Bi vî awayî Îran ji aliyê Ingilîz û Sowyetê ve hate dagirkirin. M.Riza Şah Pehlewî reviya û li Efrîqa Başûr bû penaber. Di vê aloziyê de, avakerên nasnameya Farisî, bi destê Îngilîzan ve hukumeta nû ava kirin.

Evana bi asanî mirov dikare bêje berdewama ramanên Alî Firuqî ne. Lewra pêwendiyên xweş bi îsraîlê re ava dikin, di sala 1948'an de Îsraîlê weke dewlet nas dikin. Di vê bûyerê de rola Yehudiyan biryardêr e. Lewra pêwendiyên Îranê û yên îsraîlê pir baş in. Vê hêza neteweya Farisî bi hêza Emerîka û Îngilîzan ve Îtaliya û Elmanya ji Îranê diqewirînin. Peymanê bi Îngilîzan re çêdike û alîkariya Sowyetê werdigre.

Di nava vê pêvajoyê de Kurd û Ezarbeycaniyan ji bo serxwebûna xwe têdikoşiyan. Ji aliyekî din ve kommunîstan li Îranê şer dikirin û li Ezarbeycanê bi hêz dibûn. Ingilîz ji pêşveçûna vê rewşa nû ne razî bûn. Emerîkayê berê xwe dida Îranê û bi alîkariya Îngilîzan beşdarî parvekirina xaka Îranê dibû. Lê ya herî girîng hêza Îslamî li Îranê bi hêz dibû û hemû biyaniyên li Îranê dikirin hedefa têkoşîna xwe. Di vê demê de li her aliyê Îranê şer û pevçûn hebû û kaoseke siyasî li Îranê peyda bibû. Kurd û Ezarbeycaniyan vê aloziya siyasî weke derfet didîtin û helwestên xwe yên dewleta serbixwe eşkere dikirin. Kurdan û Azeriyan alîkariya Sowyetê werdigirtin.

Komunîstên Ezarbeycanê jî alîkariya Sowyetê digirtin. Sowyetê serxwebûna Ezarbeycanê dixist rojeva xwe û bi çalakî alîkariya Ezarbeycaniyan dikir. Helwestên Ezarbeycaniyan ji bo Kurdistaneke serbixwe helwestên şovenîst bû û dijî tevgera Kurdistanê tevdiliviyan. Îngilîzan vê helwesta Azeriyan weke derfet li qelem didan û destên xwe dirêjî Kurdan dikir. Hêza Kurdan hêza eşîrî bû. Tevgera Kurd ya neteweyî jî di bin serokatiya serokeşîran de bû. Netewayetî û hîmê avakirina dewleteke serbixwedi nava Kurdan de ne zelal û ne jî bi hêz bû. Lê derfeta ku derketibû pêşiya tevgera Kurd derfeteke dîrokî bû û hêza Kurdan ya neteweyî dixwest vê derfetê bikar bîne. Ev jî helwesteke di cîh de bû û rast bû. Him sowyet û him jî Ingilîz ne li dijî serxwebûna Ezarbeycan û Kurdistanê bûn. Sowyet du dewletên serbixwe yên bi ser Sowyetê ve dixwest û alîkariya Îngilîzan pêwîst didîtin. Helwesta Îngilîzan ne li dijî avakirina dewletên serbixwe weke Kurdistan û Ezarbeycanê bû lê bê biryar bû. Emerîka dewleteke yekgirtî ya Îranî diparast û bandoreke mezin li ser Sowyet û Îngilîzan dikir. Lewra Emerîka di şerê duyemîn yê cîhanê de weke hêza yekemîn derket holê û weke hêzeke sereke jî bandora xwe li ser aliyên şer dikir.

Di vê navberê de Ezarbeycan û Kurdistanê serxwebûna xwe îlan kirin. Berê Ezarbeycanê û duvra jî Kurdistanê dest bi avakirina dewleta xwe ya serbixwe kirin. Her dû neteweyan jî alîkariya Sowyetê wergirtin. Azeriyan xaka Kurdistanê nakokbar didîtin û destdirêjiya xaka Kurdistanê dikirin. Destêwerdana dewleta Tirk, Azeriyan berbi dijminayiya Kurdan de dibir. Weke Peter Galbraith dibêje; Li pêşiya xeyalên Kurdan yên avakirina dewleta serbixwe ya Kurdî, hêza ku herdem xwe weke endamê Nato yê û hevalbendê Emerîkayê binav dike dewleta Tirk bi xweye."[71]

Bi vê destêwerdana dewleta Tirk ve şovenîzma Azerî dibû nokokiyeke mezin di nava Kurd û Azeriyan de. Helwesta Azeriyan dibû sedema lawazkirina hevkariya Azeriyan û Kurdan. Lê ji aliyekî din ve jî Dewleta Tirk dewleteke Azarî serbixwe dijî xwe weke tehdîd didît û li dijî dewleteke serbixwe derdiket. Ji aliyekî din ve bi destêwerdaneke

71 Peter Gabraith, Irak'ın Sonu Ulusal Devletlerin çökuşu-The End Of Iraq-Dogan Kitap-Araştirma/inceleme dizisi. İstanbul 2007.

nedîtî ve Kurd û Azerî bera sînga hevdû didan û ji aliyekî din ve jî bi Îranê re li hev dikir û dijî dewleta Azeriyan derdiket. Sedemên destêwerdana dewleta Tirk û sedemên dijberiya dewleta Azerî ya sereke sedema hebûna dewleta Kurdî ye.

Azeriyên ji zilma Îranê û Îngilîzan direviyan û xwe radestî Tirkiyê dikirin, ji aliyê dewleta Tirk ve dihatin girtin û radestî Îranê dikirin. Ji bo dewleta Kurdan neyê avakirin hemû tişt ji bo dewleta Tirk mubah bû û îro jî mubahe. Loma bi asanî bi Îranê re li ser Kurdan û Azeriyan li hev dikir. Ev bi xwe ji bo Emerîka û dawî jî ji bo Îngilîzan dibû derfeta li dijî helwesta Sowyetê. Tehdîtên Emerîkayê yên li dijî Sowyetê, di dema paymanên navneteweyî de mezin dibûn. Emerîka û Îngilîzan dixwestin Sowyet ji Îranê derkeve.

### Rûxandina Komara Azarbeycan û Kurdistanê

Di sala 1946'an de êdî rewşa peymana sala 1921'ê ji holê rabûbû. Elmanya ya Faşîşt bi radestiyekê ve welatê xwe û hemû xakên dagirkirî berdabû. Elmanya, Japonya û hevkarên wan yên Îranî têk çûbûn. Sowyetê li gor peymanên navneteweyî hêza xwe ya leşkerî ji Îranê paşde vekişand. Ev dem dema Kurê M.Riza Şah Pehlewî ye, ku navê wî jî Riza Pehlewî bû, Alîkariya Emerîka û Îngilîzan wergirt. Yekgirtina xaka Îranê bû qada sereke ya hêzên dereke weke Emerîka û Îngilîzan. Ezarbeycan û Kurdistan bi destê Ingilîz û Emerîkayê ve hate rûxandin. Şah (kurê wî) ji nû ve kirin serwer û Şahê Îraniyan.

Dîsa weke berê nasnameya Farisî derket pêş û nasnameyên neteweyên cûda hatine înkar kirin. Îran kete destê Emerîkayê.

Hêza leşkerî ya Emerîkayê her roj mezin dibû û aboriya Îranê her roj bêtir dikete destê Emerîkayê. Di vê navberê de tevgera bûrjuwaziyê millî bi serokatiya Musadiq dest pê kiribû. Wê gavê petrola Îranê di navbeyna Emerîka û Ingîltereyê de hatibû payêkirin. Hemû mafê mirovan û mafê neteweyên cûda bi berjewendiyên Emerîka û Îngilîzan ve hatibûn guherîn. Tevgera Musadiq jî guherîneke mezin nekir. Lê petrola Îranê kir neteweyî û ji bona wê jî zagonên teybetî derxist. Ev helwesta wî bû sedema darbeya leşkerî ya li dijî Musadiq û bû sedema ruxandina tevgera Millî li Îranê. Sowyetê jî bedelê vekşandina hêza

xwe ya leşkerî ji Îran û Emerîkayê vergirt. Kurd û Azerî, hatin firotin û xaka wan ji nû va hate dagirkirin.

## Şoreşa Îslamî

Di sala 1953'an de, piştî rûxandina tevgera Eniya neteweyî, ya Musadiq, serweriya leşkerî li Îranê dest pê kir. Musadiq yek ji wan kesan bû ku dewleta nasnameya Farisî rast nedidît û Îran weke dewleteke têkel, pirneteweyî didît. Wî nasnameya Îranî, ji dêvila nasnameya Farisî dida pêş. Di sala 1955'an de, Tirkiye, Iraq, Îran û Pakîstan, Peymana Bexdayê ava kirin. Serkêşê vê peymanê Emerîka ye û li dijî tevgera neteweyên bindest nemaze li dijî tevgera Kurdistanê ye. Di sala 1959'an de, Iraq piştî şoreşa sala 1958'an peymana Bexdayê terk kir û 3 dewlet tenê man û navê peymanê hate guherîn û navê wê bû CENTO.

Di vê aloziyê de serweriya dewleta Îranê kete destê leşker û SAWAK'ê. Li Herêma bextiyariyan (Loristanê), hînê di 1909'an de Perol hatibû dîtin. Bi destê Îngilîzan ve şîrketa petrolê hatibû avakirin. Weke ji berê da Bextiyariya serweriya dewleta Îranê qebûl nekiriye û her dem dijî wan serî hildaye. Ev xanedan yek ji wan xanedanê herî mezin ya Kurdan e. Ev nakokiyên dewletê û Bextiyariyan di vê demê de jî didomand. Muhemed Riza Pehlewî, ji bo bi Bextiyariyan re bibe meriv, keça Bextiyarî Sureya yê ji bavê wê xwest û pêra zewicî. Di sala 1956'an de Sawak bihêz bû. Lewra yek ji serokê Sawakê yê yekemîn Teymûr Bextiyarî ye, Xwezûrê Riza Pehlewî ye.

Sawakê serweriya Îranê bi alîkariya Emerîkayê ve bi rê ve dibir. Leşkerê Emerîkayê gihişt 80.000'î ku li Îranê wê demê weke hêzeke mezin dihate dîtin. Dewlemendiya Îranê kete destê Pehlewiya û serkêşên Sawakê. Bi deh hezaran kes weke ajanê Sawakê kar dikirin. Feqîrî, bêkarî mezin bû û zilma dewletê zêde bû. Şah dest bi şoreşa sipî kir. Lê şoreşa sipî ku di sala1963'yan de dest pê kir nebû çareserî û muxalefeta li dijî Şah mezin bû. Muxalefeta Îranê ji neteweyên bindest, ji çîna karger û ji olperestên Sîîa ve pêk dihat. Ji muxalefetê hêza olî di nava xwe de eniyeke olî ava kir. Hêza olî bihêz bû û bandoreke mezin li ser muxalefeta Îranê kir. Bi şoreşa sipî Şah pirsgirêka neteweyî çareşer nekir, berevajî vê, nakokiyên neteweyan mezintir kir. Tenê

Ermenî û Yahûdî weke kêmnetewe hatine qebûl kirin. Weke li Tirkiyê bi devkî be jî, Ermenî û Rum weke etnîkên olî hatine qebûlkirin. Kurd, Ereb, Gilekî, Mazenderanî, Azerî, Belucî bê maf man û zilma li ser van neteweyan berdewam kir. Zimanê wan û çanda wan hate qedexe kirin. Nasnameya Farisî derket pêş û Îran careke din, bi nasnameya Farisî hate bilêv kirin. Derebegên Îranî ku di nava Tevgera neteweyî û tevgera olî de cîh girtibûn li dijî reformên xakê ku bi şoreşa sipî ve derdiket holê radiwestiyan û li dijî Şah dest bi şer dikirin. Şah vê tevgera derebegan bi dijwarî temisand (serkut) û teroreke mezin dest pê kir. Tevgera olî serê vê serhildanê kişand û li dijî terora Şah rawestiya. Ayetullah Xumeynî piştî vê serhildanê sirgûn bû. Ji bilî vê serhildanê, serhildana Kurdistanê jî bi dijwarî hate temisandin. Lê vê zilma Şah û ya Emerîkayê nebû çare. Serhildanên olî û neteweyî berdewam kirin. Çîna karger û zahmetkêşan tekoşîna xwe berdewam kirin.

Şoreşa olî bi alîkariya neteweyên bindest, bi alîkariya çîna kargeran ve di sala 1979'an de bi ser ket. Şah reviya û serweriya Şahinşahî û Pehlewî li Îranê bi dawî hat. Şahinşahî bidawî hat û hêza olî bû serwerê Îranê, lê pirsgirêka neteweyan û pirsgirêka demokratîzekirina Îranê bê çare ma û îro ev pirsên mezin ji berê zortir û zahmetir berdewam dikin.

## Çend gotin li ser Îslama siyasî

Mebesta Îslamiya siyasî, ya ku sîstema dewletê bi yasayê Îslamî ve dixwaze û ji bona vê hêviya xwe bi cîh bîne hemû metodên şîdetê rewa dibîne. Di vê pêvajoya Paradîgmaya pêla 3'yem de, di vê dema gilobalîzekirina dinyayê de Îslamiya siyasî jî di pêvajoyeke nû da derbas dibe. Ji aliyekî ve, li hinek cîhê dinyayê weke Tirkiyeyê Îslamiya siyasî, Islamê û nîjadperestiyê, neteweperestiyê bi hevre entegre dike û ola Îslamê dixe xizmeta berjewendiyê neteweyeke. Navê wê weke Îslamiya siyasî ya nerm bi lêv dibe. Ji aliyekî din ve jî Îslamiya siyasî weke tendenseke bi hêz ya enternasyonalî tevdilive. Ev tendens weke tendenseke dijî globalîzmê bi lêv dibe û weke kampeke dijî demokrasiyê û mafê mirovan tê şîrovekirin. Vê kampa Islamî ku bi tendensa enternasyonalî tevdilive, kampa dijberî xwe jî diafirîne. Ev pêvajo dikare berevajî, jî bête bilêvkirin. Îro li Ewropa û li cîhana Ro-

java, dijî Îslama Siyasî tendensên nîjadperestiyê bihêz dibin. Sedemên bihêzbûna hêzên nîjadperest yên rojava ne Islam bi xweye. Lê Îslamê weke sedem nîşan dide ku ji rastiyê dûr e. Lê divê em rastiyeke din jî bibînin ku vê hêza Îslamiya siyasî, rê li ber hemû metodên aştiyane digire û rêya şîdetê weke rêgeyeke tek û tenha bikar tîne, xetere û dijî mafê mirovan e.

Îro li Ewropa hêzên nîjadperest mezin dibin. Ev tendensa nîjadperestiyê bi xwe jî weke tendenseke xeter bilêv dibe û ew jî kampeke enternasonalîst ya li dijî xwe li seranserê Ewropa û cîhanê diafirîne. Li Danîmarkayê, li Holandayê, li Fransayê, li Belcîhkayê û li Swêdê vê hêza nîjadperest mezin dibe. Sedemên ne rast didin pêş û berfireh dibin.

Em her roj bi nûçeyeke terorîst ya Îslamiyan ve ji xew radibin û bi bûyereke nû va jî radizên. Her dû hêz jî, him Îslamiya siyasî û him jî hêza nîjadperest, li dijî avakirina civatên piçandî radiwestin û li dijî vê serdema navneteweyî kar dikin. **Loma îro, ji berê bêtir, parastina pâradîgmaya pêla 3'yem girîng e.**

### Çend gotin li ser Komara Kurdistanê ya Mahabadê

Di 22'yê Kanûna 1946'an de Komara Kurd a Mahabadê hate damezirandin. Komarê hebûna xwe nêzîkî salekê domand. Damezirandina Komara Mahabadê, ji bona dewleta serbixweya Kurd, îrade û pêngava herî girîng a dîroka nêzîk e. Weke destkevtin û tecrûbeyeke dîroka nêzîk ya netewa Kurd e. Em vê dîroka Kurd, dînamîkên navxweyî yên wê demê û dînamîkên derekî yên damezrandina Komara Mahabadê bi kurtî be jî min li jorê aniye zimên. Niha jî dixwazim li ser tekoşîna komarê bi kurtî rawestim.

Damezrandina komara Mahabadê bidestxistineke dîrokî ya neteweya Kurd e. Kurdan vê derfetê di dawiya şerê cîhanê yê duyem de bidest xistin. Weke tê zanîn ku şerê yekem yê cîhanê bêyî bighêje armanca xwe bi şoreşa Bolşewîkan ve di nêvî de ma û bi dawî hat. Şerê duyem di bingeha xwe de berdewama şerê yekem e û weke şerê cîhanê ê duyem bû encama dewletên nuh li cîhanê. Lê Kurd ji vê derfetê bê par man.

Şerê cîhanê yê duyem jî cîhan tevlihev kir, dewletên nû avabûn, tixûbên cîhanê hatine guherîn, lê Kurd di encama vî şerî de jî, ji bidestxistina mafê xwe yê neteweyî bê par ma. Ji şerê cîhanê yê yekem ve heta şerê cîhanê yê duyem şerê Barzaniyan berdewam kir. Tevgera Şêx Mahmudê Berzencî heta sala 1931ê berdewam kirî ye. Tevgera Şêx Ebdulselamê nemir, birayê wî Şêx Ehmed berdewam kiriye. Şex Ehmedê Berzanî û Mele Mistafa Berzaniyê nemir, heta 1945an li dijî Îngilîzan û Ereban şer kirin in. Şerê Şêx Mahmûd û şerê Barzaniyan bandora xwe li ser Rojhilatê Kurdistanê dikir. Lê li bakurê Kurdistanê tevgerên sereke weke tevgera Şêx Seîdê Pîran, şoreşa Agriyê û ya Dersimê şikestibûn û bi hovîtiyeke nedîtî hatibûn temirandin. Kurd di vê demê de li bakurê Kurdistanê bê deng mabûn. Lê li başûr û li rojhilatê Kurdistanê tevgerên xurt hebûn.

Piştî şerê cîhanê yê duyem Ingilîz û Rûsan bi hevkariyekê Iran dagir kirin. Li herêma Kurdistanê û Ezarbeycanê Rûs serwer bûn. Di bin serweriya Rûsan de Kurdan û Azeriyan serî hildan û dewletên xwe ava kirin. Herdû dewletan jî alikariya Rûsan digirt in. Ev hevkarî nedihat hesabê Îngilîzan. Di Rojhilata Navîn de du dewletên bi Rûsan re ne li gor berjewendiyên Îngilîzan û Emerîkan bû. Bi dizî Îngilîzan û nemaze Emerîka alikariya Farisan dikir û serweriya Rûsan kêm dikir. Komara Kurdistan li Mahabadê di demeke kurt de gavên mezin di qada siyasî, aborî, çandî û civakî de avêt û tovê jiyana dewleta serbixweli xaka Kurdistanê piştî dewleta Şêx Mahmûd weke dewleteke neteweyî, avêt. Piştî peymanên navneteweyî û peydabûna blokên navneteweyî Rûs mecbûr man ji vê derê vekşin. Piştî vekişandina Rûsan; Îngilîzan, Emerîkan û Şahê Farisan li hev kirin û bi hêzeke mezin hatin ser Kurdan û Azeriyan û her du dewletên serbixwerûxandin. Vê rûxandinê deng ji cîhanê dernexist. Cîhan li hemberî vê rûxandina bi zorê, talanî û wêraniyê bê deng ma. Du netewe bi dewletên xwe yên serbixweve di hatin pelçiqandin û deng ji tu dewletan dernediket. Weke tê zanîn Pêşewa Qazî Muhemed û çend hevalên xwe, merivên xwe hatine bidarvekirin.

Di vê bûyerê de helwesta Azeriyan ji ya Farisan xerabtir bû. Azerî bi Propagandeya û midaxeleya Kemalîstan dijminatiya Kurdan dikirin. Hemû daxwazên Kurdan û yên Rûsan ji bona hevkariya Azerî û

Kurdan ji aliyê Azeriyan ve paşde hatiye vegerandin. Azeriyan, Xaka Kurdistanê weke xaka Azeriyan binav kirîne û li dijî dewleteke serbixweya Kurdî rawestiyane. Heger hevkariyeke baş di nava Kurd û Azeran de pêk hatibaya û bi yek awayî li dijî êrîşên Faris û Îngilîzan û Emerîkan rawestiyabûna bawerim îro wê Kurdistana Rojhilat û Azerbeycan weke du dewletên serbixweli jiyanê bûna. Rola Mele Mistefa Berzaniyê nemir di vê şoreşê de gelek girîng e. Barzaniyan ji Ebdulselam hata Berzanî bi her awayî destê alîkariyê dirêjî tevgera neteweyî ya Kurdistanê kirîne û bûne kakilê vîna netewa Kurd. Bêyî Barzaniyan û helwesta wan ya neteweyî, helwesta Kurdewarî nayê bilêvkirin.

**Rewşa navxweyî ya rojhilatê Kurdistanê çawa bû?**

Dixwazim vê mijarê bi nivîsa birêz Tahirî pêşkêşî xwendevanan bikim. Heta nuha lêkolîna herî objektîv li ser Mahabadê hatiye nivîsîn bi lêv dikim û loma jî dixim nava pirtûka xwe. Birêz Tahirî wiha dinivîse:

**"Dema ko Almanyayê êrîşî Sovyetîstanê kir, Îran hat dagirkirin û** (Rojhilata -H.M.) **Kurdistanê hat sêperçekirin, başûr di jêr desthilatdariya Brîtanyayê û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de, bakur di bin hukumdariya Sovyetistanê de û herema Mehabadê jî navçeya dagirnekirî ma. Profesyonelên Kurd ên nûgihayî ev rewş bo damezirandina J.K.ê bi kar anî. Piştre J.K. (Jiyaneweyî Kurd) di sala 1945'an de bû Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK-R). PDK-R ê di 22'yê Rêbendana 1946'an de bi piştgiriya Sovyetistanê komarek Kurdî ragihand. Lê ev komar tenê yanzdeh mehan ma. Di 17ê berfanbara 1946'an de ew ji aliyê hêzên Îranê ve hat hilweşandin."**[72]

Li rojhilatê Kurdistanê wê demê, bingeha avakirina komareke Kurdî bi civatî, aborî û siyasî tunebû. Tevgera Kurd gelekî lawaz bû. Eşîrên Kurdan ne yekgirti bûn. Kurdistana Rojhilat sêperçeyi mabû. Neteweperestiya Kurd lawaz bû. Alikariya Sowyetê ya ji bo Kurdan weke sedema yekem ya sereke ya avakirina komarekê li Mahabadê ye. Lê serokatiya Kurdan bi xwe otonomi dixwestin. Komar û serkêşên

72 www.nefel.com 12/12-10 Huseyn Tahirî li beşa Zanyariya Rêzanî ya Zanîngeha Melbournea Awistralyayê doktorê felsefeya siyasî ye.

Komarê di nasnameya xwe de û di daxwazên xwe de ne zelal bûn. Alikariya Kurdên perçeyên din ciddî negirtin. Ewlekariya komarê di siyaseta serkêşiya komarê de ne pirsa sereke bû. Wan hem digotin ku komar dewletek otonomî ye û hem jî têkilî bi Sovyetistanê û Komara Azerbeycanê re pêkdianîn û bi helwesta dewleteke neteweyî tev diliviyan. Pêwendiyên wan ên siyasî, aborî û leşkerî nakokbar bûn.

"Tevî ko civata Kurdan bo dewletbûnê ne amade jî bû, serokatiya Kurd xwe avêt wê qonaxê ko dewletek Kurdî dabimezirîne...

Tevî ko hin ramanên neteweyî ketibûn serê hin Kurdên ronakbîr jî, Kurd bi giştî hê nebûbûn netewe. Mîna ko Mîraslov Xroç tîne ziman: "(Neteweperwerî) yekemîn nirxa ferzîne (mutleq) ya neteweyekê ye û di ser nirx û berjewendiyeke din re ye."(46) Kurd hê eşîrî bûn û li pey serokeşîrên xwe diçûn, û serokeşîrên wan nirxa ferzîn nedabû neteweya Kurd lê dabûn berjewendiya eşîrên xwe. Mîna ko Hesen Erfa tîne ziman: "(Dema ko komar ruxî,) eşîr vegerîn (ser ciyê xwe) bê ko xem û serşoriyê ji ber neteweya xwe ya jêdestkirî bihesînin û xemgîn bibin ji ber ko komara xwe ya serketî lê kurtjiyayî wenda kir lê tenê ew pêzanînên ji xwe re jê girt ko ev hewl, wek gelek danexweyên din, jî hat şikandin û ji niha şûnde baştir e ko bêdeng li ciyê xwe rûbinin û nîşan bidin ko ew hemwelatiyên qenc in."

"Di salên 1940'î de neteweperwerî li Kurdistana Îranê di nav komek gelekî piçûk ya ronakbîrên Kurd de peyda dibû. Wê komê serkêşiya neteweperweriya Kurdî dikir lê Kurd bi giştî ne xwediyên giyanek neteweyî bûn..." "Hê ji destpêkê hin eşîrên Kurd li dij komarê bûn... Dema ko serokeşîrên Kurd zanî ko ronakbîrên Kurd di bin gefa Îranê de ne, wan zû dev ji hevbendiya ronakbîran berdan. ...O'Ballance dibêje ko "dema hêzên Îranê ketin nav Mehabadê de, Şikakî, Herkî, Mameşî, Mengurî û hin eşîrên din ên Kurd pê re bûn... Van eşîran, an jî qet nebe hin aliyên wan piştgirên Komara Kurdî bûn...Serokeşîran carek din jî nîşan da ko berjewendiyên wan di ser ên gelê Kurd re bûn.. Di tebaxa 1944'an de serokên Kurdên Îran, Îraq û Tirkiyeyê hevdu li çiyayê Dalanpur, yê ko sînorên her sê welatan digihîne hev, dîtin. Wan peymanek bi navê "Peymana Sê Sinor" îmze kirin. Serokên Kurdan sozên hevkariyê dan. Lê çawan be jî, ev peyman zêdetir sembolîk bû (35). Beşdarbûna Kurdên

**ji Tirkiye û Sûriyeyê tenê sembolîk bû. Kurdên ji Iraqê alîkariya sazûmankarên J. K. yê kir û ji gelek aliyan de şîretdana xwe ji wan re domand. Mele Mistefa û hêzên xwe bi rasteqînî tevlî Komara Kurdî bûn. Lê dîsan jî, ew bi asanî wek beşek ji komarê nehatin hesibandin... Rayedarên Kurd, Komara Kurdî wek tevayiyek tenê ji Kurdên Îranê re dihesiband...Bi rastî, Qazî Mihemed dikare bi pêşxistina herêmtiyê were tawanbarkirin..."[73]**

## Dîroka Îranê çi radestî me dike?

Dîroka Îranê bi eşkereyî xuya dike ku Îran dewleteke pirolî, pirneteweyî, pirçandî û pirzimanî ye. Navê Îranê weke dewlet bi yasayek demokratîk dikare nasnameya hemû neteweyên Îranî di nava xwe de bipêçe. Navê Îranê weke dewlet bi tu awayî nayê qebûlkirin ku bi nasnameya Farisî ve bête gotin.

Farisî weke ziman ji mîrasa çend zimanên qedîm ve pêk hatiye. Persî, Medî, "Farisiya qedîm" û "farisiya nû". Farisî weke ziman ji çend imparatoriyan re bûye zimanê fermî. Farisiya îro ne zimanê Persan û ne zimanê Medan e. Farisiya nû, berdewama Farisiya qedîm e ya ji aliyê Îngilîzan ve weke zimanekî nû hatiye holê.

Partî û Medî bêtir nêzî Zazakî, mukrî û Hewremanî ne. Lê em nikarin bêjin Partî û Medî tenê Kurd in. Kurdiya Îro (Kurmancî û Soranî) û ya Mediya û zimanê Partiyan ji hev dûr e. Weke Farisî zimanê Kurdî jî, nemaze bêtir zaravayên zimanê Kurdî, ango, Kurmancî, Soranî, Zazakî, hewremanî, lorî mukrî û Feylî nêzîkî zimanên jorê ne.

Farisiya îro û Kurdiya îro nêzî hev in. Zaravayê soranî nêzî Farisiya îro ye. Kurmancî bêtir nêzî Tacikî-Darî ye ku weke zaravayên Farisiyê têne bilêvkirin.

Helwesta Farisan ya şowenî ku di dema Pehlewiyan de û nuha jî bi destê olperestên Sîa ku weke nasnameya Îranî-Farisî tê şîrovekirin, tovê dijminatiya neteweyên Îraniyan bi xweye. Lewra Îran dewleteke pirneteweyî ye û divê weke Îran bête bi nav kirin. Nasnameya Îranê

---

73 www.nefel.com 12/12-10 Huseyn Tahirî li beşa Zanyariya Rêzanî ya Zanîngeha Melbournea Awistralyayê doktorê felsefeya siyasî ye.

weke nasnameya hemû neteweyên Îranê dikare bête bilêv kirin û bibe hevbeşiya hemû nasnameyên neteweyên Îranê.

Li Îranê ji Farisan Bêtir Kurdan û Azeriyan şaristanî ava kirine. Bingeha dewleta Îranê hemû neteweyên Îranî ne. Loma tekoşîna ji bona dewleteke wekhevî (di warê mafê neteweyan de), pirneteweyî û pir çandî û pirzimanî helwesteke raste û helwesteke ku mafê hemû netewa û kêmnetewa di nava xwe de dipêçe. Îran weke dewlet nabe bi nav û nasnameya yek neteweyî, bi zimanê yek neteweyî û bi nasnameya yek neteweyî binav bibe. Lê Îran weke nasnameya hevbeş ya hemû netewe, ziman û çandên gelên Îranê rast dibînim.

Helwesta Îslamiya siyasî ya îro ya Îranî ku bi nasnameya Farisî tevdilive, û dijî mafê neteweyên cuda radiweste, li dijberî serdemiya me cîh digre û lewra divê hemû hêzên guherparêz dijî vê serwerî û desthilatdariya nîjadperest raweste û mafên gelên Îraniyan biparêzin.

Îro Rojhilata Navîn di nava rewşa momenta şoreşgeriyeke nûjen de dijî. Tevgera azadîxwaz ya Tunis, ya Misrê, Ya Cezayirê, tevgera hêzên lîberal li Îranê, referandûma Başûrê Sudanê ya ji bo serxwebûnê ku bi piraniyeke mezin serxwebûnê erê dike, ango van hemû bûyerana yeko yeko bi serê xwe weke helqeyên zincîra vê serdemiya me ya îroyîn in. Ango her yek ji van bûyeran yek ji pêlên paradîgmaya pêla 3'yem in. Guherîna struktur û rûxandina dewletên –netewe-dewlet, yên unîter û navendî di rojeva gelên Rojhilata Navîn de cîh girtiye û wê berdewam bike. Li jorê di beşa Rojhilata Navîn de destêwerdana Emerîkayê dinirxînim, dihesibînim û dibêjim; li kîjan cîhê Rojhilata Navîn mecala vê pêla sêyem derkeve wê li vê derê projeya Emerîkayê roleke mezin wergire. Lê hêzên statukoperest û Îslamiya milîtan jî di her momentê de, li dijî guherîna pêla 3'yem cîh digre û ji bo guherîna struktura Rojhilata Navîn dibe astenga sereke. Dewleta Îranê weke dewleteke pirneteweyî ku ji Kurd, Azer, Faris û Belûc û bi dehan kêmnetewan ve pêk hatiye, divê desthilatdarî jî li gor vê rengîniyê bête amadekirin. Bi federasyon, yan jî konfederasyonan ve desthilatdariya dewletê bi wekheviyeke yasayî ve bête payêkirin.

Ne Îslamiya siyasî û ne jî sîstema şahinşahî çareserî ye. Çareseriya sereke avakirina dewleta pirneteweyî ye û pêkanîna makzagoneke

demokratîk e. Ev makzagon ku wekheviya neteweyên Îranî weke bingeh digre, divê mafê çarenûsiya neteweyan di vê makzagonê de sereke be.




### Iraq

**"Iraq ne bi cahda xwe, lê di dawiya şerê cîhanî yê yekem de, bi destê hukumeta Îngilîzan ve weke dewlet hate avakirin"[74]**

Di sala 1991'ê de bi sedhezaran Kurd, zarok, ciwan, kal û pîr bir bi bir bi serê çiyayê Kurdistanê diketin. Li sînorên dagirkeran dixistin. Sînorên Kurdistanê yên ku îro Kurdan ji hev bi dûr xistine. Kurd li aliyekî Kurdistanê ango li başûrê Kurdistanê roja mahşerê dijiyan. Balafirên Seddam Kurdistan kavil dikir. Kurd weke 750'î salan berê dîsa xwe diavêtin bextê çiyayê Kurdistanê. Tenê çiya ji wan re yar bû.

Neyar hawîrdor digirtin û Kurdan careke dî bangî gelên cîhanê dikirin. Lê Kurd ne yên 750 sal berê bûn. Destên xwe dirêjî birayên xwe kirin û ev musîbet bû sedema hevkariya Kurdên herçar perçeyan. Dîmenên Kurdan aletên ragîhandinê yên dinyayê dagir kirin. Li hemû dinyê Kurdan bi dostên xwe re dengên xwe bilind kirin.

74 *Irak'ı Anlamak*, William R.Polk. Çapa 2'yem Understanding Iraq- Weşanên NTV. 2007. r.6

Emerîka bi soza xwe ranebû û alîkariya Kurdan nekir. Gelên Iraqê li dijî Seddam serî hildan lê Seddam jî bi komkujiyê bersiva wan da û bi dijwarî çû ser vê serhildanê. Bi dîmenên Kurdan ve him rewşa Emerîka û him jî ya Ewropayê nebaş bû û rexneyên mezin li wan dihate kirin. Emerîka hêzeke alternatîf li Iraqê nedidît û loma jî dîktatoriya Seddam bi dawî neanî. Lê mecbûr ma ku herêma Kurdistanê û herêma Şîî'ya başûrê Iraqê biparêze. Ev ji bona Kurdan û ji bo Şîî'yan bû derfeteke yekta. Bi vê derfetê ve girêdayî Kurdan ji bona mafên xwe xebat kirin.

Lê mûsîbeteke mezin di vê navbeynê de hate serê Kurdan. Kurdan xwe bi xwe li ser herêmên bidestxistî li hev nekirin û şerê hev kirin. Di vê navberê de şerê Kurdan yên xwekujiyê, bû sedemên aloziya îro ya başûrê Kurdistanê. Yek ji wan pirsgirêkan jî pirsa Kerkukê bû, ku îro çareseriya wê him aloz û him jî zahmettir bûye. Dijberî û berberiya Kurdan vê derfeta Kerkûkê ji destê wan berda. Helwesta Emerîka ya nerûxandina dîkatoriya Seddam, Şîî'yên Iraqê ber bi Îranê ve bir. Îranê destê xwe xist nava Şîî'yan û heta îro jî berdewam dike. Ji xwe gelek partiyên Şîî'yan li Îranê bi alîkariya Îranê hatibûn ava kirin. Li gor gelek çavkaniyan di midaxeleya Emerîka ya duyem de Îranê çekên kîmyewî yên Iraqê revand Îranê. Ne bi alîkariya Şîî'yan bûya Îranê bi serê xwe nikaribû vệ derfetê bikar bîne. Heta niha çekên ji Iraqê hatine revandin nehatine dîtin. Îro li Iraqê, ne tenê hêzên El Qaîde û yên Seddam li dijî Emerîka ne her wiha hêzên Şîî'yan jî bi gelek awayî bi bandora Îranê ve li dijî Emerîkayê ne.

Bi midaxeleya duyem ya hevpeymaniyan ve dîktatoriya Seddam bi dawî hat. Ev jî hêviyeke mezin di nava gelên Iraqê û herwiha yên Rojhilata Navîn de bi cîh kir. Hêviya gelên Rojhilata Navîn berdewamiya helwesta dinyayê ya li dijî vê statukoya Rojhilata Navîn e. Li gor gelek çavkaniyan helwesta Emerîkayê jî guherîna statukoya Rojhilata Navîn bû. Lê çewtiya midaxeleya yekem bandora serkevtina midaxeleya duyem kêm kir. Destêwerdana duyem bi xwe re gelek dijberî anî. Hêzên fundamental li Rojhilata Navîn anî ba hev. Tevgera Filistîn bi rêya Hemas û Huzbilahê ve têk bir. Li Îranê hêza fundamental bihêz kir. Li Iraqê hêza kevneperest xist xizmeta terorîzmê ya bi navê Îslamê. Lê di gel hemû çewtiyan ve jî dîsa li Iraqê demokrasiya siyasî bi ser ket. Ji dema neolîtîk ve heta îro cara yekem e ku gelên Iraqê bi îradeya

xwe hukumetên xwe hildibijêrin. Ev bi xwe serkeftineke mezin e ji bo dahatûya gelên Iraqê ye.

Vê destêwerdana Emerîkayê bi kêrî Kurdan û Şîi'an hat.Herduyan jî ev derfetê bi kar anîn. Di dîroka Iraqê de cara yekem e ku Kurd û Şîi'an serweriya Iraqeka demokrat dikirin. Bi vê derfetê ve girêdayî heta îro du pêvajoyên berbiçav li Iraqê dest pê kirine. Yek ji van derfetana avakirina dewleteke federal e ku Kurdan jî dewleta xwe ava kirin. Herwiha netewatiya Kurdan jî pêşda biriye. Îro civata Iraqa federal weke civateke pirçandî ya tenha ye li Rojhilata Navîn. Pêvajoya duyem jî dîsa bi vê derfetê ve girêdayî, sê hêzên sereke di rojeva Iraqê ya siyasî de ciîhên xwe girtin. Kurd ji xwe netewyeke cûda ye û weke neteweyeke cûda jî tevdilive û mafê xwe diparêze. Lê hêza Ereban ya bi nakokiya 1300 sal berê ve berdewam dikir ku îro ev bi awayekî din derdikeve rojevê. Nakokiya berê tenê nakokiya olî bû. Lê Îro him Şîa û him jî Sunnan yên Ereb li Iraqê ne tenê bi nasnameya olî tev digerin. Vê nasnameyê êdî weke nasnameyeke etnîkî-neteweyî jî bilêv dikin. Ji xwe Ereb heta îro jî ne weke neteweyeke yekgirtî tê binavkirin. Li Iraqê jî vê helwesta Ereban bi zelalî xuya dike.

Weke tê zanîn hemû hewildanên Iraqa yekgirtî, bi zilmê û bi xwînê encam daye. Îro jî hewildanên ji bona Iraqa yekgirtî,ango tendensên netewe-dewletê dîsa dibin sedemên kuştin û terorê. Îro li Iraqê sê neteweyên sereke hene. Kurd, Şîa û Sunna yên Ereb. Gelek kes vê pirsa ku Şîa û Sunna nikarin weke netewe bêne qebûlkirin, diparêzin, divê li Bosniyayê binêrên. Mislimanê Bosniyayê ji bilî olî tu nasnameyeke wan ya etnîkî tune ye. Lê îro him weke misiliman û him jî weke hêzeke etnîkî bi nav dibin. Ji xwe statuya Bosniyayê jî vê ramana jorê îsbat dike. Peter Galbraith, dibêje; Sedemên hemû cahd, hemû hewildan, hemû kuştin û şerê hovane(Şîa û Sunna), ji bona damezrandina neteweyeke şîî û avakirina dewleta rûhanî ya şîe bi xweye"[75]

Êdî ji îro û pêve li Iraqê, tu hêz nema karin van hersê hêzan bi statuyeke weke ya berê û heta radeyekê bi statuya îro jî li hev ragire. Statuya îro ya Iraqa Federe bersiva vê pêvajoyê nade û pêdêviyên statuyeke nû

75 Peter Gabraith, Irak'in Sonu Ulusal Devletlerin çökuşu-The End Of Iraq-Dogan Kitap-Araştirma/inceleme dizisi.Istanbul 2007

di rojeva siyaseta gelên Iraqê de cîh girtiye. Îro bi dengên bilind kesek vê pirsê nayînin rojevê lê di rojeva hemû hêzan de ev pirs sereke ye.

Pêvajoya Iraqê du alternatîfan derdixe pêşberî me. Alternatîfa yekem, bi statuyeke nû hersê hêzên sereke û hêzên kêmneteweyan li hev ragirtine. Ev alternatîf, piştî hilbijartinên parlemena Iraqê ya sala 2010'an bêtir eşkere bû. Vê hilbijartinê guherîna statuya Iraqa Federe xistiye rojevê. Hersê hêzên sereke ji bona xwe bêtir azadiyê diparêzin. Kirasê Makzagona Iraqa Federe ji bona gelên Iraqê êdî biçûk e. Kirasekî mezintirîn pêwîst e. Em dikarin vê alternatîfa yekem bi statuya Dewleta Konfederal ve binav bikin. Ji xwe ji zûdaye vî kirasê Iraqa Federe ji bona Kurdistanê biçûk bûye û nema li bejna wê tê. Loma jî heroj pirsgirêkeke nû derdikeve û bêyî çareseriyê berdewam dike. Pirsgirêka petrola Kurdistanê, pirsgirêka pêşmergeyan, pirsgirêka Kerkukê û deverên din û herwiha pirsgirêka makzagona Kurdistanê çend ji van pirsgirêkan in. Pêşveçûna li Kurdistanê vê sîstem û stauya Federe derbas kiriye û îro bi tu awayî ev statu bersiva pêdêviyên Kurdistanê nade.

**Alternatîfa duyem;** Hêzên îro weke berê dixwazin Iraqeke yekgirtî li gor berjewendiyên Ereban ve berdewam bikin, şovenîzma Erebî bi hêz bikin û mafê Kurdan û hêzên din yên rewa nedin ber çavan tevbigerin û di helwestên xwe de xwedî israr bin, bê gûman wê alternatîfa duyem bibe alternatîfa yekem ku ew bi xwe jî avakirina sê dewletên serbixwene. Ji nuha ve ev nexşeya 3 dewleta weke li jorê xuya dike. Ev helwest bi hunandinek û vejandineke nûjen ku bi cûdabûneke dostanî bi encam bibe, bawerim wê ji bona hemû Iraqiyan weke pêngaveke baş bête pejirandin û bibe sedemeke berbiçav ji bona aramiya herêmê. Dema mirov li dîroka Iraqê ya bextereş ya 80 salan dinêre, mirov sedemên bêaramiya Iraqê di nava hewildan û cahdên ji bona Iraqa yekgirtî de dibîne. Ev hewildanên ji bona yekgirtina Iraqê bûne sedemên jenosîda çandî, zordarî, wêranî, dîktatorî û şîdetê.

Ez bi xwe Konfederalîzmê li gor rewşa îro ya navxweyî û navneteweyî ji bona Iraqê, rast dibînim û hêvîdarim hêzên Iraqî jî têbighêjin ku statuya îro nema bersiva pêşveçûna wan dide. Ger hêzên Iraqê û yên navneteweyî di demeke nêzîk de nikaribin vê pirsê çareser bikin, bi ya min perçebûna Iraqê wê têkeve rojevê û wê bibe pirsa sereke. Serokê

Kurdistanê Mesud Barzanî di 22/3-2010'an de wiha digot: **"Serencama dengdanên Iraqa Federe dikare nexşeya siyasî ya Iraqê biguherîne"** Firat news.[76] Ev helwest dikare bi gelek awa bête şîrovekirin. Lê ez bi xwevê gotarê weke destpêka daxwaza Iraqa Konfederal yan jî weke avakirina dewleta serbixwe bi lêv dikim.

## Sedemên Iraqa alozkirî

Gelên Obeydê ( berî 3500 salan berê li Mezopotamyayê jiyan e) di salên 1900'î de ji nû va bihatana Iraqê wê xwe weke hêzên biyanî nedîtibana. Lewra di salên 1900'î de gundiyên Iraqê, bi alav û aletên wê dema neolîtîk ve di eynê xakî de û eynê tişt diçandin û eynê tişt dixwarin"[77] Li jorê min bi kurtî aloziya Rojhilata Navîn anibû zimên. Ji bona ku em bêtir alozî û feqîriya Iraqê têbighêjin divê em berê xwe bidin dîroka Iraqê û hinek sedaman ji wê derbixin.

"Di salên 680'yî de Xelîfe Umayyed Xelîfeyê Emewiyan bi 4000 leşkerên xwe ve, ji bona bidestxistina neviyê Pêxember Husên Ibn Elî, çû Kerbelayê. Li wê derê hêzên wî û yên Husên hatine himberî hev. Hêza Husên gelek kêm bû. Lê Husên li gor agahiyên wê demê radestî qebûl nekiriye û diber xwe daye. Lê ev berxwedana Husên bû encama serjêkirina wî. Hêzên Umayyed serê wî jêkirin û şandin ji xelîfeyê mezin Yezîd re ku wê demê li Şamê rûdinişt. Tobedarên Şîa 1300 salan li dû heyfa Husên têdikoşin."[78] Bi vê bûyerê ve heta îro şerê navbeyna herdû mezheban berdewam dike û îro ji heroj bêtir kûr bûye. Hêzên Sunna bi dîktatoriya Sedamî ve girêdayî nêzî 30 salan ziyaretiya heciyên Şîa li Kerbelayê qedexe kirin. Piştî 1300 salan Şîa li Iraqê û li Kerbelayê serwer in. Hêzên Sunna li Iraqê serweriya Şîan û ya Kurdan ji bona serweriya xwe weke wendabûneke mezin dibînin û li dijî vê serweriyê radiwestin.

"10 salan piştî koçberiya hz Muhemed ramanên avakirina dewleta

---

76 Mesud Barzani. Firat news 22/03-10

77 Irak'ı Anlamak. William R.Polk. Çapa 2'yem Understanding Iraq- Weşanên NTV. 2007. r.26

78 Peter Gabraith, Irak'in Sonu Ulusal Devletlerin çöküşü-The End Of Iraq-Doğan Kitap-Araştırma/inceleme dizisi. İstanbul 2007.

Îslamî bi zelalî derketibû holê. Piştî vê ramanê jî pêwendiyên ol û dewletê dest pê kirin." S:N Eisenstadt. Pêwendiyên ol û dewletê (dewleta olî-Îslamî) bi destê Emewiyan hatiye bicîhkirin.[79]

Lê bi bandora şoreşa Îranê ve girêdayî, li Iraqê aliyekî hêzên şîa weke minak "Muqteda, ger cîranên me welatên misiliman Îran jî di nav de, bibin hedefa destêwerdanekê emê wan heta dawiyê biparêzin. Hêza Mehdî ya leşkerî ji bona parastina Îslamê hatiye avakirin" Ayetullah Xumeynî Ji bona şîayên Iraqê wiha digot: "Em weke nîjad, weke ol û weke pêşeroj bihevre girêdayî nin. Ji bilî me, li ser rukalê dinyayê mafê tu hêzan (hukumet, netewe) tuneye ku li ser pêşeroja Iraqê bibe xwedî gotin."[80] Di salên 1920'an de hêzên Şîa yên Ereb, hêza Sunna yên Ereb weke hevkarê Îngilîzan didîtin û loma jî hevkariya wan qebûl nekirin û dûrî serweriya Iraqê man. Wana kolonyalîzma Îngilîzan bi hevkariya hêza Sunna yên Ereb ve girê didan û loma jî li dijî wan radiwestiyan. Vê helwesta Şiî'yan ya li dijî Sunna heta sala 2003'an berdewam kir.

### Li Iraqê rûdanên dîrokî

Navê Iraqê weke tê zanîn ne Erebî ye. Navê Iraqê bi zimanê Partî ye û Partan ev nav li Iraqê kirine. Bi Farisî Iraq maneya "ciyê rast, yan jî deşt e".[81] Lê her wiha bi Farisî maneya Iraq tê maneya xwêdanê jî. Germiya Iraqê, bêjeya navê Iraqê bi Farisî afirandiye û ev nav jî li bejna Iraqa bi şewata germ tê.

Wîllîam R.Polk, di pirtûka xwe ya bi navê "Têgihîştina Iraqê" de pirsekê dike û pirtûka xwe hemû yê pêşkêşî vê bersivê dike. **Iraq ji bona çi girîng e?** Ji bona mirov bikaribe bersiva vê pirsê bide divê mirov weke Wîllîam pirtûkekê binivîsîne. Lê ezê bi kurtî him ji devê Wîllîam ku bawerim pirtûka herî baş li ser Iraqê hatiye nivîsîn û him jî ji dîroknas û mîsyonerên din girîngiya Iraqê û sedemên aloziya Iraqê binim zimên.

---

79 *İran'ın Etnik Yapısı, Yakın Dönem ve Günümüzde*, Prof.Dr.Aygün Attar (Haşimzade) Ankara 2006. Divan Yayıncılık. r.13

80 Peter Gabraith, *Irak'in Sonu Ulusal Devletlerin Çöküşu*-The End Of Iraq-Doğan Kitap-Araştırma/İnceleme dizisi, İstanbul 2007.

81 *Irak'ı Anlamak*, William R. Polk. Çapa 2'yem Understanding Iraq- Weşanên NTV. 2007. r.37

Berî hertiştî girîngiya Iraqê di dîrok û di dewlemendiya wê de veşartî ye. Îro hemû gelên li Iraqê dijîn xwe berdewamiya gelên Mezopotamyayê dibînin. Reh û şaxên şaristaniya Mezopotamyayê îro di nava çand û zimanê hemû neteweyan û gelên Iraqê de pir bi eşkereyî mirov dikare bibîne. Nakokiyên wê pêvajoyê îro jî bê rawestan û bêyî çareseriyê berdewam in.

Serokê Babîlê, Hamurabî, berî zayinê di navbeyna sedsala 1792 û "1750'yî de jiyaye. Wî makzagona yekemîn ya cîhanî nivîsandiye. Vê makzagonê hemû pirs û pirsgirêkên xanedana Babîlê dianî zimên û şîrove dikir. Vê makzagonê beşdarî jiyana rojane ya gelên Babîlê dikir. Makzagoneke bi dîsîplîn û bi qaîde ye. Loma jî "Gelên Iraqê ji nivşan ve heta îro fêrî qaîdeyên bi dîsîplîn bûne. Loma jî pir bi asanî ...qeîde û quralên Îslamê qebûl kirin."[82] Ger mirov bixwaze vê bûyerê li gor îro şîrove bike bi ya min îro jî gelên Iraqê hê di bin wê bandora dîrokî de dijîn.

"Bax û bexçeyên di dema Iraqa kevn de, sembola seyraniya dewlemendiyê bû... Persan û Partan bexçe weke **"ciyê der û dora wê bi dîwar", Peyrî-daîze** binav kirine...Dema Îskenderê Makedonî hatiye vê deverê û di germiya Iraqê de ev bax û bexçe dîtine navê wan ezber kirine. Peyrî-daîze bi Yewnanî bûye **Paradeîsos ango cîhê xweş û ciwan**... Erebên ji Erebîstana germ hatine vê deverê û dîsa ketine nava germiyeke din, bi dîtina van bexçeyan navê Yewnanî tercumeyî Erebî kirine "cenet" qebûl kirine. Cenet jî bi maneya" **bexçeyê di nav de av heye**" tê şîrove kirin.[83]

"Efsaneya keştiya nebî Nuh, ji efsaneya Mezopotamyayê tê. Li gor vê efsaneyê xweda Enkî, li dijî xwedayên din yên dixwestin wî ji holê rakin, zilamekî xwe yê bijarte bi navê Utnapîştim, ji bona avakirina keştiyekê bi wate dike.[84]

Serokê Akadê Sargon li gor efsaneyê," di sepetekê de di nava qamişê Firatê de hatiye dîtin" "Sargon kesê ku weke serokê yekemîn yê dewletê di dîrokê de hatiye binav kirin."[85] "Lugal- zilamê mezin- ji dema Sargon

---

82 Berhema navborî, r.28

83 Berhema navborî, r.29

84 Berhema navborî, r.29

85 Berhema navborî, r.30

û heta îro li Iraqê cîh girtiye û bûye çanda Rojhilata Navîn. Sargon xwe weke serokê dinyayê binav dikir. Kyros-Xerxes berî zayinê 539 serokê Medan dema Babîl-Asur girt û bû serokê wan jî, wî jî xwe weke Sargon serokê dinyayê ragihand.

Abdulkerîm Qasim xwe weke serokê yekta û Seddam jî xwe weke serokê wêrek û şûrê Ereban binav kirin.[86] Îro jî ev helwest li Iraqê û li Rojhilata Navîn bi girseyî xwe xuya dike.

Cara yekemîn di dîrokê de Asûriyan asîmîlasyon bikar aniye." Çanda bineciyên berî xwe ji holê rakiriye." 5 mîlyon mirov ji cîhê wan bidûr xistiye û wan fêrî çandeke nû kirine. Asûriyan vê bûyerê bi darê zorê pêk anîne. Piştî bi hezar salan Seddam û dîktatorên Tirkan weke Ataturk û yên Suriyan eynê bûyer tekrar kirine.

Asûr, bi stratejiya şerê gelan ve bû weke dezgeheke leşkerî... mirov ji çiyan anî û wan kir leşkerê bi nirx. Piraniya wan Kurd bûn. Bêyî vîna xwe Asûr bingeha împaratoriya Med'ê Kurdistanê) ava kirin. Stratejiya Seddam jî ew bû. Bi sedhezaran leşkerên bi nirx bera ser serê Kurdan da û wî jî ji kerema xwe re bingeha avakirina Kurdistanê amade kir.

## Di dîrokê de Iraq

Min li gelek cîhî dîroka neolîtîk aniye zimên. Ezê li vêderê, ji dema Îskenderê mezin dest pê bikim. Îskender bz. di 334'an de derbasî Asyayê bû. Li der û dora Erbîlê hucûmî hêzên Partan kir. Wê demê Partî li deverê serwer bûn.( Binêre beşa Îranê, Di eslê xwe de hînê jî Med û Pers e.) Dûre derbasî Misrê bû. Ji misrê vegeriya û Babîl xist destê xwe, bz.330. Ji Babîl dest bi meşa dagirkirina Îran, Efganîstan û Hîndîstanê kir. Îskender çû heta Hîndîstanê lê nexweşiya ku di nava leşkerê wî de derket wî bi şûnda vegerand. Piştî mirina wî leşkerên wî bûne çar perçe û her yekî berê xwe da ciyekî. Îskenderê Makedonî di hatina xwe ya vê herêmê de, cara yekem Persepolîs û dûre bi dehan bajarên Îranê ser û binî hev kir. Dîrok rawestand û dîrokeke nûjen derxist holê. Bi hatina Îskender ve bêjeya berî Îskender û piştî Îskender hate bikaranîn. Hemû

---

86 *Irak'ı Anlamak*, William R.Polk. Çapa 2'yem Understanding Iraq, Weşanên NTV. 2007.r.31

şaristaniyên berî xwe wêran kir. Hemû şaristaniyên ola Zaraduşt hatine şewitandin. Şîrovekirina jiyanê bi hatina wî re hate guherîn. Di wê navberê de, qabîleyên Asya navîn, gîhiştin hev û bi hêzeke mezin berê xwe dan Babîlê. Ev hêza mezin bi navê Partan tê zanîn. Bz.144.Ew jî ji qabîleyên Aryaniyan tên. Piştî Partî ji nû va hatin vê deverê şerê wan û hêzên Romiyan dest pê kir. Romî li Herranê şikandin. Bz. 53.

Di vê demê de şerê navbeyna qewma li Iraqê berdewam dikir. Dijî serweriya Partan qabîleyên Îranî piştî zayinê di 224'an de bi navê Sasanî ya împaratoriya xwe ava kirin. Avêtên ser Iraqê û Iraq jî xistin destê xwe. Weke Part û Romiyan vê carê jî şerê Sasaniyan û Bîzansan dest pê kir. Şerê herdû hêzan gelên Rojhilata Navîn ji eyarên wan derxistin. Dever wêran kiribûn. Hêzeke sêyem dikaribû bi asanî cîh li van deverana bigirtaya. Di wê navbêrê de berbanga hêzeke mezin û şervan ji nava Erebistanê dest pê dikir. Di sala 570'yî piştî zayinê de Muhemed hate dinyayê.

## Di dema Îslamê de Iraq

Li Meke û Medînê oleke nû dest pê kir. Bi serokatiya Muhemed ve ola Îslamê bi girseyî ber bi bakur de dihat. Di serî de ez dixwazim bêjim hatina Îslamê ya Iraqê çanda Iraqê ya hezar salan guhert. Lê çanda Îslamê jî di bin bandora çanda ya bi hezar salan ya Iraqê de dima. Iraq di vê demê de weke navenda bezirganiyê bû.

Hêzên Îslamî di dema Muhemed de gelek riyên bazirganiyê ji Erebîstanê yên ber bi Suriye û ji aliyê din ve ber bi Hindîstanê girtin destên xwe. Muhemed jî yek ji wan bazirganan bû. Lê Muhemed dev ji bazirganiyê berda û di 40 saliya xwe de, xwe weke pêxember ragihand. Xwe da xebata olî û

Îslamiyet pêşde bir. Di wê demê de Musewî û Îsewî jî bi hêz bûn. Lewra Muhemed herdu ol jî weke olên muqedes binav dikir. Wî weke resûlê xwedê, tenê wehiy, gotinên xwedê ji alemê re digot. Wî wehiyên berê yên ji Musa û Îsa re hatibûn, bi guherîneke biçûk, lê ya herî girîng bi Erebî digot. Ev cudahiyeke mezin bû. Wî di hatina xwe ya Medîneyê de peyman di nava xwe Musewiyan de pêk anî û ev peyman kir dadweriya Îslamê. Vê dadweriyê bandoreke mezin li ser gelên herêmê

hişt. Di dema wefata Muhemed de Îslamiyet li Erebîstanê xûrt bibû. Di Tewratê de Yuda-Yehud weke qewmê bijarte bi lêv dibe. Kuranê jî zimanê Erebî weke zimanê bijarte bi lêv kiriye. Heta îro jî wergêra Kuranê çewt tê bilêvkirin.

Piştî wefata Muhemed, hêzên Îslamê Ebu Bekir hilbijartin. Ebu Bekir cara yekem hêzên Îslamê ber bi bakur ve kişand. Împaratoriya Sasaniyan û ya Bîzansiyan xistin nava qelqeleyeke mezin. Di vê demê de hînê şerê Sasaniyan û Bîzansiyan berdewam dikir û gîhiştibû Filistînê. Şerê herdu împaratoriyan, bibû encama aloziyeke mezin li Rojhilata Navîn. Sasaniyan ola xwe ya Zaraduştî û Bîzansiyan jî Îsewîtî (Ortodoxî) li navçeyê belav dikirin. Ereban herdu ol jî qebûl nekirin û ji herduyan jî aciz bubûn. Di sala 633'yan de hêzên Îslamê berê êrîşî Sasaniyan û duvra jî li aliyê Şamê êrîşî Bîzansiyan kirin û wan şikandin. Hêzên Îslamê ji Iraqê heta Qudisê xistin destên xwe û xelîfe çû Qudisê. Ebu Bekir li Iraqê olên kevnare neguhert. Lê wan xist xizmeta Îslamê. "Weke di Quranê de jî tê gotin ola Îslamê ola Ereban e û ji aliyê Muhemed ve bi erebî hatiye gotin".[87]

Omer di dema xelîfetiya xwe de xanedana Sasanî li Iraqê bidawî anî. Lê Sasaniyan tola xwe bi kuştina wî hilanîn. Omer ji aliyê hêsîrekî Sasanî ve hate kuştin. Pitşî wî Osman bu xelîfe. Di dema Osman de qabîleyên Ereban yên Îslamî ketin sîngên hev û şerê hev kirin. Osman ji aliyê qabîleyeke Ereb ve hate kuştin, di sala 655'an pz. Elî di vê dema tevliheviya hêzên Îslamî de bû xelîfe. Qabîleya Emewiyan xelîfetiya Elî qebûl nekirin û li dijî wî derketin. Hêza Îslamê jî li ba Emewiyan bû. Serokê qabîleya Emewiyan Muawiye wê gavê li Şamê walî bû û hêzeke wî ya mezin ya leşkerî hebû. Wî jî weke hemiyan cara yekem berê xwe da Iraqê û li ciyê Elî bû hêzeke mezin. Elî di sala 661'ê de ji aliyê Mislimanekî Emewî ve li Kufayê hate kuştin. Ji bilî Ebu bekir ku ew bi xwe kalekî salmezin bû, hemû xelîfeyên piştî Muhemed bi destên wan hatine kuştin, Ji bilî Osman.

Piştî kuştina Elî Emewî bûne hêzeke mezin li Iraqê. Lê gelên Iraqê

87 *Irak'ı Anlamak*, William R. Polk. Çapa 2'yem Understanding Iraq, Weşanên NTV. 2007. r.49

ji Ereban aciz bûn. Li vê derê dixwazim perantêzekê vekim û bêjim Iraq çawa doh ne weke perçeyek netewa Ereban bû û îro jî ne perçeyeke netewa Erebî ye. Heta îro ev weke nakokiyeke sereke di nava neteweyên Iraqê de berdewam dike. Bi kuştina Elî ve hêzên Iraqê li dijî Emewiyan tevdigeriyan. Alîkariya Husên dikirin. Şerê Elewiyan û yên Emewiyan di vê navbeynê de berdewam dikir. Piştî kuştina Husên ku min berê anîbû zimên, êdî dijberiya bi sedsalan ya navbeyna Şîan û Sunnan dest pê kir û heta îro berdewam dike.

Di vê navbeynê de hêzeke din derket holê ku ew jî Ereb bûn û alîkariya hêza Şîan wergirtin. Ew Abbasî bûn. Piştî serketina Abbasiyan xwe weke hêzeke Sûnnan bi nav kirin. Wê demê hêza Şîan bi navê Haşîmiye berdewam dikir. Abbasiyan cara yekem hêza ku alîkariya wan wergirtibû ya Haşîmiye ji holê rakir û dûre berê xwe dan Emewiyan. Li Iraqê, Suriya û li Misrê dawiya Emewiyan anîn. Abbasî ji Ereban bêtir awayên jiyana Îranî diparastin. Xwe nêzî Sasaniyan didîtin. Di dema Mensur de çiqasî xwe weke Sûnnan jî binav dikirin lê awayên jiyana wan ya Şîa û weke ya Sasaniyan bû ango weke ya Zaradustiyan bû. Di dema Abbasiyan de Baxda bû navenda bazirganiyê. Di dema wan de hemû ol û qabîleyên cûda bi azadî dijiyan. Weke wîllîam dibêje wê demê Newroz bi girseyî dihate pîrozkirin ku ew bi xweweke çanda Zerdûştiyan dihate nasîn.

Xelîfeyê Bexdayê Harûn-î Reşîd weke xelîfeyekî bi dadwer dihate nasîn. Seddam gelek carî teqlîda wî dikir. Li kuçeyên Bexdayê di nava gel de digeriya û didît. Piştî mirina Harun-î Reşîd xelîfetî di nava herdû kurên wî de perçe bû. Aliyekî Iraq û aliyekî jî Îran ji xwe re kirin xelîfetî. Di vê demê de Aliyê Iraqê leşker ji Asya navîn anîne û wana jî weke Asuriyan kirine û li dijî hev bikar anîne. Tê gotin ku ew leşker Tirkmen bûn. Piştî demekê Samara kete nav destên leşkerên Asya navîn. Samara paytexta Mutasim kurê Harûn bû. Van leşkerana vê derê ser û binî hev kirin, 892 pz.

Li başûrê Iraqê maden hatibû peyda kirin. Xelîfe ji Zanzîbarê Ebîd tanîn vê derê û bi nano zikê wan dixebitand. Demek hat Ebîdan weke Spartakus serî li himber xelîfe rakirin û ew jî bûne hêzeke leşkerî, 883 pz. Dewleta xelîfe ya Îslamê ji bona gel êdî bibû hêza bacê û hêza wêranê. Gelên Iraqê ji xelîfê aciz bûn.

Di vê aloziya xelîfetiyê de hêza Selçûkiyan derbasî vê navçeyê dibûn. Di sala 1055'an de Selçûkî bir bi bir berê xwe dan Rojhilata Navîn. Çînê pêşiya wan girtibû û cîh ji xwe re nedidîtin. Birekî mezin yê Selçûkiyan gîhiştin Bexdayê. Ev bûyer bi destê wezîrê Selçukiyan yê Îranî Nîzamulmulk pêk hat. Nîzamulmulk ev dever xiste destê xwe û dest bi ewlekariya herêmê kir. Xelîfetî kete destê Selçukiyan.

Li vê derê dixwazim piçekî behsa Selçûkiyan bikim. **"Di dîroka dewleta Selçukiyan ya mezin de, di erka wezîrtiyê de tenê yek kesekî Tirk, di dema salên 1122-1124'an de wezîrtî kiriye. Ew jî her dem ji aliyê dîwanê (erka biryara dewletê) ve weke qeşmerekî hatiye dîtin."**[88] Di dema Selçûkiyan de, Iraq hê di nava aloziyekê de dijiyan. Lê Selçûkî heta şamê çûn û armanca wan ew bû ku di ser Helebê re derbasî Qudusê bibin. Wê demê Qudus di destê Bîzansiyan de bû û şerê Bîzansiyan û Selçukiyan di herêmê de berdewam dikir. Di dema Nûredînê Zengî de serokleşkerê hêza Selçûkiyan di destê Kurdan de bû. Yek ji wan jî mamê Selaheddînê Eyyubî Şêrgo ye. Piştî mirina Şêrgo biraziyê wî Selaheddîn (Yusuf) dibe serleşkerê Selçûkiyan yên herêmên Suriya û dû re jî yên Misrê. Weke tê zanîn Selaheddîn dû re emrê Nûreddîn qebûl nekir û bi serê xwe tevgeriya. Berî şerê Nûreddîn û Selaheddîn dest pê bike, Nûreddîn mir û kurê wî ku zarok bû ji şuna wî hate hilbijartin. Ji wê demê û pê ve Selaheddîn bingeha dewleta Eyyubiyan amade kir û dû re jî Imparatoriyeke mezin ava kir. Piraniya xaka Dewleta wî ne li ser xaka Kurdistanê bû. Lê yên vê dewletê ava dikirin Kurd bûn. Di vê demê de li Rojhilata Navîn xakeke bijarte ya di destê hêzekê de dima tunebû. Dewletên vê herêmê her dem serweriya xwe guhertine û tu carî jî dewletek li ciyê yek gelî nehatiye ava kirin. Hêzên serweriya nû, hêzên kevnare bi dawî neanîne. Ya Eyûbiyan jî wihabû. Dewleteke têkel e lê bi navê xanedana Kurdan ya Îslamî-Sunna hatiye ava kirin.

Di dema Selçûkiyan de gelên herêmê yên Îsewî û ta radeyekê yên Musewî jî bi Bizansiyan û bi xaçperestan re hevkarî kirine. Vê hevkariya wan di dema Moxolan de wexta Hulagû de jî berdewam kiriye. Lewra Hulagû Îsewî parastine. Diya wî û jina wî Îsewî bûn. Lê wî tu

88 *İran'ın Etnik Yapısı, Yakın Dönem ve Günümüzde* Prof. Dr. Aygün Attar (Haşimzade) Ankara 2006. Divan Yayıncılık. r.56

caran bi Îsewîtiyê bawer nekirî ye. Vê hevkariyê gah bi dizî gah bi eşkereyî heta Osmanî hatine vê herêmê jî berdewam kiriye.

### Xaçperest û hêzen Îslamê

Şerê Selçûkiyan û yên xaçperestan ku weke Fransiyan dihatine binavkirin, bi biryara kilîseyên Fransayê ve di derdora sala 1090'î de ku berê xwe dabûn Rojhilata Navîn û dixwestin hêza xwe li Qudusê bi cîh bikin, berdewam dikir. Vê helwesta ne tenê ya xaçperestan û Bizansiyan bûn her wiha armanca Selçûkiyan jî weke ya wan bû û dixwestin Qudisê têxin destên xwe. Salaheddîn vê daxwaza Îslamê bi cîh aniye. Parentêzekê li vir vedikim û dixwazim piçekî çalakiyên Selaheddîn bînim zimên.

Diynastiya Eyyubiyan ya Kurd-Îslamî-Sûnna ku ji aliyê Selahadînê Eyyubî hate ava kirin, ji Misrê, hetanî Suriyê, Yemenê, Flistîn, Urdun (Jordan) û Perçeyek ji Iraq, Aliyekî mezin yê Kurdistanê jî di navde Împaratoriyeke mezin bû.

Di sala 1169'an de hate ava kirin û di sala 1250'î de hate rûxandin. Lê aliyê wê yê Suriyê heta sala 1330'yî berdewam kiriye. Eyyubiyan li alema Erebî, Musewî, Îsewî û Mislimanan bi xanedaneke 161 salan berdewam kiriye û bi serweriya Kurdan ve hatiye hukumkirin. Lê em nikarin bêjin ev dewleta Kurdistanî bû. Lewra bi piranî li ser xaka biyanî hatiye ava kirin. Ger em bixwazin heqîqetê bêjin, serkêşên Eyyubiyan yên serkêşiya Îslamê kirine weke xelîfe, hemû dîroknasê dinyayê vê "diynastiyê" weke "diynastiya" Kurd binav dikin. Lê ev pirs di nava Kurdan de mijara devjeniyê ye.

Salaheddîn di sala 1138'an de li Tikrîtê hatiye dinyê û di sala 1193'an de li Damaskusê çûye ser dilovaniya xwe. Ew di dema berî sefera xaçperestan û dema sefera xaçperestan ya sêyem de bû serokê alema Îslamî yê herî mezin.Turbeya wî li Şamê ye.

Sultaneta wî ji aliyê kur û birayên wî berdewam kiriye, lê Memlukiyan ku weke hêzeke leşkerî û kole bûn, aliyê vê xanedanê bi zorê xistin destên xwe û bi gelemperî împaratoriya Eyyubiyan bi dawî anîn.

Bavê Salaheddîn, Necmeddîn Eyyubî di dema Selçukiyan de waliyê Baalbekê bû. Salaheddîn rêdike Şamê ji bona bixwîne. Piştî demekê Salaheddîn weke bav û apê xwe prensê Selçûkiyan Nûreddîn Zengî

nas dike. Piştî vê nasînê jiyana wî hate guhertin. Bi apê xwe Şêrgo re çû sefera Misirê. Di vê seferê de bû serokê hêzeke Leşkerên apê xwe. Apê wî serokleşker bû. Piştî mirina Apê xwe, li Misrê bû serok leşker û Emîrê xelîfetiya Fatîmiyan. Bi êrîşên xaçperestan ve rû û bi rû ma, lê her demê ji heqê xwe derket û çû heta Filistîn. Nûreddîn Zengî ji serkevtinên Selaheddîn aciz bû û xwest pêşiya wî bigire. Lê Nûreddîn di sala 1174'an de mir û rê ji sultaniya Selahedîn ya Eyuyubiyan re hate vekirin. Êrîşên xaçperestan berdewam kir. Şerê mezin yê Salaheddîn û xaçperestan di sala 1187'ê de dest pê kir. Di vî şerî de xaçperest şikestin û Salaheddîn kete Yarûsalemê. Dawî jî Kralê Ingilîz Rickardê Dilşêr di sala 1191'ê de hate vê herêmê û bi hêzeke mezin gelek cîh ji Salaheddîn wergirt lê tu caran nekarî bê Qudusê. Salaheddîn di sala 1193'an de çû ser dilovaniya xwe û piştî wî birayê wî û kurên wî heta sala 1330'yî xanedana wî berdewam kirin.

Rickard her dem dixwest bi Salaheddîn re bê ba hev. Lê Selaheddîn ev derfet neda wî. Qasidê wî çend caran çû ba Selaheddîn û daxwazên Rickard jê re digot. Carekê Selaheddîn wiha dibêje "Ez li welatê xwe, di nava zarok û xanedana xwe de dijîm" li vir mebesta min çiye? Selaheddîn ciyên xanedana Eyyubiyan weke welatê xwe dizanî û loma jî welatê xwe wiha dianî zimên. Bêgûman Kurdistanek li ba Selaheddîn bi tu awayî tune ye û tenê hêza xwe ya mezin ji Kurdistanê wergirtiye. Dema nevî neviyê wî Turanşah li Kurdistanê bû, Memlukiyan xanedana wan ya Misrê dixistin destên xwe. Wî bi hêzeke mezin ji başûrê Kurdistanê berê xwe da Misrê û çû alîkariya bav û birayê xwe. Ev bi xwe jî pêwendiyên Eyyubiyan bi Kurdistanê re eşkere dike. Binêre pirtûka bi navê "Li gor raya Ereban seferên xaçperestan" Amîn Maalouf.[89]

Di dema Salaheddîn çûbû ser heqiya xwe û birayê wî û kurên wî xanedana wî berdewam dikirin û di berdewamiya vê aloziyê de hêzeke din ji Asya navîn ber bi Rojhilata Navîn dihat. Weke lehiyekê hemû şaristaniyên dikete ber wan tar û mar dikirin. Nav û dengên wan li hemû Rojhilata Navîn belav dibû. Tirseke mezin dixist dilê gelên Rojhilata Navîn. Ew Moxolên bi serokatiya Cengîz xan bûn. Cengîz, pêşî

89 Korstågen- Enligt Araberna-Amin Maalouf. Alhambra Förlag AB. 2004 Sverige (bi Swêdî)

berê xwe da Çînê, sala 1155'an pz. Dûre berê xwe da Rojhilat. Berî mirina xwe Cengîz di sala 1220'an de Bûxara'yê (Herêmeke Îranê ye) girt destê xwe û kavil kir. Dûre Semerkand girt û wê derê jî wêran kir. Zenatkarên vê deverê kuştin, şaristaniyên vê deverê, heywan û mirov çi diket ber wan wêran dikirin. Hovîtiyeke nedîtî bi tirseke nedîtî ve nav û dengên Cengîz Xan bela dibû. Armanca şerê wî ku bighêje Bexda. Iraqî gelekî di tirsiyan. Lê Cengîz xan negîhişt Iraqê û mir, sala 1227'an pz. Kurê Cengîz Monke, Hulagu şand ser Iraqê, sala 1251 pz. Hulagu heta Bexda ne sekinî. Kî û çi ketin ber hêza wan hatin kuştin.

Hulagû û hêza wî berî bighêje Bexdê, navê Kurdan û navê Selaheddîn bihîstibûn. Wî bawer dikir ku Kurd dikarin jê re bibin asteng. Hulagû, di demeke aloz de hate vê herêmê. Ji aliyekî li Bexda hînê Abbasî li ser hukum bûn û xelîfetî di nava kirîzeke siyasî de dijiya.

Ji aliyekî din ve Xanedana Eyyubiyan hînê berdewam dikir û Memlûkî di nava Eyyubiyan de weke hêzeke leşkerî gelek cîhên Eyyubiyan dixistin destên xwe.

Dê û jina Hulagu Îsewî bûn û bandora Îswewîtiyê li ser wî hebû. Lê wî tucarî baweriya xwe bi Îsewiyan ne aniye. Ew her weke Şamanî ma. Lê di hatina xwe ya Rojhilata Navîn de hêzên xaçperest, hêzên Îsewiyên herêmê û Yehûdiyan xwestine hevkariyê bi Hulagu re bikin. Li gelek cîhî jî ev hevkarî pêk anîne.[90]

Loma cara yekem berê xwe da Kurdistanê. Lê Kurd li vê herêmê gelê herî şervan bûn. Li çiyan dijiyan û xwe radestî tu împaratoriyan nedikirin. Mirov dikare bi asanî bêje ku Kurd li dijî hemû dagirkerên vê herêmê rawestiyane û şerê wan kirine. Lewra hemû dagirkeran ji bona vê herêmê bikaribin dagir bikin divabû hêza Kurdan lawaz bikirana. Willîam dibêje" **Kurdên bi bela"**. Di şerê Kurd û Moxolan de Kurd şikestin û Hulagû Kurdistan kavil kir. Di ser Kurdistanê re derbasî Bexda bû. Hêzên kurê Harûnî Reşîd, Xelîfeyê Bexda, Mustasim xwe radestî Moxolan kir û Bexda kete destên Moxolan, (sala 1258 pz.) Piştî Hulagû, di dema hatina Tîmur Leng de dîroknas dibêjin kêm mirov hatine kuştin. Sedemê kêmkuştina mirovan jî, bi nehişti-

90 Korstågen-Enligt Araberna-Amin Maalouf. Alhambra Förlag AB.2004 Sverige (bi Swêdî)

na mirovan ji aliyê Hulagû ve nişan dikin. Ne ku Tîmor ji Hulagû bi merhamettir bû. Lê wan jî ev herêm weke hêzên Hulagû kavil kirine, sala 1400 pz.

### Şerê Safewiyan û Osmaniyan

Piştî van bûyerana, bi texmînî 100 salan, ji aliyê Îranê ve xanedanek derket rojevê. Ev xanedana Safewiyan bû. Di bingeha xwe de yên Şîa li Iraqê bi cîh kirin Safewî bûn. Di sefera xwe ya di ser Iraqê de, Şahê Safewî dest bi kuştina Sunnan kir. Hêza Safewiyan bi hevkariya hêzên Şîa û yên Zaraduştiyên kevn ku bi zorê bibûn misiliman ve mezin dibû. Her dû aliyan jî ji hêza Sunnan gelekî kişandibûn û li dijî hêza Sunnan tev digeriyan.

Di vê demê de Yavuz, padîşahê Osmaniyan bû. Osmaniyan hêza xwe xurt kiribûn û li dijî Şahê Safewiyan dixwest dest bi şer bike. Wî jî mafê mezheba Sunnan diparast. Loma jî li dijî vê helwesta Safawiyan nikaribû bêdeng bima ya. Wî xwe weke xelîfeyê Islamê û nemaze yê Sunnan bi nav dikir. Bi vê nakokiyê ve girêdayî, her wiha pirsgirêka Kurdan jî di nav de, şerê Safewiyan û Osmaniyan li Çaldiranê dest pê kir, di sala 1514'an pz. Safewî di şerê Çaldiranê de şikestin. Ev şer li Iraqê bû sedemên dijwariya mezin ya navbeyna hêza Sunnan û Şîan. Sunnan destê Osmaniyan û Şîan ji destê Safewiyan digirtin. Em vê nakokiyê di nava Kurdan de jî dibînin. Piştî şikestina Safewiyan Iraq bi alîkariya hêza Sunnan kete destê Osmaniyan û Sunna li Iraqê bûne serwer. Piştî Osmaniyan Iraq piçekî hate ser xwe. Hêzên dereke êdî quwetên xwe ji ser Iraqê bidûr xistin.

Di dawiya sedsala 18'an de Îngilîzan di navebeyna Iraq û Hîndîstanê de pêwendî ava kirin. Gava yekem ava kirina konsolosxaneyan bû. Yek li Basrayê, di sala1764'an û yek jî li Bexdayê- di sala 1834- ava kir. Dûre keştî bera nava Dîcle û Firatê dan. Di vê navberê de Elman û Fransizan jî xwestin bên vê herîmê. Elmanya bi pêwendiyên xwe yên bi Osmaniyan re dixwestin rêya trênê di navbeyna Stenbol û Basrayê de ava bikin. Di vê demê de Fransizan Misir dagir kiribûn- sala 1798- û dixwestin pêşiya Îngilîzan bigirin. Wê demê Ingilîz li Hîndîstanê û li Iranê bi hêz in û dixwazin li Rojhilata Navîn serwer bin. Napolyon berê xwe dide Suriya û Filistînê lê di sefera xwe de bi ser nakeve. Îngilîzan

hêzeke mezin rê dikirin vê herêmê. Ingilîz ji Fransiyan ditirsiyan ku berê xwe bidin Iraqê û vê deverê dagir bikin.

Di dawiya sedsala 19'an de dîsa şerê xaçperestan bi awayekî din berdewam dikir. Aloziya navbeyna dewletên mezin berbanga şerê cîhanî eşkere dikir. Elmanya bi hêzeke mezin hat Rojhilata Navîn. Iraq ji nû ve weke carên berê dibû hedefa hêzên derekeyên dagirker. Fransizan, Îngilîzan, Rûsan, Elmana berê xwe didan Iraqê.

Îngilîzan di sala 1907'an de li Iranê Abadanê- petrol dîtibûn lê wan bawer dikirin ku petrola mezin li Iraqê ye. Loma Iraq dibû ciyekî girîng û bala hemû hêzên dereke dikişand ser xwe. Li vê derê girîngiya Iraqê dertê holê. Îngilîzan petrol weke damarên jiyanê bi nav dikirin. Berdevkê hukumeta Igilîz yê Rojhilata Navîn Sîr Mark Sykes wiha dibêje "Iraq, di dinyayê de welatê herî bi ber e"[91] Ji vê demê û pê ve di sala 1914'an de amadeyî yê hakîmiyeta Îngilîz têne kirin.

## Di dema şerê yekemîn yê cîhanî de Iraq

Sedema destêwerdana Îngilîzan ya Iraqê, bi gelek sedeman ve hatiye xemilandin. Wîllîam dibêje, "sedema destêwerdana Inglîzan ya wê demê weke ya Emerîkayê ya sala 2003'an ya li ser hinek sedemên ne rast hatine ava kirin. Rastiya vê gotinê heye. Lê encamên her du destêwerdanan cûda ne. Hevbeşiya her du destêwerdanan jî heye. Armancên herdu destêwerdanan ji nû va vejîna herêmê ye. Encamên destêwerdana Emerîkayê erênî ye û dikare bibe sedemên destêwerdanên stratejiya Emerîkayê ya Rojhilata Navîn. Min li jorê di beşa Rojhilata Navîn de anîbû zimên heger ev projeya Rojhilata Navîn ya Emerîkayê bibe sedemên ji nû va vejîna Rojhilata Navîn, erêniye. Lê ya Îngilîzan weke Mam Celal dibêje tenê encama alozkirina Rojhilata Navîn bi xwe re aniye û bûye sedema şerê navbeyna neteweyan yên bi salan. Şer û nokokiyên îro yên Rojhilata Navîn nakokiyên destêwerdana Îngilîzan bi xwe ye. Îngilîzan dewletên neteweyên tune avakirine û neteweyên xwedî xak û dîrok jî bindest hiştiye. Destêwerdana Emerîkayê mirov dikare bêje şerê sererast kirina çewtiya wê demê ye. Hevbeşiya her du destêwerdana jî bêgûman

---

91 *Irak'ı Anlamak*, William R. Polk. Çapa 2'yem Understanding Iraq, Weşanên NTV, 2007. r.74

bidestxistina çavkaniyên "rehên jiyanê" ne ango av û petrol e. Lê serdemiya wan û encamên destêwerdanên wan ne wekî hev in.

Di dema şerê yekem de Elmanya, Împaratoriya Osmanî kiribû hevkarê xwe. Di vê navberê de şerê cîhanî ji Ewropayê di sala 1914'an de dest pê kir. Di dawiya sala 1914'an de Îngilîzan Iraq dagir kir. Padîşahê Osmanî cîhada li dijî Brîtanya mezin dest pê kir. Ji nû ve dîsa şerê hêzên dereke ji bo bidestxistina dewlemendiyên Iraqê şerê hev dikirin. Împaratoriya Rûs û dewleta Fransizî jî gîhiştin vê herêmê. Împaratoriya Rûs ne wekî berê bihêz bû. Muxalefeta nava Împaratoriyê bi hêz dibû û Rûsî mijûl dikir. Hînê berî şerê cîhanî dest pê bike Brîtanya Kuweyt û Basra xistibûn destên xwe. Di sala 1915'an de hêzên Birîtanyayê berê xwe dan Bexdayê. Şerê Osmaniyan û yê Brîttanyayê yê mezin li der û dora Bexdayê dest pê kir. Di vî şerî de Birîtanî şikestin. Birîtanya êdî tê gîhişt ku bi vê hêza xwe dê nikaribe li Iraqê bi ser keve.

Hêza xwe ya leşkerî xurt kir û dest bi êrîşên xwe kir. Li gor baweriya Îngilîzan ev herêm dewlemend bû û pêwîstiya Birîtanya yê bi Iraqê hebû. Yekem sedem, petrola Iraqê derbixe ya duyem jî, petrola Iranê ku di destê Brîtanyayê de bû biparêze. Hêzeke weke Fransiz yan jî Elman li vê herêmê ji xwe re weke tehdît didît. Şerê cîhanî li Rojhilata Navîn di 30/10-1918'an de bi peymana rawestina çekan bidawî hat û pirsgirêk li ser maseya axaftinê rawestî ma.

Ezê li jêrê di beşa Kurdistanê de vê demê bînim zimên. Lê dixwazim bi kurtî be jî çend gotinan bêjim. Wîllîam wiha dibêje "Li gor baweriya dibistana Hindîstanê" ku ji berdevkên siyasî û stratejî ya Brîtanyayê ve pêk dihatin, Iraqî ji sê gruba pêk dihatin.

Ji wana ya yekem Kurd û Bedewiyên Iraqê bûn...evana weke hêzên bi xeter û hovên serdemî, ku nikarin serweriya dewleteke bikin têne binav kirin. Ya duyem jî ji jaran, kedkara, gundiya û ji nezanan pêk tê ku ji îdarekirina xwe acizin. Hêza sêyem ya herî nebaş e, ev jî Erebên bajarî yên ji xerakirinê hezdikin. Ger rê ji serweriya vana re vebe wê welat tar û mar bikin. Ji ber van hersê sedemana serweriya Îngilîzan pêwîst e."[92]

Lê gelên Iraqê serweriya Birîtanyayê weke kolonyalîstî bi nav kirin û di mizgevtan de li dijî vê serweriya dereke derketin. Îngilîzan bi vî

92 Berhema navborî, r.82

awayî nikaribûn serweriya xwe berdewam bikirana û vê pirsgirêkê dibin Neteweyên Yekbûyî.

Cemiyeta Netewên Yekbûyî serweriya Birîtanyayê ya mandatî qebûl kir. Êdî Birîtanya li ser navê Neteweyê Yekbûyî îdareya Iraqê dikir.

Ev pîlan di sala 1919'an de hate amade kirin û di sala 1920'an de jî bi konferansa San Remo ve hate qebûl kirin. Lê ev biryar ji aliyê gelên Iraqê ve nehate pejirandin. Hêzên Sunna û Şîa bi hev re li dijî Îngilîzan dest bi şer kirin. Ji xwe Şerê Kurdan û Îngilîzan hînê berî vê yekê dest pê kiribû û berdewam dikir. Ji bo vê serhildanê Birîtanya mecbûr ma hukûmeta Iraqê ava bike. Lê kesên li gor xwe nedidît in ku bikaribin serweriyeke Îraqî ava bikin. Berpirsê Birîtanyayê wê demê Sîr Percy Cox bû. Ewî endamên konseya dewletê helbijart û xwest bi destê wan êdî serweriya xwe berdewam bike. Ev tedbîr pir neçû loma têgihîştin ku bi vî awayî naçe. Birîtanyayê li Iraqê weke li Iranê çawa Pehlewî anîne ser hukûm li Iraqê jî, hêza Sunna derxistin pêş û li serokê Iraqê yê Sunna geriyan.

Di wê navberê de Churchill hemû berpirsên Birîtanyayê li Misrê civand û pirsgirêkên Birîtanyayê yê serweriya Rojhilata Navîn minaqeşe kir. Wê demê Kral Faysal ji aliyê Fransizan ve ji kraliyeta Suriyê ve hatibû bidûrxistin. Îngilîzan wî anî Iraqê û taca kral dane ser serê wî. Bi vî awayî serokê hêza Sunna dihate peyda kirin. Ev dem dema Kurd û Şîa li dijî serweriya Iraqê dimînin û Kurdistan weke perçeyekî ji Iraqê tê binavkirin. Lê di serî de Kurd û herwiha Şîa û gelên din vê helwesta Birîtanyayê qebûl nekirin. Lewra Iraq hînê di dema Osmaniyan de weke sê wîlayetan hatibûn payêkirin. Basra, Bexda û Mûsil. Bexda bi Îngilîzan re ma û aliyên din jî bûne dijberî Îngilîzan.

Îngilîzan dixwestin Mûsil ji ber pirsgirêka Kurdistanê, bidin serweriya Fransizan. Lê dema ku hate têgihîştin ku li vê herêmê petrol heye nêrînên xwe guhertin û bala xwe dan ser vê herêmê. Di wê demê de jî hêza Rûsan hatibû hetanî Rewandizê û ji wir jî derbasî Îranê dibûn. Birîtanya ji Rûsan didirsiyan û loma jî bala xwe bêtir didan vê herêmê. Lê piştî şoreşa Oktobrê bi peymana Sykes Pikot ve Sowyetê hêzên xwe ji vê herêmê kişandin, Ingilîz tenê li vê herêmê weke serwer man. Wê demê ji nû va Mûsil û Basra jî bi Bexda ve hate girêdan û Sûnna weke serwerê Iraqê man.

Di vê demê de Konferansa Parîsê û ya Sewrê dest pê dike. Vê konferansê encamên baş afirand lê mixabin Kurdan nikaribûn vê derfetê bikar bînin û dewleta xwe ava bikin. Sedema neavakirina dewleta Kurdî ya dereke Birîtanya bi xweye. Wîllîam li ser vê pirsgirêkê wiha dibêje" Dibistana Hîndistanê, bi israr dixwestin Kurdistan di nava Iraqê de cîh bigre. Churchîll bê biryar bû. Wî bawer dikir ku dewleta Iraqê ya Ereb wê zilmê li Kurdan bike. Bi awayekî li hev kirin. Wê Kurd di nava cûdahiyeke demî de bimînin. Lê dawiyê wê bi dewleta Iraqê ya Ereb re bibe yek. Çarenivîsa Kurdan bi xwe ne bi Kurdan ve girêdayî bû. Vê cûdahiya demî ji ber dîtina petrolê li herêmê bû. Di 23/07-1923'yî de Peymana Lozanê pêk hat û dewleta Tirk nas kirin û qebûl kirin, lê rewşa Kurdan nehate rojevê. Sedema berdewamiya Kurdan di nava dewleta Iraqê de, petrola Kurdan bi xwe ye."[93] Rola Dibistana Hindîstanê di beşê Îranê de bêtir tê şîrovekirin. Ev dibistan e ku Rojhilata Navîn aloz kiriye. Sedemê bindestiya Kurdan ya dereke ev dibistan bi xwe ye ku serkêşên wê jî Mason bûn.

Di sala 1919'an de li Iraqê dewleta Kurdî hate ava kirin û Şêx Mahmûdê Berzencî weke Kralê Kurdistanê hate qebûlkirin. Lê hebûna kraliyeta Kurdistanê pir neajot û bû sedemên êrîşên Îngilîzan. Şerê Kurdan û Îngilîzan dest pê kir. Îngilîzan Şêx Mahmud girtin û ew koçberî Hîndîstanê kirin. Piştî demekê Ingilîz mecbûr man wî dîsa bînin Kurdistanê û wî dîsa weke kralê Kurdistanê qebûl bikin. Ji sala 1922'an ve tevgera Şêx, heta sala 1932'an berdewam kir. Di sala 1931'ê de Îngilîzan êrîşî Kurdistanê kirin. Vê carê jî di armanca Îngilîzan de Berzanî hebû. Ji vê demê û pê ve serhildana Barzaniyan heta avakirina Başûrê Kurdistanê berdewam kir.

Piştî serxwebûna Iraqê di sala 1932'an de jî şerê Kurdan û Şîan dijî vê dewletê berdewam kir. Makzagona hatibû çêkirin bersiva pêdiviyên Iraqiyan nedida. **"Perçeyekî kaxeza gemarî bû"**.

Ev makzagon li Londrayê hate amadekirin. Konseya dewleta Iraqê jî bêyî ku guherînekê têda bike qebul kir. Di vê makzagonê de ji bona mafê Kurdan tenê yek bêje tune bû" Barzanî û Tevgera neteweyî û azadîxwaz ya Kurd. Mesud Berzanî. 1. R. 280.[94]

---

93 *Irak'ı Anlamak*, William R. Polk. Çapa 2'yem Understanding Iraq, Weşanên NTV, 2007. r.92

94 *Barzani ve Kürt Ulusal Özgürlük Hareketi*, Mesud Barzanî, Weşanên Doz,

Weke ezê dawiyê di mijara serhildanên Kurdan de bînim zimên jî, li vêderê gotina wê girînge. Berdewamiya serhildana Ebdulsalamê Berzanî, Şêx Ehmedê Berzanî dewir girtibû û dijî Îngilîzan vî şerî berdewam dikir. Di sala 1932'an de serhildana Barzaniyan berdewam dikir û Îngilîzan bi dijwarî bersiva vê serhildanê didan. Dinya berbi şerê cîhanê yê duyem ve diçû. Di vê demê de Iraq hînê jî di bin bandora Îngilîzan de tev digeriya. "Berjewendiyên Îngilîzan bi daxwazên Kurdan û Ereban ve nakokbar bû. Serweriya rastiqînê di destê Îngilîzan de bû."[95]

Piştî serxwebûnê bi demeke kurt Qral Feysel nexweş ket û weke xulamekî Îngilîzan mir. Kurê wî Gazî bu Qral. Di dema wî de leşkeriya Iraqê, leşkeriya Asuriyan bidawî anî. Vê leşkeriya Îsewî ji aliyê Îngilîzan ve hatibû amade kirin. Him li dijî Ereban û him jî li dijî serhildanên Kurdan bi Îngilîzan re hevkarî kirine. Qral, Hêza leşkeriya Ereb mezin kir û selahiyetên leşkerî bilind û zêde kir. Leşkeriya Iraqê ji wê demê û vir de weke serwerê dewletê tev digeriya. Qral Gazî ji aliyê Îngilîzan ve hate kuştin lê bi fermî weke hedîseyeke terafîqê hate binav kirin. Ev bûyer bû sedema tevliheviyan. Kurê wî xulamê Îngilîzan bû Qral. Hînê zarok bû û nikaribu bi xwe dewletê îdare bike.

Di wê demê de gelên Iraqê bi serokatiya Partiya Komunist serhildaneke gelêrî pêk dianîn. Li Kurdistanê jî şerê Dewletê û Kurdan berdewam dikir. Xwenîşandanên aştiyane bi hovîtiyeke nedîtî dihatin pelçiqandin. Gelek serokên Komunistan hatin sêdar kirin. Gelekan îşkence dîtin. Lê serhildanên gel bê rawestan berdewam dikir. Wê demê Filistîn di bin serweriya Îngilîzan de bû û mal û milkê Fiistîniyan difrotin Yehûdiyên dihatin Filistînê. Lewra ev proje ya Yehudiyan bi xwe bû. Vê helwesta Îngilîzan muxalefeteke Erebî jî li Iraqê diafirand. Iraq di rewşeke wiha de di dema şerê cîhanê yê duyemin de dijiya. Lê piştî şerê cîhanê yê duyemin leşkeriya Iraqê xwe weke xwediyê dewletê didît. Dema darbeyên leşkerî li Iraqê dest pê dikir. Ji vê demê heta destêwerdana Emerîkayê ya sala 2003'yan dewleta Iraqê di bin serweriya leşker de weke dewleteke dîktator di Rojhilata Navîn de weke mekîneya kuştina mirovan tevdigeriya.

---

Cildê Yekem, Sibat-2005. r.280.

95 Berhema navborî r. 70

**Netewayetiya Erebî li Iraqê**

Di sedsala 19'an de neteweyên cûda yên di bin serweriya Osmaniyan de dijiyan, bi nasnameya xwe ya neteweyî ji bona serxwebûna xwe têdikoşiyan. Nasnameya van neteweyana bi zelalî derdiket pêş. Neteweyên Balkanî bi bandoreke mezin tekoşîna xwe berdewam dikirin. Dûre Ermeniyan û Kurdan jî bi girseyî nasnameya xwe ya neteweyî dixistin rojeva dewleta Osmanî û şerê Ermeniyan bi alîkariya hêzên dewletên mezin ve, rê li ber perçekirina Osmaniyan vedikir. Van bûyer û serhildanên neteweyên bindest ku serweriya Osmaniyan dihejandin, dibûn sedemên afirandina nasnameyeke nû ya etnîkî a Tirk. Di vê demê de nasnameya Tirkîtiyê ne zelal bû. Ji kê re Tirk dihate gotin ne xuwiya bû. Lê çeteyekî leşkerî ku bêtir bi ser Elmanan ve bûn, vê nasnameyê derdixistin pêş. Ji wan re Ciwanên Osmaniyan dihate gotin. Lê di dîroka Tirkan de ew wek Îttîhadî û Jon Tirkî jî têne binav kirin. Lê ew her berdewamiya Ciwanên Osmaniyan bûn. Gelek caran bi navê dewleta Osmanî li dijî tekoşîna neteweyên bindest radiwestiyan û li hinek cîhî jî dema pêwîst dîne bi nasnameya Tirkî tevliviyanin. Darbeya Leşkerî ya 1908'an ji bingehiya vê hêzê ve pêk hatiye. Lê hînê jî nasnameya Tirkîtî ne zelal e. Ne weke maneya neteweyeke cûda ji Osmaniyan û ji yên din cûda dihate şirovekirin. Nasnameya Tirkîtî yek ji wan nasnameyên herî tev li hev, aloz û bê bingeh e.

Vê helwesta Ciwanên Osmaniyan û dawî jî Itihadiyên Osmanî yên bi nasnameya Tirkîtiyê tev diliviyan bandoreke mezin li ser leşkerên Ereb yên di nava Osmaniyan de dikirin. Wan ber bi lêgerîna nasnameyeke neteweyî dahf didan.

Di vê demê de tu bersiv ji nasnameya Erebî re tune ye. Yek sedemekî bingehîn heye ew jî zimanê Erebî ye. Lê zimanê Erebî tenê nikaribû neteweyeke Erebî biafiranda. Bi dehan lehçeyên Erebî, weke zimanên cûda dihatine bilêv kirin. Ji bilî zimanê rojane Ereban ji hev fêm nedikirin. Olperestiya Ereban wan ji hev cûda dikir. Isewî, Yahudî û Misliman bûn û yên Misliman jî bi mezheban ji hev cûda bûn.

Ramanên Erebîtiyê berê li Misrê, Suriyê û li Lubnanê dest pê kir. Balkêş e; weke nasnameya Faris û ya Tirkan nasnameya Erebî jî ne li ser xaka Ereban û ne bi destê wan hatibû afirandin. Li Lubnanê xebatên li ser ferhenga Erebî berdewam dikir. Di wê navberê de li

Suriyê, di sala 1905'an de ji aliyê Isewiyekî ve manîfestoya Erebî hate derxistin ku weke dijberiya Osmaniyan dihate binavkirin. Lê mixabin ev manîfesto jî ne bi zimanê Erebî bû. Bi Fransizî hatibû nivîsîn. Lê dîsa jî ev weke destpêka netewayetiya Erebî bi lêv dibû. Van deverên Osmaniyan ku di bin bandora Fransizan de diman, weke Misir, Surî û Lubnan ji netewayetiya Fransizan sûd werdigirtin. Lê Îngilîzan Misir, Urdun û filistîn xistibûn destên xwe, Italyan jî Lîbya xistibû destê xwe û dagir kiribû. Çand û netewayetiya Erebî li van welatana bi çandên cûda pêk dihatin.

Nêrîna deverên di bin destên Fransizan de Misir jî di nav de weke neteweya Erebî, ku bi Erebî **qewmiye** dihate binav kirin, derdiket holê. Lê li deverên Ingilîz lê desthilatdar bûn berevajî qewmiye, ramanên **wataniye** derdiket pêş. Ev bi xwe cûdahiyeke mezin heta iro jî berdewam dike. Bi vê cûdahiyê ve girêdayî şer û pevçûnên Ereban nesekiniye û heta îro jî berdewam e.

Misir serkêşiya ramana Qewmiye dikir. Cemal Ebdulnasir bi nav û deng e. Lê serkêşiya Wataniye jî Iraqê dikşand. Di sala 1941'ê de bi hukmê leşkerî serokwezir Reşîd Elî ji hukumetê hate bidûrxistin. Nûrî Seid bi hukmê Leşkerî desthilatdariya xwe heta şoreşa sala 1958'an berdewam kir. Di nava van salan de di navbera dewletên **Qewmiye** û **Wataniye** de nakokiyên berbiçav derketin. Nûrî Iraq ji welatên Ereban yên din cûdatir didît. Pêwendiyên Iraqê bi dewletin din re ji yên Ereban bêtir bû. Di vê demê de Sowyet weke pêwendîdarê Misrê û Suriyê lê weke astengê Iraqê dihate şîrove kirin. Di şûna Îngilîzan piştî şerê cîhanê yê duyem Emerîka cîh girt. Di avakirina CENTO (Pakta Bexdayê) de rola Emerîkan mezin bû. Nûrî jî cîh di vê peymanê de girt. Ev peyman dijî tevgera Kurdistanî hatibû ava kirin û Iraq jî yek ji wan dijminên Kurdan di vê peymanê de cîh girtibû. Lê di sala 1956'an de şerê Israîl de mecbûr ma pêwendiyên xwe bi Îngilîzan re kêm bike. Dest bi mixalefeta nava Iraqê kir û zilmeke mezin li mixalefetê hate kirin.

Di vê aloziyê de Partiya Baas bingeha xwe ji rejîma faşîzmê werdigre. Partiya nîjadperest û şowen li Suriya hatibû avakirin û dixwestin li Iraqê jî vê partiyê ava bikin. Ev jî ji nakokiya ramanên Erebîtiyê dihat. Baas ramanê Qewmiye diparast. Ramanê Baasê di nava leşkerê Iraqê

de belav dibû û ji bo Nûrî weke tehdît dihate bi lêv kirin. Ji bilî vê hin helwestên din jî di nava leşker de bi cîh dibûn. Bi navê Leşkerên Azad ve hêzeke leşkerî bi serokatiya Abdulkerim Kasim ve derdiket holê û xurt dibû. Ev hêz û hêza Baasê di bin bandora Cemal Ebdulnasir de diman. Di sala 1958'an de Komara Erebî ya yekgirtî ji aliyê Nasir ve dihate danenasîn û ev jî dibû sedema tevgereke nû li Iraqê. Lê Nûrî vê helwesta Nasir weke dijminahiyê bi nav kir.

Di meha 7'an ya di sala 1958'an de desthilatdariya leşkerî li Iraqê hate ser hukum û Qraliyet bi dawî anî. Nûrî jî bi guleyekê li Bexdayê hate kuştin. Qral û merivên wî jî hatin kuştin. Partiya kommunist wê demê bi hêz bû lê mihaweleya desthilatdariyê nekir û alîkariya darbeya leşkerî kir. Mistefa Berzanî jî ji Sowyetê vegeriyabû û dest bi avakirina Kurdistanê kir. Lê Kasim jî weke Nûrî piştî demekê fikrên Wataniye derxist pêş. Ev jî bû sedema deshilatiya leşkerî û dûre jî bû sedema hukmê Baasiyan bi xwe ku heta sala 2003'yan berdewam kir.

### Çend gotin li ser hukmê leşkeriya Iraqê û Başûrê Kurdistanê

Di 27'ê Temmûza 1958'an de li Iraqê bi serokatiya General Abdulkerîm Kasim hukmê eskerî çêbû û Monarşî hate hilweşandin. Mustefa Barzanî yê nemir ku wê demê li Sowyetê penaber bû, di 6'ê Çiriya Pêşîn a sala 1958'an de vegeriya Kurdistanê. Bi hukmê leşkerî ve Kanûna Esasî ya nû hate amadekirin. Di xala 3-a Qanûna Esasî de hatibû nivîsandin ku *"li ser xaka niştimana Iraqê Ereb û Kurd wekhev in û mafê wan ên neteweyî di çarçova Iraqê de tê nasîn."* Lê mixabin piştî demekê desthilatdariya Abdulkerim Qasim jî dev ji yasaya Iraqê berda û mafê Kurdan qebûl nekir. Bi vî awayî di sala 1961'ê de, di bin serokatiya Barzaniyê nemir de Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Kurd "Şoreşa Îlonê" dest pê kir. Dîsa şer li Iraqê di navbera Kurd û hukumeta Iraqê de dest pê kir. Sedemên vî şerî gelek in. Pirtûka birêz Mesud Berzanî vê pirsê ronî dike.[96]

Ne Îngilîzan û ne jî Karaliyetê xwestîne pirsa Kurd li Iraqê çareser bikin. Parlemena Iraqê tenê ji aliyê Îngilîzan û karaliyetê ve dihatin hilbijartin. Di vê meclîsê de cîhê Karker, gundî û burjuvaziyên biçûk tunebû. Dewlemend, axa û serokeşîr di vê meclîsê de cîh digirtin.

96 *Berhema navborî*

Xelkê Iraqê ji vê rewşê ne razîbûn. Ji sala 1920'an heta sala 1958'an vê meclîsê 59 hukumet guhert û ava kir lê hemû hukumet bi destê Îngilîzan û Qraliyetê ve dihatin avakirin û di xizmeta berjewendiyên wan de bûn. Qraliyet, bi Tirkiye, Iran, Welatên kevneperest yên Ereban û bi Îngilîzan re li dijî Kurdan Peyman avakiriye û dijî Kurdan şer kiriye.

Şerê Kurdan li dijî Qraliyet û Îngilîzan heta sala 1958'an dewam kiriye. Ji şêx Abdulselamê Barzanî, şêx Mahmaudê Barzencîh, Şêx Ahmedê Barzanî û heta Barzaniyê nemir şoreşa Başûrê Kurdistanê bê rawestan berdewam kiriye. Li vir dixwazim bi têbiniyekê bersivekê bidim. Gelek Kurd şoreşên Kurdan weke herêmî, kevneperest û bê istiqrar (bê berdewamî) şîrove dikin. Ev helwest çewt e û bingeha ramana ji xwe destpêkirina dîrokê ye. Rast e herêmî ne lê ne şoreşên kevneperest in. Şerê Barzaniyan ji sedsala 20'an heta iro bê rawestan berdewam kiriye. Îro jî bandoreke mezin ya Barzaniyan li ser netewayetiya Kurdan heye.

Qraliyetê dibin serweriya Îngilîzan de kar dikir. Pêwendiyên wê bi gel re tunebû. Bi destê emperyalîzmê bi zilm û darê zorê serweriya xwe didomand. Qraliyeta Iraqê bi qasî li dijî tevgera Kurd bû herwiha dijî tevgera neteweya Ereban jî bû. Lê vê rewşê wiha dewam nekir. Piştî demeke dirêj tevgerên cûda hatine avakirin. Pirsgirêka serxwebûna Iraqê û pirsa Kurd du pirsên sereke bûn. Di xebata van tevgeranan de bi hezaran bedel hatin dayîn. Li Misirê, Suriyê, Lubnanê, Urdunê û li Cezayirê tevgerên neteweyî hatibûn avakirin û bandora xwe li ser tevgera neteweyî ya Iraqê dikir. Berevajî vê Qraliyetê bi haşimiyên Urdinê re peymana Bexda avakiribûn û ev bi xwedibû sedemê nerehetiyekê di nava tevgerên neteweyî yên Ereban de. Misir-Suriye **Komara Yekgirtî ya Ereb** avakiribûn. Ev bi xwebandoreke mezin li hemû tevgerên neteweya Ereb dikir. Cemal Abdulnasir weke serokê netewa Ereb dihate pejirandin û netewayetî pêşda dibir.

Şerê sar di navbeyna bloka emperyalîst û sosyalîst de berfireh dibû. Serweriya Emerîka û Îngilîzan li Rojhilata Navîn berevajî xwe tevger diafirand. Her wiha lêcek di nava herdû dewletên emperyal de jî didomand. Îngilîzan nedixwestin desthilatdariya xwe wenda bikin û Emerîka jî dixwest serwer be. Şerê cîhana sêyem yê ji bona serxwebûnê geş dibû û bandora wê berbiçav bû. Sistema sosyalîst alîkariya tekoşîna

welatên sêyem dikir. "**Avakirina sosyalîzmê dervî di rêya kapîtalîzmê de**" dibû armanca tevgera sosyalîst li welatên sêyem. Lê van tevgerana bandora xwe bi girseyî rê dida û dibûn hêz. Di nava vê sîstemê de Misir, Surî û Libnan berbi sowyetê ve diçûn û ev bi xwedibû sedema nerehetiyekê di nava Ereban de. Li Iraqê ji dervî partiyên Qraliyetê û yên Îngilîzan, partiyên Cûda hatibûn avakirin. Partiya Baas, Partiya Komunist, Partiya Demokrata Kurdistanê, Partiya Serxwebûnê, Partiya Welatparêz hatibûn avakirin û xebatên wan geş dibûn. Van partiyana derveyî partiya demokrata Kurdistanê, di sala 1954'an de dest bi avakirina eniyeke taze dikirin. **Eniya yekîtiya Welat** êdî nema kar dikir. Vê eniya ku nema kar dikir, di nava hêzên Iraqî de berî sala 1954'an hatibû avakirin.

## Darbeya leşkerî ya 1958'an

Di sala 1957'an de xebata Eniya neteweyî encam da û Eniya Neteweyî daxwazên xwe ji gel re eşkere kir. PDK-Iraq di vê eniyê de cîh negirt lê hevkariyeke xurt di navbeyna wan de peyda bûbû. Sedema bingehîn yê pêknehatina hevkariya Kurdan û Ereban, Partiya Baas bi xwe bû. Wê demê Partiya Baas li dijî PDK helwest digirt û tevkariya wê nedipejirand. Partiya Komunîst jî ji bo PDK dengekî bilind dernedixist. Partiya herî bihêz di wê demê de partiya Kommunist bû.

Qraliyet, Ingilîz û hukumeta Nûrî Seid bi hev re li dijî helwesta Eniya Neteweyî rawestiyan, lê êdî nema karibûn welat idare bikin. Avakirina Eniya Neteweyî bandoreke mezin li ser Ofiser- Subayên azad hişt û wan jî konseya xwe avakirin û amadeyiya hukmê leşkerî dikirin. Pêwendiyên wan û Eniya Neteweyî xurt bûn. Konseya Lêşkerî bernameya xwe ya siyasî eşkere kir û hêviya gelê Iraqê geş kir. Wan ruxandina Qraliyetê dixwestin û mafê netewa û kêmnetewa diparastin.

Cara yekemîn bû ku li Iraqê bi navê biratiya Kurd û Ereban wê komarek bihata avakirin. Iraq di armanca dawî de weke perçeyek ji netewa Ereb qebûl dikirin û Kurd jî bêyî kesek li ser bifikire beşdarî nava netewa Ereb dikirin. Ev ramana Eniya Neteweyî ramana Qewmiye, ya Cemal Abdulnasir bi xwe bû. Loma yekgirtiya Iraqê dixwestin. Komara Kurdan û Ereban, siyaseta xwe ya derve bi dewletên sosyalîst re eşkere dikirin.

Di 14/7-1958'an de bi hukmê leşkerî avakirina komara dewleta Iraqê hate destnîşankirin. Kurdan bi germî pêşewaziya vî hukmî kirin û bi hêz alîkariya serkeftina wê kirin. Şêx Ahmed ji girtîgehê hate berdan û Barzaniyê nemir ji Sowyetê vegeriya welat. Hukumeta Abdulkerim Kasim hate avakirin û konseya şoreşê ji yekî Erebê sunî, ji yekî Erebê şîa û ji yekî Kurd ve hate avakirin. Cara yekem bû ku Kurdan û şîa´ya jî beşdarî desthilatdariyê dikirin.

## Tecrûbeyên darbeya leşkerî ya 1958'an

-Tirkiye weke îro, serxwebûna Kurdistanê (Başûr) weke sedema midaxeleyê binav dikir û Kurdên başûr tehdît dikir.

-Tirkiye weke iro, bi navê "mafê Tirkmenan" pirsa Kerkuk û Musilê dixistin rojevê û digotin ku Kurd zilmê li Tirkmenan dikin.

-Emerîka, Ingilîz, Îran,Tirkiye li dijî darbeyê rawestiyan û bûne hevkarê hev.

-Sowyet, Misir, Suriye û gelek welatên din Komara Iraq naskirin û pêwendî pê re danîn. Sowyet bi leşkerên xwe ve eşkere komar parast.

- Ingilîz û Emerîka statukoya wê demê diparastin û bi dagirkerên Kurdistanê weke Tirkiye û Iranê re li dijî Kurdan radiwestiyan.

-Partiyên neteweya Ereb nemaze partiya Baas, serê nîjadperestî û şovenîzma Erebî dikişand. Abdulselam Arif yek ji wana bû ku dijminahiya Kurdan dikir.

-Kurdan wê gavê jî nikaribûn serxwebûna xwe bidin danezanîn. Ji ber ku rewşa dinyê ya wê demê ev yeka dest nedida.

Lê vê şoreşê bandoreke mezin li ser neteweya Kurd û Ereban kir û bingehan avakirina komareke pirneteweyî û demokratîk avêt. Lê nîjadperest û şovenîstên Ereban bi emperyalîzmê re li dijî demokrasiyê rawestiyan û gelên Iraqê nikaribûn vê derfetê bi encam bikin.

Li vir sucê partiya Kommunist mezin e. Wan ev şoreşa gelêrî weke şoreşa burjuwazî bi nav kirin û li gora daxwaza endam û hejarên welêt ku dixwestin partiya kommunist bibe serwer, derketin û vê derfetê dane destê şovenîst û nîjadperestan. Dawiyê poşman bûn lê poşmaniya wan tu feyde neda gel.

Vê bûyerê bandoreke mezin li ser Kurdan kir. Mafê Kurdan bi

yaseyî hate pejirandin. Kurd bi hêzbûn û vê hêza Kurdan bû bingeha garantiya şoreşên Kurd yên dawî. Ji bona ku baş bête têgihiştin dixwazim çend gotinan li ser tevgera Sêx Mahmudê Berzencî û Sêx Ebdulselamê Barzanî bêjim.

## Tevgera Ebdulselamê Barzanî

Şêx Ebdulselamê II (duyem) piştî gorbehiştiya bavê xwe Şêx Muhamed ku ew bi xwe alimekî mezin û naskirî bû, dibe Şêxê teriqata Barzaniyan ya neqşîbendî. Ebdulselam ne tenê alimekî mezin bu, sêx bû û welatperwerekî mezin bû. Ewî di pêwendiyên xwe yên neteweyî û civakî de pir bi eşkereyî xuya kiriye ku xebata wî berdewamiya tevger û serhildana Sêxên berî wî weke tevgera Sêx Ubeydullahê Nehrî bû. Dibe ku Şêx ev helwesta xwe bilêv nekiribe lê di pêwendiyên xwe de vê helwesta xwe dide dest. Agirê ku Şêx Ubeydullah pêxistibû li ba Şêx Ebdulselam gûr bû. Şêx zane û civaknasekî baş yê civata Kurd bû.

Birêz Mesud Berzanî, vê mijarê di pirtûka xwe ya Barzanî û Bizava azadiya neteweya Kurd de pir bi zelal radixe ber çavan. Ji xwe tiştê ku ez li ser Şêx Ebdulselam dinivîsim piranî ji vê pirtûka birêz hatiye girtin[97]

Ebdulselam dizanibû ku yekîtî hêz e. Di vê zanebûnê de bangî bi dehan eşîrên Kurdan yên herêma Barzan kir û ew civandin ser hev. Cara ewil 8 eşîrên Kurdan anîn ba hev. Ev gava wî gelek girîng bû. Lewra wî dixwest li vê herêmê reformên olî û civakî pêk bîne. Armanca wî, herêmê ji nû ve bi dadwerî û wekheviyê bivejîne û bingeha civateke mezintir û berfirehtir ya bi dadwer û wekheviyê amade bike.

**Li vê herêmê Şêx, bi eşîrên Kurdan re li ser van xalana li hev kir:**

1-Mulkiyeta li ser xakê rakir

2-Xak li gundiyan belav kir.

3-Next-qelend û zewaca bi zorê ji holê rakir.

4-Pêwendiyên civakî li ser bingeha dadwerî û wekheviyê ve ji nû va vejand.

---

97 *Barzani ve Kürt Ulusal Özgürlük Hareketi*, Mesud Barzanî, Weşanên Doz, Cildê Yekem, Sibat 2005.

5-Li her gundekî mescîdek ava kir. Mescîd ne tenê cîhê îbadetê bû lê herwiha cîhê civîn, şêwirmendî û dadweriyê bûn.

6-Li her gundekî rêvebiriya gund ava kir. Rêvebirî ji kar û barê gund ve berpirs bû. (Li vir serok eşîr ne xwedî berpirsin. Rêbebiriya gund bepirsiyariya gund radigire ser milên xwe)

7-Li her eşîrê hêzeke leşker amade kir û ji hemû hêzên eşîran ve leşkeriyeke herêmî damezrand.

Pir bi asanî mirov dikare bêje Şêx Ebdulselam yek ji wan hîmê tevger û serhildanên Barzaniyan yên heta îro ne. Tevger û serhildanên Barzaniyan berdawamiya tovê şoreş, serhildan û herwiha dadweriya Şêx Ebdulselam e. Ger mirov bixwaze Barzaniyan nasbike, sîstema Barzaniyan danîne nasbike divê mirov nameya Barzaniyê nemir ya ji Stalin re bi riya serokê partiya kommunist ya Ezarbeycanê re rêkiriye bixwîne.[98]

Wî Şêx Ebdulselam, pêwendiyên xwe bi herêma Barzan re bi sînor nekir. Pêwendiyên berfireh bi hawîrdora xwe re danî. Bi Cemiyeta Tealî ya Kurd re, bi Cemiyeta Hêvî re, bi Cemiyeta Serxwebûna Kurdistanê re pêwendiyê xwe danî û xurt kir. Bi Şêx Mahmudê Berzencî re, bi Sêx Ebdulkadirê Nehrî re bi Simko re pêwendiyên xwe berfireh kir.

Cara yekemîn bû ku Şêxekî Kurd, li ser bingeha welatparêziyê pêwendiyên xwe wiha berfireh bi hemû aliyên Kurdan re daniye. Pêwendiyên Şêx bi kêmneteweyên Kurdistanê re jî xweş bû ye. Ezê li jêrê minaka Serokê Asuriyan bidim.

Şêx Ebdulselam, di sala 1907'an de li gundê Birifkanî yê li mala Şêxê qadiriya (Teriqateke Kurdan e ku bêtir li aliyê herêma soran bi hêz bûne) Sêx Nûr Muhemed Birifkanî, bi serokeşîrên Kurdan re civînekê li dar dixe. Civîn biryarên dîrokî werdigre. Civîn van biryarana ji Dewleta Osmanî re bi rê dike û daxwazên Kurdan eşkere dike. Tê gotin ku Şêx bêyî daxwaza civînê ev biryar ji Şêx Ebdulkadir û ji Şêx Ebdullahê Nehrî re û herwiha ji Emîn Elî Bedirxan û ji Şerîf Pasa

98 *Barzani ve Kurt Ulusal Özgürlük Hareketi*, Mesud Barzanî, Weşanên Doz, Sibat 2005. (Pirtûka li ser bizav û serhildana Berzaniyan hatiye nivîsîn ya herî berhemdar e. Hemî kesên bixwazin li ser tevgera Barzaniyan rawestin divê van her du pirtûkan bixwînin. Du cild in.

re ( Şerif Paşa ew kesê li ser navê Kurdan serokatiya rêvebiriya Kurdan ya Sewrê kiriye) rêkiriye.

**Biryarên civîna eşîrên Kurdan ya bi Şêx Ebdulselam re:**

Li herêma Kurdan divê zimanê fermî zimanê Kurdî be.

Perwerde li herêma Kurdan divê bi zimanê Kurdî be.

Memûrên dewletê yên li Kurdistanê bêne bicîhkirin divê Kurdî baş bizanibin.

Ji ber ku ola dewletê Islam e, li dadgehan divê biryar li gor şerîetê bête dayin, baca ku tê civandin divê li herêmên Kurdan bêne xerckirin.

Dema em reformên Şêx û daxwazên civînê (ku daxwazên hevbeş in.Yên hemû eşîretên Kurdan in. Bawerim Şêx di vê civînê de daxwazên herî rewa daye pêş û daxwazên hevbeş kiriye biryar.) didin ber cavan em dûrbîniya Şêx pir bi eşkereyî dibînin. Di wê demê de Şêx daxwazên neteweyî û civakî xistîne rojevê û loma jî dewleta Osmanî ji helwesta wî gelekî tirsiya ye. Reformên Şêx di dema me de jî hînê.

Li gelek ciyê Kurdistana Azad jî nehatine bi cîh kirin. Gelek kes dibêjin Şêx şerîet xwestiye. Bawerim Şêx nikaribû di wê demê de bi eşîretên Kurdan re sosyalîzm bixwesta. Lê divê mirov li tevahiya daxwaz û reformên şêx binêre û tevgera wî şîrove bike. Daxwaz û reformên şêx yên civateke nûjen e û serdemî ye. Her bûyerek li gor dema xwe divê bête şîrovekirin. Daxwazên şêx di dema wî de daxwazên herî serdemî û netewî ne. Lê mirov dikare bêje ev tevgera Şêx herêmî maye.

Dema dewleta Osmanî daxwazên şêx digire, rewşê pir ciddî digre û leşkerekî mezin rêdike ser şêx. Şêx jî dest bi berxwedanê dike û li dijî hêza Osmaniyan radiweste. Piştî du mehan berxwedan têk diçe û şêx cîhê xwe berdide û diçe ba eşîreta Asuriyan cem Mar Semon. (Li vir pêwendiyên şêx û yên kêmneteweyên Kurdistanê dertê holê). Wê demê Mele Mustefa Barzanî yê nemir 3 salî ye û bi diya xwe re dikeve destê Osmaniyan.

Şêx di sala 1908'an de vedigere herêma Barzan û ji nû va dest bi şerê çekdarî dike. Bi hêzeke mezin êrîşî hêzên Osmanî dike û wan

bela wela dike. Herêmê ji destên Osmaniyan derdixe û zerarek mezin dide hêzên Osmaniyan. Piştî vê serhildanê Osmanî dixwazin bi şêx re li hev bên. Şêx pêşniyara wan qebûl dike û peyman di nava şêx û Osmaniyan de pêk tê. Li vir nezelaliyek heye. Nizanim şêx û Osmanî li ser çi li hev hatin? Lê xuyaye bêyî tu biryar werin girtin şêx serweriya xwe berdewam kiriye û Osmaniyan jî ta radeyekê serweriya şêx qebul kirine.

Piştî demekê Suleyman Nazîf (weke berpirsekî Osmaniyan) dibe waliyê Musilê. Di sala 1913'an de dixwaze Sêx bigire. Hêzeke leşkerî dişîne ser şêx. Şêx piştî berxwedanekê ji herêmê diçe û dihare ba Seyid Tahayê Nehrî ku li Rojhilatê Kurdistanê bû. Wê demê şêx Simko Axayî dibîne û bi hevre diherin Tiflîsê û bi berdevkê Qralê Rûsan(Çar) re rûdinên. Di vegera xwe de ji Simko axa vediqete û dixwaze bê herêma xwe. Lê bi rê da li mala Sofî Abdullah dibe mêvan. Dema şêx û mihafizên xwe razayîne Sofî wan digire û radestî Osmaniyan dike. Sofî ji bona vê jî bedêlekê werdigire. Sofî weke mazûban û weke Kurdfiroşekî ruhê xwe, namusa xwe û şerefa xwe difroşe Osmaniyan.

Divê Kurd tu caran navê Abdullah bikar neyînin. Abdullah sembola xwe firotinê ye. Şêx li Musilê tê darizandin ( lê ev darizandin weke gelek darizandinên serokên Kurdan yên din e û ji dadweriyê dûr e) û şêx di 14/12-1914 yan jî 1915an de tê bidarvekirin.

Osmaniyan şêx baş nas dikirin. Lewra dixwestin wî ji holê rakin. "Bi koçberiya şêx Kurdan serokekî xwe yê mezin û dûrbîn wenda kirin. Ger şêx heta dawiya şerê cîhanê yê yekem bijiya, bê şik wê rewşa Kurdan ji ya îro cûdatir bûya"[99]

Bawerim wê rewşa Kurdan baştir bûya. Lê mixabin. Piştî dilovaniya Şêx Ebdulselam birayê wî Şêx Ehmed cîhê wî digire. Şêx Ehmed him dadweriya şêx û him jî welatparêziya şêx kir rêbaza xwe. Şêx Ehmed 18 salî bû, lê Şêx Ebdulqadîrê Nehrî dixwaze ew serokatiya Kurdan ragire ser milên xwe. Şêx Ehmed serokatiya Şêx Ebdulqadir rastir dibîne û Barzaniyê nemir rê dike ba Şêx Ebdulqadir û Şêx

99 *Barzani ve Kürt Ulusal Özgürlük Hareketi*, Mesud Barzanî, Weşanên Doz, Sibat-2005. r.27

Seidê Piranî. Berzanî bi riya Şêx Abdurrehmanê Şirnexî dighêje herdu serokên Kurdan. Dem 1917-1919.[100] Şêx Ehmedê Barzanî dû re tê girtin û di zindana Iraqê de dimîne heta şoreşa sala 1958'an ya Iraqê.

Barzaniyê nemir şoreşa şêx Ehmed û ya Abdulselamê Barzanî hilgirt ser milên xwe û vê ala bi şeref, vîn û hesta Kurd heta gorbihiştiya xwe ji ser milên xwe û çiyayên Kurdistanê danexist.

Dema şêx Mahmudê Berzencî di sala 1919'an de dest bi serhildanê kir û li dijî Îngilîzan rawestiya Şêx Ehmedê Barzanî xwestiye alîkariya wî bike. Ji dema Şêx Ebdulselamê Barzanî û heta îro, berxwedana Barzaniyan li dijî dujmin bê rawestan berdewam kiriye. Helwesta Barzaniyan û serhildanên Barzaniyan yan jî bi serokatiya Barzaniyan, roleke erênî û bandoreke neteweyî ya yekta li ser tevgera neteweya Kurdistanê hiştiye.

## Tevgera Şêx Mahmûd

Dîroka modern ya bajar û herêma Silêmaniyê, bi Baba Suleyman dest pê kiriye. Baba Suleyman serokê Babana yê duyem e (1663-1675). Cara duyem jî weke paytaxta xwe Îbrahîm Paşa (1783-1803) nevî neviyê Baba Suleyman, bajarê Silêmaniyê ava dike. Lewra gelek dîroknas avakirina Silêmaniyê bi Îbrahîm paşa dest pê dikin. Lê rastiya wê Baba Suleyman e. Dewleta Babanan heta dema Ahmed Paşa (1847) dewam dike û ji aliyê Paşayê bexdayê ve tê ruxandin.

Şêx Mahmûd jî yek ji serokê eşîra Berzenciyan yê Silêmaniyê ye û malbateke nêzî Babana ye. Jiyana serbixwe ya Silêmaniyê ya ji dema Babanan mabû ji nivşekî derbasî nivşekî bibû û Silêmaniye ji bona jiyana azad amade bû. Kar û xebata azadiyê ji Babanan ve berdewam dikir.Yek ji wan xebatan jî derketina Şêx Mahmûdê Berzencî ye. Bêgûman Şêx Mahmûd jî xwe wekî Suleyman Paşa dibîne û weke qralê Kurdistanê tev dilive. Li Silêmaniyê baweriya dewleteke Kurdî bi hêz bû û vê baweriyê jî rê li ber dewleta modern ya Şêx Mahmûd vedikir. Weke tê zanîn Şêx Mahmûd ji ţerîqeta Qadiriyê ye. Terîqeta Qadirî ji

---

100 Berhema navborî, r.27

aliyê Şêx Ebulqadirê Geylanî ve derketiye ketiye nava Kurdan (1077-1166). Terîqeta Neqşîbendî ji di sala1317-1389'an de bi destê Muhamed Bahaedîn yê Buxarî ve hatiye holê. Mamosteyê neqşîbendiyê yê Kurdî jî bi Mewlana Xalîd ku ji eşîreta Cafê ye dest pê dike. Şêx Mewlana Xalîd, li Silêmaniyê dijiya. Lê nakokiyên navbeyna şêxê qadiriya Şêx Marûf û Şêx Xalid bû sedema ku Şêx ji Silêmaniyê derkeve (1820) û careke dî jî venegere Silêmaniyê.[101]

Dema Şêx Mahmûd dema amedeyiyên peymana Sewrê ye. Di sala 1919'an de bi serokatiya Şêxê Qadîriyan Abdurehman Geylanî ve li Kurdistanê, li Silêmaniyê hukumeta Kurdistanê ya neteweyî ya demî hate ava kirin. Qralê dewleta Kurdî Mahmûd Berzencî hate nasîn. Vê Qraliyetê bi destê Îngilîzan ve hate damezrandin. Hevkariya Kurdan û ya Îngilîzan dirêj berdewam nekir. Piştî demeke kurt siyaseta Îngilîzan ya li ser dewleta Kurdî hate guhertin.

Di vê demê de li Kahîreyê di adara 1920'an de, bi serokatiya wezîrê dewletê û berpirsê koloniyên Ingiltereyê Winston Churchill, civîneke bi dîplomatên Ingîltereyê re hate lidarxistin. Di vê civînê de Nivîsgeha Rojhilata Navîn hate damezrandin û berpirsiyariya Iraqê taze ji destê heyeta Hîndîstanê derxist. Vê nivîsgehê qedera Rojhilata Navîn guhert. Vê konferansa Churchill biryarên dîrokî wergirt û dest bi avakirina hududên Rojhilata Navîn kir. Di vê konferansê de biryara Emîr Faysal bînin Iraqê hatiye dayin. Bi kurtî tînim zimên loma min di beşa Iraqê de ev mijar anîbû zimên. Referandum li Iraqê çêbû û Feysel bû Qral. Lê Kurd beşdarî vê referandûmê nebûn.

Peymana Konferansa Sewrê pêk hat û Kurdan êdî xwestin li herêmên xwe ew bi xwe, xwe îdare bikin. Ingîltereyê di dema konferansa Kahîreyê de komîsyonek çêkiribûn û dixwestin bi rêgeya vê komîsyonê daxwazên Kurdan tê bighêjin. Piştî Qral Feysel bû xwedî desthilat bi 7 hefteyan vê komîsyonê bi beyanekê ve çareseriya pirsa Kurd û Kurdistanê dianî zimên û ji raya giştî re eşkere dikir. Pirsgirêka Başûrê Kurdistanê weke pirseka nav xaka Iraqê binav dike û çarese-

---

101 *Kürtler, Türkler ve Araplar, Kuzey Doğu Irakta Siyaset,* Sayahat ve İnceleme-1919-1925. C. J Edmonds. Avesta Yayınları, 2003.r.80-108.

riyan jî li gor vê ramanê pêşkêş dike. Ne tenê weke perçeyek ji xaka Iraqê dihate dîtin herwiha îdareya vê herêmê jî dixist destê Îngilîzan. Îngilîzan serwerî bi navê Kurdan lê bi destê leşkerên xwe ve dixwest Kurdistanê bi rêve bibe. Lê weke perçeyek ji xaka Iraqê.

Şêx Mahmûd li gora hatiye nivîsîn di sala 1880'yî de ji dayik bûye û di sala 1956'an de jî çûyi ser dilovaniya xwe. Dema Şêx Mahmûd ji bona Kurdan derfeteke dîrokî bû ye lê hemû agahiyên wê demê rê dide ku Kurdan di wê demê de jî yekîtiya xwe pêk neanîne û eşîretên Kurdan bi Şêx Mahmûd re yekîtiyeke netewî ava nekirine. Hinan destên Îngilîzan û hinan jî destên Osmaniyan û duvra jî destê Tirkan girtine û pirsa Kurdan û avakirina dewleta Kurdî jî di vê navberê de dikeve ser milê Şêx Mahmûd û hinek eşîrên Kurdan. Ezê li jêrê bêtir bînim zimên lê divê mirov bêje sedema yeknegirtina eşîrên Kurdan ya sereke dîsa jî Qralê Kurdistanê ekselans Şêx Mahmûdê Berzencî bi xwe ye.

Şêx Mahmûd qîmet daye mediya Kurdî û xwestiye bi rêya medyayê. Weke rojname Rojî Kurd agahiyên serhildanê di nava gel de bela bike û serhildanê bi hêz bike. Lê Şêx di vê demê de Pêşiya avakirina tevgereke Kurdî venekiriye. Weke dîroknas dibêjin di wê demê de ronakbîriya Kurd ji ya Ereban gelekî bihêztir bûye. Lê mixabin ne li ser hev bûne û ne jî midaxeleyeke ciddî ya ronakbîrî di serhildana Şêx de xuya dike. Aliyekî din jî yê vê serhildana Şêx heye ku divê mirov bibîne. Weke Edmond dibêje ku yek ji wan kesê (gove) şahidê hemû bûyerên wê demê ye li gelek cîhî netewayetiya Kurdan tîne zimên. Daxwaza Kurdan ya avakirina dewleteke Kurdî bi xurtî di nava Kurdan da heye lê ne Şêx Mahmûd û ne jî hêzeke din nikaribûye vê daxwaz û hêviya Kurdan bi rêxistinî û bi stratejiyeke neteweyî bikar bîne û bike hêzeke yekta. Lê Şêx Mahmûd weke Qralê Kurdistanê li hemberî daxwazên Ingilîz û Ereban dev ji doza xwe bernedaye û heta dawiyê li dû doza xwe serhildana xwe dewam kirî ye. Ev bi xwehêza ramanên Şêx yên avakirina dewleta Kurdî bi eşkereyî derdixe holê, welewkî dewleteke herêmê be jî.

### Em pirsa serhildana Şêx Mahmûd dewam bikin.

"Di 28'an Hezîrana sala 1920'an de netweperestên qabîneya Tirkan beyana "Mîsakî- Millî" yê weşandin. Di paragrafa yekem ya vê beyanê

de, di derheqê herêma Ereban de ku bi agirbesta sala1918'an ve li başûrê Iraqê diket, mafê çarenûsî qebûl dike lê pir bi eşkereyî Musilê weke perçeyekî ya ji Osmaniyan nayê veqetandin dipejirîne."[102]

Weke tê zanîn pirsa Musil-Kerkukê ne di peymana Sewrê û ne jî di peymana Lozanê de hate çareserkirin. "Peymana Sewrê bi mirîtî pêk hat lê weke belgeyeke navneteweyî ku dewleta serbixweya Kurdistanê dianî zimên di xeyalan de berdewam kir û jiya"[103]

Weke min li jorê jî gotiye, piştî Qral Feysel hate Iraqê û piştî peymana sewrê berjewendiyên Igilîzan bi dewleteke merkezî ve li hev dikir. Nikaribû pirsa Kurdan ji rojeva xwe derbixe lê tucarî jî pirsa Kurdistanê weke neteweyeke serbixwe û xwedî mafê avakirina dewleta xwe li pirsa Kurdan nenêriye. Şerê Îngilîzan û Kurdan ne sûcê Kurdan e sucê zorbetiya Îngilîzan e. Şêx Mahmûd koçberî Hidîstanê heq nekiriye. Lewra ewî tenê mafê gelê Kurd parastiye. Lê Îngilîzan gava bi balafirên xwe bombeyên heta wê demê li tu deran nehatibûn bikaranîn li ser gelê Kurd diceriband û bi top û leşkerên xwe ve Kurdistan bi daxwaza Ereban ve dagir dikir û mafê Kurdan binpê dikir, mafê Kurdan hebû serî hildin û mafê xwe yê rewa yê berxwedanê bikar bîne. Serokatiya Majeste Qral Mahmûd Berzencî jî vî mafê Kurdan bi kar aniye.

Bawerim stratejiya siyaseta Şêx hetanî dawiya sala 1918'an rast e. Wî û Îngilîzan li hev kirîne û hukumeta Kurdistanê avakirine. Lê Stratejiya Şêx Mahmûd piştî Osmaniyan Misûl bi şûnda girtin hate guherîn û stratejiyek çewt da meşandin. Tê gotin ku destên Osmaniyan xiste nava tevgera xwe û bi Îngilîzan re lihev nekir. Lê sedemên çewtbûna vê siyasetê dîsa jî Ingîlîz in. Di serî da Îngilîzan dixwestin hukumeta Kurdistanê ava bikin û bi rastî jî alikariya şêx kirin. Lê dawî siyaseta wan jî hate guhertin. Wan bawerî neda Kurdan. Kurdan carinan bi Ingîlîzan carinan bi Osmaniyan re şer li dijî yê din kirîne. Heger Ingîlîzan piştgiriya avakirina dewleta Kurdî bi rastî bikiraya û bawerî bidana Kurdan wê şêx

102 *Kürtler,Türkler ve Araplar, Kuzey Doğu Irakta Siyaset,* Sayahat ve İnceleme-1919-1925, C. J Edmonds, Avesta Yayınları, 2003.

103 *Kürtler, Türkler ve Araplar, Kuzey Doğu Irakta Siyaset,* Sayahat ve İnceleme-1919-1925. C. J Edmonds, Avesta Yayınları, 2003. r.162

Mahmûd çewtiyeke stratejîk nekiribaya. Lê bi ya min Şêx xwe mecbûr dîtiye û alikariya Osmaniyan qebûl kiriye, ger Osmaniyan alîkarî wî kiribin, ku ez bi xwe bawer nakim. Lê dibe têkilî di navbeyna wan de peyda bûbe. Wê Osmaniyan xwestibin wî li dijî Îngilîzan bikar bîne, lê Îngilîzan eynê dek û dolap gerandine. Lê bawer nakim ku Osmaniyan alîkariyeke stratejîk dabin wî. Ji xwe tiştekî mirov karibe bidest bigre jî tuneye. Hin Îdîayên leşkerên Îngilîzan weke belge têne nîşandan.

Min li jorê bahs kiribû. Siyaseta Ingîlîzan di destpêka bidawîhatina şerê cîhanê yê yekem de hate guhertin. Wan û Fransizan bi Itihadi-Kemalîstan re êdî têkilî danîbûn.

Nêrînên wan yên avakirina dewleta Kurd hatibû guhertin. Ne li dijî Şex Mahmûd lê herwiha li dijî Şex Ahmedê Barzanî jî şer dikirin (1919). Ma Şex Ahmedê Barzanî jî bi Tirkan re li hev kiribû? Na. Ev pirs bi siyaseta Îngilîzan ve girêdayî bû.

Li vir balkêşiyeke din ya berbiçav heye. Şex Ehmedê Barzanî destê xwe berbi Şêx Mahmûd ve dirêj dike lê mirov vê germiyê li ba Şêx Mahmûd nabîne. Tevgera ronakbîrên Kurd Cemiyeta Tealî ya Kurd destên xwe dirêjî Şêx Mahmûd dike. Lê ji Şêx germiyeke wiha xûya nake. Sedemê vê yekê dikare têkiliyê Şêx û itihadiyan bin. Nizanim. Herêma Soran û Bahdinan belki ne bi eşkerayî lê xûyaye nakokiyên wan hebûne. Sedemên vana ji ku tên nizanim. Di dema Şêx Ebdulselam de jî dengê Şêx Mahmûd nayê guhê gel. Yek ji sedemên têkçûna tevgera Şêx Mahmûd û rûxandina dewleta Kurdî ya yekem ya sedsala 20'an, tevgirtineke Kurdan (Kurmanc-Soran, û terîqetên Kurdan) ya bihêz tunebûye.

Dixwazim nevberekê bidim vê mijarê û piçekî rewşa navneteweyî bînim zimên û dûre mijara xwe berdewam bikim.

Weke min li jorê aniye zimên, di vê navberê de Ingîlîzan Kurê Melîkê Suudî tanîn iraqê û di bin serokatiya wî de dixwestin Iraqeke yekgirtî damezrînin. Kurd beşdarî vê prosesê nedibûn û dewleta xwe dixwestin. Ev bi xwe dibû sedema nakokiya bi Îngilîzan re. Alîkariya Îngilîzan ji bo Kurdan nakokiyên bi Kemalistan re dijwartir dikir û Kemalist berbi Bolşewikan ve didafandin. Kemalîstan jî ev dizanîn û

têkiliyên xwe bi Bolşewîkan re datanîn û Îngîlîz tehdît dikirin. Îngilîz ji ber vê nakokiyê nexweşbûn. Loma jî, ji bo Îngilîzan ji Kurdan bêtir Kemalist û Ereb girîng dibûn. Pirsgirêka Musil û Kerkukê jî yek ji sedemên bingehî ne.

Îngilîzan, bi alîkariya Itihadê-Kemalîstan dixwestin şoreşa Bolsewîkan teng bihêlin. Tevgera Kurdan ya serxwebûna dewleteke Kurdî, ji xwe re û ji serweriya ku wan dixwest ya Ereban re xeter didîtin. Şêx ji melek Feysel gelekî pêşdetir û zanetir e. Çima îngîlîz bi serokatiya Feysel dewletê ava dike lê dewleta Kurdan ava nake? Berevajî vê şerê Kurdan dike. Sedema bingehîn yê neavakirina Kurdistanê yê dereke siyaseta Îngilîzan bi xwe ye. Weke îro siyaseta Ingilîz û ya Emerîka jî nehatiye guherîn. Îro dîrok dîsa dubare dibe. **Pirsgirêka Kerkukê ya îro yek ji berdewamiya vê siyaseta wan bi xweye.**

Bolşewîkan jî, bi peymana Brest-Litovskê (1918) ve dev ji xaka Osmaniyan ya dagirkirî berdan. Daxwazên Ermeniyan û Kurdan nexistin hesêb. Lê di eynê wextê de berê xwe dan Ezarbeycanê, Gurcistanê, welatên din yên Kafkasyayê û dixwestin wan derana dagir bikin. Loma jî sedem ne baweriyên Bolşewikan bi xwe bûn ku ji xaka Kurdan û Ermenan derketin û van deran radestî Kemalistan kirin. Lê xuya ye di vê bûyerê de berjewendiyên wan bi xwe sedema sereke bû ye.

**Şoreşa Oktobirê planên dewletên emperyalist, di nêvî de hişt. Şerê cîhanê yê yekem bêyî bigihêje armanca xwe bi dawî hat. Sedemên herdûyan jî şoreşa oktoberê bi xwe ye. Sedema sereke yê devjêberdana dewleta Kurdî jî şoreşa oktobirê bi xwe bû.** Li vir mebesta min ne li dijî şoreş Oktobrê ye. Lê vê bûyerê bi xwe re guherîneke nedîtî anî û siyaseta dinyayê guhert. Piştî nakokiyên navbera Ingilîz û Kurdan gûr dibe şer dest pê dike. Lê vê serhildana Şêx Mahmûd bi têkçûna şoreşê ve bi dawî hat û Şêx Mahmûd koçberî Hîndîstanê bû lê pirsgirêka Kurdistanê careser nebû.

Gelê Kurd êdî bawerî bi Îngilîzan nedianîn û gelek caran daxwazên wan bi cîh nedianîn. Şerê li dijî Îngilîzan jî dem bi dem berdewam dikir. Asayişa Kurdistanê ne Ingilîz û ne jî Ereban dikaribûn bi cîh bikirana. Pêwîstiya Îngilîzan bi sêx Mahmûd hebû û careke din Sêx Mahmûd ji Hîndîstanê anîn Kurdistanê.

## Vegera Şêx Mahmûd ji Hîndîstanê

Şêx Mahmûd bi keştiyê ji Hîndîstanê di ser Kuweytê re hate Kurdistanê. Lê Îngilîzan şert û merc danîn pêşiya Şêx Mahmûd. Li gor peymana wan diviyabû Şêx mudaxeleyî cîhê din ji bilî Silêmaniyê nekira. Lê di serê Şêx Mahmûd de Kurdistaneke ji Silêmaniyê mezintir hebû û midaxeleyî gelek cîhên din jî kir. Ev jî bû sedema ku careke din nexweşiya serweriya Îngilîzan dest pê bike û bibe sedema şerê navbeyna Kurd û Îngilîzan. Îngilîzan bi Ereb û bi Tirkan re dixwest li hev bike. Ji xwe li Îranê serwer bûn. Daxwazên Kurdan ya dewleta serbixweya Kurdî û daxwazên Îngilîzan nakokbar bûn û dihatin hemberî hev. Îngilîzan daxwazên Şêx û midaxeleya wî ya Kerkuk û der û dora Erbîlê weke midaxeleya nava Îngilîzan bi lêv dikirin û li dijî Şêx radiwestiyan. Wan daxwazên Kurdan weke sedemên nearamiya Iraqê û ya herêmê bilêv dikirin. Aliyekî Kurdan mirov pir bi asanî dikare bêje Şêx û der û dora wî ji daxwazên avakirina dewleta Kurdî bernedidan û ev daxwazên Kurdan jî nedihat hesabê Îngilîzan û bi berjewendiyên wan re li hev nedikir.

Berjewendiyên Îngilîzan bi dewleteke yekgirtî ya Iraqî ku Kurdistan jî weke perceyeke wê hebû û dixwestin van daxwazên xwe jî bi Kurdan bidin biqebûlkirin. Di heyva 11 yê sala 1922'an de di dema vegara Sêx de rojnameya Rojî Kurd wiha dinivîsand " **Em bi hemû vîna xwe ve xwe weke neteweyeke bê tirs û pak dizanin. Hemd ji yezdan re ku îro şeva me bû roj...Qralê Kurdistanê Qral Şêx Mahmûdê yekemîn weke serwer û serokê Kurd weke Mesîh carekî di hate ser rûyê xakê. Armanca ekselans ya sereke parastina hudûdê Kurdistanê yên xwezayî ye û dostaniya bi cîranê Kurdistanê re ye."**[104]

Kurdekî xwendevan dema van gotinan bixwîne wê pir bi eşkereyî bizanibe ku armanca Şêx ne bi Silêmaniyê ve hudûdkirî ye"[105] "Hêviya me ji peymana lozanê ne bidestxistina mafê kêmneteweyî ye. Armanc; weke neteweyeke mezin li ser xaka xwe û serbixwe teyidkirina jiyanê ye." Daxwazên Kurdan berî Lozanê wiha zelal bûn[106]

---

104 *Kürtler, Türkler ve Araplar, Kuzey Doğu Irakta Siyaset,* Sayahat ve İnceleme-1919-1925. C.J Edmonds, Avesta Yayınları, 2003.r399

105 Berhema navborî, r.399

106 Berhema navborî, r. 399

Edmonds li ser vê mijarê wiha dibêje:" Talîmata ji bo min hatibû dayin; min ê ji bona guherîna helwesta Kurdan ya ji bo Kerkukê bi dizî bixebitanda û minê daxwaza ku Kerkûk di nava dewleta Iraqê de bimaya bianiya zimên." Helwesta Îngilîzan li vê derê bi eşkereyî dertê holê. Herwiha di derbarê Simko Axayê Şîkakî de jî wiha dinivîsîne. Dibêje Simko di şerê li dijî Iranê de şikestibû û hatibû nêzî Erbîlê. Lê me nehişt ew têkeve nava Erbîlê û vê helwesta me jî ew êşand.[107] Ingilîz ne tenê li dijî Kurdên Iraqê şer dikirin. Herwiha li dijî Kurdên Rojhilat jî radiwestiyan. Lewra ew li Îranê jî serwer bûn. Lê Seyid Taha ku weke serleşkerê Simko Axa dihate qebûlkirin; ku ew bi xwe ji Rewandizê ye û Pêwîstiya Îngilîzan bi wî hebûn; ew tê başûr û bi Îngilîzan re pêwendiyan datîne. Îngilîzan herdem Seyid Taha weke alternatîfa Şêx Mahmûd dîtine, lê Seyid Taha vê derfeta nedaye Îngilîzan.[108]

Îngilîzan alîkarî ji Seyid Taha li dijî Tirkan dixwestin û Seyid Taha vê yekê qebûl dike lê ew jî bedêl dixwaze û alîkariya Îngilîzan dixwaze. Loma hêza Îngilîzan hate Erbîlê û li vêderê bi Simko Axa re runişt û daxwazên wî gohdar kir. Lê li dijî Îranê alîkariya Simko qebûl nekirin. Simko dixwaze li dijî Tirkan jî şer bike lewra Tirk û Farisan di vê demê de bi hevre alîkarî kirine û li dijî serhildana Simko rawestiyane. Ger alîkariya Tirkan nebûya Îranê nikaribû Simko jî xaka Rojhilatê Kurdistanê derbixe. Îngilîzan ev alîkariyê jî nedan Simko Axa. Alîkariya Îngilîzan ya ji bo Seyid Taha hemû çekên xerabe bû û loma jî Seyid Taha vê alîkariya Îngilîzan weke heqaretekê dît. Lê Simko dev ji alîkariya Îngilîzan berdide û berê xwe dide alîkariya Kurdan.

Îngilîzan di vê demê de jî dîsa dibêjin Sêx têkiliyê bi Tirkan re datîne û ji bo me xeter e. Ingilîz ji aliyekî ve bi eşîrên Kurdan re li dijî Tirkan alîkariyê dixwazin û ji aliyekî din ve jî li dijî Kurdan şer dikin û dibêjin ji bona çi Kurd alîkariya Tirkan qebûl dikin. Ger Sêx ji Tirkan alîkarî wergirtibe jî sedemê vê alîkariyê jî dîsa Ingilîz bi xwene. Lewra gava mirov li helwesta Kurdan ya tevayî mêze dike dibîne ku Kurdan bawerî ne bi Osmaniyan û nejî bi Tirkan aniye. Li gelek cîhên Kurdistanê weke mînak di dema heyeta navneteweyî ya cemiyeta Netewan de ku ji bo

107 Berhema navborî, r.403

108 Berhema navborî, r.403

pirsgirêka Musilê û Kerkukê hatibûn Iraqê û lêkolîn dikirin hemû aliyên Kurdan alîkariya Îngilîzan kiriye. Bi helwesta Kurdan ve Mûsil û Kerkuk di nava xaka Iraqê de ma. Ger Kurdan helwesta xwe ji aliyê Tirkan ve bidana bi îhtîmaleke mezin wê Îro Mûsil û Kerkuk di nava hudûdê Tirkiyê de bûya. Mûsil û Kerkuk ne bi peymana Lozanê di nava Iraqê de ma, lê bi helwesta Kurdan ve di nava hudûdê Iraqê de ma. Di sala 1926'an de Tirk mecbûr man ku peymana pêşniyara heyetê qebûl bike. Li vir dîsa û careke din bêdadweriya Îngilîzan û zilma wan ya li ser Kurdan derdikeve holê. Lê divê em îndîvîdên Îngilîzan jî yên weke Noel, ku Osmaniyan navê wî kiribûn Noelê Kurd, wî piştî vê helwesta Îngilîzan Simko, Seyid Taha û Sêx Mahmûd tîne ba hev û dixwaze hevkariyeke neteweyî ava bike. Edmond wiha dinivîsîne" Herdû navên pêşî- Simko û Seyid Taha- ji rehma Tirkan bêhêvî bûn û didîtin ku Şêx Mahmûd wan bikar tîne"[109]

Loma jî hêviyên Noelê Kurd babilhawa çû. Vê helwesta Şêx ger rast be ku rast xuya dike ne helwestekî Kurdistanî ye. Berjewendiyên herêmî derxistiye pêşberî helwesta Kurdistanî. Dîsa Edmonds wiha dibêje; " Şêx Abdulkerîm, Qadir Keremî û beyzadeyên Cafî ji min re nameyek şandine û dibêjin em têkiliyên Şêx yên bi Tirkan re rast nabînin û loma jî em alîkariya şêx nakin" Li vir helwesta eşîrên Kurdan belkî ne rast be lê helwesta şêx ku hevkariya Kurdan nabîne jî ne rast e. Yek ji wan kesan ku Şêx Ebdulkerîm e, bi hemû vîn û hesta xwe ve daxwaza dewleteke Kurdî di bin serokatiya Barzenciyan de diparêze, gîhiştibe vê helwestê wê gavê rewşa şêx xeter bû ye.

Di vê demê de çi mixabin çend eşîrên Kurdan yên bi Şêx Mahmûd re serî hildabûn dest avêtin hevkariya Îngilîzan. Îngilîzan bi hemû dek û dolabên xwe ve dixwestin Kurdan bera sînga hev bidin. Bawerim herdû aliyên Kurdan jî di vê pêvajoyê de hewildanên şerê hevdû nekirinin. Mirov dikare vê helwesta Kurdan bi erênî li pênûsê bide. Hinek eşîran xwestinin şer bikin jî bi ser neketine, lê bi gelemperî şerê navbeyna eşîrên Kurdan nehatiye kirin. Lewra eşîrên bi Îngilîzan re hevkarî dikirin jî, him di hevkariya xwe de qels bûn û him jî daxwazên Kurdan bi kêmasî be jî dianîn zimên.

---

109 Berhema navborî, r. 408

Weke Edmonds dibêje; "Kurd di daxwazên xwe de pir zelal bûn. Netewayetî li ba Kurdan bi hêz bû. Daxwazên Kurdan weke daxwazên neteweyeke serdemî dihate zimên. Lê hesabê Ingilîz û Ereban berevajî daxwazên Kurdan di rojeva siyaseta Rojhilata Navîn û ya Iraqê de cîh digirt. Prensîbên Willsonî yên mafê çarenûsiyê ji bona Kurdan derbas nedibûn. Îngilîzan bi hêza xwe ya leşkerî, bi balafirên xwe û bombeyên netecrubekirî dihatin ser Sêx Mahmûd. Eşîrên Kurdan tehdît dikirin. Bi zorê bac ji Kurdan distendin û serweriya xwe bi wan û bi zorê didan qebûlkirinê.

Tevgereke neteweyî organîzekirî hebûya wê ev derfeta rewşa Iraqê û ya Kurdistanê bikar bianiya û wê bikaribaya serxwebûna xwe bi Îngilîzan bidaya qebûlkirinê. Welew ku Edmond îtiraf jî dike û dibêje sûcê Kurdan di vê pêvajoyê de tuneye jî dîsa bi ya min sedem dîsa Kurd bi xwe ne. Min çiqasî xwest bibînim ka di vê pêvajoyê de Şêx Mahmûd destê daxwaza alîkariyê berbi aliyê behdînan ve biriye yan na. Min li tu derê peyda nekir. Ger hebe jî min nedîtiye. Belkî di serê Şêx Mahmûd de Kurdistana mezin hebûye, lê ev daxwaz û helwest li ba şêx ne zelal bû. Herwiha ev helwest li ba eşîrên din yên kurmancan jî ne zelal bûye. Heta birayê Şêx Qadir, him di dema şêx de çûbu koçberiyê û vedigeriya Kurdistanê him jî di dema şêx li serê çiyan li dijî Îngilîzan şer dike, ew bi xwe bi çend eşîrên din re bi Îngilîzan re li hev dikin. Çiqasî Kurd di daxwazên xwe de zelal bin jî, ew ne xwedî hêz bûn. Ne organîzekiribûn. Siyaseta Rojhilata Navîn û ya dewletên dagirker hesab nekirine. Derfeta nakokiyên navbeyna van hêzan b ikar neanîne. Têkiliyên pêwist di dema pêwîst de bi kar neanîne.

Çend caran bahsa têkiliyên Tirkan û Şêx Mahmûd dihate kirin. Belkî propagandeya Îngilîzan bi xwe bû. Lê şêx jî di têkiliyên xwe de pir ne zelal bûye. Sedema vê idiayê jî, ji nakokiya navbeyna Osmanî û Îngilîzan û dûre jî ya Tirkan tê.

Di serî de cara yekem şêx, weke Qralê Kurdistanê hate destnîşankirin û şêx serweriya xwe li Silêmaniyê bi cîh kir. Di vê Şêx pêwîstiyên wê jî bi kar bianiya. Lê bi ya min helwesta herêmî li ba şêx ji ya Kurdistanî bihêztir bûye. Têkiliyên şêx û yên Osmaniyan ku Îngilîzan tirsandiye di vê dema serî de xuya dike. Aliyekî Kurdan weke rojnamevanên Kurd helwesta

Kurdan ya wê demê weke helwesta neteweyî bikar anîbin jî xuyaye helwesta desthilatdariya Kurdan xwe ji helwestên herêmî azad nekirine.

Gava em vegerin ser helwesta şêx ya herêmî û Kurdistanî weke minak di dema şêx ya duyemîn de, aliyekî hêza Îngilîzan naxwazin şêx vegere Kurdistanê û Seyid Taha weke alternatîf rê didin. Lê Seyid Taha vê helwesta Îngilîzan rast nabîne û daxwaza wan qebûl nake. Seyid Taha alîkariya Simko Axa dike û vê alîkariya xwe ji Îngilîzan jî venaşêre. Helwesteke wiha li ba şêx Mahmûd ne zelal e.

Ez bi xwe vê pêvajoyê weke derfeta herî mezin û dîrokî ji bona Kurdan li pênûs didim û dibêjim mixabin Kurdan ew qudret û vîna yekgirtina neteweyî li aliyekî welat be jî bi cîh neanîne û dîsa jî hatine xapandin. Vê serdema ku ez tînim zimên dema amadeyiya peymana Lozanê ye. Weke min li jor jî aniye zimên peymana Lozanê jî pirsgirêka Mûsilê û Kerkukê çareser nekir û radestî Neteweyên Yekbûyî kir. Lê helwesta Kurdan ya piştî peymanê ya di sala 1925'an de ku Serhildana Şêx Seîdî PÎranî têk çûbû û zilm li Kurdên bakur dihate kirin. Kurdan bi eşkereyî helwesta xwe li dijî Tirkan anîn zimên û ji bêçaretiyê aliyê Îngilîzan girtine. Bi peymana Lozanê ve Mafê Kurdan yê li başûrê Tirkiyeyê avakirina dewleta Kurdan jî ji holê rabû û peymana Sewrê jî hebûna xwe wenda kir. Piştî peymana Lozanê bûrayê Şêx Mahmûd ku Leşkerê Tirkan bû bi soza alîkariya Tirkan ve ji Enqereyê vegeriya Silêmaniyê. Şêx Mahmûd li dijî Îngilîzan heta dawiyê şer kir lê taliyê xwe radestî Îngilîzan kir. Tevgera şêx Mahmûd têk çû lê tevgera neteweyî bê rawestan berdewam kir. Şêx Mahmûd di sala 1956'an de çû ser dilovaniya xwe. Tê gotin ku di sala 1923'yan de gava Simko Axa tê Silêmaniyê weke Qralekî Kurdistanê ji aliyê hazretî ekselans ve pêşewazî dibe. Bi rêz û rismekê tê pêşewazî kirin lê dîsa jî hevkariya wî û ya şêx cîh nagire.

Li Rojhilata Navîn Rasîtyek heye divê em bibînin: Pişti Mondrosê, her wiha bihêzbûna Kemalîstan helwesta Emerîkan, Fransizan û Îngilîzan guhertibû. Ji xwe ji zûva Bolşewîkan alikariya Kemalistan dikirin. Tevgera Şêx ne demeke kurt, lê demeke dirêj heta sala 1931'ê berdewam kir lê mixabin bi destê zordarên Ereb û yê Îngilîzan ve hate rûxandin û jiyana dewleta Kurdî ya serdemî bi dawî hat.

**Iraq ji bo çi Girîng e û em ê çi sudî jê wergirin?**

Iraq dewleteke bi petrola xwe dewlemend e, loma jî girîng e. Lê girîngiya Iraqê heger dewlemendiya wê be, mixabin ev bi xwe dewlemendiya Kurdistanê ye û loma jî Kurdistan ji Iraqê girîngtir e. Li Kurdistanê jî Kerkuk ji hemû bajarên Kurdistanê girîngtir dertê pêş. Lewra yek ji sembola berxwedana Kurdan e û yek ji bajarê dewlemend yê Kurdistanê ye.

Ji bona ku Iraq weke perçeyekî ji netewa Erebî bê binav kirin bi dehan darbeyên leşkerî û şerê mezin yên nava neteweyan peyda kiriye. Lê ji Sumeran heta dewleta Federe Iraq, nebûye perçeyek ji neteweya Erebî. Îro jî helwestên vê nîjadperestiyê berdewam in.

Iraq di dîrokê de tucarî nebûye weke welatekî Ereban. Ereb ji derve hatine vê herêmê û vêderê bi navê Islamê dagir kirine. Emewiyan pêngavên dewleta Islam-Erebî avêtine lê dîsa jî bi ser neketine.

Iraq bi destê Îngilîzan hatiye ava kirin û pirsgirêkên Iraqê yên iro jî ji wê demê de dest pê kirine û radestî nivsê dema me kirine. Îngilîzan Dewleteke bê dadwerî ava kirine û neteweyên cûda û olên cûda paşçav kirine, ta redeyekê dijî wan şer kirine.

Iraq weke dewleteke pirneteweyî, pirolî, pirzimanî, pirçandî ye û divê wiha bimîne. Hemû mihaweleyên yekgirtina dewletê bi navê Erebîtiyê sedema şerê nava neteweyan e û tucarî jî biser nakeve.

Şoreşa Iraqê û destêwerdana hêzên navnetewî stratejiya avakirina "demokrasiyê" li Rojhilata Navîn xistiye nava qrizeke siyasî û leşkerî. Lê vê şoreşê mecal û ramanên avakirina dewleteke demokratî, pirneteweyî, pirçandî li Rojhilata Navîn pêk aniye û ji nuha ve ev diyardeya dîrokî ji bona hêzên guherxwaz yên Rojhilata Navîn bûye minaka berbiçav û giranbiha. Çareseriya pirsa Kurd li Iraqê, bidestxistinên başûrê Kurdistanê, nimûneya sereke ya çareseriya pirsa beşên dinê yên Kurdistanê ye. Ev çareserî jî ya herî kêm e. Guherîna helwesta hêzên serneteweyî-navneteweyî derfeta ku Kurd li Başûrê Kurdistanê, yekcar, bicarekê ve dest daynin ser xaka xwe û desthilatdariya xwe avabikin vekiriye. Ev derfeta serneteweyî-navneteweyî dikare ji bo rojava û rojhelatê Kurdistanê jî peyda bibe. Ango nimûneya başûr ji bo van beşên Kurdistanê jî mumkune û belkî ne dûr be jî. Lê ev nimûne ji bo

gelek sedema ji bo bakurê Kurdistanê derbas nabe. Ango di demke nêzîk de tu midaxeleyên-destêwerdanên serneyeweyî-navneteweyî ji bo Tirkiyê xuya nake. Lewra srtratejiya bakurê Kurdistanê ji bo bidestxistina mafê Kurda ji yên başûr,rojava û rojhelat cuda tire. Mafên Kurda li bakur wê di demke dirêj de û bi awayên cuda ve bê bidest xistin û wê di pêvajoyeke cuda de derbas bibe.

## TIRKIYE

### Li Rojhilata Navîn pêvajoya avakirina dewleta Tirk

Berî ez dest bi pêvajoya avakirina dewleta Tirk bikim dixwazim çend gotinan li ser bêje û têgehên li ser vê pêvajoyê têne gotin bînim zimên. Yek ji wan têgehan jî Tirkên Oxûz e.

Di nivîsîna dîrokê de, di têkoşîna neteweyî de û bi gelemperî di têkoşîna siyasî de rola bêje û têgehan gelekî girîng in. Lewra jiyana siyasî li ser bingeha bêje û têgehan têne ava kirin. Loma divê bêje û têgeh di cîhê xwe de û rast bêne bikaranîn. Divê em ji bîr nekin ku her bêjeyek û têgehek xwedî dîrokekê ye û ji bo armancekê hatiye bikar anîn. Bi bêje û têgehan ve mirov çandeke dîrokî û civakî ava dike. Mirov bi rêya wan bêjeyan û têgehan raman û armanca xwe tîne zimên, civatê bi rêya wan dixe tevgerê û bi rêya wan bûyeran diguhere û bûyeran bi cîh dike. Heger têgeh û bêje ne di cîh de û bi çewtî bêne bikar anîn wê gavê mirov jiyanê tevlihev û aloz dike. Dîrokê diguhere û jiyana civakî li ser bingeha çewtiyê ava dike.

Îro li Tirkiyê tevliheviya têgehan heye. Hinan bi zanetî têgehên vê civatê tevlihev kirîne. Bi tevliheviya têgehan ve dîrok jî tevlihev bûye. Herwiha mejiyên însanan jî tevlihev û dagirkirî maye. Ramanên azad têne tawanbar kirin. Di civateke wiha de, dîtina rastiyê gelekî zahmet e. Li vir pirsa sereke ya bêje û têgehan ya dîrokê ye. Mebesta min dîroka dewleta Tirkan e. Dîroknas û siyasetmedarên Tirk yan jî yên li ser navê Tirkan diaxivin, ne tenê dîroka neteweyên cûda lê herwiha dîroka xwe jî aloz kirine û herimandin in. Îdîayên dîroknasên Tirk yên li ser Tirkên Oxuz balkêş e. Ez dikarim ji vê mijarê dest pê bikim.

Ji destpêkê de divê mirov bêje gelo bi rastî kesên îro ji xwe re dibêjin Tirk ew berdewama Tirkên Oğuz in yan na? Bersiva vê pirsê bêgûman **na** ye. Tirkên Oxuz kî nin û ji ku û kengî hatinin Rojhilata

Navîn? Evana him pirsên dîrokî ne, him jî pirsên dîroka nîvîsî ne. Pirsa Oxuzan bi xwe tenê wek çîrok hatiye gotin û hinekan jî ev çîrok kirine dîrok. Bi kurtî tiştekî wiha tuneye. Ji xwe dîroka Tirkan li ser bingeha çîrokan hatiye ava kirin. Di nîvîsîna vê çîrokê de bêje û têgeh, bi armanc û bi zaneyî çewt hatine bikaranîn. Dîroka Tirkan tevlihev û aloz kirine. Ev nêzîkî 90 salan e dîroknas û siyasetmedarên Tirk, bi bêje û têgeha " **kî Tirk in yan jî Tirk kînin?**" serê xwe diêşînin lê hê jî bersiva vê pirsê nedane. Ji bo çi? Ji bo ku dîroka neteweya Tirk dîrokeke çêkirî ye û ji rastiyê dûr e. Têgeh û bêjeyên di vê dîrokê de bi kar hatine ev dîrok aloz kirîne.

Tirk ji gelek qewman û ji gelek gelan weke fikreke nuh di destpêka sedsala 20'an de di nava imparatoriya Osmanî de dest pê kiriye. Yên nasnameya Tirk bi kar anîne û ji bo berjewendiyên xwe xistine xizmeta avakirina dewleteke neteweyî bi xwe ne Tirk in. Bêtirên wana Balkanî û Qafqasî ne. Di nava wan de em Kurdan, Ereban, Ermenan, Rûman û Yehûdiyan jî dibînin. Lê Li gora gotin û çîrokên dîroknasên Tirk, Tirkên Oxuz berî sedsala 11'an û nemaze di sedsala 11'an de ji bîst û çar qebîleyan, bîst û sê qabîle ji Asya navîn ber bi Rojhilata Navîn û Ewrupayê de meşiyane. Ji xwe ji bona ev bûyer bi xwe çîrokeke û ne raste, dîroknasên Tirkan jî weke hev nafikirin. Ji wan qebîleyan ka çend qebîle hatine heta Anatoliyê ew jî ne zelal e. Bingeha vê çîrokê bi xwe li gor gotara dîroknasên Tirk ji efsaneya Oxuz Kahan hatiye girtin. Li gor vê efsaneyê 6 kurê Oxuz hene û ji her kurekî wî jî 4 kur hene. Her yek ji wana weke qebîleyekê binav dibin û ew jî 24 qebîle ne. Yek ji sedemên ku ev çîrok e û ne raste jî ev e: Weke tê gotin ji her kurekî Oxûz çar kur hene. Keç tuneye û kurê her 6 kuran jî weke hev hatine hesibandin. Ev tenê jî rê dide ku ev dîrok di eslê xwe de çîrok e û ne raste.

Bi baweriya dîroknasên Tirk, Ji sedsala 6'an heta sedsala 11-12'an, ji Çînê heta nîvê Ewrupayê hemû devlet û împaratoriyên hatine avakirin yan bi destên wan qebîleyan yan jî bi alîkariya wan hatine avakirin. Navên wan dewletana cûr be cûr in lê hemû jî wek dewletên Tirk û weke dewletên Tirkên Oxûz bi nav dibin. Ji wan qebîleyan yên ber bi bakurê Ewrupayê de çûne, dewletên Hûnî, Kirimî, Kazakî, Bulgarî û Tatarî û çendek dewletên din ava kirine. Oxûzên din jî di bin

navên cûda cûda de û dawî jî bi serokatiya Selçûk beg ve hatine Rojhilata Navîn û dewleta Selçûkiyan ya islamî avakirine. Împaratoriya Selçûkiyan ya aliyê Îran û Iraqê di sala 1150'yê ji aliyê Kardûkiyan ve hatiye rûxandin û Selçûki belav kirine. Ji wan qabîleyên belavbûyî yên hatin û beşdarî selçûkiyê Anatoliyê bûn, ewana ne yên dewletên Akkoyuniyan, Karakoyuniyan, Sefawiyan û Osmaniyan avakirine. Ev çîrokên dîroknasên Tirkan e. Lê rastî ne wiha ye.

Rastiyek heye ku qabîleyên ji Asya navîn hatine Rojhilata Navîn û li dijî qabîleyên gelên binecîh weke Kurdan, Ermenan, Persan, Partan, Eramiyan, Ezeriyan û gelekî din şer kirine û bi zorê cîh ji xwe re li Mezopotamyayê û li Anatoliyê bidest xistine henin. Evana bêtir Moxolî, Tacîhkî-Partî, Selcûqî û Tatarî bûne. Tu qabîle bi navê Tirkan nehatine û tu dewletên Tirkî li vê herêmê ava nekirine. Selçûkî, Osmanî, Sefawî ne Tirkin û dewletên pirqewmî û pirolî ne. Ango ne tenê Selçûkî û Osmanî herwiha gelek dewletên din yên li Îranê, Mezopotamyayê û li Anatoliya yê hatine avakirin ji wana yek tenê jî bi navê Tirkan nehatine ava kirin. Min di nivîsên jorê de rewşa Selçûqiyan û ya Moxolan aniye zimên. Li vir dixwazim ji Osmaniyan dest pê bikim.

Heta şerê cîhanê dewletên li van herêmana hatine avakirin ji qewmiyetên têkel hatine avakirin û qabîleyên ku Tirk jî xwe berdewama wan dihesibînin ango Osmanî jî di nava wan de ne. Lewra di wê demê de ol, qabîle û malbat bingehan avakirina dewletan in. Weke mînak gava ku Osman Beg li Sogutê bi cîh bû û wê derê weke eşîrekê dagir kir ramanên avakirina dewletê di serê wî de tunebû. Hayê wî û bayê wî ne ji Tirkan û nejî ji dewleteke Tirkî hebû. Hayê wî ji dewletbûyinê tunebû ye. Ew weke qabileyekê li Anatoliyê bicîh dibe lê dû re avakirina dewletê fêr dibe. Osman Beg tucarî bi navê Tirkan ne şer kiriye û ne jî dewlet avakirî ye. Bi navê malbata xwe dewlet avakiriye lê dewleteke têkel bûye. Dewleta Osmanî tucarî nebûye dewleteke xwerû ya gelekî yan jî qabîleyekê. Ji xwe sultanên Osmanî heta dawiya Împaratoriyê jî bi navê Osmaniyan tevgeriyane û dijî kes û partî, tevger û hêzên bi navê Tirkîtiyê kar kirine rawestiyane û dewleta pirçandî bi navê ummetê parastine. Di dema dawiya Împaratoriyê de, yên bi navê Tirkîtiyê tevgeriyanin, paşayên Osmaniyan in û tevayiya wan ji welatên Balkanî û Kafqasyayê hatine. Arnawût, çerkez, Laz, Gurcî, Tatarî, Kirimî û wekî

din in. Di nava wan de bêgûman, Ereb, Kurd, Yehûdî, Ermenî, Rûmî jî henin. Lê Tirk tunenin. Ev mîrat hetanî îro jî didomîne.

Dewleta Osmanî mîrata dewleta Bîzansî ye. Dewleta Osmanî dewleteke misiliman û ji gelek netewe û olên cûda pêk hatiye. Osmaniyan ji Efrîka, heta Ewrupayê dewleteke împaratorî ava kirine. Lê avakirina dewleta Osmanî wek împaratorî bi dagirkirina Kostantînopolîs-Îstanbûlê ve pêk hatiye. Lê weke hemû tiştî navê Stenbol jî guhertine. Navê Stenbol; "Eis Ten Polin" e û bi maneya ber bi bajêr e. Ji aliyê Netewa û ji aliyê olî ve Dewleteke kozmopolît e. Dewleta Osmanî weke dewleteke bi olî misiliman be jî, olên cûda jî di nava împaratoriyê de jiyane û ola xwe bikar anîne. Osmaniyan ji serokwezîrê xwe re "sadraazam" digotin. Dewleta Osmanî 624 salan jiya ye. Di serweriya Osmaniyan ya 624 salan de 215 sadraazam bûne xwedî desthilat. Di dîroka Dewleta Tirk ya vî 90 salên dawîn de di dema komarê de her hatiye gotin ku ji 215 Sadraazama 78 Sadraazam Tirkin. Rastiya van gotinan bi xwe jî cîhê devjeniyê ye. Ev gotin bi xwe ji rastiyê dûr e, Lê her ev gotin rast be jî, 197 Sadraazamên ne Tirk, kî bûn? Di nava vî 624 salên serweriya Osmaniyan de navê yekî tenê wezîr yê Tirk nayê gotin. Heta makzagona sala 1876'an di hemû belgeyên fermî yên dewletê de bêjeyeke bi Tirkî tuneye. Heta vê demê zimanê Osmaniyan Farisî, Erebî bûye û dawî jî ji Farisî, Erebî û ji Kurdî zimanekî Osmanî hatiye derxistin. Baş e ev dewlet çawa dibe dewleteke Tirk? Emê vanên cûda, ne Tirk deynin ku? Emê zimanê dewletê yê Farisî û Erebî li ku deynin?

## Dewleta Osmanî û statuya Kurdistanê

Mîrekên Kurdistanê heta 1514'an di nava împaratoriya Sefawiyan de bi awayekî xweserî dijiyan. Di navbeyna salên 1514-1530'yî de, di nava împaratoriya Osmanî de pêvajoyeke nû ji bo mîrekên Kurdistanê dest pê kiribû. Mîrekên Kurdan bi sîstemeke nû di nava Osmaniyan de bi xwesîriyeke taybetmend ve li herêmên xwe serwer bûn. Hemû tevger û serhildanên Kurdan yên di dema Osmaniyan de bi şînşop û bermayên vê demê ve form girtine. Di navbeyna 400 salên bi Osmaniyan re, Mîrekên Kurdistanê heta dema dawiya Împaratoriya Osmanî, li herêmên xwe xweser jiyane û li herêmên xwe serwer bûne. Osmaniyan navê herêmên Kurdan weke Kurdistan bikar anîne. Di hemû

belgeyên Osmaniyan de welatê Kurdan weke Kurdistan hatiye binavkirin. Nivîskar û siyasetmedarên nîjadperestên Tirk gelek carî dibêjin, navê Kurdistan ne weke welat bikar ahtiye. Lê belgeyên Osmaniya wan derewîn derdixe.

Împaratoriya Osmanî bi destxistina Costantinopolîs( Stenbûl) ve li ser mîrata Bîzansiya rûnişt. Di vê demê de Osmaniyan bala xwe dabûn rojava. Yê Stenbûl dagir kir, Fatîh Sultan Mehemed bi xwe Rûm e û loma jî bala xwe bêtir dida rojavayê împaratoriyê. Dema şerê Osmaniyan li rojava didomand, li Rojhilat û başûr jî di nava Sefawiyan, Akkoyuniyan û Kurdan de şer berdewam dikir. Şah Îsmaîl di 1502'an de dawî li Akkoyuniyan anî û serweriya xwe eşkere kir. Li Ermenîstanê, Baxdadê û heta Maraşê jî Kurdistanê serweriya xwe berfireh dike. Sefawiyna li van herêmana şerê navbeyna, Ermen, Kurd, Ereb, Tatar, Azeriyan yê bi sedsala didomand bi dawî anî û li van herêmana serweriya xwe bicîh kir.

Di vê demê de, berî împaratoriya Osmanî û Sefawî werin Kurdistanê, Mîrekên Kurdan dijî desthilatdariya Akkoyuniyan şer dikirin û serweriya herêmên xwe bernedidan. Bi şerê Sefawiyan yê dijî Akkoyuniyan ve pêwendiyên Kurdan û Sefawiyan dest pê kirin. Piştî Sefawiyan dawî li Akkoyuniyan anîn, berê xwe dane Kurdistanê. Pêwendiyên wan zêde berdewam nekir. Şah Îsmaîl bi Mîrekên Kurdan yên Sûnnî bawer ne dianî û loma jî xwest serweriya wan ya herêmî bidawî bîne. Bi vî awayî şerê Kurdan û Sefawiyan dest pê kir. Bi awayekî din Mîrekên Kurdan dijî zilm û zordariya Sefawiyan serî hildan. Di şerê navbeyna Kurdan û Sefawiyan de, berxwedanên Kurdan bala Osmaniyan dikişand. Osmaniyan vê rewşa hanê weke derfet didîtin. Lewra heta wê demê hînê jî Mîrekên Kurdistanê li Musil, Kerkuk, Soran, Husnû Keyf, Bidlîs,Sason, Palu, Mayafariqîn, Sîirt û wekî din desthilatdariya xwe di domandin. Lê gelek Mîrekên Kurdan pêwendiyên xwe ji Sefawiyan cuda nekiribûn.

**Mewlana Idrîsê Bitlîsî**

Mewlana Idrîs ji bo hukûmeta Mîrekên Kurdan xebat dikir. Ewî dixwest Mîrekên Kurdan yên bi Sefawiyan re ne, bi yên dijî Sefawiyan re bîne ba hev û desthilatdariya Mîrekên Kurdan ava bike. Lê bi astengiyên mezin ve rûberû dima. Loma wî berê xwe dida Osmaniyan û dixwest bi Osmaniyan re li hev bike. Osmanî ji bo pêwendiyeke wiha amade bûn. Osmaniyan ji nuh va bala xwe didan Rojhilat û loma jî Mîrekên Kurdistanê ji bo wan girîng bûn.

Mewlana Idrîs peymana bi Osmaniyan re bi xwe dinivîsîne û pêşkêşî Mîrekên Kurdan dike. Dû re vê peymanê bi serlêdana Stenbolê ve pêşkêşî Yavuz Sultan Selîm dike. Di bingehiya vê peymanê de Mîrekên Kurdan dijî Sefawiyan şer dikin. Şerê Çaldiranê di bingehiya xwe de şerê Kurdan û yê Sefawiyan e û bi alîkariya Osmaniyan ve Kurd bi ser ketine. Heta wê demê jî desthilatdariya Osmanî li Kurdistanê tuneye. Di şerê Çaldiranê (1514) de Mewlana Idrîs li ser aliyekî mezin yê xaka Kurdistanê "hukumeta mîrekên Kurd" ava kiriye.

Li gor peymana Mewlana Idrîs, Yavuz Sultan Selîm, xweserî û serweriya Mîrekên Kurdan li herêmên wan qebûl dike. Mîrekên Kurdan wê li dijî destdirêjiyên cîranên Osmaniyan, xwe û Osmaniyan biparêzin. Hemû mîrekên beşdarî peymanê dibin xweseriya xwe diparêzin. Desthilatdariya xanedaniya mîrektiyê ji bav radestî law dibe. Ger ew nebe bi lihevkirina gel, kesek tê helbijartin lê divê serweriya Osmaniyan wî kesî qebûl bike. Kurd wê beşdarî hemu şerê Osmaniyan bibin û wê Osmanî jî Kurdan dijî hemû hêzên derekî biparîze. Mîrekên Kurdistanê li herêmên xwe azad in û serwer in.

Serweriya hukumeta Mîrekên Kurdistanê, ji pênc (5) xanedanên xweser, û ji heyşt (8) sancaxên xweser ve pêk dihat. Şerê Çaldiranê bi peymana Qasrî Şîrîn ve bi dawî hat û piraniya xaka Kurdistanê xist nava Osmaniyan. Lê Mîrekên Kurdistanê yên di nava Osmaniyan de bûn, bûne du beş. Beşê Elewî dijî Osmaniyan bûn û serweriya Mîrekên Kurdên Sunnî qebûl nedikirin. Alîgirê Sefawiyan bûn. Serhildanên wan yên dijî Osmaniyan bala mîrekên Sunnî nekişandîne. Mixabin oldarî, terîqetî ji Kurdayetî bihêztir bû û yekîtiya Mîrekên Kurdistanê lawaz kiriye. Gelek balkêş e ku vê hêza Mîrekên Kurdan heta 1690'î di nava şerê dijî Osmaniyan de jiyaye. Ji bilî Dêrsimê ev herêmên

Kurdan di dawiya sedsala 17'an de dikevin bin serweriya Osmaniyan. Lê nakokî û serhildanên wan didomin. Ji bilî hêviyên Ehmedî Xanî, helwestên Mewlana Idrîsê Bitlîsî, Şeref Xan, di wê demê de bi tevayî di nava Mîrekên Kurdan de helwesta avakirina dewleteke Kurdî tuneye. Welewkî hukumeta Mîrekên Kurdan jî tê avakirin, di eslê xwe de ew dewlet e, lê ne domandiye û piştî mewlana Idrîs jî bi dawî hatiye. Lê serxwebûna mîrektiyê ji dest bernedane. Li herêmên xwe desthilatdar bûne. Heta dawiya sedsala 19'an jî Osmanî li Kurdistanê ne serwer bûn.

Desthilatdariya mîrekî li Kurdistanê di dema lawê yavuz Sultan selîm, Qanûnî Sultan Suleyman de jî berdewam kiriye. Kanûnî S.Suleyman peymana bi Mîrekên Kurdan re li gor van xalên li jêr hatine nivîsîn pêk aniye.

**Peymana Kanûnî Sultan Suleyman ya bi Mîrekên Kurdan re**

"Şah Îsmaîl bi hîsên xwe ve ku girêdayî terîqet û mezhebên bi ser Şîa ve bûn, gelekî zerar û ziyan dan hêjayiyên Kurdan. Ango Şah Îsmaîl, hukûmdariya Xanedanên Kurdan serûbin kir. Yek ji wan Mîrekên Kurdan, mîrekê Bedlîsê Emîr Şerefxan e ku di serdana xwe de ji aliyê Şah Îsmaîl ve hate serdestkirin, (ev bûyer bi fireyî di Şerefnameyê de hatiye nivîsîn). Lewra pirraniya Mîrekên Kurdan ên sûnnî û alimên wan yên oldar li dijî Sewefiyên şîia bûn. Di wê demê de Mîr Şerefxan piştî ji destên wan azad dibe, Gava yekem Mîrekên Kurdan ji deverên cudacuda dicivîne ser hev.Di encama vê civandinê de Mîrekên Kurdan, li dijî desthilatdariya Sefewiyan helwest digrin. Her wiha ewan bi xwe ji helwesta Dewleta Osmaniyan ku li Stenbolê, di pêşevaniya Yavuz Sultan Selîm de amadeyiya sefera şerê dijî Sefawiyan dikirin, agahdar bûn. Ji bo lihevkirinekê pêkbînin, Mîrekên Kurdan biryar dan ku, heyeta bi navê Mîrekên Kurdistanê bişînin Îstenbolê cem Osmaniyan. Ev heyet ji aliyê alimê mezin Mewlana Îdrîsê Bedlîsî û herwiha yek ji mezinê eşîra Rojkiyan wezîr Mihemed Axa ve pêk dihat.

Dewleta Osmanî, bi peymana navbeyna Mîrekên Kurdan û dewleta Osmaniyan ve ya şerê çaldiranê yê di 1514'an de bi encam bû, dijî dewleta Sefewiyan bi ser ket. Bi vê peymanê ve Mîrekên Kurdan mafên

xwe yên desthilatdariya herêmî bi stautuyeke nuh di nava dewleta Osmanî de domandin. Ji vê demê u virde pêwendiyên Mîrekên Kurdan û dewleta Osmanî li ser bingeha vê peymanê berdewam kirî ye. Piştî Yavuz Sultan Selîm, lawê wî Qanûnî Sultan Suleyman (1495-1566) bû padîşahê Osmanî. Weke tê xuyakirin, ku ew bi xwe jî tîne zimên, weke berdewamiya vê peymanê, bi fermaneke nuh va desthilatdariya Mîrekên Kurdan li Kurdistanê, bi deh xalan ve eşkere dike.

**Peyman:**

"Di dema gorbehiştê bavê min Sultan Selîm xan de, Mîrekên Kurdistanê bi dil û can, bi girêdaneke xizmetwarî, di bin rêvebiriya dewleta Îslamî de, bi caran li dijî Qizilbaşa şer li dar xistinin û xizmetên bi nirx afirandinin.

Her wiha di dema serweriya min de, encamdayîna bi rêkirina serleşker Îbrahîm paşa, ya sefera şerqê ku bi Mîrekên Kurdistanê re dan û stand û peyman çêkiribû, Ezarbeycan, Horasan, Tebrêz, Bexdat û wekî din, birc û welat bidest xistin.

Berdêla fedakarî û dilsoziya Mîrekên Kurdan yên di van şeran de, bi cîhanîna daxwazên wan, bi wateyî (wacib) dizanim."

1-Bajar,birc û sancaxên ji berê da, bi sedsalan di bin serweriya Mîrekên Kurdistanê de ne, hukumraniya wan bi awayê temlikî ji bo wan hatiye pêşkeş kirin û ev belgename bi nivîskî ji hemû Mîrekên sancaxan re hatiye radest kirin.

2-Hemû hatin û berhemên birc bajar, gund û mezrayên ji xanedanên herêmî re (Kurdistan – S.N) hatine berdest kirin, weke mafê wan û neslên wan ku ji bav radestî law dibe, bi awayekî temlikî berdewam dike. Mulknameya Xanedanan gîhiştiye destên wan.

3-Ez li ser hewe emir dikim ku ji nuha û pêve, hemû sancaxên ku min dane Xanedanên eyaleta "Kurdistanê" bi tevayî him di bin mulkiyeta wan û him jî weke malîkane di bin desthilatdariya wan de ne.

4-Sancaxên di bin desthilatdariya Mîrekên Kurdan de ne, heta serweriya dewleta Îslamî ya dewleta Aliyeyê qebûl bikin, tu kesek ji ewlad û ecdadên me, ji hemû xelefên silsileya me, wezîrên me, serbegên me û erka birêvebira dewleta me, di bin nîrê çi sedemî dibe bila bibe, mafê wan yên êrîş û destêwerdanê tuneye.

5-Ew emrê bi qedirşînasî û payebilind ji aliyê min ve hatiye rêkirin, ji aliyê tu kesî ve, bi tu awayî bi pênûsê pê nayê leyistin, nayê xerakirin û nayê guherîn. Mulkiyet û erka sancaxa tenê ji bav radestî law dibe.

6-Ji Mîrekên sancaxa (Mîrekên Kurdistanê S-N) kîjan dibe bila bibe, piştî çû ser dilovaniya xwe, eyaleta wî ji holê ranabe û li gor belgenameya Humayunê, sancax bi hemû sînorên xwe ve radestî lawê Mîrek dibe. Heger çend lawên Mîrek hebin, wê gavê sancax bi awayekî wekhevî di nava lawên Mîrek de payê dibe.Yan jî ew bi xwe li ser çarenûsa sancaxê xwedî biryar in.

7-Her yek ji Mîrekên sancaxa ku bi qudreta xweda ve kordûnde (bê ziryet) û bê xizm biçe ser dilovaniya xwe, wê eyaleta wî radestî kesên dereke û biyanî nebe. Birêvebirina eyaletê, bi encama hevkarî û lihevkirina Mîrekên Kurdistanê ve, wê têkeve bin serweriya Mîrekekî herêmî û layîq.

8-Ez bi qesem, biyektayî ya xwedayê dilovan ve sond duxum ku ji nuha û pêve, ew peymana ku min bi emr û teqrîra xwe ya bilind, bi Mîrekên Kurdistanê re pêk aniye, wê dijberî û berberiya wê bi tu suret û bi tu awayî neyê kirin.

9-Ji bo pakî û hedîsên pêxemberê serwerê her du cîhana, heta Mîrekên Kurdan, li ser rêya rastiyê, ji dostê me re dost û ji neyrên mere neyar û atebe-î ulema re rêzê bigrin, divê hûn ji fermana ku min nivîsiye rûmetê bigrin û tu guherînan têda nekin. Piştî min, emr û wesiyeta min ya ji bo zarokên min ev e: Divê ji peymana min ya bi Mîrekên Kurdan re hatiye çêkirin, sadiq bimînin û li gor rêbaza emirnameya min, ku ji dema bavê min Yavuz Sultan Selîm ve weke mîrat didome, tevbigerin. Ew kesê bi dujminayî dijî peymana min ya bi Mîrekên Kurdan re hatiye çêkirin derkeve û rêzê ji vê emirnameya min re negre, di wê roja zehmet ya hesabdayinê de, ricaya min ji xwedayê dilovan eve, ku weke zalim, tawanbar û qatil (mucrum) bêne darizandin.

10-Her dem bi rastî tevbigerin. Di derbarê xizmeta ol û dewleta min de, cudahiyê nekin. Nemaze bi Mîrekên Diyarbekir û begên Bexdayê re û bi cenabên Mîrekên Kurdistanê re, bi yek zimanî û bi yek eniyê tevbigerin û ji wan cuda nekevin. Bi hemû muhîmatên leşkerî ve, bi qebîle û eşîran re dijî dujmina rawestin. Alîkarî û hevkariya hev bikin. Di derbarê van mijaran de deqîqeyekê wenda nekin. Ne-

maze, gelên mazlum yên dibin destên we de ne , ew bi xwe emanetên xwedayê dilovan in. Li himberî wan rêzdar û dadwer bin. Ji qanûnên heyî re rêzê bigrin. Her wiha rê nedin ku kesekî ji derve zulmê li wan bike."[110]

Dewleta Osmanî dewleteke Împaratorî bû. Bi sancak, wîlayet û eyaletan ve dihate birêvebirin. Bingeha împaratoriyê ummetî -Îslamî ye. Netewayetî di nava Osmaniyan de heta sedsala 19'an jî tune bû. Dewleteke pirçandî bûye.

Bi çend nimûneyên cuda ve dixwazim statuya mîrekî ya Kurdistanê bidomînim. Bi van nimûneyan ve statuya Kurdistanê ya wê demê eşkere dibe. Yek ji nimûneyên balkêş jî nimûneya konfederasyona Rojkiyan e.

### Êla Rojkiyan û yekîtiya wan

Neteweyek, gelek yan jî civatek bi dîroka xwe ya kevnare ve, hatibe hunandin û di dîroka xwe de têgihiştî be, dikare xwe ji bo pêşerojê amade bike. Neteweyek bêyî zanîna dîrokê weke darek bê kok û rût e. Têgihiştina neteweyekî ya mêjûyî temînata pêşeroja wî bi xwe ye.

Gelê Kurd bi hafizeya xwe ya kolektîfî di warê dîrokê de pir lawaz e. Weke pêwîstî nekariye li hêjayiyên xwe xwedî derkeve. Bêşik dîrok di jiyana netewa Kurd de sitûna bingehîn e. Bêgûman hêz û taqeta dîroka hevbeş dikare Kurdan li ser hev rabigirê. Qet nebe divê em bikaribin li berhemên xwe yên hêja ên kolektîvî û dîrokî, xwedî derkevin û wan derxînin pêş.

Yek ji van xezîneyên mêjûyî ya neteweya Kurd, ya bi nav û deng "Şerefname" ye. Mîrê Bedlîsê Şerefxan ev berhema xwe ya bi rûmet li ser dîroka Kurdistanê ya kevnare nivîsiye. Şerefname bi tena xwe, dikare bibe çavkaniya bi dehan pirtûkan. Bi tena xwe tabloyên di Şerefnameyê de mijara çendîn pirtûkan in. Bêdewletbûna netewa Kurd, her weha tunebûna dezgehên neteweyî rê li ber Şerefnameyê

110 Çavkanî pirtûk "Beyanameya derdora Tatwanê ya ji doh hetanî îro ya navneteweyî" r-275,276-277. Semivîsa Abdullah Demîr, ya bi navê "Di sedsala 16an de, di serweriya Sefawî û Osmaniyan de Mîrekên Bedlîsê, Jimara Arşîvê,72-TSMA No E:11696. (Malpera Argun- Slêymanê Norşînî.

teng kiriye ku şewqa xwe bi tevayî bide ser civata Kurdan û ronî bike. Her çiqas dijminên netewa Kurd ên sondxwarî xwestine giraniya Şerefnameyê berbend bikin jî, ew bi ser neketine. Şerefname bi tena xwe û piştrast, ji hêza leşkerî ya bi sedhezaran bêtir ji miletê Kurd re bûye balpişt. Bi saya nîrê mezin Şerefxanê Bedlîsê em li ser diroka Kurdistanê ya kevnare gelekî tişt fêr dibin. Mijareke ji van mijara ya balkêş di Şerefnameyê de, ji xwe re cî dîtiye êlên Rojkiyan e. Ezê di vê nivîsê de hinekî aliyên balkêş ên êlên Rojkiyan derxînim pêş.

Mebesta min bi vê meqaleyê bêtir ew e ku çend çiqên balkêş ên êlên Rojkiyan raxim ber çavan. Bêgûman di çerçoweyekî fireh de bandora şînşopên êlên Rojkiyan mijara pirtûkane. Dîroka êlekî weha ku ji Mîr Şerefxan şûnde, bi gelekî awan nehatiye tevdan, bêşik ji bo civaknasiya Kurdan valayî û kêmasiyeke mezin e. Lewra Rojkiyan di bin fermanrewatiya mîrên Bedlîsê de, zêdetirî 650î roleke biryardêr girtine ser milên xwe. Hezar heyf ku li ser êla Rojkiyan bi rêk û pêk agahdarî û çavkanî, ji bilê Şerefnameyê û hindik jî gerokên weke Ewliya Çelebî pêve, min nekarî di tu berheman de bidestxim. Bêgûman ez di vê rêçêde rastî gelekî nivîsan hatim ku navê êlên Rojkiyan di nivîsên xwe de bi karanîne.

Yên bi zimanê Tirkî jî weka "Ünlü Rojkî aşîretî-kahraman Rojkî aşîretî hwd" bi mebesta nexşandina nivîsên xwe bicîkirine. Min ji van çavkaniyan tu fêde ne dît. Min ji hinek çevkaniyên din ên ku liser dîroka kevnare hatine nivîsandin sûd wergirt. Lê ewê Şerefnameya bi nav û deng kevirê avakirina bingehiya vê miqaleyê be.

Yekîtiya berek û êlên Kurdan weke ya Rojkiyan, ji nêzik de pêwendiyên xwe, bi dewleta Merwanî ya Kurd ve heye. Danîna hîmê vê dewletê, ji êla Humeydî û gundê Kermasê Bad bîn Dostik dest pê kiriye. Li pêyî bidestxistina cî û waran, di dema kuştina Bad de, ji nava xwarziyên Bad, Emîr Alî bin Merwan, xelkê li dora xwe civand, çû ser Meyyafarqînê û di sala 991 de kete hûndirê bajêr û bajar girt destê xwe. Ji wê demê û virda, bajarê Farqîn û Amedê bûne navenda dewleta Merwaniyan û deverên din yên Kurdistanê jî kirine binê Hukimdariya xwe. Li gor agahiyên Îbn ûl-Ezrak" Di salên 993yan de hêzên Ruman bi ser Xelat, Milazgir, Erdîş û Bargiriyê ve girtin. Lê belê Emîr Ebu Alî bin Merwan êrîş bire ser wan û ew têk birin. Rum, ji ber Emîr Ebu Alî dest bi revê kirin. Ebu Alî got ku; hêzên Îslamî wê tevde bên vê derê. Li ser vê Ruman aştî xwast û vegeriyan welatê xwe. Di

nav wan de lihevkirina çekrawestanê ji bo 10 salan çêbû. Bi vî awayî Ebu Alî welatê xwe gîhande ewleyiyê." Ji dawiya sedsala 9an û di tevayî ya pêvajoya sedsala 10an de, hêzên Merwanî, bi alîkariya êlên Kurdan, li dijî hêzên biyanî û talanker, xwe parastin." Di wê demê de M.(Miladî- SN) 998an li Tetwan û dora wê de, di navbeyna Merwanî û Gûrciyan de pevçûn û şerek li dar dikeve. Îdareya Merwaniyan, bi du navendên girîng ve dabeş bû. Ji van navendan a yekê, Diyarbekir û bajarê dora wê û navenda diduyan jî, Tetwan û dora wê bû. Xelat û Bedlîs du bajarên girîng ên vê navendê ne"[111]

Li van navendan, Merwanî û xanedana xwe û êlên Kurdan ên van deveran heta sala 1100î jî, li mintiqeyê hukumdar bûn. Tê texmîn kirin li dijî van hêzên cûda û talanker, êlên Kurdan di nava xwe de mecbûrî avakirina yekîtiyê bûne. Ez bawer dikim û şopên dîrokê jî bi gelekî awan nîşan dide ku Yekîtiya êlên Rojkiyan di dawiya sedsala IXan û di sedsala Xan de pêk hatiye.

Di van deman de, ji êlên Kurdan yên Hekkariyê cûr be cûr eşîr, binemal, bi bendikên xwe ve hatine û li der û dora Bedlîsê ji xwe re zozanan (çêrgeh) û zivistangeh ava kirine û li van deveran bi cîbûne. Beriya hatina van eşîran, li Bedlîsê weke eşîrên qedîmî Qeysanî, Bayekî, Modkî, Zoqeysî, Zeydanî cîwarbûy hebûn. "Yek ji dîrokzanê Ermenî ê bi navê Thoma Ardzrounî di nîvê sedsala VIIIan de bûye şahidê êrîşên êlên Kurdan ji xwêyîtê, ku di sala 852yan de erîşî hêzên Ereban yên li deşta Mûşê qonax kirine."[112]

Ev êlên bineciyên van deveran û êlên ji hêla Hekkariyê bi hev du re gewda bingeh a êlên Rojkiyan in. Di derbarê dîroka pêk hatina yekîtiya êlên Rojkiyan de, Hammer-Purgstll bi texmînî dinivîse ku "bi îhtimeleke zêde ev yekîtî, di dema seroktiya Hûlaguyê Moxolî, di 1259an de di dema jiholêrakirina qiraliyeta biçûk a Ermeniyan 1375 de, ango di wê navbeynê de pêk hatiye" (rûpêl 36). Lê bi baweriya min, ev texmînekî şaş e û ne rast e. Em dibînin ku di dema Împaratoriya Eyyûbiyan de, yekîtiya Rojkiyan di zîrveyê de ye û hêzên wan ên li hev hatî, li serê çiyan yên Kurdistanê li dijî talankeran şer dikin. Di derbareyê vê bûyerê de Şerefname bi me dide zanîn

---

111 Mehmet Azimli "Sökmenşahlar Dönemine Kadar Müslümanlarin Hakimiyetindeki Tatvan", r.84

112 *Bedlîs û Gelê Wê*, Seyhetnama Ewliya Çelebi, Wilhelm Kohler, r.35

ka rewş çiye: "Bandora Atabegên Selçûkî ya li ser Kurdistanê û bi taybetî li ser Kela Bedlîsê ji 40 salan zêdetir ajot. Pişt re, di sala 576ê koçî (1180yê zaînî) de, Sultan Selaheddînê kurê (?) Seyfeddîn Gaziyê Atabegî di şerê bi Misriyan re, yanî bi Eyyûbiyên kurd ên Misrî re, mexlûb bû. Ji wê rojê şûn de stêrka Atabegiyan ber bi tefînê ve û dewleta wan jî hêdî hêdî dest pê kir ber bi nemanê ve çû. Belê, tam wê çaxê, Eşîreta Rojkî, li hemberî zor û zordaran ku di muddetê vê zerfê han de serî netewandibûn û li serê çiya û latan, di nav newal û geliyan de ji bo ku wekî şêr û pilingan nêçîra xwe bikin û li hêviya firsetan bin, derketine meydanê û bêyî firset bidin hêzên Atabegî yên tovê fitne û fesadiyê li ser rûyê cîhanê direşandin û welat di bin zor û zordestiyê de digirtin, dan ber êrîşan û bi şûrê xwe yên tûj û xencerên xwe yên devbixwîn ew ji deşt û çiyayan vekirin û avêtin" (rûpêl 384-385).

Bi baweriya min, ji wan jêgirên li jorê hatine nivîsîn zelal xûya dike, ka di kîjan sedsalê de yekîtiya Rojkiyan pêk hatiye. Ev yekîtî ji 24 eşîr û berekên Kurdan pêk hatiye û bi bêjeya Rûzîkî- Rojkî-Roşkî û Rockî ve hatiye biliv kirin. Ev yekîtî di dema dewleta Merwaniyan de û di sedsala X an de pêk hatiye. Lewra em dizanin yekîtiya Rojkiyan, ji 40 salan zêdetir li serê çiya xwe parastine û ji bo hemî erîşan amade ne. Wexta firseta xwe dîtine weke nimûne, di 1180yî de, li himberê dujminê xwe mîna şêr û pilingan hazir bûne. Eger em bînin bîra xwe, hêzên Merwanî heta 1100î jî li navenda Bedlîs, Xelat û Tedwanê rêber bûn. Ango bi qasî agahiyên Şerefnameyê em dikarin bêjin yekîtiya Rojkiyan di sedsala X an de pêk hatiye. Baş tê zanîn berî wê demê jî, di sedsala X de bi caran hêzên Selçûkî û Merwanî hatibûn hemberên hevûdu.

Dîrokzan Mîr Şerefxan, di Şerefnameyê de yekîtiya êlên Rojkiyan weke diyardeyeke giring destnîşan kiriye. Ew noqte ew bû ku Rojkiyan bi yekîtiya xwe ve, welatê xwe, ji Qiralê Gûrcî ê bi navê Davîd azad kirine. Weke li jorê jî bilêv bûye, di dawiya sedsala IX de, li deverên Rojkiyan, şer di navbêyna êlên Kurdan û Gûrciyan de çêbûne. Di vî warî de, gelek belgeyên dîrokî destnîşan dikin ku di sedsala X an de, êlên Kurd û hêzên Gûrciyan hatine hemberên hev û şer kirine. Di derbareyê vê bûyerê de, bi qasî mirov ji Şerefnameyê tê digihêje; "Kurdên Rojkî welatê xwe, ji qiralê Gûrcî azad kirine". Li gor vê çavkaniyê jî êdî zelal xûya dike ku yekîtiya Rojkiyan di sedsala

X de pêk hatiye û weke beşekî hêza dewleta Merwanî li herêmên xwe hukum kirine.

Di dema Eyyûbiyan de jî Rojkiyan, bi Eyyûbiyan re, li dijî Atabegên Selçûkî, xwe parastine û destkeftinên xwe ji dest bernedane.

Qiralên Gûrciyan bi hêzên mezin bi caran êrîş anîne ser Bedlîsê, Xelatê û Erdîşê û van herêmana talan kirine.Yek ji destkeftinên vê demê jî, dema Necmeddîn Eyyûbî li Xelatê hukumdar bû ye. Di sala 1209an de hêzên Gurciyan bi seroktiya Îvan ve Xelatê dorpêç kirin e. Di vê êrişê de dîlê serleşker, Îvanê Gurcî hatiye girtin û wî birine hizûra Necmeddînê Eyyubî. Weka adeta rêberên Eyyubiyan wî di astekî bilind de pêşwazî kirine û Necmeddîn Eyyubî bi qedir, di astekî bilind de û pêre peyman çêkirî ye. Ev peyman ji şeş xalan pêk dihat: 1- berdêla azadiya Îvan ê serleşkerê Gurcî weke nirx wê 200.000 zêr bac bide;

2 - Wê Gurcî 2.000 misilmanên êsîr bûne azad bikin; 3 – Wê 21 bircên bi sînorê wilayetên Eyyubiyan ve wê teslîmê Necmeddîn Eyyubî bikin; 4- Îvan wê keça xwe bi birayê Necmeddîn Eyyûbî - Melîkûl Eşref Muzafferûddîn Musa re bizewicîne; 5- Di şerên Necmeddîn Eyyubbî beşdarî bike, wê hêzên Gurciyan li cem wî cî bigrin; 6 - Wê ji nişteciyên xiristiyan yên Xelatê re dêrek bê avakirin. Îvanê Gurcî vê peymanê bi teveayî qebûl kiriye (Ahmet Demir ji cevkaniyên din neqil kiriye, rûpêl 148-149).

**Destpêka yekgirtinê**

Ji nêz ve naskirina ev yekîtiya hêzên Kurda bi girîngî dizanim. êrişên dijwar ên talanker yên hêzên biyanî pêdiviyên yekîtiya êlên Kurdan pêwîst kiriye û loma jî yekîtiya xwe ava kirine. Ew êl û berekên Kurdan rojekê ji rojan "li ciyekî ku navê wê Tabê ye û li der û dora Xwêtê dicivin û vê yekîtiya xwe pêk tînin. Ev civaka han ya ji qebîleyan pêk hatî ye, dawiyê dibe du beşên girîng . Beşa yekem ji 12 grûban pêkhatî ye û weke Bilbasî û ya duwem jî weke Qewalis bi nav bûne. Gotinên Bilbas an bilbîs û Qewalis jî, navê du gundên mîrekên Hekkariyê ne. Li gor rîwayeteka din jî, ev herdu gotinên han navê du qebîleyên ji Eşîreta Baban in" (Şerefname-werger kurmancî Ziya Avcî, rûpêl 376).

"Ev eşîreta han a kurd ya bi wan xesletên xwe yên civakî yên bilind, ku behsa wan hatiye kirin, ji qismek eşîret û gelên Kurdistanê

cihê dibin, 24 qism in. Pênc ji wan: Qeysanî, Bayekî, Modkî, Zoqeysî û Zeydanî eşîretên qedîm ên wîlayeta Bedlîsê ne. Panzdehên din jî di bin du şaxên mezin: Bilbasî û Qewalisî de berhev dibin. Bilbasî ewin: Keleçîrî, Xerbîlî, Balekî, Xiyartî, Korî, Birêşî, Sekrî, Garisî, Bêdorî û Belagerdî ne.Qewalisî jî:Zerduzî, Endakî, Pertavî, Girdikî, Suhrewêrdî, Kaşaxî, Xaldî, Wastudkî û Ezîzanî nin" (rûpêl 381).

Ger em baş bi dîqat bala xwe bidine wan rêzên jorê, emê xweş tê bighêjin ku eşîrên Rojkiyan ji sê qisman pêk hatine. Qismê Bedlîsê, Bilbasî û Qewalisî ne û bi hev re yektiyek ava kirine. Bi vê yektiyê ve 24 eşîrên Kurdistanê di nava yekîtiyekê de cî girtine. Ev yektiya eşîrên Kurdan a konfederal, li himberê bager, firtûne, tofanên civakî, şer û aloziyên di dîrokê de qewimîne karîbûne xwe biparêzin. Ji ber ku yekgirtina konfederalî bi xwe ra yekîtiya hêzên çekdarî jî afirandiye û navenda leşkeriya hêzên êlan avakirîne.Ji ber vê jî dikarîbûn xwe baştir dijî hêzên biyanî biparêzin. Mexsed ji yekgirtina konfederalî, ya civatên êlên ji hev cûda, di navendekê de anîna ba heve. Sîstema Konfederalî ya eşîran bi xwe weke rêkxistinî, ya zêde nêzi ava kirina dewletê ye. Lewra ew bixwe yekîtiyeke leşkerî, siyasî û aboriye. Konfederasiyonê van êlan di nava yekîtiyê de, li piyan hiştiye, lê belê ji bo parastinê, aboriyê û rêvebiriyê jî yekîtiya tevayî parastiye. Aliyê konfederasiyonê ya girîng û xweser hêza wê ya rêxistinî, leşkerî û rêvebiriya siyasî ye. Bi baweriya min ev konfederal ya yekîtiya Rojkiyan ya herî nêzî hêza dewletbûyinê ye. Dema mirov ji nîzik de lê kûr dibe, aşkere xuya dike ku yekgirtina Rojkiyan di warê perwerde, rêberiya siyasî û leşkerî de, ji wan dewletên dema xwe kêmtir nebûne. Her weha mirov dikare bêje ji wan dewletana pêştir bûne. Bêgûman di domandina yekîtiya konfederaliya Rojkiyan de, ciyê Mîrên Bedlîsê biryardêre. Mîrên Şerefxaniyan bi dadweriya mîrekî karîbûne aloziyên nava êlan, bêyî ji hev bela wela bikin çareser kirine. Ev jî zanîna hunandin û birêvebirina Xanedanên Bedlîsê, radixin ber çavên me.

Bi riya vê yekgirtinê ve Rojkiyan karibûne xwe li himber hêzên biyanî biparêzin û li welat serkeftinan bidest bixin. Bi van serkeftinan ve, êl û berekên Kurdan, axa welêt bi yeksanî di nava xwe de parve kirine. Lewra tu kes û ber, ji axa xwe bê par nemane. Kesên ku xwediyê erd û ax nebûna, ji êla Rojkiyan nedhatin hesbandin. Gelek balkêşe ku eşîrên Kurdan di nava xwe de, di vê demê de reforma xakî pêk anîne. Bi vî awayî gundiyên konfederasyonê, di

warê çandinî û baxçevaniyê de pêşketine û aboriya xwe xûrt kirine û mil dane hukumata Mîrên xwe. Bi serweriya mîrên xwe ên Bedlîsê ve ji 650 salî zêdetir li ser xaka xwe desthilat bûne û welatê xwe bi rê ve birine. Yektiya Rojkiyan di çavên dujminan de bûye weke kelemekî nedîtî. Lê, Rojkiyan li himber êrîşên hêzên talanker yên Gurcî, Mongolî, Akkoyonî, Selçukî, Herzemî, Osmanî, Sefewî, Rûs û eşîrên Tirkmenan, bi qehremanî di berxwedane û axa welatê xwe parastine.

**Yekîtiyeke pirçandî**

Ev yekîtî bi her awayî ve weke nimûneyeke yekta ya civaka Kurdan bi nav dibe. Ev yekîtiyeke pirçandî bû. Di nava xwe de Kurdên dimilî (zaza) û kurmanc, weke ol jî êzdî û misilman li hev civandibû. Gelekî eşkereye ku di wê demê de cûdayiyên olî û lehçeyên Kurdî di pêşiya yekîtiya Rojkiyan de nebûne asteng. Ev jî zîrekiya birêvebirina Mîrekîtiya Kurdan rê dide. Gelekî şax û bendikên di nava yekîtiya Rojkiyan de, li rex ola Îslam û bawermendên êzdî bûn. Ji vana Kaşaxî û Xiyartî ku di Şerefnameyê de navê wan derbas dibe, di nava yekîtiya konfederal ya Rojkiyan da cî girtine, ola êzdî dihebandin. Çendek ji çiqên eşîrên Motkiyan mîna Xiyartiyan – ku weke bavik dihatin dîtin, Ezdoyî, Şifqetî, Kaloyî, Emoyî bûn baweriya wan êzdî bû û di nava yekîtiya konfederaliyê da cî girtibûn.

Ji şaxên eşîra Rojkiyan ên li Ermenîstanê bicîbûne û baweriya êzdatiyê dihebînin evin: Alumêrî, Çekoî, Hebûkî, Gabelekî, Sanî weke bermayên êlên Rojkiyane. "Sykes" di 1908 an de dide xûyakirin ku li mintîqa Motkan eşîrên Kurd ên wehşî henin û ew ne Misilman ne jî Xiristyanin. (Wîlhelm Kohler, rûpêl 40). Xûya ye ku ew hay û goman ji ola Kurdan ya êzdî tunebûye. Ango yekîtiya konfederal ya Rojkiyan ji ol û eşîrên cûda pêk hatibû. Li gor agahiyên bi dest ketine jî xuya dike kû, Paşayê Osmaniyan Melek Ahmed Paşa bi leşkerên xwe li himberî Mîrê Bedlîsê Abdil xan û qehremanên Kurdên - Rojkiyan, tê cengê. Li deşta Rehwayê piştî du rukaat nimêjê, bi çawîşên xwe dide bangkirinê û weha dibêje, "Bizanin û agahdar bin gelî gaziyan! Ev cenga Kerbelayê ye; neyarên li himberî we Êzdî'nin". Ev jî motîvekirina şerê Osmaniyan rêdide.Tu şik têde nîne ku ev yekîtî ya Kurdên êzdî û yên misilman bû. Lewra paşayê Osmanî, ola Yezdî-Ezdî û Yezîdê kurê Muawiye, bi zaneyî yan jî bi

nezanî tev li hev dike. Lê pir balkêşe ku motiveya şerê Kurda weke şerê dijî mezheba Sunna (Yezîd) bi nav dike. Lewra Osmanî bixwe mezheba Sunna parastine.

Her weha yekîtiya konfederal ya Rojkiyan, ji êlên Kurdan ku bi zaravayên cûda diaxivîn pêk hatibû. Kurmancî û dimilî (zazakî) bingeh bûn. Li herêmên Modkiyan lehçaya dimilî zêdetirî kurmancî bikar tê û heta nuha jî didome. Li gor baweriya min, bandora lehçeyên zimanê Kurdî û olên Kurdî li ser bikaranîna bêjeya Rûzkî, Rockî, Roşkî, Rojkî ku di Şerefnameyê de û di hinek berhemên din de bûye mijara şiroveyan heye. Em dizanin ku bêjeya Rojkî di zaravayên Kurdî da ji hev cûda tê bilêvkirin. Di zaravayê kurmancî de her Rojkî an jî Roşkî ye û bi dimilî jî li gor deveran Rûzkî-Rockî hatiye bilêvkirin û bivê nevê bûye mijara şiroveyan. Ango bandora Roja pîroz, şewq, tîrêj û germiya wê, ya ku di ola êzdiyan de bi hêze, çiqasî li ser bêjeya Rojkî hebûye ne zelale. Bêjeya Rojkî'yan ji ku hatibe bila hatibe, weke di Şerefnameyê de hatiye destnîşan kirin, bêjeya Rojkî ji wê yekîtiya ku di rojekê de pêk hatiye peyda bûye.

Rojkî bi tev êl, berek û çiqên xwe va li Kurdistanê hêzeke pir bijarte bû. Di nava êlên Kurdistanê da, ew xwediyê rêz û rûmetê bûn. Li himberî dujminan jî ewan sernizmî, xulamtî binax kiribûn. Ewan di oxira jiyana azad da, bi qehremanî welat û mîrên xwe bi hesudî parastine. Ew, li himberê neyarên xwe, bê eman bûn. Di şer û pevçûnan da, bi cesaret û lehengiyên xwe ve dihatin naskirin.

Di dîroka zêdetirî 1000 salan de, tu bûyer û şerên giran ên li erdnîgariya Kurdistanê rû dane, biyî têkildariya eşîrên Rojkiyan pêk ne hatiye. Ji ber ku dema hêzên biyanî xwastine Kurdistanê dagir bikin, di serîde Rojkiyan ji xwera kirine hedef û berê bi wan ra şer kirine. Lê belê Rojkiyan her demê mirina xwe dane berçavan. Êla Rojkiyan û Mîrên wan yên payebilindên Bedlîsê, çiqasî bi mêrxasî û şervaniyên xwe ve li dijî dagirkeran dihatine nasîn, her weha di warê şaristanî, zanistî, zanyarî, rêvebirî, dadwerî, avadanî, dîplomasî, huner û perwerdeyê da jî bi nav û deng bûn.

**Şaristanî û dadweriya yekîtiya Rojkiyan**

Sînorê desthilatdariya Mîrektiya Bedlîsê ku weke Mîrektiya Rojkiyan jî hatiye binavkirin, di pêvajoya dîroka dirêj da, bi pirranî navenda wê wilayeta Bedlîsê bûye. Lê berbi sînorê wilayeta Hekkariyê,

Sêrtê, Hezzo, (Kozlok) Erzirom, Milazgirê û Xelatê va hukumdarî kirine. Çend ji wan bircên di bin serwerî û parêzvaniya Mîrên Bedlîsê û hêzên Rojkiyan de, domandine evin: Kele û birca Bedlîsê, kela Muşê, Kêfnedûr, Amurk, Kelhok, Fîruz, Silîm, Gulxar, Tatik, Sewî, Xelat û Poxnad bûn. Serok, giregir û zanayên êlên Rojkiyan di dîwana Mîrên Bedlîsê de rêzdar bûn. Rojkî di hukûmatê de rêvebir û biroqratên dewletê ên bilind bûn. Di rêxistinên perwerde, aborî, dadmendî, avedanî, dîplomasî û leşkerî da, pêşevanî yê dikirin.

Em dibînin serweriya Mîrên Bedlîsê û yên Rojkiyan di sedsala XVI de jî pirr serkeftî bûne.Di derbareyê hêza Rojkiyan û Mîr Abdilxan de, gerokê navdar Ewliya Çelebî agahiyên pirr hêja, dide:"Dibin hukumraniya Mîr de 70ê eşîr hebûn. Di nava serokên eşîrande begê Modkiyan Alî Beg bû. Hêza Alî Beg ya çekdar ji 700 kesan zêdetir bû. Wexta Mîr bixwasta, ji van eşîretan 70.000 leşkerî dikariya berhev bikiraya. Tenê li bajarê Bedlîsê 40.000 zilamên Rojkiyan hebûn.

Lê belê, ev hêzên han wekê ên din bi cesaret û mirxas nebûn. Evana dest û rûyên xwe hina dikirin û çavên xwe kil dikirin. Ev mirovên paqij û oldar bûn. Di warê oldarî û fîlosofî da zanînên wan pirr kurbûn (rûpêl 66). Li Bedlîsê zaniyar, şair, hekîm, senetkarên destî, bi teybetî yên çekan çêdikin navdarin. Tiştên di debaxanan da çêdibûn û malên boyexkirî, îxracê Awrupayê dihat kirin (rûpêl 37-38). Li Bedlîsê di rex boyaxkiran da, hedad jî navdar bûn. Li Bedlîsê ji wan şûrên Şêxanî, Makrawî û Zîverzîn ên dihatin çêkirin, li tu derekî dinê nedihatin çêkirinê...Çûxên ji hiriya safî dihatên çêkirin û terziyan didirûtin, ku dirûna wan jî xuya nedikir gelek giranbiha bûn...Mîrektiya Bedlîsê gelekî di qadên fireh da û di dereceyê bilind de serwerî û hukumraniyeke serbixwe dikir (rûpêl 63). Ewliya Çelebî, sedemê serxwebûna Mîrê Bedlîsê ya payebilindî weke daxwaza gelê wî ji bo jiyaneke azad û qehremanî binav dike. Yan na Sultanan nedhiştin ew çavên xwe vekin. Ji bo vê çendê jî Sultanan tim xastiye rêya lehvkirinê bi vî gelê qehraman re bibîne (S.N) (rûpêl 42).

Zimanê Rojkiyan jî bala Ewliya Çelebî kêşaye. "Rojkî Kurdên qedîmî û bijare´nin. Bi zimanekî vekirî û zelal ku tê fêmkirin diaxivin, ji zimanê ku bi kar tînin, Kurdên deverên din nizanin. Lêbelê, ew bixwe ji duwazdeh devokên Kurdên dinê baş fêm dikin". Wekê ji jêgirtên jorê jî zelal xuya dike, hêza êlên Rojkiyan di warê perwerdeyê û di warê zimên de pêşde çûne, li wilayeta Bedlîsê bi navûdeng û

biryardêr bûne. Bi sîstema perwerdeyê, senetê û leşkeriyê va navdar bûn. Li gor gotinên Ewliya Çelebî yên li jorê hatine nivîsîn, gelekî zelal xuya dike ku du hêzên Rojkiyan ên hinekî ji hev cûda henin. Yên çekdar yên jêhatî û lehengin, yên kêmtir qehreman jî ew hêzên dest û rûyên xwe hine dikin, kil dikşînin çavên xwe; her weha zanayên olî û feylesofên sohbet xweşin. Bi vê rastiyê ve em rêvebiriya çekdarî û ya sivîl, birokrat û ademî weke du hêzên cûda, ku bi hev ra dewletê îdare dikin dibînin. Ev jî nîşana bilind ya îdarî ya sivîl, zanist û zanyar e. Balkêşe; Ewliya Çelebî dest nîşan dike ku li himberê daxwaza jiyana azad a lehengên Kurdan, Sultanan kumên xwe avêtine ber lingên wan. Xuya dike ku piştî yekîtiya Rojkiyan ya dema Şerefxanê payebilind, gav bi gav bi hêztir bûye. Ev jî hêjayî rêzgirtineke dîrokî ye ji bo yekgirtina Rojkiyan ku riya nifşên me di warê yekîtiyê de ronî dike.

Li gor agahiyên Ewliya Çelebî, di nava sînorê Mîrektiya Bedlîsê de ew dem 43 hezar Ermenî hebûne. Hemwelatî yê Eremenî ên xaçparêz û Kurdên Rojkî ên êzdî û misilman di nav aştî û aramiyê de weke biran, bi sedsalan cîrantiya hev kirine û bi hev re jiyane. Hezar heyf biratiya di navbêna Kurd û Ermeniyan de, bi çandina tovên fitne û fesadiya Osmanî, Tirk û Ewrupiyan xerab bû û ji herdu hêlan bi deh hezaran kesên bê gûne telef bûn.

**Bandora Mîrektiyê berdewama nasnameya neteweyî ye**

Rola êl û berekên Kurdan bi yekîtiya xwe ya Konfederalî ve, di parastina nasnameya Kurdî û mayîna netewa Kurd de, ku li cîhanê heta nuha maye bingehe. Bi saya van êl û berekên Kurdan, di nava aloziyên dîrokê de, ev netewa Kurd li piyan maye. Lê divê em ji bîr nekin kû, ji aliyekî din ve êl û berekên kurdan, bi teybetmendiyên xwe ve bûne astengên azadiya netewe. Yek ji bingehên astengiyên yekîtiya neteweyî bêgûman berjewendiyên êl û eşîrên kurdan´in. Lewra Qazî Muhemed bi israr ji Berzaniyê nemir re dibêje; bi eşîran baweriyê neyne. Loma ewî îxanet û bêhurmetiya serokeşîrên Kurdan di dema avakirin û rûxandina komara Mahabadê de bi eşkereyî dît. Bêşik ev aliyên êlên Kurdan yên herî xerab in. Lê belê di nav şert û mercên wê demê de ango 1000 sal berê, pêşiyên me dikaribûne yekîtiya eşîran ava bikin. Bi ya mi ev pêngaveke dîrokî ye. Nimûneyên weha li Kurdistanê gelekin. Ya herî balkêş ewe ku nifşên me hînê jî ji

bo Kurdistaneke azad konsensuseke neteweyî pêk neanîne. Ya ecêb, giran û ya bê vîn û hesta neteweyî eve!

Di nav Kurdan de, ên bi yekîtiyê mijûlin (muhendisên yekîtiyê) pirî caran dinvîsin û bilêv jî dikin ku Kurd bi rêxistin nînin. Ev dîtînekî ji rastiya miletê Kurd pir dur, neraste û pûçe. Li cîhanê Kurd yek ji wan gelên herî bi rêxistinin û kontirola civakî lê zêdeye. Bi rêya malbat, gund, bajar, berek, êl, şêxtî, axa, Mîr,beg, û partiyan ve herkes, herkesê nasdike û birêxistine. Lê mixabin Kurd di xeta mîlî û neteweyî de vê derfetê ji bo konsensuseke neteweyî bikar ne anîne.

Dîrok bûye şahidê du bûyeran ku Rojkî li dijê Mîrên xwe Şerefxanan derketine. Cara yekê dema Mîr Şerefxan, bapîrê nivîskarê Şerefnameyê ye ku dijî Mîr Dawudê Hîzanê çûbû cengê. Gelekan ji serok û giregirên Rojkiyan bi vî şerî ve dijî Mîr ketibûn û ji wî xeyîdî bûn. Kesên wekî Mîr Budaqê Keysanî, Îbrahîm Axayê Bilbasî yê kurê Şêx Emîr, Qelender Axayê kurê Mihemmed Axayê Kelhokî û Derwêş Axayê Keleçirî dijê Mîrê xwe helwest girtibûn.

Berî şer dest pêke Mîr Şerefxan xwast hêzên xwe parva vekêşe û tev li şer nebe, ji ber ku hêzên himberên wan pirr zêdebûn. Lê belê serokên êlên Rojkiyan ên li wir, kesê mîna Seydî Elî Axayê Pertawî, tevê dîtina Mîr nebûn û biryara têkelbûna şerî dan. Di vî şerê başûrê Kela Tatîkê ya 1534 an de dest pê kiriye, emîrên Rojkiyan yên li jorê navên wan derbas dibin, li cem Ulame Paşayê Osmaniyan û li cem Mîr Dawidî cî girtine. Mixabin di vî şerî de, Ulame Paşa bi serket, hêza Rojkiyan şikest û Mîr Şerefxan jî şehîd bû. Ji 700 kesan zêdetir ji xortên mêrxas ên Rojkiyan hatin kuştin. Lê her çiqas Ulame Paşa bi hêzên xwe ve di vî şerî de bi ser ketibin jî, ji tirsa xwe ew newîrîn bikevine hundirê wilayeta Bedlîsê, lewra berê xwe dane aliyê Wanê.

Cara duwem jî dîsa di dema Osmaniyan de pêk hatiye. Wezîrê Mezin Îbrahîm Paşa li Xelatê, di lehê Ulema paşayê Osmaniyan ê ji êla Tekellu Tirkmen ve dihate nasîn, xwestiye wilayeta Bedlîsê bide wî. Her weha xwestiye xwediyê wilayeta Bedlîsê ê esil Mîr Şemseddîn koçberî wilayeta Meletiyê bike. Dema Mir Şemseddîn bê dilê xwe, evî biryara Paşayê Osmaniyan qebûl dike, yek ji Qebîleya Bayîkan û pêşberê giregirên Rojkiyan û kevirê hîmê wan, Mehmûd'l maddedîn ku di dîwanê de bû, berê xwe da Şemseddîn beg û bi kurdî jê re wiha got: "Dema ku wilayeta ji bav û bapîrên me ji mer e mayî û îmtiyazên me yên dîrokî yên meşrû ji destên me bên sitan-

din, çi nirx û qîmeta jiyanê ji mere heye? Eger tu bi îşareteke biçûk destura kuştina Wezîrê Mezin Îbrahîm Paşa bide min, dê ez ê wî niha li ber xenceran perçe perçe bikim. Niha, 150 kesên ji mêrxasên Eşîreta Rojkî ên di dîwanê de hazir in, di bin emrê te de nin û amade ne xwîna xwe, jiyana xwe ji bo te feda bikin. Bila ji xeynî navên me yên zindî û helwestên me yên wêrekî yên bi sedsalan wê bêne bibîranîn pê ve, rêçek di pê me de nemîne." (rûpêl 446).

Rojkî di qada şervaniyê de pêşveçûyî, hêzekî bijarte û lehengî bûn. Bi sedan salan li çiyayên Kurdistanê, xwe li dijî biyaniyan parastine. Ew rewşa zor û zehmet lê welê kiribû ku di şer û pevçûnan de bibin hêzekî zîrek. Rojkî di şerê Çaldiranê de di sala 1514 an de bi hêzên xwe ve li qada şerî de amade bûn. Bi seroktiya Mîr Şerefxan û di emrê Mewlana Îdrîsê Bedlîsî de li herdu milên wî, Mîrên Kurdistanê bi hicûma Mewlana Îdrîs, eman ji dijmin birîn. Her weha di şerê Koçhîsarê de Rojkî´yan di qada cengê de bi lehengiya xwe ve, çavên dujminan tirsandin. Dujmin têk birin, lê mixabin di vî şerî de Rojkiyan serokên xwe yên mêrxas weke, Tac Ehmed, Qasim Endakî, Mîr Şah Huseyîn Kêsanî, Mîr Seyfeddîn û Omer Candar wenda kirin. Cê gotinêye kû, serokên êla Rojkiyan weke, Mîr Nasîreddînî, Qere Yadîgarî, Seyîd Selmananî Qewalisî û geleke kesên din bi birînên xwe yên xeddarî ve heta dawiyê xwe ji qada şer nedane alî.

### Navdarên Rojkiyan

Kesên navdarên Bedlîsê, ji êlên Rojkiyan ku di dîrokê de şopa xwe hiştine: **Mewlana Abdurrehîmê Bedlîsî** (li ser mantiqê nivîsiye) **Mewlana Muhemmed Berkalî** zaniyare û (li ser Fikih, hedîs, mentiqê nivîsiye); **Şêx Omer Yasîr** (li ser ilmê tasawûfê tê nasîn); **Mewlana Hûsameddîn Alî Bedlîsî** (zanayê ilmê tasawufê ye); **Mewlana Îdrîsê Bedlîsî** (keskî piralî zanyar, di gelekî beşan da berhem nivîsiye weke nimûne; li ser Kelam, Tasawuf, Hedîs, Tefsîr, Fikih, Dîrok, Zoolojî, Kozmolojî, Felsefê û tibê bi zimanên cuda, bîst berhemên wî di pirtûkxaneyên cûda de mewcudin. Ji bilî 20 pirtûkên wî, 8 pirtûkên wî jî wenda nin. Ji van 28 pirûkan, berhema wî ya bi navê Heşt buhişta, ji 80 ê hezar malikan pêk hatiye, **Ebul Fadil** (Kurê Îdrîsê Bedlîsî, têra xwe tê nasîn); **Şair Şukrî´yê Bedlîsî** bi şeş zimanan xazel nivîsandî ye, bi Kurdî, Erebî, Farisî, Ermenkî, Hindî û Osmanî zanibû

ye. Herweha di qada dîrokê de têra xwe tê nasîn. **Harisê Bedlîsî – Sewadî** (wî perwerda xwe di camî û medreseyên Kurdistanê da qedandiye. Çîroka Leyla û Mecnûn bi 771 beytan, bi zimanekî gelekî zelal û uslûbekî herikî nivîsandiye); **Derwêş Mahmud'ê Kileçirî, Ebu Tahir ê Kurdî, Şêx Tacuddîn, Şêx Mûcadeddîn'ê Bedlîsî**, kesên abîde ên naskirî yên ji Rojkiya'nin. Her weha mamoste û zaniyarên unîversteyên Mîrên Bedlîsê yên Rojkiyan jî bi nav û deng bûn. Ji vana **Mewlana Xidir Bîbî, Şêx Şemseddîn Mewlana, Muhemmed Şeranşî, Mewlana Muhemmed Zirkî, Mewlana Abdurrahman** (wek melayê Reşik jî tê nasîn), **Seyyîd Hûseyîn Xelatî, Mewlana Muhîddîn Xelatî.** Evana weke profesorên unîversîteyan têne nasîn û zarokên kurdan di beşên cûda yên îlmî da, ji bo pêşerojê amade kirine. Çend kesên navdar ji êla Rojkiyan ku ji welatê xwe dûr weka **Bestam Axa** (li Qendeharê di meclisa Sultan Mîrza de cî girtiye, tevlê karûbarê wî welatî bû ye û siyanet jêre hatiye nîşandan); **Îbrahîm Begê Kurê Kalender Aka** jî, ji êla Bilbasî (çûye Sîstanê li cem Mihemed Xanê Tirkmen hatiye naskirin û li sînorê Belûcîstanê bûye Waliyê wê derê); **Heyder Aka** biraziyê Derwêş Mehmûdê Keleçêrî (li welatê Osmaniyan bûye rêvebirê eşîreta Cîhanbelku); **Qasim begê Kurê Şah Huseyîn Aka** (jî di sefên parêzgerên Sultantiyê yên teybetî de bûye). Di warê leşkerî û şervanî de, bi sedan û hezaran lehengên êlên Rojkiyan hebûne. Çend kes ji wan lehengan: **Qelender Axa, Şêx Emîr Bilbasî, Dede Begê Qewalisî, Mîr Mihemmed Nasreddîn** ji van lehengan bi hezaran di nav Rojkiyan da hebûn.

Girînge li vir balê bikşînim ser dîroka Tirk'an kû, wêrankirina dîroka neteweya Kurd ji xwe re kirine armanc. Ew tu hêjayiyên neteweya Kurd nabînin. Tirk bi amancên qirêj dijê dîroka gelê Kurd, bi dezgeh û derfetên xwe yên dewletê ve dîroka Kurd aloz kirine. Bi vê mebestê ve girêdayî hemî qaîdeyên zanistiyê bin pê kirine. Ev talanî îro jî didome. Weke nimûne, Mewlana Îdrîsê Bedlîsî bi caran di nivîsên xwe de, xwe weke Kurd dide nasîn, ku ew bi xwe Kurde, ji Tirkên weke Mehmet Bayrakdar bi navê profesoriyê dikare bibêje "na Mewlana Îdrîs ne Kurd e, ew Tirke" Nuha kî binavê zaniztî li ser mijarê nivîsekî binvîse wek adet berê nîşan dike ku "Profesor Mehmet Bayrakdar nivîsiye ku Mewlana Îdrîsê Bedlîsî Tirke û pêde diçe" Weke tê gotin şahidê rovî, poçîka rovî ye. Jibona Tirkan dema mijar Kurdbin her tişt mubahe.

Di destpêka sedsala bûrîde, ji Rojkiyan gelekî kesan, di refê tekoşîna azadiya netewa Kurd de cî girtine. Ewan kesan ala rizgariya gelê Kurd, di asta bilind de parastine. Xwedî li nirxên neteweyî yên piroz derketine û dijî zalim û xunxwaran bi serbilindî di ber xwe de dane.

Dema Tirkan bi înkara mafên netewa Kurd, dewleta xwe ava kirin, di serîde ji lehengên **Rojkiyan Yusif Ziya Beg**, ala şerê azadî yê bilind kir. Di serkişiya rêxistina Azadî´yê de Rojkî li hev cîviyan. Serleşker **general Îhsan Nurî Paşayî** ji êla Rojkî´yan, **Teymen Elîriza Beg, Fayêq Çawîş, Xelîl Xeyalî, Kemal Fewzî Beg** di oxira Kurdistana azad de bi canfidaî jiyana xwe ji dest dan. Wekê din ji **Hacî Musa Begê Xweyîtê** jî Rojkî bû.

Di sedsala bûrî de ji salên çelî bi şûnde jî, refên tekoşer û azadîxwazên Kurdistanê ji Rojkiyan xalî nebûne. Li dijî zilim û sextên dewleta Tirk, ji malbata eşîra Rojkiyan wek **Awuqad Weysî Zeydanlioglu, Şakir Epozdemir, Şehîd Awuqad Şewket Epozdemir, Mele Îshak Tepe, Cemal Saygilî, Gelwekîlê Bedlîsê Husamedîn Zenderlîoglu,** çend kesên naskirîne. Ji welatê Ermenîstanê **Temurê Xelîl** û weke wan bi hezaran Rojkî di nava azadiya neteweyî de cî digrin.

Ji Mîrên Bedlîsê **Adil Şerefhanoglu** (balkêşe x, bûye h e), navê bavê wî **Mehmet Saît Begê kurê Nuh Begê** ye, herî dawî di salên heftêyî de Seroktiya şaredariya Bedlîsê kiribû, ji mêjde bi rehma yezdan şa bûye. **Birayê Adil Şerefxan, Ziya Şerefxan** weke senatorê wilayeta Bedlîsê di salên şêstî de koçberî dervayî welat bûye û li Lubnanê jiyaye.

**Gotina dawîn**

Li jorê bi kurtî dîrok û bûyerên xanedana Rojkiyan hatiye nivîsîn. Bawerim weke dîrok û serpêhatiyên Rojkiyan, bi dehan dîrok û serpêhatiyên malbat û xanedanên Kurdan yên cuda di nava aloziya dîrokê de wenda bûne. Şîrovekirina bûyerên dîrokî yên xanedanên Kurdan, pêşiya xebata me ya çandî û siyasî ronîtir dike. Pêdiviyên nivîsa dîroka neteweyî, îro ji her rojê bîtir girînge. Lewra ronakbîrên neteweya Kurd, bi ronîkirina dîroka xwe û bi lê xwedî derketina mîrasa dîroka xwe ve dikare, çanda xwe zindî bihêle û di qada tekoşîna azadiyê de bibe çirûska hêviyan. Bapîrên me bi qasî

karibûne dîroka xwe nivîsîne. Pêwîste nivşên me vê dîroka wan raxe ber çavên raya giştî ya Kurd û ji tecrubeyên wan sûdê werbigre.

Hêvîdarim ev kurte nivîs bibe encama gelek lêkolînên giranbiha.


**ÇAVKANÎ**

**Hîmê esasî ê vê meqaleyê**

Mîr Şerefxanê Bîtlîsî. *Şerefname*. Wergera Kurmacî Ziya Avcî.

Prof. Dr.Ahmet Ugur. *Îdrîs-Î Bîtlîsî ve Şukrî-î Bîtlîsî*

Mehmet Bayrakdar, *Bîtlîslî Îdrîs*

Wîlhelm Kohler. *Evliya Çelebi Seyhatnamesinde Bitlis ve Halkı*

Kemal Burkay. *Geçmişten Bugüne Kurdler ve Kurdistan*

Pîr Dîma, Ezîzê Cewo. *Êzdiyên Serhedê*

Dr. K.Mezher Ehmed. *Çend Rûpel ji dîroka gelê Kurd*

Martîn van Bruinessen. *Kürdolojinin bahçesinde*

Îbn ûl Ezrak. *Mervanî Kürtlerî Tarihi*, Wergera Mehmet Emîn Bozarslan

Mehmed Emîn Zeki Bey,*Kürd ve Kürdistan Ünlülerî*

Sempozyumu Bildirileri, *Uluslararasi-Dünden Bugüne Tatvan ve Çevresi*

Soane E. B. *Rêvîtiya bi Dizî li Mezopotamya û Kurdistanê*


* Lêkolîner, Silêmanê Norşînî, Bi erêkirina wî vê nivîsê di pirtûka xwe de bi cî dikim"

Ji salên 1774'an ve bi alîkariya Rûsya ve neteweyên Îsewî dest bi şerê azadiyê kirin. Bi van serhildanan ve Împaratoriya Osmanî kete nava pêvajoyeke nû. Ji aliyekî şerê neteweyên bindest gûr dibû û ji aliyekî din ve jî desthilatdariya siyasî ya dewletê lawaz dibû.

## Rûxandina dewleta Osmanî

Di sedsala 18 û 19'an de li Ewrupayê şoreşa Endustrî biserketî berdewam dikir. Wê guherîneke mezin û nedîtî li Ewrupayê pêk dianî. Li Ewrupayê struktûra tradisyonî dihate guhertin û sermayedarî bi karekterê xwe yê nûjen ve bi cîh dibû. Bi vê guherînê ve ramanên neteweyî bi hêz dibûn. Şoreşa Fransî jî bi hemû bandora xwe li Ewrupayê avakirina deweleta neteweyî bihêz dikir. Ramanên dewleta neteweyî berê bandora xwe li Ewrupayê lê dawî jî li dinyayê bi berfirehî dikir. Struktura Ewrupayê ya Rojava dihate guhertin. Bi dehan dewletên serbixwe yên neteweyî dihatin avakirin. Sîstema van dewletên neteweyî sîstema netewe-dewlet bûye. Sermayedarî pêş de diçû û ji sermayeya rojava re bazarên nû pêwîst dibûn. Dewleta Osmanî li himber vê guherîna dinyayê êdî nikaribû weke berê serweriya xwe bidomanda lewra sermayeya Ewrupî dikete nava Osmaniyan û ew dikir deyndarê Ewropayê. Vê pêvajoyê bandoreke mezin li ser dewleta Osmanî dikir. Ramanên nûjen di nava Osmaniyan de peyda dikir û neteweyên bindest jî li dijî dewleta wan serî hildidan. Nemaze neteweyên Balkanî û dawî jî Ermeniyan serê vê tekoşînê dikşandin. Di wê demê de serhildanên Kurdan jî dest pê kirine.

Dewleta Osmanî dewleteke kolonyalîst bû û di nava xwe de gelek neteweyên cûda diparast. Tevgera avakirina dewleta neteweyî berê di nava neteweyên îsewî de dest pê kir. Neteweyên Rumelî- ango yên Roma'yî, Ewrupî bûn û bandora ramanên avakirina dewleta neteweyî zû di nava wan de belav bû. Dewletên Ewrupî weke Ingilîz û Fransan, Rûs, Îtaliya û Elmanya destên xwe dirêjî nava dewleta Osmanî dikirin û bi eşkereyî alîkariya têkoşîna neteweyên Ewrupî yên di bin destên wan de dikirin. Berê neteweyên Ewrupî dû re yên Efrikayê û dawî jî yên Asyayê dest bi têkoşîna serxwebunê kirin. Alîkariya Rûsan ji bona Ermeniyan di vê navberê de bi taybetî berdewam kiriye.

Dewleta Osmanî li hember van herdû sedemana Lawaz dima û li pirsên çareseriyê digeriya. Di vê pêvajoya avakirina dewletên neteweyî bi pêşve diçû, têkiliyên Osmaniyan bi neteweyên cûda re nebaş bû. Nakokiyên navbeyna wan herku diçû mezintir dibûn. Dewleta Osmanî weke dezgeh û struktur di Rojhilata Navîn de dibû astenga pêşveçûna sermayedarî û avakirina dewletên neteweyî. Dewlet dibû astengek berbiçav ji bona civatên nûjen. Ramanên avakirina netewe-dewletê di sedsala 20'an de di nava neteweyên Osmaniyan de weke diyardeyeke sereke bû. Hemû hewildanên Osmaniyan ji bona rawestandina vê pêvajoya netewe-dewletê bi ser neketiye. Lewra ew li çareseriyan digeriyan, lê ji bilî reformên nava dewletê û şerê dijî neteweyên bindest pê ve tişteki dinê ne didîtin.

Serweriya Osmaniyan di nava dewletê de dest bi reforman dikir. Osmaniyan bawer dikirin ku bi hinek reforman ve wê bikaribin vê tofanê bela wela bikin. Lê mixabin berevajî vê, reformên dewletê ramanên neteweyî di nava dewleta Osmanî de bi hêztir dikirin û ta radeyekê dibûn sedemên veqetandina gelek neteweyan û perçekirina dewleta Osmanî. Loma jî dewletê tehamila van serhildanan nedikir û li dijî wan bi dijwarî radiwestiya. Di vê demê de Mîrekên Kurdan xwestine serweriya Osmaniyan li herêma Kurdistanê kêm bikin û li dijî Osmaniyan şer kirine, serî hildane. Lê tevgerên Mîrekan bi hovane hatine şikestin, koçber bûne û hatine kuştin.

Di serê sedsala 20'an de perçekirina Osmaniyan dikeve rojevê. Lê wê çawa û wê di nava kê de bê parvekirin ne zelal bû. Ingîlîzan dixwestin Osmanî di bin bandora wan de, li dijî Rûsan rawestin. Rûsan dixwest derbasî deryaya germ bibin. Dewleta Rûsî, Ingîlîz û Fransayê ditirsand û loma berê xwe didan aliyê Efrîka. Misir û Cezayîr dagir dikirin. Hînê di sala 1815'an de li ser navê **"pirsgirêka şerqê"** di konferansa Viyanayê de devjeniya parvekirina Osmaniyan dihate kirin.

Osmaniyan vê diyardeya netewan dîtin û hînê di nava sedsala 19'an de xwe mecbûr didîtin ku dest bi hinek reforman bikin.

Yek ji wan reformana di sala 1839'an de bi navê peymana Bazirganiyê ya di nava Ingilîz û Osmaniyan de pêk hat, ku jê re digotin **"Gülhane hatt-ı Hümayûnû"** Mafê îsewiyan di nava Osmaniyan de bihêz kir. Ev bi xwe dibû sedema bihêzkirina bûrjûvaziyên îsewî

di nava Osmaniyan de û di bû sedema pêkanîna serkêşiya tekoşîna serxwebûnê ya neteweyên îsewî.

Di sala 1856'an de **"fermana îslehetê"** derket û ev bi xwe bû sedemên destpêkirina lîberalîzmê di nava Osmaniyan de. Osmaniyan van reformana ji bona dewlet perçenebe û ji hev nekeve û herwiha ji bona serhildanên neteweyan rawestîne, pêk dianîn.

Cara yekem Fransizan di sala 1798'an de Misir dagir kir û ev dibû cara yekem ku xaka Osmanî dihate dagirkirin. Bi vê dagirkirinê nakokiyên Ingîlîz û Fransizan jî dest pê kirin. Nakokiyên wan dawî bû bela serê neteweyên Rojhilata Navîn. Weke tê zanîn cara dawîn di sala 1882'an îngîlîzan Misir dagir kirin û bi dadwerî Misir di nava xaka Osmaniyan de bû lê di fîîliyatê de di bin serweriya Ingîlîzan de bû û bi rêya waliyê giştî dihate birêvebirin.

Di vê navberê de di sala 1867'an de **Ciwanên Osmaniyan** tevgera "Carbonî" ku tevgereke Masonî ye, weke nimûne girtin û bi serokatiya Namik Kemal û Fazil Paşa ve bi alîkariya du kesên biyanî, Wladyslaw Plater û Sîmon Deutch, destûra xwe derxistin. Li vir ya balkêş ev e ku, Sîmon bi xwe yek ji damezrêner û piştî Karl marx jî serokatiya enternasoyonalîzma 1.emîn kiriye. Rêberên Ciwanên Osmaniyan bûrjûwaziya Ewropa Rojhilat(Wladyslaw) û enternasyonalîzma Ewropiya ya sosyalîst e. Ciwanên Osmanî bi nasnameyeke ne zelal, lê bi navê Osmaniyan û ji bo parastina împaratoriyê derdiketin qada namzetiya serweriya dewletê. Ciwanên Osmaniyan li dijî reformên dewletê derdiketin û digotin dewleta Elî Osman radestî Ewrupiyan dibe. Ew dijî serhildanên neteweyên Balkanî derdiketin û alîkariya Elmanya û ya Enternasyonalîsta 1.em digirtin. Enternasyonalê bawer dikir ku serketin û azadiya welatên Balkanî ku alîkariya Rûsan werdigirtin, wê ji bo Rûsyayê bibin alîkar û wê şoreşa wan lawaz bike. Lewra bi hemû awayî alîkariya Ciwanên Osmaniyan dikirin. Nêrîn, helwest û programa Ciwanên Osmanî, li ser payêkirina desthilatdariya împaratoriyê diciviya. Ewan meclîsek dixwestin û bi riya meclîsê jî dixwestin desthilatdariyê parê bikin. Dijî sîstema Padîşahiyê nebûn lê dixwestin Erkên Padîşah kêm bikin. Heta wê demê jî nasnameya wan ya sereke Osmanî ye. Di helwestên Namik Kemal de nêrînên Masonan yên Tirkîtiyê, li ba wî weke tendens heye lê ne xurte û ne

zelal e. Nêrînên wan bêtir weke parastina dewleteke pirrçandî ye. Hemû etnîkên di nava dewletê de wê bikaribûna xwe bi nasnameya xwe derbibirînin. Ewan bi vê baweriyê dixwestin dewletê ji parvekirinê azad bikin. Wê tevgerê heta sala 1872'an dewam kir, lê ev tevger hate rûxandin. Bandora wê berdewam kir û bû sedema pêkanîna hukmê leşkerî ya sala 1908'an ku dîroknasên Tirkan vê darbeyê bi navê "**Jon Tirk**" bi lêv dikin. Di eslê xwe de ew bi xwe Ciwanên Osmanî ne. Dewleta Osmanî bi van nakokiyana ber bi sedsala 20'an ve diçû.

**Berdewama Ciwanên Osmanî, Cemiyeta Ittihad û Teraqî, Karakol, û "Tekoşîna Rêzgariya Neteweyî"**

Bi mebesta parastina yekpareyiya dewletê, di sala 1876'an de, Namik Kemal û Ziya Paşa, makzagona Ciwanên Osmaniyan pêşkêşî Ebdulhemîdê II'yem kirin. Makzagon hate pejirandin û li ser vê bingehê dest bi helbijartina meclîsê bû. Meclîsa yekemîn di 1877'an de hate avakirin. Meclîs ji hemû etnîkan ve pêk dihat û yên xeyrî Muslîm jî di nava meclîsê de cîh girtin.

Ev dem, dema pêvajoya serketina têkoşîna neteweyên bindest e û destpeka şerê Rûs û Osmaniyan e. Evana giş sedemên berfirehbûyina nakokiyên neteweyî û civakî ne. Lê hemû tedbîrên Osmaniyan alîkariya yekpareyiya dewleta Osmanî nedikir. Di sala 1877-1878'an de, piştî şerê Rûs û Osmaniyan, bi peymana Berlînê ve, Romanya, Sirbîstan, Karadax, Bosna-Hersek, Bulgarîstan serxwebûna xwe bi dest xistin. Alîkariya Rûsan di serxwebûna van welatan de biryardêr e. Ger Rûs û Ingilîz alîkariya wan nekin ew nikarin di demeke wiha kurt de serxwebûnên xwe bidest bixin.

Pêwendiyên Osmaniyan bi enternasyonalê û Elmanya re xurt dibûn. Ji aliyekî din ve jî Rûs, Ingilîz û Fransizan alîkariya neteweyên Îsewî dikirin. Di nava vê aloziya dewletê de di medreseyên Artêşa dewletê de, ku bi destê Ebdulhemîd ve hatibû avakirin, di sala 1889'an de bi destên efseran ve "**Cemiyeta Ittihad-î Osmanî**" (1889) ku bi nehênî ji aliyê "**ronakbîrên**" leşkerî yên neteweyên misiliman ve hate avakirin. Tevger bi xwe ji kesên weke, Ishak Sikûtî, Îbrahîm Temo, Abdullah cewdet, jî di nava wan de ji gelek etnîka ve pêk dihat. Weke xuya dike bingeha dewleta Tirkan, mixabin Kurdan, Ermenan, Rûma û sosyalîstên Ewropiya daniye.

Ev tevger bi xwe statukoperest û dijberî reformên ji bo neteweyên cûda bûn. Ewana yekîtiya, yekpareyî ya dewleta Osmanî diparastin. Ramanên neteweperestiya Tirkî di nava wan de weke tendens xurt dibû. Ev ramaneke nûjen bû û gelek kes li dora xwe civandin.

Navenda Tevgerê, bêtir aliyê Rumelî ye. Ev tevger jî weke Ciwanên Osmanî, tevgera Masona ya Carbonî ji xwe re minak dibînin.[113]

Evana ji ber dijberiya Sultan, bêtir li derveyî welat bi hêz dibûn. Li derveyî welat bi Ciwanên Osmanî re bûne yek û **"Cemiyeta Îttihad û Teraqî ya Osmanî"** ava kirin.

Di nava desthilatdariya Osmaniyan de nexweşiyeke mezin hebû. Lawê Damat Mehmed Paşa, Sebahettîn, di sala 1899'an de, weke endamê wan reviya û derket ewropayê. Ewî li Parîsê, di sala 1902'an de, Kongreya yekemîn ya Ciwanên Osmanîiyan ya Jon Tirk'an, li dar xist û bû serokê wê.

Ev Kongre destpêka eşkerebûyina nasnameyên cuda ye. Di kongreyê de û piştî kongreyê du nasnameyên cuda derdiketin rojeva siyasiya dewleta Osmanî.

Tevgera yekemîn: Bi serokatiya Ehmed Riza ve Tirkîtî û navendîtî diparastin. Weke îdeolojî, jî Tirkîtî, Mislimantî û Osmanîtî diparastin. Bi îdeolojiyek û nasnameyeke aloz ve tevdigeriyan. Berdewama wan, CHF-CHP, Millî Bîrlik komîtesî, Mustafa kemal, Îsmet înûnû, Fewzî çakmak û wekî dinin.

Tevgera Duyem: Bi serokatiya Sebahettîn ve tevdigere û ademî navendiyê diparêze. Lîberal-muhafazakar e. Dijî ramanên Tirkîtiyê radiweste û pirçandiyê diparêze. Berdewama wan jî, di 1906'an de" Tevgera Teşebus-î Şexsî û Ademî Merkezî", Hurriyet û Îtilaf, Teraqî Perwer, Demokrat, Adalet Partî û hetanî nuha jî Özal û Erdogan berdewamiya wan diajon.

---

113 *Kuruluş ve Kurucu,* Seyfi Özgider. Aykırı Tarih-Aykırı Yayıncılık. İstanbul. Ekim 2003.

Tevgera yekemîn bi riya leşkerî ve, bi navê "cemiyeta Îttîhad û teraqî" ve, zor dane Ebdulhemîd. Evana ne, yên ku darbeya leşkerî ya 1908'an pêk anîn.

Cara yekemîn bû ku bi navê Tirkîtiyê ramanên siyasî dihatin gotin. Lê di dema wan de jî neteweyên cûda azad dibûn û Dewleta Osmanî perçe dibû. Serhildanên neteweyan berdewam dikirin. Ev pêvajo bû sedema hukmê leşkerî ya 1908'an.

Di beyana xwe ya avakirina tevgerê de, Ittihadiyan, dewleteke bi serweriya parlementerî diparastin, dev ji navê Osmaniyan bernedidan lê navê Tirkîtiyê li ba wan bi hêz bû.

Berî Ittihadiyan bi bandora Ciwanên Osmanî, di 23/12-1876'an de makzagona Osmaniyan bi navê **'Kanûni Esasi'** derketibû û li ser vê bingehê di 20/3-1877'an de parlemena yekemîn hatibû avakirin. "Tirkên Jon", bi hukmê leşkerî ya sala 1908'an ve, makzagona berê bi hinek reforman berdewam kirin. Îttihadiyan ev magzakona di 20'ê adara sala 1877'an de hatibû qebûlkirin, bi hinek reforman berdewam kirin. Ev makzagon di salên 1909, di 1912, 1914, û 1916'an bi hinek guherînên biçûk ve berdewam kiriye. Ev guherandinên sexte nikaribûn bibin sedemên rawestandina tevgerên cûr be cûr yên nava dewleta Osmanî. Lewra di **Kanûnî Esasiyê** de ne mafê neteweyan û ne jî yên kêmneteweyan dihate eşkerekirin lê berevajî vê her dem li dijî mafê netewa û kêmnetewan rawestiyan û loma jî tekoşîna neteweyan ne sekinî û bi gelemperî berdewam kir.

Îttîhadiyan bi darbeya 1913'yan ve serweriya xwe xurt kirin. Hêza wê ya sereke leşker bû. Bi navê Tirkîtiyê kar kirin, awayên tundrewî bû xebata wan ya sereke. Li himber nêrînên cuda zordar bûn. Lê hînê jî bi awayekî nehênî dewlet îdare dikirin. Bernameyeke wê ya bi rêk û pêk tune bû. Armanca sereke parastina yekpareyiya dewletê bû û dijî hemû tevger û serhildanên etnîkî, lîberalî, pirrçandî bi tundî radiwestiyan. Teror bi kar dianîn û dixwestin dengên muxalif ji holê rakin. Di sala 1911'an de Hurriyet û Îtilaf ya berdewama Sebahettîn, hate ava kirin û dijî wan rawestiya. Lê bi darbeya 1913'an ve lawaz bû û hukum di destê Îttîhadiyan de ma û xurt bûn.

Ev helwesta Îttîhadiyan ji dêvila bikaribe serhildanên netewan rawestîne, gûrtir dike. Vê helwesta wan ya Tirkîtî bû sedemê

bihêzkirina nasnameyên etnîkî yên Kurd, Ereb û Ermenan. Di vê demê de lêgerîneke nasnameyî di nava neteweyên bindest de bi hêz dibe, berfireh dibe û gelek serhildan pêk tên. Divê em li vê derê pirsekê bînin zimên. Serweriya dewleta Osmanî, tucarî weke serweriya Komara Tirk, neteweyên cûda inkar nekirine. Wan netewana bi navên wan û bi navên herêmên wan yan jî bi navên welatên wan bi nav kirine. Înkara neteweyên cûda di destpêka avakirina komara Tirk ya şowenîst û nijadperest de dest pê kirî ye. Lê bingeha wê jî bi destên Îttîhadiyan hatiye danîn.

## Encama Şerê Rûs û Osmaniyan û destpêka Şerê Cîhanî

Di vê navbeynê de Rûsan, alîkariya neteweyên Balkaniyan dikir. Serkeftina Rûsan ya li Makadonyayê, him Îttîhadiyan û him jî Îngilîzan û Fransizan ditirsand. Welatên emperyal dest bi hevkariyeke dijî Rûsan dikirin. Împaratoriya Awusturya-Macarîstan, Elmanya, Ingilîz, Fransiz li ser hevkariyê dihatine ba hev. Rûsya êdî çare nedî û civîna Berlînê qebûl kir. Civîn bi bejdariya 7 dewletan ve pêk hat. Osmaniyan jî di vê civînê de cîh girt in. Civîn di 13/6-1878'an de pêk hat. Bingeha perçekirina dewleta Osmanî di rojeva civînê de bû pirsa sereke. Gelek netewe serbixwe bûn û gelek jî weke bi mandatiya dewletên emperyal ve ji Osmaniyan vediqetiyan. Kars, Ardehan û Batun di destê Rûsan de ma. Ji xwe Rûs li aliyê Balkanan bi hêz bûn. Gelek neteweyên Balkanî jî azadiya xwe wergirtin.

Piştî vê civîna Berlînê Îttîhadiyan helwesta xwe ya li dijî perçebûnê bi hêz kirin. Li dijî azadiya neteweyên bindest radiwestiyan.

Di sala 1906'an de "Cemiyeta Azadî ya Ciwanên Osmanî" ji aliyê leşkerên ordiya 3'yem ve dihate ava kirin. Ev cemiyet zû mezin bû û bi Îttîhadiyan re yekîtî çêkirin. Navê yekîtiyê bû "Îttîhad û Terakkî".[114] Ev jî bû bingeha hukmê leşkerî ya Îttîhadiyan ya sala 1908'an.

Gava bi navê Tirkan di nava dewleta Osmanî de cemiyet dihatine ava kirin, Kurdan jî dest bi ava kirina Cemiyeta Tealî ya Kurd kirin. Xebata tevgera Îttîhadî ji aliyê Abdulhemîd ve hatibû qedexekirin. Di

114 Halim Demir. *Yeraltından İktidara-İttihat ve Terakki-Darbeler ve Suikastlar Tarihi,* Ozan Yayıncılık. Cotmeh-2005.

destpeka şerê cîhanê ê yekem de Tirkên Îttihad sîstema yek partîtiyê li ser lingan dihiştin û nedihiştin kesekî din bi partiyên xwe serweriyê parve bikin. Hêza ku bi navê Tirkîtiyê tev digeriya dixwest dewletê têxe destên xwe. Di vê demê de weke dewletên Ewrupî dewletên Efrîqî jî ji Osmaniyan vediqetiyan. Osmaniyan girîngiyeke mezin nedidan van welatana, lê ji bo Osmaniyan Rojhilata Navîn her ku diçû girîngtir dibû. Tirkîtî di nava dewletê de mezin dibû lê neteweyên cûda weke Ermen, Kurd û Ereban jî serî hildidan û dewletên xwe dixwestin. Cûdabûna bingehîn, ev e ku tevgera Tirkîtî bi navê dewletê, bi hêza dewletê, bi leşkerên dewletê dixwaze dewletê bi navê Osmaniyan-Tirkîtiyê li ser lingan bihêle. Lê neteweyên din berevajî wê, veqetandin dixwestin û li dijî vê dewletê serî hildidan. Bi van nakokiyan û serhildana ve dewleta Osmanî beşdarî şerê yekem yê cîhanê bû. Li vir divê em bêjin ku Kurdan mafê xwe dixwestin lê daxwazên wan ne zelal bûn. Di nava Osmaniyan de mayina Kurdan weke otonomî daxwaza sereke bû. Lê nêrînên weqetandinê jî hebûn.

Di destpêka şerê yekem de, Îttîhadê dewlet xiste destê xwe. Meclîs di destên wan de bû. Hêza Sultan Kêm bibû. Serokatîiya vê hêzê wê demê, Enwer,Telat û cemal paşa bûn. "Teşkîlatî Mahsûsan" ava kiribûn û teroreke dewletî bikar dianîn.

Cara yekemîn e ku, Îttîhad navê Tirkîtiyê dike bingeha siyaseta Osmanî û dijî hemû tevgerên etnîkî radiweste. Di bingeha hemû çalakî, bûyer, daxwaz û îdeolojiya Kemalîstan de nêrîn û helwesta Îttîhadiyan heye.

### Şerê Balkaniyan, dawiya sedsala 19'an û şerê cîhanî

Di 28/8-1914'an de şerê cîhanî dest pê kir. Dewleta osmanî ne tenê ji bo alîkariya Elmanyayê beşdarî şer bû. Osmaniyan ji bo yekpareyiya dewletê biparêzin û ji bo ji nuh va ciyê ji dest berdane paşde vegerînin beşdariya şerî kirin.

Dewleta Osmanî bi amadeyiyên mezin yên leşkerî di bin bandora Îttîhadiyan de, ji aliyê Elmanyayê ve artêşa Osmanî ya Îttîhadiyan ji nuh ve, bi destê generalê Elmanî, Lîman Von Sanders ve hate vejandin. Serê artêşa Osmaniyan generalê Elmanî dikişand. Ango artêşa Osmaniyan di bin serweriya Elmanyayê de beşdarî şerê cîhanî bû. "Di nava

salên 1912-1922'an de, %40 mêr yên leşker, yên di navbeyna 20-40 saliya xwe de bûn, hatin kuştin."[115]

Weke tê gotin Osmanî bi 4 mîlyon leşker ve beşdariya vî şerî kirin. Li gor van agahdariya Osmaniyan mîlyonek û 600 hezar mirovê xwe bi kuştin dane. Serjimara Osmanî ya wê demê di nava 15-16 milyonan de tê hesibandin.

Di nava van salan de milyon û nîvek Ermenî, 700 hezar Kurd û bi sedhezaran Rûm û Suryanî hatin qetilkirin. Ango Îttîhadiyan nîvê civata Osmanî ya çalak ji holê rakiriye.

Di nava van salan de ramanên nîjadperestî yên Tirkîtî di nava hêza Îttîhadiyan de mezin bû. Serkêşên vê ramanê penaberên Kafqasî, Arnawutî, Makadonî û paşayên bê dûnde bûne. Ev paşayên Osmaniyan bêtir ji zarokên Ewropiyan, pêk dihatin. Ramanên Tirkîtiyê di nava vê hêzê de bi dujminahiya Rûm û Ermenan ve dest pê kir û bi dujminahiya Kurdan ve jî forma xwe ya îroyîn girtiye. Ramaneke reaksiyoner, nîjadperest e û ji rastiyê dûr e.

Bingeha vê ramanê sermayedariya Kafqasî, û Mislimanên Balkanî ne ku ew bi xwe li ser mal û milkên Rûm û Ermenan rûniştin û ji bo vî mal û mulkî ji dest bernedin bi her awayî ji bo Tirkîtiyê şer kirin.

Di wê demê de erka Sultan kêm û desthilatdariya Îttîhadiyan sereke bû. Artêş di desthilatdariya Îttîhadiyan û Elmayayê de bû. Meclîs bi dawî hatibû û bi seferberiyeke mezin artêş mezin dikirin.

Vê rewşa Osmaniyan Rûs, Ingilîz û Faransizan dixistin nava gûmanên mezin. Her sê dewleta di 1/11-1914'an de dijî dewleta Osmanî dest bi şer kirin. Hêza Îttîhadiyan ji gelên Misliman ve pêk dihat. Kurd, Laz, Çerkez, Ereb û wekî din. Di şerê Rûs û Osmaniyan de di navbeyna salên 1877-1878'an de ji herêmên Balkanî û Kafqasî ya yê milyon û nîv- du milyon Misliman koçberî nava Osmaniyan kiribûn. Ev hêz e ku, ji Tirkîtiyê re buye palpişt û bûye bingeha dewleta nîjadperest ya netewe-dewleta Tirk. Gelek balkêşe. Li Îranê Pehlewî û Yehudî, Li Iraq û Suryeyê jî, Erebên ji derve hatine yên pêgirên Ingilîz û Faransizan, li Tirkiyeyê jî Kafqas, Rûm, Makadonî û Arnawûtân

115 *Kuruluş ve Kurucu. Seyfi Özgider*, Aykırı Tarih-Aykırı Yayıncılık, İstanbul. Cotmeh 2003.

dewletên –netewe-dewlet ava kirinin. Ji xwe ji wê demê û hetanî îro, desthilatdariya netewe-dewleta Tirk ji Mustafa kemal hetanî Erdogan di destê vê hêzê de ye.

Elçiyê Îngilîzan yê dema Mistefa Kemal û hukumeta Enqereyê wiha dinivîsîne" Pêwendiyên xwînî û dûndeyî yên serokên Enqereyê, bi tu awayî bi welat (Osmanî) re tuneye. M.Kemal Makedonekî şoreşger yê bê dûndeyî ye... bêtir dirûvê Sirbiya pê dikeve.., Bekir Samî ji xwe çerkez e. Hemû Aranawût û çerkez in. Evana ji bilî Tirkan hemû tişt in. Di nava wan de yekî bi dûndeyî Tirk tuneye. Evana alîkariya xwe ji Bolşewîkan werdigrin."[116]

Sala 1915'an dema dewleta Osmaniyan ya herî girîng e. Li Rûsyayê Bolşewîkan bi alîkariya Elman û Osmaniyan ve şer dikirin. Elmanya di nava Osmanî de dibû hêza sereke. Artêşa Osmaniyan di destê Elmanyayê de ye û dijî hemû serhildanên etnîkî radiwestin. Ingilîz û Fransiz dixwazin di çanaqaleyê re derbasî Derya Reş bibin. Armanca wan alîkariya Rûsan ya dijî Bolşewîkan e. Serketina Bolşewîkan ji bo wan bûyereke nedihat qebûlkirin bû. Lewra dibû sedama bihêzbûyina Elmanya û Osmaniyan û loma jî ev diyarde biryardêr bû. Lewra hêza Osmaniyan ya mezin bi efserên weke M.Kemal û hevalên wî ve, ku ew bi xwe jî dibin serokatiya generalê Elman Liman de bûn, Çanaqaleyê diparastin. Pêşiya Ingilîz û Faransizan girtibûn û mixabin negihîştin Derya Reş.

Ger Ingilîz û Faransiz derbasî derya reş bibûnaya me yê îro dîroka Rojhilata Navîn bi awayekî berevajî dîroka îroyîn bixwendaya. Lewra wê dîroknivîs ne Îttîhadî û Kemalîst bûna. Wê şoreşa Bolşewîkan bi îhtîmala mezin di 1917'an de pêk nehatibûya. Wê Îro Kurdistan û Ermenîstana Mezin hebûya. Wê pirsgirêka bingehîn li Rojhilata Navîn pirsgirêka sînorên navbeyna Kurdistan û Ermenîstanê bûya. Wê Îro Îstanbûl di destê Rûs û Ruman de bûya. Wê nêviyê Tirkiyê Rûm bûna. Wê pirsgirêka Kibrisê tunebûya. Wê Laz xwedî dewlet bûna.Wê Kemalîst weke hêz tucarî nebûya. Wê dewletek bi navê Tirkan li ser rûqala dinyayê tunebûya. Mirov dikare bûyeran weke zincîhrê bi rêz bike.

---

116 *Kuruluş ve Kurucu,* Seyfi Özgider, Aykiri Tarih-Aykırı Yayıncılık, İstanbul. Cotmeh 2003.

Li gor dîroka Tirk ya fermî, yê pêşiya Ingilîz û Faransizan girtiye M.Kemal bi xwe ye. Lê vî aliyê dîroka Tirk jî, weke hemû aliyê wê, derew e. Stratejiya şer di destê generalê Elman de ye û yê xwedî biryar jî ew e. Heta wê demê M.Kemal nehatiye naskirin. Piştî serketina Osmaniyan ya li Çanaqaleyê M.Kemal û hevalên xwe, weke bûyer û serketina xwe binav kirin. Elmana jî xwestin derfetekê bidin wan ku bikaribin hêza artêşê li ser hev rabigre. Pêdiviya artêşa Osmanî ji qehremanan hebû û Elmana serleşkerên Osmaniyan dane pêş. Ev jî bû sedema ku M.Kemal û hevalên xwe di nava artêşê de bihêz bibin.

Evan efserên Osmanî yên derketên pêş bêtirîn yên artêşa nûjenkirî ya Enwer Paşa bûn. Serokên wan weke Enwer û Cemal paşa bi alîkariya Elmanan reviyan û li derveyî welat bûne penaber. Di şerê cîhanî de Osmanî û Elman têk çûn.

## Dawiya şerê cîhanî û awakirina netewe-dewleta Tirk

Di 30/10-1918'an de Mutarekeya Mondrosê pêk hat. Cemiyeta Îttihad û Teraqî hate rûxandin. Serkêşên wê ji aliyê Ingilîz û Fransizan ve weke qatilên şerî û yên komkujiya Ermenan û Rûman hatin darizandin. Gelek ji wan hatin girtin û gelek jî reviyan derveyî welat. Îttihadiyan tevgereke nuh bi navê "firqeya teceddut" û yek jî bi navê "karakolê" weke tevgera terorê ava kirin. Endamên wan yên nedihatin darizandin di nava van tevgeran de cîh girtin. M.Kemal endamê Îttihadê bû lê ne endamekî xuyayî û bi nav û deng bû. Yawerê sultan bû û dixwest di xizmeta Îngilîzan de kar bike. Baweriya Sultan pê dihat. Wî û hevalên wî ji bo cepheya şerqê ku bikaribe pêşiya Bolşewîkan û pêgirên wan li Anatolyayê û li Kurdistanê bigre bi alîkariya Îngilîzan ve rêkirin Kurdistanê. Ewî jî weke berdevkê Sultan tevdigeriya û bawerî dida Îngilîzan. Tevgera Îttîhadiyan ya nuh di 1919'an de bi navê "Cemiyeta Mudafaî hukuk" tevgereke nuh ava kirin. Armanca wê bi alîkariya Kurdan û Bolşewîkan, dijî Rûm û Ermeniya û Kurdan rawestin, û yekpareyî ya dewleta Osmanî biparêzin. Bi alîkariya Kurdan rawestandina dijî Kurdan armanca wan ya sereke bû.

Di dîroka Tirkan de ev dem û M.Kemal, weke dijberiyên Îngilîzan hatine nivîsîn. Ev jî ji rastiyê dûre. Heta 1921'ê ku wê gavê meclîsa Enqereyê jî hatiye ava kirin, M.Kemal û hevalên xwe, heta serokên

Îttîhadiyan yên li welêt mabûn jî, bi hevre mandatiya Îngilîzan heger nebe ya Emerîkiya weke çareseriyê binav dikin û ji bo vê mandatiyê jî kar dikin. Wê demê hemû serok û berpirsên Îttîhadiyan dihatin darizandin. Îngilîzan bixwestana bêyî tu astengiya dikaribûn M.Kemal û hevalên wî bigrin, sirgûn bikin yan jî darizînin. Dogan Avcioglu, dibêje; M.Kemal bi destê Îngilîzan û Sultan ve çû Anatolyayê û dûre Kurdistanê. M.Kemal û hevalên wî, bêtir bala xwe dan ser sermayedarên li ser sînoran yên mal û milkên Rûm û Ermeniyan dagir kiribûn û mezin dibûn. Ew bêtir Kafqasî û Balkanî bûn. Li Kurdistanê mistek Kurd jî hebûn. Evana ji Kemalîstan bêtir Tirkîtî dikirin û ji Îttîhadiyan bêtir yekpareyiya welat diparastin û li dijî Rûm û Ermeniya radiwestiyan. Ev hêzeke mezin bû û loma jî Îttîhadiyên nuh ango Kemalîstan di nava vê hêzê de cîh girtin û kirin bingeha tevgera xwe.

Bi alîkariya Bolşewîkan baweriyên sosyalîstî li Anatolyayê belav dibû û tevgerên nuh dihatin avakirin. Evana gişan dijî Îngilîzan helwest digirtin. Agahdariyên Îngilîzan ji hevkariya Kemalîstan û Bolşewîkan çê bû. Ji xwe piştî avakirina meclîsa Enqereyê ev têkilî eşkere bûn. Bolşewîkan Ezarbeycana serbixwe rûxandin û xistin nava Federasyona Rûsan. Bi vî awayî gelek welatên Kafqasyayî ji xistin nava xwe û bi hêz bûn. Bolşewîkan berdêla Ezarbeycan û welatên Kafqasî, Kurdistan û Ermenîstan radestî Kemalîstan kirin. Ji bo Rûsyayê ji destêwerdanên emperyalîzmê biparêzin, der û dora xwe bi dagirkirina welatên Kafqasî ve pêçan. Ji aliyê din ve jî dewleteke weke ya Îttihadiyan dixwestin weke cîran ji bo wan girîng bû.

Nêviyê Anatolyayê di bin hukumraniya Italyayê de bû. Ciyên ku Îtalya dagir kiribû, mijara devjengiyê di nava wan û Îngilîzan de peyda dikir. Fransa bi bêdiliyekê alîkariya Îtalyayê dikir. Cîhê Îtalyayê dagir kiribû cîhê Rûman bû û Yunan dijî vê helwesta Îtalyayê radiwestiya û dixwest ev dever radestî wê bibe.

Yûnanan alîkariya Îngilîzan werdigirt û derbasî Anatolyayê bû. Hêza Yunan mezin bû. Bi alîkariya Îngilîzan him îtaliya û him jî Osmaniyan tirsand. Lê yên herî bêtir tirsiyan ew kesên mal û milkên Rûman dagir kiribûn û nedixwestin vê derfeta dewlemendiyê ji dest berdin. Yên bi Îttîhadiyan-Kemalîstan re dijî Yunanan serî hildan ev hêza ser sînor bû. Ew jî bêtir Mislimanên Balkanî û Kafqasî bûn.

Dijayetiya Îtalya û Faransayê alîkariya Osmaniyan kir. Herwiha hatina Rûman ya Anatolyayê Bolşewîk jî tirsandin. Di vê navberê de pêwendiyên Bolşewîkan û Îttîhadiyan-Kemalîstan xurt bû. Lê hêzên Yûnan ber bi nava Anatolyayê berfireh dibû. Bolşewîkan ji bo alîkariya Îttîhadiyan bikin, kongreya enternasyonala l'emîn ya Balkan li dar xist û biryara alîkariya Îttîhadiyan ji kongreyê derxistin. Partiya komunist ya Yunan, û hêzên din yên sosyalîst bi biryara enternasyonala l'emîn ve dijî hêzên Yunanî rawestiyan û di nava artêşa Yunaniyan de dest bi serhildan kirin. Alîkariya hêzên Osmaniyan kirin û hêza Yunanî lawaz kirin. Weke tê gotin hêza sosyalîsta mezin bû û astengiyên mezin di nava artêşa Yunaniyan de peyda kirin. Îtaliya û Faransa ji xwe dijî hatina Yunaniyan bûn. Tenê Îngilîzan alîkariya wan dikir û loma jî hêzên Osmaniyan bi ser ketin. Ev bûyer di dîroka Tirkan de weke şerê rêzgariya neteweyî ya Tirk binav dibe. Ango şerê dijî Yunan û Ermenan bûye şerê rêzgariya neteweyî. Ev şer yê navxweyî ye û ji sala 1918'an heta 1922'an tu şer di navbeyna dewletên îhtilaf û yên Tirkan de derneketiye. Ango Tirkan dijî Yunan û Ermenan û dawî jî dijî Kurdan "şerê rêzgariya neteweyî" dane.

Mirov ji kîjan aliyî ve li van bûyeran binêre wê mirov bibîne ku avakirina dewleta Tirk, ne bi şerê rêzgariya neteweyî weke Tirk tînin zimên pêk hatiye. Nakokiyên navbeyna dewletên mezin, alîkariya komunîstan û nemaze ya Bolşewîkan bûye bingeha avakirina dewleta Tirk.

Di dawiya şerê cîhanê de Osmanî jî bi Elmanan re şikestin û serokên îttihadê Enwer, Telat û Cemal paşa reviyan çûn Elmanyayê û li wir bûne penaber.

Ingîlîz û Fransizan siyaseta xwe ya Rojhilata Navîn guherîn. Herdû dewletên Emperyal nedixwestin ku weke berê serweriya Osmaniyan ji bona berjewendiyên xwe bikar bînin. Dev ji bikaranîna Osmaniyan berdidan. Lewra bi rêya Osmaniyan êdî nikaribûn serweriya Rojhilata Navîn bikin. Êdî wan dixwestin bi xwe li Rojhilata Navîn serwer bin. Dewleta Osmanî li ber belavbûnê bû û ew bûbû qada parvekirina dewletên mezin. Dewletên mezin bêhna petrolê li Rojhilata Navîn digirtin û Rojhilata Navîn dibû qada nakokiyên dewletên mezin.

Bandora tevgerên netweyên Rumelî-Balkanan li neteweyên Asyayî

û Efriqî jî dikirin. Ermeniyan dest bi şoreşê kiribûn. Ermeniyan bi Rûsan û Ereban jî bi îngîlîz û Fransizan re peyman çêdikirin. Kurdan jî cîh bi cîh dest bi şerê azadiyê dikirin û alîkariya wan dewletên mezin dixwestin. Îttihad û Teraki jî bi bandora tevgerên azadîxwaz ve parastina yekîtiya dewleta Osmanî bi navê Tirkan dixwestin û li dijî şoreşên neteweyan derdiketin.

Daxwaza îngîlîzan ya sereke dibin bandora xwe de avakirina dewleteke yekgirtî ya Ereb hebû. Kurdistan jî qada petrolê bû û îngîlîzan dewleteke biçûk ya Kurd jî dixistin nava planên xwe. Weke Rûsan, îngîlîzan jî dewleta Ermenî dixwestin. Evana hemû bûn sedema rûxandina Osmaniyan û piştî şerê cîhanê ê yekem dewleta Osmanî hate parvekirin.

### Di dema Osmaniyan de tevgera Kurd

Çend dîroknasên Tirkan yên nîjadperest îdîa dikin ku Kurd tu carî ne bûne dewlet û loma jî Kurd ne neteweyeke serbixwe ye. Ango li gora ramanên wan Kurdan tu caran statuyeke netewî peyda nekirine, statuyeke dewletî ne afirandine û loma jî mafê carenûsî ji bo Kurdan derbas nabe. Mafê carenûsî ji bo neteweyên bûne xwedî struktur, derbas dibe. Welewkî otonom bin jî dîsa struktureke wan hebûye lê ya Kurdan tunebûye û lomajî mafê carenûsî ji bona wan derbas nabe. Hinek ji wan jî dibêjin Kurdan bi Tirkan re di şerê rêzgarîxwaziya nateweyî de ango di şerê serxwebûna ava kirina dewleta Tirk ya îro de mafê xwe yê carenûsî bi kar anîne û di nava Tirkan de mane û bûne perçeyek ji neteweya Tirkan. Hin Kurd jî bi vê çewtiyê dixapin û dibêjin Kurdan dewlet ava nekirine. Bingeha vê îdiayê ji bingeha ramanên înkarkirina Kurdan tê û ne raste. Belkî ji hemû qewmên Rojhilata Navîn bêtir Kurdan dewlet avakirine. Lê mixabin îro ji dewleteke serbixwe û yekgirtî bêpar in.

### Bi kurtî Kurd û dîroka Kurdistanê

Berî zayinê sedsala 6'an de Medî derketine ser sahneya dîrokê. Dewleta Medî weke dewleta Kurdî tê binav kirin. Dîroknas vê dewletê bi gelek awayî şîrove dikin. Lê dewleta herî mezine ku digel xaka gelek herêmên cûda ve, hemû xaka Kurdistanê jî xistiye destên xwe. Piştî vê

dewletê xuyaye ku Kurdan dewleteke wiha yekgirtî ava nekirine. Ev rastiyeke Kurdan e.

Lê gelek dewletên din yên weke dewletên Kurdî têne binav kirin ava kirine. Ji vana çend dewletan dixwazim bi nav bikim. Berî Medan Gutî, hebûn, Berî zayinê 2700 sal Gutiya li der dora Zagros-Elamê serweriya xwe bi cîh kirine. Akadiyan jî dixin destên xwe û weke dewleteke mezin dighêjin Loloyan û di sala 2649'an berî zayinê de bi wan re yekgirtinekê ava dikin. Lolo, berî zayinê di sala 2800'î de li der dora Zagrosê bicîh bûne. 1000 salan hukumdariya xwe li vê derê berdewam kirine. Di salên 1800'î de dikeve nava Akadan. Lê Gutiyan bi şerê li dijî Akadan ve ew ji bin destên Akadan derxistine û bi Gutiyan re bûne yek.

Mîtanî weke Eşîreke Subariyan e, wan jî li der dora Zagrosê berî zayinê di sala 1600'î de dewleta xwe ava kirine.

"Aryanî berî ku bên Rojhilatê, ji hev cûda bûn. Hêza sereke bû du hêzan. Wana berê xwe dan Anatolyayê û Asya pêşî. Ew Hîttît û Hûrî ne. Ew in yên şaristaniya Mîtaniyan ava kirine."[117] Berê jî min gotibû ku li dû wan qabîleyên Aryanî cara duyem weke beşa duyem Medî û Persî weke berdewama wan qabîleyên Aryanî yên berî xwe hatine Rojhilata Navîn û Suriye, Amuriye, Asûr, Anatolya, Mezopotamya, Îran û xaka Kurdîstana îro jî xistine destên xwe. Vana çend dewletên bi navên dewletên Kurdî têne binavkirin ku li ser xaka Kurdistanê şaristanî avakirine. (**Binêre li beşa Îran û Iraqê.**)

Vana belkî ne tenê dewletên xwerû yên Kurdan in lê mirov dikare bêje evana ya dewletên Kurdan avakirinin yan jî dewletên Kurd di nava wan de xwedî hêzbûn û xwedî erk bûn. Di vê demê de lêgerîna dewletên xwerû ji qewmekî ne rast in. Lê bi navê qabîleyan, eşîran û kesan dewlet hatine avakirin û gelek caran dewlet ji qabîle û eşîrên têkel pêk hatine. Dewletên Kurdan jî wiha ne. Xwerû dewleta Kurdî bawer nakim heye. Ger hebe jî ez nizanim. Lê ez ne di wê demê de û nejî nuha dewleta tu qewmî ya xwerû nabînim. Kurdan jî weke qewmên vê herêmê dewlet ava kirine û dewletên xwe bi qewmên din ve payê

---

117 Siraç Bilgin, *Zarathuştra* Berfin Yayınları. Çapa Duyem 2003, Çapa Berfirehkirî, Çapa Yekem 1995. r.163-164

kirine. Minakên vê pêvajoyê yên dewletên li jorê hatine binav kirin in. Piştî zayinê jî Kurdan dewlet avakirine. Piştî Împaratoriya Medî Kurdan bi qabîle û gelên herêmê re cûr be cûr jiyane. Divê em bêjin di dawiya dema dewleta Medî de Persî û dawî jî Partî bûne serwerê vê împaratoriyê û heta hatiye rûxandin jî di bin serweriya wan de maye. Bi gelemperî di beşa Îranê de min ev pirsgirêk aniye zimên. Part û Sasanî' jî weke dewletên Kurd di nava wan de bihêz bûne bilêv dikim.

Di dema Îslamê de jî Kurdan dewletên têkel avakirine. Berê li dijî Îslamê şer kirine lê dû re piştî sedsalan Kurdan Îslamiyet qebûl kirine û bi navê Îslamê dewlet avakirine. Dewleta Şedadî yek ji wan dewletên Kurdan avakirine (915-1174). Navê xwe ji Eşîreta Sadiyan wergirtiye. Ew bi xwe weke merivên Eyyubiyan û Merwaniyan jî têne nasîn. Ji Malatyayê heta, nahcîhwan, Tiflîs, Karabax û Duvînê herêmên mezin cîh girtine û weke cîranê Merwaniyan di eynê demê de jiyane. Dewleta Şedadî jî dewleteke têkel e û xwerû ne dewleteke Kurdan e.

Dewleta Hesnewî jî yek ji wan dewletên Kurdî ye ku eşîreta Berzikaniyan ava kiriye (959-1015). Ev dewlet jî di dema Merwanî û Şeddadiyan de jiyaye û li ser xaka herêma Hemedan hatiye ava kirin. Hemedan weke tê zanîn paytexta Med'an bû

Dewleta Merwanî (984 -1096). Ji Amedê heta Mêrdîn, Nisêbîn, Cizîre Malazgîrt Farqîn heta Mûsilê weke dewleteke mezin serweriya xwe dom kiriye.

Dewleta Eyubiyan (1169- 1330) Gelek Kurd wek dewleteke Kurdî nabînin. Bi ya min ne rast e. Dewleta Eyubiyan jî weke dewletên din dewleta Kurdî ya Îslamî û têkel e. Min di beşa Iraqê de rewşa Eyyubiyan aniye zimên. Lê bi kurtî mirov bêje piştî dewleta Medî dewleta Eyyubiyan ya herî mezin e ku aliyekî wê yê mezin ne li ser xaka Kurdistanê hatiye ava kirin. Dewletên berî Eyyubiyan derfet ji dewleta Eyyubiyan re vekirine. Wana dewletên Kurdan yên Misliman ava kirine û ji hêzên Îslamê re rê vekirine. Ango hebûna dewletên Kurdan yên Îslamî xebat û calakiyên Îslamê bi hêz kirine. Eyyubiyan jî di dema Sellehedîn de bi serokatiya wî derfetên mezin ji bona Kurdan afirandiye. Di dema Eyyubiyan de gelek dewletên Kurdan yên herêmî li ser xaka perceyekî Kurdistanê bi azadî jiyane û herêma xwe îdare kirine.

Di vê demê de derfeta mezin ji bo Kurdan belkî avakirina dewleta mezin ya Kurdistanî bûye. Lê mixabin Kurdan ev nekirine. Lê li ser xaka xwe bi destên xwe, xwe îdare kirine. Kes nikare bêjin bandora Eyyubiyan li ser vê rewşa erînî ji bo Kurdan tuneye. Lê dîsa jî di dema Îslamê de lêgerîna dewleteke xwerû Kurd yan jî dewleteke netewa Kurd ne rast e. Li dinyayê tu netweyeke ji yek kabîleyê, yan jî ji yek nîjadî, yan jî ji yek kokê hatiye tuneye. Ji xwe pirsa nîjad û pirsa koka netewa pirsa dîrokê û pirseke akademîk e. Ev bi xwe nikare rastiya îro biguhere. Lê lêkolîna li ser nîjad, qabîle û kokên netewa divê nebin sedemên înkarkirina netewe û gelên cûda. Ji xwe bingeha nîjadperestiyê ji vir tê.

Berê divê em bi çend gotinan pirsa neteweyî bînin zimên. Netewayetî ji nûşka ve, bêyî mêjûya dîrokî dernakeve holê. Netewayetiya Kurd di nava Osmaniyan de ji nişka ve derneketiye. Bîr û baweriyên neteweyî weke xelqeyên zincîhrê bi hev re girêdayi, bi rêya gelek serhildanên herêmî, bi çand û edebiyata gelêrî weke tevgereke siyasî-neteweyî li der û dora daxwazeke siyasî-neteweyî organîze dibe û weke tevgereke neteweyî ji bo bicîhanîn û bi dest xistina daxwaz û hêviyên xwe dest bi têkoşînê dike. Bandora netweyî û navneteweyî, pêşveçûna sermayeyê û zilma dijmin û têkoşîn û serhildanên li dijî zilmê, li dijî înkarê bîr û baweriyên neteweyî bi hêz dikin. Şerên bidestxistin û dagirkirina xakên cûda, şerên navbeyna olan, şerên navbeyna gelên binecîh li dijî biyaniyan ramanên neteweyî bi hêz dikin û daxwazên gel weke tevgereke siyasî derdixin holê.

Netewayetiya Kurdî em bixwazin nexwazin bi derengî dest pê kiriye. Di dema avakirina netewe-dewletê de Kurd bi mîrekên xwe ve wek otonom jiyane. Ramanên "Yekîtiya Eşîretên Kurd" a di dema Idrîsê Bedlîsî de dest pê kiriye (1512). Idrîs di dema xwe de weke alimekî û Kurdperwerekî bandorek mezin li ser êl û eşîrên Kurdan kiriye û xwestiye wan bîne ba hev û bi hev re bike hêzeke yekgirtî ya Kurdistanî. Alimê mezin Îdrîs bi yekîtiya Eşîr û Mîrekên Kurdan xwestiye herêma Kurdistanê yan jî qismekî ji herêma Kurdistanê **bi serweriya Hikûmetên Mîrekan ya yekgirtî** ve bi rêve bibe. Ji bona bi cîhkirina vê daxwazê jî bi Yavuzê Osmaniyan re li hev kiriye û hukumeta Kurdan

ya mîrekî ava kiriye. Di vê helwestê de tovên neteweyî henin, lê em ji ber gelek sedema vê helwesta Îdrîsî weke tevgereke neteweyî nikarin şîrove bikin. Ji şûna daxwazên neteweyî daxwazên herêmî û daxwazên serweriya Mîrekên Kurdan derketiye pêş û loma jî, ji Kurdan bêtir sultanê Osmaniyan jê derfet girtiye û li gora berjewendiyên dewleta Osmaniyan jî alîkariya Idrîsê Bedlîsî bûye. Lê berjewendiyên Kurdan jî di vê yekgirtinê de heye ku cara yekemîne ku di dema Osmaniyan de bi dehan Mîrekên Kurdan bi hev re hukumetek û yekîtiyeke Kurdî ava kirine û şerê hev nekirine. Mirov dikare vê yekgirtinê weke hukumeta Kurdî û idareya xwe bi xwe idarekirinê binav bike. Belkî weke otonomiyê jî mirov bikaribe binav bike. Heger Idrîsê Bedlîsî zû neçûya ser heqiya xwe dibe ku li gora berjewendiyên gelê Kurd karekî baştir bikiraya. Loma ev bûyer bi xwe di dema wî camêrî de gelekî mezin e. Ev bûyer weke diyardeyeke Kurdî bandoreke erênî li ser tevger û serhildanên dawî yên piştî vê bûyerê yên Kurdan hiştiye. Lewra Idrîsî Bidlîsî, di jiyanê de mumkuniya yekîtiya eşîrên Kurdan bicîh aniye û ev minak minakeke gelek mezine ku di nava êl û eşîrên Kurdan de bûye weke bûyereke berbiçav. Lê divê bê gotin ku hêzên Kurdan nebûya Osmaniyan nikaribûn bi serê xwe zora Eceman bibraya. Yên zora Eceman birine Kurd in. Lê di dîrokê de ji Osmaniyan re bûye mal. Ez li vir bahsa şerê navbeyna Osmaniyan û Sefawiyan ya çaldiranê dikim. Bawerim planên Osmaniyan bikar hatiye. Lewra wan dixwest dijî Sefawiyan dest bi şer bike û lewra jî pêwîstiya wan bi yekîtiya Kurdan hebû. Kurdan jî bi serokatiya Idrîsê Bitlîsî ev derfet bikar anîne û yekîtiya xwe ava kirine û dijî Sefawiyan aliyê Osmaniyan girtine.

Dîsa piştî peymana Çaldiriranê perçebûna Kurdistanê bandoreke mezin li ser Ehmedê xanî kiriye û loma jî pirtûka xwe Mem û Zînê dinivîsîne û bi sembolan perçebûna Kurdistanê tîne zimên û yekîtiya Kurdan dixwaze. Netewayetî li ba Ehmedê Xanî xurt e.

Piştî Idrîsê Bedlîsî dîsa Mîrekên Kurdan heta sala 1870'yî di nava dewleta Osmanî de weke otonom weke serweriyên teybetmend li ser xaka xwe jiyane û serweriya Mîrekiyan berdewam kirine. Gava berjewendiyên wan û yên dewletê li hev nekirine li dijî dewletê serî hildane. Yek ji tevgera Mîrekên Kurdan, tevgera Mîrê Cizîrê, ya Mîr Bedirxan e.

## Tevgera Mîr Bedirxan

Tevgera Mîrê Botan, Mîr Bedirxan di sedsala 1830'yî de weke tevgereke Kurdewarî dest pê dike. Ji bona ku em vê tevgerê weke tevgereke neteweyî binav bikin pêwîst nîne ku armanca vê tevgerê avakirina dewleta neteweya Kurd ya serbixwebe. Di bingeha xwe de armanca tevgerên neteweyî avakirina dewleta neteweyî ye. Lê tevgerên weke tevgera Mîrê Botan ku li ser aliyekî xaka Kurdistanê bi xweseriya xwe ve xwestiye serweriya xwe rabigihîne û bi navê xwe xudbê bixwîne û bi navê xwe pere derbixe, bi leşker û bi aboriya xwe serweriya herêma xwe bike, girîng e. Di bingeha xwe de ev dewleteke Kurdî-herêmî ye. Em nikarin dewletê bi prensîbên îro şîrove bikin. Bi ya min heger herêmek di wê demê de tiştê Mîr kiriye, kiribe navê wê bi xwe dewlet e. Lê ne dewleteke Kurdistanî ye. Loma ji pişti Bedirxan Beg kurên wî serhildana Mîr berdewam kirin in. Li vê derê em berdewamiyeke neteweyî û bi bi xwe bawer dibînin. Ne tenê wek berjewendiyên Mîr lê herwiha berjewendiyên neteweya Kurd jî li vir derdikevin holê. Di tevgera Mîr Bedirxan de helwesta Kurdewarî ya giştî ne zelal e. Mîr bêtir bi navê xwe û bi navê malbata xwe serweriya xwe bi kar aniye. Ji ber vê yekê tevgera Mîr ne weke tevgereke, bi helwesta netewe-dewlet zelal e. Lê bandora Bedirxaniyan heta tevgera Araratê jî berdewam kiriye. Di avakirina Tevgera Xoybûnê de rola Bedirxaniyan mezin e. Di berhemû û jiyana zimanê Kurdî de rola wan sereke ye. Em vana hemûyan bêyî bandora serhildana Mîr Bedirxan nikarin îzah bikin.

Ji aliyekî din ve bandora ramanên neteweyî di nava dewleta Osmanî de berfireh dibû û neteweyên balkanan serxwebûna xwe bi dest dixistin. Bandora tevgera neteweyî ya balkana jî li ser şoreşa Bedirxaniyan heye.Tevgera Bedirxaniyan jî weke tevgerên neteweyî yên cîhanê bandoreke mezin li ser tevgerên sedsala 19 û 20'an ya netewa Kurd kirî ye. Bedirxaniyan bi têkiliyên xwe bîr û baweriyên neteweyî di nava Mîrek û eşîrên Kurdan de belav kiriye. Lê tevger bi xwe, bi daxwazên xwe, bi têkiliyên xwe, bi armanca xwe, bi berhemên netewayetî lawaz e.

## Tevgera Şêx Ubeydullahê Nehrî

Agirê azadiyê ya Mîrekên Kurdan yên binavkirî û yên nebinavkirî, lê nemaze agirê mala Mîr Bedirxan pêxistibû li ba şêx Ubeydullahê

Nehrî zindî bû. Zilma Osmaniyan û ya Farisan qebûl nedikir. Piştî şikestina tevgera Mîr Bedirxan, şerê Rûsan û Osmaniyan (1878) dest pê kir. Osmaniyan alîkarî ji Kurdan dixwestin. Di vê navberê de Şêx li herêma şemdînanê dest bi şerê serxwebunê dikir. Şêx berê di sala 1880'yî de li dijî Osmaniyan serî hilda. Lewra vê demê Osmaniyan xwestine sîstema dewleta navendî ava bikin û Kurdistanê bi vê sîstemê ve entegre bikin. Sîstema Mîrektî ji holê rabûye û Osmanî dixwazin bi sîstema xwe ya nûjen ve, Kurdistanê bi rêve bibin. Di pirsa bacê de , di pirsa leşkeriyê de û di struktura rêvebirinê de dijî sîstema Mîrekiyê li Kurdistanê gav avêtine. Evana hemû sedemên serhildanên Mîrekên Kurdan yên wê demê ne.

Di vê demê de li Kurdistanê feqîrî û nexweşî zêde bû. Gel êrîşî embarên dewletê dikirin, li dijî dewletê serî hildidan. Van sedemana jî bingeha şoreşa Şêx bi hêz û amade dikirin. Tevgera Bedirxaniyan şikestibû lê cîh bi cîh Kurdan li dijî dewletê serî hildidan. Di vê demê de bandora Şêx ya olî û neteweyî bi hêz bû. Di wê demê de Kurdistan di bin bandora êl û Eşîrande bûn. Herwiha bandora ol û terîqatan mezin bû. Mirov dikare vê dema Şêx weke dema civata Kurd ji sîstema mîrektiyê derbasî sîstema şêx û olîtiyê dibe, bi nav bike. Wê demê dewletên der û dor weke Îran, Osmanî jî dibin bandora olî û malbatan de bûn. Dewleta Osmanî di nava tevliheviyeke mezin debû û nikaribû pêşiya serhildanên neteweyî bigirtaya.

Şêx li herêma Kurdistanê ewlekariyeke berbiçav amade kiribû û bazirganî ji Osmaniyan bêtir li vê herêmê bi rêk û pêk bû. Osmanî bi şerê Rûsan ve mijûl bû û jar ketibû. Serhildana şêx di nava Kurdan de deng da û Kurdên herdû perçeyan li dora xwe civand. Tevgera Şêx tevgereke neteweyî, Kurdistanî û demokratik bû. Helwesta Şêx serdemî û demokratîk bû. Wî serxwebûna Kurdistanê kiribû armanc. Ne Kurdistana Osmanî yan jî Kurdistana Iranê. Kûrdistaneke yekgirtî û serbixwediparast.

Şêx berevajî Bedirxaniyan bangî hemû kêmneteweyên Kurdistanê dikir û têkilî bi wan re datanî ku beşdarî şoreşê bibin. Şêx pirsgirêka Kurdistanê ne tenê pirsgirêka netewa Kurd didît. Wî pirsgirêk di çerçoweya Kurdistanî de didît. Loma jî bi Sụryan, Ermen, Kel-

dan, Ereb,Yezîd hemû kêmneteweyan û olên cuda re têkilî datanî û daxwazên wan dida ber çavan.

Şoreşa Şêx ne ji bona perçeyekî Kurdistanê lê ji bona hemû Kurdistanê bû. Şêx yekîtiya Kurdan û yekîtiya kêmneteweyên Kurdistaniyan bingeha şoreşê didît. Şêx dixwest hemû Kurdistanî beşdarî şerê serxwebûnê bibin. Di dema şêx de Balkan, Misir, Tunûs, Kibris ji bin destên Osmaniyan derketiye. Pirsgirêka Ermeniyan mezin bûye û Ermenî dewleta xwe dixwestin. Ingîlîz, Rûs, Fransiz planên parvekirina Osmaniyan çê dikin. Iran di şerê bi der û dora xwe re lawaz bûye û pirsgirêkên netewa û yên olî û civakî li Îranê qels kiribû.

Li Gor belgeyên Osmaniyan tevgera şêx tevgera avakirina dewleteke Kurdistanî serbixwe ye. Osmanî-Sefawî di gel hemû nakokiyên xwe ve bi alîkariya Rûsan ya leşkerî li dijî şoreşa Şêx peyman çêkirine. Ev bi xwe rê dide ku tevgera Şêx ne tevgereke herêmî bûye û him Osmaniyan û him jî Sefawiyan û Rûsan jî xistine nava tirsê. Şêx di tengasiya xwe de eşîrên Ereb û Suryaniyan li ba xwe dibîne. Şêx di dostaniya kêmnetewan de stratejîk fikiriye. Yekîtiya Ermen û Kurdan gelekî girîng digre, qîmetê didê. Şêx di têkiliyên xwe yên navnetweyi de biserketî bûye lê dewletên weke Îngîlîz, Rûs, Fransizî alikariya şêx nekirine. Belgeyên Osmaniyan nîşan dikin ku Osmanî baş hay ji stratejiya Şêx ya serxwebûna Kurdistanê heye. Emerîka, îngîlîz, Rûs alîkariya Îranê dikin. Avusturî jî alîkariya Osmaniyan dikin. Dinya li ser serê şêx dibe yek.

**Şêx di şerê dijî Sefawiyan de gelek herêmên Kurdistana Rojhilat azad kiribû. Li hemû herêmên azad de Hukumeta demî ya Kurdistanî ava kiribû û bi vî awayî xweşiya azadî û serxwebûna Kurdistanê di jiyanê de rê da bû.** Stratejiya şêx ya ku berê, ji bo azadiya Rojhilatê Kurdistanê bi dest bixe û dû re ji bo bakur û başûrê Kurdistanê çewt bû. Bi ya min ev stratejiya Şêx bûye yek ji sedemên têkçûna şoreşê. Li vir çewtiyek heye. Dema Osmanî qels ketîne Şêx berê xwe daye Sefawiyan. Çima? Ji bona ku Osmanî Sunni bû û ev bi xwe jî şêx tirsandiye. Kurd jî piraniya wan sunnî ne û Şêx tirsiya ye ku Kurd piştgiriya şoreşê nekin. Lê wê beşdarî şoreşa li dijî Sefawiyan bibin loma Sefawî şîî ye. Her wiha nakokiyên Îran û yên Osmaniyan jî rê ji Şêx re vekiriye ku şerê Îranê bike. Piştî azadiya Rojhilat bi hêzeke

mezin wê bakur û Başûr jî azad bikiraya. Lê ev stratejiya Şêx çewt derketiye. Di gel hemû nakokiyan ve dewletên Emperyal, Osmanî û Sefawiyan li dijî Şêx anîne ba hev. Stratejiya rast ewe bû ku şerê li dijî Osmaniyan berdewam bikiraya. Wê gavê guman be jî belkî alîkariya Îngilîz û Rûsan wer bigirtaya. Lewra wê demê ji aliyekî ve Rûs ji aliyekî din ve jî Îngilîzan li ser xaka Îranê hesabên xwe dikirin û dîtine ku Şêx hesabên wan têk dibe. Lê di wê demê de perçekirina dewleta Osmanî di rojevê deye û ev bi xwe sedemeke girîng dida destê dewletên mezin ku alîkariya Sêx bikirana. Heger alîkariya Şêx nekirana jî dibe ku alîkariya Osmaniyan nekiribana.

Weke Mînorskî dibêje, "Tevgera şêx ya neteweyî û serdemî" bi hevkariya dijminên netewa Kurd û bi alîkariya dewletên dagirker û dewletên emperyal ve tê rûxandin. Şêx di nameya xwe ya ji Dr. Kohran re wiha dibêje: " **Kurd neteweyeke cûda ye, ola wan cihê ye, adet û kevneşopiyên wan cihê ne û taybetmendin.**" Ev şîrovekirina ha ya şêxê Kurd şîrovekirina Kurdan weke neteweyeke serdemî bi xwe ye. Di vê çerçoweyê de mirov dikare bi rehetî bêje tevgera yekemîn ya neteweyî, ya Şêxê nemir Şêx Ubeydullahê Nehrî ye. Berdewamiya tevgera Şêx Ubeydulahê Nehrî, tevgera Şêx Ebdulselamê Barzanî dest pê kiriye. Binêre beşê Iraqê.

### Berî şerê cîhanê yê yekem

Di dawiya sedsala 19'an de Dewleta Osmanî gelek xakên dagirkirî ji destê xwe berdabû. Li vir naxwazim bi dirêjayî bahs bikim. Lê pir eşkereye ku Dewleta Osmanî giringiya mezin daye ser Stenbol, Kurdistan û Ermenîstanê. Xaka Iraq û Suriyê ta radeyekê girîng girtiye lê dawî dev ji vê xakê jî berdeye. Kemalîstan jî ev siyaset berdewam kirine.

Di dema berî şerê cîhanê yê yekem de civata Kurd, bi pêşveçûna siyasî, aborî û komelayetî ve amadeyiyên xwe yên avakirina netewe-dewlet xelas nekiribûn. Bi ya min di nava Kurdan de bîr û baweriyên netewayetî û ramanên avakirina netewe-dewlet beriya şerê cîhanê û di dema şerê cîhanê de ne bihêz bû. Lê dewletên mezin weke Ingîlîzan, Fransizan, Rûsan, bixwestana wê Kurdistanek ava kiribana. Lewra ne Tirkan, ne Farisan, û ne jî Ereban weke neteweyên serdemî xwe amade nekiribûn. Lê dewletên mezin ji bona berjewendiyên xwe û li gor

mêzîn û balansa siyaseta navneteweyî û ya Rojhilata Navîn dewletnetewe yên wan ji tuneyî ava kirinin.

## Sedemên sedaman

Berî şerê yekem û di dema wê de dewletên mezin ku yek ji wana Ingîlîz in, Kurdistanekê dixwazin lê tixûbê wê sînorkirî ye. Ango Kurdistaneke biçûk. Rûsya Ermenîstaneke mezin dixwaze. Ingîlîz dîsa dewleteke Tirk dixwaze lê li nava Anatoliyê. Tixûbên dewletên nû yên ji nava dewleta Osmanî yên Îngilîz dixwazin bên ava kirin ne zelal in. Dewletên mezin li gor rewşa Rojhilata Navîn û rewşa dinyayê siyaseta xwe guhertine. Yek ji sedemên guherandina siyaseta Dewletên mezin, Tevgera Bolşewîkan e. Piştî şerê cîhanê yê yekem Serweriya Bolşewîkan nêrînên hemû cîhanê guhertin. Lê bêtir yên Ingîlîzan û Fransizan û Italiyan guherand. Ew Tirsiyane û xwestine pêşiya berfirehbûyina ramanên Bolşewîkan (sosyalîzmê) bigrin.

Ji aliyê Iskandînavyayê û Ewrupa Rojhilat ve pêşiya Bolşewîkan digirtin. Li Rojhilata Navîn jî dewleta Osmanî û Iran dikaribûn pêşiya wê bigrin. Osmanî di şerê parastina xaka Kurdistanê û Ermenîstanê debûn û rûxandina dewleta Osmanî dihate plankirin. Tirkîtî hemû mecalên dewletê yên leşkerî, aborî, dîplomasî û siyasî bikar dianîn û bi hêz dibû. Dewletên mezin ev dîtin û destên xwe dirêjî Itihadî-Kemalîstan kirin. Xwestin bi rêya Kemalîstan pêşiya Bolsewîkan bigirin. Kemalîstan jî xwestin dengê Bolşewîkan yên parastina mafê çarenivisiya netewa kêm bikin. Ataturk bi devkî be jî mafê çarenivisiya netewa qebûl dikir. Kemalistan dengên xwe ji bona Mûsil û aliyê Suriyê birîn û şertên xwe jî pêşkêşî Ingîlîzan kirin. Wan dixwestin Ingîlîz dev ji ramanên avakirina Kurdistan û Ermenîstanê berdin. Planên wan yên avakirina dewletên Ereban qebûl dikirin. Welewkî nakokî dinavbeyna wan de hebûn jî bi esasê xwe li hev kiribûn. Ingîlîz û Fransizan ji bilî dev ji avakirina Kurdistanê berdin, şerê li dijî Kurdan gûr kiribûn. Rûsan bi Kemalîstan re li hev kiribûn. Kemalîstan Ezarbeycan, Gûrcîhstan û heta dewletên Kafkasya yê teslîmî Bolşewîkan kiribû û weke berdêl devjêberdana Bolşewîkan ji bona Ermenîstan û Kurdistan bû.

Ji aliyekî ve dewletên Emperyal di gel û bi prensîbên Wilsonî û Bolşewîkan jî di gel mafê carenûsiyê, dijberiya Kurd û Ermenan kirin û

Kemalîst biserxistin. Di vê bûyera mezin de Demokrasî, mafê mirova, mafê carenûsî yê neteweyan û hemû mafên kesayetî binpê kirin. Bi gelemperî mafê mirovî bû qûrbana Berjewendiyên dewletên mezin.

Ereb ji Kurdan xerabtir bûn. Bûbûn sed perçeyî û ramanên neteweyî wê gavê li cem Ereban ne bi hêz bû. Îro jî li cem wan ne bi hêz e. Lê bi destên dewletên emperyal ve dewletên eşîrî, qabîleyî, melekî, prensî bi navê netewe-dewlet avakirin û Ereb kirin xwedî dewlet. Lê ew jî perçekirin. Bingeha avakirina dewleteke Erebî ne wê rojê hebû û ne jî îro heye. Dikaribûn Kurdistanê jî perçe perçe avabikin, lê biya min di serî de Ingîlîzan, lê herwiha Rûs û Fransan jî avakirina Kurdistanê ne xwestin e. Kurd wê demê bi hêza xwe ya neteweyî ne di asteke bilind de bûn û nikaribûn xwe bi qebûlkirin bidin.

Ger dewleta Kurdî di nava vê derfetê de nehatibe ava kirin sedema sereke Kurd bi xwe ne. Sedema duyem jî Ermen bi xwe bûne. Wan bawer dikirin ku wê Rûs û Ingîlîz dewleta wan ava bikin. Ji xwe pêwîstiya wan bi Kurdan nema bû. Loma jî hemû daxwaz û hêviyên Kurdan bi şûnda vegerandin. Wan li herêma Ermenîstan-Kurdistanê ji xwe dewlet avakiribûn. Lê hêvî nedidan Kurdan. Heta dijberiya Kurdan kirin û Kurd berê xistin paxila Osmaniyan û dû re jî ya Kemalîstan.

## Netewayetiya Kurdan piştî şerê cîhanê û perçebûna Osamniyan

Di vê demê de ramanên netewayetî li Ewropa û di nava neteweyên Ewrupî yên dewleta Osmanî de berfireh bûn. Balkanî serbixwe dibûn û Osmaniyan nikaribûn pêşiya vê hêzê bigirtana. Herwiha li Efrika jî dewletên Ereban ji bin destên Osmaniyan derdiketin.Tirkîtî jî di nava Osmaniyan de pêşde diçû û dezgehên Itihadiyan berfireh dibûn. Ermeniyan dest bi avakirina dewleta xwe dikirin. Dengên parvekirina Dewleta Osmanî her roj dihat guhê ronakbîrên Kurdan.

Damezrandina Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê avêtina tovê organîzekirina neteweya Kurd e. Bandora Itihadiyan li ser Kurdan bi erênî bûye. Bihêzbûyina Itihadiyan bi navê Tirkîti, ronakbîrên Kurd ber bi organîzekirina Kurdistaniyê ve birine. Ev tevger bûye encama yekgirtina bi Komeleya Azadî ve avakirina Komîteya Istiqlalê ya Kurdistanê. Ev bi xwe jî bûye yek ji wan encamên amadekirina ser-

hildana Koçgirî û ya Şex Seîd. Pir eşkere ye ku ev tevger tevgereke ronakbîriya Kurd e û ne tevgereke gelêrî û kîtlewî ye. Welewkî gelek hemal û xebatkarên Kurd jî di nava xwe de organîze jî kiribe dîsa karaktera wê ya ronakbîriya Kurd e. Lê ji aliyekî din jî mirov karektera tevgerekê ne bi endamên wê tenê lê herwiha bi bandora wê ya siyasî li ser civakê ve dikare şîrove bike. Vê tevgerê xwestiye bandora xwe li zahmetkêşên Kurdan jî bike. Di vê demê de netewayetiya Kurdan bi pirnasnameyî ve lawaz bûye. Daxwazên netewayetî jî bi pirnasnameyetiya neteweyî ve aloz bûye. Daxwazên Kurdan li hev nehatine ragirtin.

## Piştî şerê cîhanê yê yekem û Konferansa Fransayê

**-Sewrê-**

Ev konferans di 18/1-1919'an de li Parîsê bi beşdariya 32 dewletan ve civiya. Di vê konferansê de giraniya Îngilîzan, Fransizan û Emerikan sereke ye. Konferans bi sedemên peydakirina çareseriyên pirsgirêkên şerê cîhanê yê yekem ve civiyabû. Pirsgirêkên sereke ev bûn:

1-Tixûbên Ewrupa ji nû ve dihate pejirandin. Awusturya perçe dibû û macariyan û gelek neteweyên din dewletên xwe yên serbixwe ava dikirin.

2- Parvekirina Dewleta Osmanî wê li ser bingeha neteweyan pêk bihata û wê tixûbên Rojhilata Navîn ji nû va bihata destnîşankirin. Pirsgirêkên neteweyên Dewleta Osmanî û berjewendiyên dewletên mezin çend pirsgirêkên sereke yên vê konferansê bûn. Di destpêka konferansê de pirsa Ruman û xaka wan dibe pirsa sereke. Berjewendiyên Italiya û Yunana dibûn nakokiya sereke. Lê Ingilîz, Fransiz û Emerîkiyan destê Yunanan digirtin. Ev nakokî di konferansê de dibûn pirsgirêk. Italya di 22/3 1919'an de, berê Antalya û dû re gelek girav û herêmên din yên Yunaniyan li wan xwedî derdiketin dagir kiribû. Helwesta Dewletên din li himber Italya dijwar bû û Italya ji konferansê derketibû.

Konferans biryareke girîng digire. Rojavayê Anatolyê didin Yunanan. Başûrê Anatolyê didin Italyan, Kurdistan û Ermenîstan jî di-

din mandatiya Emerika. Filistîn û Iraq ji Îngilîzan, Suriye û Libnan jî Fransa digirin.

Hersê dewlet û Yunanan di 15/5-1919'an de Izmîrê dixin destên xwe. Lê di vê navberê de Willson bi biryara Kongreyê 14 prensîbên Emerîkayê pêşkêşî konferansê dike û bi van prensîbana ve hemû peymanên berê, hebûna xwe wenda dikin. Li vir cara yekem binavkirina Mandatî tê holê. Ev jî ji bona neteweyên xwedêgiravî nikarin xwe bi rêve bibin. Wê dibin mandatiya wan dewletan de xwe bi rêve bivirina.

Konferansa Parîsê di demeke girîng de dest pê kiriye. Serencama vê konferansê peymana Sewrê ye. Wê gavê sê hêzên dijber ji nava dewleta Osmanî namzedên vê civînê ne. Hêza yekem ya Osmaniyan ya hukumeta Istanbulê ye. Yên muxalif jî ya yekem hêza Kemalistan e û dest bi avakirina hukumeta Enqerê kirine. Ew beşdarî konferansê nabin û dijberiya konferansê dikin. Duyem hêza Ermeniyanne û ya sêyem jî hêza Kurdan e. Hersê dewletên mezin Kurd, Ermen, Ereb û Rûman jî beşdarî konferansê dikin.

## Konferansa Sewrê

Berî em bi hûr û kûr têkevin nav vê peymanê, divê ez bêjim cara yekemîn e ku di dîroka Kurdistanê de bi peymanek navneteweyî biryara avakirina dewleta Kurd, Kurdistan hatiye qebûlkirin. Kurd divê herdem vî mafê xwe yê navneteweyî bînin zimên. Divê Kurd îro jî rê bidin ku wan dev ji biryarên vê peymanê bernedane. Lozan ji bona Tirk û Bolşewîkan çibe, Sewr jî ji bo Kurd û Ermeniyan ew e. Kurdên li Sewrê xwedî dernakevin, lê li lozanê xwedî derdikevin çewt tevdigerin.

Peymana Sewrê berdewama konferansa parîsê ye. Bi vê konferansê ve bi kêmanî be jî, cara yekemîn e vîna-îradeya- Kurdan jî di nav de bi îradeyek navnetewî ve di sedsala 20'an de çarenûsa Kurdan hatiye ragihandin.

Di dawiya şerê yekemîn de dewletên hevpeyman bi peymana Mondorêse ve (1917-1918) dewleta Osmanî dagir kirin. Di vê wextê de Aliyekî xaka Kurdistanê û Ermenîstanê di bin serweriya Ermeniyan de bûn. Ermeniyan him alîkariya Rûsan him jî alîkariya Îngilîzan digirt

in. Di vê demê de Ermeniyan berevajî baweriyê bidin Kurdan li ser xaka Kudistanê doza axê dikin û Kurdan ditirsînin. Pirsa xaka Kurdistanê û Ermenîstanê dikeve nav hev û nakokî di nava wan de peyda dikir. Ev nakokî di prosesa peymana Sewrê de jî derdikeve holê. Kurdan di vê demê de ji Ermeniyan bêtir baweriya xwe didan Rûsan. Lê ev jî ne çareserî bû lewra Rûsan piştî Şoreşa Oktobrê **"perçe dikirin qûrbana tevayiyê"** û loma Kurd dihatin firotin. Piştî Şoreşa Oktobrê Kurd mecbûr dibûn biryara xwe bidin. Rûsî, ji Kurdistan-Ermenîstanê vedikşiyan û Osmanî diketin vê derê. Li vir Kurdan di biryara xwe de zahmetî dikşandin. Ji aliyekî Ermenî û ji aliyekî ve Osmanî. Di nava şerê wan de diman. Lê ji bona ku Ermeniyan bawerî nedidan Kurdan, Kurd bêtir bi ser Osmaniyan ve diçûn. Vê rewşê heta sala1920'an dewam kir.

Di vê demê de Kurd ne li ser hev bûn. Ev jî dibû sedema ku Kurdan nikaribûn dewleta xwe ya serbixwe ragihênin raya cihanê. Piştî vekşandina Rûsan Kurd li vê herêmê belawela lê bêyî serweriya tu kesan dijîn. Di vê demê de Ataturk ji aliyê Osmaniyan ve li ser navê dewleta Osmanî weke berdevkê Sûltan tê herêma Kurdistanê û têkilî bi Kurdan re datîne.

Di vê demê de Ingîlîzan jî bi awayekî qels soza dewleta Kurdî didan. Ev bi xwe jî dibû sedema pasîfîzekirina Kurdan. Kemalîstan bi Bolşewîkan û Ingîlîzan û bi aliyekî Kurdan ve lihev dikir û li Ermeniyan dixistin. Kemalîst mecbûrî Kurdan bûn. Di vê demê de navbeyna Kurd û Îngilîzan ne xerab bû. Lê Ingîlîzan bawerî nedidan Kurdan. Kurd jî bêyî tevgereke neteweyî û yekgirtî bela wela li wê navberê de diman. Kurd di rewşeke wiha de beşdarî peymana Sewrê dibûn.

## Peymana Sewrê

Berevajî tevgera Kurdan dinya yê alîkariya Ermeniyan dikir. Ermenî xwedî hêz û xwedî tevger bûn. Ji ber vê jî Ermeniyan bala xwe zêde nedidan hevkariya bi Kurdan re. Osmanî bi navê serweriya Stenbolê beşdarî Konferansê dibûn. Kemalîstan jî taze bingeha hukumeta Enqereyê avadikirin. Ji aliyê dadwerî ve hukûmeta Enqereyê ne xwedî gotine û tu serweriya wê ya yasayî tunebû. Baravajî vê, Enqera bi meclîsa xwe ve wê demê hînê dijî Sultan tevnagere û li ser navê Sûltan dixebite.

Konferans di 22/4-1920'an de civiya. Osmanî bi heyeta xwe beşdarî civînê bûn. Kemalîstan jî di 30/4-1920'an de bi zû hukumeta Enqerê ku bi yasayî îradeya kesekî temsîl nadikir ava dikin û ji hemû hukûmetên beşdarên konferansê re rayên xwe rê dikin. Hukumeta Osmanî ya Stenbolê, hukûmeta Enqereyê meşrû nabîne.

Di nava Ermeniyan de gelek tevger hebûn û wan li hev nedikirin. Lê delegasyona Kurdan bi yek dengî temsîla Kurdan dikir. Şerîf Paşa serokê delegasyonê bû. Ji xwe tu alternatîfekî din ya Kurdan tunebû. Şerîf Paşa ne bi dengên Kurdan hatibû hilbijartin. Lê alîkariya Eşîr û tevger û ronakbîrên Kurd digirt û temsîliya Kurdan dikir. Nêrîna delegasyonê li ser dewleta serbixwe ne zelal bû, lê her dîsa jî Kurdistaneke serbixwe diparast. Daxwazên Kurd û Ermenan tevlihev dibûn û ev jî di nava delegasyonan de nakokî peyda dikirin. Di sala 1919'an de herdû delegasyonan li ser peymaneke yekîtiyê li hev kirin û daxwazên xwe ji dinyayê re ragihandin. Delegasyona Kurd û ya Ermenan ev peyman qebûl kirin. Vê peymanê ji aliyekî ve Kemalîst ji aliyekî din ve Bolşewîk tirsandibû. Lê ev peyman him darbeyek li Osmaniyan û him jî li Kemalîstan dixist. Kesekî bawer nedikir ku wê Kurd û Ermen li hev bikin. Vê peymanê, Herî bêtir Kemalîst dixist nava nerehetiyeke mezin. Ev peyman weke encama dîplomasiya Şerîf Paşa ya biserketî ve tête nîşandan. Kemalîstan zû be zû berê xwe didan Kurdan û alîkariya wan dixwestin û hinek soz didan Kurdan. Nakokiyên Kurd û Ermenan derdixistin pêş û dixwestin wan bînin himberî hev. Lê Kurd û Ermenan bi delegasyonên xwe ve bersiva dinyayê didan û daxwaza serxwebûna dewleta Ermenî û Kurdistanî pir bi eşkereyî radigihandin û nelihevkirina tixûbên dewleta Ermenî û Kurdistanî radestî biryarên konferansê dikirin û rêzgirtina ji bona biryara konferansê bingeh digirtin. Di vê demê de Ataturk, hinek gotina li ser Kurdan û mafên wan dibêje. Lê ev ne nêrînên stratejiya Kemalîstan bûn. Yên xapandina Kurdan bûn.

Konferansa Sewrê di 10/8-1920'an de biryara xwe girt û daxwazên Kurd û Ermenan hate qebûlkirin. Hukumeta Osmanî jî ev biryar qebul kir. Lê propagandeya Kemalîstan ku dibêjin padîşah vê peymanê îmze nekiriye, nerast e. Bi gelek çîrokan, vê peymanê nepejirandî xuya dikin. Lê nerast e. Padîşah jî ev peyman pejirandiye û binê wê welewkî bêdilê xwe be jî imze kiriye.

Propagandeyeke Kemalîstan din jî heye ku ew jî ne rast e. Di dema amadekariyên Sewrê de Ataturk, "Kongreya Rojhilat" 23/7-1919'an de li Erzuromê dicivîne û bangî Kurdan dike. Lê tucaran bangî Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê nekirî ye. Bangî yeko yeko eşîrên Kurdan kiriye. Di vê kongreyê de xaka Kurdistanê weke xaka Osmanî ku jê nayê parvekirin binav kiriye. Doza Kurdan ne weke doza netewayekî lê weke tevgereke ji derve pîlankirî û bi dijminî tête şîrovekirin. Di hinek gotin û beyanan de bahsa Kurdan kiribe jî, vê rastiya Kemalîstan ya şowen naguherîne.

Lawrence Kurd, E.D.C Noel, li ser navê Îngilîzan li Kurdistanê digeriya û rapora xwe dinivîsand. Ew berevajî gotinên Kemalîstan dibêje li Kurdistanê Tirk tunene. Tenê çend memûr hene. Loma Kurdistana serbixwe bi alîkariya Îngilîzan rast dibîne. Bi van gotinên xwe nêrînên Kemalîstan vala derdixe. Loma jî Kemalîst ji wî aciz bûn û dixwestin wî bikujin. Gotinên Lawrance ji bo bakurê Kurdistanê ya dîrokê girîng in.

Bi peymana Sewrê ve pirsa statukoya siyasî û coxrafî ya Rojhilata Navîn dihate holê. Kurdan bi vê peymanê ve cara yekem pêngava xwe diavêtin nava civata navneteweyî û dibûn xwedî heq û xwedî huqûk. Lewra cara yekeme ku dewletên hevpeyman û yên ne hevpeyman pirsgirêka neteweya Kurd bi çerçoveyeke siyasî, yasayî û hukûqî ve bi îradeya Kurd ve jî girêdayî çareser dike. Lê ev nedihate hesabê Bolşewîk û Kemalîstan.

**Peymana Sewrê madde 62-64: Di bin çavdêriya heyeteke Ingîlîz, Fransiz û Îtalî de li der û dora Rojhilata Firatê de wê serweriya Kurdan bête avakirin û Kurd bixwazin piştî salekê wê bikaribin daxwaza dewleteke serbixwe bikin. Vê biryarê jî radestî Neteweyên Yekbûyî dike. Ev biryar çiqasî raste rast dewleteke mezin li ser xaka Kurdistanê nayîne zimên jî weke yasayeke navneteweyî qebulkirina avakirina Kurdistaneke bi sînor (ku sînorên wê jî ne zelal e) gelekî girîng dibînim.**

Di sala 1921'ê de berevajî vê biryarê devjeniyeke nuh dihate destpêkirin. Bolşewîkan û Kemalîstan ev peyman qebûl nedikirin. Bolşewîkan, dewleta Ezarbeycanê di sala 1920'an de dagir kiribûn û bi Sovyetê ve girêdabûn. Her wiha berbi welatên din yên Kafqasî ve

diçûn û ew der jî dagir dikirin. Armanca Sowyetê ewlekariya dewleta sosyalîst ya Rûsya bi xwe bû. Hawirdorê wê bi ewlekariyê ve bi rê dikir. Hukûmeta nuh ya Ezarbeycanê ya Bolşewîkan weke diyarî bi tonan zêr û çek dane Kemalîstan. Fransa di sala 1920'an de bi Kemalîstan re peymanek çêkiribû û hukûmeta Kemalîstan bi fermî nas kiribû. Piştî vê peymanê di sala 1921ê de peymana fermî ya Enqereyê di navbeyna wan de tê îmzekirin. Fransa û Kemalîstan li hev kiribûn. Suriye di sala 1921'ê de bi qebûlkirina Kemalîstan ve bi biryara Neteweyên Yekbûyî ve kete bin mandata Fransayê. Kemalîstan, Fransa û Bolşewîk qane kiribûn. Nakokiyên navbeyna xwe bi vî awayî çareser kiribûn. Nakokiya wan û Îngilîzan mabû.

Di vê navberê de di navbeyna Ingîlîz û Fransizan de tixûbê (sînor) Iraq û Suriyê hate kişandin. Italya ciyê dagir kiribû berdida û ji vê helwesta Îngilîzan aciz bû. Emerîka ji xwe dawî beşdarî vê pêvajoyê bû û tiştekî ciddî bidest nexistibû. Wan hemûyan li hev kiribûn. Cîh bi cîh Îngilîzan daxwazên Kurdan bilêv dikirin lê têr nedikir. Ingilîz ketibûn rewşeke zahmet. Şoreşa Koçgirî li dijî Osmaniyan dest pê kiribû. Rûxandina Koçgirî ji aliyê dewletên hevpeyman ve hatibû qebûlkirin. Kesekî ji wana dengê xwe li dijî Kemalîstan dernaxe. Bi kurtasî evana giş xuya dikin ku dewletên hevpeyman û Kemalîst û Bolşewîkan li hev kiribûn û dewleta Kurdistanî û Ermenîstana mezin nedixwestin.

Kurdan tucaran daxwazên xwe ji bîr nekirin û heta îro bêyî ku binav bikin ji bo daxwaz û biryarên Sewrê şer dikin. Dewletên hevpeyman soza xwe xwarin û alîkariya Kemalîstan kirin. Piştî hemiyan daxwazên xwe bi cîh anîn dest bi peymana Lozanê kirin. Di esasê xwe de Kurdistan ne bi biryara lozanê ve, lê nebicîhkirina biryarên Sewrê ve perçe kirin. Kurdistan bi awayekî perçebûyî gîhişt peymana Lozanê. Lozan perçebûna Kurdistanê weke yasaya ne huquqî qebul kirî ye. Ji xwe peymana Lozanê bi destê Bolşewîk û Kemalîstan dikete rojevê, lê herwiha bi alîkariya dewletên hevpeyman yên sermayedar ve jî gîhiştiye armanca xwe. Di vê peymanê de temsîliya Kurdan tune ye û serhildanên Kurdan berdewam dikin.

Kemalîstan pirsgirêka Musilê û tixûbên Iraq-Tirkiyê qebûl dikirin û bi Ingîlîz û Fransizan ve lihev dikirin. Ji xwe navbeyna wan û Bolşewîkan baş bû. Kurdan jî bi hêzeke lihevkirî û serdemî ji bo

bicîhkirina biryarên Sewrê xebat nekirine. **Kemalîstan wan bi hinek cil û bergên Kurdî beşdarî meclîsa Enqereyê dikirin û digotin: "ev welat yê Tirk û Kurdan e". Lê peymana Sewrê dijminê me herdû yan e.** Di pêvajoya Lozanê de Kurdan dengekî mezin dernexistin û beşdarî konferansê nebûn. Ji xwe kesekî jî bangî wan nekir û Kurd nexistin hesêb. Berevajî Sewrê, di peymana Lozanê de vîn û hestên Kurdan qet tuneye. Loma jî perçebûna Kurdan ne meşrû ye û ji xwe Kurdan tucarî ev perçebûn qebûl nekirine.

Kemalîstan perçebûna Kurdistanê ji dil û can dixwestin. Bi vê perçebûnê dikaribûn bi asanî bakur di bin destên xwe de bihêlin. Pirsgirêka Musilê ji bingeh de derewe û tenê ji bo hinek daxwazên xwe bi Îngilîzan ve qebulkirin bidin, didan pêş.

Neteweyeke perçebûyî, weke mêjiyê miroveki yê perçebûyî ye. Ji xwe yek ji bingeha sîstema Kolonyalîst jî perçekirina neteweyan bi xwe ye. Weke li jorê min aniye zimên Kemalîstan jî di vê rastiyê de têgîhiştine û loma jî perçekirina Kurdistanê xwestine. Perçekirina neteweyekê, serweriya kolonyalîstan rehet dike. Perçekirina xaka neteweya Kurd, mêjî û vîna Kurd bela û wela kiriye. Kurd piştî perçebuna xaka xwe weke neteweyeke yekgirtî tev nagere. Kurd bi vî awayî ji hev hatine bi dûrxistin. Bi vê dûrxistinê ve ziman û çanda Kurd jî dikeve nava cûdahiyên berbiçav. Kurd êdî ji hev fêhm nakin. Vê perçebunê realîteyeke berbiçav derxistiye holê. Dervî vîn û hesta neteweya Kurd, li her perçeyekî pêvajoya siyasî, çandî û prosesa netewayetî ne weke hev pêşda çûye û cûdahiyeke berbiçav peyda kiriye. Îro zahmetiyên Kurdan yê yek neteweyî, yek zimanî, yek xakî û yek çandî xwe di her qada têkoşînê de xuya dike. Kurdan gelek caran bi hewildanên weke yek neteweyî kar kirine lê dîsa jî cûdabûnên wan eşkere ye û her dem ev perçebûn bûye sedemên cûdabûnên yeknetewayetiya Kurd.

### Bakurê Kurdistanê

**Li dijî dewleta Kemalîst ya Komara Tirk tevgerên wekî Qoçgirî (1919), Şêx Seîd(1925), Agirî(1930), Dêrsim(1937-38) pêk hatin. Digel bedêlên giran jî dîsa jî tevgerên neteweyî yên bakurê Kurdistanê bi ser neketin. Sedemên navxweyî û yên navneteweyî têkçûna van tevgerana hêsan kiriye. Di dawiya şerê yekemîn de, di nava planên**

**dewletên mezin de ku dixwestin herêmê ji nû ve bi statuyeke nû bivejînin, ji bo Kurdan projeyeke ciddî tunebû.**

Ji bilî Koçgirî serhildanên hatine binavkirin di dema komarê de (Komara Tirkiyê de) pêk hatin in. Şoreşa Koçgirî di demeke dîrokî de dest pê kir. Ji aliyekî ve Italiya, Fransa û Ingîlîz û ji aliyê din ve Yunanî ketibûn nava sînorên Dewleta Osmanî û gelek cîh dagir kiribûn. Şerê Ermeniyan jî berdewam bû. Heleb- Şam ji dest derketibûn. Cara yekemîn bû ku tevgereke Kurd ya neteweyî, serokatiya şoreşekê li bakurê Kurdistanê dike. Ev gaveke dîrokî û neteweyî ye ku, bandora xwe li ser tevgerên neteweyî yên sedsala 20'an kiriye. Di vê demê de tevgera Tirkîtî ya neteweperest jî bi hêz dibû. Mustefa Kemal Ataturk, li ser navê dewleta Osmanî hatiye Kurdistanê û dest bi organîzekirina Kurdan kiriye. Di 19/5-1919'an de Ataturk dihare Samsunê, name û nûçeya ji eşîretên Kurdan re dişîne û ji wan daxwaza beşdarîkirina konferansa Samsunê dike. Di nameyên xwe de Ataturk mafê Kurdan diparêze û alîkariya wan dixwaze. Ataturk ji aliyekî ve bi navê Tirkîtiyê kar dike û ji aliyê din ve jî girêdayî Hukumeta Stenbolê tevdigere. Derfet û hêza dewletê dixe berjewendiya tevgera xwe. Di wê demê de Konferansa Sewrê dest pê kiriye û Kurd û Ermen bi zaneyî mafê xwe diparêzin.

## Armanca Mustafa Kemal (Ataturk)

Armanca Ataturk, bandora Îngilîzan ya li ser herêmê lawaz bike. Wê demê tenê Ingîlîzan mafê neteweyan diparast in. Yên din bi Kemal û Osmaniyan re tekilî danîbûn. Kemal dixwest Kurd û Îngilîzan bîne hemberî hev. Hevkariya Kurd- Ermenan xerab bike. Kurd–Ermenan dest bi avakirina protokola Sewrê kiribûn. Loma Ataturk zû bi zû biryara avakirina meclîsa Enqereyê dide û bingeha dewleta Tirk ava dike. Têkiliya xwe bi Bolşewîkan re datîne û li dijî daxwazên Kurd-Ermeniyan kar dike. Bolşewîk-Kemalîstan li dijî Kurd-Ermenan li hev kiribûn.

## Koçgirî:

Di sala 1919'an de û di meha nehê de Osmaniyan bi alîkariya Kurdan dixwestin Ataturk bigrin. Wê gavê Ataturk, li Sîwasê civîna meclîsa Enqereyê dicivand. Osmaniyan dixwestin ev civîn têk biçe.

Di wê navberê de Ataturk bi Cemiyeta Taalî ya Kurdistanê re têkilî datîne lê li hev nakin. Wê gavê Ataturk bi endamên Kurd yên meclîsê re dixwaze nameyekê bişîne konferansa Sewrê û bêjin da ku Kurd ne bi delegasyona Kurdan re ne. Lê Cemiyta Kurdistan plan û lîstêkên Ataturk têk dibe.

Nameyekê ji konferansê re rê dike û dibêje Kurd ne bi nameya Ataturk re ne û loma ev tenê ramanên Ataturk in û Kurd van ramanana napejirînin. Ataturk gelek aciz dibe û berê xwe dide Cemiyeta Kurdistanê. Cemiyeta Kurdistanê bangî Kurdan dike û dixwaze hemû kes beşdarî şoresa Koçgirî bibin. Bangî Elewiyan, Suniyan, Naqşîbendiyan, Qadiriyan û hemû Kurdan dike. Di vê demê de di 25/10-1920'an de daxwazên Kurdan dişîne ji hukumeta Enqereyê re û daxwaza mafê Kurdan zelal dike. Şoreş geş dibe. Cemiyeta Kurdistan û şoreşa Koçgirî ji bo bicîhkirina biryarên Sewrê têdikoşin. Di vê şoreşê de Kemalîst û Osmaniyan bi hevre li dijî Kurdan şer kirin û şoreş di nîsana sala 1921'ê de ji aliyê Kemalîstan ve bi awayekî hovane tête ruxandin.

Şoreşa şêx Seid, (1925,) şoreşa Agirî-Ararat (1930), û şoreşa Dêrsim (1938) berdewamên hev in. Di eslê xwe de hemû berdewama şoresa Koçgirî ne. Di van deman de ne statukoya cîhanê ne jî ya Rojhilata Navîn ji bo avakirina dewleteke Kurd amade bû. Berjewendiyên cîhanê û yên dewletên Rojhilata Navîn, ku piranî dagirkerên Kurdistanê ne û berjewendiyên Kurdan li hev ne dikirin. Dewletên emperyal bi her awayî bi dewleta Tirk re bûn. Şoresa Şêx Seîd piştî şerê cîhanê û piştî peymanên navneteweyî ku yek ji wana jî peymana lozanê ye, pêk hatibûn, dest pê kiriye. Cîhana sosyalîst û ya Emperyalist pêdiviyên xwe bidest xistibûn û êdî tevliheviyeke nuh ku dikribû biba nearamiya Rojhilata Navîn nedixwestin. Şoreşa Şêx Seîd bêyî pêdiviyên şoreşê amade bike dest pê kir û serokên Kurdan yên dikaribûn şoreşê bi rêve bibin zû eşkere bûn û hatin girtin. Kemalîstan dest bi tunekirina Kurdan kiribûn û dengên Kurdan nediçû cîhanê.

Şoreşa Şêx Seîd şoreşeke klasîk bû û him hunandina şoreşê û him jî hêzên şoreşê bêyî organîzeyeke serdemî telef dibû. Hersê şoreşên bakurê Kurdistanê kêm zêde wekî hev dest pê kirine û tevayiya bakur nedane pêşiya xwe. Ji dêlva her herêm li çiyê xwe dest bi şoreşê bike

hêza şoreşê tenê li ciyekî merkezî (navendê) civandine û bûne hedefa dijmin. Ev çewtiyeke bingehîn bû. Kurdan bi hemû dezgehên xwe yên neteweyî jî hê wê gavê tevgereke neteweyî, gelêrî ku bikaribaya li gelek herêman dest bi şoreşê bikira tunebû. Tevgerên hebûn kêm hêz û tevgerên ronakbîrên Kurdan bûn. Bandoreke mezin li ser neteweya Kurdan nehiştibûn. Herwiha nakokiyên êşîrî, herêmî û olî dibûn sedemên qelskirina şoreşê. Şoreşên Kurdan bi piranî herêmî mane.

Bi wesîleya Tevgera Agiriyê, li hemberî xwestinên demokratîk û neteweyî yên Kurdan, helwesta dewleta Tirk di rojnameya Komarê (Cumhuriyetê) ya roja 16/7-1930'yî de wiha tê sîrove kirin. **"Di serê girên Agiriyê de 1500 eşqiyayên di kon û şikeftan de man in. Balafirên me bi awayekî tundrew wan eşqiyayana bombebaran dikin. Çiyayê Agirî her gav di nav agir û înfilaqê de dinale... Ew gundên ku xwe sipartine eşqiyayan bi temamî têne şewitandin. Ew ên ku di Tevgera Zîlanê de hatine îmhakirin hejmara wan nêzîkî 15.000 an in. Geliyê Zîlanê heta ber dev bi cendekan ve tije ye." Û di pey wê re di hejmara roja 31'ê Tebaxa 1930'yî de di rojnameya mîlliyet ê de, bi giştî li himberî grubên etnîkî yên din û bi taybetî jî li hemberî daxwazên neteweyî yên Kurdan siyaseta Dewleta Tirk wiha tê nivîsîn: "Di vî welatî de tenê neteweya Tirk dikare mafên etnîkî û netewî bixwaze, ji bilî wê mafê tu kesekî tune ye."**[118]

Ev daxuyaniyên ku ji devê kesên di dereca yekemîn de hatine eşkere kirin, li hemberî xwestinên neteweyî yên gelê Kurd polîtîka asîmlasyon, înkarkirin, tunekirin û qetil kirina Kurdan bi destê dewletê bi awayekî pir eşkere dide nîşandan. Kurdan bi daxwaza lêkolîna van bûyerana, hin caran serdana Neteweyên Yekgirtî û saziyên dadwerî û siyasî yên navneteweyî kirin, lê belê daxwaza wan di rojeva van dezgeha de cîh wernegirtiye.

Komara Tirk, li ser xaka neteweyên din bi nav û nîşanên etnîka Tirk û li ser navê "şaristaniyê û demokrasiyê" bi inkarkirina netewe û kêmneteweyên cûda hatiye ava kirin û loma jî ji bo me Kurdan ev statu ne rast e û divê bête guherîn. Desthilatdarên Komara Tirk ji amadeyiyên avakirina komarê û heta nuha, meşrûiyeta dewletê kiri-

118 Kovara *Bîrê*, Nezir Akat

ne pirsa sereke. Ji roja ev dewlet hatiye avakirin, hemû awa û aletên derbirînê, hemû dezgehên perwerdeyiyê, hemû gotin û devjenî, hemû dezgehên nivîsîn û weşana dîrokê, raman û mêjû, tenê, lê tenê di xizmeta meşrûiyeta vê dewletê de hatiye bikar anîn. Ji xwe pêwîst nakim ku vê înkarê û zilmê bînim zimên.

Piştî peymana Lozanê dewleta Tirk bi hemû kiryarên xwe yên şovenî, nîjadperestî û înkarê ve xwe sipartiye biryarên vê peymanê. Ev peyman bûye rêgeya tek û tenha ya kiryarên Komara Tirk. Di dema şoreşên bakurê Kurdistanê de, dewletên mezin bi dewletên serdest yên dagîkerên Kurdistanê ve li hev kirine. Rewşa navneteweyî ne li gora berjewendiyên Kurdan hatibûn hunandin. Kemalîstan ji aliyekî ve bi dewletên sermayedar re û ji aliyê din ve bi dewleta sosyalîst re têkiliyên berjewendî danîbû. Dema şoreşa Şêx Seîd, di sala 1925'an de Ingilîz û Kemalîstan lihevhatina li ser pirsgirêka Musilê eşkere dikirin. Çîrokên Kemalîstan li ser pirsa Kurdistanê ku bi midaxeleya Îngilîzan ve girê didin tenê dereweke mezin e. Pirsgirêk berevajî çîrokên Kemalîstan e. Fransî û Ingilîz û Emerîka jî bi wan re di vê demê de naxwazin pirsgirêka Kurdan ji nû va vekin û bikin nearamiya Rojhela Navîn û cîhanê.[119]

**Pirsgirêka bingehîn ya wê demê ev e**: Peyman û prensîbên navneteweyî, piştî peymana Lozanê û parvekirin û ji hev xistina Rojhilata Navîn, herwiha kişandina sînorên bêyî vîna netewa, raman û biryarên neguhertina sînoran bûye biryara sereke ya Neteweyên Yekbûyî (NY) û bûye biryara sereke ya welatên sermayedar û sosyalistan. Li ser vê biryarê li hev kirine û loma dawiyê ev biryara neguherîna sînoran xistine pêşiya pirsa çarenûsiyê. Hemû pirsgirêkên neteweyên Rojhilata Navîn weke pisgirêkên navxweyî yên wan dewletên dagirker şîrove kirine û destdirêjiya nava wan dewletana nekirine. Ji ber vê yekê pirsa Kurd û Kurdistanê tenê ser êşa wan dewletana bi xwe ye û loma jî dengê Kurdan nebihîstine. Berevajî vê dest dane destê Kemalîstan. Ji xwe Bolşewîkan hemû tevgerên Kurdan weke tevgerên kevneperest, paşverû û li diji şaristaniyê binav kirine. Ji bilî demeke kurt alîkariya

---

119 *Ulusal Sorun ve Çözüm Arayışı*, Nezir Akat, Helwest förlag/Yayınları İstanbul/ Stockholm-2010.

Barzaniyê nemir kirine. Lê dawiyê dîsa zîvirîne alîkariya seddam û yên wekî wî kirine.

Piştî têkçûna Tevgera Dêrsimê, li bakurê Kurdistanê bêdengiyek nedîtî dest pê kir. "Doza 49" an û bûyerên di pey wê re vê bêdengiyê şikand. Pêvajo wiha dest pê kir:

Hukmê leşkerî ya 1958'an ya dewleta Iraqê li Rojhilata Navîn pêvajoyeke nû derxist holê. Kurd rabûn ser xwe û mafê xwe yên neteweyî xwestin. Biserketina hukmê leşkerî ve mafê netewa Kurd dihate rojevê. Destûra Iraqê mafê Kurdan pir bi eşkereyî destnîşan dikir. Kurdên başûr bi serokatiya Barzaniyê nemir û PDK-Iraq ve geş dibû.

Tevgera başûrê Kurdistanê di wê demê de bandoreke mezin li ser Kurdên bakur hişt. Ya din jî vê helwesta Kurdan û ya hukmê leşkerî û makzagona Iraqê, Tirkiyeyê ditirsand. Li Tirkiyê devjeniyeke mezin li ser başûrê Kurdistanê dihate kirin. Tirkan, Kurdên başûr tehdît dikirin û digotin: **"îlankirina dewleteke serbixwe ya Kurdan, dibe sedema midaxeleya Bakurê Iraqê"**. Pirsa Kerkuk û Musilê dîsa derdixistin rojevê û bi vî awayî Iraq jî tehdît dikirin. Ev gengeşî di nava parlemena Tirkan de jî dihate kirin.

Wê wextê dîsa wek îro Tirkan digotin: **"Kurd zilm û zorê li Tirkmena dikin û emê vê yekê ji Kurdan re nahêlin"**. Bi van gotin û helwestan ve Kurd tehdît dikirin.

Emerîka, îngilîz û Iranê dijberiya vê hukmê leşkerî dikirin û ev pirs di qada navneteweyî de jî ciyekî girîng digirt. Tehdîtên midaxeleya Tirkiyê van dewletên din jî dixistine nava tevgereke awerte. Kurdên başûr bi mêranî mafê xwe diparastin û ji mafê xwe weke pirsgirêka Kerkukê û wekî din gav paşde nediavêtin.

Di wê navberê de dîsa Parlemena Tirk li ser bûyerên Musilê minaqeşe dikir. Wekîlê Nigdeyê Asim Eren peşniyarekê dide parlemenê û dixwaze Tirk midaxeleyî Iraqê bike û "Tirkên Iraqê" ji zilma Kurdan azad bike.

Kurdên bakur li dijî vê helwesta Tirkan û nemaze ya Asim Eren dengên xwe bilind kirin. Name û telgirafên tawanbariyê ji parlemenê û hukumetê re dişandin. Piştî demeke dirêj ev hêz dibû dengekî nûjen

li bakurê Kurdistanê. Ev helwest weke helwesteke sivîl û demokrat derdiket holê û ronakbîrên Kurd dicivand serhev. Ev bi xwe dibû sedema midaxeleya dewletê.

Di 17/12-1959'an de li Diyarbekir, Stenbolê, Ankara û wekî din gelek ronakbîrên Kurd hatine binçavkirin. Ev helwesta dewletê ne ji nişka ve derket holê. Ev plankirîbû. Loma di eynê wextê de avêtên ser mal û ciyê ronakbîrên Kurd û ew digirtin. Ji wana 40 kes hatin zîndan kirin û 10 kes jî li derve dihatine dadgehkirin. Giş 50 kes bûn. Ji wan yek diçe ser heqiya xwe û 49 kes dimînin. Loma jî ev bûyer bi navê doza 49'an tê binav kirin. Dadweriya wan heta 30/4-1961'ê berdewam kir. Dadgehê ew azad kirin, lê dadgeha yargitayê ya leşkerî ev dawa hanê red kir û di 16/7-1964'an de doz ji nûve dest pê kir, lê bêyî bidawî bibe di sala 1968'an de ji ber pir bi derengî ketibû dema wê derbas bû û dadgehê êdî nema karibû wan ji nû va mahkeme bikiraya..

Ev bûyer di dîroka bakurê Kurdistanê de bû destpêka vejandin û avakirina tevgereke neteweyî. Gelek ji wan kesên di vê bûyerê de cîh girtibûn bûne serok û qadirên çalak yên doza tevgera neteweya Kurd li Bakurê Kurdistanê.

Li Tirkiyeyê hukmê Eskerî ya 27'ê Gulan 1960'an, ji aliyê piraniya çepgirên Turk ve wek mudaxaleyek pêşverû tête dîtin. Lê belê Saziya Ewlekariya Neteweyî, xalên neguhêr ên Kanûna Esasî, rêxistina dewleta kûr û wd. pêkanîna tiştên nedemokratîk bi vê re çêbûn. Her wiha bi guman û tawanbariya neteweparêziya Kurd, 485 şexsiyetên Kurd ji cîhê wan hatin bidûrxistin û wan koçberî Sêwazê kirin. Heman demî ji aliyê desthilatdaran ve Gruba Rojhilatê hate damezirandin û ji bo çareseriya Pirsgirêka Kurd ji aliyê wan ve raporek hate amadekirin. Di vê raporê de ji bo asîlmîlekirina Kurdan pêşniyarên wisa hatin kirin ku raste rast wekî kopiyekî "Pîlana Îsleheta Şarqê" yê sala 1925'an bû.

Şertên ku darbeya leşkerî ya sala 1960'an peyda kir çi bûn û armanca darbeyê çi bû?

Hukmê leşkerî ya sala 1960'an bi ya min berdewama tevgera darbeya Kemalîstan ya avakirina komara nemeşrû ye û darbeya leşkerî ya dûwem e. Kesek avakirina komara dewleta Tirk bi darbeya leşkerî ve girênade, lê bi ya min bingeha avakirina komara Tirk darbeya leşkerî ye. Leşker dest daniye ser hukum û Kemalîstan jî ev

bûyer weke şoreşê binav kiriye.Weke derewê dîroka komara Tirk şîrovekirina vê darbeya leşkerî ya sala 1960'î û armanca wê jî bi derewan hatiye şîrovekirin. Kemalîstan û aliyekî eskeriyê piştî şerê duyem bi derbasbûna pirpartîtiyê ve desthilatdarî wenda kiribûn. Partiyên mûxalefet û aliyekî mezin yê leşker ji iktidara Demokrat Partiyê (DP) nexweşbûn. Partiya demokrat bi xwe berdewama mîrasa Sabahettîne ku li dijî Îttîhadiyan tevgeriya ye.

Di sala 1950'î de Leşker ji Hukumeta DP nexweş bûn. Aliyekî leşker bi girseyî antî- propagandaya DP"yê dikir û hukumeta DP'yê weke hukumeta li dijî Kemalîzmê û li dijî layikiyê dipejirand. Hêza wê rojê li dijî hukumeta DP'yê derdiket îro jî li dijî hukumeta AK partî derdikevin. Herdû jî aliyê dewletê yê nîjadperest û statukoperest in û berdewama Îttîhadê bi xwe ne.

Hukumeta DP'yê bi dijberiya makzagona komarê ve dihate tawanbar kirin. Tevgera ciwanên dewleta Kemalîst bi navê demokrasî, serxwebûn û antî emperyalîzmê ve bi leşker ve dihate girêdan. Evana nerehetiyeke mezin derdixistin. Li dibistanan. Li kolanan her roj mitîng hebûn û mirov dihatine kûştin û birîndar kirin. Dewletê. Bi destê dewletê tevlihevî li dar dixist û dizîvirî digotin: "Divê em dewletê ji vê tevliheviyê azad bikin". Hukumet bi hevkariya Emerîka ve dihate tawanbar kirin lê têkiliyên hukumetê bi SOVYET'ê re geştir dibû. Berevajî îdîaya desthilatarên hukmê sala 1960'î, ew bi xwe bi Emerîkayê re bûn û darbeyê alikarî ji Emerîka. CIA û Îsraîl MOSAD'ê wergirtiye. Di nava Tirkiyê de jî alîkariya Nîjadperestan, Faşîstan, Staukoperestan wergirtiye. Antî emperyalîstî ji xwe re weke maske bikar aniye.

Bûyerên bi nakokiyên navbeyna CHP'ya faşîst û DP'ya muhafazekar ve girêdayî hergi diçûn berfirehtir dibûn û Tirkiye berbi kaoseke ewlekarî û siyasî yê ve dibir. Li her derê welat; Li dibistanan xwendevan, li nava leşker weke subayên ciwan... Li fabrîkan jî karkeran kolanên bajaran tije insan dikirin û li dijî DP serî hildidan. Evana giş weke îro çawa bi destê Ergenekonê mitîngên komarê dihatine çêkirin wê wextê jî bi destên dewletê mitîngên komarê û yên layiqiyê çêdibûn.

Li Tirkiyê dîrok tenê dubare dibe. Bi gelemperî gava mirov ciddî lêbikole wê bê dîtin ku tiştên îro li Tirkiyê dibin berî 50-60 salan eynê tişt bûne. Dîroka Tirk ji dubarekirina xwe pê ve gavekê jî pêşde

neçûye. Nakokiyên navbeyna CHP'ê û DP'ê bi hilbijartina sala 1955'an ve dijwartir bû. DP'ê % 47.88 girt û weke îro piraniya parlemenan xist destê xwe û hukumeta xwe avakir. Lê muxalefet nesekinî u hukumet protesto kir. Di sala 1959'an de kongreya CHP'ê civiya û gelek biryar wergirt. Biryarên kongreya CHP bû bingeha makzagona sala 1961'ê ya darbeya leşkerî. Hukumeta DP'ê piçekî li himber Kurdan nerm bû û Melîk Firat (Nebiyê Şêx Seîdê Pîran) anîbûn meclîsê.

Muxalefetê digot: "Wê DP, hukumeta Kurdistanê avabike". Loma jî piştî darbeyê bi sedan Kurd hatine girtin û koçber bûn. Partiyên siyasî yên şowen û nîjadperest, hêzên dewletê yen çekdar û yên "siwîl" hevdû bi fobiya Kurdan û bi teoriya konspîrasyonê tawanbar dikirin û hebûna xwe li ser derewan ava dikirin. Wê demê jî wiha bû îro jî wiha ye.

Evana gişan amdekariya darbeya leşkerî dikirin. Ev darbe ji yên din cûdatir bi destên subayên ciwan ve pêk hatiye û sererkan bi xwe jî ji aliyê darbeyê ve hatiye girtin. Serokê hukumetê hatiye îdamkirin.

Bi vê darbeyê ve bingeha dewleta tarî, kûr û dewleta elîtekî (bijarteyekî) aborî û siyasî hatiye bihêzkirin. Propagandeya ku ev darbe şoreş e û pêşverû ye tenê propagandeya çep-Kemalîstên Tirkan e û derewa wan ya 50'î sali ye. Yalçin Kuçuk. Dogan Avcioglu û Dogu Perînçek bi eşkere û bi zaneyî hetanî îro vê derewê weke rastiyekê bi xelkê didin fêhmkirin û ev derew kirine yek ji çanda netewa Tirk û çanda komarê. Ev darbeya leşkerî jî weke hemû darbeyên leşkerî ji bo meşrukirina vê –netewe-dewleta Tirk e û avakirina neteweyeke nuh e.

### Tevgera Kurd ya ji sala 1960'î

"Berî salên 1980'yî û piştî wê, di encama perçebûna tevgera neteweyî ya Kurd de grubên siyasî yên cûda derketin holê. Eger ku em îro vegerin û li pêvajoya wê demê binêrin û cûdahiyên siyasî û îdeolojîkî ya grubên wê demê bidin ber çavan, emê cihêwaziyeke çawa di nava tevgera Kurd de bibînin?."

"Di navbera salên 1965-1970'yî de Tevgera Neteweyî ya Bakurê Kurdistanê dikeve pêvajoyeke nû; ku-di vê pêvajoyê de li ser tevgera neteweyî ya Kurd, raman û îdeolojiya çepgir bi bandor e. Rêxistin û grubên çepgirên Kurd di çerçoweya îdeolojiya çepgirî de xwe li dijî-

Emperyalî, li dijî-kapîtalî, li dijî-feodalî, li dijî-eşîrî, bi nav dikin û têdikoşin. Ev têgehên li jorê, di çareseriya pirsgirêka neteweya Kurd de çi îfade dikirin?"

Tevgera neteweyeke bindest dikare li dijî emperyalîzmê û li dijî kolonyalîzmê be. Lê divê bingeha wê ya sosyal, aborî û leşkerî hebe. Wexta ku Kurdan li dijî Îngîlîzan şer kirine ev şerê wan dualî bûye. Yek jê li dijî Îngîlîzan e ji bo ku Ingîlîzan herêma Kurdan dagir kirine û bi neteweyeke din, weke minak bi netewa Ereb re li dijî avakirina dewleta Kurdî rawestiyane û bûne astengê azadiya Kurdistanê. Ji aliyekî din ve li dijî netewa serdest û kolonyalîst e ku wê demê bi emperyalîzmê re lihevkirî ye, şer dike. Ango dixwazim bêjim dem û cîh di armancên tevgerê de roleke mezin dilîzin. Tevgera Kurd ya salên 65-70'yî ne antî emperyalîst bûye. Heger di nava Kurdan de hêzên antî-emperyalîst hebûn jî bingehiya tevgera Kurd li bakur ya wê demê ji bo azadiya Kurdistanê ye. Antî emperyalîstî dû re bi destê çepên Tirk derbasî nava tevgera bakur kirine. Antî emperyalîstî antî kapîtalîstî bingeha xwe ji tevgera çînî digire û armanca wê bi xwe avakirina dewleteke çînî ye ango tevgereke Sosyalîst e. Tevgera azadiya Kurdistanê ne antî emperyalîste û ne antî kapîtalîste. Ev him nezaniya û him jî çepîtiya zarokiya neteweya Kurd bû û bi gelemperî bi dawî hatiye. Îro hinek dengên nexweş ku xwe weke antî emperyalîst bi nav dikin, evana armanca doza tevgera neteweyî şolî û aloz dikin. Ev qalikê Kemalîzmê û çepîtiya Tirkan ya Yalçin Kuçuk û yên wekî wî ya di nava Kurdan de ye. Vîrûseke nexweşiya çepîtiyê ye ku tenê zerarê dide doza Kurd. Ez li vir armanca tevgera neteweyî û demokratîk tînim zimên.

Antî feodalî, antî eşîrî pirseke girîng e. Weke sîstem bi ya min divê tevgera Kurd li dijî feodalî û li dijî eşîrî be. Li vir mebesta min sîstema wan e. Lê ne li dijî feodalan û eşîran be. Me li ser tevgera Şêx Abdulselamê Barzan jî anîbû zimên. Tevgera Şêx tevgereke li dijî eşîrî û feodalî bûye. Lê ne li dijî feodal û eşîran bûye. Ev cûdabûneke berbiçav û zirav e (girîng e). Loma divê em vê cûdahiyê baş ji hev cuda bikin. Tevgera ku xwe antî-feodal û antî-eşîrî bi nav dike bawer nakim ku vê girîngiya ku ez tînim zimên jî bi zaneyî têgîhiştibe.

Li pêy vê bêdengiya dûr û dirêj di sala 1965'an de Partiya Demokrat a Kurdtistana Tirkiyê (PDKT) tête damezrandin. Weke pêngaveke

yekemîn a piştî demeke dûr û dirêj a bêdengiya Kurdên bakur, dişkîne û tevgera neteweyî geş dike. Piştî bûyera 49'an û şoreşa eylulê ya başûrê Kurdistanê bi serokatiya Barzaniyê nemir bandoreke neteweyî di nava ronakbîrên Kurdên bakur de eşkere dibû. Damezrandina partiyê (PDKT)'ê ne ji pêvajoya damezrandina PDK-Iran û PDK Iraq bi dûr e. Tevger û bandora Barzaniyê nemir bi xwe damezrandina PDKT xistiye rojevê. Bi avakirina PDKT re ronakbîrên Kurd jî pêwîstiya rêxistiniya ronakbîriya Kurdan dîtine.

Ronakbîrên Kurd wê demê tevgereke li gor civata Kurd damezrandine. Tevgereke neteweyî, serdemî û demokrat bûye. Ew bi xwe bûye dayika tevgera neteweyî li bakurê Kurdistanê.

Têkçûna şoreşa başûrê Kurdistanê (1975) yek ji sedemên perçebûna tevgera bakurê Kurdistanê ye. Berî wê cudabûnek hebû lê berfirehbûna wê piştî têkçûna şoreşê ye. Piştî têkçûna şoreşê lêgerîneke cûda di nava tevgera bakur de dest pêkir. Di vê lêgerînê de ramanên cûda derketin holê. Di rojeva tevgera Kurd de ji pirsgirêkên Kurdistanê bêtir pirsgirêkên navneteweyî û nakokiyên sîstema sostalîst cîh digirt. Berê cûdayî ji nêrîn û helwesta tevgera başûr dest pêkir û bi nêrînên cûda yên li ser tevgera sosyalîst berfireh bû. Li ser pirsgirêka Kurd û Kurdistanê cûdahiyek berbiçav tuneye. Ji bilî PSK ku federasyon dixwest û hemû tevgerên din serxwebûn dixwestin. Cudayiyên berbiçav helwestgirtina hevkarî û siyaseta navneteweyî ye. Dervî wê jî pêwendiyên bi tevgera çepê Tirk û tevgera başûrê Kurdistanê re ye. Hukmê leşkerî ya 12 îlona 1980'ê ev pêvajoya tevgera Kurd rawestand û bû sedema jihevketina tevgera neteweyî ya Bakurê Kurdistanê.

## Ronakbîriya Kurd bi du aliyan ve berfireh bûye

Ya yekem, ronakbîriya xwe bêtir ji tevgera neteweyî ya her çar perçeyên Kurdistanê stendiye. Ronakbîriyeke Kurdewarî ye. Destpêka vê ronakbîriyê di nava şêx, ronakbîr û melayên Kurdan de dest pê kiriye. Bandora dewletên dagirker bê şik li ser van ronakbîrên Kurd heye lê bawerim bingeha ronakbiriya xwe ji tevgera neteweyî wergirtine û bi vê ronakbîriyê jî beşdarî tevgera neteweyî bûne. Mirov karekterê vê ronakbîriya Kurdî di tevgera neteweyî de baş dibîne. Cîhê gotinêye ku divê mirov bêje bingeha netewayetiya Kurd li Başûrê Kurdistanê dest

pê kiriye. Netawayetiya Kurd ya serdemî jî bi Barzaniyan ve dest pê kiriye. Bêgûman berî Barzaniyan jî tevgera neteweyî hebûye. Weke tevgera Mîrekên Kurdan, tevgera Nehrî, ya Bedirxan. Lê tevgera başûrê Kurdistanê ya serdemî destpêka tevgera netewayetiya Kurd ya Kurdistanî ye. Tevgera netewayetî bi vê bingeha ve berfireh bûye. Mîratê vê netawayetiya Kurd aliyê yekemîn e.

Ya duyem jî, bîr û rayê xwe bi zêdeyî ji tevgera navneteweyî girtiye û bi karekterê tevgera navneteweyî, (weke tevgera çep, tevgera lîberalî, tevgera dekomkratî, sosyalîstî û li gor baweriya min bi bandora Kemalîzmê) beşdarî nava tevgera neteweya Kurd bûye. Aliyê vê ronakbîriya Kurd ya netewayetî qels e. Hêza ronakbîriya xwe, ya ji tevgera çep ya navneteweyî yanjî ji tekoşîna neteweyên serdest wergirtiye. Karekter û îdeolojiya çep û lîberalên neteweyên serdest di aliyê vê ronakbîriya Kurd de cîhekî berbiçav wergirtiye. Piraniya ronakbîrên Kurd bi ziman û çanda netewa serdest ve perwerde bûne. Ronakbîriya xwe cara yekem ji ronakbîriya netewa serdest ve wergirtîne. Loma jî ne mumkun e ku bandora çanda netewa serdest li ser ronakbîriya Kurd tunebe. Ronakbîrên Kurd bi çîrok û helbestên dîroka netewa serdest ve perwerde bûne, dîrokê û edebiyatê bi ramanên wan fêr bûne. Ta radeyekê hebûna xwe ji dîroka înkariya netewa serdest ve fêr bûne. Baweriya min e we ku bandora çanda neteweyî, siyasî û civatî ya neteweya serdest li ser ronakbîriya Kurd bi girseyî heye û aliyekî ronakbîriya Kurd hînê jî di bin vê bandorê deye.

Bêgûman bi taybetî miletekî bindest ku ji bo rizgarî û bidestxistina mafên neteweyî têbikoşe, piştgiriya hêz û rêxistinên demokratîk ên navnetewî pir girîng e. Ji aliyekî ve dikarim bêjim bêyî alîkariya derve serketina têkoşîna neteweyeke zehmet e. Lê belê dema ku tekoşîn û daxwazên neteweyî yên Kurdan hatine rojevê, bi giştî ne hêzên "çepgir" û ne jî hêzên "Îslamî" helwesteka pêdivî nîşan nedan in. "Çepgir"an daxwazên neteweyî yên Kurdan bi navê "birayetiya gelan yan jî birayetiya çînan"; yên "Îslamî"yan jî bi navê "ûmmet û birayetiya Îslamî", bûne alîkarê berdewamiya statukoya dewletên dagirker û serdest,ango netewe-dewletê.

Pirsgirêka hevkariya têkoşîna netewa Kurd her dem bûye sedema ji hevketina tevger û şoreşên Kurdan. Di Rojhilata Navîn de mixabin îro

hevkariya têkoşîna neteweya Kurd di nava tevgera "Enternasyonalîst ya neteweya serdest" ( Islamî, çep û lîberal) de ya tuneye yan jî gelekî kêm e. Enternasyonalîstên neteweyên serdest di Rojhilata Navîn de hevkarên neguherîna statukoya Rojhilata Navîn in. Kurd di têkoşîna xwe ya ji bona mafê neteweyî û demokratîk de derveyî vîna wan yeko yeko kevirên vê avahiya statukoya nemeşrû ya Rojhilata Navîn radikin û bi têkoşînê ve avahiya Rojhilata Navîn dihejînin.

Tevgera enternasyonalîst ya neteweyên serdest mixabin di bin bandora helwesta kolonyalîst deye û bi navê li dijî emperyalîzmê û bi navê pêşverûtiyê li dijî tevgera Kurd tevdigerin. Ev jî mixabin reng û dengên wan yên netewayetiya serdest nîşan didin.

Tevgera Kurd iro bi paradîgmayeke ideolojiya welatparêzî û demokratî û wekheviyê struktura Rojhilata Navîn tehdît dike. Di guherandina struktura Rojhilata Navîn de berjewendiyên hemû hejar, karker, Gundî û kêmneteweyên Rojhilata Navîn heye. Têkoşîna neteweya Kurd, pêwîst e alîkariyê ji tevgerên çep û Îslamî wergire. Tevgera Kurd divê bi helwesta xwe bikaribe alîkariya tevgera hejar û olperestên Rojhilata Navîn wergire. Tevgera neteweyî ya Kurd ne li dijî tevgera çep û ya Îslamî û ne jî li dijî tevgera lîberal ya neteweyên serdest e. Ew bi xwe mutefîkên tevgera Kurd in. Lê îro bi helwesta xwe ve dervî vê helwesta xwezayî ketine û di berjewendiya netewa serdest û statukoya Rojhilata Navîn de xwedî helwesteke kevneperest û paşverû ne. Di Rojhilata Navîn de hêza yekta ya statukoya Rojhilata Navîn nemeşru dibîne tevgera neteweyî ya Kurd e. **Hemû hêz û tevgerên netewî û yên navneteweyî yên li dijî statukoya Rojhilata Navîn in û guherîneke erênî dixwazin mutefîkên xwezayî yên tevgera neteweya Kurd in.**

Di konjoktura îro de pirsa Kurd pirsa herêma Rojhilata Navîn e. Çareseriya Pirsa Kurd û Kurdistanê guherandina struktura Rojhilata Navîn dixe rojevê. Loma jî girîngiya xwe ji vir digire. Bi vî awayî jî pirsgirêka neteweya Kurd, pirseke navneteweyî, strukturî û dadwerî ye. Bêdadweriya sînorên hatine kişandin, bêdadweriya mafê netewa û kêmnetwa li Rojhilata Navîn e. Dewletên hatine avakirin ne li ser maf û azadiyên netewa lê li ser tunekirina maf û azadiyên gelek neteweyan hatine avakirin. Me gelek caran ev aniye zimên ku sînorên van dewlatana ne meşru û neheq in. Loma destnîşankirina van sînorana

sedema nearamiya Rojhilata Navînin. Heta ev bêdadwerî bidome wê ev nearamî jî berdewam be. Heta Netewa Kurd mafê xwe yê neteweyî yên rewa bidest nexe û heta Kurdistan azad nebe wê ev bêaramiya Rojhilata Navîn berdewam be.

Piştî min Rojhilata Navîn û her 4 çar dewletên dagirker, (ji bilî Iraqê ku îro Kurd li başûrê Kurdistanê azad in) anî zimên, dixwazim nuha jî dest bi şîrovekirina paradîgmaya pêla 3'yem bikim û minakên wê jî raxim ber çavan. Ezê di vî beşî de pêla 3'yem çi ye, bînim zimên. Dû re ezê minakên wê yên dualî jî eşkere bikim. Loma jî hûnê bi xwe bikaribin muqayeseyekê di nava van minakan û nimûneyên Rojhilata Navîn de bikin. Paradîgmaya pêla sêyem di nava hêzên navneteweyî de weke rê û çareseriya tenha ya ji bo wekhevî,yeksanî û azadiya civatên netwe-dewlet û stakuperest têne şîrove kirin. Pirsgirêkên netewan û yên kêmnetewan li dinyayê bi vê paradîgmayê hatiye çareserkirin yan jî ji nû va bi vê paradîgmayê ve di nava çareseriyekê de berdewam dike.

# III

# DI BERBANGA RÛDANÊN DAWÎN YÊN DINYAYÊ DE PARADÎGMAYA PÊLA 3'YEM

Di nava van 30- 40 salên dawîn de struktur û siyaseta dinyayê hate guherîn. Li gelek cîhê dinyayê, nemaze li Ewropayê, him bi Yekîtiya Ewropayê him jî bi rûdanên nû yên dinyayê ve girêdayî bêjeya netewe-dewlet û dewlet-netewe ji nû va tûşî siyaset û çalakiyên gelan bûn û bêjeyên nû di rojeva siyaseta dinyayê de cihên xwe girtin û bûn kevirên bingeha demokrasiyê û mafê mirovan. Îro nîvê dinyayê ji nû ve li gor wan bêjeyan xwe diguherin. Piraniya wan dewletana struktura xwe ya berê rast nabînin û di nava lêgerîneke berbiçav de ne. Nûjeniya struktura piraniya dewletan di rojeva siyaseta wan dewletan de weke gaveke girîng tê pejirandin.

Di vê prosesa girîng ya nû de bêjeya netewe-dewlet û naveroka wê bi berfirehî kete rojeva devjeniya civatên dinyayê. Raman û bûyerên di xewnan de nedihatin dîtin bi rastî wergeriyan. Gelek civat û dewletên mezin û yên bi hêz nikaribûn li ber vî bayê pevajoya nû rawestin û mecbûr man xwe biguherin. Dewletên bi dijwarî navendîparêzbûn (merkeziyetçî) bi vî bayê nû desentralîzasyon (ademî merkeziyetî) xistin rojeva siyaseta xwe û gelek erkên dewleta navendî radestî herêmên otonom kirin. Ji aliyekî din ve van dewletana xwe ji nû ve vejandin û struktureke nû pejirandin. Di vê pêvajoyê de federalî, konfederalî û otonomî sê minakên berbiçav in. Çend Dewletên navendîparêz divê pêvajoyê de bûne qada devjeniya raya giştî ya cîhanê. Gelek dewletan ji vana zû be zû struktura dewleta xwe guhertin. Hinan ji wana ji ber hêzên nijadperet û statukoperest dereng man û ev derengî bûne se-

dema şer û pevçûnên nedîtî yên navxweyî. Hin ji wan dewletana ser û binî hev bûn. Weke dewlet hin hatine rûxandin. Bi dehan dewletên nuh hatine avakirin. Derengbûna wan dewletana bû sedema hebakirina keda bi salan. Bi hezaran mirov ji jiyana xwe bûn. Bi milyonan mirov koçber bûn. Şerê netewan, şerê dewletan kete rojeva dinyayê. Hêzên dinyayê li ser van bûyerana bûne çend alî.

Divê serdema me ya 21'ê de ji nû ve şerê neteweyî li gelek cîhê dinyayê dest pê kirin û nasnameya netewayatî weke nasnameya sedsala 21'ê di rojeva cîhanê de cîhê xwe girtin. Netewe û gelên bindest ji bo mafê xwe yê neteweyî û demokratîk bi şêweyên şîdetê, bikaranîna çek û bi rêyên aştiyane, herwiha bi rêya siyasetê ketin nava tekoşîneke bêhempa. Çiqasî ev pêvajo bi erênî jî tê nirxandin herwiha neyêniyên vê pêvajoyê jî hene. Ango vê pêvajoyê bandoreke mezin li ser gelên cîhanê hişt.

Li gelek welatan mafê mirovan hatine bênpêkirin. Karger û zahmetkêşên cîhanê bi awayekî berfirehî feqîr ketin. Li gelek cîhî mafên wan yên aborî û civakî û rêkxistinî kêm bûn. Sîstema sermayedarî, û dewletên sermayedar bi rûxandina sosyalîzmê ve serxweş bûn û dest avêtin mafê bidestxistî yên civatê û yên karger û zahmetkêşan. Bêkarî û feqîrî li dinyayê bû metirsiyeke mezin. Di sedsala 21'ê de li gelek cîhên dinyayê birçîbûn dibe qada devjeniya dinyaya "serdem". Bîr û baweriyên mafê hejaran û kedkaran diparastin, ango baweriyên sosyalîstî (ku nikiarîbû xwe nûjen bike), tekoşîna kargeran ya ji bo mafê aborî û rêkxistinî qels ketin. Bîr û baweriyên sermayedarî, bîr û rayên bûrjûwazî derketin pêş û bûne ray û bîrên biryardêr. Êdî parastina baweriyên sosyalîst bûye para çend rêkxistin û dewletên "terorîst" û "dîktator."

Ray û baweriyên sermayedarî ne çarenivîsa gelan e. Di vê pêvajoyê de lîberalîzm û muhafazakarî ji nû ve kete rojeva ronakbîriya cîhanê. Hemû çareseriyên pirsgirêkên cîhanê di çerçoweya perspektîvên îdeolojiya sermayedariyê de tê dîtin. Di vê prosesê de rol û bandora baweriyên sosyalîzmê ya tuneye yan jî qels e. Lê ne tenê baweriyên sosyalîzmê qels maye. Herwiha Lîberalîzma demokrat jî ji baweriyê xwe bi dûr dikeve. Di vê pêvajoyê de Lîberalîzmê jî xwe guhert û dev ji hin prensîbên xwe yên sedsalan berdan.

Bi gelemperî bîr û baweriyên bûrjûwazî bûne bîr û rayên sereke yên dinyayê. Emerîka bûye hêza yekta. Ewropa xwe nûjen dike û Yekîtiya Ewropa (YE) yê bihêz dike. Çîn û Japon û Hîndîstan qedera aboriya dinyayê dixin destên xwe. Hêza çek û leşkerî di yekdestî de li ser çarenivîsa mirovahiyê dibe xwedî biryar. Çekên kîmyewî ji nû va di qada siyasî ya cîhanê de cîhekî girîng digire. Çend dewletên dîktator ku dibin xwediyê çekên kîmyewî, ji nû va dinyayê dixin nava gumanên mezin. Neteweyên Yekbûyî (NY) nikare bi rola xwe ya bingehîn rabe. Evana giş neyîniyên vê pêvajoyê ne.

**Lê erêniyên vê pêvajoyê ji neyêniyên wê bêtirin.**

Di vê pêvajoya nû de, nasnameya me di nava guherîneke nedîtî de ye. Post-nasname - ango post identity bi berfirehî dibe bêjeyeke xurt. Nasnameya me xwe ji şovenîzmê û nîjadperestiyê diparêze. Lê ji aliyekî din ve nasnameya netewî -national identity- di rojeva dinyayê de cîhekî girîng werdigire. Mixabin heta neteweyên bindest hebin, heta mafê neteweyan bê inkarkirin wê nasnameya netewî jî hebe û wê xurt be. Îro herdû proses weke li dijî hev xûya dikin lê ne wiha ye, berevajî vê, herdû pêvajo hevdû temam dikin. Di vê dema post identity xûrt dibe, li aliyekî dinyayê jî mafê neteweyan û kêmneteweyan binpê dibe. Ango heta mafê neteweyan û kêmneteweyan binpê bibe di vê dema globalîzmê de post îdentity bi temamî cîh nagire û pêşde naçe. Loma dema me dema herdû prosesên dijber ku hevdû bihêz dikin û rê liber dinyayeke nûjen vedikin. **Em dikarin vê prosesê û vê pêvajoyê weke pêla 3'yem ya demokrasiyê binav bikin.** Ev paradîgmaya pêla 3'yem e.

Divê prosesê de mafê mirovan û mafê kêmneteweyan û neteweyên bindest di nava raya giştî ya demokratîk û humanîter de cîhekî girîng digire. Sermayedarî bi aboriyeke xurt û bi hêzeke navneteweyî di globalîzekirina cîhanê de roleke biryardêr dileyize. Her çiqas Lîberalîzmê xwe guhertibe jî dîsa rola wê ya erênî di vê prosesê de bi eşkereyî xuya dike. Sermayedarî bi vê globalîzekirina dinyayê ve bîr û rayên me jî diguhere û ta radeyekê dervî daxwaza xwe nasnameyeke navneteweyî diafirîne û vê nasnameyê dike bîr û raya sereke ya cîhanê. Globalîzekirina dinyayê bandoreke mezin li ser hêzên statukoperest dike

û ew jî mecbûr dibin xwe bigherin. Loma jî îro li gelek cîhên dinyayê statukoparêz jî dikevin nava hewildanên nû û nêrînên raya giştî digrin ber çavan. Di vê pêvajoya nû de herkes mecbûrin ku derbasbûna xwe û nêrînen xwe yên berê ku weke tabû dihatine zanîn bi awayekî serdemî ji nû va lêbikole û xwe li gor serdemê amade bike.

Tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurd jî xwe diguhere. Ango tevgera Kurd bi şêweyên berê nema kare pêşde biçe. Civata Kurd jî li dinyayê dijî, û loma jî dibin bandora guherîna dinyayê de dimîne. Tevgera Kurd mecbûr e xwe ji nû ve bi awayekî serdemî vejîne. Şêweyên berê êdî kevn bûne loma êdî bersiva civata Kurd nadin.

Civata Kurd bêgûman ji çîn û tebeqeyên cûda ava dibe. Berjewendiyên aliyên civatê bêguman cûda ne û loma jî bi zorê hemû aliyên civatê nikarin di nava partiyekê yan jî li der û dora baweriyekê bicive. Îro piraniya civata bakurê Kurdistanê bi yekalî ve tê organîzekirin. Aloziyeke berbiçav di nava civatê de peyda bûye û tu kes li çareseriyên vê aloziyê bi awayekî ciddî nagere. Civat weke civateke milîtarîzekirî bi yek alî, yek rengî yek ramanî tê organîzekirin. Divê pêvajoyêde maf û azadiyên kesayetî lawaz dibin. Mafê ray û îdeolojî yên cûda bi gelemperî cîh nagirin. Derbirîna azad bêyî vîna me ji holê radibe. Ev pêvajo di vê prosesa global de, di vê pirrengî û piraliya afirandina civateke serdemî de, qetilkirina civata Kurd bi xwe re tîne. Aliyên civata Kurd divê xwe organîze bikin. Lê di vê pêvajoya nû de pirsa sereke dikare hemû aliyên civatê bi hevkariyeke serdemî bîne ba hev. Yekrengî, yek alî li Kurdistanê xerabiya bingehîn ya dagirkirina ramanên afirandêr e. Li vir mebesta min ne tevgereke spesifik e. Mebesta min pêvajoya tekoşîna neteweyî bi xwe ye û divê pirengî û pirdengiya civata Kurd, bête parastin.

Di vê pêvajoya nû de, li Rojhilata Navîn yek ji pirsên sereke jî pirsa neteweyan e. Di nivîsandina dîroka Rojhilata Navîn de pirsa netewe û pirsa netewe-dewlet her wiha pirsa nasnameya neteweyên cûda hatiye alozkirin û şolîkirin. Çawa di nava hêzên dinyayê de ev pirs bi alozî tê şîrovekirin, herwiha li Rojhilata Navîn jî ev pirs bêtir alozekirî, bi aweyekî astengî berdewam dibe. Ango Rojhilata Navîn mozaîka netew û kêmneteweyan e. Dîrok li Rojhilata Navîn li ser bingeha înkarê hatiye nivîsîn. Dîrok berevajî rastiyê bi derewan hatiye nivîsandin. Ji

ber van sedemên li jorê hatine binavkirin, li Rojhilata Navîn xebat û tekoşîna li dijî statukoperestiyê û fundamentalîzmê gelek zahmet e. Lê weke li jor jî min anîbû zimên Rojhilata Navîn di vê prosesa nû da nikare weke berê berdewam bike. Hemû hewildanên statukoperest û fundamentalîstan têk diçin. Bi bûyerên dinyayê ve, statukoya bê dadwer ya Rojhilata Navîn nikare berdewam bibe.

Pirsgirêka netewa/neteweyî 200 salin di rojeva dewletên Ewropayî de cîhê xwe girtiye û ta radeyekê çareserî jê re hatiye dîtin. Iro li Ewropayê 32 neteweyên cûda him bi hev re û him jî di nava aştiyê de dijîn. 67 zimanên cûda têne axaftin. Bi gelemperî şerê navbeyna neteweyan li rojavayê Ewropayê bi dawî hatiye. Lê pirsên netewa û yên kêmnetewa yên neçareserkirî mane û bi şêweyên demokrasiyê û li gora serdema nû di nava lêgerîna çareseriyekê de berdewam dike. Li rojava û ta radeyekê li Rojhilatê Ewropayê, çareseriyên vê pirsgirêkê gelek alternativan radestî me dikin. Ewropa bi careseriyên vê pirsgirêkê ve dewlemend e. Pêwîst e em ji dewlemendiya Ewropayê fêdê bikin lê pirsgirêkên neteweyan ji bona ku bi sedsalane hatine alozkirin, pir bi rehetî em nikarin minakan weke şablon nimûneya welatekî li welatekî din bi kar bînin. Ango pirsa her neteweyeke li gor rewşa wî welatî ya siyasî, aborî û civakî dikare bê çareserkirin. Lê minak û serpêhatiyên neteweyên dinyayê perspektîva çareseriyên vê pirsgirêkê dewlemendtir dikin û rêyên cûda û alternatîfên cûda pêşkêşî me dikin. Ev bi xwe dewlemendiyeke berbiçav e.

Prosesa netewayetî li ewropayê pir bi rehetî mirov dikare ji şoreşa Fransayê dest pê bike. Bi şoreşa Fransayê ya burjuwazî ve "wekhevî,yeksanî û azadî" weke gotinên sereke hatin bikar anînîn. Pirsa dewlet-netewe jî divê çerçoweyê de dihate şîrovekirin. Şoreşa Emerîkayê rê li ber şoreşa Fransayê vekir û şoreşa Fransayê jî çavê netewe û çîna bûrjuwazî û herwiha bi xwe re çavê çîna bindest yê Ewropayê jî vekir. Pirsa neteweyan û çareseriyên pirsa neteweyan di avakirina dewlet- netewe de bû pirsa sereke. Bêjeya netewe di vê prosesê de gaveke girîng bû. Li dijî kilîsê û xanedanê Ewropî bû qada tekoşîn û bidestxistina mafê mirovî. Di vê pêvajoyê de rola serkêşên ola Protestanî ciyekî girîn girtiye. Mafê netewa û mafê mirovayetî di prosesa avakirina netewe-dewletê de bûye qada devjeniyeke mezin.

Di vê pêvajoyê de çend imparaotêrên mezin hatine rûxandin. Ji nava wan împaratoriyan bi dehan netewe-dewlet hatine avakirin. Li aliyê din tekoşîna çînî bi girseyî berdewam dikir. Tekoşîna karger û zahmetkêşan û tekoşîna ji bona mafê neteweyî ango tekoşîna neteweyên rêzgarîxwaz bi peymaneke dîrokî ve ji bona mafê mirovan berdewam dikir. Lê ev proses bi şerê cîhanê yê yekem ve aloz bû.

Pirsa çareseriya neteweyan piştî rawestandina şerê cîhanê ê yekem jî di paymanên aştiyê de bû pirsa sereke. Bi dehan netewe azad bûn û serxwebûna xwe bi dest xistin. Bi dehan neteweyên ku tunebûn weke netewe hatine nasîn û dewleta xwe ya serbixwe avakirin. Lê herwiha bi dehan netewe jî bindest man yan jî pirsa wan nehate çareserkirin. Pêvajoya tekoşîna neteweyan berdewam kir. **Vê pêla demokrasiyê ya 1'em yan jî paradîgmaya pêla yekem** şoreşa sosyalît ya Rûsyayê afirand û bi ser xist.

Şerê cîhanê yê yekem rastiyek raxist ber çavên raya giştî û du pêvajoyên berevajî hev afirand. Pêvajoya yekem ya şerê cîhanê bû sedema rûxandina împaratoriyên pirneteweyî. Vê pêvajoyê berî şerê cîhanê dest pê kiribû û bi dehan dewletên serbixwe hatibûn avakirin. Ev pêvajo, pêvajoya dewletên–neteweyî ye. Şerê cîhanê tenê bicîhkirina vê pêvajoyê bi lez kir. Bi şerê cîhanê ve vê pêvajoyê împaratoriyên pirneteweyî, pirçandî bi dawî anî û bi dehan dewletên neteweyî anî hole. Di vê pêvajoyê de rûxandina împaratoriya Osmanî û ya Ewusturya-Macarîstan û Rûsya ciyekî girîng e. Hersê împaratorî jî, dewletên pirçandî, pirneteweyî bûn. Lê bayê netewe-dewletê ji yê vê pêvajoya împaratoriyê bihêztir bû û bayê serxwebûnê hersê împaratorî bidawî anîn.

### Bi vê pêvajoyê ve dû prosesan dest pê kir

**Prosesa yekem** afirandina netewe-dewltê ye. Ya min li jor aniye zimên.

**Pêvajoya duyem** ya şerê cîhanê, bi baweriya min ya herî girîng e ku rojeva qada siyasî ya cîhanê guhert. Vê pêvajoyê dewleteke pirçandî, pirneteweyî ji nava împaratoriyeke pirçandî û pirneteweyî weke dewleta SOWYETê ya sosyalîst derxist. Ji aliyekî ve vê pêvajoyê împaratoriyên pirneteweyî dirûxand û ji aliyekî ve jî dewleta pirçandî ya nûjen ava dikir. Du pêvajoyên berevajî hev.

Avakirina dewleta Sowyetê ji bona çi berevajî prosesa dewletên serbixwe yên dewlet-netewe bû. Lewra baweriyên serkêşên avakirina vê dewletê partiya komunîst e. Li dijî dewletên serbixwe bi eşkereyî dernediket lê yekgirtiya neteweya di çerçoweyeke wekhevî de rastir didît. Sowyet weke tê zanîn ne navê neteweyekê ye û bi navê neteweyekê nehatiye avakirin. Weke dewleta karger hatiye avakirin û di nava xwe de bi dehan neteweya dipêça. Loma jî berevajî pêvajoya avakirina netewe-dewletê bû.

Şoreşa Oktobirê Emperyalîzma cîhanî tirsand û nakokiyên Emperyalîzma cîhanî paştguh kir. Şerê cîhanê yê yekem, bi Şoreşa Rûs ya Oktobrê ve bi dawî hat. Ango Şoreşa Oktobrê şerê cîhanê bêyî ku bighêje armanca xwe bi dawî anî. Emperyalîzma cîhanî tenê bi rawestina şerê cîhanê nema her wiha li dijî Sowyetê, peymaneke sermayedarî pêk anî û der û dora dewleta sosyalîst bi îdeolojiya vê peymanê ve xemiland. Dewletên sermayedar ji bo rûxandina dewleta Sowyetê bi vê peymana nav xwe mafê bi dehan neteweyan binpê kirin. Prensîbên di çerçoweya demokrasiya lîberal de ku dihatin pêşkêşkirin hatin rawestandin. Bi dehan netewe dervî van prensîban bêmaf man û bindestî bû para wan. "Netewe-dewlet" bû bêjeya binpêkirina mafê neteweyên cûda. Bu derfeta bikaranîna şovenîzmê û nîjadperestiyê. Bi vî awayî pirsa neteweyan li gelek cîhên dinyayê nehate çareserkirin û tekoşîna neteweyan berdewam kir. Ev pirsgirêk li Ewropayê jî bi temamî nehate çareserkirin û tekoşîna netewa li Ewropayê jî berdewam kir. Lê divê bê gotin ku him li Ewropayê û him jî li Asyayê û Efriqayê dewletên neteweyî û navendî hatine avakirin. Dewletên,Neteweyên tune hatine damezrandin. Li Rojhilata Navîn ev weke projeya dewletên mezin kete rojevê û hin dewletên nû hatin avakirin. Bi dehan netewe jî ji mafê xwe yê rewa bêpar man.

### Şerê cîhanê yê duyem û paradîgmaya pêla 2'yem

Şerê cîhanê yê duyem weke berdewamiya şerê cîhanê ê yekem dest pê kir. Bi dehan dewletên yekgirtî hatine perçekirin û bidehan dewletên serbixwe hatine avakirin. Bi vê pêvajoyê ve girêdayî sîstema sosyalîst bi hêz bû. Sîstema sosyalîst li gelek welatan sîstema federeratîf weke çareseriya pirsa netewa pêşkêş kir. Çend dewletên federal weke

Sowyet, Çekoslowakya, Yugoslavya ku bi dehan neteweyên cûda bi şîara wekheviyê di nava xwe de diparastin, weke sîstema sosyalîst bloka xwe avakirin. Lê mixabin vê pêla 2'yem (duyem) ya demokrasiya navneteweyî berdewam nekir. Piştî demeke dûr û dirêj hate xuyakirin ku sosyalîzmê jî ev pirsgirêk çareser nekiriye û bi ruxandina xwe ve rê li ber şerê neteweyî vekir û bi dahan neteweyan dewlata xwe ya serbixwe avakirin.

Piştî prosesa şerê cîhanê yê duyem li rojavayê Ewropayê pirsa netewa ji nû va dest pê kir û pirsgirêkên netewa di rojeva dewletên Ewropayê de bû pirsa sereke. Vê prosesê bandora xwe li Rojhilata Navîn berevajî kir. Dewletên bi alîkariya Sowyetê ve hatibûn avakirin weke komara Mahabad, Komara Ezarbeycan bi destê emperyalîzmê ve hatine ruxandin. Sowyetê jî xwedî li van dewletana derneket.

Ji salên1950 -1970'yî li gelek welatên Ewropayê pirsa netewan bû sedema şer û pevçûnên mezin. Li Ewropayê pirsa netewe-dewlet dibû devjeniya civatên Ewropayê. Netewe û kêm neteweyên cûda li Ispanyayê, li Birîtanya mezin, li Fransayê, Li îtalyayê li Belcîhkayê serî hildidan û mafê xwe dixwestin. Li gelek ciyan jî şerê çekdarî dest pê dikir û ev jî dibû sedema afirandina şêweyên terorê. Herwiha rê li ber koloniyên van dewletên emperyal yên ji bo serxwebûna xwe têdikoşiyan,vekir. Civata Ewropa di nava guherîneke nedîtî de dijiya û bandoreke mezin li ser netewe, kêmnetewe û hejarên dinyayê dikir. Li Ewropayê ji aliyekî ve **pêla 2'yem** ya demokrasiyê bi dawî dihat û ji aliyekî din ve **pêla 3'yem** ya demokrasiya global dest pê dikir.

Nakokiya navbeyna blokên îdeolojîk binpêkirina mafê mirovan bi xwe re dianî. Lê hewildanên demokrasiyê bi hêz dibûn. Mafê mirovan û mafê neteweyan di vê prosesê de dibûn qada tekoşîna sereke. Di destpêka salên 70'yî de tovên pêla sêyem dest pê dikir. Di vê pêvajoyê de bi dehan îdeolojî di rojeva dinyayê de cîhê xwe digirtin û tekoşîna netewa, tekoşîna ji bona demokrasiyê û sosyalîzmê him geş dikir û him jî aloz dikirin. Nakokiya navbeyna blokan ango serdema şerê sar jî ev mijarê aloztir dikir. Lê ev proses ber bi devjeniyeke nû ve diçû.

Di vê devjeniya nû da pirsa netewayetî bi zelalî nehate şîrovekirin. Bi her bûyerekê ve ev devjenî geştir û ta radeyekê aloztir dibû. Ne

sîstema sosyalîst û ne jî ya sermayedar ji vê pirsgirêkê re çareseriyeke konkret pêşkêş dikir. Şer û tekoşîna navbeyna herdu sîsteman ku bi navê şerê sar dihate bilêvkirin, ev pirsgirêk aloztir dikir. Şerê bi heq û yê neheq dikete nava hev û serê bi milyonan mirovan tevlihev dikir. Her sîstemekê li gor berjewendiyên xwe ev pirs dixiste rojeva cîhanê. Li gelek cîhî ji ber dijberiya herdû sîsteman mafê neteweyên bindest û mafê mirovan binpê dibûn.

Di vê pêvajoyê de tevgera şoreşger ya çep li cîhanê bi berfirehî dest pê kiribû û sermayedarî dixist nava lêgerîneke nû. Baweriyên sosyalist û yên tevgera şoreşger û çep ji aliyê dewletên sosyalîst ve manîpule dibûn û hêza çep ji hev diket. Nerînên, Sowyetê, yên cîhanê, yên tevgerên Latîn Emerîkayê û nêrînên Arnawut yên Enwer Xoceyî nakokiyeke mezin dixist nava tevgera çep ya cîhanî. Li Ewropayê hêza çep bi girseyî bandoreke mezin li ser civatê dikir. Ya herî girîng erkên netewe-dewletê çewt dihate dîtin û ramanên sosyalît derdiketin pêş. Vê prosesê bandoreke mezin li ser burjuwaziyê Ewropayê hişt û mejbûr man dest bi reformên nava netewe-dewletê bike. Prosesa reforma ya ku bi desentralizasyona dewleta navendî ve dihate binavkirin dest pê dikir. Ji salên Destpêka 1970'yî ta îro ev proses berdewame. Di vê prosesê de çareseriya sereke nûjenkirina dewleta navendî ye. **Li gelek cîhî ev pirsgirêk di vê çerçoweyê de hate çareserkirin. Di çerçoweya civata pirçandî pir neteweyî de gelek pirs hatine çareserkirin. Lê li gelek welatan jî vê prosesê rê li ber bi dehan dewletên serbixwe vekir. Îro li Ewropayê û li çaraliyê dinyayê ev pirsgirêk û ev proses bi herdû çareseriyan ve berdewam dike.**

Vê pêvajoya jorîn mixabin bandoreke mezin li ser Rojhilata Navîn nekir. Îro hêzên statukoperest, islamiya siyasî ya milîtan, dewletên li ser bingeha nîjadperestiyê û şovenîzmê hatine avakirin û civatên militarize kirî di pêşveçûn û avakirina demokrasiyê de, di nûjenkirina civatê de, di desentralîzasyona dewletê de û di derbarê mafê netewe û kêmneteweyên bindest de li Rojhilata Navîn astengiyên mezin û yên sereke nin. Piraniya van dewletên Rojhilata Navîn, ji avakirina xwe û hetanî îro, kar û barên dewletê ji bandora olî û ji helwestên olî û her wiha ji ramanên şovenî û nîjadperestî azad nekirine. Serkêşên piraniya wan dîktatorin. Bi hêza leşker ve bi darê zorê li ser lingan dimînin.

Îslama siyasî li gelek aliyê dinyayê şoreşa Îranê weke minak nişan dike. Vê pêvajoya nû weke şerê navbeyna du şaristaniyan binav dike û pirsa neteweyî di çerçoweya "umett" iyê de şîrove dike. Bandora şoreşa Îslamê ya Îranê weke şoreşa Fransiz ya sala 1789'an û weke şoreşa Oktobrê ya Rûsya yê ya sala 1917'an şîrove dike û dike pirsa sereke ya nûjenkirina civatê. Li Rojhilata Navîn Îslamiya siyasî û mîlîtanî ji aliyekî ve dijî statukoya heyî derdikeve û vejîneke Îslamî dide pêş û ji aliyekî din ve jî Îslamiya siyasî bi dewlet û hukumetên statukoperest re hevkariyê dike û li dijî hêzên guherxwêz derdikeve. Çareseriya pirsgirêka netewan û ya kêmneteweyan radestî hatina imamê 12'an, Mehdî dike. Îslamiya siyasî jî di nava xwe de perçekirî ye. Sûna û Şîa şerê hezar salî didomînin. Mizgeftên hev bombardûman dikin, sivîla dikujin û bi teroreke nedîtî ve li Rojhilata Navîn pêşiya vê prosesa nû digirin. Ji aliyekî ve bi devkî be jî mafê mazlûma diparêzin lê ji aliyekî din ve mafê mazluma înkar dikin û li aliyê zaliman dewletên dagirker û dîktator cîh digirin. Statukoperest û fundamentalîst in. Tevgera Îslamî ya Rojhilata Navîn ji nasnameyeke hevbeş bêpar e û loma jî gelek carî di nava refê guherparêzan de cîh digire. Di prosesa guherîna statuya Rojhilata Navîn de rola tevgera Îslamî girîng e, lê divê ji bîr û rayên Îslamiya Îranî bi dûr keve.

Digel helwestên aştiyane û yên demokratîk de, hêza navneteweyî û midaxeleya wê dikare rêya çareseriyê amade bike. Lewra Rojhilata Navîn di nava prosesa nûjenkirin û ji nû va sererastkirina dadweriyê (heq û edalet) de ye û hêzên guherparêz di vê prosesa nû de roleke sereke werdigrin. Ger hêza global ya cîhanî bi helwestên ciddî midaxeleya vê pêvajoyê û vê prosesa dijî kevneperestiyê û fundamentaltiyê neke, wê gelên Rojhilata Navîn û aliyekî mezin yê Afrika û yên Asiyewî di nava bîr û helwestên demokratîk û yên fundamental de herin û werin û wê ev proses bê encam bi dawî bê yan jî wê bi derengî bikeve.

Ji aliyekî din li Rojhilata Navîn dewletên şovenîst û dagirker bi israra li ser netewe-dewletê û struktura wê li dijî vê prosesê bi dijwarî radiwestin. Li van dewletana hêzên terorê û hêzên leşkerî serwer in û loma jî statukoperest in. Van dewletana bingeha felsefeya avakirina xwe li ser înkara neteweyên cûda kirine û loma jî di nava tirseke nedîtî de ne. Ji serweriya xwe ditirsin û li dijî vê pêvajoyê bi rêya dîplomasiyê,

bi rêya terorê, bi rêya aboriyê, bi kurtî bi hemi awayî têdikoşin. Vê prosesa nû weke neyar bi nav dikin û bi hemi awayên fundamentalist xwe organîze dikin û li dijî hêzên guherparêz yên navxweyî radiwestin. Lê digel hemi dijberiya dewlet û hêzên statukoperest de jî dîsa pêvajoyeke nû li Rojhilata Navîn dest pê kiriye û êdî tu kesek nikare xwe ji vê pêvajoyê bi dûr bixe. Ev pêvajoya ha prosesa paradîgmaya pêla 3'yem e. Ji Rojhilata Navîn ber bi Efrikayê dihere. Dawî wê dîsa vegere Rojhilata Navîn û wê bandora xwe li ser welatên Qafkasyayî bikin. Ev paradîgma wê bibe nimûneya guherînên netewe-dewletê.

### Paradîgmaya pêla 3'yem

Paradîgmaya pêla 3'yem çi ye? Min li jorê bi kurtî paradîgmaya pêla 1'em û ya 2'yem aniye zimên. Nuha jî dixwazim pêvajoya pêla sêyem bêjim.

Îro piraniya dewletên dinyayê struktura xwe ya kevn dihguherin. Li hemû aliyên dinyayê ev guherîn weke proseseke globalî derdikeve holê. Guherîn piralî û pirrengîn in. Ev guherîn bi çend bêjeyan tê binavkirin. Ya herî berfireh û global avakirina sîstema federalî ye. Ji bilî federasyonê sîstema konfederalî, Otonomî, mafê çandî û gelek awayên din têne bi navkirin. Li Ewropayê Kanton, Land û Bundesland weke sîstema federalî têne bi navkirin. Evan sîstemana hemiyan mirov dikare bi hin navan bîne zimên. Civata pirçandî, civata pirnetewî yan jî civata mozaik û civata kozmopolît. Evana jî yeko yeko van sîstemên li jor hatine zimên dipejirînin. Ez bêtir civata pirçandî bikar tînim. Bi ya min bêjeya civata pirçandî evana gişan tîne zimên yan jî mirov dikare bêje bêjeya civata pirçandî bi naveroka van sîstemana ve pêçayî ye. Loma jî mijarê bi bêjaya civata pirçandî şîrove dikim. Bêguman bingeha civata pirçandî wekhevi û yeksanî ye û biryara bi peymaneke siyasî ve bi hevre jiyanê ye.

Îro jî piraniya dewletên dinyayê pirsgirêka netewa, kêmnetewa, zimanên cûda, ol û çanda cûda di çerçoweya avakirina civatên pirçandî de dibînin û loma jî struktura xwe li gor vê sîstemê ava dikin. Çiqasî van civatana sîstema xwe bi bêjeyên cûda ji bi nav dikin lê dîsa jî bingeha xwe ji netewe, kêmnetewe, yan jî ziman û olên cûda werdigre. Ango avakirina civata pirçandî ji hebûna çandên cûda tê. **Ev sîstem hewil-**

**dana jiyana bi hev re mayinê ye.** Îro ev weke paradîgmayekê di serdemiya globalîzekirina cîhanê de cîh girtiye. Ev paradîgma inkarkirina ideolojiya yekrengî ya netewe-dewletê ye. Inkarkirina ideolojiya wê ya navendî ye. Ango em bixwazin vê paradîgmayê bi şêweyekî teorîk û ideolojîk şîrove bikin emê pir bi asanî bikaribin bêjin ev paradîgma li dijî şovenîzmê, asîmîlasyonê û li dijî inkarkirina çand, ziman û olên cûda ye. **Ev paradîgma Înkariya Înkarê bi xweye.**

Di vê paradîgmayê de bêjeya derdikeve pêş, bêjeya çareseriya globale ku bingehiya xwe ji paradîgmaya wekheviyê û yeksanî yê werdigire. Ev paradîgma dihere û tê û li ser bêjeya, ka pirsgirêka sereke di civatê de çi ye, radiweste û çareseriyên vê pirsgirêkê radixe ber çavên raya giştî. Paradîgma civatê rojeva civatê ya sereke û çareseriyên wê bi xwe ne. Îro yek ji pisgirêkên sereke yên dinyayê pirsgirêka netewa ye. Çareseriyên vê pirsgirêkê devjeniya piraliyên paradîgmaya civatê derdixe holê. Li vir rola ideolojiyê roleke sereke ye. Statukoparêz, fundamental, şovenîst û dagirker li aliyekî vê paradîgmayê radiwestin. Aliyê din jî kedkar, neteweyên bindest, ol, çand û zimanên cûda ne. Di vê tekoşînê de rol û ramanên kedkar û zahmetkêşan ku weke rayên sosyalîst têne binavkirin, ne zelalin. Mixabin piştî têkçûna sîstema sosyalîst ev nezelalî bêtir derketiye holê. Bi vê pêvajoyê ve girêdayî maf û azadiyên çînî jî hewqasî ne zelal in. Sermayedarî bi bîr û rayên xwe yên globalîzmê ve bandoreke mezin li ser vê prosesê dike. Di prosesa bicîhkirina vê paradîgmayê de pir aliyên civatê cîh digrin. Çîna zahmetkêşan, burjuwaziyê biçûk, jin, weke ideolojî, lîberal, sosyalîst, sosyal demokrat, humanîst, aliyên dewr û dor giş cîhê xwe di vê tekoşînê de digirin. Van aliyên civatê bi hevkariyeke globalî tev dilivin û hevkariya aliyên civatê, civatê pêşde dibe, loma jî ev hevkarî pêşverû û serdemî ye. Lê em bixwazin nexwazin tekoşîna neteweyî bêtir bi kêrî burjuwazî tê. Zahmetkêş li gor hêza xwe dikare vê pêvajoyê têxe berjewendiya karger û zahmetkêşan. Aliyê girîng yê vê paradîgmayê bi hevkariyeke gilobal piraniya çîn û aliyên civatê ji bilî hevkarên dewleta strukturel û dagirker di bin alaya azadîxwaziyê de dicivîne. Kîjan aliyê civatê bi hêz û xwe bi rêkxistin kiribe ew alî di pêvajoya tekoşînê de dibe xwedî bandor. Li vê derê em hevkariyeke global û neteweyî dibînin. Hemû aliyên li dijî dewleta merkezî (navendî), hemû aliyên

li dijî dîktatoriyê, hemû aliyên li dijî şovenîzmê û asîmîlasyonê, hemû aliyên azadiya civakî û kesayetî diparêzin, xwe di nava vê paradîgmayê de dibînin. Ev jî aliyê vê paradîgmayê yê erênî yê. Hunandina tekoşîna hêzên vê paradîgmayê di serhildanên Rojhilata Navîn û yên Bakurên Efrikayê de bi zelalî xuya dikin. **Ez vê paradîgmayê weke pêla 3'yem ya demokrasiyê binav dikin.**

Îro kêm dewlet di dinyayê de li dijî vê paradîgmayê radiwestin. Weke li jor jî min anîbû zimên piraniya dewletên dinyayê xwe di nava prosesa vê paradîgmayê de dibînin. Lê hinek dewlet yên li dijî vê paradîgmayê radiwestin jî henin. Serkêşên vê dijîtiyê di Rojhilata Navîn de sê dewletên dagirker, dewletên Ereban û yên Efrîkayê nin. Lê divê em dewletên Qafkasyayê jî ji bîr nekin. Hersê dewletên dagirkerên Kurdistanê, jî di nava xwe de peymaneke nehênî-eşkere pêk anîne. Serkêşê vê peymanê dewleta Tirk e. Dewleta Tirk ji avakirina xwe heta îro, bi destên hêzên dewletê yên nehênî û eşkere, li ser rêbaza vê dijîtiyê xwestiye hebûna xwe bide îsbatkirin. Bingeha vê rêbazê jî inkarkirina netewe, çand û zimanên cûda ye. Vê inkarê jî li ser bingeha asîmîlasyon û nîjadperestiyê avakiriye. Hêza vê inkar, asîmîlasyon û nîjadperestiyê jî hêza dewletê ya leşkerî, siyasî û terora dewletê bi xweye.

Ev peyman, ev inkar, ev asîmîlasyon, ev nîjadperestî ev zilma leşkerî û terorê tenê ji bo afirandina neteweya dewletê ye. Ango dewlet ji avakirina xwe hatanî îro xwestiye neteweya dewletê pêk bîne. Neteweyeke ji hemû netewe, kêmnetewe, ziman, ol û çandên cûda ava bike. Bi zimanekî din dewletê xwestiye hemû netewe, kêmnetwe, ziman, çand û olên cûda di nava xwe de bi ideolojiya nîjadperestiyê bihelîne û nîjadeke pak û yekta derbixe. Dewletê bi vê xeyalê û bi vê xewnê ideolojiya dewletê ya fermî çêkiriye. Bi vê ideolojiya nîjadperestî her sê dewletên dagirker û nîjadperest heta îro nikaribûn neteweya xwe ya yekta ava bikin. Aliyekî dewleta Tirk di vê pêvajoyê de xweş tê gîhiştiye. Li jêrê helwesta artêşa dewleta Tirk ji devê sererkanê leşkerî ve hatiye şîrovekirin. Ev bi xwe tenê jî cîhê dewleta Tirk li dinyayê xuya dike. Lê rastiyek ji hemû aliyên dewletê ve eşkere bûye. Ew jî ev e: **Dewlet di projeya xwe ya afirandina neteweyeke yekta de bi ser neketiye û ji nuha û pêve jî nikare biser keve. Lê çend aliyên dewletê naxwazin ji ceneta xwe bibin. Loma jî bi her awayî dijberî**

**vê pêvajoyê radiwestin. Bi gelemperî nêrînên li jêrê hatine nivîsîn yên sererkanê kevn yê dewleta Tirk, îro jî didomin. Piştî bi dehan salan jî hînê nêrîn û helwesta dewleta Tirk ne hatiye guherîn.**

Dewleta şahinşahî û berdewamiya wê dewleta Îslamî ya Îranê ji dewleta Tirk ya Kemalîst ne kêmtir e. Li Îranê jî weke Tirkiyê dewletê xwestiye nîjadeke pak ava bike, ango nîjada Farisî. Ne dewleta şahinşahî û ne jî komara Îslamî di vê projeya xwe de bi ser neketiye û bi ser nakeve. Dewleta Elewî ya faşîst ya Suriyê weke ya Tirk li ser bingeha înkarê hatiye avakirin. Dewleta tenê beşeke ji civatê ye, fundamentalîste û statukoperest e. Ji avakirina xwe heta îro ji bin bandora leşkerî derneketiye û weke dewleteke terorîst û dîktator di Rojhilata Navînde bûye astengê bi cîh kirina demokrasiyê. Sûnna û Şîa yên Iraqê jî weke wan asteng in. Lê hêzên demokrat û pêşverû der û dora wan bi girseyî pêçane û loma jî îro ew di nava vê prosesê de ji mecbûrî cîh digrin.

### Nimûneyên paradîgmaya pêla 3'yem

Dewleta Tirk minakên dinyayê ji ber cavên raya gistî ya Tirkiyê vedişêre. Dewlet bi nivîskar û dîroknasên xwe re teorî û felsefeya vê veşartinê amade dike. Ez dixwazim çend minakên li dinyayê ku raya giştî ya Tirkiyê haya wê jê tuneye bînim zimên.

Weke min li jor jî anîbû zimên îro piraniya dewletên dinyayê xwe di nava vê paradîgmaya global ya navneteweyî de dibînin. Ji wana çend minakan dixwazim bidim.

"Yekgirtina Dewletên Emerikayê, Komara Federe ya Brezîlya yê (Republica Federetiva do Brazil), Konfederasyona Kanadayê, Yekîtiya Hîndîstanê,Yekîtiya Birmanyayê, Komara Efrika Başûr ya Federal, Komara Nijeriya ya Federe"[120] Li Komara Efrika Başûr 11 zimanê fermî hene. Sîngapor bi çar zimanê fermî xwe weke civateke pirçandî binav dike.

Li Yekîtiya dewletên Hindîstanê, ku bi 28 perçe-dewletan û bi 7 dewletên yekgirtî ve weke demokrasiya herî mezin li dinyayê tê nasîn, bi15 zimanê fermî yê dewletê û bi 2 zimanê fermî yên herêman ve xwe birêkxistin kiriye. Mirov dikare dewleta Çînê, Endoneziyayê û gelek

---

120 *Avrupa Birliğinde Devlet ve Fransa da Korsika*, M. Şehmus Güzel, Araştırma-İnceleme, Perî Yayınları, Mart.2006.

welatên din nişan bide. Çawa ev pirs li Ewropayê û li welatên din weke çareserî hatiye dîtin li Asyayê jî ev pirs ketiye rojeva gelek welatan û gelek welatan çareseriyên xwe bicîh kirine. Yek ji wan welatan jî Hîndîstan e. Ta radeyekê Pakîstan e, Endonezya ye, Sîngapûr e û ya girîn jî Iraqa federal e.

Evan dewletên li jor hatine binavkirin hemû xwe weke dewletên pirneteweyî yan jî pirçandî binav dikin. Weke Pakîstan, ta radeyekê Afganîstan jî bi gelek zimanên fermî û bi herêmên otonom ve di nava vî kerwanî de cîh digirin. Mirov nikare bêje li van welatana pirsgirêkên netewan û kêmnetewan bi dawî hatine. Lê bi asanî mirov dikare bêje pirsgirêkên van welatana bi hinek awayan hatiye çareserkirin yan jî prosesa çareseriyê berdewam dike. Li van welatana bingeha inkarê ya civakî û sosyal lawaz bûye. Dem bi dem şovenîst û statukoparêz bûne serwer. Çareseriyên civatê piştguh kirine. Lê şovenîzma yekneteweyî li van welatana kêm e yan jî tuneye. Di nava wan welatana de em konsensuseke (lihevhatinek) civata pirçandî dibînin. Kêmasiyên vê konsensusê gelek in lê tu caran ne weke kêmasiyên dewleta nîjadperest in, ango netewe-dewlet in. Evana yên derveyî Ewropayê ne. Lê dewletên Ewropayê jî ji vana ne kêmtirin.

Li Ewropayê Ji Fransayê em dest pê bikin. Fransa 200 sal in ku dixwaze neteweya xwe ava bike. Fransa û Îtalya ji bona Tirkiyê xezîneya yasaya ne. Çi yasayên şovenîst, nîjadperest hebin ji van welatana hatine girtin. Ewana bi xwe dev ji van yasayan berdane, lê dewleta Tirk dev ji van yasayana bernade. Dewleta Tirk li hêviya dewletên Ewropayê ye ku kî ji wan yasayekê ji makzagona xwe derxe û bavêje nava gemarê wê siyasetmedarên dewleta Tirk herin û wê wan yasayana ji nava gemarê derbixin û wê bikin makzagona xwe. Hemû yasayên ji Ewropayê re nabin, gemar û qirêj in Dewleta Tirk wana top dike. Ango Makzagona Dewleta Tirk bûye sergoyê yasayên dewletên Ewropayê.

Em mijara Fransayê berdewam bikin. Fransa yê, dixwest hemû netewan û kêmnetewan di nava neteweya Fransizî de bihelîne û neteweyeke nûjen derbixe. Lê pistî 200 salî li xwe verqilî û tê gihîşt ku ew di vê mijarê de nikare bi ser bikeve.

Mecbûr ma dev ji vê xewna xwe ya 200 salan berde. Fransa di şerê li dijî Korsîkiyê de bi ser neket. Îro Korsîkî jî di nav de netewe

û kêmneteweyên li Fransayê bi hinek mafên herêmî erkên dewleta navendî payê dikin. Dewleta navendî ya Fransayê di mebesta ji hemû netewa û kêmneteweyan yek neteweyî ava bike bi ser neket.

Asîmîlasyon û zordariya dewleta navendî ya bi salan tirsa dewletê ji holê ranekir. Neteweyan û kêmneteweyan dev ji mafê xwe yê rewa bernedan. Fransa yek ji wan dewletên navendî yên Ewropayê bû. Hemû mihawele û cahda dewletê ya bi salan têra pêkanîna yek neteweyî nekir. Herêmên Fransayê helwesta netewe-dewletê ya navendî nepejirandin. Struktura kevnare xetimî û di pêşveçûna civatê de bû asteng.

Dewletê di sala 2003'yan de Makzagona xwe guhert. "La France est une Republique Decentralisêe" Bi vê yasaya makzagonê ve dewleta navendî ji nû va decentralîze (ademî merkezî) bû. Mafên herêma û yên hinek kêm neteweyan di çerçeweya decentralîzasyonê de hate dayîn û dewlet ji nû va hate vejandin. Fransa êdî weke dewleteke pirçandî tê qebûlkirin. Lê bi hemû guherînan vê hînê jî dewleta navendî pirsgirêkên netewa û kêmnetewan bi dawî nehatiye û çareser nebûye. Fransa yek ji wan dewletên Ewropayê ye ku divê sîstema dewleta xwe demokratîzetir bike. Li Fransayê mafê netewan û kêmnetewan îro jî di rojeva dewleta Fransayê de cîhekî girîng digire.

### Li Fransayê Baskî

Baskiyên Faransayê bi alîkariya rêxistina ETA'yê têne nasîn. Di dema Franko de û di pêvajoya piştî Franko de Baskiyan Fransa, weke cîhê parastina milîtanên ETA'yê û weke karargaha planên operasyonên ETA'yê dihate binav kirin. Vê helwesta Fransayê dibû astengiyeke berbiçav ya dîplomasiya di navbeyana Îspanya û Fransayê de. Gelek Baskiyên Îspanî derbasî Fransayê dibûn û di nava Baskiyên Fransayê de cîh digirtin. Kilîseyên Fransayê jî alîkariya hêza Baskiyan ya li dijî Franko dikir û nasnameya Baskiyan qebûl dikir. Helwesta Klîseyên Fransayê rê li ber tevgera ETA'yê vedikir û bi gelemperî alîkariya Baskiyan dikir.

Pistî sala 1973'yan û piştî kuştina Carrero Blanco helwesta dewleta Fransayê ya li dijî ETA'yê hate guhertin. Sedemeke din jî yê helwesta Fransayê diguhert, helwesta ETA'yê bi xwe bû. ETA'yê li Fransayê jî dest bikaranîna şîdetê dikir. Li Baskiyan Fransayê jî vê nexweşiyê dest

pê kiribû û vê helwesta ETA'yê Fransa dixist nava gumanan. Sedema sêyem jî guherîna makzagona Îspanyayê bû. Makzagona Ispanyayê ya nû di sala 1978'an de hate guherîn û Baskiyan otonomiya xwe di sala 1979'an de bidest xistin. Herwiha Îspanya dibû endamê YE (Yekîtiya Ewropayê), û dibû endamê NATO'yê. Evan hersê sedemên dawîn helwesta Fransayê ya bi ser ETA'yê ve guhert. Fransa bi dijwarî li dijî ETA'yê rawestiya. Gelek ji endamên ETA'yê hatin girtin yan jî derxistin derveyî welêt. Di navbeyna salên 1986-1988'an de 200 endamên ETA'yê radestî Ispanyayê kirin. Fransayê ji ETA'yê re zahmetiyên mezin peyda kir û pêşiya operasyonên şîdetê rawestand. Li Fransayê pirsgirêka Baskiyan bi dawî nehatiye û Baskî mafê xwe yê rewa li perçeyê Fransayê jî dixwazin û ji bona mafê xwe têdikoşin.

### Li Fransayê pirsgirêka Korsikayê

Tekoşîna Korsîkiyan ya ji bo mafê neteweyî û herêmî bi dîrokeke dûr û dirêj ve tê nasîn. Şerê Korsîkiyan li ewropayê baş tê nasîn. Dewleta Fransayê bi salan di ber xwe da û mafê Korsîkiyan înkar kir. Lê Korsîkiyan dev ji têkoşîna xwe bernedan. Îro Korsîka weke herêmeke taybet-otonom bi statuyeke xweser ve hatiye qebûlkirin. Îro hukumeta Korsîkan ya herêmî û meclîsa Korsîkan ya herêmî heye. Korsîkan bi yasaya sala 1991'ê ve bi navekî û bi statuyeke taybet "Collectivité Territoriale de Corse" Kolektîviya xakî ya Korsîkayê ve bi yasayî hatiye qebûl kirin.

Erkên vê hukumet û meclîsê berfireh in. Pirsa Aboriyê , turîzmê, karê xwezayî yê, karê zîraetê, pirsa enerjiyê, pirsa avadaniyê, pirsa perwerdeyê, pirsa unîversîteyê û perwerdeya bilind, pirsa zimanê Korsîkî û perwerdeya bi zimanê Korsîkî, hêza polîs û asayişa navxweyî çend erkên meclîs û hukumeta Korsîkî ne.

### Meclîsa korsîkayê

Pirsgirêka vê giravê ji sala 1982'an û virde bi erkên meclîsa Korsîkayê ve têne çareserkirin. Meclîsa Korsîkayê ji 51 endaman ve pêk tê û ji aliyê Korsîkiyan ve têne hilbijartin. Ev meclîs butçeya giravê û hukumeta wê dipejirîne û çavdêriyê li ser xebata hukumetê dike. Parlemena Fransayê bêyî biryara meclîsa Korsîkayê nikare di derbarê korsîkayê

de biryaran bigire. Meclîsê di sala 1992'an de zimanê Korsîkî li giravê fermî kir. Zimanê meclîsê bû du zimanê fermî. Korsîkî û Fransizî.

**Minakên din yên Ewropayê**

Berî ruxandina sîstema sosyalîst û berî bihêzbûyina globalîzmê, dewleta Îspanî yek ji wan dewletên Ewropayê ye ku dest bi vejandina dewleta merkezî kiriye. Ji nû ve vejandina dewletê li ser pirensîbên pirneteweyî û pircandî pêk hatiye. Li jêrê ez vê pirsê bi berfirehî digrim dest, Lê niha bi kurtî jî be dixwazim hinekî li ser vê rawestim.

Îspanya di sala 1975'an de piştî mirina Franko bi 17 herêmên otonom ve xwe ji nûve weke dewleteke pirnetweyî û pirçandî vejandiye. Struktura xwe ya dewleta navendî guhertiye û bûye dewleteke federe/nîv-federe.

Îtaliya jî bi gelek herêmên otonom ve û bi desentralîzasyona dewleta merkezî ve xwe ji nûve vejandiye û îro weke dewleteke federe tê binavkirin.

Îro him li Fransayê û him jî li Îtalyayê herêmên otonom xwedî meclîs in û xwedî serok in. Erkên wan meclîsa bi yasayî hatiye pejirandin. Îtalya weke minak, di 1977'an de bi guherîna paragrafa makzagonê ya 4'an ve, mafê herêmên xweser (otonom) ku dikarin têkiliyên xwe yên navneteweyî deynin pejirandiye.

Belçîka di sala 1993'yan de bi makzagonî û bi yasayî ve xwe ji nû ve vejandiye. Belçîka bûye dewleteke federal. Bi Valonya, Flemenya û Bruksel ve bûye weke dewleteke sê perçeyî, lê yekgirtî. Ji bilî hersê herêmên federe, çend herêmên biçûk jî hene ku ew jî weke herêmên otonomî hatine qebûlkirin.Yek ji wana li bakurê Belcîkayê herêma Elmanîaxêva ye ku nûfusa wê 80.000 e.

Piştî Belcîkayê Brîtanyaya Mezin struktura dewleta xwe guhert û xwe weke dewleteke federe ya asîmetrîk binav kir. Di sala 1997'an de Îskocya, Galler bi referandûmê mafê otonomî wergirtin. Îrlanda bakur jî weke wan xweseriya (otonomiya) xwe pejirand. Îro Brîtanya Mezin bi 4 perçeyên otonom ve weke dewleteke federe tê binavkirin. Îngîltere (London), Îskocya, Galler û Îrlanda Bakur.

Elmanya weke komareke federe bi navê Land'a (welat) piştî şerê cîhanê yê duyem xwe ji nû va vejand. Îro komara Elmanya yê ji 16

land'a ( dewletên federal) pêk tê. Evana bi navê Bundesland- weke yekîtiya dewletan hatiye organîzekirin. Ji vana sê land (dewlet, beş) weke bajarên, "**Bajar-dewlet**" têne binavkirin. Berlîn, Bremen û Hambûrg. Hersê jî weke bajar-dewletên xweser in.

Di nava YE (Yekîtiya Ewropayê) de, hemû herêmên otonom yên van dewletên federe bi organîzeyên xwe ve nûneriya herêmên xwe dikin. Herwiha nûnerên van herêmana bi yasayî dikarin têkiliyên xwe yên navneteweyî deynin. Têkiliyên xwe him bi dewletên cûda re û him jî bi herêmên otonom re dikarin ava bikin. Îro YE yê bi herêmên xwe yên otonom ve, bi dewletên xwe yên federal ve weke dewleteke konfederal ji nû va tê vejandin.

Pistî serê cîhanê weke tê zanîn Swisre xwe weke Kantona binav kir û xwe ji nû va vejand. Swisre bi 23 kantonên mezin û bi 3 kantonên biçûk, bi 26 kantonan ve xwe weke dewleteke konfederatif tîne zimên. Hînê di sala 1291'ê de 3 kantonên mezin yên Swisreyê- **Unterwalden, Urî û Schwyz, bi hevre bi navê Edsforbundet konfederasyonek ava kirin**. Ev hersê herêm yan jî her sê kanton weke bingeha dewleta konfedere hatine ba hev û dewleta xwe ya konfedere ava kirine. Di sala 1815'an de sîstema kantona bi berfirehî berdewam kir. Di sala 1979'an de pirsa Kantona careke dî di nava gelên Swîsreyê de ciyê xwe girt û hejmara kantona zêde bû. Li Swisreyê îro sê zimanê dewletê yê fermî hene. Elmanîaxêv %63,7 Fransizîaxêv %20,4 Îtalîaxêv jî %6,5 in. Zimanekî din jî heye ku ne zimanekî fermiye, lê li gelek ciyan weke zimanekî fermî bikar tê. Ev ziman jî Romanî ye. Romanî weke zimanekî neteweyî tê zanîn lê ne zimanekî fermî ye. Swisreyê yan jî Schweiz weke navekî hevbeş hatiye qebulkirin. Schweiz bi maneya konfederaliya 26 kantona ve tê naskirin. Hemû yasa bi hemû zimanên fermî hatiye nivîsîn. Swisreyê dewleteke konfedere bi kantona ve hatiye organîzekirin. Her kanton makzagona xwe û meclisa xwe û hukumeta xwe heye. Ev konfederasyon weke komar-dewlete. Ji sala 1848'an û virde çend kantona xwestin bi serê xwe bin û ne di nava kantonên din da cîh bigrin. Weke minak, Kantona îro bi navê Jura, ku Fransizîaxêv e û katolîk e, xwest ji nava kantona Bernê ku ew Elmanîaxêvin û protestanin veqete. Bi rêya referandûmê ji Bernê veqetiya û bû kantoneke bi serê xwe. Mafê hemû kantona ya serbixweyî heye. Ango kanton bix-

wazin bi rêya referandumê dikarin vî mafê xwe bikar bînin û veqetin. Prensîbên bingehî tenê divê ew kanton sîstema komariyê bipejirîne û wekheviyê û mafê mirova biparêze. Lê kanton ji konfederasyonê venaqetin. Hemû kanton xwedî maf in û herdem dikarin vî mafê xwe bikar bînin. Swisre Îro weke dewleteke sê perçeyî û konfederal bi sê zimanê fermî ve dewleteke yekgirtî tê nasîn.

**Ewusturya**

Îro di nava YE a yê de yên sîstema federalî bi dijwarî diparêzin yek ji wan Elmanya û ya din jî Ewusturya ye. Ji bo ku Ewusturya hate binavkirin dixwazim çend gotinan li ser wê jî bînim zimên. Ango Ewustyurya jî weke dewleteke federe ya Elmanya xwe bi nav dike. Bandora herdû dewletan ya siyasî ya ji bo sîstema federalî di nava YE'yê de xurt e. Ewusturya di sala 1918'an de bû komarek serbixwe ku ew jî weke Swîsreyê bi navê "Forbundsrepublik" hate avakirin. Imparatoriya Ewusturya-Macarîstan perçe bû û serxwebûna Macarîstan, Çekoslowakya, Polonya, Slovenya, Kroasiya û Sirbîstan derket holê û serxwebûna xwe bidest xistin. Di sala 1945'an de Ewusturya weke Elmanya ji aliyê Sowyet, Emerîka, Ingilîz û Fransiza ve hate dagirkirin. Welatê Ewusturya kirin çar perçe. Ewusturya di bin dagirkirinê de 10 salan ma û di 1955'an de serbixwe bû. Ewusturya xwe weke dewleteke demokratîk organîze kir û di nava blokên siyasî de bê alî ma.

Ewusturya di avakirina dewletê de xwe weke dewleteke federe organîze kir. Ew jî weke Elmanya ji landan (dewletan), pêk tê. Dewlet bi xwe **Forbundsrepublik e**, Ango Komara yekîtiya dewletan e. Ji 9 (neh) welatê ku bi navê "Bundesland" têne naskirin ji nû va dewleta xwe ya Federal avakir û di sala 1995'an de bû endamê Yekîtiya Ewropayê. Hemû Bûndesrepublik, xwedî meclîs in û xwedî erk in.

**Zimanê fermî yên Federasyona Ewusturyayê:** Slovenî, ku li Kärnten ê fermî ye û ji nûfusa Ewosturyayê % 0,3 bi vî zimanî diaxivin. Kärnten- Slovenya ji sala 1955'an ve weke herêmeke otonom e. Kroasî, li herêma Burgenlund'ê fermî ye. Ew jî weke Sloveniya weke netewyekî têne qebûlkirin û mafê wan yên otonomî heye. Elmanî ji xwe zimanekî fermî ye û % 90 bi vê zaravaya Elmanî ya Ewusturyayî

diaxivin. **Ewusturya di sala 2001'an de li gor prensîbên YE ê, mafê ziman û herêma ji nû va bi strukturekе nû bi yasayî ve qebûl kir.** Weke minak: Kroasî li Burgenlund, Slovenî li Kärnten û Steiermark, Macarî li Burgenland û Wiyana, Çekî li Viyana, Slowakî li Viyana, Romanî li Burenlund ê bûne zimanê fermî yên dewletê.

**Bosniya û Hersek,** dewleteke nû ya federal e. Li vî welatî 3 zimanên fermî hene. Bosnî, Serbî û Kroasî. Bosniyan bi destêwerdaneke navneteweyî ji bin zilma Serbiyan azad bû. Piştî azadiya xwe bi devjeniyên berfireh, yên netweyî û navneteweyî pirsgirêkên Bosniyan û neteweyên li Bosniya yê bi berfirehî berdewam kir. Pirsgirêk di çerçoweya federaliyê de hate dîtin û hêzên neteweyî û navnetweyî li ser vê çareseriyê li hev kirin. Ev bi xwe bi destxistineke girîng ya pêla 3'yem ya paradîgmaya demokrasiyê ye. Ev mînak weke minakeke berbiçav hate dîtin û pirsgirêkên neteweyên li Bosniya yê demî be jî hatine çareserkirin. Pirsgirêka Bosniyayê pir girîng e. Ji aliyekî ve di vê pêvajoya pêla 3'yem de mînaka avakirina dewleta serbixwe ye. Ji aliyekî din ve Bosniya bi çareseriyên navxweyî yên netewa ve minaka pêvajoya avakirina dewleta pir çandî ye. Bi Bosniyayê, bi Kosowayê ve herdû pêvajoyên vê pêla 3'yem bi eşkereyî dertên holê. Ezê li jêrê vê pêvajoya Bosniyayê û Kosowayê bi kurtî be jî raxim ber çavan.

Li Fînlandiyayê 2 zimanê fermî yê dewletê hene. Girava Åland ê Otonom e. Portekîz jî yek ji wan welatên Ewropayê ye ku herêmên wê yên otonom hene. Li Portekîzê ji bilî Portugalî ku zimanê dewletê yê fermî ye, zimanê Mîrandî jî li herêma xwe weke zimanekî fermî ye. Li Swêdê 6 zimanê fermî hene. 5 kêmnetewe li vî welatî xwedî maf in. Meclîsê wan, partiyên wan yên siyasî hene. Hejmara van kêmnetewan gişa bi qasî bajarekî Kurdistanê nabe. Lê mafê wan yên kêmneteweyî heye."[121]

Ewropa bi tecrubeyên xwe xezîneya mînakan e. Lê divê mirov mînakên Ewropayê baş û rast bixwîne. Ne weke nivîskarên Tirk ku derin, digerin û kîjan mînaka xerab bibînin dinivîsin û ji dewletê re dikin mînak. Dûre siyasetmedarên Tirk ji wan dixwînin û ji mînakên wan tecrubeyan digirin.

---

121 *Ulusal Sorun ve Çözüm Arayışı*, Nezir Akat, Helwest förlag/Yayınları İstanbul/ Stockholm-2010.

### Pêvajoya paradîgmaya pêla 3'yem

Piştî şerê cîhanê yê duyem û piştî rûxandina sîstema sosyalîst û herwiha bi prosesa bihêzkirina gilobalîzekirina dinyayê ve pêvajoya nû ya ji nû va guherîna dewletên merkezî ketiye rojeva gelên cîhanê. **Ev paradîgmaya pêla 3'yem ya demokrasiya navneteweyî ye.** Bi bayê vê pêlê ve girêdayî, gelek dewletan xwe guhertine û hin dewlet hînê jî di nava vê prosesê de ji bo struktureke demokratîktir kar dikin.

Ev pêvajo û ev proses li Ewropayê bi gelemperî hînê jî berdewam e. Îro li Ewropayê 200 herêm hene. Evana di nava "**Assemblee des regions d'Europé** " Meclîsa herêmên Ewropayê de hatine ba hev. Bi vê organîzeyê him mafê xwe yên welatê lê otonom in, diparêzin him jî têkiliyên ciddî bihev re ava dikin. Armanca vê meclîsê, parastina mafê herêman û erkên hukumetên herêman e. Dewleta Tirk ji bo endametiya YE dixebite, divê tevgera Bakurê Kurdistanê jî bixebite ku bibe aliyekî diyalogê û ji aliyekî din ve jî bixwaze cîh di nava vê meclîsa netewa û kêmneteweyên Ewropayê de bigre. Kurd ji YE bêtir di nava vê meclîsê de dikarin karekî mezin bikin.

### Pêla 3'yem û herdû pêvajoyên wê

Di vê pêla 3'yem ya demokrasiyê de du pêvajoyên berbiçav di rojeva mirovahiyê de ciyekî girîng digrin. Serkêşiya vê pêlê, netewe û kêmneteweyên bindest dikşînin. Pêvajoya yekem ya paradîgmaya pêla 3'yem, ji şerê cîhanê yê duyem ve dest pê kiriye û ji sala 1970'yî û virde jî bi gelemperî di jiyana siyasî û civakî ya cîhanê de roleke girîng wergirtiye. Di vê mînaka yekem de bûyera sereke ji nû va vejandina dewleta merkezî, netewe-dewlet e. Di vê pêvajoyê de diyardeya sereke destpêkirina vejandina dewleta navendî ye ku erk û watiniyên xwe radestî netewan, kêmnetewan û herêmên cûda dike û dewleta federe/nîvfedere, devulation, Land yan jî weke dewleta konfedere ji nû va ava dikin. Ez vê pêvajoyê bi **pêla 3'yem ya demokrasiyê ya pêvajoya yekem** ve bi nav dikim. Diyardeya serkêşê vê pêvajoyê avakirina civata pirçandî ye. Di vê pêvajoyê de hêza neteweya serdest bi pêşveçûna civatê ve girêdayî û bi têkoşîna bê rawestan ya netewan ve bîr û rayên xwe diguhere. **Ev guherîn dibe diyardeya bêyî netewe-dewletê ên cûda, yên serbixwe bêne avakirin, hemû aliyên cûda**

**yên civatê li ser peymaneke siyasî û civakî li hev dikin û jiyana bi hevre mayinê di çerçoweya makzagoneke demokratîk de ku bingehiya xwe ji wekheviyê û yeksanî yê werdigre diafirînin û bi hevre dewleta merkezî, ya yek rengî, yek neteweyî, yek çandî, yek alî, yek zimanî ji nû va divejînin û civateke demokratîk û serdem, civata pirçandî ava dikin.** Vê **pêvajoya yekem ya pêla 3'yeme,** weke derfeteke dîrokî him ji bo neperçebûna dewletên navendî û him jî ji bo netewe û kêmneteweyên bindest e ku dikarin mafên xwe yên rewa bidest bixin. Vê pêvajoya yekem ya pêla 3'yem pêla serdemiya sedsala 21ê ye û derfeteke bêhempa li pêşiya democratizekirina dinyayê vedike. Îro hemi û aliyên civatê yên guherparêz dibin ala vê pêvajoyê de ji bo wekheviyê û mafê mirovan têdikoşin. Di vê pêvajoya yekem ya prosesa pêla 3'yem de rola globalîzekirina sermayedariyê ku sînoran ji holê radike û nasnameyeke navneteweyî diafirîne biryardêr e. Mînakên vê pêvajoyê bi kurtî be jî min li jorê anîbû zimên. Li jêrê jî ezê bi çend mînakan ve vê mijarê bêtir ronî bikim.

**Pêvajoya duyem ya, paradîgmaya pêla 3'yem çi ye?**

**Pêvajoya duyem ya prosesa pêla 3'yem jî giring e. Vê pêvajoya duyem ya paradîgmaya pêla 3'yem, piştî rûxandina sîstema sosyalîst geştir bû. Di vê pêvajoyê de pirsa sereke dîsa pirsgirêka netewan e. Çareseriyên vê pêvajoyê jî, berevajî pêvajoya yekem ya paradîgmaya pêla 3'yem e. Di vê pêvajoyê de çareserî weke avakirina dewleta serbixwe ya pirneteweyî ye.** Ango di vê pêvajoyê de neteweyeke sereke yê bindest weke mînak Kosowî, Boşnakî, ji bo avakirina dewleta serbixweyî şer dikin û bi alîkariya hêzên navxweyî û navneteweyî dewleta xwe ya serbixwe ava dikin. **Lê di avakirina vê dewleta serbixwe de dewlet ne weke netewe-dewletê tê avakirin.** Di pêvajoya vê çareseriyê de pirsa sereke ev e, ango dewlet ne dewleta neteweyeke tenê tê ava kirin. Netewe û kêmneteweyên vê dewletê bi hev re li ser peymanekê li hev dikin û dewleta hevbeş ava dikin. Hêzên di avakirina dewletê de cîh digrin, mafê hemû netewa , kêmnetewa, zimanê cûda û olên cûda didin ber çav û bi çareseriya avakirina civata pirçandî ve ango bi wekheviya neteweyên cûda ve dewleta federal/konfederal û bi xweseriyên herêmî ava dikin û bi peymaneke siyasî ango bi mak-

zagoneke hevbeş jiyana bi hev re mayinê di nava vê dewleta nû ya serbixwe û federal de dibînin. **Divê ev pêvajo jî baş bê lêkolîn. Loma ev pêvajo herdû pêvajoyên sereke yên paradîgmaya pêla 3'yem di nava xwe de dipêçe û ji bo her dû mînakan tecrubeyên dewlemend radestî cîhana serdemî dike.**

**Di berbanga rûdanên dawî yên dinyayê de çareseriya pirsa neteweyî û bingeha avakirina civata pirçandî. Ango beşa yekem ya paradîgmaya pêla 3'yem.**

Yek ji rûdanên sereke yên li cîhanê têkçûna sîstema sosyalîst e. Çawa di avabûna sîstema sosyalîst de pêvajoyeke nuh li cîhanê dest pikiribe, herwiha bi têkçûna wê re jî pêvajoyeke nuh li cîhanê dest pê kiriye. Ez ê li jêrê, sîstema sosyalîst û pirsa neteweyan û civata pirçandî bînim zimên. Lê yek ji bûyerên li cîhanê belkî ya sereke ku di vê pêvajoyê de derket holê jî, destpêkirina globalîzmê ye. Globalîzmê gelek mefhûm û helwestên nuh derxistin holê. Bi globalîzmê ve girêdayî bi gelemperî nasname jî ji nuh va hate şîrovekirin. Gelek tabû hatin şikandin. Nasname û sînorên dewletan ji nuh va hatine guherîn. Yek ji prensîbên Yekgirtiya Neteweyan (NY) ya "**neguherîna sînoran**" têk çû.

Ev herdû pêvajoyên girîng li cîhanê, nemaze piştî salên 1990'î, du pêlên demokrasiyê bi xwe re anîn. Ev herdû pêl jî weke du çareseriyên berbiçav yên pirsgirêkên neteweyan di vê pêvajoyê da dest pê kirin. Yek ji wan pêvajoyan avakirina yan jî ji nû va vejîna dewletên pirçandî, pirneteweyî ye. Ya duyem jî pêvajoya guherandina sînorên dewletan e ku bi xwe re bi dehan dewletên serbixwe peyda kiriye. Ev dewletên serbixwe bêtir ji nav Yekîtiya Sovyetê û ji nava Yugoslavya ya kevin derketin. Ezê di vê nivîsa xwe de li ser pêvajoya yekem ya dewletên pirçandî rawestim. Ango pêvajoya yekem ya paradîgmaya pêla 3'yem bînim zimên.

**Pêvajoya yekem;** Destpêkirina guherîna nasname û ji nuh va hûnandina dewletên netewe-dewlet û yên unîter in. Di vê pêvajoyê de, dewletên unîter bi dewirkirin û radestkirina serweriyên xwe yên navenda dewletê ve hûnandina federatîf û xweseriyên herêmî ve dest pê kiriye. Li gelek welatan jî mafê kêmnetewa hatiye dayîn û dewlet ji nuh ve hatiye vejandin. Vê pêvajoya yekem bêtir bandora xwe li ser dewletên Ewropa rojava hiştiye. Di vê pêvajoyê de Ispanya mafên

berfireh yên neteweyî da welatê Bask û Katalonya û galicya. Îspanyayê bi hivde (17) herêm û du bajarên otonom ve dewlet li ser prensîbên federalîzmê/nîvfederalîzmê ji nuh va vejand û hûnand. Civatên otonom yên Îspanyayê bi wate û erkên xwe ve ji yên Elmanyayê gelekî berfirehtir in û bi serweriyen yasayî ve cûdatir in. Pêvajoya federatîf ya Elmanyayê, di dema piştî şerê cîhanê de hatiye holê û li gora rewşa Elmanyayê hatiye vejandin. Li Swîsreyê pêvajoya dest pê kirî pêvajoya hûnandina dewleta pirçandî û pirneteweyî bû. Di sala 1957'an de cara yekem li vê derê binavkirina civata pirçandî hatiye holê. Li Swîsreyê sîstema federalî/Konfederalî bi" Kanton"an tê binavkirin. Neteweyên cûda di nava dewletekê de bi hev re û bi mafê wekhevî ve bi hevre jiyan kirine prensîbên dewleta federalî-Konfederalî.

Li Îspanyayê bi qanûnan mafê vekirina komele û partiyên siyasî yên neteweyî-etnîkî-heye û ev jî pirengî û pirçandiyeke bêhempa di nav civatê de peyda dike. Her wiha zimanên fermî yên dewletê jî gelek in. Li Îtalyayê jî 20 herêmên otonom hene. Ew jî xwe weke dewleteke federe bi nav dike, lê federalîzma Îtalyayê radestkirina berfirehî ya erkên herêmî ye û nêzîkî federalîzma Elmanyayê ye. Li vir ez dixwazim cûdahiya dewletên federe yên Ewropa rojava yên piştî şerê cîhanê û yên piştî pêvajoya globalîzmê raxim ber çavan. Lê ya pêwîst li vê derê ev e ku wan dewletên ez tînim zimên hemû xwe weke dewletên pirçandî bi nav dikin. Hemiyan di vê dema ku ez bahs dikim ango ji 1990î û virde gelek guherînên girîng di struktura civatên xwe de pêk anîne. Federalîzm û konfederalîzm û mafên herêmên xweserî bi berfirehî bi cîh bûne lê cûdahiyên wan gelek in. Ji xwe ev cûdahî bi xwe alternatîfên berfireh pêşkêşî me dikin. Ev jî pirengiya çareseriyên neteweyî radestî me dikin.

Di vê pêvajoya nuh da Belçîka ciyekî girîng digre. Belçîka di sala 1993'yan de bi fermî dewleta federe ava kir. Li Belçîkayê neteweyên cûda bi wekheviyeke neteweyî erk û watiniyên hemwelatiyên dewleta federalî payê kirin. Zimanên fermî yên sereke sisê ne (3). Ev pêvajoya Belçîkayê bandoreke mezin li ser dewletên din kir û binavkirina civatên pirçandî, pirzimanî, pirneteweyî li seranserê Ewropayê bi berfirehî belav bû. Îngîltereyê (Britanyaya Mezin), di sala 1998'an de mafê otonomî ji bo Îskoçya û Gallerê qebûl kir û xwe weke dewleteke

federatîf ya asîmetrîk bi nav kir. Dawî jî Irlanda bakur mafê herêma xweser bi dest xist. Fransayê di van salên dawî de mafê kêmnetewan û mafê zimanên cûda bi berfirehî xistiye rojeva guherandina yasayên dewletê û pirsa mafê kêmnetewan bêtir têne minaqeşekirin. Fransa ji nuha ve xwe weke Birîtanyaya mezin, weke Îspanya û weke Belçîkayê civateke pirçandî bi nav dike. Vê pêvajoya li Rojavayê Ewropayê bandoreke mezin li seranserê Ewropayê kir. Welatên Îskandînawî ji sala 1990'î û vir de gav bi gav pirsa mafê kêmneteweyan û pirsa ziman xistiye rojeva xwe ya siyasî û gelek gavên berbiçav avêtîne. Îro hemû welatên Îskandînavyayê xwe weke dewletên pîrçandî bi nav dikin.[122]

Em bi kurtî û bi rehetî û herwiha bêşik jî dikarin bêjin îro him piraniya dewletên Ewropa rojava û him jî dewletên Ewropa Rojhilat xwe weke dewletên pirçandî binav dikin. Ev pêvajo bivê nevê bandora xwe li ser neteweyên dinyayê dike û pêşiya vê pêvajoyê di nav dewletên din yên cîhanê de vedike. Bi vê helwesta xwe û bi vê bandora xwe ve welatên Ewropayê di çareseriya pirsgirêka neteweyan de û di derbarê guherîna netewe-dewletê de roleke erênî dilîzin. Vê pêvajoyê, di nava dewletekê de bi aştiyane bi hev re jiyana netewe, ol û zimanên cûda derxistiye holê û weke minakeke berbiçav radixin ber çavên raya giştî.

Vê pêvajoyê bandora xwe li ser tevahiya cîhanê kir. Hin nimûneyên girîng yên vê pêvajoyê li Rojhilata Navîn û li Bakurê Efrîkayê pêk hatin. Di van guherîn û bûyerên Rojhilata Navîn û Efrikayê de rola vê pêla 3'yem bi eşkereyî xuya dike. Li Rojhilata Navîn îro tenê berbanga vê pêvajoyê dest pê kiriye û xuyaye bi awayên cuda wê ev proses berdewam bike.

Piştî midaxelaya Emerîkayê rejîma Seddam li Iraqê bi dawî hat û pêvajoyeke nuh li Iraqê dest pê kir. Ji xwe pêvajoyeke nuh hînê ji sala 1991'ê ve dest pê kiribû, parlemena Kurdistanê di sala 1992'an de hatibû vekirin û Kurdan xwe weke dewleteke serbixwe, xwe bi rêve dibirin. Lê encama pêvajoya midaxeleya dawî ya Emerîkayê ya sala 2003'ê yek ji bidestxistinên vê prosesa navneteweyî bi xwe ye. Bi vê

122 *Ulusal Sorun ve Çözüm Arayışı*, Nezir Akat, Helwest förlag/Yayınları İstanbul/Stockholm-2010.

prosesê ve girêdayî li Iraqê pêvajoyeke demokratîk ya siyasî dest pê kir. Neteweyên bindest, mafên xwe bidest xistin. Ol, çand û zimanên cûda bûne xwedî maf. Mafê avakirina partiyên etnîkî hatiye dayin û çend zimanên fermî yên dewletê bi yasayî hatiye qebûlkirin. Du zimanên bingehî yên fermî di destûra dewleta Iraqê de cîh girtin in. Erebî û Kurdî. Li herêma Kurdistanê jî zimanên kêmnetewan weke Tirkmen, Asurî û weke ol jî Îsewî,Yezîdî Elewîtî jî bi azadî dikarin xwe derbibirin. Dewleta Iraqê mînaka demokrasiya siyasî ya Rojhilata Navîn e.

Loma Iraq xwe weke dewleteke federe bi nav dike. Dewlet ji du neteweyên sereke Kurd û Ereb û ji çend kêmneteweyan ve ji nuh va hatiye vejandin. Iraq îro weke dewleta tenha ya demokratîk li Rojhilata Navîn îradeya xwe ya siyasî ji nuh va hunandiye. Lê pirs û pisgirêkên vê dewletê gelek in. Dewletên cîran bi midaxeleyên xwe yên nava vê dewletê ve pirsgirêka di nava vê dewletê de mezin dikin. Ji xwe demokrasî nayê maneya ku dewlet bê pirsgirêk e. Hûnandina demokrasiyê li Iraqê û çareseriya pirsgirêka neteweyî û olî li vê derê divê bibin minakên berbiçav li welatên cîran. Em fêr bûne bêtir mînakan ji Ewropayê nîşan bidin. Lê mînaka berbiçav, li gor rewşa Rojhilata Navîn hatiye hûnandin û mînaka demokrasiyeke nuh li Rojhilata Navîn pêşkêşî me dike, Iraqa federal e. Siyasetmedar, dîroknas û nivîskarên dewleta Tirk, Ereb û Faris naxwazin vê mînakê bi rast raxin ber cavên raya giştî. Ew her Emerîkayê derdixin pêş û her terorê weke mînaka sereke nîşan dikin. Ev pêvajo li Rojhilata Navîn hîn berdewam e. Em ê di salên pêş de fêkiyên vê pêvajoyê bi hevre parve bikin. Îro li Rojhilata Navîn tenê yek dewletê bi yasayî û bi fermî civata pirçandî ava kiriye. Ew jî dewleta Iraqê ya Federal e. Bi hêviya mînakên zêde em mijara xwe berdewam bikin.

### Dewleta demokratik ya kozmopolit û neteweperestî (Nasyonalizm)

Ez dixwazim bi şîrovekirina pirçandî yan jî pirnetweyî dest pê bikim. Pirçandî (Multikulturalizm) bêjeyeke sosyolojîk (civakî) û teoriyeke çandî ye; ku bi gelek awayî tê binavkirin. Ev bêje bêtir ji bo pêwendiyên navbeyna netewe û kêmneteweyên cûda ku di nava yekîtiyeke siyasî de bi hevre dijîn, tê bikaranîn. Di vê teoriyê de dewlet,

bi fermî û yasayî li himberî hemû cûdahiyên hene (ol, mezheb, çand, netewe û kêmnetewe) bê alî ye. Ev bi navê civata pirneteweyî yan jî civata pirçandî tê binavkirin. Ev bêje cara yekem di sala 1957'an de ji bo rewşa Swîsreyê hatiye bikaranînîn û di sala 1960'î de jî li welatên Ewropayê û li dinyayê belav bûye. Ji civatên kesayet û grubên cûda pêk hatinin, ango ji aliyê ol, ziman, netewe, dîrok û erdnîgarî yê ve ji hev cûda ne lê bi peymaneke siyasî li hev kirine û di nava dewleteke hevbeş de bi hevrejiyan weke prensîb qebûl kirine civata multîkulturî tê gotin. Ev civat weke civata pirçandî tê binavkirin û dewlet jî weke dewleta kozmopolît tê şîrovekirin. Ev civat weke civata çanda neteweyên cûda ku bi hevre dijîn hatiye qebûlkirin

## Dewleta kozmopolît çi ye?

Di zimanê yewnanî de kozmoz (cosmos) dinya û polites jî weke hemwelatî tê şîrovekirin. Maneya kozmopolît hemwelatiyê dinyayî ye. Di çerçoweya raman de, ev **bi xwe bi maneya ku hemû kesayetiyên, netewe, ol, ziman û çandên cûda ku** di nav yekîtiyeke siyasî ango di nav dewleteke hevbeş de bi mafê wekhevî ve dijîn, hatiye qebûlkirin. Îro dewletên kozmopolît weke dewletên pirçandî têne nasîn. Li vê derê girîngiya espiriya globalîzmê jî derdikeve holê. Lewra îro di qada siyasî de globalîzm bêjeyeke girîng e. Armanca modela demokratik ya kozmopolît bicîhkirina strûktûra polîtîk ya global e. Espiriya bingehîn ya kozmopolîtzmê qebûlkirina civata pirçandî ye. Bêyî vê qebûlkirinê dewleta kozmopolît ava nabe. Tenê qebûlkirin jî têrê nake, divê strûktûra dewletê jî li gor vê bêjeyê ji nû ve bê hûnandin.

Em ê vê mijarê bi nêrinên niviskarên Tirkan dest pê bikin. Li gor nêrînên wan, helwesta civata pircandi ya mozaik wiha tê sirovekirin: " **multikulturalizm", ku" bi zimanê me pirçandi hatiye bi navkirin di bingehiya xwe de, sermayeya rojava ya global û pirneteweyi, ku cihanê ji nû va li gor berjewendiyên xwe dihûne û bi armanca ku cihanê ji bo xwe bike bazara azad ya vekirî, ku em wê wek rêkxistineke bi sistem pêçayî bi nav dikin, dixwaze dewletin netewî,ango netewe-dewletan di bingehiya etnîkî de ji hev bixe." Ev sîstem "multikulturalizm"ê "ji welatê me re wek dewlemendiyekê bi nav dike. Dixwazin pircandiyê (mutikulturalizm) ê bikin siyase-**

**ta fermî ya dewletê. Herwiha dixwazin birên (grûbên) etnîkî tahrik bikin û zanistiya netewî Lawaz bikin û welat ji hundurî ve ji perçebunê re (belavbûnê) amade bikin"**

**Yek ji serkêşên wan dezgehên navneteweyi YE (Yekîtiya Ewropayê) ye. "Ispanî, herêma devletê ya herî dewlemend, ku wek devleteke di nav dewletê de tê bi navkirin cudaxwazên Baskî, wek dewlemendiyeke welêt şirove nakin. Herwiha ji bo Fransayê Korsîka ne dewlemendiyek e. Fransa ji sala 1992'an de paragrafa 2'an destûra Fransayê "Fransizî zimanê komarê yê fermî ye" guhert. Li Almanyayê Tirkên hemwelatiyên Almanyayê ne wek kêmnetewe nayên dîtin, lê wek kargerên koçber ên biyanî tên binavkirin. Endamên YE Yunanistan, Mekedon, Arnawut û Tirkên li Yunanîstanê wek kêmnetewe nabînin û nefesa wan diçikînin. Heger pirçandî dewlemendiyek be, ji bo çi Yekîtiya Sovyetê, Yugoslavya, Cekoslavakya ji hev ket û belav bûn. Yên Osmaniyan ji hev xistin ma ne kêmnetewe bûn"** (Hunandina Etnisiteya Turkiyeyê r. 57-58 Teyyar Önder.Ali)" **Li paş wan pirsgirêkan, sermayeya pirnetewî û navnetewî ya global heye, ku armanca wê bi xwe ji nû va hûnandina cihanê ye. Vê hêza mezin, ji bo bighêje armanca xwe, dewletên netewî(netewe-dewlet) di bingehiya kêmneteweya de bi stratejiyek dûr û kûr ji hev bixe û wan bê hêz bike. Hedefa vê hêza global ya sereke: Dewleta Tirk e ku di Avrasyayê de cihekî stratejik girtiye."[123]**

Stratejiya dewleta Tirk ya fermî û gotinên Ali Teyyar li hev dikin. Gotinên Ali yên dewletê bi xwe ne û loma jî giring in. Em nêrînên Ali weke yên dewleta Tirk li pênûsê didin. Ger em diroka vê pirsgirêkê bikolin û ger em li pêvajoya îroyîn binêrin em ê bibînin ku, nêrîn û helwestên nivîskarên Tirk û nêrînên dewleta Tirk yên fermî ji rastiyê geleki dûr in. Kaniya nerinên dewletê yên fermî û yên nivîskar û dîroknasên Tirk, karektera dewleta Tirk ya konspiratif bi xwe ye. Teoriya komployê bingeha van teorî û nêrînên dewletê civandiye ser hev û bûye ideolojiyek konspiratif û nerast. Vê teoriyê hetanî nuha nehiştiye rastî derkeve holê. Pirsgirêk herdem bi hêzên dereke girêdayî ve rê

123 *Turkiyenin Etnik yapısı –Halkımızın Kökenleri Ve gerçeği-* Ali Teyyar Önder. Fark Yayınları, Genişletilmiş ikinci Baskı. Çapa 21. 2007.

daye û herkes weke dijminê xwe bi nav kiriye. Tekoşîna maf û azadiyên bingehîn li nava welêt bi dujminên dewletê yên derve ve girêdayî ye û wan jî weke dujmin li qelem daye. Loma jî kuştin, îşkence, zîndan weke kiryarên xwezayî li Tirkiyê hatiye şîrovekirin. Gotinên jorê yên Alî ku em weke yên dewletê binav dikin; rê dide ku dewlet pirsgirêka neteweyî ya Kurd û yên kêmnetewa li Tirkiyê weke gaveke perçekirina dewletê dibîne û loma jî li dijî vê projeya demokratîk ya navneteweyî bi tûndî radiweste û di serî de Ewropayê wek dijmin bi lêv dike. Lê di esasê xwe de hemû cîhana demokratîk weke dujmin li pênûsê dide. Em ê li jêr nerastiya teoriya Alî û ya dewletê ya fermî bi nêrîn û bûyerên li dinyayê ve şîrove bikin.

Termînolojiya civata pirçandî yanjî termînolojiya dewleta kozmopolît -mozayîk ku em wê bi **"civata pircandî"** bi nav dikin, Weke min li jorê jî anîbû zimên, cara yekemîn di sala 1957'an de, ji bo şîrovekirina civata Swisreyê hatiye bikaranin. Ji sala 1960'î û vir de ev terminilojî li Emerikayê û li Rojavayê Ewropayê belav bûye. Iro ev termînolojî wek terminolojiyek navneteweyî ku çand, ol, ziman û neteweyên cûda bi hev re di nava rêkxistneke siyasi ango di nava dewleteke hevbeş de dijîn tê bikaranin. Terminolojiya civata pircandî iro ji bo dewleta ku di nav hudûdê xwe de li himberî ol, ziman, netewe, grubên etnikî û çandên cûda bi helwesteke bê teref tev digere û yasaya dewletê li gor reng û dengên civatê bi cîh dike û civatê li gora wan rengan dihûne, tê bikaranin.

Terminolojiya pircandî "**Multikulturalizm**", li dijî yekçandiyê "monokulturalizm"ê hatiye bikaranin û wek siyaset jî li dijî yeknetewayetî yanî li dijî "Nasyonalizm"ê bi kar hatiye. Berevajî vê, termînolojiya **Monokulturalizm** jî ji bo tarifkirina helwesta dewlet û welatên wekî Tirkiyê ku xwe wek yek netewe, yek ziman û heta yek ol dibînin hatiye bikaranin û bi xwe jî li dijî terminolojiya pirçandiyê ye. Loma dewletên weke dewleta Tirk xwe wek dewleta yek neteweyî bi nav dikin lê di rastiya xwe de dewleteke pirçandî, pirneteweyî, pirolî ye. Ew bi yasayî dewleteke monokulturaliste. Rehên vê terminolojiyê ji nasyonalîzmê, şovenîzmê û nijadperestiyê tê û wek rejîmek kevneperest, fundamental tê binavkirin. Iro bêjeya pirçandî, di çerçoweya

mafê mirovayetî de jî ciyekî girîng digire. Mafê mirovan di vê bêjeyê de, mafê bikaranîna derbirîna azadî ya çandê ye. Her wiha li himber çandên cûda jî bêterefiya dewletê tîne zimên.

Berevajî nêrîn û helwesta dewleta Tirk û berevajî bîr û rayên nivîskar û dîroknasên dewleta Tirk, hemû bûyer û pêvajoyên serdemî, çewtiya dewleta yek neteweyî ango netewe-dewlet ê radixe ber çavê me û wê mecbûr dike ku struktûra xwe biguhere û hûnandineke pirçandi pêk bîne. Dewletên xwe li gor pirneteweyî, pirçandiyê, piroliyê neguhere, wê aqîbeta wan wek aqibeta Rûsya, Yugoslavya û Iraqê bin. Di serdemiya me de rê ji dewleta netewe-dewlet ango dewleta yekneteweyî û yekçandî re nemaye. Loma ev dewletên wiha weke dewletên fundamental û kevneperest ku di pêşiya pêşveçûna demokrasiya navneteweyî de weke asteng têne dîtin. Li dijî van dewlatana gava ku pêwîst bête dîtin û berjewendiyên sermayeya navneteweyî jî têde bête xûyakirin, midaxeleya ji derve ya -sivîl û leşkerî- jî têde hemû şiklê midaxeleyê di vîcdanê raya giştî de weke midaxeleyeke rewa hatiye şîrovekirin. Afganîstan, Iraq, Yugoslavya sê mînakên berbiçav yên vê pêvajoyê ne. Destêwerdana Lîbyayê jî yek ji helwesta vê pêvajoyê bi xweye. Sêbê dora Suriyeyë, Îranê, Tirkiyeyê jî wê bê. Loma hemû hewildanên dewletên fundamental wê bê encam pûç bibin û wê bê encam bi dawî bên.

Çerçoweya careseriyên pirsgirêka neteweyî pirsa çarenivisê jî ronî dike. Çareserî jî wek herêmên xwser, wek otonomiya çandî, wek sistema Federal û ya konfederal (ku ew bi xwe ji pirengî ne) hatiye dîtin. Di nava vê sîstemê de bi gelemperî mafê cûdabûnê heye û her netewe dema bixwaze wê bikaribe bi yasayî cûda bibe. Ev nêrin û helwest, ji aliyê gelek dezgehên neteweyî û navneteweyî ve tê parastin.

**Nêrîn û helwestên civata pircandî û du çavkanî:**

**1- Yek:** ji sala 1970'yî û vir de tekoşîna ji bona bidestxistina mafê neteweyî bi hêz bûye. Di serî de li Ispanyayê Baskî û Katalonî, li Kanadayê Kûbekî, li Hindistanê Sîkhî, li Sirilankayê Tamî, li Fransayê Korsîkî û li Rojhilatê Ewropayê Kosowî, Mekedonî, Boşnakî, Li Afrikayê Eritreyî û Netweyên bakurên Efrikayê. Li Rojhilata Navîn jî Kurd û Filîstînî têne nîşandan.

Nasnameya wan neteweyan bi zanyarî pêş de diçe û tekoşîna wan mezin dibe. Hemû van neteweyên me navên wan anîne zimên ji bona naskirina nasnameya xwe ya neteweyî têdikoşin û daxwaza wan ya sereke çareserkirina pirsa neteweyî û avakirin û pêşdebirina demokrasiyê li dewleta serdest bi xwe ye. Bi piranî daxwazên wan neteweyan li ser avakirina dewleta serbixwe ya neteweyî dicive. Hin ji wan neteweyan jî car bi car çareseriyê di bidestxistina xweseriya herêmî de dibînin, hin ji wana jî avakirina deweleteke federalî, konfederalî û di hûnandina dewleteke pirçandî de dibîninin. Lê hevbeşiya tekoşîna hemiyan peydakirina çareseriya pirsgirêkên neteweyî di çerçoweya nûjeniya dewletê de li ser bingeha civata pirneteweyî, pirçandî weke pêngaveke yekta ya serdemiya me de dibînin. Îro ev ramana ha li cîhana demokrat bêtir tê qebûlkirin.

**2-Du:** Globalîzekirina sermayeyê avakirina civata pirçandî pêwîst dike. Struktura netewe-dewletê êdî bersiva pêdiviyên cîhana global nade. Xetimî ye û ji sermayeya navneteweyî re bûye asteng. Globalîzekirina sermayeyê, ziyadebûyina koçberiyê ji Rojhilatê Ewropayê û ji cîhana sêyem zêde kiriye. Her wiha bihêzbûyina girêdanên aborî yên navneteweyî, biçûkbûyina cihanê bi xwe re aniye û ramanên herêmên neteweyî lawaz kiriye, Lê ji holê ranekiriye. Di çavkaniya vê nêrînê de koçberiya rojava cihekî giring digire. Cîhana rojava êdî mecbûr e siyasetek nûjen biafirîne. Cîhana sêyem ku bêtir dewletên feqîr in, guherandina wan ya demografik û geşbûyina bûyerên siyasi, netewî li wan welatan koçberiya ji bo cîhana rojava zêde kiriye. Ji bo vê çendê welatên Ewropî siyaseta koçberiyê di ber çavan re derbas dikin û siyaseta xwe diguherin. Globalizekirina sermayeyê jî bi vê koçberiyê ve zorê dide cihana rojava ku civatên pirçandî ava bikin. Yasayên xwe li gor reng û dengên civatê biguherin. Herwiha alîkariya xebata ji bo avakirina civatên pirçandî jî bikin da ku aşîtî ne tenê li Ewropayê lê li tevayiya cîhanê peyda bibe. Ev helwesta sermayeya navneteweyî û dezgehên navneteweyî weke gaveke demokratîk û aştîxwaz bi lêv dibe. Berjewendiyên sermayeya navneteweyî di vê prosesê de cîhekî girîng digre. Lewra sermayeya navneteweyî dixwaze, berjewendiyên xwe yên cîhana sêyem weke petrol, enerjî, fêkî, wekî din bi asanî bi dest bixe û tûşî pirsgirêkan nebe. Weke min li jorê

gotiye, navê vê pêvajoyê weke "**Demokrasiya Emperyal**" bi nav dibe. Sermayedariya global berjewendiyên xwe yên aborî û civakî êdî bi cîh kirina vê Pêvajoyê de dibînin.

Di serdema me de şoreşa teknîkê, agahdarî û komunikasyonê, dinya biçûk kiriye. Ev biçûkbûyin ya dinyayê gelek hêzên neteweperest û statukoperst ditirsîne. Ev hêzên statukoperest li dijî ramanên avakirina civatên pirçandî derdikevin û ramanên fundamental didin pêş. Li vê derê prensîbên dewleta demokratîk yên unîversal û prensîbên dewleta fundamental, nîjadperest û statukoperset têne himberî hev.

Di pêvajoya vê nakokiyê de dixwazim rola Lîberalîzmê bînim zimên. Lewra pirsa neteweyî bingeha lîberalîzmê bi xwe ye. Gelek caran jî çareserî di çerçoweya prensîbên lîberalîzmê de hatine dîtin.

### Lîberalîzm û pirsa civata pirçandî

Di bingehiya lîberalîzmê de "**Mafên hemû mirovan wekî hev in**" heye. Lê ev prensîbên lîberalîzmê gelek caran tûşî prensîbên netewedewletê ango dewleta neteweyî ya statukoperest dibe û weke asteng derdikeve pêşiya çalakiyên hêzên lîberal. Ev astengî bi xwe re nexweşî û bêaramiyê di nava civatê de peyda dike. Nakokiyên antagonîst di nava civatê de pêk tîne. Gava ku em prensîbên dewleta lîberal tînin zimên divê em ji bîr nekin ku bingeha dewleta lîberal li ser bingeha netewayetiyê pêk hatiye.

Berjewendiyên netewe jî di dewleta lîberal de sereke ye. Îro dewletên lîberal xwe bi civatên pirçandî bi nav dikin. Struktura dewletê guherandine û mafê kesayetî bêtir kirine. Ewlekarî û mafê aborî û mafê jiyaneke şad pêşkêşî hemû hemwelatiyan kirine. Lê dîsa jî berjewendiyên sermayeya dewleta lîberal sereke ye û di her momenteke krîza aborî de ew derdikeve pêşiya tevgerên gelêrî û sivîl. Lê em nikarin van dewletên lîberal weke dewletên yekrengî jî bi nav bikin. Pirs li vê derê pirsa pêvajoya guherandina struktura dewletê ye û hînê jî jêra gelek dem divê.

Li Tirkiyê ya balkêş, ku hînê partiyên siyasî, siyasetmedran, dîroknas û nivîskarên Tirk bi naqaratên kevnare tev dilivin û hînê li dijî ramanên şovenîst û fundamental derknakevin. Piraniya wan bi xwe jî partiyên nîjadperest û şovenîst in. Perwerdeya neteweya Tirk

ya şovenîstî û nîjadperestî lê wiha kiriye ku êdî tu hûkûmet, siyasetmedar, dîroknas û nivîskar nema diwêrin dijî wan ramanan rawestin û rastiyê raxin ber çavên raya giştî. Şîara sereke hînê li Tirkiyê, yek netewe, yek ziman, yek dewlet û yek al e. Ev jî xuya dike ku prensîbên lîberalîzmê li Tirkiyê nayê peydakirin. Ji xwe lîberalîzm li Tirkiyeyê tu caran nebûye hêz û nebûye prensîbên avakirina dewletê. Faşîzm, şovenîzm û nîjadpersetî herdem bûye bingeha avakirin û bihêzkirina dewleta Tirk. Ev pêvajo him li dinyayê û him jî di nava demokratên li Tirkiyê de weke metirsiyekê bilêv dibe û hêzên demokrat, sosyalîst, sosyaldemokrat û lîberal yên dinyayê dixin nava gumanên kûr.

Li Tirkiyê "Tirkîtî, nîjadperestî " hîn jî weke astengên pêşiya avakirina civata pirçandî nayên dîtin. Ev jî xuya dike ku dewleta Tirk norm û qaîdeyên dinyaya global, prensîbên civata pirçandî yên demokrat qebûl nake û weke dewleteke fundamental kevneperestiya Tirkîtiyê weke parastina dewleta unîter dide pêş û di her mijarê de weke pirsa sereke rêdide. Nîjadperestên Tirk li her derê peymana Lozanê weke bingeha vê struktura îroyîn didin pêş. Rewşa mozayika neteweya ango helwesta pirnetewayetî li Tirkiyê ji avakirina komarê hetanî îro bûye kabûsa xewnên hukumet û brokrasiya dewletê. Vê helwestê her demê dewlet tirsandiye.

Dewlet jî li dijî vê helwesta navneteweyî her demê, li şûna pişta xwe bide gel, pişta xwe dide leşker û birokrasiya dewletê û wan hêzên staukoperest ji xwe re dike palpişt. Loma jî bi asanî em dikarin bêjin dewlet di destê hêzên fundamental û statukoparêz de ye û guherandineke bi ser civata pirçandiyê naxwaze û dijî vê helwestê radiweste. Ev helwesta dewletê jî bivê nevê nakokiyên antegonîstî di nava civatê de peyda dike û hêzên li dijî xwe derdixe. Her çiqas îro li Tirkiyê dijî artêşê û dijî nîjadperestiyê gav têne avêtin jî, statukoya netewe-dewlet û nasnameya desthilatdariyê nabe mijara devjeniyê. Bingehiya xetên sor yên dewletê hînê jî struktur û nasnameya desthilatdariyê ya netewe-dewletê ye.

Berî demekê 20 saliya rûxandina dîwarê Bęrlînê hate pîrozkirin. Gelek mirovan beşdarî vê pîrozbahiyê kirin. Di hemû axaftinên wê rojê de **"avakirina dîwarên nû weke bêçaretî yê"** hate bi nav kirin. Esra Bakalbaşioglû dibêje; **"Ramanên dîwarê Berlînê ava kiribûn,**

**mixabin nehatine rûxandin, Tenê cîh guhertîne"** Ramanên avakirina dîwaran li Tirkiyê hîn jî serwer in. Hînê ew raman weke çareseriya yekta tê pejirandin. Di alavê ragîhandinê de, di siyasetê de ev raman bi hêz e. Kurd weke netewe tê inkar kirin. Lê pirsa Kurd weke kesayetî derdikeve pêş. Mafê kollektivî tê inkar kirin mafê kesayetî derdikeve pêş. Bi sedan nivîskar û siyasetmedar dibêjin li Tirkiyê pirsgirêka etnîkî tuneye. Kurd perçeyek in ji neteweya Tirk û birayên me ne. Em ê nehêlin Tirkiye bibe Rûsya yan jî Yugoslavya. Dewleta 90 salan ku bi makzagonên faşîst û şovenîst, û bi serweriya leşkeran ve hatibe îdarekirin, dewleta ku 90 salan înkar, şovenîtî û nîjadperestî kiribe bingeha perwerdeya xwe, wê bi asanî dev ji ramanên avakirina dîwarên nû bernede. Sema Gul, di pirtûka xwe ya bi navê **Koka Etnîsîteya Tirk** de, vê pêla demokrasiyê weke pêleke dijminî şîrove dike. Dibêje neteweya nebûye xwedî devlet, wexta ku ji nû ve dest bi hunandina xwe ya netewayetiyê dike, krîzeke neteweperestiyê (şovenîstî, nijadperestî, n.m) di nava neteweya mezin (neteweya serdest) de peyda dike. Ango sedemê nîjadperestî û şovenîstiya Tirk, dîsa sucê neteweyetiya Kurd e. Li gor nêrînên Sema xanimê heger Kurd dengê xwe nekin, wê şovenîtî û nîjadperestî di nava neteweya Tirk de bi hêz nebe. Ew jî tê wê maneya ku Kurd, ji bo xatirê nêrîna Sema xanimê divê dev ji daxwazên xwe yên rewa berdin. Divê têkoşîna ji bo avakirina civateke pirçandî, pirneteweyî rawestînin. Lewra ew dibin sedemên bihêzbûyina neteweperestiyê di nava netewa Tirk de. Sema Xanim vê pêlê bi pirsgirêka xakê ve girê dide û dibêje ev raman li ser xakekê û xwedî li xakekê derdikeve û loma jî ji bo neteweya mezin weke tehdît tê binavkirin. Ango Kurd li xaka xwe xwedî derkevin û pirsgirêka Kurd pirsgirêka xaka Kurdan ango Kurdistanê ye. Loma jî xanim vê helwestê bi xeterî şîrove dike û lewra divê Kurd dev ji daxwaza xwe ya xakê berdin.[124]

Ev nêrîn di qada navnetweyî de weke nêrînên nasyonal lîberala tên şîrovekirin. Bingeha nêrînên nasyonal lîberala, bingeha dewleta yekrengî ye. Nasyonalên Lîberal (neteweperst) dibêjin heger bi şîddetê be jî divê yekrengiya dewletê û çanda yekrengî (yekçandiya dewlêtê)

---

124 *Türklerin Etnik Kökenleri*, Sema Gül, Çapa Duyem, Nokta Yayınları, 2007.

bête parastin. Nêrînên wan di pêşiya avakirina civatên pirrçandî de yek ji astengên sereke ne. Li Tirkiyê ev fikra nasyonalîstî ( bi esasê xwe nîjadperestî ye) bi destên leşkeran û burokrasiya faşîst weke hêza dewletê li dijî hemû daxwazên demokratî, hatiye bikaranîn, Vê hêza zordar kiryarên xwe bi argumanên dewleta yekneteweyî, yekzimanî û yekalayî ve xemilandiye û her wextê jî vêya weke metirsiyeke xeter li pênûsê daye. Ezê li jêrê gotinên Sererkanê leşkerê Tirk yê berê Başbug bînim zimên. Ji bo ku balkêş e ezê mafê lêbûrînê ji xwendevanan bikim û ezê axaftina Başbug bi firehî binvîsînim.

**Sererkan Başbug wiha dibêje: "Zayina (avakirin) Komara Tirk şoreş e. Ev mûcîze ya Mustafa Kemal bi xwe ye. Bingeha felsefeya avakirina komarê netewe-dewlet e, dewleta unîter e û dewleta laîk e. Leşkerê Tirk, di parastina felsefeya avakirina komara Tirk de her daîm xwedî layan e(teref).**

**Netewe: Yekîtiyeke siyasî û civakî ye ku bi hemwelatiyên xwe ve bi yekîtiya çand, ziman û welatekî ve girêdayî tê şîrovekirin. Bêjeya hemwelatiya me ne bi nîjad, etnîsîte û ne jî bi olî ve girêdayî hatiye nivîsîn.. Mustafa Kemal û hevalên xwe tu caran, wan diyardeyên heyî û nasnameyên jêr(binî) (¤) yên cûda înkar nekirine. Wan bi xwe, ji wan kesên ku nasnameya xwe ya jêrî parastine û dibin nasnameya jorîn(Banî) (¤) de bûne yek, gotine Tirk. Wana (Mistefa Kemal û hevalên wî) tu mafê çalakiyên ku zerarê bidin nasnameya jorîn (nasnameya Tirk) qebûl nekirine.**

**Di serdemiya globalîzmê de bê şik pirsa netewe-dewlet tê darizandin. Cûdahiyeke berbiçav di navbeyna ramana ku dibêje netewe-dewlet dibin tehdîtên cûda de dijî û ramana ku dibêje jiyana netewe-dewlet bi dawî hatiye, heye. Çawa bêjeya ramana yekem rast be herwiha bêjeya ramana duyem jî çewt e. Bi ya me hûnandina netewe-dewlet ya Tirkiyê ne mijareke devjeniyê ye. Devjeniya vê mijarê maneya nexwestina yekîtiya neteweya Tirk e. Derfeta devjeniyên entelektuelî dikare di nava dewletê de peyda bibe, lê ev nayê maneya ku diyardeyên bingehiya dewletê bibe mijara devjeniyê. Divê em li ser çareseriyên bihêzkirina netewe-dewletê bêtir rawestin û pêşniyaran bikin. (li vêderê qesda Başbug dewleta yekçandî- yekrengî ye. N.A.) Bêjeya kesayetî yê, ya dewletê û ya**

**azadiyê, ji bo bikaribin bijîn pêwîstiya wan bi hev heye. Ji wana yek li dijî ya din raweste wê jiyana hersiyan jî têxe xeterê. Ji bona demokrasiyê parastina vê dengeya hesas girîng e û pêwîst e.**

**Di bingeha tevgera terorê de netewayetî heye. Gelek alî ewlekariya mafê nasnameya xwe ya yasayî bi eşkereyî tînin zimên. Armanca sereke ya vê ramanê ji hevxistina dewleta neteweyî bi xwe ye. Komara Dewleta Tirk, ji çandên cûda re rêzê digre.( rêzgirtina Başbug inkarkirina nasnameyên cûda ye N.A). Ji bilî vê, kesek bi xapandinê nikarin bi xwestina mafê demokratîkî û bi xwestinên cûda ve derkeve pêşiya raya giştî. Heger ev mijar bi berdewamî di rojeva welêt de cîh bigire, wê metirsiya xetera yekîtiya dewletê têxe rojevê û civatê bîne himberî hev. Ev jî xerabiya herî mezin e ku bi welat tê kirin.**

**Pêkhatina Bakur (Başûrê Kurdistanê ye qesda wî. Loma Tirk tu caran nabêjin Kurdistan. Bi bakurê Iraqê ve binav dikin N.A) li dijî yekîtiya Iraqê ya siyasî û xakî ve berfireh dibe. Statuyeke taybet ji bo Kerkukê gelekî girîng e...heger hemnîjadên me yên Iraqê, Turkmen bibin aliyekî şer ew ê ji bo Tirkiyê gelek xeter be."**[125]

Bawerim şîrovekirin ji axaftina Başbug ra navê. Nêrînên Başbug nêrînê dewleta neteweya Tirk ya 90 salan e. Bi her şêweyî eşkere û vekirî li dijî ramanên civata pirçandî radiweste, pirnetewayetiyê înkar dike. Kes û tevgerên ramanên civata pirçandî diparêzin, tehdit dike. Mixabin heta nuha serwerên dewleta Tirk jî ev leşker bi xwe ne. Gava ku leşker bi xwe ne serwer bin, wê gavê ramanên wan serwerin. Îro çiqas cûdahiyek peyda bûbe jî ramanên leşkerî hînê jî serwerên dewletê ne. weke Aytekîn Yilmaz dibêje:"**Ev tê maneya ku di pêşiya demokratîzekirina Tirkiyeyê de di israrkirina kemalîzma muhafezakar de Ordî, leşker û burokrasiya di bin bandora leşker de ye, weke asteng e"**[126] Min nêrînên Alî Önder weke yên dewletê yên fermî binav kiribû. Nêrînên Başbug jî vê nêrîna me bi hêztir dike. Nêrînên Başbug ji bo eşkerekirina cîhê dewleta Tirk li dinyayê gelekî girîng e.

Ev axaftina Başbûg gelekî balkêş e. Gelek mijaran dixe rojevê. Lê

---

125 Aytekin Yılmaz makaleya li ser Ergenekonê.

126 Rojnameya *Milliyet* 28/08-2008

ez dixwazim tenê li ser çend mijaran rawestim. Başbûg Dewleta Tirk weke Netewe-Dewlet bi nav dike. Ev bêje ji bo dewleta Tirk ne rast e. Netewe dewlet di sala 1800 de li Rojavayê Ewropayê bûye weke bêjeya avakirina dewleta neteweyî. Li Rojavayê Ewropayê berê netewe xwe bi organîze dike û dewletê jî li gor organîzeya netewe ava dike. Loma jî ji wan dewletan re Netewe-Dewlet hatiye gotin. Dewleta Tirk berevajî vê prosesê hatiye avakirin. Berî neteweya Tirk dewlet bi destê leşkerên Osmanî hatiye avakirin û ji vê dewletê re neteweyek peyda kirine. Ango berî kerê kurtan hatiye kirîn. Lê raste îro dewleta Tirk, netewe-dewlete.

**Ziya Gökap dibêje: "Ji bo vê dewletê neteweyek hatiye afirandin".** Neteweyên cûda, weke Kurd, Rum, Ermenî, Laz û Ereb hatin inkarkirin. Dewletê xwest hafizeya (mejiyê) van netewana biguhere. Navên bajar, gund, rê, qesr û qonaxan guhert. Dewletê wana asîmîle kirin. Ji wan netewana tenê Kurdan di ber xwe dan. Yên din weke netewe ji holê rabûn. Dawî jî teorî û îdeolojiya Netewe-Dewlet li dijî Kurdan hate bikaranînîn. Ev 90 sal in dewlet dixwaze vê îdeolojiyê bi cîh bike.

Lê tenê Kurd dibin astengê vê helwestê. Piştî 90 salan vê îdeolojiya dewletê di vijdan û hişmendiya raya giştî de hatiye mahkûmkirin. Lê ya girîng piştî hemû bûyerên cîhanê jî hînê desthilatdarên dewleta Tirk statuko û nasnameya desthilatdariya netewe-dewletê diparêzin û weke xeta sor ya dewletê destnîşan dikin. Ev nêrîn di hemû qadên dewletê de pir zelale.

Başbuğ dibêje; Bêjeya hemwelatiyê ya me ne bi nîjad, ne bi navê etnîsîteyekî û ne bi nave olî ve girêdayî ye. Başbuğ rast nabêje. Navê dewletê navê etnîsîteya Tirk e. Makzagon binavê etnîsîteya Tirk ve hatiye amadekirin. Hemwelatiya Tirk jî bi navê etnîsîteya Tirk ve hatiye nivîsîn û di makzagona Tirk de cîh girtiye. Herwiha hemû netewekêmnetewyên cuda jî bi yasayî înkar kiriye.

Başbûg dibêje; di navbeyna Dewlet, civat û azadiyan de balansek pêwîst e. Ger balansa navbeyna wan xera bibe hersê jî têk diçin. Li vir jî Başbug rast nabêje. Ango dewletê bi xwe ev balans guhertiye. Civat û hemû azadiyên civatê û yên kesayetiyên civatê bi berjewendiyên netewe-dewletê ve hatine girêdan. Tenê berjewendiyên dewletê û yên

neteweyekê heye. Loma jî her roj di medya Tirk de tê zimên" gava pirs dibe pirsa dewletê hemû tişt teferûat e. Ango berjewendiya dewletê di ser her tiştî re ye. Ev helwesta dewletê bi xwe balansa dewletê û ya her sê hêzên li jorê hatine binavkirin ji hev xistiye. Îro têkoşîna ji bona peydakirina vê balansê jî dibe sedemên êrîşên dewletê. Ji xwe ev balans tu carî li Tirkiye pêk ne hatiye. Baş e, Başbuğ kîjan balansê tîne zimên? Bingeha guherandina vê balansê jî dîsa bi armanca avakirina netewe-dewletê ve hatiye girêdan. Hemû darbeyên leşkerî bi vê mebestê pêk hatine. **Îro pir kêm be jî, ji bo sererastkirina vê balansê gav têne avêtin û loma jî hêzên dewletê û hêza leşker ango hêzên parastina statuya netewe-dewletê li dijî vê xebatê radiwestin û dibin astengên wê.**

Li Tirkiyê ramanên komarparêzên duyem weke ramanên lîberalan bi nav dibin. Lê xûyay e li Tirkiyê nêrînên lîberalên herî pêş de,ne weke lîberalên nasyonalîst yên Ewrupayî ne.Lê dive em jibîr nekin ku her dem îstîsna hene. Li Tirkiyê jî îstîsna heye.

Hin nivîskarên lîberal yên komarparêzên duyem di vê pêvajoya nû de roleke biryardêr digirin. Lê mixabin ramanên wan yên civata pirçandî, tucarî nebûye parastina mafê wekheviya netewa. **Ango wana tucarî nasnameya desthilatdariya netewe-dewletê nekiriye devjeniya guherînê. Ji xwe ya girîng jî li Tirkiye ev mijar e.** Ew daîma di bin bandora perwerdeya 90 salan de, ya Kemalîst, statukoperest û şovenîst de vê mijarê şîrove dikin. Loma jî lîberalîzmê li Tirkiyê cîh negirtiye û nikare cîh bigire heger bi wêrekî vê mijarê bi çareseriya wekheviyê neyne zimên.

Li Tirkiyê dewletê di qada her aliyê jiyanê de cîh girtiye û li her aliyê jiyana hemwelatiyan de dewlet û ramanên dewletê bihêz bûye. Di encamê de dewlet bûye hêzeke burokratî û leşkerî ya fundamentalî. Îro jî cemaetî, olperestî, bi şovenîzma dewletê ve li hev dike û vê guherînê dixe xizmeta bihêzkirina netewe-dewletê. Loma jî guherandina dewletên wiha gelekî zahmet e. Lewra berjewendiyên dewletê û berjewendiyên burokrasiyê û yên hêzên tarî bûne yek. Êdî ji hev veqetandina wan gelekî dijwar bûye. Dewlet heta nuha di destê hêzên tarî û gladîo de berdewam kiriye û hêza wan heta nuha jî bi gelek awayî berdewam e.

Li dewletên wekî Tirkiyê, lîberal û ramanên lîberalî gelekî lawaz in yan jî tune ne. Loma jî dewleta Tirk ji berjewendiyên gel bi dûr ketiye û di destên eşqiyan û çeteyên xwiyayî û nexwiyayî (nehênî) de bûye dewleteke tarî.

Dewletên weke dewleta Tirk bêyî midaxeleyên navneteweyî dînamîkên hundirîn bi serên xwe tenê nikarin dewletê ji nava lepên van hêzên tarî azad bikin. Di her momenteke hesas de hêzên tarî midaxeleya dînamîkên hundirîn bi dijminî binav dikin û planên wan yên demokratîzekirina dewletê têk dibin. Lê heger dînamîkên dereke yên navneteweyî zorê bidin hêzên tarî û statukoperest û ji dînamîkên hundirîn yên guherxwaz re bibin palpişt wê gavê dînamîkên hundirîn dikarin gavên berbiçav bavêjin. Îro gavên li Tirkiyê têne avêtin perçeyek ji vê pêvajoyê bi xwe ye. Li vê derê hêzên lîberal jî dikarin bibin xwedî hêz û roleke girîng di pêşveçûna civatê de bileyîzin. Loma hêzên dereke girîngiyeke mezin didin mezinbûn û serweriya hêzên lîberalî li Tirkiyê. Li vê derê dixwazim bêjim hêza sivîl ya lîberal bi midaxeleya dînamîkên dereke ve dikare bibe xwedî gotin. Mebesta min mudaxeleya siyasî ye. Ev jî dikare roleke mezin di pirsgirêka civata pirçandî de wergire û bi erênî kar bike. Bihêzbûna lîberalîzmê lawaziya şovenîzmê, nîjadperestiyê û statukoperestiyê jî bi xwe re tîne. Berjewendiyên sermaye yê ji berjewendiyên dewleta statukoyî bêtir derdikeve pêş. Espiriya globalîzekirina sermayeyê jî li vê derê dertê pêşiya civatê. Civat bihêzbûyina globalîzmê ve girêdayî bi nasnameya xwe û bi helwesta xwe ya nûjen ve ji nû va civatê li ser bingeha demokratîzekirina serdemî ve dihûne û civateke pirçandî ava dike. Îro ev helwest li Rojhilata Navîn bûye xebata sereke.

Pirsa me li vê derê ev e: Gelo di vê pêvajoya globalizekirina serdemî de nasnameya me tête guherandin? Bersiva me jî "belê nasnameya me tê guhertin" Pirsa ma ya duyem jî ev e: Çareserî çi ye? Bersiva me jî ev e: Çareserî avakirina civatên pirçandî, pirneteweyî ye. Ger wiha nebe bivê nevê pirsgirêka neteweyî bi veqetandineke mezin serxwebûna xwe bi mafê xwe yê çarenûsî ve bikar tîne û dewleta xwe ya serbixwe ava dike. Lê bersiva bingehî ya vê pirsa dûwem îro li cîhana demokratîk, weke çareseriyê avakirina civatên pirçandî ye. Li gora vê baweriyê jî demokrasiya lîberal dikare xwe tenê di civatên demokratîk yên pirçandî

de ifade bike û bihêz bike. Êdî li cîhanê yek ji qistasên demokrasiyê jî ev e. Dewletên di nava xwe de pirçandiyê bi cîh neke, wê ji akubeta Iraqê, Yugoslawyayê û Rûsyayê xelas nebe. Êdî girtina neteweyên cûda di girtîgeha dewleta neteweyî ango netewe-dewletê ya yekrengî,yek dengî de ne rehet e.

## Lîberalî, nasyonalî û civata pirçandî

Demokrasiya lîberal, di her momentê de, wekheviya mirovan, azadiya mirovan û bêtarefiya demokrasiya lîberal weke bingeha prensîbên xwe tîne zimên. Vê bêjeya lîberal a ji bo civateke pirçandî gelekî girîng e. Loma jî divê dewlet di nava civatê de li himber hemwelatiyên xwe bêterefiya xwe weke dibêje îsbat bike. Li hemberî hemû çanda bi bêterefî tevbigere. Evana jî yeko yeko weke prensîbên dewlet yan jî civata lîberal têne binavkirin.

Lê Lîberalîzm jî îro ji nû ve tê nîqaşkirin. Îro rexneyên bêtir li lîberalîzmê tête kirin, di çerçoveya ku Lîberalîzmê, dev ji hêjayiyên xwe û dev ji prensîbên xwe berdaye. Li gor baweriyên wan rexnegiran, Lîberalîzmê xwe li gora **Kommunîtarîzmê** guhertiye. Kommunîtarîzm nêrîneke felsefî ya Amerikayê ya sala 1900'î ye. Kommunîtarîzm îro weke nêrîn û ideolojiya demokratên xirîstiyan têtebinavkirin. Di çavkaniya vê îdeolojiyê de afirandina alternatîfeke îdeolojî ya konservatîzmê heye. Ev bi xwe îdeolojiyeke li dijî civata sivîl e. Em vê îdeolojiyê weke nêrîneke fundamental jî dikarin bi nav bikin. Çavkaniya nêrînên vê îdeolojiyê kevneşop û kevneperestiya civatê bi xwe ye. Bi kurtî ev îdeolojî, statukoperest e. Ew yekgirtina civatê bi kevneşopiya civatê ve girê dide û diparêze. Loma jî li ser navê kevneşopiyê, civatê di nava çar dîwaran de digire. Ev nerîn û helwest ji bo hukumeta Ak Partiyê jî derbas dibe. Di nava nerînên lîberal û kommunîtarîst de di kiryarên xwe yên ji bo civateke pirçandî de bêîstîqrare û ramanên kevneşopî dibin astengên kiryarên wê. Di pirsgirêka Kurdî de kommunitarîste û di pirsa demokrasiyê de bi tevayî jî konserwatîve.

Rexnegir dibêjin heger lîberalîzm ber bi Kommunîtarîzmê ve here, wê gavê lîberalîzm prensîbên xwe yên azadiya kesayetî û "bêtarafiya" dewletê wenda dike. Li gor rexnegiran di sala 1980'yî de lîberalîzmê nêrînê Kommunîtarîzmê girtiye û dev ji nêrînên xwe berdaye. Li gora

nêrînên Kommunîtarîzmê jî "Azadiya kesayetî" ya lîberalîzmê beravajî rastiya jiyanê ye û ne rast e. Li gora nêrînên Kommunîtarîstan nêrîna lîberalan ya bêlayaniya dewletê çewt e. Dibêjin, bi vê nêrînê ve dewlet, dikare armanca kolektîvî ya civatê wenda bike. Berevajî vê nêrîna lîberalan, Kommunîtarîst dibêjin, divê hemû nêrînên bi civatê re nakokbar in ji aliyê hemwelatiyan ve bête red kirin û divê dewlet jî rê ji wan re veke ku bikaribin li dijî wan ramanan rawestin.

Nêrînên kommunîtarîstan û yên Başbug û yên Alî Teyyar li hev dikin. Kommunitarîst dibêjin civata pirçandî, civatê perçe dike û ewlekariya civatê dixe xeterê. Kommunîtarîst, dibêjin mafê dewletê heye ku, guherînên çandî yên çanda kolektivî ya hemwelatiyan dixe xeterê bi asteng bike. **Ew dibêjin civata pirrçandî ji bo jiyana çanda hemwelatiyan xeter e.** Lê civata pirçandî başiya xwe ya wekheviya civatê, weke alternatîfa demokratîk berevajî idîayên Kommunîtarîstan di jiyanê de isbat dike û nêrînên Kommunîtarîstan derew derdixe. Weke minak, Belçîka, Swîsre, Kanada, Amerîka, Fransa, îspanya, Brîtanya Mezin, Hindîstan, Iraq û wekî din. Ji aliyekî din ve Sovyet, Cekoslovakya û Yugoslavya kevin minakên berbiçav in ku ew jî bi ideolojiya sosyalîstan ve hatine avakirin.

Guherandina lîberalîzmê xeterên mezin bi xwe re tîne. Guherandina civatên yekrengî zahmet dike, çareseriya pirsgirêkên civatê tenha bi çareseriya şiddetê ve girê dide. Civatên bi nakokiyên antagonîstî ve dihûne. Helwesta fîlozofên lîberalên nasyonal û yên Komunîtarîstan ku dibêjin, **çanda cûda, hetanî çanda seredest tehdît neke azad e,** gelekî xetere. Ger em di jiyana Tirkiyê de vêya weke mînak nişan bidin, emê bêjin çanda Kurd, heta çanda Tirk tehdît neke azad e. Bi kurtî ew çandên cûda qebûl nakin. Azadiya çandên cûda li ba Kommunîtarîstan tuneye. Ew jî tê maneya ku çandên cûda nikarin bi azadî xwe derbibirin û mafên xwe yên kolektivî bikar bînin.

### Du kampên îdeolojî yên lîberalîzmê

Di kampa yekem de lîberalên demokrat cîh digrin. Li gor nêrînên wan afirandina civata pirçandî careseriya sereke ye. Nêrîna dûwem jî ya ku yekçandiya civatê diparêze û serkêşên vê nêrînê jî lîberalên nasyonalîst û Kommunîtarîst in.

## Di çareseriya pirsgirêka neteweyan de rûdanên nû û rûxandina sosyalîzmê

Teoriya stalînîst ya neteweyan ne rast e û tu neteweyî ji bilî bûbe dewlet mercên teoriya stalînîstî pêk neaniye. Li gora vê nêrînê jî pir bi asanî mirov dikare bêje netweyên nebûne dewlet li gora stalînîzmê ne netewe ne. Sosyalistan mercên neteweyetiyê li gora berjewendiyên xwe anîne zimên. Mercên neteweyetiyê yên sosyalîzmê, tekabulî avakirina dewletê bi xwe ye. Neteweyên dewleta xwe ava nekirine nebûne netewe. Stalînîzm wan mahkûmî bindestiyê dike. Sosyalîzma reel di jiyana xwe ya dûr û dirêj de mixabin pirsgirêka neteweyan çareser nekir. Sowyet, Yugoslavya, Çekoslavakya sê welatên nimûnyên civatên pirçandî ne. Her sê welat jî ne bi navê neteweyeke, etnîsîteyekî hatine avakirin. Hersê welat jî ji çend neteweyan û kêm neteweyan hatine avakirin. Weke prensîb hemû netewe di van welatan de mafên wan wekî hev in. Dewletên federal in û ji gelek netewan pêk hatine. Weke mînak Sowyet ji 15 (panzdeh) komeran û bi dehan herêmên otonom pêk hatibû. 130 zimanên cûda li Sowyetê dihatin axaftin. Yugoslavya jî weke Sowyet ji çend komar û herêmên xweser ve pêk hatibû. Li Yugoslavyaya yê jî bi dehan zimanên cûda diahtin axaftin. Çekoslovakya Jî ji du netewan û ji du komeran pêk hatibû. Navên wan dewletana bi xwe jî, yan ji navê hevbeşiya wan netweyan pêk hatibû yan jî bi navekî hevbeş weke Sowyet, hatibû avakirin. Prensîbên van dewletana li ser bingeha wekheviya neteweya hatibûn afirandin.

Teyyar Ali Önder,dibêje:Heger pirçandî dewlemendiyek be, ji bo çi Yekîtiya Sovyetê,Yugoslavya, û Çekoslavakyayê ji hev ketin û belav bûn. Yên Osmaniyan ji hev xistin ma ne kêmnetewe bûn"[127]

Ger mirov sedemên rûxandina sîstema sosyalîst bi dewlemendiya prensîbên pirçandiyê ve girê bide ya mirov nezan e yan jî mirov sextekarekî dîrokê ye. Nêrîna Ali ne ya wî bi xwe ye, nêrîna dewleta Tirk ya fermî ye. Sedemên rûxandina sîstema sosyalîst gelek in.

Lê bi kurtî mirov bixwaze sedeman bîne zimên, mirov dikare bêje yek ji wan sedemên esasî ku rûxandina sosyalîzmê anî; berevajî

127 *Türkiyenin Etnik Yapısı –Halkımızın Kökenleri ve Gerçeği-* Ali Teyyar Önder. Fark Yayınları. Çapa Duyem a Berfirehkirî, Çapa 21. 2007.

nêrînên dewleta Tirk, di praktîkê de prensîbên dewleta pirçandî nehatin bicîhkirin. Burokrasiyek dîktatorî bû desthilatdar. Azadiya mirovan û mafê mirovan yên hilbijartinê ji holê hate rakirin. Federalîzma wan welatan lê wiha hat ku neteweyek û çanda neteweyeke bû serdest. Lê mirov pir bi rehetî berevajî teoriya Ali dikare bêje, sedemên rûxandina wan welatan ne ji ber prensîbên dewleta pirçandî ye.

## Netewe û girêdana yekgirtina siyasî yan jî peymana siyasî ya Neteweyên Yekbûyî

Netewe û karekterên netewayetiyê bêyî xebateke zanistî dernakeve holê. Netaweyetî bi tekoşîneke dûr û dirêj ya siyasî û çandî ve dikare bibe hêzeke berbiçav. Pêşdeçûyina sermayedariyê tenê ji bo netewayetiyê têr nake. Neteweperestî jî yek ji karekter û aîdiyeta vê pêvajoyê bi xwe ye. Netewe-perestî helwesta netewe weke civeteke yekgirtî bihêz dike û qada civatê û armanca civatê weke dozeke hevbeş dixe rojevê. Ji xwe ev nebe netewe nikare xwe weke neteweyeke bi nav bike. Gava ku netewe doza xwe û aîdiyetên xwe bi eşkereyî û zelal raxist ber çavên raya giştî wê gavê bivê nevê mercên neteweyatiyê jî bi xwe re diafirîne. **Mercên sûbjektiv di avakirina netewayetiyê de biryardêr e.** Loma hêza subjektîv ku ew bi xwe tevgera neteweyî ye, mercên sereke yên netaweyetiyê zelal dike û ew bi xwe jî dibe perçeyek ji doza netewe. Ev tevger armanca siyasî dihûne û dixe qada tekoşîna netewe. Bingeha avakirina netweyatiyê ava dike. Loma hunandina netewayetî bi tekûzkirina tevgera netewe ve girêdayî, doza siyasî û çandî dibe qada xebata bidestxistina mafê netewe. Li vê derê rola ziman gelekî mezin e. Loma netewe bi zimanê xwe dikare qada xwe bîne zimên. Xwe bi zimanê xwe derbibirîne.

Me nêrîna lîberalên nasyonalîst ya ku nasnameya neteweyî ya hevbeş diparêze anîbû zimên. **Ji dêvla mirov hevbeşiya nasnameyeke neteweyî biparêze divê mirov hevgirtina siyasî ya hemwelatiyan biparêze.** Îro bi milyonan mirov, bidehan netewe û kêmnetewe yên ku nasnameya neteweyeke hevbeş qebûl nakin, di hevgirtineke siyasî de hatine ba hev û nasnameyeke hevbeş ya hemwelatiyê pêk anînin. Nasnameya Sowyet, Yogoslavya, Çekoslovakya, herwiha Kanada, Ispanya, Amerika, Belçîka, Brîtanya Mezin, Iraq, Lubnan, Swisre, Hîndîstan,

Pakîstan, Ewosturya û gelek mînakên din ku vana hemiyan xwe bi nasnameyeke hevbeş ya peymana neteweyan ve tînin zimên. Li van welatana nasnameya hevbeş ya neteweyî tuneye. Lê nasnameya hevbeş ya hemwelatiyê heye. Li wan welatan neteweyên cûda, olên cûda û zimanên cûda bi hev re bi peymaneke siyasî li ser nasnameyeke hemwelatiyê li hev kirine û dewlet li gora vê peymana siyasî yan ji nû ve vejandine, yan jî, ji nû va ava kirine. Li wan welatan weke dewleta Tirk dibêje, nasnameya jorî(Banî) û nasnameya jêrîn(Binî) tuneye. Yek zimanê fermî yê dewletê tune ye. Ya gelek zimanên fermî hene yan jî zimanê fermî tuneye weke mînak Emerîka ye û hetanî sala 2009'an Swêd e. Ewan welatên weke mînak min nîşan kiriye, avakirin yan jî nûjenkirina dewleta pirçandî ne û ne di bingehiya neteweyekê, ne jî bi navê neteweyekê pêk anîne. Li van welatan peymana sereke hevbeşiya nasnameya hemwelatiyê ye û herwiha hemû netewe jî dikarin xwe bi nasnameya xwe jî derbibirînin.

**Ev hevbeşî bi navê hevgirtina siyasî tê binavkirin. Di prensîbên nasnameya neteweyî ya hevbeş de, inkarkirina netewe û çandên cûda heye (nêrînên nasyonal lîberalan). Lê di prensîbên nasnameya hevbeş ya hemwelatiyê de lihevkirina neteweyan û lihevkirina çandên cûda heye (nêrînên lîberal demokratan û yên sosyalîstan).**

Xwe bi nasnameya hevbeş ya neteweyekê anîna zimên li welatên weke Tirkiyê derbas dibe ku li wê derê derbirîn tenê bi navê neteweyeke pêk tê. Ger em dixwazin di nav netewan de aramî pêk bê, divê em mecalên lihevkirina peymana siyasî di nav netewan de peyda bikin ku ev jî sazkirina makzagoneke demokratîk, pirçandî, pirneteweyî, pirzimanî û pirolî ye.

Pirsgirêka Kurd li Tirkiyê, ne pirsgirêka ewlekariyê ye. Pirsgirêk pirsgirêka neteweyekê ye û pirsgirêka mafê kollektifî ye. Li Tirkiyê derfeta nûjenkirina dewletê ya pirengî û rûxandina îdeolojiya nasnameya yekneteweyî, şovenî û mejiyê statukoperestiyê peyda bûye. Pirsgirêka neteweya Kurd li Tirkiyê, di çerçoweya prensîbên dewleta pirçandî, multîkultîralîzmê de dikare bête çareserkirin. Cara yekem e ku serokwezîrek li Tirkiyê statukoya dewletê tîne zimên."**Ji bo guherandina statukoya dewletê me weke hukumet, vîna (irade) xwe raxist ber çavên raya giştî" Serokwezîrê Tirk Tayip Erdoğan.** Ji

bona kesayetiyên guherparêz rastî û nerastiya vê gotinê ne pir girîng e. Bêgûman statuya ku ew tine zimê û ya em tînin zimên ji hev cuda nin. Lê gotina guherîna struktura netewe-dewletê bi xwe gotineke girîng e. Girîngiya mezin binavkirina vê bêjeyê ye. Divê hemû hêzên guhezparêz vê bêjeyê weke derfetekê bibînin û ji bo bicîhkirina vê bêjeyê têbikoşin. Ev nayê maneya ku hemû alî alîkariya vê hukûmetê bikin. Ji bona ev nêrîn bi rastiyê vegere divê, Kurd jî weke neteweyeke serdemî, ji bo mafê xwe yên kollektîvî bi şêweyên serdemî têbikoşin.

Bi baweriya min îro çareseriya pirsgirêka neteweya Kurd li Tirkiyê bêtir bi helwesta tevgerên Kurdan ve girêdayî ye. Divê tevgera neteweyî ya demokratîk ya Kurdistanê çareseriya civata pirçandî ya Iraqa Federal weke derfeteke dîrokî raxe ber Çavan. Li vê derê dixwazim çend gotinan li ser pêvajoya Iraqa Federal bêjim. Ango îro mînaka sereke ya civata pirçandî li Rojhilata Navîn Dewleta Federal ya Iraqê ye. Dixwazim bi mînakek biçûk dest pê bikim. Weke tê zanîn hukumeta AK partiyê dest bi "Rê li bervekirina Kurd" kiribû. Serencama vê helwestê bu sedemê amadeyiya makzagoneke nû. Makzagona ku mafê Kurdan nayine zimên." Makzagona kerr û lal". Lê bi asanî mirov dikare bêje ev helwest devjeniya pirsgirêka Kurd bû. Mediya, siyasetmedaran û dîroknasan ray û bîrên xwe li ser vê mijarê eşkere kirin. Ev mijar bi devjeniyeke berfireh ku di dîroka Komara Tirk de tucarî nehatiye kirin berdewam kir. Îro jî berdewam e. Ev bi xwe weke prosesekê binav dikim. Vê prosesê bi kêmanî derewên 90 salan yên dewleta Tirk raxist ber çavên raya gistî.

Ev hukumet nikaribe gavekê bavêje jî ev pirs ji rojeva dewletê û ya hukumetê dernakeve. Ji xwe ev hukumet ne hukumeta ku bikaribe pirsgirêka Kurdan û ya Kurdistanê çareser bike. Hêviyeke wiha ji vê hukumetê ne rast e. Lê ev hukumet dikare têkoşîna ji bo çareseriyê asantir bike.

Bi mînakek neyênî dixwazim dest bi mijara Iraqê bikim.

Ev tecrûbeyekê rê me dide. Li Tirkiyê kesayetiyên xwe weke Tirk binav dikin, ji bin bandora nîjadperestiyê derketina wan zahmet e. Bi salan e bi ziman û çanda nîjadperestî hatine perwerde kirin. Rastî bi nîjadperestiyê ve girêdane û dervî vê "rastiyê" ji bo wan rastî tuneye. Fermo mînaka serencama "rê li bervekirina Kurd", binêre.

Pistî hewqasan munaqeşe li ser pirsgirêka Kurd li Tirkiyê hate kirin hê jî nivîskar û perçeyekî mezin ji gelê Tirk wiha difikire:

**Reha Muhtar/ rojnameya vatan 100303** sernivîs:"Ger me bikaribaya dayikên Kurdan perwerde bikirana"...Ji dostekî xwe gotinên jêr guhdar dike.[128]

**"Bi rastî ev 87 sal in komarê(Komara dewleta Tirk) mirov û grubên ji etnîsîteyên cûda, xwestiye bi çand û zimanekî yekgirtî ve di bin sîbera yek neteweyekê de bicivîne."**

Reha, berdewam dike û dibêje: Dostê min wiha berdewam kir: **"Ji bona ku Komarê di dema xwe de dayikên Kurdan fêrî Tirkî nekir, tûşî van pirsgirêkana dibe".**

Reha Muhtarî raya xwe dibêje: **Tesbîteke bê pêşramanî û biaqilî bû.**

Fêrkirina Tirkî, afirandina zimanekî yekgirtî, bêguman divê ne ji bo asîmîleya çandê be, ne ji bo ji holê rakirina ziman be (zimanê cûda), ne ji bo ji bîrkirina zimanê xwe yê zikmakî be.

Divê li Tirkiyê mecala ku, Kurd jî dinav de hemû etnîsîteyan bikaribûna bi rehetî û bi azadî zimanê xwe pêşde bibin, hebûya.

Lê ew erkên komarê yên nikaribûn dayikên Kurdan perwerde bikin, yên nikaribûn ziman û çandeke yekgirti biafirînin di nava desthilatdariya îro de ne.....

Nivîskarekî din yê Tirk ji Reha Muhtar bêtir li ser pirsgirêkê radiweste. Nivîskarê Tirk yê Mîlliyetê, Fikret Bîla, hînê jî bi tembûra netewedewletê dikeve govendê. Li dijî BDP'ê ( Partiya Aşîtî û Demokrasiyê) û dijî DTP (Tevgera demokratîk ya civakî) bi nêrînên netewe-dewletê yên kevnare ve dijî daxwazên wan derdikeve. Weke tê zanîn van tevgerana ji bo makzagoneke nuh li Tirkiyê wiha gotibûn: "Makzagona Cumhûriyeta Tirkiyê qebûl dike ku bi awayekî demokratîk hemi çandên henin bikaribin hebûna xwe bi cîh bikin û xwe bi azadî derbibirînin." Weke tê zanîn van tevgerên Kurdan ji bo çareseriya pirsgirêka bakurê Kurdistanê weke" xweseriya demokratîk" û ji bo Kurdistanê jî "konfederaliya demokratîk" pêşniyaz kiribûn. Fikret Bîla dijî daxwazên wan der-

128 Rojnameya *Vatan*, Reha Muhtar, tarih 10.03 03

dike ve û dibêje: Van daxwazên ha, bi komara Tirk ya netewe-dewletê ve li hev nakin... ger em grûbên olî jî têxin nava van pêşniyazan wê Tirkiyeke cuda derkeve pêşiya me." Dema hemwelatiyên Tirkiyê li gor nasnameyên etnîsîkî û olî ve xwe bi partiyên xwe ve xwe bi rêk bixin, emê wê gave nikaribin bêjin evana yekîtiya neteweyî û siyasî bihêz dikin." Dewleta wî ya netewe-dewlet ji hev dikeve. Yekîtiya neteweyî ango nîjadperestiya dewletê bi dawî tê. "**bihesibînin ku li mîrata împaratoriyeke mezin, dewleta Tirk de, Tirk, Kurd, Çerkez, Laz, Sûnnî, Elewî, Kurdên sûnnî, Tirkên Sûnnî, Elewiyên Kurd, Elewiyên Tirk,( ez jî Erebên Sûnnî, Elewî, Xirîstiyan. Kurdên Yezîdî, Rûm, Ermenî, ya li ser dikim NA) bibin xwedî partî"** Fikret Bîla başûrê Kurdistanê weke nimûne rêdide û dibêje: **li wêderê, komele, sendîka jî bi nasnameya xwe ya etnîkî tabelayên xwe dinivîsînin. Bi hesibînin ev li Tirkiyê jî hebe"... wê çawa be?**

Ji serî de mirov divê bibîne ku ev camêr sextekariya siyasî dike. Kesên nizanibin wê bêjin belkî mafê Tirkan jî weke yê Kurdan tuneye ku xwe bi nave xwe birêkxistin bikin. Dewleta Tirk bi navê Tirkan hatiye avakirin û partiyên Tirkan hene.

Ji nêrînên Fikret Bîla re îzahat pêwîst navê. Lê tiştê Fikret Bîla jê ditirse wê bê serê wî. Îro bi dehan dewletên dinyayê, tiştê Fikret Bîla jê ditrse û dike sedemên aloziya sîstema netewe-dewlet ya Tirk, bi dehsalan e pêk hatine û van dewletana ne aloz bûne û ne jî ji hev ketine. Li gelek cîhî berevajî nêrînên Fikret, vê sîstema pirçandî, pirneteweyî, demokrasiya dewletê û yekgirtina wê bihêz kiriye.

Reha Muhtar jî di nav de pistî hewqesî devjenî hînê jî bi dehan nivîskarên Tirk bi awayekî dîrek-indîrek asîmîlasyonê diparêzin. Evan kesên wiha difikirin pir bi asanî dikarin bêjin" Iraq ne welatekî demokratîk e." De ka em binêrin bê evan camêrên şovenîst rast dibêjin yan na?

**Xwendevan dikare bûyerên Iraqê bi Tirkiyê re miqayese bike.**

Çand û ziman pêşeroja netweyekî ye. Ger mirov neteweyeke ji çanda wî û ji zimanê wî bi dûr bixe, mirov wê gave damarên jiyana wî jê digre û wî bê giyan dihêle. Netewe-dewlet çanda neteweyan û

zimanên wan qedexe kiriye û bi riya asîmîlasyonê jî wan ji nasname û kesayetiya wan bi dûr xistiye Lê jiyanê rêdaye ku netewe-dewlet di vê armanca xwe de bi ser neketiye. Dewletên pirçandî weke nimûneyên demokrasiyê derfetên bêhempa di nava civatan de peyda kiriye. Demokrasiyê bi cîh kiriye. Lewra "demokrasî sîstema yekta ye ku gel, di bingehiya çanda xwe de bi azadî û wekhevî dikare bijî."[129]

Pirsgirêkên bi zordariya netewe-dewletê ve peyda bûne, weke pirsgirêkên netewî, etnîkî,olî û cinsî tenê di nava sîstema demokrasiyê de dikarin xwe derbibirînin.

"Îro demokrasî ji bo gelên Rojhilata Navîn weke nan û avê pêwîst e. Lewra ji bilî demokrasiyê, tu bijarteyeke din ku bikaribe gelan şad bike tuneye"[130]

Li Rojhilata Navîn demokrasî tucaran bi cîh nebûye û ne jî maneya demokrasiyê hatiye fêmkirin. Li gor helwesta mirovên Rojhilata Navîn, di demokrasiyê de şer û pevçûn tuneye. Herkes bi mafê xwe yê heyî razî ye. Siyasetmedar ne berjewendiyên xwe û ne jî yên merivên xwe diparêzin. Di meclîsê de pevçûn çê nabe. Di nava netewa, kêmnetewa de şer û pevçûn çê nabe, nakokiyên çînî tune ne, nakokiyên cînsî tune ne. Ew demokrasiyê li gor baweriyên mizgevftê şîrove dikin.

Van ramanên ku min li jor anîne zimên, pêwendiyê wan bi demokrasiyê re tunene. Ji demokrasiyê dûr in. Her roj li mizgeftan, di perwerdeya dibistanan de, di watiniyên leşkerî de, li cîhên kar, li mal, li kuçe û kolanan ev gotin û bêjeyên li jêr têne gotin

Weke "yekîtiya netewî" "yekgirtina dewletê" "mukadesiya Alê" " Artêş bingehên komarê ne" "komar nayê percekirin" "dewlet ji yek neteweyî pêk hatiye" "pêwîstiya me bi yekîtiyê heye" "Xwedê artêşa me û dewleta me biparêze." "Xwedê dewleta me ji perçebûnê biparêze" van bêjeyana û gelekên weke wan ne bêjeyên demokrasiyê ne. Bêjeyên li jor hatine binavkirin bêjeyên civata yekrengî, yek neteweyî, strukturel, dîktatorî û nijadperest in. Li Tirkiyê nêzîkî 90 salane ev propagande tê

129 *Avrupa Kürt Demokratik Halk Meclisleri*, Mezopotamya Yayınları, Haziran 2009. r. 21

130 *Avrupa Kürt Demokratik Halk Meclisleri*, Mezopotamya Yayınları, Haziran 2009. r.34

kirin. Civatên Rojhilata Navîn û nemaze civata Tirkiyê her roj bi van bêjeyan şiyar dibin, bi van bêjeyan radikevin, bi van bêjeyan dixwînin, bi van bêjeyan dikenin û digirîn. Zarok bi van bêjeyan perwerde dibin û bi van bêjeyan mezin dibin. Gel van bêjeyan her roj di mizgeftan û di alavên ragîhandinê de gohdarî dikin. Civatekî wiha bivê nevê wê demokrasiyê, erk û watiniyên demokrasiyê û bêdengiya gel û stuxwarkirin û serî tewandina ji dewletê re tevli hev bike.

Her daxwazek ji bo maf û azadiyan pir bi asanî dikare bibe mijara devjeniya neyartiyê. Her pêngaveke ber bi demokrasiyê dikare bibe bêhêviya civatê.

Lenîn bi qasî ez têgihîştime ne miroveki demokrat bû. Mirovekî navendîparêz bû. Ji bo mijar li ser pevçûn û devjeniyê ye mînaka Lenîn hate bîra min û min xwest weke mînak bînim zimên. Lenîn di çend kongreyên partiyê de demokrasî parastiye. Ew di nava partiyê de alîgirê devjeniyê bû. Di wan kongreyan de, gelek nûnerên kongreyê, pevçûna endamên kongreyê, weke anarşîzmê binav dikirin. Lê wî digot divê herkes gotinên xwe bêje. Ramanên xwe şîrove bike, endamên din yê dijberî ramanên xwe iqna bike, destê xwe rake, hilbijêre û bê hilbijartin. Wî digot ev demokrasî ye. Ta radeyekê rast e. Ger li cîhvatekê, di nava partiyekê, di nava komeleyekê, di nava meclîsekê yan jî di nava dewletekê de yên li jor hatine binavkirin tunebin li wêderê demokrasî tuneye.

Gelên Rojhilata Navîn fêrî xwe, bi xwe rêvebirinê nebûne û ji dîrokê ve ta îro ya mîrekî, ya padîşahekî, Ya şêxsekî, yan jî diktatorekî ew bi rê ve birine. Ji çanda demokrasiyê dûr, bi norm û qaîdeyên civata yekrengî û totalîter ve demokrasî nayê avakirin. Heger îro li Ewropayê navê demokrasiyê û civatên demokratîzekirî têne binavkirin, bi xwe ew deyndarên mafê bidestxistina derbirîna azad û mafê bidestxistina xwe birêkxistina azadî ye. Îro li Ewropayê tekoşîn, pevçûn û rexnegirî bi qaide û bi normên demokrasiyê ve hatiye pêçandin. Garantiya demokrasiyê li welatên Ewropayê, derbirîna azad e.

Di vê çerçoweyê de tevger û hêzên Rojhilata Navîn Iraqa federal şîrove dikin û pêşveçûn û bûyerên Iraqa federal weke metirsiyekê dipejirînin. Bi ya min ev helwest helwesteke ji rastiyê dûr e. Raste li Iraqê şer û pevçûn heye, mirovên sivîl têne kuştin, gendelî û feqîrî û bêkarî heye. Şerê navbeyna mezheban, netewan û kêm netewan heye.

Emerîka bi hevalbendên xwe ve li Iraqê ye. Evana giş neyîniyên vê demokrasiya nû ne. Li welatekî weke Iraqê avakirina demokrasiyê karekî zahmet e.

Lê devjeniya li ser demokrasiyê ka divê çawa be û ne çawa be bi xwe perçeyek ji demokrasiyê bi xwe ye. Guherandina struktura dewletê jî perçeyekî demokrasiyê yê girîng e. Sîstema avakirina dewleteke federe, bidestxistina mafê derbirîna siyasî bi azadî, mafê avakirina partî û dezgehên etnîkî, çînî û olî û cinsî bi kêmanî be jî bingeha avakirina demokrasiyê bi xwe ne. Demokrasî û jiyana civakî bi benên xurt bihev re girêdayî ne. Jiyana civakî ya sivîl li Iraqê dibin bandora oli û neteweyî de ye. Demokrasî li Iraqê di çerçoweya jiyana civakî de bi neyîniyên xwe derdikeve pêş. Ji xwe demokrasî nayê maneya civateke bê pirsgirêk. Heger civatek bi mecalên xwe yên bidestxistî, bi azadî pirsgirêkên xwe bikaribe raxe ber çavên raya giştî, li wê derê demokrasî heye. Bîr û rayên li ser demokrasiyê her dem di nava guherandinê de ye. Rastiya demokrasiyê ya îro, dikare çewtiya pêşerojê be. Li Iraqa federe neyîniya sereke bi ya min ya ku "çavkaniya xwe ji Îslamê werdigre" ye. Li vê derê aliyekî demokrasiya Iraqê dixwaze islamiyetê ango ola Îslamî bike erkê siyasî. Karê dewletê aloz bike û hêza Îslamî derxe pêş û bi hêz bike. Ev bi xwe dibe sedemê aliyekî civatê weke jin ji derveyî jiyana civakî bimîne. Lê ev neyînî bi hêza demokrasiyê ve dikare ji holê rabe. Ev jî wext dixwaze.

Kurdên bakur, yên rojava û yên Rojhilat, û hemû netewe û kêmnetweyên Rojhilata Navîn pir bireheti dikarin çareseriya neteweyî li Iraqa federe ji xwe re bikin mînak. Ev mînak divê mînaka siyasî be ne mînaka civakî. Struktura nû ya Iraqa federe pêngava yekem ya guherandina struktura Rojhilata Navîn e. Lewra pêwîst e em neyînî û erêniyên vê prosesê bibînin û mînakên erênî derxin pêş. Ev tenê ne watiniyên tevgera Kurd e. Hemû netewe, kêmnetewe û çîna zahmetkêş, ol û mezhebên bê mecal û bindest dikarin vê mînakê xurt bikin. Li vê derê min bi kurtî anî zimên. Li jorê min ev pirs anîbû zimên. Bi baweriya min ji dîrokê û virde ta îro, di Rojhilata Navîn de cara yekem e ku çewtiya bi salan hatiye kirin, ji nû va tê sererastkirin. Ev mînaka Iraqa federal berbanga sererastkirina vê pêvajo bi xwe ye û loma jî girîng e.

Ezê nuha jî çend mînakên civatên pirçandî bînim zimên. Minakên ezê bînim zimên dixwazim bi dîrokî ve şîrove bikim. Ger ji dîrokê bêpar em vê rewşa van mînaka bînin zimên bawerim wê kêmasiyekê bi xwe re bînin û wê neyê fêmkirin. Mînakên min wê dîsa ji Ewropayê be.

Ezê ji Îspanyayê dest pê bikim. Bawerim pisgirêka Îspanyayê nêzîkî pirsgirêka neteweyî li Tirkiyê, Îran, Iraq û Suriyê ye.



# IV

# ÎSPANYA

Kraliyeta Ispanyayê dewleteke li başûrê rojavayê Ewropayê, li nîvgirava Îberyayê ye. Paytexta Îspanyayê Madrid e. Îspanya bi 17 navçeyên xweser ve weke dewleteke Federal/nîv Federal xwe binav dike. Weke minak ji van 17 herêm û navçeyên Îspanyayê yên naskirî binav dikim.Valensiya (Valensiya), Galîsiya (Santiago de Compostela), Katalonya (Barselona), Welatê Baskî (Vitoria-Gasteiz), wek 4 herêmên xweser di nava yekîtiya Îspanyayê de cîh digrin. Ezê li jêrê bi kurtî dîrok û xweseriya du welatan şîrove bikim. Li Îspanyayê bi gelemperî zimanên Îspanî, Katalanî, Galîsyayî, Baskî û Aranî (okzîtanî) tên axaftin. Îspanî zimanê fermî yê dewletê ye û ew her sê zimanên din jî bi tenê li hin herêman zimanê fermî ne. Lê li hin derên din hin zimanên din jî tên axaftin. Li Katalonya li dibistan û zanîngehan him zimanê Katalanî û him jî Îspanî tên bikaranîn. Wek li Valencia zaraveke Katalanî, mînak Asturî, zimanên din yên ji aliya kêmnetewyên Îspanyayê ve têne axaftin. Îspanya weke gelek welatên Ewropî bi makzagonî Kraliyet e lê li Îspanyayê demokrasiya parlementerî serwer e. Ji sala 1986'an û vir de endamê Yekgirtiya Ewropayê ye. Îspanya di sala 1982'an de jî bûye endamê NATO yê.

### Rewşa Îspanya ya îro

Dîroknasê Baskî rewşa struktura otonomiya Baskê ya îro wiha şîrove dike:" Îspanya dewleteke ji 7 (heft) xweseriya pêk hatiye. Ji wana 4 otonomî yên neteweyên cuda ne. Evana Baskî, Katalonî, Galîçî û

Navarayî ne. Xweseriyên netewan ji her sê xweseriyên din cudatir in. Neteweyên xwedî herêmên xweser in, li ser herêmên xwe desthilatdar in. Hukûmetên wan, meclîsên wan, dadgehên wan heta dadgeha bilind û hêza wan ya polis (asyişê) heye. Hêza wan ya polis mezin e. Beşek ji baca herêmê di destê desthilatdariya otonomiya herêman de ye. Perwerde, pizişk, aboriya herêmê, dadwerî, çandî, turîzm, xwezayî, pirsa derdorê, pirsên rê, spor û wekî din di bin desthilatdariya otonomiya herêman de ye. Di derbarê pirsên girîng de xweseriyên netewa desthilatdar in. Ala otonomiyên netewa ya neteweyî heye ."[131]

Otonomiyên netewan yên Îspanyayê ne weke dewletên serbixwenne. Lê desthilatdariya wan bi hêzne û li ser xaka xwe desthilatdar in. Otonomiyên netewan, yên xwedî zimanên cuda ne, perwerdeya xwe bi zimanê xwe dikin. Zimanê wan zimanê fermî yê herêmî ye. Li van herêma perwerde bi modelên cuda û bi gelek alternatîfan pêk tê. Lê piranî bi du zimanan perwerde pêk tê û tu pirsgirêkên mezin peyda nake. Sîstema du zimanî li Îspanyayê bi berfirehî heye û bi serkeftî tê şîrovekirin. Navara weke herêmeke Baskan ya duyem e. Li vê herêmê serjimara Baskîaxêvan ne zêdenye. Asîmîlasyon li vê herêmê pir xurt bû. %10-12 Baskî dizanin. Weke etnîkî ev herêm Baskî ye lê weke herêmên Kurdistanê Soranî û Kurmancî yan jî Zazakî û Kurmancî, ji hev cudaye. Lê li Navarayê sê sîstemên fêrbûna ziman û ya perwerdeyê heye. Her mirovek di helbijartina xwe de azad e.

Li Katalonya û li Galîçya zimanê herêmî bi hêz e û perwerde bi zimanê herêmî pêk tê. Îspanyolî jî heye û weke zimanê duyem di perwerdê de bikar tê.

Gelek nivîskar û dîroknasên Tirk, rastiya Îspanyayê bi çewtî şîrove dikin û rastiya wan ji ber çavê civatê bi dûr dixin. Zimanê dewletê yê fermî rast e Îspanî ye. Lê herêmên otonom jî xwedî zimanê fermî ne. Perwerdeya xwe bi zimanê xwe dikin. Li van herêman hêza polîs (asayiş), hêza pizişkî, û hêza perwerdeyê ji neteweyên van herêma pêk tên. Yekî Baskî yan jî Katalonî nizanibe di nava van hêzan de nikare kar bike. Ev bi xwe desthilatdariya van herêman bi zelalî rxuya dike.

131 Rapora Şaxa Diyarbekir a Bel-Senê.

Nimûneya Îspanyayê girîng e. Bi awayên cuda tê îzah kirin. Hinek vê strukturê weke nîv-federasyon bi lêv dikin. Hinek weke federasyon û hiek jî weke struktura Brîtanya Mezin weke devolusyonê bi nav dikin. Lê ji vana kîjan dibe bila bibin ne girîng e. Ya girîng selahiyeta desthilatdariya herêmê xweser in. Otonomiya Katalonya weke dewleteke serbixwe tevdigere. Pêwendiyên xwe yên navneteweyî weke struktura konfederasyonê bikar tîne. Makzagona Îspanyayê, mafê neteweyên cuda bi yasayî aniye zimên û mafê wan bi yasayî ewle kiriye. Loma jî pir bi asanî mirov dikare bêje Îspanya dewleteke demokratîk, pirçandî û pirneteweyî ye. Makzagona Îspanyayê, bi ewleyiya mafê mirovan û mafê netewan û kêmnetwan ve demokrasî li Îspanyayê bicîh kiriye û êdî tu hêz nikare vê strukturê jinholê rake. Lê her roj ev struktur di berjewendiyên hemû netewe û kêmneteweyên Îspanyayê de bi başî pêşve diçe.

## Dîroka Îspanyayê

Berî zayinê di 1100 de Fenîkî cara yekem weke qabîleyekê weke bineciyê Îspanyayê cîh li Îspanya girtine. Piştî wan jî Keltî û Yunaniyan li vêderê cîh girtine. Romî berî zayinê 202'an de Kartacayiyan ji girava Iberiyayê derxistine. Piştî vê demê împaratoriya Roma li Îspanyayê yekîtiyek avakiriye û ola Îsewîtî aniye vî welatî. Duvra piştî zayinê di sedsala 5'an de Îspanya kete ber êrîşên qabîleyên Germanî. Piştî wan jî gelek qabîleyên cuda li vî welatî desthilatî kirine.

Piştî van qabîleyên cuda û serweriya wan, dû re jî piştî zayinê di sala 711'ê de qabîleyên musliman ji Afrikayê berbi vî welatî ve hatine û ji serdema 8'an ta serdema 10'an dervî çend qabîleyên nehatine zevtê, hemû Îspanya girtine destê xwe û navê şaristaniya xwe li vê derê kirine Endulusî. Vê şaristaniya ha, ya Emewiya bi xweye.

Di serdema 11'an de li welatê Îspanya tevlihevî û şer dest pê kir. Îsewiyan ev tevliheviyê weke derfet şîrove kirin û ev derfet bikar anîn. Ji nûva welatê Îspanyayê xistin bin destên xwe. Di vê demê de cîhê ji destê Misilman û Yehudiyan derketine bûne qada zilma Îsewiyan. Di dema 1276'an de tenê Granada di destê Misilmanan de mabû.

Di sala 1469'an de Karaliyeta Aragon û ya Kastîlya gihiştin hev û imparatoriyek hevbeş avakirin. Di sala 1492'an de melekiya Granada hate ruxandin û Kristof Kolomb bi alîkariya melekê Îspanyayê derket

keşifkirina Amerikayê. Ev ger bû sedema avakirina kraliyeta mezin ya kolonyalistî ya Îspanyayê. Îspanya bi vê keşifkirina Amerikayê şerekî mezin li dijî Çermsoran da û bi qetilkirinên mezin Çermsor kuştin. Di sala 1588'an de Îspanya di şerê navbeyna Britanya û Îspanya mezin de lawaz ket. Di sala 1640'î û 1714'an de gelek cîhê di destê Îspanyayê de ji dest derketin. Portekiz azadiya xwe bi dest xist. Di dawiya sedsala 19'an de Îspanya hemû xaka xwe ya kolonîkirî yên Emerîkayê ji dest berda.

### Şerê cîhanê yê yekem

Di şerê cîhanê yê yekem de Îspanya bi dewletên hevpar re tevdiliviya. Fransa kete nava Îspanya û gelek cîh dagir kir. Di sala 1931'ê de dengdan çêbû û komarparêz bi ser ketin. Kral Alfonso reviya û welat terk kir. Piştî dengdana sala 1936'an hêzên çep bi ser ketin û şerê navxweyî li Îspanyayê dest pê kir. Di sala 1939'an de şerê navxweyî bidawî hat û Franko bû serokê dewletê. Franko di şerê cîhanê yê duyem de beşdarî şer nebû û serokatiya xwe berdewam kir. Di sala 1975'an de Franko mir û hêzên siyasî ketin nava lêgerînekê. Carlos di sala 1976'an de bû kral och pêvajoyeke nû li Îspanyayê dest pê kir. Dengdana demokratîk piştî 41 salan di sala 1977'an de dest pê kir û Îspanya kete rêya guherandineke bêhempa. Ji vê demê û virde muhaweleyên çend darbeyên leşkerî biser neket û Îspanya rêya xwe ya demokrasiyê berneda. Di sala 1978'an de makzagona nuh hate pejirandin û bi makzagonê ve girêdayî Îspanya ji nuh ve bi 17 herêmên xweser û bi du bajarên otonom v e hate vejandin. Nûfusa Îspanya ya 2008'an 40.491.051 e.

### Zimanên Ispanyayê

| Ziman | Prosent | Ciyê lê fermî ne |
|---|---|---|
| Ispanyolî | % 99 | Li hemû welat |
| Kataloni | % 10 | Katalonya<br>Giravên Balearic<br>Valencia |
| Galiçî | % 6 | Galiçya |
| Baskî | % 1.6 | Bask |

Li Îspanyayê zimanê fermî gelek in. Îspanî yek ji wan zimanan e ku li hemû welat tê axaftin. Zimanên din tenê li herêmên xwe weke zimanê fermî ne û li wan herêman perwerde jî him bi wan zimanên wan netewan him jî bi Îspanî pêk tê.

### Ol

Di makzagona Îspanyayê de dewlet bê ol e. Lê binecîhên Îspanyayê ji sedî % 96 katolîk in.

### Netewe û kêmneteweyên li Îspanyayê

#### Baskiyan, yan jî Euskadî (Welatê Baskan)

Li bakurê Îspanyayê û li başûrê Fransayê welatekî bi zimanê Indi-Ewropî ye. Navê Baskiyan bi zimanê Baskî Euskadî ye. Baskiyan ji heft herêman pêk hatiye û her heft herêm bi hevre binavê Baskiyan yan jî Euskadiyan tê nasîn. Kurdistan ji bo Kurdan çiqas girîng e, Navê Euskadî jî li ba Baskiyan gelek xurt e, lewra ev nava ji wan re isbata welatê wan bi xweye.

Welatê Baskiyan di sala 1659'an de di navbeyna Ispanya û Fransayê de hate perçekirin û Baskî di nava du hêzên biyanî de man. Di nava netewa Baskî de gelek raman û ideolojiyên cûda hene. Li ser çareseriya pirsgirêka Baskiyan gelek ramanên cûda hene û gelek caran pevçûn dinavbeyna wan de derketiye.

Ispanya û Faransa bi dijwarî li ser asîmîleya Baskiyan rawestiyane û xwestine wan asîmîle bikin. Loma jî îro gelek Baskî xwe ji Fransiziyan û Ispaniyan cûdatir nabînin.

Lê piraniya Baskiyan xwe weke neteweyekê dibînin û daxwazên xwe jî li gor neteweyeke serdemî tînin zimên. îro gelek siyasetmedar û kesayetî bi tehditên ETA'yê rûberû dimînin. ETA weke temsîliya Baskan tenê kesayetiyên der û dora ETA'yê dibînin û hemû kesyetiyên din yên Baskî bi tehdîtên ETA'yê rûbe rû dimînin. ETA şerê xwe yê çekdarî berdewam dike. Ji bo pirsgirêka Baskan nehatiye careserkirin li gor baweriya wan berdewamiya şer girîng e. Ew dixwazin cûdahiya Nasnameya Baskan ji ya Ispaniya û ji ya Fransiya bi rêya şerê çekdarî eşkere bikin.

Destpêkirina tevgera neteweyî ya Baskî bi dîroka wê ya netewî ve girêdayî ye. Baskî xwe weke neteweyeke dîrokî bi zimanekî dîrokî û bi çandeke dîrokî yek ji neteweyên kevnare dibîne û nasnameya xwe bi hersê beşan tîne zimên. Lê ji dîroka Baskiyan tê xûyakirin da ku tucarî weke neteweyeke serdemî dewleta xwe ya serbixwe ava nekirine. Ev herêm bi dîroka serhildana li dijî Îspaniyan navdar e.

## Destpêka neteweya Baskî

Bi serweriya yasayên herêmî ve jî Baskiyan navdar in, ku ew bi zimanê xwe Euskadî, weke Fueros binav dikin. Neteweperestiya Baskî di dawiya sedsala 1800'î û di destpêka sedsala 1900'î de dest pê kiriye û heta îro berdewam dike. Ev herêm bi sahîl û beravên xwe ve tê nasîn û loma jî ji Ispanya û ji gelek welatên din yên Ewropayê koçberî berbi vê derê çêbûye. Ev koçberî û ev sahîl û beravên Baskiyan bandoreke mezin li ser neteweperestiya Baskiyan kiriye.

Bavê neteweperestiya Baskiyan Sabîno Aranay Goiri tê binavkirin. Ew di sala 1865'an de li herêma Abando hatiye dinyê. Wî hê di zaroktiya xwe de ji birayê xwe serxwebûna Baskiyan Dibîhîst û di (17) hivdeh saliya xwe de dest bi propagandeya serxwebûna Baskiyan dikir. Wî herêma Baskiyan ya di bin destê Ispanyayê de weke dagirkirî didît û loma jî bi îdeolojiyeke netewayetî ku bi girêdaneke olperestî ve dihate binavkirin dest bi serhildana neteweyatî dikir. Wî tevgera xwe li ser 4 elementên bingehîn ava dikir.

1- Tevgera neteweyî ya Baskî serweriya bi yasaya herêma ku li jorê jî me anîbû zimên Fueros weke mafekî bingehîn û yasayeke rast didîtin. (Ji bona bê fêhmkirin weke mînak serweriya Mîrekiya Kurdan li Kurdistanê mirov dikare nîşan bide 2- Nîjada Baskiyan bi taybetî ji ya Fransiyan û ji ya Ispaniyan bilintir û paqijtir e. 3- Adet û kevneşopiya Baskiyan û çanda wan divê bête parastin. 4- Divê zimanê Baskiyan Euskeran bête parastin û bihêz bibe.

Bi van herçar elementên sereke ve cara yekem di sala 1893'yan de Aranay Goiri bi berxwedaneke eşkere bi xwerêdaneke gelemperî daxwaz û hêviyên Baskiyan bi netweperestiya Baskiyan ve anî zimên. Li ser van herçar elementan weke bingeh cara yekem di sala 1895'an de bi serokatiya Aranay partiya neteweyî ya Baskî hate avakirin. Navê partiyê **PNV-**

**Partîdo Nacionalîsta Vasco**, bû. Îro ev partiya neteweyî partiya herî mezin ya Baskiyan e. Sabîno Aranay weke nîjadperestekî Baskî di dema jiyana xwe û piştî mirina xwe 1903'yan ya de, bandoreke mezin li ser tevgera neteweyî hişt. Îro gelek siyasetmedar û kesayetiyên Baskî nîjadperestiya Sabîno naparêzin û bi awayekî serdemî mafê xwe diparêzin. Lê ew herdem weke bavê destpêka tevgera neteweyî tê binavkirin û tê bibîranîn. Weke minak rola Barzaniyê nemir di dîroka Kurdistanê de çawa ciyekî girîng werdigre Sabîno jî di dîroka neteweyî ya Baskiyan de roleke wiha werdigre. Lê divê bê gotin Barzaniyê nemir tucaran nîjadiya Kurd di ser neteweyên din re negirtiye. Parastina mafê neteweya Kurd bi awayên aştîxwaz kiriye stratejiya sereke ya tevgera neteweya Kurd. Wekheviya netewa parastiye û di vê çerçoweyê de mafê Kurdan yê rewa parastiye. Lê tucarî mafê netewa Kurd nekiriye bazara siyasî.

Birastî jî cara yekem Sabîno ala Baskî ( **Ikurrinan**) derxist holê. Wî maf û azadiyên netewa Baskî û daxwazên netewa Baskî aniye zimên. Cara yekem wî siruda netewî -**Gora ta gora**- aniye zimên û ev roj weke roja neteweyî – **Aberri Eguna** pîroz kiriye.

Navê Baskiyan yê bi navê Baskî **Euskadî** wî derxistiye holê. Partiya wî weke partiya yekem ji sala 1895'an ta demokratîzekirina Ispanyayê berdewam kiriye û weke partiya neteweyî serhildan û daxwazên Baskan aniye zimên.

Ev partiya Sabîno di sala 1986'an de ji hev ket û bû du perçe. Partiyek bi navê Eusko Alkartasuna derket holê. Iro herdû partî gelek caran bi hevre hevkarî dikin. **Partiyên hatine binavkirin di program û bernameyên partiyên xwe de çareseriya pirsgirêka Baskiyan, di referandûmê de dibînin û mafê çarenivîsî jî bi vê referandûmê ve girê didin.** Di qada teoriyê de herdû partî jî serxwebûna Baskiyan tînin zimên. Ev daxwaz û têkoşîna Baskiyan ji aliyê partî û kesayetiyên siyasî yên Îspanî ve neyênî tête şîrovekirin û li dijî van daxwaza radiwestin.

### Di dema Franko de Baskiyan

Di dema Franko de, Pir bi asanî mirov dikare bêje Franko û diktatorên piştî wî, bi zilma xwe, bi siyaseta li dijî çand û zimanê Baskiyan û bi dijberiya maf û azadiyên Baskiyan ve tevgera neteweyî ya

Baskiyan bihêz kiriye. Di sala 1936-1939'an de zilmeke mezin li netewa Baskan hate kirin. Vê zilmê û sidetê tevgera neteweyî ya radîkal bihêz kir.

Franko di sala 1939'an de bû xwedî desthilat. Piştî hate hukum şîara wî ya esasî **"Espana una librey grande" bû. Ango** Ispanya yekgirtî, azad û serwer. Di bin ala vê şîarê de Franko zilma dewletê li ser Baskiyan û çanda wan zêde kir. Kuştin, dardekirin, zindan bû para kesayetiyên cûdaraman û kesayetiyên demokrat. Kesayetiyên wekheviya netewa diparastin hatine dadwerkirin. Hatine kuştin yan jî hatine zindankirin. Netewa Baskî kete ber zilmeke mezin ya serweriya Franko. Mafê wî yê neteweyî, çanda wî hate înkar kirin. Yekgirtina dewletê bû bingeha serweriya dewletê ya tenha. Zimanê Baskî, perwerdeya bi zimanê Baskî, çalakiyên çandî hatine qedexekirin. Bi zimanê Baskî axaftin û nivîsandin hate qedexekirin. Li zarokên xwe navkirina bi zimanê Baskî hate qedexekirin. Navê herêm û navçeyên Baskiyan hate guherandin û bi navê Îspanî hatine binavkirin.

Dewleta Tirk mînaka Îspanya yê ji xwe re kiriye nimûne û daye ser şopa Franko û qedexeyên hatine binav kirin li Kurdistana bakur ji yên Baskan bêtir in. Vê zilma Franko tevgera neteweyî bi hêz û bi jiyan kir. Şiyarbûneke bêhempa dest pê kir. Berxwedan berfireh bû beşdarî jî zêde bû.

## ETA

Vê helwesta Baskiyan heta avakirina ETA'yê berdewam kir. ETA di sala 1959'an de hate avakirin. ETA bi şîara parastina ziman û çanda Baskî û bi berxwedana li dijî şîdeta rejîma Franko hate avakirin. Vê berxwedena Baskiyan tenê ne li Îspanya herwiha li Franasayê jî dest pê kir. Li Faransayê di dema şoreşa Fransî de di sala 1789'an de sê herêmên Baskî yên di nava sînorên Fransayê de bi çend herêmên başûrê Fransayê ve kirin yek û weke herêmeke mezin hate binavkirin. Armanca vê siyasetê ew bû ku sînorên hemû yên etnîkî bidawî bîne û civateke yekreng ya Fransizî ava bike. Mafê kêmnetewa û herêmên etnîkî hatine inkarkirin. Mafê wan yên kollektifî ji holê rabû. Evana kiryarên netewe-dewleta Fransizî ne.

Mafê wan yên siyasî-etnîkî hate qedexekirin. Ji vê demê û virde pirsgirêka Baskiyan ne tenê li Ispanyayê lê herwiha li Fransayê jî hebû û di vê dema ku netewa Baskî Ji nû ve dest bi organîzekirina serhildana li Ispanyayê dikir herwiha li Fransayê jî ev serhildan dihate organîzekirin. Mînaka Kurdistanê ji bo bête fêhmkirin, mînakeke berbiçav e. Serhildanên başur û Rojhilatê Kurdistanê bandora xwe li ser bakurê Kurdistanê kiriye. Herwiha serhildanên neteweyî yên bakur jî bandoreke mezin li ser beşûrê Kurdistanê yên din kiriye û gelek caran jî têkiliyên wan bi hevre hebûne û alîkariya hev kirin in.

## Tevgera ETA'yê

Piştî mirina Franko sala 1975'an û piştî demokratîzekirina Îspanyayê Netewa Baskî mafê xwe yê neteweyî weke herêmeke xweser di nava dewleta Ispanî de bidest xistiye. Herêma Baskiyan li Îspanyayê serokê (president) herêmê heye. Weke başûrê Kurdistanê. Hukumeta xwe ya serbixwe heye. Parlementoya xwe ya serbixwe heye. Dadgeha xwe ya bilind heye. Dezgeha bac vergirtinê di destê herêmê de ye. Hêza xwe ya polis heye. Zimanê Baskî zimanê fermî yê herêmê ye. Perwerde bi zimanê fermî yê herêmê tê kirin. Lê Ispanî jî di perwerdeyê de ciyê xwe digire.

Li herêma Baskiyan ( Euskadî) ETA weke partiyek cûdaxwaz têdikoşe. Ev tevger yan jî partî ji sala 1959'an ve weke partiyeke nehênî têdikoşe. Di eslê xwe de kevirên avakirina vê tevgerê hê di sala 1952'an de hatibû avêtin. Li dijî Franko xwendevanên Baskî bi avakirina hucreyên (grub) cûda cûda têdikoşiyan. Ji wana yên mezin û naskirî weke EKIN û weke EGI dixwestin xwe li dijî Franko bikin yek û hêzeke serhildanê li dar bixin. Vê tevgerê bi navê ETA ( **Euskadi Ta Askatasuna, Baskî och Azadî**) xwe birêkxistin kir.

Di sala 1968'an de vê tevgerê dest bi kuştinê kir. 836 kes kuştin û 2367 kes jî birîndar kirin. Wê demê ETA bi xwe weke pêşdebirina çand û zimanê Baskî têdikoşiya. Lê şaxê wê yê bikaranîna şîdetê jî hebû û car bi car bikar tanî lê ne bi navê ETA'yê. ETA ji avakirina xwe û heta nuha tucarî nebûye partiyek yekgirtî. Daima fraksiyon di navde hebûne û car bi car jî ji hev veqetiya ne û hevdû êşandin in. Lê di sala 1980 yî de

veqetandineke mezin pêk hat û sê şaxên wê derketin holê. **Weke ETA Militar, ETA politico-militar û ETA Comandos Autonomos.**

Lê ji bilî vana jî dem bi dem veqetandin di jiyana ETA'yê de bûye adet. Tevgerê zû dest bi hêmbêzkirina ramanên li dijî sermayedariyê kir û ramanên li dijî burjuvazî bi ramanên neteweperestiyê ve hate girêdan û ramanên cûdabûnê kire bingeh. Lewra tevgerê pir zû dixwest hêza karger di nava tevgerê de bihêz bike.

Ramanên nuh yên tevgerê cûdabûna xwe ji ramanên faşîst yên rejîma Îspanî tanî zimên û bi ramanên nuh xeta sor dikişand navbeyna xwe û rejîma faşist ya Îspanî. Van ramanên ETA'yê bi bandoreke mezin hetanî îro jî berdewam dike. Tevgerê dest bi şidetê kir. Êrîş bir ser polis û leşkeran û hêzên dewletê. Bi vê rêyê dixwest rûyê dewleta faşîst eşkere bike. Di sala 1965'an de tevgerê dest avêt çek û bi şîdetê ve hate pêçan. Aramanca tevgerê ya sereke ew bû ku bi vê riyê pirsgirêka Baskiyan têxe rojevê. Wê hêvî dikir da ku Baskî bi wan re rabin ser lingan û tola xwe hilînin. Îro ji şaxê ETA'yê yê herî çalak ETA comado ye û bi sîstema hûcreyan çalakiyên xwe pêk tine. Hucreyê tevgerê bi serê xwe tevdilivin û têkiliyên wan bi serokatiya tevgerê re di derbareyê operasyona û propagandeya tevgerê de pêk tê. Vê mînaka ETA'yê li gelek welatan derdiket holê. Li Rojhilata Navîn weke Devsol, Devyol, li Îranê Çirîkhayên Fedaiyên Xelk, li Suriyê Partiya Komunîst ya Karger û li Bakurë Kurdistanê jî PKK nezî vê tevgerê ye. Evana çend minakên berbiçav in. Hatina tevgerê ya aborî bêtir ji girtina zikata (Bac) şoreşê pêk tê. Ev jî bi darê zorê wergirtina aboriyê ji dewlemendên Baskiyan e. Li bakurê Kurdistanê jî hin rêxistinan metodên ETA'yê pêk anîne. Li hinek welatên Ewropayê jî mînaka ETA'yê xurt e. Baydermaynof, IRA weke du nimûneyan ji wanane.

### Batasuna

Batasuna ji gelek aliyên civata Baskiyan ve pêk hatiye. Partiyeke legal û eşkere ye. Weke tevgereka ETA'yê ya eşkere tê nasîn. Tevger ji rojname, sendiqa û ji komeleyên çandî û siyasî ve hatiye avakirin. Tevgera Batasuna ji aliyê hêzên cûdaparêz ve hatiye avakirin û serxwebûna Baskiyan diparêze. Weke tevgereke gelêrî û koalisyona tevgera tê bi-

navkirin. Di sala 1977'an de bi navê **Mesa De Alsasua** hate avakirin û di sala 1986'an de jî bû partiyeke eşkere. Weke partiya eşkere bi navê **Herri Batasuna** duv re bi navê **Euskal Herritarokk** tev geriya.

Piştî dengdana 2001'ê ku tevgera koalosyonê bi ser neket, wê gavê dîsa bi navê xwe yê kevn Batasuna, dest bi têkoşînê kir. Îro jî bi vî navî têdikoşe. Bi gelek muhawelan hate xwestin ku tevger di navbeyna xwe û ETA'yê de cûdahiyekê derbixe û eşkere bike. Lê Serokê tevgerê Jon Idigoras hînê ji sala 1986'an de herdem digot her dengdaneke ji bo Batasuna dengdaneke ji bo ETA'yê ye. Batasuna tucarî çalakiyên ETA'yê yên şîdetê mahkum nekirî ye. Loma jî ew herdem weke tevgereke ETA'yê ya eşkere hate nasîn û ew jî tucarî li dijî vê helwestê ranewestiya û inkar nekirî ye. Lê herwiha jî dengdêrên û hogirên vê partiyê gelek bûn. Gelek caran %20 deng digirt. Di sala 1998'an de % 18 û di 2001'ê de jî % 10 wergirtiye.

Batasuna ji aliyê dewleta Ispanî ve hate qedexekirin. Batasuna vê biryarê li ba dadgeha Ewropayê vegilî (îhtîraz) kir lê mixabin dadgeha mafê mirovan ya Ewropayê dewleta Ispanî bi maf girt. Dadgeha Ewropayê Batasuna bi ETA'yê bestî (Têkildar) dit û loma jî vegiliya wê red kir. Serlêdarên Batasunayê ne li hêviya biryareke wiha bûn. Lê vê biryarê xeta sor kişand navbeyna tevgerên demokratîk û yên bi navê terorê hatine naskirin. Prosesek wiha li Tirkiyê dest pê kiriye. DTP hate girtin û wan jî vegiliyê xwe li ba Dadgeha mafê mirova kiriye.

### Rewşa Baskiyan ya îro

Iro piştî hewqas pêşveçûn û mafdayina Baskan hê jî pirsgirêkên Baskiyan ji rojevê derneketiye û hê jî weke berê nebe jî gelek di rojevê de ye. Di navbeyna Hukumeta Îspanî û hukumeta Baskiyan de nemaze di navbeyna partiyên wan yê siyasî de diyalogoke têr tuneye. Hemû mihawele di nêvî da dimînin û bêencam bidawî tên. Dîsa ji nûva dest pê dike û dîsa bê encam bi dawî tê. Ev proses berdewame.

Him partiyên Îspanî, partiyên Baskî yên ne bi ETA'yê ve girêdayîne sûcdar dikin û him jî wana bi alîkariya Batasuna ve tawanbar dikin. Partiyên Baskiyan jî di navbeyna Batasuna û partiyên Îspanî de di helwestên xwede nezelal dimînin û loma jî nakokî li ser vê mijarê ber-

dewam dike û nexweşî û nakokiyan dinavbeyna Baskiyan û Îspanyayê de diafirîne. Gelek siyasetmedar û serokên Baskiyan yên ne bi helwesta ETA'yê û Batasunayê ve tev dilivin dibin tehdita ETA'yê de dijîn. Her roj listeyên kesayetiyên Baskî yên bikuştinê hatine mahkumkirin têne girtin û ji raya giştî re eşkere dibin.

Hukumeta Îspanî zorê dide parlementoya Baskiyan ku pêşiya çalakiyên Batasuna û ETA'yê bigrin. Lê ev helwest dibe sedema nexweşiya têkiliyên di navbeyna herdu netewan de.

**Piştî qedexekirina Batasunayê hemû lêkolîn rê dididin ku ew bi xwene careseriye û berevajî wê radikalîzekirina tevgerê bêtir dike. Tevgerê bi hêztir dike û neteweperestiyê û dijberiya Îspaniya di nava Baskiyan de zêdetir dike. Dîsa lêkolîn rê didin ku ew şîdetê berfirehtir dike.Herwiha ew bi xwebi mebesta qedexekirinê ve nasnameya şîdetê di nava Baskiyan de ciyê xwe yê rewa werdigire.**

Îro ji berê bêtir ji sedî 30 ê Baskiyan serxwebûna Baskiyan (Euskadî) diparêzin. Ev jî maneya ku ETA bi hêztir bûye û bi girtina Batasunayê ve pirsgirêk hatiye xetimandin û xerab bûye. Li vêderê ya herî girîng eve ku li ku dibe bila bibe hetanî tevgerek bi karê terorê ranebe û eşkere kar bike divê neyê qedexekirin. Divê tu tevger, partî ji bo rayên xwe neyên qedexekirin. Tu partî û tevger ji bo nasnameya xwe ya etnîkî neyên qedexekirin. Ji bo alîkariya terorê qedexekirina tevgerekê tenê weke propagandeya serdesta tê şîrovekirin û ev helwest bi xwedibe alîkarê terorê. Berevajî armanca qedexekirinê tevgera bi navê terorê tê binavkirin bêtir bihêz dibe. Nakokiya di navbeyna netewa de dijwartir dike. Pirsgirêkê aloztir û çareseriyan jî ji ber çavê raya giştî bidûr dixe.

### Welat, ziman û netewe

**Welatê Baskan Euskadi welatekî biçûke. Bi mezinbûna xwe 20.439 km2. Biqasî bajarekî Kurdistanê ye. Welat ji heft herêma pêk hatiye. Vizcaya, Guipúzcoa, Alava, Navarra, Labourd, Basse-Navarre û Soule. Çar herêm ji yên pêşîn di nava dewleta Îspanî û her sê yê din jî di nava dewleta Fransî de cîh girtine. Her çar herêmên Baskî yên Îspaniyayê bi 17.582 km2 ye. Bilî demeke kurt di dema kevnare de tu carî Baskî bi heft herêmên xwe ve weke welatekî û weke**

**dezgeheke siyasî yekgirtî pêk nehatiye. Lê Baskî hemû herêmên xwe bi du nava bikar tînin. Herêma bakur û herêma rojava. Di salên 1900 de Baskî bi qasî milyonekê hebûn îro ew weke 2,9 hezarî tên binavkirin. Ev jî ji nûfusa Îspanî 7,5% e. Herêma herî bi nifusa xwe mezin herêma Vizceya ye. Li wêderê nêviyê gelê Baskî dijîn. Li hersê herêmên Fransayê ji nûfusa Baskiyan 8,2% dijîn.**

Perçeyê Baskiyan yê Îspanyayê ji du herêmên xweser pêk hatiye. Herdû herêm bi strukrura xwe ya civakî û bi dezgehê xwe û sîstema partîtiyê ji hev cûda ne. Heta nuha bi îsbat kesekî esl û feslê Baskiyan dernexistiye holê. Ji ku hatine û ji kengî ve li vê herêmê bicîh bûne mijareke devjeniyê ye. Nêrînek heye ku dibêje Baskî ji kabileyên Förîberiyên Pyreneiya pêk hatine. Baskiyên îro cûdabûneke berbiçav ji cîranê xwe Fransiyan û Ispaniyan tuneye. Lê Baskî herdem dibêjin ew nijadekî bi serê xwe ne. Lê Baskî bi zimanê xwe Euskera ji neteweyên din cûdatirin. Euskera yek ji zimanê kevnare yê berî zayinê bi 1000 salan ango berî hatina gelên Indo-Ewropî ye. Ev ziman tenê iro li herêma bakurê Baskiyan tê axaftin. Neteweperestbûna Baskiyan û xwedî li zimanê xwe xwedî derketin bêtir ne ji neteweperestiya Baskiyan pêk hatiye. Netewa Bask bi zilma Îspanyayê û ya Faransayê ya li ser çand û zimanê Baskî lê wa kir ku bi tundî li dijî herdû dewletana raweste û mafê Baskiyan biparêze. ETA jî yek ji afirandina vê pêvajoyê ye. Tucarî zimanê Baskî nebû zimanekî fermî yê kraliyeta li Nawarra lê li herêmên din Euskera dem bi dem weke zimanê fermî yê herêmê hatiye bikaranîn. Lê her dem zimanê nivîsê zimanê Îspanî û zimanê Fransizî bûye. Tenê li kilîseyan zimanê Euskera weke zimanê nivîskî û yê axaftinê bikar hatiye.

## Sermayedarî û neteweperweriya Baskiyan

Sermayedarî( industrî) li Baskiyan zû belav bû. Xaka wê bi ber e, bi hebûna masiyê xwe dewlemende û gelê Bask afrandêre û çalake. Loma Baskiyan herdem yek ji herêmên Îspanyayê ya dewlemende. Hê di sala 1500'an de Baskiyan dest bi sermayedariyê kiribûn. Bajarê Bilbaodi salên 1500'an de ne tenê bajarê industriyê yê kastilyayê bû herwiha bajarê herî girîng yê keştîgehê bû. Di salên 1900'an de welatê Baskiyan ji bezirganiya biçûk, û ji zireeta biçûk berbi civateke me-

zin ya industrî berfireh bû. Neteweperweriya Baskiyan jî di vê demê de bi vê berfirehiya industriyê û sermayedariyê ve hate vejandin. Di vê demê de ideolojiya neteweperwerî û hêzên neteweyî bi awayekî serdemî derketin rojeva welatê Baskiyan. Sermayedarî bandoreke mezin li ser netewayetiya Baskiyan kir. Sermayedarî di civata Baskiyan de struktureke taze afirand. Civateke ji ya berê cudatir derket holê. Bingeha guherandina struktura civakî li ser bingeha industrialîzma Baskî pêşda çû.

Sermayedariya Baskî mezin dibû û bi sermayedariya û nemaze bi olîgarşiya Îspanîve dihate adeptekirin. Bi latînî Inkorporation dibêjin. Bi vê pêşveçûnê ve girêdayî çîna karger jî derdiket rojeva civata Baskiyan û Îspanyayê. Ji herêmên Îspanyayê yên din bi hezara karger dibûn bineciyê Baskiyan. Koçberiyeke berbiçav dest pê dikir û evê bi xwe jî struktura civata Baskiyan diguhert. Hêzên tradisyonel, Kilîse û hêzên katolîk yên ruhanî yên Baskî ji vê pêşveçûnê aciz dibûn û li dijî guherandina struktura civatê radiwestiyan û fundamentalizm jî pêjda diçû. Lê di gel hemû astengiyên civatê de jî dîsa sermayedarî(kapitalizm) olîgarşiyeke Baskî diafirand û bivê nevê bandoreke mezin li ser siyaseta Baskiyan dikir. Sermayeya baskî dibû hêza sereke ya siyasî, aborî û civakî ya Baskiyan. Civata Baskiyan di navbera salên 1960- 1975an de di nava guherandinên mezin û berbiçav re derbas dibû. Nûfusa gel 44% zêde dibû. Kocberiyê nûfusa Baskiyan zêde dikir. Industriyê û pêşdeçûna civatê ya sosiyal, hêza karger zêde kir. Ev bi xwejî bû sedemê pêkanîna civata radikal ya Baskî. Ev jî ji bo netewayetiya Baskî bû bingehekî girîng. Nemaze ji dema Franco ya dîktatorî derbasbûna demokrasiyê hêzeke mezin ya Baskî ya neteweyî pêk hatibû.

Di sala 1975an de kirîzeke aborî li Baskiyan dest pê kir. Sedemên vê kirîzê him ji derve û him jî ji hundirva dihat. Sedemên sereke kirîza petrolê bû û weke Baskiyan gelek welatên din jî di bin bandora vê kirîzê de diman. Sedema hundirî jî bêistiqrariya siyasî bû ku sermayeyê ditirsand. Lê vê kirîzê li Baskiyan bandoreke mezin hişt. Şîdeta terorê bi vê kirîzê ve zêde bû. Bêkarî zêde bû û hêviya paşerojeke refah ya ciwanan nemabû. Bajarên mezin bibûn qada terorê û ciyê organîzeya kriminalîzekirina civatê.

**Dîroka Baskiyan ya berî netewayetiyê**

Heta piştî zayinê sala 200 î wexta ku imparatoriya Roma Lîberiya dagir kir Baskî bi gelek periodên dirêj weke herêmên serbixwejiyane. Di salên 700î de wexta ereb hatin vê herêmê têkiliyê Baskiyan û Ereban çêbûn. Têkiliyên Baskan û Ereban ne xerab bû. Lê Baskiyan dijminên xwe yê vê herêmê dewleta biçûk ya Isewî (xiristiyan) Asturia didîtin. Dostaniya Ereb û Baskiyan alîkariya Baskan ya li dijî Împaratoriya Karoliniya dikir. Di sedsala 824'an de piştî kraliyeta Nawarra Ku îro jî herêmeke Baskiyan ya herî naskirî ye, prensiya Pamplona hat avakirin. Kraliyeta Baskiyan di salên 1004-1035 de gîhişt asta herî bilind. Kralê Baskiyan Sancho III cara yekemîn bû ku hemû herêmên Baskiyan di bin serweriya xwe de civand. Dewleteke yekgirtî ya Baskî ava kir. Di vê demê de Nawarra bû herêma herî pêşde çûyî ya Baskî û bû herêmeke bazara Herêma Baskiyan û dervî Baskiyan. Kral Sancho III di serweriya xwe de hemû îspaniya dervî herêma (welatê) Katalonya xistibû bin destê xwe û kraliyeteke îsewî avakiribû. Vê serweriya kraliyeta Baskî heta sala 1076'an berdewam kir û gihişt Kastîlya û Aragonya .

Di navbera salên 1134-1150 kral Garcia El restaurador Kraliyeta Nawarra berdewam kir. Kral garcia kraliyet mezintir kir. Alava, Guipuzcoa û Vizcaya ji Ereban wergirt û beşdarî kraliyeta xwe kir. Kraliyeta Nawarra serxwebûna xwe heta sala 1521 ê berdewam kir lê di vê demê de ne weke dewleteke girîng dihate binavkirin. Yek ji sedema lawaziya kraliyeta Nawarra ev bû ku Gelek herêmên Baskiyan hakîmiyet û serweriya biyaniyan qebûl kirin û ketin bin destên wan. Têkiliyên herêman ji hev hatine qetandin û her herêmek bi serê xwe bi hineke serweriyên biyanî re jiyan. Ev jî dihat maneya ku cûdahiyên berbiçav di nava Herêmên Baskiyan de derdiket holê û her ku diçû mezin dibûn. Hersê herêmên ji Ereban hatibûn wergirtin yên binavê li jorê, di navbeyna salên 1200-1300 bi serweriya xwe ya herêmî ve derbasî nava kraliyeta Kastîlyan bûn.

Şîrovekirina dîroka Baskiyan belkî ji xwendevan re bêtam bê. Lê ez dixwazim welatê Baskiyan weke mînak nîşan bidim. Loma jî Baskiyan di dema xwe ya berî dîrokê û piştî dîrokê de çawa jiyane girîng e. Baskî bi navê Fueros bi yasa û serweriya xwe ya herêmî dîsa jî mafê xwe bi kar dianîn. Yasayên Baskî yên herêmî dihat maneya ku dadweriya xwe û ser-

weriya xwe bikar anîn weke mafê wan yên herêmî bû. Herêmên Baskiyan dervî herêmên xwe ji bac û ji watiniyên leşkerî muaf dihatin girtin. Di salên 1500'î de, bi yasayên Fuerosê ve girêdayî sê herêmên Baskiyan bi hev re herêmên bazara serbest avakirin. Mafê herêmên Baskiyan yê Fueros bi hinek mafên din ve ji aliyê kralên Kastilyan ve (navê Îspanya yê kevn e. Zimanê Îspanî ji Kastîlî ye.) hatin xurtkirin. Kastilyan rêz ji yasa û serweriya Baskiyan- Fuero- re digirtin û navbeyna wan xweş bû. Baskiyan di bin serweriya Kastilya de birêzgirtin berdewam dikir. Bi pêşdeçûyina sermayedariyê û bazirganiyê gelek baskiyên dewlemend bi dewlemendiya Kastilya ve hatine girêdan û gelek dewlemendên Baskî derketin holê. Lê van dewlemendên Baskî ne burjûwaziyê neteweyî bûn. Wan bêtir bi sermayedariya Îspanyayî re kar dikirin û berjewendiyên xwe di hevkariya burjuwaziyên Îspanyayî de didîtin.

Gelek ji Baskiyan di serweriya Dewleta Kastilya de û di kilîseyên Kastîlya yê de cîhê girîng wergirtin. Di sedsalên 1700'î de herêmên Baskiyan weke perçeyên dewleta Kastîlî yên bê pirsgirêk dihatin binavkirin. Serweriya navenda dewleta Kastîlya (ispanya) serweriya Fuero yê bidawî anîn. Ev ji bo Baskiyan weke felaketekê hate bibîranîn. Gundiyên Baskiyan bi vê guherandinê perîşan bûn. Dest bi dayina bacê kirin û malên erzan yên bi bazara serbest ve bidest dixistin ji holê rabû. Keşîşan erk û watiniyên xwe yên Kilîseyê wenda kirin. Tenê li bajarên Baskiyan ji vê yasaya lîberal ya neteweyî ya Kastilya re itiat dihate kirin. Tucar û dewlemendên Baskiyan bi vê yasayê ve têkiliyên xwe bi dewletê re bihêz dikirin. Lê bi gelemperî him li bajaran û him jî li gundan Baskî bi vê yasayê helak bûn û dijî vê yasayê rawestiyan.

### Netewayetiya Baskiyan

Piştî bidawîanîna Fuerosê di nava Baskiyan de bê hêvîtî û nearamî dest pê kir. Di salên 1880 'yî û 1890'î de li herêma Vizcaya dest bi çalakiyên neteweyî hatine kirin. Li dijî dewleta Îspanî û zilma wê, weke xwe û mafê xwe parastin dest bi çalakiyan dihate kirin. Dewleta Îspanî ji aliyê Baskiyan ve, ji vê demê û pê ve weke dewleteke biyanî, bêaxlaq û dewleteke dagirker lê lawaz û netêgihiştî dihate binav kirin.

Kesayetiyekî Baskî ku ji çîniya Baskî ya dewlemend dihat, weke kesayetiyekî netewî dest bi xebata neteweyî kir. Navê wî Jauntxos bû.

Neteweperestiya wî bi xwe weke netewayetiyeke reaksiyoner dest pê dikir. Serhildana wî bi helwestên nîjadperestî û li dijî netewa Îspanî û weke antî-kapitalist dihate binav kirin. Bingeha xwe li ser şîdetê ava dikir. Lê vê tevgerê ne¨ji sermayedarê Baskî û ne jî ji tevgera çepê Baskî alîkarî wergirt. Lê netewayetiya Baskiyan mirov dikare bêje bi Sabîno De Aranas ve dest pê bûye. (1865-1903). Min li jorê tevgera Sabino ya bi navê PNV Partido Nacionalista Vasco anîbû zimên. Li vê derê ez dikarim bi kurtî bêjim tevgera Baskî ya neteweyî xwe bi hêza zimanê Baskî û xwe li dora nasnameyeke hevbeş dida hev û xwe bi tevger dikir. Di destpêka netewayetiya Baskî de û bi tevgera Sabino hemû tiştê bi Îspanî dihatine binav kirin hatine red kirin. Nîjadeke Baskî, zimanekî Baskî, xaka Baskî û ola Baskî ku bi katolîkiyeke hişk ve dihate girêdan. Ev tevger di nava burjuvaziya biçuk û di nava olperesta de belav bû. Ev tevger di berfirehbuna xwe de bû du alî. Aliyek weke muhafazakar û aliyeke din jî weke radikal hatine binavkirin. Aliyê muhafazakar ku weke tevgera rast dihate binavkirin bi tevgera muhafazakar ya Îspanî ve dijî tevgera lîberal û ya sosyalist rawestiyan. Wan tevgera Lîberal û ya sosyalist weke metirsiyekê şîrove dikirin. Tevgera radikal jî xwe ji tevkariya tevgera Îspanî ya rast û ji oligarşiya Baskî jî xwe parast û weke tevgereke demokrat bi serê xwe tev digeriya.

Di şerê cîhanê yê yekem de li Baskê tevgera netweyî ya Baskî lawaz bû û nikaribû xwe bi mîrekparêzeran re û bi sosyalistan re miqayese bike. Lê di dema şerê cîhanê û heta sala 1920'an tevgera neteweyî xwe organîze kir. Tevgera neteweyî ji bo otonomiya Baskan bi dewleta Îspanî re di nava devjeniyê de bû. Lê mixabin di sala 1923'yan de general Primo bi darbeyeke leşkerî hate ser hukum û hemû dezgehên siyasî û çalakiyên wan qedexe kir. Tevgera Baskî jî nesîbê xwe ji vê darbeyê girt. Di vê demê de çand û zimanê Baskî pêşde diçû. Gavên siyasî nehatin avêtin lê xebata çandî bi girseyî berdewam dikir. Di sala 1930'yî de piştî ruxandina Primo De Riveras tevgera netewayetî ya Baskî dîsa dest bi xebata xwe kir. Tevgerên netewî xwe kirin yek û bi hêz bûn. Tevgera neteweyî li Baskiyan bi azadî dest bi xebata xwe dikir. Wê gavê PNV bi Josê Antonîno ve xwe nû dikir û xwe ji nijadperestiya Baskî azad dikir. Eniya demokrasî piştî hilbijartina di sala 1936'an de hate ser hukum. Bi vê serketinê ve ji nû va ji bo mafê otonomiya Baskiyan têkilî

di navbeyna Baskî û Îspaniyan de dest pê kir. Lê mixabin di dema ku otonomiya Baskî tenê li hêviya biryara Parlemena Îspanyayê bûn ji nû va serhildana generalan di 18'yê meha sala 1936'an de dest pê kir û çareseriya pirsgirêka otonomiya Baskê jî ji holê rabû. Di navbeyna hêzên çep û rastê de li Ispanyayê şer dest pê kir. PNV bêterafî tevliviya. Lê di dema şerê navxweyî berfireh dibû PNV êdî nikarîbû bêteref bimaya. Di vî şerî de armanca hêzên rast yên Îspanî bidawîanîna tevgerên cudaparêz yên Baskiyan û yên Katalonyan bû.

Di 1/10-1936'an de parlemena Îspanyayê di derbarê mafê otonomiya Baskî de biryar da. Lê di vê biryarê de hemiya welatê Baskan cîh nedigirt. Lewra Îspanyayê hemû herêmên Baskiyan qebûl nedikir. Navarra yek ji wan herêmên Baskiyan ya herî girîng bû û ew jî dervî vê biryarê dima. Bi vê biryarê tenê herêma Vizcaya dibû otonom. Perçeyên din di bin destên hêzên leşkerê Franko de bûn. Serokê herêma otonom ya Baskî Josê Antonino Aguirre weke presidentê yekem hate helbijartin. Hukumeta otonoma Baskiyan di 7/10-1936'an de hate avakirin. Vê otonomiya Euskadî (Bask) gelek demeke kurt berdewam kir û bi malwêranî bi dawî hat. Heta generalan midaxeleyî vê otonomiyê nedikir, pir bi xweşî bi rê ve diçû. Lê general Mola di 31/adarê 1937'an de êrîşî Euskadî kir û rewşa otonomiyê guhert. Hêzên Baskî ji hev xist û dawiya otonomiya Baskiyan anî. Di dema serweriya Franko de jî dîsa Euskadî kete bin zilm û zordariya Franko. Bi gelek kuştin û girtin zilmeke mezin li gelê Baskiyan hate kirin. Zîndanên Franko bi girtiyên siyasî tije bûn. Otonomiya Baskiyan bidawî hat. Hemû sembolên netewayetiya Baskiyan û Kataloniyan hatine qedexekirin. Gelek herêmên Baskiyan di serî de bi generalan re tevliviyan. Hêzên burjuwaziya Baskî bi generalan re tevgeriyan û bandoreke mezin li ser hêzên neteweyî kirin. Baskiyan vê helwesta generalên Ispanî weke dagirkerî bi nav kirin û dijî wê rawestiyan. Hêzên leşkerî yên dagirker bandoreke mezin li ser tevgera neteweya Baskî kir û ew ji hev xist. PNV weke tevger koçber bû. Bêhêvîtî di nava nivşê kevn de peyda bû û ji hev qetiyan. Nivşê nuh yên ciwan ji nû ve lê bi rengekî radikal xwe organîze dikirin û li dijî Franko şer dikirin û nasnameya Baskiyan derdixistin pêş.

**Helwesta li dijî dewletê**

Di sala 1977'an de gelên Îspanyayê di derbareyê struktura dewleta Îspanyayê de rayê wan li gora li jêr hatiye nivîsîn. Ji sedî % 46 dewleta merkezî dixwestin. %45 desentralizasyona dewletê dixwestin û otonomî ji bo gelên cûda diparastin. %3'yan jî ji bo hin herêma serxwebûn diparastin. Di sala 1979'an de piştî devjenî û axaftin û nivîsên li ser vê babetê û axaftinên di medyayê de û herwiha bi berdewamiya çalakiyên şîdetê ya ETA'yê nûfusa otonomîparêzan gelekî zêde bûn. %56'an ji gel mafê herêman yên otonomî diparastin. Yên dewleteke navendî diparastin daket %30'yî. Li Welatê Baskiyan jî ev rewşa ha bi awayekî din dihate şîrovekirin.

Di sala 1977'an de %45'an otonomî dixwestin. %18'an otonomiyeke berfireh û xwedî serwer diparastin. %16 jî otonomiyeke bêhûdûd dixwestin. Pistî du sala ango di sala 1979'an de yên otonomî dixwestin bûn %54. Di 1982'an de ji 4'an yek gelê Baskî serxwebûn diparastin û ji bo otonomiyê hejmar gîhişt %57'an. Li vê derê bi asanî mirov dikare bêje di serî de şîdetê rê li ber raya giştî ya ji bo otonomî û serxwebûnê vedikir. Lê piştî otonomî hate bicîhkirin şîdeta ETA'yê bandora xwe wenda kir û raya gel berbi otonomiyeke berfireh de diçû. Ev jî tecrûbeyeke girîng e. Wexta demokrasî hebe şîdet bandoreke mezin li ser raya gel nake. Lê demokrasî û wekhevî tunebe, zilm û şîdeta dewletê hebe wê gavê şîdeta berevajî şîdeta dewletê di civatê de cîh digre û bandoreke mezin li ser gel dike.

Di salên 1978-79'an de %20 ji gelê Baskî ETA'yê weke terorist didît. Ji sêya yek ETA'yê weke tevgereke manîpulatif didît.

Lê nêviyê nûfusa gelê Baskî ETA'yê weke tevgereke neteweparêz, welatperwer û xwedî îdîa didît. Ev jî tecrûbeyeke girîng e. Baweriya gel bi serhildana çekdarî dihat û dewleta Îspanî ji gel re tu rê nehiştibû. Gelê Îspanî berevajî Baskiyan di sala 1978'an de bi piranî weke bêlayanî xûya dikir. Di sala 1982'an de dijberiya ETA'yê di nava Baskiyan de mezin bû. Di sala 1979'an de ev hejmar %53 bû lê di sala 1982'an de ev hejmar gîhişt %82'an. Îro piraniya Baskiyan ETA'yê weke tevgereke terorîst dibînin û alîkariya ETA'yê nakin.

Di sala1979'an de sedemê şîdetê ji aliyê gelên Îspanyayê ve wiha dihate şîrovekirin. Piraniya gelê Baskî sedemê şîdetê bi helwes-

ta dewlet û hûkumetên Ispanyayê ve girêdidan. Di dema Îspanya derbasî demokrasiyê dibû di nava Baskiyan de konsensuseke hevbeş û yekîtiyeke xurt li ser bikaranîna şîdetê û bidestxistina otonomiyê tunebû. Digel hemû kêmasiyan de dîsa jî armanca neteweyî di nava Baskiyan de xurt bû û li ETA'yê bi erênî dinêrîn.

Berevajî Baskiyan piraniya Îspanyoliyan li dijî helwesta ETA'yê bûn. Sedema sereke ya Îspanyoliyan li gor nêrîna wan ETA'yê nedixwest bi dewletê re li hev bike û şîdetê bi kar dianî. Piraniya Îspanyoliyan dixwestin di çerçoveya yasayan de aramî pêk bê û ji yasayan re rêz were girtin.

Li gor lêkolînekê ku di sala 1985'an de pêk hatiye xuya dike ku heta wê gavê jî helwesteke hevbeş di nava Baskiyan de li ser ETA'yê tunebûye. %76 difikirin ku rawestandina şîdetê wê rê li ber pirsgirêka Baskiyan vebike û bikaribe guherînên erênî Pêkbînî. %16 dixwestin ETA hebe û xebata xwe berdewam bike. %40 jî nêrînên ETA'yê yên li ser guherîn û struktura dewleta Îspanî rast nedidîtin. %36 hevkariya Ispanya û ya Fransayê ya li dijî ETA'yê payê dikin. %63 dixwestin dewleta Îspanî bi ETA'yê re rûne û vê pirsgirêkê careser bike. Evan lêkolînên cûda di salên cûda cûda de pêk hatine û min tenê yên balkêş raxistiye ber çavên xwendevanan.

Helwesta Baskiyan di helbijartina sala 1979'an de eşkere bû. Partiyên neteweperest dengên xwe ji %34 derxistin %51'ê. PNV di nava partiyên neteweyî de piraniya dengan werdigirt. Herri Batasuna weke cara yekem diket dengdanê %15 wergirt. Bi vî awayî kandîdatê parlementoya Baskiyan ya sala 1980'ê yî dihatine hilbijartin. Lê partiyeke bi serê xwe piraniya dengan wernegirt.

PNV piştî hilbijartinê ne weke nêrînên xwe yên berê tevdiliviya û ne jî bi dewleta Ispanî ve li hev dikir. Kêmbûna dengwergirtinê û alîkariya Baskiyan ya ji bo ETA'yê bandoreke mezin li ser partiyê dikir. Bikaranîna şîdeta ETA'yê û hebûna Partiya Batasuna ku herdû partî jî weke du partiyên radîkal ku bi dijberiya dewletê û ya PNV ve dihatine xuyakirin bandoreke mezin li der û dora partiya neteweyî PNV dikir. Vê bêhelwestî û bêîstîqrariya **PNV di navbera salên 1981-1985'an de jî berdewam kir. Welewkî piraniya gelê Baskî li dijî helwesta ETA'yê radiwestiyan jî dîsa PNV raste rast û ji raya giştî re helwesta xwe li**

**dijî ETA'yê eşkere nedikir. ETA'yê weke partiyeke terorist tawanbar nedikir. Hukumeta ku PNV serî dikişand ya Baskî daîmî helwesta dewleta Ispanî ya şerê dijî ETA'yê tawanbar dikir. Hukumeta PNV'ê hevkariya li dijî ETA'yê bi dewleta Îspanî re par ve nedikir.**

Di vê demê de nêrînên Baskiyan yên li ser şîdetê yên neyênî zêde dibûn. Di sala 1987'an de %80'yî êdî bikaranîna şîdetê rast nedidîtin û piraniya wan li dijî helwesta şîdetê radiwestiyan. Lê dîsa jî ji 4'an yek ETA'yê weke tevgereke welatperwer didîtin. Di vê demê de bêhelwestiya PNV bandoreke mezin li ser gel dihişt û loma jî %34'an bêhelwest diman. Lê beşeke mezin ji Baskiyan hê jî dixwestin Ispanî bi ETA'yê re rûnên û vê pirsê careser bikin. %63 dixwestin di vê rûniştinê de pirsa serxwebûnê bibe pirsa sereke.

## ETA û helwesta wê

Di dema hilbijartinên ji bo endamên parlementoya Baskiyan de, di dema devjeniya li ser xweseriya herêmî de, dihate berdewam kirin, di dema Îspanya ji dîktatoriyê derbasî demokrasiyê dibû, di dema ku dewleta Îspanî bi ramanên erênî li pirsa aboriya welatê Baskiyan dinêrî, ETA'yê şîdeta xwe bi berdewamî zêde dikir û mercên xwe dikir pirsa sereke. Di vê demê de dîsa helwesta dewleta Îspanî ya awayên û metodên li dijî ETA'yê, îşkenceyên polis yên li ser endamên ETA'yê û bihêzbûna hêzên nijadperest û faşîst yên Îspanî dihatine tawanbarkirin. Şîdeta ETA'yê prosesa derbasbûna demokrasiyê dixist xeterê. Loma jî prosesa avakirin û bicîhkirina demokrasiyê li Baskiyan biderengî diket. Di dema diktatoriya Franko de ETA'yê gelê Baskî li dijî rejîmê seferber dikir û serî netewandina Baskiyan ji raya giştî re eşkere dikir. Di gel bidestxistina demokrasiyê û mafê otonomiyê li Baskiyan jî dîsa ETA'yê şerê xwe yê ji bo serxwebûna Baskê, bi şîdet û metodên terorî berdewam dikir. ETA'yê, bikaranîna şîdetê ve dixwest helwesta şeş (6) hêzên welêt biguhere. ETA'yê dixwest helwesta Dewlet, hukumet, leşker û partiyên Îspanî û herwiha helwesta hêz û partiyên Baskiyan biguhere. Bi vê şîdetê ETA'yê bandoreke mezin li ser hevalbend û militanên ETA'yê dihişt. Li ser raya giştî bandoreke mezin dihişt. Di navbeyna salên 1981-1985'an de, dema PNV serweriya hukumet û hêza dewleta Baskiyan (xweseriya herêmî) dikir, şîdeta ETA'yê kêm

bû. Lê dîsa jî terora ETA'yê bandoreke neyênî li ser tevger û hêzên netweyî yê Baskiyan dikir.

## Helwesta dewleta Îspanî

Ji dikatoriyê berbi derbasbûyina demokrasiyê ve guherandineke strukturî ya berbiçav di nava dewleta Ispanî de peyda dibû. Di navbera salên 1975-1981'ê de guherandinên mezin li Ispanyayê pêk hatin. Di sala 1976'an de yasaya avakirina partiyên cûda hate wergirtin. Di sala 1976'an de makzagona nuh hate amadekirin û dû re jî hate qebulkirin. Di makzagonê de pir bi eşkereyî û zelal civata Ispanî weke civateke pirçandî, pirzimanî û pirneteweyî tê bi nav kirin. Bi vê makzagonê ve rewşa navendîbûyina dewletê jî dihate eşkere kirin. Bi vê makzagonê ve dewleta navendî dibû dewleta desentralîzekirî, ango avakirina herêmên otonom dihate sererastkirin. Di makzagonê de bi zelalî mafê otonomiyê ya Baskiyan ci digirt. Di sala 1979'an de hêzên neteweyî û gelêrî yên Baskî otonomiya xwe avakirin û mafên xwe yên neteweyî bidest xistin. Otonomiya Baskiyan di sala 1980'yî de beşdarî dengdanê bû. Di vê demê de bikaranîna şîdeta ETA'yê û bê biryarî û nezelaliya helwesta PNV'ê, bandoreke berbiçav li ser dewleta Îspanî kir ku serweriya hêzên neteweperest yên Baskiyan qebûl bike. Hukumeta Îspanî ji wendakirina derfeta avakirina prosesa demokrasiyê ditirsiya û loma jî bi hêzên neteweperestên Baskiyan re li hev dikir. Hukumeta sosyalist ya Îspanî ya wê demê, li dijî ETA'yê helwest digirt û loma jî bandora xwe li ser berfirehbûna ETA'yê bi neyênî dikir. Her wiha opersyonên mezin li dijî ETA'yê amade kirin û bi dewleta Fransayê re di tekoşîna li dijî ETA'yê de li hev kirin û gelek endamên ETA'yê hatine girtin. Piştî vê helwesta dewleta Îspanî ya li dijî ETA'yê, dewlet û hukumeta sosyalist ya Îspanî bi hêza polisên Baskiyan ve hevkariyek amade kirin da ku li dijî hêzên terorîst rawestin. Heta sala 1980'yî hukumeta Îspanî runiştina bi ETA'yê re qebûl nedikir.

## Partiyên siyasî

ETA jî dinav de gelek partiyên Baskî di nava tevgera neteweyî de aloziyeke siyasî û şolî peyda kirin. Di vê aloziyê de rola PNV mezin bû. Welewkî PNV di dengdana salên 1977 û 79'an de piraniya dengan

negirtibûn jî, dixwest di vê tevliheviyê de weke temsîliya Baskan li ser mafê otonomiyê û makzagonê bi hukumeta Îspanî re peymanan amade bikin. Di vê prosesê de PNV weke tehdît parlemetoya Ispanî terikand û gelek parlementerên Baskiyan li dijî hukumetê û helwesta wê ya li ser makzagon û otonomiya baskê protesto kirin. Di dengdana makzagonê de %45,5 Baskî û %67,7 Îspanî beşdarî dengdanê bûn. Ji vana %31,3 Baskiyan û % 59,4 jî Îspaniyan makzagon erê kirin. % 23,8 jî dijî makzagonê dengdan. Piştî dengdana makzagonê di sala 1984'an de dengdana dezgehên herêmî pêk hat û di vê dengdanê de PNV %4 zêde deng wergirt. Lê nakokiyên navbeyna hêzên Baskiyan hê jî berdewam dikir. Di dengdana parlemena Baskî de PNV û PSOE soz didan gel ku ew bêne ser hukum ewê yasaya nuh û otonomiya Baskî biparêzin û wê otonomiyê bihêztir bikin. Wan partiyan bi hev re makzagona Îspanî diparastin û li dijî bikaranîna terorê û şîdetê radiwestiyan.

Di sala 1985'an de cara yekem hukumeta Baskî li dijî bikaranîna şîdetê derdiket û teror tawanbar dikir. Sedemê bingehî yê vê helwesta hukumeta Baskî ya li dijî ETA'yê, ew bû ku ETA'yê serokê hêza polîsê Baskî kuştibû û li kuştina wî jî xwedî derketibû. Biryareke parlementoya Baskî ya bidizî gihişt ETA'yê ku çekê xwe dayne û metodên şîdetê rawestîne.

Di vê nabêrê de di sala 1986'an de partiyeke nuh li Baskiyan bi navê Eusko Alkartasuna EA hate damezrandin. Piştî damezrandina vê partiyê hêzên neteweyî bêtir ji hev ketin û perçe bûn. Partiyên Baskî bi pirsgirêkên navxweyî mijûl dibûn û xwe li dijî bandora ETA'yê diparastin. Ispanya jî di nava prosesa demokratîzekirina dewletê de tûşî gelek astengan bû. Iro jî piştî 30 saliya demokratîzekirina dewleta Îspanî hê jî ji astengiyên li dijî demokratîzekirina dewletê azad nebûye.

Demokrasî di nava gelên Îspanî de weke prensibên jiyaneke nû tê pejirandin û otonomiya Baskiyan bi vê demokrasiyê ve girêdayî xwe bi xwe idarekirina welatê xwe dike û her ku diçe serweriya xwe ya neteweyî bi hêz dike. Xebata ETA'yê kêm dibe û hêza xwe wenda dike. Iro Baskî ji berê bêtir li dijî şîdetê helwest werdigrin. Him li Ispanyayê û him jî li Baskiyan li dijî terorê xwepêşandanên girseyî pêk tên. **Di prosesa daxwazên berfirehkirina otonomiya Baskê de gelê Baskî**

**bawer dike ku bi metodên demokrasiyê û bi awayên aştiyane dikare bighêje armanca xwe û encamên mezin bidest bixe.** Iro pirsgirêka dewleta serbixwe û otonomiya berfireh, pirsa sînorên Baskiyan, desthilatdariya herêmên Baskiyan û bi tevayî desthilatdariya otonomiya Baskê di rojeva siyaseta Baskiyan û siyaseta dewleta Îspanyayê de cîhekî girîn digire. Lê awa û şêweyên tekoşînê dervî bikaranîna şîdetê di nava raya giştî de hatiye pejirandin. Belkî ya girîng jî ev e. Weke duhî ne Îspanî û ne jî Baskî yan jî neteweyeke din bi devjeniyên pirsgirêka civata pircandî, bi helwestên avakirina dewleta serbixwe ecêb namînin û bi awayekî serdemî devjeniyên xwe berdewam dikin. Lê dîsa jî ev welat jî astengiyên dijber û ji awayên şîdetê ne bêpar e.

Hê di salên 80'yî de dewleta Îspanî xwest bi ETA'yê re rûne. ETA'yê mercên Madrîtê nepejirand. Daxwazên Madrîtê di prosesa bihevreaxaftinê de rawestandina şîdetê bû. ETA'yê digot heta daxwazên wan pêk neyên ew daxwaza rawestandina şer napejirînin. Di sala 1988'an de piştî yekgirtina partiyên siyasî li Baskiyan ya li dijî terorê, ETA'yê rawestandina şer qebûl kir. Di nava 3 mehan de bi Madritê re axaftin berdewam kir û şer hate rawestandin. ETA'yê cara yekem bû ku axaftina bi berpirsên siyasî yê Baskiyan re qebûl dikir. Hemû aliyan vê helwesta ETA'yê bi erênî dipejirandin. Piştî sê mehan Madritê biryara xwe eşkere kir da ku êdî dikarin bi serokên ETA'yê yên penaber re rûnin û biaxivin. Ev jî gaveke erênî dihate pejirandin. Lê ev hêvî berdewam nekir. Piştî demekê herdû aliyan hevdû tawanbar kirin û operasyonên ETA'yê ji nû va dest pê kir. 1993-94'an de operasyonên ETA'yê berdewam dikir û hukumeta Nuh li dijî terorê bi dijwarî radiwestiya. ETA'yê operasyonek li dijî serokê partiya PP Josê Maria Aznar ku hukumet avakiribû pêk anî û şer mezin bû. Şerê ETA'yê tenê ne li dijî leşker û polisan lê herwiha li dijî hêzên sivil jî berdewam dikir. Ev dibû metirsiyeke berbiçav. Li dijî herêmên turîsîtî operasyonên ETA'yê dest pê kir. Awayên nuh yên terorê li Baskiyan dest pê kir û ev jî nexweşiyeke mezin di nava tevgerên Baskî û gelê Baskî de peyda kir.1995-97'an de şîdeta ETA'yê bi girseyî berdewam kir. **Di wê demê de serokên ETA'yê yên girtî li dijî terorê derketin. Li gor baweriya wan rewşa şîdetê bi avakirina demokrasiyê ve hatibû guhertin. Gel li dijî terorê derdiketin û Batasuna ku weke partiya ETA'yê dihate pejirandin dengên kêm werdigirt.**

Îro ETA'yê hêza xwe bi gelemperî wenda kiriye. Batasuna ku partiya ETA'yê ya legal e hatiye qedexekirin. Him Baskî û him jî Ispanî li dijî awayên şîdetê radiwestin û metodên demokratîk yên şêweyên aştiyane derdikevin pêş û di tekoşîna mafê berfirehiya Baskiyan de roleke sereke werdigrin.

### Welat û nûfusa Baskiyan

**Baskiyan: Xak:** 20.439 $km^2$

**Herêmên Baskiyan:**

Vizcaya, li Ispanya, 2217 $km^2$
Guipúzcoa, li Ispanya, 1997 $km^2$
Alava, li Ispanya, 3047 $km^2$
Navarra, li Ispanya, 10.421 $km^2$
Labourd, li Fransayê, 741 $km^2$
Basse-Navarre, li Fransayê, 1263 $km^2$
Soule, li Fransayê, 753 $km^2$

**Nifus:** 2,9 miljon nifusa Baskiyan e ku ev nifus %7.5 ji nifusa Îspanyayê ye.

### Makzagona Îspanyayê û ya Baskiyan

Makzagona Îspanyayê dewleta Îspanî dabeşî 17 otonoman û 50 î herêman dike ku bi xwe ji 8000 şaredariyan pêk tên. Erk û watiniyên Otonomiyan û yên herêman di parlementoya Îspanyayê de bi zelalî xuya dike. Parlemento ji du kamaran pêk tê. Kongre û Senato ye. Sanato ji 208 mandatan û ji 49 kanditatên taybet ve pêk tê û ji aliyê parlementoyê ve têne helbijartin. Wekîlên li Kongreyê cîh digrin ji aliyê gel ve têne hilbijartin û 350 kes in.

Euskadî–Baskiyan dervî hêza leşker, gumrukê û siyaseta derve xwedî hukumet û xwedî parlementoyê ye. Baskiyan bi hukumet û parlementoya xwe dervî erkên li jorê hatine binavkirin hemû aliyên jiyanê de xwedî biryar e. Otonomiya ji baskê ji sala 1978'an ve bi yasaya makzagona Îspanyayê hatiye ewlekirin. Bi yasaya makzagonê Bask bi du welatên din ve Katalonî û Galicia weke sê neteweyên dîrokî têne binavkirin. Otonomiya Baskê idareya walatê xwe bi xwe dike.

Serweriya xwe ji makzagona ya bi navê **Estatuto de Guernica** ku ji aliyê netewa Baskî ve di 25/10-1979'an de bi dengdana tevayî hatiye qebûlkirin, werdigre.

Baskiyan weke otonom serokê wê heye ku bi navê presidend tê nasîn. Derveyî parlementoyê û hukumetê mahkemeya bilind jî heye. Hukumet û otonomiya Baskê bi serê xwe serweriya perwerdeyê, sistema pizişkiyê, sîstema çandê û ya bacê dike. Hêza polis ya taybetî ya Baskê heye. Li Baskiyan du ziman têne axaftin. Euskara (Baskî) û Îspanî. Zimanê Baskî zimanekî indo Ewropî ye û zimanekî fermiye.

**Basta ya! – êdî bes e!** gotina wan ya sereke ye.

ETA, Iro bi berdewamiya ramanên serxwebûna welat wiha dibêje: **Heta dujminên me li ser tunekirin û zilma li ser Baskiyan bi biryarbin wê şerê me yê çekdarî jî li dijî vê helwestê berdewam bike.**

Li ser pirsgirêka Baskiyan bi sedan lêkolîn hatine kirin. Bi sedan nivîs hatine nivîsîn. Her nivîsek li gor berjewendiyê hinekan hatine nivîsîn. Lê kesekî weke nivîskarên Tirk yên nijadperest ev pirsgirêk bi alozî şîrove nekirine. Yek ji wana jî nîjadperestê nivîskarê rojnameya Hurriyetê Özdemîr İnce ye. Wiha dinivîsîne:

**"Di makzagona Îspanyayayê de çiqas mafê çand, ziman û yên mirovan jî hatibe îfade kirin, lê di dawiyê de bêje û têgeha netewe û gelê îspanyolî hatiye bikar anînîn. Kurdçiyên weke DTP û Bostîl demokratên me yên bêje û têgeha Tirk, netewa Tirk, gelê Tirk ya di makzagona sala 1982'an de cîh girtiye weke Neteweperestî û faşîstmeşrebî bi nav dikin, ji me re makzagona îspaniya yê ya sala 1978'an weke Lîberal û demokrat pêşkêş dikin. Wexta vêya dikin dîsa derewan dikin. Îspata wê jî destpêka makzagona îspanyayê ye. Êdî li me derewa nekin."**

Ezê ji çend nivîsên din minakan bidim. Yek ji wan minaka pisporekî li ser îspaniyayê û dîplomatê dewleta Tirk yê îspanyayê yê kevn Akin Özcer[132] Wiha dinivîsîne "Katalanî, Baskî û Galîçî xwe weke netewe bi nav dikin. Lê Madrîtê ev statu ji bo wan qebûl nekir. Dawiyê çareseriyeke hevbeş hate dîtin. Îro makzagona îspanyayê di maddeya 2'yem de, îspanyayê ji herêm û mîlliyeta pêkhatî qebûl dike. Maddeya

132 Akın Özçer 26/02-2010 NTVSNBC

3'yem jî, ji bilî Ispanî mafê statuya fermî dide zimanê cûda. Maddeya 4'em jî, ji bilî alaya Ispanî mafê alayên cûda jî dide gel...Gava em pirsa makzagona îspanyayê tînin zimên em dizanin ev ji bo Tirkiyê zahmet e. Ji bo ku Tirkiye bikaribe sîstemeke wiha bimeşîne ji çand û dîroka demokrasiyê bêpar e...Afirandina bi Makzagona sala 1978'an ya "Dewleta otonomi"ya ( Estado Autonomica)", îro dewleta federal ya bi federalî nayê binavkirin e. Ev dewleta federe asîmetrîka xwezayî e... Weke minaka statuya Katalînî ya, Baskî jî weke wan di destpêka şîrovekirina statuya xwe de wê karibin xwe weke netewe binav bikin. Lê makzagona îspanî wê wan hînê jî weke "Mîlliyet" binav bike. Mîlliyet li vir weke kêmnetewe tê binav kirin."

Li vir du pirsên balkêş dertê rojevê. Yek ji wana, kî derewan dike dertê holê. Lewra muqayesekirina bêjeya Tirk, netewa Tirk di makzagona sala1982'an de û bêjeya îspanyolî di makzagona îspanyayê de tenê dikare karê nîjadperestên Tirkan be. Kesekî din nikarin vê cesaretê bi xwe re bibînin. Bi vê ez naxwazim bêjim makzagona îspanyolî bê kêmasiye. Lewra Makzagona sala 1978'an bi konsensusa aliyan ve hatiye amade kirin û gelek kêmasiyan di nava xwe de dipêçe. Loma jî heta îro devjeniyên pirsa vê makzagonê berdewam dikin. Ya duyem; Makzagona Tirk, ne netewa û ne jî kêmnetewa, ji bilî Tirkan tu kesan qebûl nake û hemû kesî weke Tirk binav dike. Ya îspanî çewt be jî dîsa kêmnetewa qebul dike. Ala wan, zimanê wan, çanda wan qebûl dike û wan bi navê welatê wan bi nav dike. Netweyên têne bi navkirin di şîrovekirina statuya xwe de xwe weke netewe binav dikin. Ev jî cûdahiyeke mezin e. Ji bo makzagona Tirk bighêje vê asta makzagona îspanyayê, ji Özdemîr Înce re çend tenûr nan divê.[133]

Minaka 2 Yem; Minaka.[134] Vê gotinê ji devê serokê îspanyayê digre; "Min gelek bêje û nokteyên balkêş ji bo devjeniya rojeva li ser makzagona (Tirk) girt. Weke mînak, serok wiha digot; "îspanya di sala 1978'an de makzagoneke demokratîk afirand ku dawiyê di pêkanîna reformên demokratîk de zahmetî nekişand. Makzagonê ji xwe bingeha hemû reformên demokratîk amade kiribû. "De were di eynê serdemê

133 Hürriyet 09/10-2009

134 Radikal, Erdal Güven, 04/04-2010

de, di eynê dinyayê de, lê li welatên cûda makzagonê li qelem hatine danîn nefikire. Mînak makzagona me ya sala 1982'an ye. Ev 30 sal in tiştê aniye serê Tirkiyê û yên wê bîne sere Tirkiye yê". Îro tenê karê nîjadperestên Tirk ya parastina Makzagona nîjadperest ya Tirk maye. Bi hêviya bêkar mayina wan em mijara xwe berdewam bikin.

### Rewşa Îspanyayê ya îro

Dîroknasê Baskî rewşa struktura otonomiya Baskê ya îro wiha şîrove dike: Îspanya dewleteke ji 7 (heft) otonomiya pêk hatiye.

Ji wana 4 otonomî yên neteweyên cuda ne. Evana Baskî, Katalonî, Galîçî û Navara'yî ne. Otonomiyên netewa ji her sê otonomiyê din cudatir in. Neteweyên xwedî otonomî ne, li ser herêmên xwe desthilatdarin. Hukûmetên wan, meclîsên wan, dadgehên wan heta dadgeha bilind û hêza wan ya polis (asyişê) heye. Hêza wan ya polis mezin e. Beşek ji baca herêmê di destê desthilatdariya otonomiya herêman de ye. Perwerde, pizişk, aboriya herêmê, dadwerî, çandî, turîzm, xwezayî, pirsa derdorê, pirsên rê, spor û wekî din di bin desthilatdariya otonomiya herêman de ye. Di derbarê pirsên girîng deotonomiyên netewa desthilatdarin. Ala otonomiyên netewan heye[135]

Otonomiyên netewayên Îspanya ne weke dewletên serbixwe ne. Lê desthilatdariya wan bi hêz e û li ser xaka xwe desthilatdar in. Otonomiyên netewa yên xwedî zimanên cuda ne, perwerdeya xwe bi zimanê xwe dikin. Zimanê wan zimanê fermî yê herêmê ye. Li van herêmana perwerde bi modelên cuda û bi gelek alternatîfan pêk tê. Lê piranî bi du zimanan perwerde pêk tê û tu pirsgirêkên mezin peyda nake. Sîstema du zimanî li Îspanyayê bi berfirehî heye û bi serkeftî tê şîrovekirin. Navara weke herêmeke Baskan ya duyem e. Li vê herêmê serjimara Baskanxêvan ne zêde ye. Asîmîlasyon li vê herêmê pir xurt bû. % 10-12 Baskî dizanin. Weke etnîkî ev herêm Baskî ye lê weke herêmên Kurdistanê soranî û Kurmancî yan jî zazakî û Kurmancî ji hev cuda ye. Lê li Navarayê sê sîstemên fêrbûna ziman û ya perwerdeyê heye. Her mirovek di helbijartina xwe de azad e.

---

135 Xavier Aragall, Hîndekarê Zanîngeha Derya Spî ya İspanya. Rapora Şaxa Bel-Sena Diyarbekirê.

Li Katalonya û li Galîçya zimanê herêmî bi hêz e û perwerde bi zimnê herêmî pêk tê. Îspanyolî jî heye û weke zimanê duyem di perwerdê de bikar tê.

Gelek nivîskar û dîroknasên Tirk, rastiya Îspanyayê bi çewtî şîrove dikin û rastiya wan ji ber çavê civatê bi dûr dixin. Zimanê dewletê yê fermî rast e Îspanî ye. Lê herêmên otonom jî xwedî zimanê fermî ne. Perwerdeya xwe bi zimanê xwe dikin. Li van herêmana hêza polîs(asayiş), hêza pizişkî û hêza perwerdeyê ji neteweyên van herêman pêk tên. Yekî Baskî yan jî Katalonî nizanibe di nava van hêzan de nikare kar bike. Ev bi xwe desthilatdariya van herêma bi zelalî xuya dike.

Nimûneya Îspanyayê girîng e. Bi awayên cuda tê îzah kirin. Hinek vê strukturê weke nîv-federasyon bi lêv dikin. Hinek weke federasyon û hiek jî weke struktura Brîtanya Mezin weke devolusyon bi nav dikin. Lê ji vana kîjan dibe bila bibin ne girîng e. Ya girîng selahiyeta desthilatdariya herêmê ye. Otonomiya Katalonya weke dewleteke serbixwetev dilive. Pêwendiyên xwe yên navneteweyî weke struktura konfederasyonê bikar tîne. Makzagona Îspanyayê, mafê neteweyên cuda bi yasayî tîne zimên û mafê wan bi yasayî ewle kiriye. Loma jî pir bi asanî mirov dikare bêje Îspanya dewleteke demokratîk, pirçandî û pirneteweyî ye. Makzagona Îspanyayê, bi ewleyiya mafê mirovan û mafê netewa û kêmnetwan ve demokrasî li Îspanyayê bicîh kiriye û êdî tu hêz nikare vê strukturê ji holê rake. Lê her roj ev struktur di berjewendiyên hemû netewe û kêmneteweyên Îspanyayê de bi başî pêş ve diçe.

### Catalunya (Katalonya)

Katalonya, navçeyek ji (17) hivde herêmên otonom yên Îspanyayê ye. Katalonya ji 4 herêman pêk hatiye Lleida, Tarragona, Girona û Barcelona. Barcelona weke paytexta wê ye.

Cudahiya mezin ya navbeyna Katalonya û Baskan bi pirsa burjuwaziyê netewî ve dertê rojevê. Li Katalonyayê burjuwaziyê netewî him zimanê Katalonî parastiye û him jî xwestiye li ser herêma xwe desthilatdar be. Lê vê hêza burjuwaziyê netewî yê Baskan tunebûye. Loma jî Katalonya herêma herî dewlemend ya Îspanyayê ye. Zimanê Katalonî li herêma Katalonyayê pir xurt e. Katalonî weke Baskan ne-

hatine asîmîlekirin. Struktura Katalonya bi destê burjuwaziyê Katalonî ve form girtiye û bi hêz bûye." Burjuwaziyê Katalonî ne xwestiye ji burjuwaziyê Îspanî cuda bibe."[136]

Lê bazara xwe radestî burjuwaziyê Îspanî jî nekiriye. Dev ji zimanê xwe bernedaye. Nasnameya netewayetiya xwe parastiye û ji bo vê nasnameyê jî têkoşiya ye. Herêma Katalonya ne weke herêma Baskan bindestî kişandiye. Katolonya her demê bi strukturekê xwe îdare kiriye. Dem bi dem struktura wan hatiye rûxandin lê carekî din ava kirine. Ji sala 1932'an u hetanî îro bi awayên cuda serweriya herêmê di destê Kataloniya de bûye. Darbeya mezin di dema Franko de li Katalonya ketiye lê heta 1975'an di bin dîktatoriya Franko de ji mafê xwe yê neteweyî bêpar maye. Dema Franko li Îspanyayê dema avakirina dewleta modern ya netewe-dewlete. Dema înkara çandên cuda ye. Katalonî weke neteweyên din di vê dema Franko de bi bobelata qedexebûna ziman û çanda xwe ve rû be rû mane. Piştî Franko li hemû Katalonya du milyon mirov dijiyan. Zimanê Katalonî li ber mirinê bû. Lê Kataloniyan zimanê xwe bernedan. Bi zimanê xwe axivîn û bi çanda xwe ve serbilind bûn. Îro Katalonya herêmeke dewlemend û xwedî ziman û xwedî çandeke dîrokî ye. Îro Katalonî, xwedî hukumet, meclîs, dadgeh, polîs, unîversîte û xwedî desthilatdariya siyasî, aborî û perwerdeyî ye. Îro nûfusa Katalonya zêdeyî 8 milyonan e.

## Çend gotin li ser dîroka Katalîniya

Berî zayinê 500 salî Gîrona yek ji herêma Katalonya yê ye ku ketibû bin destê Împaratoriya Romayê. Serweriya Romayê li Katalonyayê hetanî piştî zayinê 475'an berdewam kiriye. Ji vê demê û pêve Katalonya dikeve bin serweriya Gotiya. Dagirkeriya Gotiyan hetanî sedsala 718 berdewam kiriye, heta ku hêzên islamî vê derê xistine bin destên xwe. Dûre Serweriya islamê li vê derê heta sedsala 801'ê berdewam kiriye. Piştre Melikê mezin Karl yê mezin bi navê Marca Hispanica hemû kraliyetên xwe bi hev re girêdaye û Katalonya jî di nava vê yekîtiyê de cîh girtiye.

---

136 Berhema navborî.

Dibin serweriya Kralê Hispanica de welat hate payêkirin û cara yekem bi vê payêkirinê herêma bi navê **Catalaunia** derket holê. Bi texmîna dîroknasan ev nava ji Gotiya maye ku weke Gotholania hatiye binavkirin. Li vê herêmê kralê bi navê Ludvig ku bi xwe Frankî bûye li vêderê bûye serwer. Azadiya Katalonya di destpêka sala 985'an de dest pê kiriye. Piştî vê demê Katalonya weke dewleteke serbixwe ya feodalî heta sala 1137'an jiyana xwe berdewam kiriye. Di vê tarîxê de bi berfirehiya xaka xwe Katalonya nav guhert û weke Mîrekiya Aragon serweriya xwe li vê derê berdewam kir heta 1150'yî. Mîrekê wê jî Patronila Aragon bû. Mîrekiya Aragonê her ku çû berfireh bû, lê di sala 1400"î de Ferdînand yê katolîk vê herêmê beşdarî tevayiya Ispanyayê kir. Lê Mîrekiya Aragon otonomiya xwe berdewam kir hetanî Kralê Ispanî Filipê V ' an. di 1714'an de otonomiya Aragonê ji holê rakir. Di navbeyna Kataloniya û Kralên Ispanî de ji sala 1640'an heta 1652'an wî şerî berdewam kiriye. Fransayê di vî şerî de alîkariya Kataloniya dikir. Di sala 1640'an de bi alîkariya Fransayê Kataloniya cumhuriyeta xwe damezrand. Di sala 1648'an de Fransa hêza xwe ji Katalonya kişand û welat kete bin destê karal Filip yê VI'an.

**Katalonyaya serdemî**

Kataloniya welatekî biçûk e lê dewlemend e. Bi Zimanê xwe û bi çanda xwe yek ji wan 17 herêmên otonom e û bi wan 16 herêman ve Dewleta îspanî pêk tînin. Kataloniya di nava dewleta îspanîde cîh digire lê bi otonomiyek berfireh weke dewleteke serbixwe tevdigere. Katalonî Katalonya weke welatekî ji îspanya cûda dibînin. Bi ziman û bi çanda xwe serbilind in. Zimanê Katalonî ji şaxê Latînî ye û ji Ispanî bêtir nêzî Ingilîzi û Elmanî ye. Hemû Katalonî weke duzimanî binav dibin. Li Katalonya Ispanî pir tê axaftin. Lewra turist ji Katalonî bêtir bi Ingilîzi û Ispanî diaxivin û ev ji bandoreke mezin li ser zimanê Kataloni dike. Katalonî li Katalonya zimanê fermî ye. Nêviyê Kataloniya naxwazin bi zimanekî din weke Ispanî biaxivin. Ew her bi Kataloni diaxivin û ev jî gelek carî nakokiyan di nava wan û Îspaniyan de derdixîne.

Li Katalonya digel zimanê Îspanî zimanê Katalonî weke zimanê fermî yê perwerdeyê tê bikaranînîn. Lêkolîna ku hatiye kirin rê dide

ku pirsgireka fermîkirina zimanê Katalonî tu nakokî û dijberî di nava civatê de neafirandiye. Şagirt bi zimanê xwe û bi Îspanî jî perwerdeyê dikin. Gel bi herdû zimanan jî diaxivin. Piraniya gel li Katalonyayê bi zimanê xwe yê zikmakî diaxivin û perwerde dibin. Ispanî jî di nava gel de bi gelemperî tê axaftin û di perwerdeyê de tê bikaranîn. Bi tu awayî ne ecêb e ku Katalanî li Barselonayê bi zimanê xwe perwerde dibin weke îspanî li Madridê bi Îspanî perwerde dibin. Ji bo dewleta Tirk û dîroknasên Tirk gelek ecêb e ku Kurd bi zimanê xwe perwerde bibin. Lê ne ecêbe ku Tirk bi zimanê xwe perwerde dibin.

Katalonya weke otonom serweriya perwerdeyê, sîstema pizişkiyê, perwerdeya dibistanên bilind û unîversîteyê her wiha alîkariya civakî, weşana kanalên TV û radyo yê dike. Meclis û hukumeta xwe heye û weke welatekî serbixwe tevdigere.

Îro dengên ji bakurê Kurdistanê derdikevin û Katalonya weke mînak nîşan didin gaveke erêniye û divê Kurd ji mafê xwe yê neteweyî, ji vê minakê kêmtir qebûl nekin.

**Piştî pêvajoya yekem ya paradîgmaya pêla 3'yem ku min bi gelek mînakan şîrove kiriye, dixwazim nuha jî dest bi pêvajoya duyem ya paradîgmaya pêla 3'yem bikim. Weke tê zanîn pêvajoya yekem avakirina dewletên pirçandî ye. Mînakên vê pêvajoyê gelekin. Min li jorê anîne zimên. Fermo bi hevre em pêvajoya duyem şîrove bikin.**

# V
# PÊVAJOYA DUYEM YA PARADÎGMAYA PÊLA 3'YEM

Min li jorê pêvajoya 1'em ya pêla paradîgmaya pêla 3'yem anîbû zimên. Li vê derê jî ezê çend gotinan li ser pêvajoya duyem bêjim. Çavkaniyên pêvajoya duyem ji salên 90'î ve dest pê dike û heta îro jî berdewame. Ev pêvajo bi rûxandina şîstema sosyalîst ve weke çareseriyên pirsgirêka netewayetî li welatên sosyalîst yên kevn de derkt û bû mijara devjenî û destêwerdana hêzên navneteweyî. Vê pirsgirêkê di rojeva cîhanê de ciyekî girîng girt û bi destêwerdana hêzên navneteweyî jî weke pêvajoyeke nû dest pê kir. Di vê pêvajoyê de pirsa sereke ya derdikeve pêş û çareseriyên wê, weke avakirina dewletên serbixwe ye. Bêgûman berî vê pêvajoyê jî tekoşîna ji bo avakirina dewleta serbixwe hebû. Lê vê pêvajoya nû di dema gilobalîzekirina dinyayê de bi hinek teybetmendiyên xwe ve weke pêvajoyeke nû ya navneteweyî dest pê kir. Ezê li jêrê taybetmendiyên vê pêvajoyê bînim zimên.

Piştî rûxandina sîstema sosyalist, bi helwesta neteweyên Yekitiya Sovyetê û yên Yugoslavyayê ve proseseke taze dest pê kir. Ev proses ji aliyê NY (Neteweyên Yekbûyî) ve jî hate pejirandin. Serkêşên vê prosesê yek ji hêzên navneteweyî NATO bû. Vê helwesta NATO yê û ya NY, ji aliyê Yekîtiya Ewropayê (YE) ve jî bi erênî dihate bilêv kirin. Hêzên mezin yê navneteweyî li ser vê prosesê konsensuseke navneteweyî pêk anîn. Evê prosesê di dema globalîzekirina dinyayê de, di dema nasnameya navneteweyî derdiket pêş, di dema nasnameya neteweyî ciyê xwe radestî post identity dikir, rastiyeke din radixist ber çavên raya giştî. Bi vê pêvajoyê ve zîndîbûna nasnameya netewayetî

derdiket holê û rojeva siyaseta qada cîhanî dagir dikir. Bi vê prêsesê ve careke din pirsa çarenivîsa neteweyan di qada rewşenbîrî de ciyê xwe digirt û ev mijar dibû qada devjeniya cîhanê. Di vê pêvajoyê de pirsa çarenivîsa netewa di çerçoweya mafê avakirina dewleta serbixwe de dihate dîtin. Li Yogoslawya yê neteweyên bindest bi alîkarî û destêwerdana hêzên navneteweyî ve dewletên xwe yên serbixwe lê yên pirçandî ava kirin.

Em vê pirsgirêkê bi tarifkirina pêvajoya derketina netewe û neteweperestiyê berdewam bikin. Bingeha neteweperestiyê li ser bidestxistina mafê carenivisê hatiye avakirin. Ew bi xwe wek tradisyonî tê maneya ku mafê her neteweyekê heye ku dewleta xwe ya serbixwe ava bike. Gava ku em ji 200 salan û virde derbasbûn û jiyana mirovayetiyê şîrove dikin, dibînin ku ev maf him li Ewrupayê û him ji li gelek ciyê dinyayê bûye kaniya bûyerên mezin û giranbiha.

Lê îro devjeniyeke nû di qada cîhanê de li ser vê mijarê dest pê kiriye. Bingeha vê devjeniyê, bandora globalîzmê ya li ser netewayetiyê û avakirina dewleta serbixwe ye. Bêtirîn lêkolin û devjeniyên têne kirin rê didin ku giringiya avakirina dewleta serbixwe ne weke berê bihêz e. Lê belê gava ku em li rastiya jiyana vê mijarê dinêrin berevajî van lêkolinana ji şerê cîhanê yê yekem û duyem ve heta îro, avakirina dewletên serbixwe zêde bûne u kêm nebûne. Wek minak, di sala 1945'an de 51 dewletên serbixwe hebûn. Lê îro 196 dewletên serbixwe hene û di demek nêzîk de dikare bighêje 200 i. Xuyaye ev lêkolînên hatine kirin jî rastiya vê pirsê dernaxin holê.

Ji aliyekî din ve jî di sala 1900'î û vir de heta îro rûdan û bûyerên netewayetî û berfirehiya tekoşîna neteweyî ya ji bo avakirina dewleta serbixwe ya netewî kêm nebûye. Lê berevajî vê berfireh bûye û ev prosesa hê jî berdewam e. Berfirehiya bûyerên neteweyî "Yekîtiya Netewa" (NY,) ji bo aramî û ewlekariya navneteweyi mecbûr kiriye ku hinek tedbiran wergire. **Dezgehên navneteweyî wek NY, YE, Nato û gelekî din, ji dêvla avakirina dewleta serbixwe, dewletên hene û pirnetewe ne lê wek dewletên yeknetewe tevdilivin, ango netewe-dewletê, bi hunandinek û bi vejandineke nû û bi şêweyên demokrasiyê reng û dengê wan biguhere û dixwazin wana bikin dewletên demok-**

**ratik yên kozmopolit. Di serdema me de vê helwesta van hêzên navneteweyî bi eşkereyî dertê pêş û dibe çareseriya sereke.**

Di çerçoweya vê çareseriyê de pirsgirêka çarenivisê jî tê ronî kirin. Çareserî jî wek herêmên otonom, wek otonomiya çandî, wek sistema federativ û konfederatif (ku ew bi xwe ji pirrengî ye) tê dîtin. Ev nêrin û helwest, ji aliyê gelek dezgehên navneteweyî ve jî tê parastin. Loma jî gelek kes û dezgehên navneteweyî û neteweyî ji vê pêvajoyê û ji vê prosesê sedem û encama derdixin û dibêjin globalizm êdî ramanên avakirina dewleta serbixwe ji holê rakiriye yan jî gelekî lawaz kiri ye.

Nivîskar û siyasetmedarên Tirk vê pirsê li dijî civata pirçandî jî bikar tînin. Divê em vê pirsê jî zelal bikin. Nêrînên dezgehên neteweyî û navneteweyî rastiyekê tînin zimên. Rast e avakirina civatên pirçandî roleke sereke dileyize, lê ev rastî li her derê dinyayê bi cîh nebû û wê nikaribe li hemû dinyayê jî bi cîh bibe. Li gelek cîhên dinyayê weke mînak li Yugoslawyayê ev pêşniyara avakirina civata pirçandî cîh negirtiye û dewletên serbixwe hatine avakirin. Ev rastiyeke din rê me dide. Mixabin berevajî van ramanan, avakirina dewletên serbixe bêtir derketiye pêş û li gelek cîhên dinyayê bûye çareseriya sereke.

Sedemên ku ev raman li hin derên dinyayê bi ser neketiye gelek in. Lê bi ya min ya bingehîn ne sedema ramana pirçandiyê ye. Sedema esasî dewletên xwe pirçandî didîtin ne li ser bingeha wekheviyê hatibûn hûnandin. Dewlet li van welatana bêtir bi ser neteweyekê ve dihate vejandin û berjewendiyên neteweyekê derdikete pêş. Weke mînak, Çekoslovakya, Sovyet û Yugoslavya. Loma jî bi rûxandina sîstema sosyalîst ve van welatana ji hev ketin û bi dehan dewletên serbixwe hatine avakirin. Di vê pêvajoyê de berevajî van nêrînan em dibînin civatên pirçandî, (bi devkî be jî) xwe bi dewletên serbixwe ve bi dawî tînin. Li vê derê divê em pirseke din dîsa zelal bikin. Cîh guherîna yan jî rûxandina van civatên û dewletên pirçandî, çewtiya avakirina civatên pirçandî dernaxe holê. Berevajî vê rastiya naveroka civata pirçandî bi hêztir dike. Ango van dewletên ji hev ketine, heger bi naveroka xwe bi rastî civatên pirçandî ava kiribana ji hev nediketin û wê weke mînakên jiyana bi hevre bimana. Lewra mînakên vê pêvajoya civata pirçandî gelek in. Min li jorê van mînakana anîbû

zimên. Nivîskarên Tirk vê mijarê bi çewtî şîrove dikin û dixwazin bêjin avakirina civatên pirçandî çewt e. Lê nêrînên wan weke gelek nêrînan di derbarê vê mijarê de jî çewt in û rastiyê nabêjin û rastiyê vedişêrin. Yek ji nivîskarên nîjadperest ê Tirkan wiha dinivîsîne: Heger pirçandî dewlemendiyek be, ji bo çi Yekîtiya Sovyetê, Yugoslavya, Çekoslavakya ji hev ketin û belav bûn. Yên Osmaniyan ji hev xistin ma ne kêmnetewe bûn" 2 Bersiva vê pirsê di beşa mijara civata pirçandî de hatiye dayîn.[137]

Îro gelek nêrîn û helwest hene ku ji rastiyê dûr in. Li gor wan Nêrînan di dema globalîzmê de ramanên avakirina dewleta serbixwe nemaye.

Di derbarê vê mijarê de tevliheviyek heye. Gelek ji wana netewe-dewletê û tekoşîna ji bo dewleta serbixwe ya neteweya bindest tevî hev dikin û seranser encama jê derdixin. Wek li jor jî min destnîşan kiriye ev nêrîn ji rastiyê dûr e. Yên li dijî van nêrînan radiwestin, dibêjin berevajî bi dawî hatina ramanên avakirina dewleta serbixwe, ev raman dem bi dem zindî û berfireh dibe. Lê li gor ramanên wan jî helwestên avakirina dewleta serbixwene weke berê ye. Ew jî hatiye guhertin û ne wekî berê tê ifadekirin. Li vir rastiyeke girîng destnîşan dibe. Ev rastî çiye? Li vê derê **pêvajoya duyem ya paradîgmaya pêla 3'yem dertê rojevê. Avakirina dewleta serbixwe ne weke netewe-dewlet ya kevnare tê avakirin. Vê dewleta serbixwe ya pêvajoya pêla 3'yem weke dewleteke serbixwe lê dewleteke pirçandî û pirneteweyî tê ava kirin, ango ev dewleta serbixwe pirrengî, pirdengî û gelêrî ye. Awayên avakirina vê dewleta serbixwe dijî avakirina netewe-dewletê ye. Dewleta serbixwe ya pirneteweyî û demokratîk tê avakirin.**

Şêweyên guhertî yek jî evin. Li vê dewletê ji çand û zimanên cûda re rêz tê girtin. Netweyên cûda hebin bi hevre civateke hevbeş bi peymaneke siyasî ya hevbeş ve ava dikin û bi peymaneke siyasî jî jiyana bi hevremayinê dikin qada sereke. Mînakên vê pêvajoyê gelek in. Welatên Ji yogoslavya kevn veqetiyane mînakên berbiçav in. Lê vana hemû

---

137 *Turkiye'nin Etnik Yapısı, Halkımızın Kökenleri ve Gerçekleri*, Ali Teyyar Önder. Fark Yayınları, Çapa Duyem a Berfirehkirî 21, 2007. r-57-58

ne sedemên inkarkirina avakirina dewleta serbixene û ne ji sedemên înkarkirina civata pirçandî ne. Berevajî vê hemû bûyer û pêvajoyên serdemî, netewe-dewletê mecbûr dike ku struktûra xwe biguhere û hunandineke pirçandî pêk bîne. Dewletên xwe li gor pirneteweyî û pirçandiyê neguherînin, wê akûbeta wan wek akubeta Rûsya, Yugoslavya û Iraqê bin. Di serdemiya me de rê ji dewleta yeknetewî û yek çandî re nemaye. Netewe-dewlet bi yekrengiya xwe iflas kirî ye. Loma ev dewletên wiha weke dewletên fundamental û kevneperest ku di pêşiya pêşveçûna demokrasiya navneteweyî de weke asteng têne dîtin. Afganîstan, Iraq, Yugoslavya çend mînakên vê pêvajoyê ne. Loma hemû hewildanên dewletên fundamental weke dewleta Tirk wê bêencam pûç bibe û wê bêencam bi dawî bên.

### Netewayetî û pirsa ava kirina dewleta serbixwe

Dewlet dikare ji gelek neteweyan pêk bê. Mînakên dewletên wiha gelek in. Yekîtiya soweyet ê, Yugoslawya û Çekoslowakya kevn her wiha Belçîka, Swîsre, Kanada, Iraq, Lubnan, Ispanya, Kraliyeta Brîtanya, Emerîka, Hindîstan, û bi dehan dewletên din. Lê her wiha neteweyên bê dewlet jî hene. Weke Kurdan, Flistîniyan, Beluciyan, Baskan, Laponan, Kubekan, Katalonan, û wekî din. Civatek heger, xakekê û çandekê bi hevre weke dîrok payê bikin ji wê civatê re netewe tê gotin. Ziman, ol û yên din jî di nava çanda netewe de têne qebûlkirin. Li vê derê divê em bêjin teoriya Stalînîst ya neteweya ne rast e û tu neteweyî ji bilî bibe dewlet mercên teoriya Stalînîstî pek neanîne. Min li jorê bi kurtî be jî ev mijar anîbû zimên. Heta îro ne sosyalîzmê nejî kapîtalîzmê mercên netewayetiyê bi zanistî şîrove ne kirine. Lê ne tenê şîrove nekirine herwiha ev pirs bi teoriyên xwe ve tev li hev û şolî kirine. Di şîrovekirina herdû aliyan de jî em berjewendiyên wan dibînin. Berjewendiyên netewa di nava berjewendiyên van sîsteman de nebûye qada sereke. Berjewendiyên îdeolojî her gav di pêşiya berjewendiyên netewan de cîh girtiye. Herkesî li gora berjewendiyên xwe ev pirsgirêk anîne zimên û loma jî tevliheviyeke berbiçav peyda kirine.

Min li jorê pirsa neteweyî bi kurtî be jî şîrove kiribû. Lê dixwazim li vê derê bêjim, ger netewe xwedî tevger be ku bêyî tevgerê netewe nikare bibe netewe, wê gavê helwesta sereke ya tevgera netewe di seren-

cama tekoşînê de biryardêr e. Ger **tevgera netewe xwe bi daxwazên serbixweyiyê pêça be û rewşa avakirina civateke pirçandî ji holê rabû be, ango netewa serdest ev mecal ji holê rakiribe, bi kurtî di bingehiya wekheviyê de rewşa bi peymaneke siyasî bi hev re jiyanê nema be avakirna dewleta serbixwe dibe çareseriya sereke. Rewşa bi hev re jiyanê ne netewa bindest lê netewa serdest amade dike. Ger netewa serdest ji berjewendiyên xwe yên şovenî û nîjadperestî paş ve gav navêje û rê li ber peymana siyasî ya bi hev re jiyanê veneke, tekoşîna avakirina dewleta serbixwe bivê nevê ye.**

Di nava civata neteweya serdest de ramanên lîberalîzma demokrat û baweriyên wekheviyê yên sosyalîst pêşda neçe rê li ber civateke wekhevî nayê vekirin. Îro nêrîneke lîberalên nasyonalîst heye ku bi rastî me Kurdan jî, ji nêz ve eleqeder dike. Ew bi xwe di avakirina civata pirçandî de ne zelal in. Lê ew raste rast li dijî civata pirçandî ranawestin. Lê di bingehiya nêrînên wan yên li ser civatê de, dijberiya wan ya li dijî wekheviya mafê netewa eşkere dibe. Lewra mirov dikare bêje ew li dijî civata pirçandî radiwestin.

Nêrîna wan li ser civateke ewleyî, bi hêz û yekgirtî kûr dibe. Ew dibêjin ji civatekê re nasnameyeke hevbeş pêwîst e. Raste nasnameyeke hevbeş pêwîste, lê çênabe nasnameya neteweyekî bibe nasnameya hevbeş. Ev nasname ya hevbeş dibe nasnameya kolektiv ya civatê. Ji vir ber bi ziman ve diçin û dibêjin ji vê civatê re zimanekî hevbeş jî pêwîst e. Li vir helwesteke cuda werdigrin ku bi encama xwe ve nerast hatiye îsbatkirin. Dibêjin, Civat bêyî nasname û zimanekî hevbeş, ji hev dikeve û bela wela dibe.Vê nêrîna wan digihêje dewlet bi yasayî zimanekî fermî biafirîne ku ev ziman jî dibe zimanê neteweya serdet. Nasname dibe nasnameya neteweya serdest. Di vê civatê de netewe, kêmnetewe, ziman û olên cûda xwe di nava vê nasname û zimanê kolektiv de nabînin. Ev jî dibe sedema asîmîlasyon û şovenîzma nasname û zimanê fermî ku bi xwe re nakokiyên mezin di afirîne. Ev helwest rê li ber nasname, çand û zimanên cûda digire û rê li ber şer û pevçûnan vedike.

Ev helwest dibe sedema tekoşîna neteweyên bindest ya ji bo avakirina dewleta serbixwe. Ev nakokî jî rê li ber şerê çekdarî û terorê vedike. Lewra civat ji nêrînên wekheviyê, ji nasnameya civata pirçandî

re girtî ye. Hemû nêrînên ji bo wekheviyê, hemû nêrînên parastina mafê neteweyên bindest weke dijminahiya vê civatê tê binav kirin û rê li ber tê girtin. Neteweyên bindest çareseriya vê pirsgirêkê weke rêya yekta û tenha di şerê çekdarî de dibînin. Şerê çekdarî jî rê li ber jenosîd û qirkirinan vedikin û rewşa bi hev re jiyanê dixetimînin.

Şer û şêweyên terorê, qirkirin û jenosîd dibin sedemên destêwerdana hêzên navneteweyî. Ev pirsgirêk heta îro bi vî awayî berdewam kiriye. Lê bi vê pêvajoya duyem ya paradîgmaya pêla 3'yem ve ev pêvajo dibe pirsa hêzên navneteweyî. Hêzên navneteweyî-serneteweyî bi hêzên xwe yên hevbeş ve bi destêwerdaneke navneteweyî ve vê pirsê çareser dike. Di vê pêvajoyê de bivê nevê avakirina dewleta serbixwe dertê holê. Lewra neteweya serdest bi hemû hêza xwe li dijî vê hêza navnetweyî radiweste û mafê neteweya bindest qebûl nake. Pirsgirêka Kosowayê, pirsgirêka Bosniyayê, pirsgirêka Başûrê Sûdanê, pirsgirêka Tîmora Rojhilat wiha hate çareser kirin. Avakirina civata pirçandî li Iraqê bi vê helwestê hate çareser kirin. Pirsgirêkên dewleta Sowyetê û herwiha pirsgirêkên dewletên ji Sowyetê veqetiyane û pirsgirêkên xwe çareser nekirine ew jî bi vê helwestê ve rû be rû dimînin. Dixwazim careke din pêvajoya avakirinên dewletên serbixwe yên dema paradîgmaya pêla 3'yem û dewletên serbixweyên pêvajoya netewe-dewltetê bînim zimên. Bi kurtî dewletên pêla 3'yem dewletên serbixwe yên demokratîk, yên pirçandî, pirneteweyî û gelêrî ne. Ji netewe-dewletê dûr in. Li jêrê hin nimûneyan binav dikim.

### Mafê netewe yê avakirina dewleta serbixwe

Di navenda nêrînên netewayetiyê de, avakirina dewleta serbixwe cîhekî girîng werdigre. Netewe vê helwestê weke mafê xwe yê xwezayî şîrove dike. Îro li dinyayê bi hezaran netewe hene lê berevajî vê bi sedan dewlet hene. Ger em mafê hemû neteweyî yê avakirina dewleta xwe ya serbixwe rast bibînin ku divê em rast bibînin lewra ew tenê weke mafêkî xwezayî ye, divê em guherîna nexşeya cîhanê jî rast bibînin. Guherîna Nexşeya cîhanê ku weke tabu dihate dîtin bi vê pêvajoyê ve hate guherîn. Tabu şikest û dewletên nû yên serbixwe hatine ava kirin û sînor hatine guhertin. Li vêderê burjuwazî û nêrînên burjuwazî yên lîberalên demokrat û nemaze yên lîberalên nasyonalîst bi neyînî

derdikevin rojevê. Bersiveke wan ya ji bo dewleta serbixwe û guherîna nexşeyên netewe-dewletê û sînoran û struktura wê ne zelale.

Ew pirsgirêka mafê çarenivîsê, tenê weke mafê avakirina dewleta serbixwe şîrove dikin û loma jî bi zelalî bersiva vê pirsê nadin û jê direvin. Tu kes mafê netewa yê, avakirina dewleta xwe ya serbixwe, ji netewan nikare wergire. Di derbarê vê mijarê de tenê mafê neteweye ku ew bi xwe biryara xwe bide. Her neteweyeke bixwaze dewleta xwe ava bike, divê ev helwest weke mafê wî yê xwezayî bê dîtin û ji helwesta netewe re rêz were girtin.

Li vê derê pirsa mafê çarenivîsiyê dertê rojevê û divê ev maf bi vê pêvajoyê ve bê şîrovekirin. Alternatîfên çarenivîsê bêguman tenha ne avakirina dewleta serbixwe ye û tenê nayê maneya avakirina dewleta serbixwe. Lê avakirina dewleta serbixwe alternatîfek e û mafê netewan yê xwezayî ye. Helwesta neteweya serdest, bandoreke biryardêr li ser helwesta neteweya bindest ya avakirina dewleta serbixwe dike. Weke alternatifên min li jorê anîne zimên, ewana hemû jî dikarin bibin alternatîfên çareseriyê, lê ewana bi xwe jî bi helwesta netewa serdest ve girêdayî ne. Guherîna helwesta neteweya serdest ya ji bo avakirina civata pirçandî, pirneteweyî dikare rê li ber helwesta neteweya bindest ya avakirina dewleta serbixwe bigire. Lê helwesta neyênî jî berevajî wê, rêya serxwebûnê vedike.

# KOSOWA

Beriya ez dest bi mijara Kosowa yê bikim dixwazim çend gotin
ser mijara mafê çaranivîsê bêjim. Kosowa yê di vê pêvajoya nû
referandûmê mafê xwe yê neteweyî di çerçoweya avakirina dewle
rbixwe de biryara pêşeroja xwe da û dewleta xwe ya serbixwe a
r. Pêwendiyên çareseriya pirsgirêka Kosowa yê, ya di çerçoweya ma
renûsî de derket rojevê, pirsgirêka Kurd jî ji nêz ve eleqeder dik
wra him pirsa mafê çarenûsî û him jî şêweyên çareseriya pirsgirê
osowa yê girîng in û divê em bikaribin ji raya giştî re ronî bikin.

Pêvajoya netewayetî yê li Asya yê, li Efriqa yê û nemaze li Rojhila
avîn weke pêvajoya li Ewropayê dest pê nekiriye û bi bêdadweriye
dîtî ve mafê neteweyan û kêmneteweyan binpê bû ye. Sedema
dayî ya netewayetiyê gelek in. Lê dixwazim bêjim li Rojhilata Nav
rê dewlet hatine ava kirin û dû re jî van dewletên pirneteweyî xwe
ne bi zora dewletê, neteweyeke yekta ava bikin. Di kişandina
xseya Rojhilata Navîn de pêvajoyêke taybetmend dest pê kiriye
afê gelek netewan ne hetiye berçav kirin. Nexşeya hatiye kişand
xşeya statukoya nû ya îro afirandiye û bûye belaya serê netewan
mnetewan yên Rojhilata Navîn..

Woodrow Wilson di 8/1-1918'an de mesajekê ji Kongreyê re
ke. Wilson di mesaja xwe de mercên aşîtiyê û yên çareseriya ma
tewan û kêmnetewan tîne zimên û wiha berdewam dike: "**Divê**
**tewe di bin serweriya ku ew naxwazin bijîn, neyên mecbûr kirin**

Lê dawî ew bi xwe bû yek ji wan kesan ku li Rojhilata Navîn gelek neteweyên cûda mecbûrî serweriya çend dewletên dagirker kiriye. Pirsa bi dehan neteweyan kiriye qurbana berjewendiyên dewleta xwe ya zordar.

Di mesaja xwe de Wilson mafê netewan ya mafê çarenûsî tîne zimên. Lê mercên Wilsonî, dawiyê bi neguherîna sînoran ve hate sînor kirin û gelek netew mecbûrî serweriya ku ew naxwazin kirin. Lê ne tenê li Rojhilata Navîn herwiha li Ewropayê jî gelek netewan ji mafê xwe yên rewa bêpar man. Li Rojhilata Navîn yek ji wan netewa Kurd û li Ewropa jî yek ji wan netewa Kosowî bûn. Bi şerê cîhanê yê yekem ve ev pirs nehate çareserkirin. Bi şerê cîhanê ya duyem ve ev pirsgirêk aloztir û şolîtir bûn.

Piştî şerê cîhanê NY (Yekgirtina Netewa) bi biryara xwe ya 59/134'an ve mafê neteweyên kolonî careke dî bi eşkereyî tîne zimên: "**Ji kolonyalîzmê azadiya neteweyên bindest (kolonî), weke çareseriya yekta, mafê çarenûsî ye.**" Di vê pêvajoyê de NY biryareke din werdigre. Danasîna ku kolnyalîzm weke sîstem bi dawî hatiye eşkere dike. Ev biryar gelekî girîng e, lewra bi vê biryarê ve pirsgirêka netewa êdî dibe pirsgirêka nava dewleta bi xwe. Weke pirsgirêka hemwelatiyan tê şîrove kirin û pirsa sînoran dibe pirsa sereke. Pirsgirêka netewan ya herî mezin di çerçoweya pirsgirêka kêmnetewayetiyê de tê dîtin û loma jî mafê otonomî, otonomiya çandî yan jî mafê hemwelatiyê dibin çareseriyên sereke. Lê li gelek dewletan ev jî pêk nayên, weke Tirkiye, Iraq, Sûriye, Îran.

NY, bi vê helwesta xwe ve şerê netewan amade dike. Nakokiya neteweyan kûr dike. Ev biryara NY bi biryareke din ve xurttir dike." **destpêka perçekirina yekîtiya xaka welatekî û yekîtiya neteweyeke, weke berevajî prensîb û armancên NY tê sîrove kirin." Ango netewe-dewlet nikare bêne perçekirin.** NY bi vê biryara xwe ve mafê hemû neteweyên bindest binpê kir. Bi kurtî ev biryar tê maneya, ji nuha û pêve tu netewe êdî ji bo mafê xwe yê neteweyî nikare tê bikoşe. NY li ser navê dadweriyê bêdadweriyê dike yasa û prensîbên dadweriya navneteweyî.

Îro biryara NY'yê ya sala 1966'an hê jî ne hatiye guherîn û vê biryara NY bi biryara li jorê hatiye nivîsîn nakokbar e. Biryara sala 1966'an

wiha dibêj e: "**Mafê hemû neteweyan mafê çarenûsî heye. Li gor vî mafî her neteweyek dikare statuya xwe ya siyasî bipejirîne..**" Di vê biryarê de ya girîng ku dertê pêş, êdî mijara ka kî netewe ye û kî ne netewe ye. Her wiha ka wê kî vî mafî wergire û wê kî wernegire. Mafê kîjan neteweyî heye û yê kîjan neteweyî tuneye. Ji bo mijarên li jorê bilêv bûne, ji aliyê NY 'yê ve û ji aliyê hêzên navneteweyî ve tu çareserî nehatine pêşkêş kirin. Berjewendiyên van hêzên navneteweyî di bicîhkirina vê prensîba NY'yê de sereke ne.

Di vê pêvajoya ku ez dixwazim bînim zimên de di çerçoweya prensîba sala 1966'an de pirsgirêka çend neteweyan hate çareser kirin û bi vê çareseriyê ve pêvajoyeke nû dest pê kir.

Di sala 1990'î de rewşa neteweyên dinyayê hate guherîn. Gelek welatên xwe weke yek neteweyî binav dikirin, xwe ji nû va vejandin û civatên pirçandî ava kirin. Çareseriya pirsgirêka netewan di vê pêvajoyê de di çerçoweya ava kirina civatên pirçandî de hatine dîtin. Min li jorê çareseriyên vê pêvajoyê aniye zimên.

Lê di dawiya salên 90'î de pirsgirêkeke nû di qada navneteweyî de cîh girt. Pirsgirêkên neteweyên Federasyona Rûsya û Yugoslawyayê bûn mijara sereke ya cîhanê. Bi vê pêvajoyê ve carekî din pirsa mafê çarenûsî di nava NY, NATO û YE'yê de bû mijara sereke. Bi dehan neteweyên van federasyonan serxwebûna xwe dixwestin. Rewşa jiyana bi hev re bi dawî hatibû û netewa mafê cudabûnê dixwestin. **Di vê pêvajoyê de mafê çarenûsî û prensîbên NY a ya ku sînor guherînê red dike hatine dijberî hev. Dawî mafê çarenûsî bi ser ket û bi referandûmê yan jî bi daxwaza hêzên navneteweyî bi dehan netewa dewletên xwe yên serbixwe yên pirçandî ava kirin.**

Divê em mijarekê ronî bikin. Neteweyên weke komar di van federasyonan de yekîtî çêkiribûn ji xwe mafê wan yên cûdabûnê hebûn û nebûne devjeniya navneteweyî. Lê mijara, Bosna yê, Ya Slowenya yê û ya Xirwatîstanê, bûne mijara devjeniyê. Encamên devjeniyê bi erênî bi dawî hatin û dewletên xwe ava kirin. Lê mijara Kosowayê û ya Qeredaxê nehate çareser kirin. Vê pirsgirêkê rê li ber careseriyên nû vedikir. Neteweyên serdest rê li ber cûdabûna van neteweyan digirt û li dijî daxwazên wan netewan bi şêweyên şîdetê bersiv dan. Di vê dema golobal de, pirsgirêkên neteweyî bûn qada şer û pevçûnên

nedîtî. NY, NATO û YE mecbûr man bi destêwerdaneke navneteweyî vê pirsgirêkê çareser bikin. Bi destêwerdana van hêzên navneteweyî Kosowa bi referandûmê mafê serxwebûna xwe bi dest xist û mafê xwe yê çarenûsiyê bicîh kir, ku Kosowa wek perçeyek ji xaka Sirbîstan dihate qebûl kirin.

Bi serxwebûna Kosowa yê naveroka mafê çarenûsiyê jî hate guherîn. Ji vê pêvajoyê û pêda, mafê çarenûsî weke mafê hemû neteweyên xwe weke neteweyeke cûda dibînin hate pejirandin. **Bi vê pêvajoyê ve du tabû hatine ruxandin. Ya yekem perçebûna dewleta ku weke tabû dihate dîtin û ev tabû ji aliyê NY a ve jî weke yasa û prensîb dihate pejirandin, hate guhertin. Bi ava kirina bi dehan dewletan ve sînorên nexşeya dinyayê hate guhertin. Ya duyem jî guhertina yek ji prensîbên NY ye. NY guhertina sînoran weke dijberiya prensîbên xwe dipejirand.** Lê di vê pêvajoyê de bi çareseriya pirsgirêka Kosowayê, pirsgirêka Bosnayê û pirsa Qeredaxê ve NY bi xwe prensîbên xwe yên pirsgirêka sînoran binpê kir û rê li ber serxwebûna van dewletana vekir. Ji vê pêvajoyê pê ve êdî, prensîbên NY ya di vê pirsgirêkê de ya girîng ku **guhertina** sînoran weke dijberiya prensîbên xwe didît, ji bo tu welat û neteweyên din jî derbas nabe. Lê divê em ji bîr nekin ku ev pirsgirêk û çareseriyên vê pirsgirêkê di destê hêzên navneteweyî de ne. Berjewendiyên hêzên navneteweyî di perçebûna Yugoslawya û Rûsya yê de bû. Îro bi dehan netewe li dinyayê dixwazin van prensîbên NY yên çewt piştî vê pêvajoyê êdî ji bo wan jî derbas nebe û nebe astengê îradeya wan. Netewa Kurd jî yek ji van neteweyan e.

Di vê pêvajoyê de bi qasî girîngiya pirsa Kosowayê ya Bosniyayê jî girîng e. Bosniya ji neteweyekê pêk nayê. Civateke pir neteweyî, pir zimanî û pirolî ye. Her çiqasî Sirbên Bosniyayê li dijî serxwebûna Bosnayê rawestiyan jî, dawî wan jî qebûl kir û di nava federasyona Bosnayê de cîh girtin. Bosniya di sala 1992'an de çû referandûmê. Bi referandûmê ve % 99 serxwebûna Bosniyayê bijartin. Sirbîstan bi leşkerên xwe û bi hêzên Sirbê yên faşîst li dijî gelên Bosniya yê nemaze li dijî Mislimanan dest bi şer kirin û mafê serxwebûna Bosniyayê qebûl nekirin. Lê YE û NY derhal serxwebûna Bosniya yê naskirin û alîkariya xwe eşkere kirin. Li vê derê hêzên navneteweyî roleke mezin di çareseriyê de wergirtin. Îro Bosniya bi peymana Daytonê ya

sala 1995'an ve weke dewleteke serbixwe lê bi 3 neteweyên sereke, (Komara Sirbî ya federasyonê, û bi federasyona Boşnak û Xirwatan) ve weke dewleteke 3 perçeyî, ku diruvê Konfederaliyê dide lê bi navê federasyonê ve tê bilêv kirin, ji 3 federasyon û ji 10 kanton û ji 13 hukumetên herêmî û hukumetek navendî ve bi 3 zimanê fermî û gelek lehçe û zimanê herêman ve weke dewleteke serbixwe lê dewleteke pirçandî serweriya xwe û ewlekariya xwe li navenda Ewropayê berdewam dike. Em, dewleta Bosniyayê ya serbixwe û pirçandî, di şîrovekirina **pêvajoya duyem ya paradîgmaya pêla 3'yem** de weke mînakeke sereke dikarin bidin pêş û di vê çerçoweyê de şîrove bikin. Sîstema Bosniya bêtir ji bo Iraqa federal dikare bibe mînakeke berbiçav. Ez bawerim mînaka Bosniya weke mînaka Konfederal mirov dikare şîrove bike. Îro çareseriya pirsgirêka Iraqa federe jî ber bi Konfederaliyê ve diçe û bi raya min ya herî rast jî ev e. Ez çareseriya Bosna, Xirwatîstan û ya Kosowayê weke destpêka vê pêvajoya duyem ya paradîgmaya pêla 3'yem bi nav dikim.

Vê pêvajoyê prensîbên NY û prensîbên YE'yê ser û binî hev kir û ger van hêzên navneteweyî durûtiyê nekin wê êdî van prensîbên xwe yên dualî û nakokbar dernexin pêşiya çareseriya pirsgirêka neteweyan. **Di serencama vê pêvajoyê de, prensîba sereke ya NY ya" yekgirtina xaka welat" ya bi navê "neguhertina sînoran" ve dihate bilêv kirin têk çû ye.** Yugoslawya perçe bû. Bosniya, Qeredax û dawî jî Kosowa dewletên xwe yên serbixwe ava kirin. Piştî demeke dirêj cara yekem e ku mafê çarenûsî bi awayekî dirust bi cîh bû. Ev prosesa nû weke serketina tekoşîna neteweyên bindest hate şîrove kirin. Ji îro û pê ve referensa neteweyên cûdabûnê dixwazin ya sereke ev e. Ev referens ji bo tekoşîna Kurdistanê jî sereke ye.

### Pirsgirêka KOSOWA yê

Kosowa di sala 1389'an de di dema serweriya Muradê yekem de, bi şerê bi navê Kosowayê ve kete bin destê Osmaniyan. 500 salan di bin dagirkeriya Osmaniyan de ma. Di sala 1912'an de di şerê ji bo serxwebûna neteweyên Balkanî de kete bin destê Sirbiya. Kosowayê tenê xwediyê xwe guhert û careke dî bindestî bû para wê.

Pirsgirêka Kosowayê bi dîroka xwe ve û bi çareseriya xwe ve bersiva vê pêvajoyê û bersiva pirsa çarenûsî yê dide. Loma çareseriya pirsgirêka Kosowayê ji bo gelek neteweyên ji bo azadiyê têdikoşin dikare bibe mînak.

Dema Kosowa di bin destê Osmaniyan de bû û di dema di bin destê Sirbiyan de bû, bi statuya xwe ji ya Kurdistanê gelekî kêmtir bû. Di wê demê de Kurdan xwe bi xwe lê di nava împaratora Osmaniyan de weke Mîrekiyên xweser xwe bi rê ve dibirin. Kurdan ji bilî dewletên ava kirine, herwiha wan dem bi dem bi sîstema Mîrektiyê ve xwe îdare kirin e û gah bi sîstema şêxîtî yê, Heta dawiya şerê cîhanê yê yekem. Welewkî Kurdistan hatibû perçekirin jî, welewkî bi herêmên xwe ve bi serweriyên cûda cûda jî jiyana xwe berdewam dikirin, têkiliyên wan yên neteweyî ji hev neqetiya ne.

Bi statuya xwe ya dîrokî ve Kurdistan ji wan welatên li jorê hatine binav kirin, gişan bêtir xwedî serwer bûye û xwedî statu bûye. Îro çend dewletên nîjadperest pirsgirêka Kurdan weke pirsgirêka hemwelatiyên xwe şîrove dikin û Kurdan wek netewe û Kurdistanê jî weke welat înkar dikin. Wîlayeta Kosowayê, bi şerê Balkanan ve kete bin destê Sirbîstanê. Di sala 1945'an de bi serokatiya Tîto ve di ava kirina dewleta Yugoslawî de Sirbîstan weke netewa sereke derket pêş. Piştî salekê di sala 1946'an de komara federal hate pejirandin. Bi vê pejirandinê ve Kosowa bû sê herêm. Başûrê Kosowayê di nava Mekedonyayê de, bakurê Kosowayê jî di nava Sirbîstan de ma. Di nava herdû perça de perçeyekî biçûk di navenda Kosowayê de ma. Ev herêm weke otonomiya Kosowa hate hilbijartin û bi komara federal ya Sirbîstan ve hate girêdan. Îro Kosowa dewleta xwe ya serbixwe li vê herêma navend de ava kiriye. Heta serxwebûnê Kosowa him di qada navneteweyî de him jî di qada neteweyî de weke perçeyek ji xaka Sirbîstan dihate dîtin. Weke li jor jî hatiye nivîsîn Statuya Kosowa weke statuya neteweyeke xweser nedihate dîtin.

Di sala 1974'an de statuya Yugoslawya ji nû va hate vejandin û bi 6 komaran ve weke dewleteke federal hate vejîn. Sirbîstan, Xirwatîstan, Bosna-Xersek, Mekedonya, Slowenya û Qeredax. Voyvodîna û Kosowa jî weke du herîmên xwser di nava komara federal ya Sirbiya de cîh girtin. Bi vejana nû jî mixabin Kosowa weke neteweyeke xweser xwedî xak nehate dîtin û weke perçeyeke Sirbî statu wergirt. Pirsgirêka

Kosowayê weke pirsgirêka navxweyî ya Komara Sirbî hate binav kirin. Ne weke pirsgirêka Yugoslawya. Dervî vîn û hesta Arnawutê Kosowayê, weke kêmnetewe hatine dîtin û statuya wan ji aliyê hinekî din hate pejirandin. Kesekî li vîn û hesta wan guhdarî nekir û mafê wan yê neteweyî binpê bû.

Îro Kosowa weke dewleteke serbixwe û pirçandî bi nûfusa xwe ya 2 milyonan ve weke dewleteke federe tê binavkirin. %90 Arnawutî, %6 Sirbî, %4 jî Xirwatî, Boşnakî ne.

## Di çerçoweya peymanên navneteweyî de dîroka Kosowayê û statuya wê

Di sala 1878'an de bi konferansa Berlînê ve xaka Kosowayê di nava sirbîstan û Karadax de ma. Di nexşeya sala 1913'yan ya Balkanan ya nû de ciyê Kosowayê tune ye. Bi şerê cîhanê yê yekem ve pirsa wê nehate çareserkirin. Bi şerê cîhanê yê duyem ve Yogoslawya li dijî Nazistan rawestiya û di dawiya şerî de jî dewleta xwe ya federal ava kir. Li vir dîsa Kosowa weke neteweyeke mafê xwe bidest nexist.

Di sala 1950'yî de dewlet ji nû ve hate vejandin lê Kosowa weke xwe ma. Di sala 1968'an de Kosowî li dijî dewletê dengên xwe bilind kirin. Kosowa bi vê helwesta xwe ve mafê otonomî wergirt. Meclîseke formel hate vekirin lê temsîliya Kosowiya nedikir. Nûnerên Kosowayê di parlemena navendî ya federal de cîh girtin. Weke Otonomiya başurê Kurdistanê ya salên 1972'yan. Lê Otonomiya Başurê Kurdistanê dem bi dem ji vê otonomiya Kosowayê mezintir bû. Di sala 1981'ê de dîsa tekoşîna wan dest pê kir. Vê carê ji carê din cûdatir mafê serxwebûnê dixwestin. Tevgera neteweyî bi mafê serxwebûnê derkete qada siyasî. Di sala 1989'an de Slobodan Milosewîç mafê otonomiyê ya sala 1974'an ya Kosowayê bi dawî anî. Weke Seddam. Dîktator ji eynê kaniyê avê vedixun. Piştî têkçûna sîstema sosyalîst jî bi mafê xwe yê serxwebûnê ve tekoşîna xwe berdewam kir û tekoşîna neteweyî mezin bû.

## Pêvajoya nû û pirsgirêka Kosowayê

Piştî şerê Bosniya, şerê Kosowayê dest pê kir. Sirbiyan bi komkujiyên xwe yên li Bosniyayê dijberiya cîhanê wergirtibû. Di şerê Kosowayê de dinya êdî nikaribû bêdeng bimaya. Emerîka alîkariya hêzên

navneteweyî wergirt û him Bosniya û him jî Kosowa xist bin ewlekariya NY'ê. Bi destêwerdana hêzên navneteweyî Bosniya û Kosowayê serxwebûna xwe eşkere kirin. Îro herdu jî weke dewletên serbixwe lê dewletên pirçandî û pirneteweyî weke minakên pêvajoya duyem ya paradîgmaya pêla 3'yem dijîn.

Ruxandina Sowyetê di sala 1991'ê de û rûxandina Yugoslawyayê di sala 1992'an de, ji bo serxwebûna Kosowayê bûn du encamên sereke. Di sala 1991'ê de welewkî Sirbî li dijî rawestiyan dîsa jî Kosowî çûn referandûmê. Bi referandûmê %98,87 serxwebûn hate hilbijartin. Bi vê referandûmê Kosowayê serxwebûna xwe eşkere kir. Welatê yekem Arnawut biryara wan erê kir. Bosniya, Xirwatîstan û Slowenya jî dû re biryara wan erê kirin. Di vê demê de li Başûrê Kurdistanê jî parlemena Kurdistanê hete ava kirin û Kurdan dewleta xwe ya federal ava kirin. Li başûrê Kurdistanê jî tevgera referandûmê hate afirandin. Çawa Kosowa di bin ewlekariya NY de serxwebûna xwe berdewam dikir Kurdan jî bi ewlekariya Emerîka ve serxwebûna xwe berdewam dikir. Başûrê Kurdistanê jî çû referandûmê û %99 serxwebûna Kurdistanê pejirandin. Referandûma Kurdistanê tevgereke neteweyî ye û daxwaza gel aniye zimên. Başûrê Kurdistanê bi vê referandûmê ve vîna xwe eşkere kiriye. Çawa dinya ji bo Kosowayê vî mafî rast dibîne divê ji bo Kurdan jî rast bibîne. Lê Kurdan dîsa jî mafê serxwebûnê bikar ne anîn û weke komareke federal di nava dewleta federal ya Iraqê de man.

Kosowa îro weke dewleteke pirçandî û serbixwe bi du zimanê fermî yê dewletê, Arnawutî û Sirbî serweriya xwe berdewam dike. Tirkî jî li hinek herêma weke zimanê fermî ye. Vê helwesta Kosowayê berevajî helwesta dewleta Tirk û dîroka wê bersiva pêvajoya duyem ya paradîgmaya pêla 3'yem dide û bi ava kirina dewleta pirçandî ve di nava şaristaniya cîhanî de cîh digre. Kosowa êdî ne weke perçeyek ji xaka Sirbîstan lê weke dewleteke serbixwe û serwer tev dilive. Vê helwesta Kosowayê ji aliyê dinyayê ve bi erênî tê pejirandin. Vê pêvajoya Yugoslawya bandoreke mezin li ser Kafkasya hişt û ev pêvajo bi hemû bandora xwe ve li vê herêmê berdewam dike. Di dehsalên pêş de emê çend dewletên serbixweyê Kafkasî bikaribin bibînin. Ev destpêka guherîna statukoya herêma Kafkasya yê ye. Osetya û Abhazya du neteweyên di nêz da dixwazin bighêjin mafên xwe.

## Di çareseriya pirsgirêka Kosowayê de Pêvajoyeke nû
## Dîwana dadwer ya Laheyê û Kosowa

Sirbîstanê vegiliyê (Ihtîraz) xwe bi fermî li ba Dadgeha Laheyê kir û li dijî biryara Kosowayê ya sebixwebûnê derket. Daxwaza Sirbîstanê ew bû ku Dîwana Dadgeha Laheyê biryara Kosowayê ya yekalî ji bo serxwebûnê çewt bibîne. Lê dîwanê berevajî daxwaza Sirbîstanê biryara Kosowayê li gor huqûqa navneteweyî rast dît û vegiliyê Sirbîstanê bi şunda vegerand. Ger biryar li gor daxwazên Sirbîstanê derbiketaya dibe ku Sirbîstan vê biryarê bikira sedemê şerekî nû li vê herêmê. Armanca Sirbîstan bi ya min ev bû lê zordarî weke rastiyê nehate dîtin.

Biryara Dîwana Dadgeha Laheyê weke biryareke huqûqa navneteweyî tê şîrovekirin û divê ji bo bi dehan neteweyên din jî derbas bibe. Ev biryar jî pêvajoya duyem ya paradîgmaya pêla 3'yem bihêz dike û vê helwesta ha weke helwesteke navneteweyî ku li dijî Înkarê û li dijî şovenîzmê bi lêv dibe, ji bo me Kurdan mijareke berbiçav e. Ji nuha ve Tirkiye vê mijarê ji bo Tirkên Kibrisê dixwaze têxe rojeva xwe ya dîplomasî lê pirsgirêka Kurdistanê ji bo wan ji pirsgirêka Kibrisê girîngtir e û loma jî bi dengekî bilind vê mijarê naxin rojeva xwe.

Ev biryara Dîwanâ Adaletê ji bo hemû tekoşîna neteweyên bindest, weke çavkaniya dadweriyê û têkoşîna meşrû ya neteweyên bindest tê şîrovekirin.

Ev biryar ji bo hemû têkoşîna neteweyên bindest çavkaniyeke bêhempa ye. Divê hêzên navneteweyî vê biryara Dîwanê di her çareseriya nakokiyên netewan de bide ber çavan. Herwiha hêzên netewî jî di tekoşîna xwe de divê, vê biryarê di qada siyasî û dîplomasî de derxin pêş.

Pirsgirêka Kosowayê û biryara dadgeha Laheyê di raya giştî û di medya cîhanê de weke bûyereke girîng û weke bûyereke nû cîh girt. Girîngiya vê bûyerê di medya Tirk de jî weke pirsekê cîh girt û gelek nivîskar û siyasetmedarên Tirkan jî ev bûyer şîrove kirin. Ji wana çend şîroveyan dixwazim bînim zimên.

Cem Sey di rojnameya Tarafê de bi sernivîsa "serxwebûnê" ve maqaleyeke dirêj nivîsî û ev mijar şîrove kir. "Huquqnasên navneteweyî ewê vê mijarê ji nêz ve şîrove bikin" "Piştî vê biryarê di derbarê,

hudûdên navneteweyî de, di derbarê yekgirtina xakê de (neperçekirina dewleta), serweriya neteweyî û pirsa çare-nivîsê de wê berbangên taze bêne vekirin" Biryara dadgehê jî wiha şîrove dike:

1-Her danenasîneke serxwebûnê bi serê xwe wê weke diyardeyekê be. Divê di çerçoweya rewşa wê (dewletê) de bê şîrovekirin." (Ango ev biryar ji hemi netewa re nabe weke mînak. Ev bi xwe di qada navneteweyî de gelek hate minaqeşekirin. Lê ji bo ji hemû, neteweyên dixwazin serbixwe bijîn, dikare bibe mînak. Bi ya min gelek dewletên dinyayê ne li hêviya vê biryarê bûn. Gelek dewlet jî ji vê biryarê aciz bûn. Hemû dewletên birînên wan hene vê biryarê weke derman nabînin û li dijî vê biryarê radiwestin. N.A)

2-Mînakên weke Rodezya Başûr, Kibris û Komara Sirbî û biryarên Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî, danasîna serxwebûna wan weke biryarên di rewşa wê demê de didît. Ango guherîna rewşa wan netewan û rewşa guherîna dinyayê, biryara xwediyê herêmê jî diguherîne.

3-Sedemên qebûlkirina, neyasayî ya îlankirina serxwebûnê, ne îlankirina serxwebûnê ya yek alî ye. Lê ji bo bikaranîna hêza neyasayî ye.

4-Li gor şîroveyên jorê û bi vana girêdayî, îlankirina serxwebûnê ya yek alî gelekî mumkun xuya dike. (Pirsa Kibrisê bi bikaranîna hêza neyasayî ve girêdayî ye. Lewra Tirkiye weke dagirker tê qebûlkirin.)

### Ev biryar bi pirsa Kurdistanê ve çawa pêwendîdar e

"Rapora dadgehê xuya dike ku, yekgirtina xaka tu dewletan ne weke xaka bê destêwerdanê ye. Li dijî bikaranîna hêza bê yasayî ya dewletekê, rê li ber destêwerdana dadwerî ya dezgehên navneteweyî vedike. Ango rapora dadgehê vê destêwerdana hêzên navneteweyî weke tedbîreke bivê nevê nîşan dike. Êdî xwesipartina biryara yekgirtina xakê zahmet dibe.[138]

Dîsa di rojnameya tarafê de di 5/8-10'an de bi sernivîsa Ewropa


138 Cem Sey, Rojnameya Tarafê, 26.07.2010 ji meqaleya nivîskar a bi sernavê Serxwebûn.

nû ve Sezîn Oney jî li ser vê mijarê beşdarî niqaşê bû." Di çareseriya pirsgirêka Kurdan de sedema tenha ya veqetandinê û teyidkirina veqetandinê ji aliyê hêzên navnetewî ve, tenê di israrkirina berdewamiya şîdetê de ye."[139] **Ango dewletek li aliyê dinyayê li ku dibe bila bibe ger çareseriya pirsgirêkan tenê di çerçoweya bikaranîna hêza neyasayî** (şîdet) **de bibîne, wê rê li ber destêwerdana hêzên navneteweyî veke.** Lewra çareserî di devjeniya derbirîna azad de ye. Ger civatek bi azadî, pirsgirêkên xwe bîne zimên, bi azadî rayên xwe li ser çareseriyên pirsgirêkên civatê pêşkêş bike wê demê wê bikaribe dewleta xwe, civata xwe ji perçebûnê azad bike. Jiyana wekhevî, ji ber ramanên înkarê, ji ber raman û kiryarên tunekirinê, ji ber ramanên şowenî û nîjadperestî zahmet dibe û rê li ber veqetandinê vedike.

Hemû dezgehên civakî û siyasî yên civata dewleta Tirk, ku yekgirtina xaka dewleta Tirk weke xeta sor derdixin pêş û nakin qada devjeniyê, divê weke mînakên li dinyayê li jorê hatine nivîsîn, qebûl bikin û dev ji nîjadperestiya qirêj, şovenîzma li dijî mirovahiyê berdin û weke minakên serdemî mafê netewa Kurd yê rewa jî qebûl bikin. Di vê devjeniya li ser pirsgirêka Kurd û Kurdistanê de, hemi nîjadperestên Tirkan , pirsa kêmneteweyên din jî dikin weke pirsgirêk û dibêjin ger mafê Kurdan bê dayin wê kêmneteweyên din jî mafê xwe bixwazin. Ev jî dibe sedemên perçebûna vê dewleta dawî ya neteweya Tirk. Ango van nîjadperest û şowenîstên qirêj û hov, tirsa xwe ya perçebûyina dewletê weke teoriya konspîratif derdixin rojevê û bi vê teoriyê jî pêşiya tekoşîna neteweya Kurd digrin. Lê ger dewleta Tirk dixwaze dewlet perçe nebe, dive mafê Kurdan yê neteweyî û civakî radestî Kurdan bike.Divê rê li ber avakirina civateke pirçandî,pirneteweyî veke. Ger dewleta Tirk li ser bikaranîna vê hêza neyasayî (li dijî daxwazên rewa bikaranîna şîdetê û înkara mafê kollektîvî ango mafê neteweyî) berdewam bike, veqetandina Kurdan bivê nevê ye. Ev jî mafê Kurdan yê rewa û xwezayî û yasayî ye. Li gor yasayên navneteweyî mafê neteweyeke heye ku xwe biparêze. Welewkî bi awayên **çekdarî be jî.**

---

139 Sezin Öney, Taraf, 05/08-2010.




## TÎMORA ROJHILAT

Serjimara Tîmora Rojhilat nêzî yek milyonê ye. Li Asyayê welatê duyem yê katolîk e. Weke tê zanîn Flîpîn jî welatekî Katolîk e. Îsewîtî, Muslumantî, Hîndûîzmî, Bûdîzmî li vî welatî bi hev re dijîn. Ola mezin weke tê gotin Isewîtî ye û Katolîk û Protestan piraniya serjimara hemwelatiyên Tîmora Rojhilat in. Du zimanên fermî yên dewletê hene. Tetum û Portekîzî ne. Tetûm zimanê wan yê netewî ye û Portekîzî jî zimanê wan yên ji Portekîzan maye weke zimanekî neteweyî tê bikar anîn. Digel van zimanên fermî de bi dehan zimanên din yên cuda têne axaftin lê ne weke zimanên fermî ne. Yek ji wana jî zimanê Endonezyayê (Endonezî) ye

### Bi kurtî dîroka Tîmora Rojhelat

Neteweya Tîmor bi eslê xwe ji Rojhilat û rojavayê Asyayê hatine û aliyekî wan jî ji Ewusturalyayê hatine. Tê gotin ku berî 40 hezar salî ev gruba mirova hatine vê herêmê. Neteweya bingehî Cermsor in. Berî 3000 sal berê jî ji Ewusturalyayê mirov hatine vê herêmê.

### Kolonyalîzma Portekîzê

Yekemîn ji koloniyên Portekîzê di sedsala 16'an de li Rojhilatê Asyayê bicîh bû. Yek ji wan welata yê yekemîn jî kolonîkirina Rojhilatê

Tîmorê ye. Berê gelek girav xistin destê xwe lê dawî Tîmor tenê weke kolonî di destê Portekîzê de ma. Weke tê zanîn Portekîz yek ji wan welatên Ewropa yê yekemîne ku li Asyayê kolonî bidest xistiye.

Welatê Tîmor heta 1975'an di bin kolniya Portekîzan de ma. Di 1975'an de Endonezya vê derê dagir kir û weke wîlayeta xwe ya 27'an bi nav kir. Lê netewa Tîmor serhildanên xwe berdewam kir. Bindestiya Endonezyayê qebûl nekir. Yekgirtina Neteweya di 1999'han de kete navbeyna Netewa Tîmor û Endonezyayê û Netewa Tîmor xweseriya herêmî bidest xist. Lê serhildan û daxwazên wan bi dawî nehatin. Dîsa di salên 2000'î de Tîmor çû referandûmê û di 20 gulana 2000'î de serxwebûna xwe bidest xist. Endonezya pistî vê referandûmê dev ji serweriya xwe ya li Tîmorê berda. Tîmor jî weke Kosowayê yek ji wan neteweyê di vê dema paradîgmaya pêla 3'yem de serxwebûna xwe bidest xistiye. Ew jî weke Kosowayê dewleta xwe ya pirçandî û pirneteweyî ava kiriye. Vê karektera dewletên serbixweyên vê pêvajoyê weke ekoleke berbiçav derdikeve rojevê. Ev pêvajo ekoleke girîng ya dema paradîgmaya pêla 3'yem e û ji netewe-dewletê ve cudatir e.

Min li jorê pirsa serxwebûna Bosniya´yê ya avakirina dewleta serbixwe ya pirçandî aniye zimên. Ew bi xwe jî nimûneyeke girîng ya vê pêvajoyê ye. Di dawiya sala 2010'an de Başûrê Sudanê piştî şîdeta bi salan, ew jî weke gelên,Tîmorê, Kosowayê, Bosniyayê di bin çavdêriya hêzên navnetweyî de çûn referandûmê û %99 serxwebûna xwe erê kirin. Sûdan jî ev erêniya wan qebûl kir. Evana hemûyan yeko yeko weke nimûneyên paradîgmaya pêla 3'yem yên pêvajoya duyemîn in.

# VI

# ETNÎSÎTE Û NETEWE

Etnîsîte û netewe pirsên sereke yên civata serdemiya me nin. Ji salên 1960'î ve bûne pirsên girîng û ji salên 1990'î ve jî, bûne navenda Lêkolînên mezin. Ji bo çi pirsa netewî û etnîkî di van deman de bûye pirsên biryardêr?

Lêkolîner, siyasetmedar û dîroknasên dinyayê bi alaqeyeke mezin sernişîvî ser vê pirsê bûne û bi balkişandineke mezin û bi awayekî berfireh didomînin. Yek ji sedemên bingehîn ew e ku ev pirsgirêk di nava gelek civatên dinyayê de hatiye înkar kirin û gîhiştiye asta şer û pevçûnên mezin û ne hatine çareserkirin.

Di sedsala 20'an de gelek dîroknas û fîlozofên dinyayê bawer dikirin ku, "wê etnîsîte û netewayetî girîngiya xwe wenda bike û wê bi geşbûna sermayedariyê, moderníteyê û bi geşepêdana mafê kesayetî ve jî, ji rojeva mirovahiyê bi dûr bikeve."[140] Lê mixabin wiha nebû, berevajî nêrîn û dûrbûniyên dîroknasan, pirsgirêka etnîkî (olî, zimanî, çandî) û pirsa neteweyî (mafê wekhevî, dewleta serbixwe) domand û gîhişt heta dema me.

Di sala 1991'ê de, ji nava sîh û heft (37) şerê çekdarî yên li dinyayê, sîh û pênc şerê navxweyî bûn (yên neteweyî). Ji Sirîlanka heta bakurê Îrlandayê hemû weke şerê etnîkî binav dibûn. Ji bilî şerê çekdarî li hinek cîhî weke nimûne tekoşîna neteweyî ya Quebek'an ya ji bo serxwebûnê bi riya aştiyane ve xwe xuya kir.[141]"

140 *Etnisite ve Miliyetçilik-Antropolojik bir bakış*, Thomas Hyllande Eriksen Avesta Yayınları, 2004. r.11-12

141 Berhema navborî, r. 11-12

Tevlihevî û pevçûnên etnîkî û neteweyî li Ewropayê di jiyana siyasî de weke pirseke sereke derket rojevê. Li Sowyet û Yugoslawyayê û bi gelemperî li Rojhilatê Ewropayê pisgirêka etnîkî û neteweyî bû pirseke sereke. Vê pêvajoyê bandora xwe li ser rojavayê Ewropayê jî kir û li gelek welatan pirsgirêkên etnîkî, netewyî û nasnameyî bûne mijarên guherîna struktura civatan.

Di civatên Rojavayê Ewropayê de, pirsa etnîkan, netewan, kêmnetewan bi berfirehî hatin minaqeşekirin. Li gelek cîhî kêmnetewe û grubên etnîkî weke hev hatin dîtin. Maneya van bêjeya carekî di, di serdemiya me de hatine alozkirin. Bingeha vê aloziyê nasnameya netewe-dewletê ye. Antropologên Ewropayî xwestin bersiva van pirsan bidin lê bi ya min heta nuha bersiveke biryardêr nehatiye dayin. Di derbarê van mijaran de hînê jî aloziyek heye. "Pêwendiyên kesên bi çanda xwe ve, xwe cuda bibînin û ji derve jî cuda têne dîtin", bersiva statuya wan ya etnîkî bi xwe xuya dike.

Li vir pirsgirêka neteweyî ji pirsgirêka etnîsîte û kêmneteweya cuda dibe. Lewra cudahiya pirsgirêka neteweyî, bi pêwendiyên dewletê û statuya dewletê ve girêdayî dertê rojevê. Netewe sînorên statuya xwe bi sînorên ziman, çand û xaka dîrokî ve girêdide. Lê grûbên etnîkî û, kêmneteweyî gelek carî sînorên wan ne bi sînorên ziman û çanda wan ve dertê holê. Îro kêmneteweyên Çskandînawî gelek ji wan bi vî awayî weke kêmnetewene. Dema ku etnîseteyek mafê xwe bi pêwendiyên dewletbûyinê ve girê bide wê gavê etnîsîte, gîhiştiye asta netewe. Lewra îro li Tirkiyê bi dehan dîroknas, antropolog, nivîskar û siyasetmedarên Tirk, naxwazin qebûl bikin da Kurd netewe ye. Gelek ji wan dibêjin roja ku me Kurd weke netewe qebûl kir wê gavê em yê mecbûr bibin mafê wan yê çarenûsî jî bipejirînin.

## Çend nimûneyên cuda

Weber Max vê pirsê bi bêjeya "grûbên satatuyî" ve şîrove dike. Ango statuya wan ya civakî û îdarî wan ji hev cuda dikin. Grûbên etnîkî jî di nava xwe de bi gelek beşan ve ji hev cuda dibin. Di nav grûbên etnîkî de "gelên binecîh" henin, yên penaber henin, yên bermaya neteweya serdest henin û wekî din. Gelên binecîh dikare weke neteweyên bê dewlet jî bêne binavkirin. Ewana bêtir weke gelên berî zayinê jî binav dibin.

Weke minak Kurd, Belûc, Filistînî, Lazî, Tamiyê Srîlankî û Quebecîh weke netweyên bê dewlet in. Evana hemû ji bo bidestxistina mafê xwe yê çarenûsî têdikoşin. Ew hemû dixwazin li ser xaka xwe serwer û xwedî desthilatdar bin. Evana her dem li ser xaka xwe, li ser herêma xwe jiyane û ji aliyê hêzên dereke ve hatine dagirkirin. Asurî jî yek ji wan gelên binecîh in, lê ne netewe ye. Weke grûbeke etnîkî ku nebûye netewe tê binavkirin. Daxwazên etnîkan û netewan bi ya min gelek carî wekî hev xuya dikin lê di bingehiya xwe de cudahiyeke mezin heye û daxwazên netewe bêtir weke min li jor aniye zimên bi dewletê ve pêwendîdar e. Lê îro pirsgirêkên nasnameyî (netewe, kêmnetewe, grubên etnîkî) weke pirsgirêkên etnîkî bi lêv dibin.

### Hevbeşiya bingehîn ku wan nêzî hev dike çi ye?

Ew her dû jî berhemên pêwendiyên grûbê yên çandî û siyasî nin û ew tunebin ne etnîk û ne jî netewe heye. Li vir pirsa Kurdan ya neteweyî dertê rojevê. Pêwendiyên Kurdan yên siyasî û dîrokî wan dighîne hev û ew nasnameya xwe ya etnîkî bi bêjeyên neteweyî weke berdewama gelê berî zayinê xwedî ziman û xwedî xak dipêçin û têdikoşin. Moderniteyê berevajî Kurdan ji netewayetiya wan bike, wan bêtir gîhandiye hev. Zilma netewe-dewletê, asîmîlasyon û dabeşiya Kurdistanê, netewayetiya Kurd bi dereng xistibe jî, ew bi xwe bûne sedem û encama avakirina netewayetiya Kurd. Lê bi dehan gelên binecîh ne weke netewe weke etnîk jî ji holê rabûn û wenda bûne.

Pirsa etnîk (ol,ziman, çand, erdnîgarî, dîrok, paşeroj, reng wekî din), li gelek cîhê dinyayê bi awayên cuda, bi sedemên cuda derketinin rojeva siyasî û bi encamên cuda jî çareser bûne.

Di 1991'ê de bi rûxandina federasyona Yugoslawyayê ve, pirsgirêka sînorên etnîsîteyên federasyonê bûne pirsên sereke. Sirbî û Xirwatî (kroatî) weke yek neteweyî bi hev re jiyane. Her du jî bi yek zimanî diaxivin. Çanda wan ne dûrî hev e, bi hev re zewicîne, cîranên hevdu bûn û bi hev ra dijiyan. Lê mezhebên wan yên îsewî û elfabeya bi kar dianîn ji hev cuda bûn.

Yek ziman du elfabe. Yek etnîsîte du mezheb. Ne tenê ew herwiha weke neteweyeke yekgirtî Irlandî jî tenê bi sedema mezhebî ji hev

bidûr ketine. Sirbî ortodox in û elfabeya kirîlî bikar tînin. Xirwatî katolîk in û elfabeya latînî bikar tînin. Di 1991'ê de êdî nikaribûn bi hev re bijîn û ji hev cuda bûn. Du dewletên serbixwe.

Pirsa yehûdiyan jî pirseke balkêş e. Kesekî yehûdiyan weke netewe nedidît. Lewra Yehûdî hemû ne ji etnîseteyeke neteweyî pêk tên. Di nava Yehûdiyan de çawa Ereb hebin hewqasî jî, Kurd, Rûs, Swêdî, Ingilîzî Elmanî henin. Baş e çawa dibe ku Yehûdî bibin netewe? Dibêjim netewe lewra etnîka bibe xwedî dewlet, yan jî bibe xwedî struktura dewletî (federasyon) ji etnîkî dibe netewe. Tirk, Faris, Ereb jî bi avakirina dewletê ve bûne netewe. Lê pirsa Yehûdiyan girîng e. Yehûdî Îdia dikin ku hemû Yehûdî ji yek kokê hatine. Kesek ji derve nikare bibe Yehûdî. Ji aliyê dayikê ve Yehûdî dûndeya xwe didomînin. Lê ne rast e. Kurd, Rûs û Ereb ne ji dûndeya hev in. Lê yê yehûdiyan kiriye etnîk ya sereke ne dûndeya wan e, ya bingehî ol e û zimanê wan yê qedîm e. Lewra Etnîsîte ne diyardeyeke xwezayî ye, diyardeyeke civakî ye û ji aliyê hêzên siyasî yan jî çandî ve têne avakirin.

Pêwendiyên etnîkî, ji bo li ser berjewendiyên hevbeş pêk tên û li ser wan berjewendiyan rêkxistin têne avakirin, ew pêwendî bi xwe dibin encama berxwedana ji bo bidestxistina mafê kollektivî (hevbeşî). Ew berxwedan ji bo wê dibe diyardeyek ku ji êl û eşîrtiyê, ji herêmtiyê, ji qabîletiyê ber bi netewayetiyê ve biçe. Berxwedanên Kurdan yên etnîkî, belam hemû ne yên neteweyî ne, etnîsîteya Kurd ber bi netewayetiyê ve biriye. Kurd îro bêgûman dikarin weke neteweyeke serdemî tevbigerin. Sedemên bingehîn yên bihêzbûyina hestên netewayetî, -ji bo Kurdan- zilm û înkara kesayetî û nasnameya etnîkî ye. Netewa Kurd êdî ne tenê weke metafora merivantiyê, (ji eynê kokê) di Rojhilata Navîn de weke enstrumenekî, lê weke neteweyeke serdemî bingeha aramî û ewlekariya Rojhilata Navîn xuya dike. Ev bi xwe jî xuya dike ku pirsgirêka Kurd û Kurdistanê pirsgirêka bingehîn ya Rojhilata Navîn e. Ger ev pirsgirêk çareser nebe, ger Kurd mafên xwe yên rewa bi dest nexin, tu netewe, tu gel tu kêmnetewe, tu grûbên etnîkî (olî, zimanî, mezhebî) wê nikaribin di nava aramî û ewlekariyê de bijîn. Îro cudahiyên etnîkî li Rojhilata Navîn ji hemû cudahiyan bêtir di rojeva siyasî de cîh girtîne û pêdiviyên çareseriyan gihiştiye hestî.

### Netewe-dewlet û pirsa etnîkî

Weke Furniell J.S, dibêje, dewletên pirretnîkîne, lê weke netewe-dewlet hatine avakirin, weke xwezayiya karektera netewe-dewletê hemû cudahiyên civatê inkar kiriye. Dewletê bi hêza xwe ya zordar ve dengên cuda temisandiye û hemû cudahiyan bi darê zorê bêyî vîn û hesta wan, wana di nava sîstemeke zordar de li hev ragirtiye. Li vir pirsa dîrokî ya etnîsîteyî, li gelek cîhî dibe sedema cudahiyên civatê. Lewra lêkolînên dîrokî yên etnîkî, ku bi pêwendiyên kevnare re bêne girêdan dikarin bibin sedema daxwazên siyasî û ew belgename û lêkolîn dikare bibin girêdaneke meşrû ya vîn û hesta etnîkî û siyasî ya neteweyî. Gelek ji antrepologên dinyayê, dîrokê ne weke diyardeyeke derbasbûyî dibînin, ew vê diyardeyê weke aleteka pêdiviyên bersiva pirsên demê şîrove dikin. Loma ev minaqeşeya dîrokê ne bi derbasbûna mirovahiyê ve, lê bi rewşa civakî ya îro ve pêwendîdar dibînin.

### Şîrovekirina Dîrokê û Pirsa Etnîsîte

Lêkolîn û şîroveyên dîrokê ji bo geşepêdan, jiyan û nasnameya etnîsîteyekê girîng e û her lêkolîneke bêtteref bi şîroveyên dîroka fermî re nakokbar dikeve û çewtiyên dîroka fermî radixin ber çavên raya giştî. Lewra dîroka fermî li ser bingeha berjewendiyên neteweykê û li ser înkara grûbên cuda (netewe, kêmnetewe ol û zimanên cuda) hatiye nivîsîn. Di nava vê mijarê de ya girîng û biryardêr, ne tenê dîrok û derbasiya mirovahiyê bi xwe ye, lê ya girîng ew e ku li ser dîroka înkarê ji kevnare heta îro, dîrok çawa û bi kîjan awayî hatiye nivîsîn û netewe hatine avakirin. Min di beşên pêşiyê de anîbû zimên. Cîhê gotine ye ku. Têkiliyên civatan û pêwendiyên wan, bi keşîfên mezin û nemaze bi kolonyalîzma Ewropayê ya ji salên 1500'î, ve didomin, zêde bûye. Îro nakokî û şerên etnîsîteyan yên nehatinin çareserkirin ji Emerîkayê heta Asya, Efrika û Ewropayê, weke bermayên van deman gîhiştiye serdemiya me. Gelek carî hatiye gotin û nuha jî tê gotin ku etnîsîte, bi maneya çandên cuda ve têne bilêv kirin, weke berhemên sermayedariya Ewropa bi xwe ye. Lê weke min li gelek cîhî gotiye ev sedem tenê bersiva pisgirêkên etnîsîteyên îro nabe. Lê ev sedem rastiyekê radixe ber çavên me. Ji okyanûsên mezin heta Efrikayê ji sedsala 16'an ve anîna koleyan, bûye sedemên avakirina grûbên, zimanên

cuda, çandên cuda ku îro ji hev tênagihêjin. Bûye sedemên avakirina sîstemên cuda ku dijberiya hevdu kirine, hevdu dagir kirine û şerên mezin li dar xisinin.

Li vir ya bala me dikişîne, pirsa etnîsîte ye. Bi van bûyerên mezin ve, etnîsîteyan, xwestine li ser xaka xwe yan jî li ser xakên dagirkirî sînorên xwe yên siyasî bikişînin. Ev helwest jî bûye sedema pêkanîn û avakirina ideolojiyekê ku em îro wê bi neteweperstiyê binav dikin. Lewra meşrûiyeta sînorên siyasî tenê bi teoriya îdeolojiya neteweperestiyê ve dikare pêk bê. Lewra netewe-dewlet berhema vê helwesta etnîkîyek etnîkî- û meşrûkirina sînorên siyasî ango helwesta etnîkî ya li jor hatiye nivîsîn e. Weke nimûne Ingiltêre. Andersson Benedict di 1991'ê de dinivîsîne ku, ji sedsala 11'an heta şerê cîhanê yê yekemîn, tu xanedaneke Îngilîzan li Ingîltereyê nebûye serwer. Lê îro em dibînin etnîsîteya Ingilîz ji ya hemû etnîsîteyên berî wan yên li welat desthilatdar bûn bihêztir û bêtir xwedî maf e.

Ev diyarde rastiyeke din derdixe rojevê. Weke Gellner Ernest dibêje, netewe-dewlet, dikare neteweyeke ji tuneyî ava bike. Lewra netewe-dewlet di nava sînorên xwe de bi riya sermayedariyê, pêwendiyên kevnare ji holê radike û di nava sînorên xwe de mecala lêgerîneke taybetmend amade dike ku ew bi xwe jî dibe encama afirandina bazara neteweyî. Ev pêvajo jî bi xwe re ji aliyekî asîmîlasyonê ferz dike û ji aliyekî din ve jî pêvajoya entegrasyonê dest pê dike. Lê her dû proses jî bi zorê pêk tên. Asîmîlasyon bi awayên zordariya tundrewî (weke zîndankirin, kuştin, koçberî) û entegrasyon jî bi metodên jihevxistina pêwendiyên kevnare ve bicîh dibin. Entegrasyon, bi xwe bêjeyeke lihevgirtinê ye. Ew bêje di nava asîmîlasyon û cudahiyê de kombînasyonekê pêk tîne û loma jî ewropayî û serdesthilatdarên netewe-dewletê vê bêjeyê bikar tînin. Li Fransayê bi riya asîmîlasyonê ku bingeha wê perwerdeya neteweyî ye, bi milyonan kes kirin Fransizî. Li Tirkiyê bingeha vê diyardeyê jî weke Fransayê perwerdeya neteweyî ya nîjadperestî ye.

### Neteweperestî û sembolên wê

Bi vê pêngava avakirina netewe-dewletê û bi afirandina neteweyeke nuh ve di nava civatê de valahiyeke bê bersiv pêk tê. Aloziyeke nasnameyî derdikeve rojeva civatê û civat bi tewayî di nava lêgerîna

nasnameya xwe de xwe di nava aloziyek û kaoseke sosyolojîk ya bê bersiv de dibîne. Di pêvajoyeke wiha de bersiva yekemîn afirandina nasnameyeke nuh e û ew jî bi navê neteweperestiyê û hemwelatiyê ve binav dibe. Ev helwesta netewe-dewletê bi mebesta ji nuh ve peydakirina hestên ewlekariya hemwelatiyan ve binav dibe. Li vir dewlet bi riya neteweperestiyê valahiya nava takekesayetî û civatê dadigre. Ji xwe netewe-dewlet ji bilî vê helwestê pêve riyeke din jî nabîne. Dewlet, di vê pêvajoyê de zahmetiyeke mezin nade pêşiya xwe. Çend kesên naskirî û binav jî dengdayî têra vê pêvajoyê dike. Lê dawiyê bêyî alîkariya netewe ev helwest bê encam dimîne û loma jî dewlet berê xwe dide gel û pêwîstiyê bibîne bi darê zorê neteweya xwe ava dike. Ev pêvajo li Rojhilata Navîn pir bi eşkereyî pêk hatiye û cîh girtiye. Îro li Tirkiyê ji bilî darê zorê, hemû aletên ragîhandinê (radiyo, internet, TV), hemû dadgeh, unîversîte û sîstema perwerdeyê di xizmeta vê helwesta dewletê de ne. Kurd di bin bomberdûmana sîstema asîmîlasyona dewletê de di ber xwe didin.

Weke nimûne netewe-dewleta Tirk bi hinek sembolên ne rast yên çêkirî yên neteweyî ve hatiye hunandin. Dewlet van semolên çêkirî weke hebûn û nebûna dewletê bi lêv dike. Di dema pêvajoya guherîna makzagona dewletê de devjeniyên mezin li ser sembolên dewletê pêk tên. Di makzagonê de sembolên nayên guherîn henin. Bi rastî jî ew sembolana nîjadperestiya dewletê xuya dikin û heta ew neyên guherîn civateke bi aramî nayê avakirin. Îro bi milyonan Tirk (yên xwe weke Tirk binav dikin) ji bo van sembolan dikarin xwe bikujin. Sembolên sereke li Tirkiyê gelek in. Ez dixwazim çendeka ji wana binav bikim. Ya yekemîn zimanê Tirkiye. Hemû kesên cuda lê bi Tirkî diaxivin dibin hezkiriyê dewletê. Ev maneya ku dewlet di armanca xwe de bi ser ketiye rxuya dike. Lewra axaftina bi Kurdî li Tirkiyê ji bo guherîna netewedewletê biryardêr e. Bi vî awayî Kurd xuya dikin ku, dewlet di armanca xwe de bi ser neketiye. Ya duyem jî, xuya dikin ku, Kurd hukumraniya dewletê êdî qebûl nakin. Ya duyem jî ala dewletê ye. Piraniya siyasiyên Kurdan li Tirkiyê, weke xuya dikin ku ev ala dewletê weke ala xwe qebûl dikin, belam rastiyê bincil dikin, lê civat wiha têdighêje ku ev ala ne sembola netewe-dewletê û inkara neteweya Kurdan e. Her tevgereke Kurd pêwîst e li reng û dengên xwe xwedî derkeve lê ne pêwîst

e ala dewletê înkar bike. Kurd xwedî maf e ku xwe bi ala xwe bide naskirin. Desthilatdariya Başûrê Kurdistanê ala Seddam qebûl nekir û li Kurdistanê bilind nekir. Ew bi xwe bû sembola neqebûlkirina sîstema netewe-dewleta Iraqê. Li bakur em nikarin wiha bikin lê em dikarin xwedî li ala xwe derkevin. Ne ku weke paçikekî beredayî lê weke sembola berxwedana wekheviyê, yeksaniyê û azadiyê. Navê bikaranîna Kurdistanê, li ba Tirkan inkara netewe-dewletê ye. Ji bo ku em rêbidin em dijî struktura netewe-dewletê ne divê em Kurdistanê bikar bînin. Ew jî mafê me yê xwezayî ye. Bi milyonan Kurd navê Kurdistana Iraqê bi zimanê dewletê ve weke bakurê Iraqê binav dikin. Ew kes jî bi navê Kurda têdikoşin, lê bê fedî û şerm dikarin bêjin bakurê Iraqê.

Li gelek cîhî û platforman de Kurdên "enternasyonal" û yên bê helwest dibêjin ew ne neteweperest in. Rast dibêjin lê mixabin vê rastiyê çewt dibêjin. Ez bi xwe ne di wê qeneetê de me ku ew bi zaneyî weke ezê li jêrê bînim zimên xwe binav dikin. Yek nezaniya wan e ya duyem jî newêrekiya wan ya siyasî ye. Kurdên Kurdistaneke serbixwe jî dixwazin ne neteweperest in. Neteweperestî îdeolojiya hêza înkara cudahiyên civatê û înkara neteweyên cuda ye. Herwiha neteweperestî perspektifeke dijî netewe, kêmneteweyên serwer e û parastina netewe-dewleta nîjadperest e. Ez neteweperşetiyê wiha dizanim. Lê ez bawer nakim ku siyasetmedarên Kurd jî wiha şîrove dikin. Ma Kurdan kîjan etnîsîte, kîjan netewe, Kîjan ziman û ol înkar kiriye ku bibin neteweperest. Kurd tenê wekheviya netewa diparêzin û mafê Kurdan jî di vê çerçoweyê de dixwazin. Kurdekî sosyalîst ku serxwebûna Kurdistanê dixwaze çawa dikare weke neteweperest bête binavkirin. Nîştîman perwerî, neteweperwerî jî heye ku ji neteweperestiyê cudatire û bi xwe demokratîke.

Çanda Kurd li Rojhilata Navîn û nemaze li Tirkiyê hatiye polîtîzekirin. Sedemên vê polîtizekirinê helwesta înkariya dewletên dagîkerin. Hemû reng û dengên Kurdî, elfabeya Kurdî, erdnîgariya Kurdî, zimanê Kurdî, dîroka Kurdî hemû polîtîze bûne. Lewra hemû sembolên neteweya Kurd in û bikaranîna wan dijî netewe-dewleta dagirker têne bilêvkirin. Îro ji hemû rojan bêtir Kurd weke neteweyekê tevdigerin lê di qada bikaranîna reng û dengên xwe de lawaz in. Bikaranîna van sembolan şan, erk û watiniya nivşê meye û divê em bi serbilindî vî karê xwe bicîh bikin.

# VII
# KURDISTAN

Bingeha perçekirina Kurdistanê û peymana 1639'an ya Qesrî Şîrîn.

Dema ku em vê peymanê tînin zimên weke mirov penêr bi kêrê jêkirin dibînin û dibên Kurdistan bi vê peymanê perçe bû. Rastiyeke vê gotine heye. Lewra peymaneke wiha di navbeyna Osmaniyan û Sefawiyan de çêbûye. Kurdan bi milyon caran ev anîne zimên. Demjimara vê peymanê jî weke tê gotin ji sala 1639'e. Lê ev peyman ne peymaneke bi her awayî temam bû. Ji herdû aliya jî vegilî hebûn û loma jî piştî vê peymanê bi dehan caran herdû dewlet bi nûnerên Rûsan û Îngilîzan ve rûniştine û peyman ji nû va di ber çavan re derbas kirine û guhertine. Civînên nû ji sala 1727'an ve dest pê dike û heta sala 1865'an berdewam dike. Dawî di sala 1850-52'an de li Petersburgê ji bo nexşeyekê ya sînor çêbikin dicivin, lê ev nexşe di sala 1865'an de temam dibe û ji aliyê herdu dewletan ve weke prensîb tê qebûlkirin. Lê vegiliyê Osmaniyan heta sala 1875'an berdewam dike û dawî di vê demê de bi şert qebûl dike û binê vê peymanê îmze dike. Lê dîsa jî dem bi dem ta sala 1912'an ev civînên li ser pirsa sînorî berdewam dikin. Di van civînên piştî peymanê de gelek cîh hatine guherîn. Peymana berê weke sînorê hatibû gotin ji nû ve hate vejandin. Sînor weke berê neman. Loma jî divê em vê peymanê tenê weke peyman bînin zimên. Di jiyanê de ev sînor heta 1875'an bi cîh nebûye. Her dem guherînek pêk hatiye û gelek caran jî şer di navbeyna herdû dewletan de li ser pirsa sînorî derketiye û loma jî ji nûva civiyane û biryarên nû wergirtine.

Pirsa Kurdan nebûye pirseke girîng ya mijara van civînan û vîn û hesta Kurdan nedane ber çavan. Bi qasî Osmanî û Sefawî tawanbar in

û bê dadwerin her wiha Ingilîz û Rûs jî weke serkêşên wan bêdadwer in û yên bêne tawanbar kirin jî ew bixwenin. Lewra ew Ji wan bêtir tawanbar, û bêdadwer in. Ji sala 1639'an heta sala 1912'an bi dehan serhildanên Kurdan pêk hatine. Bi qirkirinên mezin ve ev serhildan têkçûne. Hay û bayê Îngilîzan û Rûsan ji van serhildanan hebû. Gelek caran jî bi alîkariya wan herdû dewletana van serhildanên Kurdan têk birine. Loma jî tawanbarên mezin herdû dewlet bi xwe ne.[142]

Pirsa Lozanê (Lausanne) sala1923'ê ya ku em dibêjin Kurdistan kiriye 4 perçe jî weke peymana sala 1639'an bi gelek vegilî yên Îngilîzan û Tirkan ve hetanî sala 1926'an berdewam kiriye. Di vê pêvajoyê de jî dîsa ji peymana Sewrê heta dawiya peymana Lozanê Kurdan bi dehan caran serî hildane û van sînorên bêdadwer qebûl nekirine. Lê mixabin kesekî daxwaz û hêviyên Kurdan nebihîstine. Dema daxwazên wan hatine zimên jî li dijî wan şer kirine û daxwazên Kurdan ku bi serhildanên xwe ve dianîn zimên ji aliyên van hêzên herêmî û yên navneteweyî ve bi zilm û bi şîdetê hatine tefandin. Van hêzên zordar bêtirîn hêzên dereke yên biyaniyên vê herêmê ne û hêzên kolonyalîst in. Tawanbarên sereke Ingilîz, Fransiz û Emerîkî ne û dû re Ji Rûs û Sowyet in.

Îro jî Kurdistan çar perçeye û îro dîsa wekî ji 500 salan berê heta îro, Kurd ji aliyekî ve peymanên navneteweyî yên Kurdistan perçekirine qebûl nekirine/nakin û ji aliyekî din ve jî, ji bo Kurdistaneke yekgirtî û serbixwe têdikoşin. Xewn û xeyalên Kurdistaneke yekgirtî û serbixwe ji hişmendiya Kurdan derneketiye û heta îro jî di helwesta Kurdan de weke vîn û hesta Kurdan ya neteweyî berdewam dike.

Îro beşeke Kurdan li ser xaka xwe azad dijîn. Dewleta xwe ya herêmî ava kirine. Ev bidestxistin hêviya Kurdistana mezin bi vîn û hesta Kurdan ve geştir dike. Kurd li Rojhilata Navîn ne weke neteweyeke azad li ser xaka xwe dijîn. Kurd weke hercar îro jî ji bo rûxandina sînorên bêdadwer têdikoşin. Ango Kurd weke neteweyeke serdemî ji bo mafê xwe yê rewa bi daxwazên serdemî ve têdikoşin û dixwazin weke hemû neteweyên dinyayê ku weke neteweyeke mezin, xwedî ziman, dîrok û xwedî xak li Rojhilata Navîn weke Qedafî dibêje di bin

142 *Kürtler, Türkler ve Araplar, Kuzey Doğu Irakta Siyaset, Sayahat ve İnceleme* 1919-1925- C-J Edmonds, Weşanên Avesta, 2003.

şaxê roja Rojhilata Navîn de, bi azadî û bextewar bijîn. Ji îro û pê ve êdî tu hêz nikare daxwazên Kurdan piştguh bikin. Kurd li Rojhilata Navîn hêzeke dînamîk, hêzeke guherparêz, hêzeke serdemî nin û daxwazên wan û yên hejar û azadîxwazên Rojhilata Navîn li hev dikin.

Paradîgmaya Pêla 3'yem ji bo Kurdan pêvajoyeke pîroz pêşkêş dike û derfetên mezin berdest dike. Bi hêviya ku Kurd di vê pêvajoya nû de ku weke derfetekê radestî me dike, bikaribin ji paradîgmaya 1'em û 2'yem sûd wergirin û bikaribin Paradîgmaya Pêla 3'yem di xizmeta azadiya netewa xwe de weke derfet bikar bînin û weke hemû neteweyên dinyayê bextewar li ser xaka xwe bi azadî bijîn.

Îro di vê sedsala me ya serdemî ya sedsala 21'ê de careke din neviyên Hulagû, neviyên Pehlewiyan û neviyên Emewiyan hemi nakokiyên xwe dane aliyekî û li ser qedera Kurdan destên xwe dixin destên hev û hevdû ji bo hovîtiya li dijî Kurdan pîroz dikin.

Kurd ne Kurdên 700 salan berê ne. Kurd êdî dev ji vîna xwe bernadin. Hesta kurdî û Kurdistanî her roj bi hêz dibe. Lê mixabin hê jî Kurd li hêviya Vîstaspa ye.[143] Weke Zaraduşt dibêje, "gotinên me yên îro ne li gor guhê vê civatê ye" Gotinên me bawerim li gor baweriya aliyekî civatê hê weke "Maîdyu Mah" tête dîtin.[144]

Lê kî çi dibêje bila bibêje, nêrînên ku yên îro em tînin zimên li dinyayê, weke çareseriyên yektane û weke hêzeke ramanî ya berbiçav e. Paradîgmaya pêla 3'yem ramana çareseriya pirsgirêka Kurdistanê û ya guherîna struktura Rojhilata Navîn e û çareseriya hejar, kedkar û kêmneteweyên bindest yên Rojhilata Navîn e. çareseriya azadiya gelan e.

## Nasnameya Kurdî ya neteweyî

Yek ji encamên şerê cîhanê encama perçebûna Kurdistanê ye. Bi vê perçebûnê ve girêdayî, civatên Kurdan bi serweriya siyaset û rejîmên

---

143 Vistaspa: Prenseyê Împaratoriya Medê ye. Ewî Ola Zaraduştrayî bihêz kiriye.

144 Maidyû Mah; Kesayetiyeke yekemîne ku baweriya xwe bi Axûra Mazda aniye. Ango Ola Kurdan ya kevnar e. Di dîrokê de ew weke Ezîzê Zaraduştiya hatiye danasîn.

cuda ve form girtine. Siyaset û çanda Kurd li gor rejîmên dagirker bi şêweyên cuda di rojeva welat de cîh girtine. Encama vê diyardeyê rûxandina yekgirtina Kurdan ya siyasî û çandî bi xwe re aniye. Mirov pir bi asanî dikare bêje, ji 1918'an û vir de li Kurdistana perçebûyî, tevger û bizavên cuda hatine avakirin û bi reng û bi dengên cuda ve çalak bûne. Armanc û destûrên xwe li gor rewşa rejîm û serweriya welatên dagirker afirandine. Yekîtiya xaka Kurdistanê nebûye armanca yek serhildanên Kurdan. Tevgerên neteweyî li her perçeyekî li gor serweriya siyasiya wî welatî hatiye hunandin. Di pêvajoya têkoşîna vê siyasetê de mijara bidestxistina xweseriya herêmî ciyekî girîng wergirtiye. Bi vê mebestê ve girêdayî jî Kurdan serî hildane, şerê çekdarî li darxistine û gelek carî jî têk çûne û serhildanên wan bi qetlîamên mezin ve encam bûne. Vê helwesta Kurdan, bûye sedem û encama çand û şêweyên xebata neteweyî ya perçeparêzî (herêmparêzî). Lê hevbeşiyeke sereke di têkoşîna netewayetiya Kurdan de weke çand cîh girtiye. Kurdan li ser xaka xwe ya perçebûyî, li herçar perçeyên Kurdistanê, li dijî helwestên tinekirina nasnameya neteweyî (Kurdî) û li dijî bi darê zorê qebûlkirina nasnameya "netewayetiya biyanî" serî hildane. Di van serhildanan de, karektera sereke dîsa karektera herêmî û eşîrî ye. Sîstema şêxîtî çiqas xwestibe pêşiya vê karekterê birûxîne jî dîsa biser neketiye. Lewra çanda sîstema mîrekî û eşîrî ya sedsalan di nava Kurdan de cîh girtibû û sîstema şêxîtî tenê bêyî bihêzkirina hastên neteweyî nikaribû pişta vê çanda mîrekî û eşîriyê bişkîne.

Ji vê pêvajoyê û virde têkoşîna neteweya Kurd, bi tekoşîna siyaseta meşrûkirina nasnameya neteweyî (Kurdî) ve bûye yek. Ev netewayetiya Kurdan her çiqas ne ji bo avakirina dewleta neteweyî be jî, dîsa jî ew bi xwe encama avakirina dewleta modern ya dewlet-netewe ye ku bingehiya xwe ji Ewropayê wergirtiye. Ji şerê cîhanê yê yekem ve, netewayetiya Kurd, li her çar perçeyên Kurdistanê, di nava civatên pirçandî û pirneteweyî de, ne tenê di pêvajoya avakirina netewe-dewletê de ku bi yek neteweyî ve dihate binavkirin, lê herwiha di xebata bihêzkirina vê helwesta netewe-dewletê de jî bûye pirsgirêk û kelema sereke ya van dewletên dagirker.

Înkarkirin û armanca tunekirina nasnameya gelê Kurd, di pêvajoya avakirina dewletên neteweyî- ango netewe-dewletê de, bûye diyarde-

yeke bivê nevê. Lewra bêyî înkarkirin û bêyî şerekî tinekirina nasnameya Kurdan, avakirina netewe-dewletê ne mumkun bû.

Pêvajoya netewayetiya van welatên dagirker û pêvajoya avakirina dewletên neteweyî min li jor aniye zimên. Loma jî di nava van dewletên pirneteweyî de tenê neteweya Kurd, avakirina dewlet-netewe meşrû nedîtiye û li dijî vê pêvajoyê serî hilda ye. Di van serhildanan de gelê Kurd, bi bobelata perçebûyî ve ji yekgirtineke helwesta neteweyî bêpar, serhildanên herêmî (perçeyî) li dar xistine û armancên xwe jî li gor rewşa wan welatan anîne zimên. Lê em nikarin vê helwesta neteweya Kurd, tenê bi perçebûna Kurdistanê ve girê bidin. Wê gave em ji mêjûya dîrokî bidûrketî vê pêvajoyê şîrove dikin. Divê em bikaribin bînin bîra xwe û bibînin ku ev helwesta perçeyî, herêmî, çiqas bi perçebûna Kurdistanê ve girêdayî be, hewqas jî bi çand û sîstema mirata Mîrekî û eşîretiya Kurdan û herêm ûlehçeyên zimnaî ve jî girêdayî ye. Ango tevgera neteweyî ne li ser bingeha neteweyeke yekgirtî hatiye hunandin.

Vê pêvajoya bêdadwer li dewletên dagirker, bi afirandina yek neteweyî û bi ideolojiya nîjadperestî ve encam daye û bûye sedema înkarkirina avakirina civatên pirçandî û pirneteweyî. Di vê pêvajoya bêdadwer de nîjadperestî bûye çanda neteweya serdest ya van dewletên dagirker.

Vê çanda înkarê û şêweyên şîdetê bi armanca tunekirina nasnameya neteweya Kurd ve encam daye, dîsa vê pêvajoya dirêj li tevgera neteweyî wiha kiriye kû, êdî nikaribe konsensuseke hevbeş ya neteweyî ava bike. Vê çanda înkarê bandoreke neyênî li ser neteweyetiya Kurd kiriye.Vê bandora zordar, ji dema derketina neteweya Kurd, ango ji dema zaroktiya netewayetiya Kurdan ve dest pê kiriye û heta îro jî berdewam dike. Berdewamiya bandora vê pêvajoya bêdadwer û zordar, encamên neyênî di nava tevgera neteweya Kurd de afirandiye. Vê pêvajoya dirêj bûye encama damezrandina tevgerên li gor herêman. Îro mixabin em nikarin nasnameya neteweyî ya Kurd bi konsensuseke hevbeşiya neteweyî binav bikin. Kurd li Rojhilata Navîn ji netewayetiyeke yekgirtî bêpar in. Tenê weke min li jorê aniye zimên, hevbeşiyeke Kurdan ya parastina nasnameya Kurdî heye û ev jî dikare bibe mebest û sedema avahiya neteweyeke yekgirtî. Tevgera neteweyî ya Kurd, bi mebesta vê hevbeşiyê, dikare nasnameya neteweyî li perçeyên xwe

biparêze. Tevgera neteweyî li gor perçebûna Kurdistanê hatiye hunandin û lewra jî nikare xwe ji berjewendiyên herêmî biparêze. Îro başûrê Kurdistanê azad e. Ev azadî erêniyeke yekta ya ji bo helwesta malbenda neteweyeke yekgirtî weke derfet diafirîne û mecalên azadiya perçeyên din jî dixe rojeva dewletên dagirker. Lê dive em ji bîr nekin kû, helwestên eşîrî û herêmî yên tevgera başûrê Kurdistanê, ji tevgera neteweyî ya Kurdistanî bidûr dixe. Ger başûr nebe bingeha nasnameya netewayetiya Kurdî ya yekgirtî û xwe ji berjewendiyên eşîrî û herêmî neparêze, wê bi destê xwe mirina nasnameya Kurdî amade bike. Lewra raman û kirdarên vî perçeyê azad nûmûneya sereke ya neteweya Kurd e. Ev jî pêvajoyeke hestiyar û mesûliyeteke mêjûyî dide ser mile desthilatdariya vî perçeyî.

Li bakurê Kurdistanê tevgera neteweyî ji bandora vê derfetê û helwesta wê ve bidûrketî berfireh dibe. Erênî û neyêniyên vê tevgera bakur pêwîstî devjeniyên cuda nin. Li bakur tevgera Kurd bi ramanên **"bidestxistina mafê mumkun"**ve tête vejandin. Tendensên girîng yên tevgera bakur bi pêngavên zelalkirina daxwazên xwe ve berfireh dibe û gavên mezin tavêje. Bakur weke perçeyê mezin yê neteweya Kurd, bi pêşketina xwe ya civatî û aborî bi helwest û vîzyona Kurdistanî, dikare pêşkêşiya neteweya Kurdistanê bi tevayî bike. Ezê li jêrê bînim zimên, lê divê bi çend gotinan be jî bînim zimên ku îro, bi hemû pêşveçûnên girîng li bakurê Kurdistanê bi gelemperî tevgera bakur, bi navê modernîteyê, bi hin raman û hevokan ve çanda têkoşîna neteweyî lawaz dike. Bi kurtî tevgera Kurd ji vizyona perçeyî, herêmî û partîtî hînê jî azad nebûye.

Tevgera neteweyî û demokratîk ya gelên Kurdistanê xwe ji vîzyona perçeyî, herêmî, eşîrtî û partîtî yê neweşîne, wê nikaribe konsensusa neteweyî û gelêrî bi cîh bike. Doh û îro jî, diyardeyên, piştа tevgera neteweya Kurd şikandiye mixabin van hevok û bêjeyên li jorê hatine binavkirin in.

### Neguherîna mêjûyî ya siyaseta nasnameya Kurdî

Nêzîkî 200 saliye ku Kurd bi siyaseta berjewendiya herêmî ve doza xwe ya neteweyî di çerçoweya perçeyê xwe de tînin zimên û li ser vê zemîna siyasî têdikoşin. Bingeha vê têkoşîna perçeyî, bi daxwazên

xweseriyên herêmî ve hatine xemilandin û dijî berjewendî û hestên nasnameya netewayetiya yekgirtî ketîne. Ev bi xwe lawaziya mêjûyî û tevgerî ya neteweyî ye. Vê lawaziya neteweyî, weke berevajî tevgera serdemî tê şîrovekirin û loma jî xwe neguheriye. Vê karektera tevgera neteweyî, di derbirîna nasnameya neteweyî de jî dertê rojevê û weke pirsgirêkeke sereke di rojeva daxwaz û têkoşîna neteweyî de cîh digre. Bêgûman bi vê mebestê ve ez nabêjim nasnameyên neteweyî nayên guherîn, berevajî, ez dibêjim nasnameya neteweyî herdem di nava guherîneke xwezayî de xwe nuh dike. Erênî û neyêniyên vê guherînê hene û pêşiya vê guherînê jî nayê girtin. Lê vegiliya min, ne guherîna nasnameya Kurd e. Bi ya min nasnameya Kurd, ya gelekî dereng yan jî nayê guherîn. Aliyê duyem yê guherîna nasnameya neteweyî li gelek aliyê Kurdistanê li gor çand û hevokên biyanî têne vejandin.

Bingeha hemû hewldanên tevgera Kurd, li ser çi navî û bi çi awayî dibe bila bibe, ji bo îsbatkirina nasnameya Kurdî weke neteweyeke serdemî ye, hewildanên xebata çanda hevbeş e, hewildanên afirandina konsensuseke neteweyî ye. Ev hewildanên tevgera neteweyî bi xwe xuya dike ku cudahî û pirsgirêkên neteweyî yên navxweyî bingeha esareta netewa Kurd e. Di şîrovekirina neteweyî de tevgera Kurd, di nava xwe de konsensuseke hevbeş ava nekiriye. Ev jî dibe sedemên şîrovekirinên cuda yên nasnameya Kurdî û dibe sedemên daxwaz û helwestên cuda. Bi gelemperî hewildanên tevgera Kurd yên ji bo afirandina hevbeşiya nasnameya Kurdî dest pê kiribe jî, mixabin û sed mixabin têr nake û ji avahiya neteweyeke serdemî dûre. Elementên hevbeş yên neteweyeke bêyî xebateke hevbeşî çê nabe. Ne tenê xebat, lê divê di xebata hevbeşî de bicîhkirina elementên hevbeşiya neteweyî sereke bin. Ev jî tê wê wateya ku em, ji berjewendiyên xwe yên herêmî, eşîrî, lehçeyî, olî û partîtî fedekarî bikin. Rewşa îro ya nasnameya Kurdî ji radestkirina van fedekariyan dûr e. Lewra di vê pêvajoya bidestxistina elementên neteweyî de lîberalîzma neteweyî pêwîst e. Ji bîr û rayên cuda re rêzgirtin pêngava sereke ye. Parastina derbirîna ramaniya azad bingeha tevgera gelêrî ye.

**Cudahiyeke xwezayî di nasnameya netewayetiya Kurdî de heye û vê xwezayiya netewayetiya Kurd heta îro berdewam dike. Nasnameya neteweya Kurd bi lehçeyên xwe yên zimanî ku gelek carî mirov**

**dikare weke zimanên cuda binav bike, bi ol û terîqetên xwe yên cuda, ku di kuraniya dîrokê de şer û pevçûnên mezin afirandîne, bi herêmên xwe yên di serhildanên dijî zordaran de û di şerê êl û eşîrî de deng vedane û di çanda herêmî de şaxê xwe bi kûranî berdane, ne weke nasnameya neteweyekê dertê rojevê. Ger van cudahiyên netewa Kurd, bi zaneyî bête hunandin weke dewlemendiyên yekta ne. Lê ji aliyê din ve jî weke astangên sereke yên pêşîgirtina avahiya neteweyeke serdemî ne.**

Piştî hewqas bûyer û bobelatan, hînê jî van cudahiyên xwezayî ku dibin astengên hevbeşiya nasnameya neteweyî û di her momentê de dertên pêşiya xebat û tekoşîna gelêrî, tevgera Kurdî dixe nava dualîzmeke mezin.

## Serdemiya netewayetî û nasnameya netewayetiya Kurdî

"Netewayetiya Ewropayê, ya klasîkî bi moderníteyê ve girêdayî ango bi civata sivîl û bi hemwelatiya demokratîk ve dest pê kiriye. Berevajî vê, netewayetiya Kurd, bi têkoşîna dijî inkara nasnameya neteweyî dest pê kiriye. Bingeha vê înkarê jî, ji tunekirina civata sivîl û ji tunekirina hemwelatiya demokratîk tê. Ev pêvajo paradoksa asîmîlasyona bi şîdetê ye...Ev paradoks di kuraniya lawaziya nasnameya netewayetiya Kurd de veşartî ye. Vê rewşa ha, di destpêka nasnameya netewayetiya Kurdan de dest pê kiriye û heta îro berdewam dike."[145]

Birêz Abbas Valî vê pirsê bi kuranî şîrove dike û encamê jê derdixe. Di pirsa nasnameya netewayetiya Kurdan de em paradokseke eşkere dibînin. Dewletên dagirker di pêvajoya bidestxistina neteweya dewleta "modern" de, (min di beşa şîrovekirina dewletên dagirkerên Kurdistanê de aniye zimên), înkara nasnameya Kurdî, radestî zordariya şîdeta leşkerî kirine. Lewra li van dewletan, di vê pêvajoya afirandina nasnameya neteweya dewletê de, ya sermayedarî tune bû yan jî sermayedarî weke sîstem lawaz bû. Lawazbûna sîstema sermayedariyê li van welatan, tunebûna sîstema lîberalî bi xwere aniye. Vê nasnameya netewayetiya dewleta nemeşrû, berevajî pêvajoya nasnameya neteweya "modern" ya Ewropayê ye. Li van dewletên nemeşrû, nasnameya

145 Abbas Vali Kovara *Bîr*.

dewletê, ku bi hebûna nasnameya yek neteweyî ve tê bilêvkirin, bi şîdeta leşkerî ve li ser lingan maye û pêşde çûye. Li vê derê etnîsîteya dewletê ya fermî, Ereb, Tirk, Faris bi şîdeta leşkerî ve cîh girtîne û loma jî ne meşrû ne û bingeha avakirina wan bi xwe bêdadwerî ye. Etnîsîteyên nasnameya neteweya dewletê çewt dîtine, weke nimûne etnîsîteya Kurd, ji dergehên dewleta "modern" hatine avêtin û hemû daxwaz û hêviyên wan bi şîdetê ve rû be rû mane. Di nava pêvajoya vê şîdeta dewletê de, hemwelatiya van etnîsîteyên cuda ji holê rabûye. Dewletê meşrûiyeta nasnameya wan ya hemwelatiya dewletê bi yasayî anîbe ziman jî, mercên hemwelatiyê bi yaseya netewayetiya dewletê ve girê daye. Ango qebûlkirina nasnameya dewletê weke merca sereke derketiye pêşiya hemwelatiya mirovên ji neteweyên cuda.

Ev merc û şertên hemwelatiya dewletê, di hukumraniya serweriya dewletê de pir bi eşkereyî xuya dike. Vê serwerî û desthilatdarî ya dewletê xwe daîmî sipartiye yasayên nasnameya dewletê. Li Tirkiyê dewlet û hukumetên wê, ji avakirina komarê heta îro, lê nemaze peymana Lozanê weke yasa qebûl kiriye û kiriye bingeha makzagona netewe-dewletê. Ev proses îro jî berdewame. Tevgera bakur û hêzên "demokrat" û "sivîl" heta bi eşkereyî dijî vê peymanê ranewestin wê nikaribin pêngaveke mezin ji bo demokrasiyê û ji bo wekheviyê peyda bikin. Nemaze tevgera Kurd, divê meşrûiyeta vê peymanê li her derê û di her momentê de têxe rojeva devjeniya têkoşîna neteweyî û demokrasiyê.

Vê prosesa ku ez tînim zimên, her daîm weke şîdeta dewletê derketiye rojevê. Vê şîdeta dewletê, etnîsîteya Kurd marjînal kiriye û hemû riyên modern-sivîl, yasayî, dadwerî, girtiye û tenê alternatîfa rêya şerê çekdarî di destê neteweya Kurd de hiştiye. Lewra şerê çekdarî wêrankirina nasnameya neteweyî bi xwe re aniye. Kurdan jî, ji ber bêpariya mecalên yasayî, vê riya şerê çekdarî bi kar anîne û ev jî bûye sedemê dubarekirina şîdeta dewleta dagirker.

"Van dewletên"modern" arenayên siyasî û neteweyî yên ku Kurd di nava wan de nehatine temsîlkirin" ava kirine.[146]

Ev tedbîra sereke ya dewletê, ku di makzagona xwe de weke serweriya netewe binav kiriye, bi yasayê modern ve xemilandiye. Pir bi

146 Abbas Valî Kovara *Bîr*.

rehetî em dikarin, van yasayan weke yasayên tinekirina neteweya Kurd bi nav bikin. "Heta rewşa pêwendiyên nasnameya Kurd û nasnameya neteweya dewletê (neteweya serwer), neyê guherîn, wê zordariya siyasetê û şîdetê li Kurdistanê bi dawî neyê."[147]

Vê prosesa guherîna pêwendiyên nasnameya etnîsîteyên cuda, îro bi peymana neteweya ya wekheviyê û yeksaniyê ve girêdayî dikare bicîh bibe. Ango pêwîst e, dewlet berjewendiyên hemû netewan bide ber çav û peymana hevbeş têxe rojeva van neteweyên cuda. Bi vê peymana demokratîk ve jî hemwelatiya dewletê ya demokratîk bicîh bike. Ev peyman makzagona dewletê bi xwe ye. Makzagona dewletê li ser bingeha bêaliya dewletê, û li ser bingeha pirçandî û pirneteweyî ya civatê neyê amadekirin wê li van dewletana aramî bicîh nebe. Îro têkoşîna tevgera neteweya Kurd li her çar perçeyî, bi nûansên ji hev cuda, di çerçoweya vê siyasetê de berdewam dike.

Ango têkoşîna tevgera neteweya Kurd, li ser bingeha guherîn û ji nû ve şîrovekirina makzagona dewletê tête vejandin.

Lê têkoşîn û daxwaza tevgera Kurd, di derbarê vê stratejiyê de jî ne zelal û ronî ye. Nemaze li bakurê Kurdistanê ev pirs weke pirsa sereke dertê pêşiya tevgera Kurd. Bêjeya "bidestxistina mafê mumkun" di dirêjahiya têkoşîna neteweyî de, bi guherîna stratejiya tevgerê ya demî ve, bêîstiqrariyeke berbiçav û kaoseke ya hevok û bêjeyên siyasî dikare peyda dike. Lê ev kaos dikare rê û rêbazên sereke jî bi cîh bike. Divê em vê pêvajoyê weke proseseke demî binav bikin. **Lewra daxwazên aloz, sedema nasnameya aloz e û nasnameya aloz jî encama daxwazên aloz e. Vê aloziyê li bakurê Kurdistanê em bi zelalî dibînin.**

Li Tirkiyê û li bakurê Kurdistanê, têkoşîna neteweyî ji bo bidestxistina mafê çanda Kurdî û daxwazên mafên nasnameya Kurdî, xwe tavêje bextê nasnameya bi sedsalan ve şolîkirî û alozkirî. Vê têkoşîna ji bo mafê bidestxistina nasnameya Kurdî, li gor realîteya strukturî ya dewletê tête vejandin û berfireh dibe. Her roj ev têkoşîn bi guherîna daxwazên cuda ve, nasnameya Kurdî dixe nava lêgerîneke bêhempa.

Li Tirkiyê, Îranê û li Sûriyê, têkoşîna ji bo demokrasiyê, ji nêz ve bi daxwazên nasnameya Kurdî ve girêdayî ye. **Vê têkoşîna ji bo**

147 Abbas Valî Kovara *Bîr.*

**demokrasiyê, guherîna serweriya etnîsîteya serwer yan jî neteweya dewletê bi taybetî naxe rojeva devjeniyê.** Têkoşîna hêzên "demokrat" yên sivîl, lîberal, sosyalîst, olperest û hêzên pêşeyî tenê di nava atmosfera çerçoweya serweriya dewletê û hukumraniya etnîsîteya serwer de têne sînorkirin. **Li van dewletana hêza "demokrat" serweriya siyasî û îdarî ya etnîsîteya serwer xwezayî dibînin.** Li Tirkiyê, **vê hêza "demokrat" di çareseriya pirsgirêka Kurdistanê de, guherîna sîstema dewletê ya Kemalîst naxe rojeva têkoşîna xwe.** Hînê jî pirsa Kurdistanê weke pirsa çanda cuda binav dike û ne weke pirsa neteweyekê. Pêşniyarê çareseriyê jî di vê çerçoweyê de pêşkêşî tevgera Kurd dike. Lê tevgera Kurd bêgûman dijî vê helwestê radiweste û mafê Kurdan weke mafê gelêrî û xakî bilêv dike.

Li bakurê Kurdistanê îro pêdiviya konsensuseke neteweyî bûye pirsa sereke. Lê ji ber lawaziya hestên netewî û lawaziya derbirîna ramanên azad, pir bi asanî pêşiya hevbeşiya neteweyî tê girtin. Daxwazên guherîna yasayên dewletê, bi daxwazên Kurdan yên serweriya siyasî, aborî, îdarî, ewlekarî û perwerdeyî ve neyê girêdan û neyê hunandin, wê daxwazên guherînê nikaribin bersiva hêvî û hestên netewa Kurd bidin.

### Nasnameya Kurdî berê û îro

Ezê nasnameya Kurdî ji dema rûxandina dewleta Osmaniyan ve dest pê bikim. Nasnameya Kurdî di dema dewleta Osmanî de jî ne yekperçeyî bû. Hewildanên yekperçeyî hebin jî weke serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî, weke hewildana Mewlana Îdrîs, lê ew jî nebûnin nimûneyên sereke.

Di pêvajoya şerê cîhanî yê yekem de û di dema rûxandin û payêkirina dewleta Osmanî de, tenê Kurdan nikaribû, mafê xwe yê neteweyî bidest bixin. Bêgûman rewşa navneteweyî ji bo neteweyên dinê, weke Tirk, Ereb û neteweyên Balkanî ji rewşa Kurdan baştir bûn. Lê tenê ev sedem nabe encama esareta Kurdan. Di vê prosesa perçebûna dewleta Osmanî de, Kurdan destê Osmaniyan girtin. Civata Kurd di vê pêvajoyê de ne şiyar bû. Bîr û raya neteweyî di nava Kurdan de pir lawaz bû. Neteweperwerên Kurdan jî li hev nedikirin. Komele

û tevgerên neteweyî ne gelêrî bûn. Elîta prens, eşîr û şêxên Kurdan ji bo nasnameyeke yekgirtî erkên xwe bi cîh neanîn. Kurd ji serokekî neteweyî kû, bikaribe serokeşîr û elîta neteweperwerên Kurd li hev rabigre, bêpar bûn.

Piştî serweriya Osmaniyan di 1918'an de xwe radestî dewletên îtîlaf kir, Kurd têgihîştin ku derfet ji dest berda ne û ji nû va ketin lêgerîna çareseriyan. Neteweperwerên Kurdan dest bi hunandina hêviyên xwe kirin. Ew bi xwe jî ne li ser hev bûn û hêviyên wan cuda bûn. Beşekî wan bi ciwanên Osmaniyan re tevdiliviyan û dibûn aletên parastina neteweya Tirk. Beşekî din bi Sultanê Osmaniyan re dijî dewletên îtîlaf derdiketin. Ji van ronakbîrên Kurd beşeke biçûk, elîteke xweser pirsa Kurdistanê dixistin rojeva neteweyî û navneteweyî û mafê Kurdan diparastin. Konsensuseke neteweyî di nava vê elîtê de jî tunebû. Neteweperwerên Kurdan, bê îstîqrar tevdiliviyan û bandora wan li ser gelê Kurd tunebûn.

Di vê pêvajoyê de, Mustafa Kemal, di nava Îttîhadiyan de dest bi amadeyiya avakirina dewleta Tirk kir. Pêwendiyên xwe ji Sultan nebirî, lê bi xweseriyeke taybet, berê xwe dida Kurdan û amadeyiyên berxwedaneke neteweyî dikir. Mustafa Kemal hestiyên bê goşt tavêt ber serokeşîrên Kurdan û wan di nava tevgera xwe de bicîh dikir. Eşîrên Kurdan, bêyî hestiyariya neteweyî, berjewendiyên xwe yên eşîrî û herêmî dane pêş û alîkariya Mustafa Kemal kirin. Gelekan ji wan dijî tevgera neteweyî rawestiyan û bûn sedemên lawaziya tevgera neteweya Kurd.

Nasnameya Tirk, di vê pêvajoyê de ne weke ya Kurdan zelal bû. Lê dîsa jî tevgera neteweperestên Tirk di Anatolyayê de bû hêza mezin. Ji xwe Kurd hêzperest in û lewra jî dane dû Mustafa kemal.

"Ataturk, bawerî bi nasnameyeke nû ya Tirk dikir. Ewî dizanibû cîhê vê nasnameyê, ne wan cîhên di bin dagiriya dewletên îtîlaf de bûn. Ango ne xaka Sûriye bû. (Misir, Filistîn, heta Iraq jî.N.A.). Ji bo wî Anatolya cîhê vê nasnameya nû bû. Li vî cîhî wî dikaribû, bi ewlekarî bijî. Kemal xaka Kurdistanê jî di nava vî cîhê dewleta nû de dibîne, ango weke perçeyek ji dewleta nû."[148]

148 Sabah Galib, Kovara *Bîr*.

Mustafa kemal û hevalên xwe, ji serî de Tirkiye weke dewleta yekneteweyî bilêv dikirin. Ev netewe jî neteweya Tirk bû. Ger Kurdan alîkariya Kemal nekiribaya, îro dewletek bi navê dewleta Tirk tunebû. Ê ev dewlet kir bela serê Kurdan dîsa jî Kurd bi xwe ne, ango eşîr û elîta Kurdan ya xwefroş e.

**3 (sê) tiştan alîkariya Tirkan kir.**

1-Ola Îslamê: Bi vê riyê Kurd hatine xapandin. Ataturk, li her derê Kurdistanê ola Îslamî weke alet bikar aniye. Civata Kurd jî civateke olperest bû. Nakokiyên navbeyna Kurdan û kêmneteweyên olî û neteweyî yên Îsewiyan weke Ermen, Asur, Suryan û Keldanan kûr kirin. Kurdên Musliman jî bi navê biratiya olî aliyê Tirkan girtin. Di dema Osmaniyan û ya Ittihadiyan û heta di dema Ataturk de hin eşîrên Kurdan bûne hevkarê qetilkirina wan kêmneteweyana.

2- Eşîretiya Kurdan û lawaziya hest û giyaniya neteweyî: Eşîrên Kurdan berjewendiyên xwe ji bejewendiyên netewayetiyê girîngtir dîtine. Ji xwe bîr û rayên netewayetî nuh dest pê kiribû û Kurd ji giyaniya neteweyî bêpar bûn.

3- Peymana bi Bolşewîkan re: Sowyetê, ji bo Ermenîstan û Kurdistan neyê avakirin, dijî dewletên mutefîk bi Kemal re peyman çêkiribûn. Lewra dijî Kurdan Kemal diparastin.

Kurd di siyaseta dinyayê de ne xwedî raman bûn. Serokên Kurdan ne xwedî vizyoneke neteweyî bûn. Nasnameya Kurdî di rojeva siyaseta Kurdan de ciyekî girîng nedigirt. Herêmparêzî, eşîretparêzî, olperestî di nava Kurdan de nasnameya sereke bû. Kurd, ji bo dewleteke serbixwe û neteweyî ne amade bûn. Civata Kurd ji aletên avakirina dewleteke neteweyî bêpar bûn. Îro di sedsala 21'ê de jî civata Kurdan, Başûra azad jî di nav de, ji hest û vîn û amadeyiyên dewleta neteweyî dûr in. Mustafa Kemal wê demê vê rewşa Kurdan rast xwend û wan kir hevkarê ramanên xwe.

Di dema peymana sewrê de Kurdan îradeyeke yekgirtî pêk neanînîn. Di dema Lozanê de ji nû va dest bi serhildanan kirin lê dereng mabûn. Dinyayê sînorên dewleta Tirk qebûl kiribû, peymanên navneteweyî rê li ber tevgereke Kurdî digirt, dewletên mezin li pişta

dewleta Tirk bûn û Kurdan ji nû va dixwestin vê dewletê ji nû va bivejînin. Mixabin weke hercar vê carê jî Kurd dereng man. Li vir pirsa sereke pirsa nasnameya netewayetiya Kurd e û bingeha esareta Kurdistanê jî dîsa ev nasnameya perçebûyî û herêmî ye.

Ji dema destpêka nasnameya netewayetiya Kurdan heta îro, bidestketina nasnameya Kurdî ya herî mezin, dewleta Federe ya Başûrê Kurdistanê ye. Başûrê Kurdistanê bingeha netewayetiya Kurd bû, îro jî, bingeha derfeta avakirina neteweyeke yekgirtî ye. Lê mixabin desthilatdarî û ronakbîriya başûr, bi hemû erêniyên xwe ve di nava 20 salên azadiyê de, vê vîna neteweyî nexistiye rojeva siyaseta tevgera neteweyî. Bê gûman û bê şik, Başûrê Kurdistanê bi destxistinên xwe ve bandoreke erênî li ser tevgera neteweyî kiriye. Lê ji ber pirsgirêka nasnameya neteweyî ya li başûr, ku bi bandora eşîrî, herêmî ve aloz bûye, nikaribûye bersiva nasnameya neteweyî ya tevayiya Kurdistanê bide.

## Di dema Osmaniyan de nasnameya Kurdî

Nasnameya Kurdî, heta sedsala 1514'an bi nasnameya Îranî ve dihate binavkirin. Serweriya Mîrekên Kurdan û serweriya piraniya xaka Kurdistanê di bin serweriya rejîmên Îraniyan de bûn.

Vê serweriya Îraniyan, ji sedsala 10'an ve dest pê kiribû û heta sedsala 1514'an ve dewam kir. Ji xwe min rewşa Kurdan di çerçoweya dewleta Îraniyan de aniye zimên. Li vir tenê dixwazim li ser nasnameya Kurdî rawestim.

Dewleta Sefawiyan, di şerê bi Osmaniyan re di 1514'an de xaka piraniya Kurdistanê ji dest berdan. Osmanî bûn serwerên Mîrek û xaka Kurdistanê. Ev jî bû encama peymana Qesrî Şîrîn ya 1639'an. Min ev jî bi dirêjayî aniye zimên. Vê rewşa Kurdan heta belavbûna dewleta Osmanî -1918'an berdewam kir. Kurd bi sîstema mîrekî ve jiyana xwe berdewam kirin. Min ev jî di beşa Osmaniyan de aniye zimên.

Fîlozofê Kurdperwerê Mezin Ehmedê Xanî, vê dema perçekirina Kurdistanê bi destana Mem û Zînê ve aniye zimên. Yekîtiya Kurdan xwestiye. Pirî di bin bandora vê perçekirinê de maye û bangî Kurdan kiriye. Lê bi ya min bangî Mîrekên Kurdan kiriye. Daxwazên wî daxwazên avakirina dewleta Kurdî ye (împaratoreke Kurd). Gelek

nivîskarên Kurdan vê helwesta Ehmedê Xanî weke destpêka netewayetiya Kurdan dibînin. Lê gelek ji wana jî dijî "yekîtiya Hukumeta Mîrekên Kurdan" derdikevin. Mewlana Idrîs hukumeta Mîrekan ava kir. Bawerim Ehmedê Xanî ji Mewlana Idrîs bêtir împaratoriyeke mezintir û Kurdserwer dixwest. Lê herdûyan jî bi armanca yekgirtina Kurdan ve gav avêtine. Ehmedê Xanî Kurdperwer e lê ne, neteweperwer e. Lewma di dema wî de neteweperestî û ramanên neteweperestî tineye. Împaratoriyên wê demê hatine avakirin, bi navê kesan, ol û qabîleyan hatine avakirin. Lê gelekî balkêş e ku Ehmedê xanî împaratoriya Kurdan dixwaze. Dewletek bi navê Kurdan û weke "netewayetî" jî gelên cîran weke Koleyên Kurdan dibîne. Nûveyên netewayetî di ramanên Xanî de henin lê bi tevayî daxwazên wî ne daxwazên neteweyî ne. Ger wiha be Xanî bi xwe navê Farisan dide Wê gavê dewleta Sefawî dewleteke neteweyî ye. Desthilatdariya gelêrî di daxwazên wî de tineye. Serweriya Padîşahî bi yekîtiya Mîrekên Kurdan ve dixwaze.

Vê rewşa Kurdan heta belavbûna dewleta Osmanî -1918'an berdewam kir. Kurdan bi sîstema mîrekî ve jiyana xwe berdewam kirine. Mirov pir bi asanî dikare bêje "dewletên biçûk" in. Min ev jî di beşa Osmaniyan de aniye zimên.

Dixwazim di derbarê mijara nasnameyê de bandora Sîstema mîrekî bilêv bikim. Vê sîstema mîrekî li ser nasnameya Kurdî bandoreke mezin hiştiye. Mîrekên Kurdan weke otonom li herêmên xwe serwer bûn û hukumraniya Osmaniyan tunebû. Mîrekên Kurdan bixwestana wê bikaribana hêzên xwe bikrana yek. Min di beşa Mewlana Idrîsî Bitlîsî de ev mijar aniye zimên. Di vê pêvajoyê de nasnameyeke neteweyî pêk nehat û ji xwe di wê serdemê de xwestina nasnameyeke neteweyî ne xwezayî ye. Di dema Tanzîmatê de di navbeyna sedsalên 1830 –nemaze di sedsala 1860 yî de, Osmaniyan xwestîne serweriya xwe li ser Kurd û Kurdistanê bi hêz bikin. Ev dema rûxandina sîstema Mîrektiya Kurdan e. Lewra Mîrekên Kurdan dijî merkezîkirina dewletê serî hildane. Lê serhildanên wan lokal, herêmî û di berjewendiya mîrekan de hatiye fetisandin. Nasnameya neteweyî dernektiye pêş û nebûye sedemên sereke yên serhildana neteweyî.

Sîstema Şêxîtiyê cîhê sîstema Mîrekiyê girt lê vê sîstemê jî nasnameya Kurdî weke nasnameya neteweyekê nekir qada sereke ya

serhildanên xwe. Piranî herêmî mane û ji berjewendiyên herîmî û eşîrî azad nebûne. Nasnameya Kurdî jî di nava vê aloziyê de lawaz û bê xwedî maye. Nasnameya Kurdî bi sîstema şêxîtiyê ve piştî perçebûna Kurdistanê jî berdewam kiriye.

Îro devjeniya pirsa du zimanî li Tirkiyê berdewam dike. Li ser vê pirsê nivîskarekî Tirk, him rewşa wê dema Osmaniyan û him jî roja îro li gor xwe wiha dinivîsîne.

"Di nava Osmaniyan de xwe weke Tirk bilêvkirin şermî bû[149] Kılıçdaroğlu, Show TV.siyaset meydani) . Li ser vê mijarê nivîskar Taha Akyol wiha dinivîse: "Di hemû demên Osmaniyan de, zimanê fermî, ango zimanê nivîsê, yê dadweriyê, yê îdarî û yê zumreya desthilatdar zimanê Tirkî bûye... Dewleta Tirkmen ya Sefawî, bûbe dewleta Faris, dewleta Osmanî jî bûbe dewleta Tirk, bi sedemên dîrokî ve girêdayî ne.

**Zimanê fermî yê Osmaniyan:** Makzagona Osmaniyan ya 1876'an "Kanûnî Esasî" di sê peragrafan de Tirkî (zimanê Tirkî) ango "Lîsanî Tirkî" 4 caran hatiye nivîsîn. Madde 18: Ji bo mirov bikaribe bibe memûrê dewletê divê mirov bi Tirkî bizanibe. Madde 57: Zimanê parlementoyê Tirkî ye. Madde 68: Ji bo miletwekîlî jî zimanê Tirkî weke merc e. Evana giş ji bo çi girîng in? 1- Fermîbûna zimanê Tirkî û fermîbûna yek zimanekî yê Tirkî, ne icada Komarê ye, ev xwezayî dîroka ya 1000 salî ye. 2- Divê êdî CHP bi dîroka Osmanî re li hev were....Elementên me li van xaka tîne ba hev...sedsalên Selçûkiyan û Osmaniyan e. Komar (dewleta Tirk) weke berdewama vî 1000 salî, wê bi demokrasiyê ve hebûna xwe berdewam bike.[150]

Taha Akyol, Rast nabêje. Di hemû demên Osmaniyan de zimanê Tirkî ne zimanê dewletê yê fermî bûye. Farisî û Erebî di jiyana Osmaniyan de ji Tirkî bêtir cîh girtiye. Weke nimûne, Idrîsî bitlîsî hemû nivîsên xwe bi farisî nivîsiye. Nivîsên wî li ser navê dewleta Osmanî hatine nivîsîn. Bi sedan wekî Îdrîs ya bi Erebî yan jî bi Farisî yan jî bi Kurdî nivîsîne.

Di beşa Tirkiyeyê de min rewşa Osmaniyan aniye zimên. Akyol, dema Osmaniyan ya berî 1876'an û piştî 1876'an tevlihev dike. Rast e

149 Kemal Kılıçdaroğlu; Show TV Siyaset Meydanı.

150 Taha Akyol, rojnameya Milliyetê, 03/01-2011.

ji 1876'an a pê ve dest bi netawayetiya navkirina Tirkan hatiye kirin. Lê ne wê demê û ne jî hetanî 1920'an, Tirk weke netewe nehatine binavkirin. Makzagona 1876'an bi xwe jî bi Erebî hatiye binav kirin "Kanûnî Esasî" Zimanê Tirkî bi xwe jî weke "lîsan" hatiye binavkirin, Hînê jî Erebî ye. Belgeyên dema Osmaniyan heta 1876'an xuya dikin kû, yek bêje bi Tirkî nehatiye nivîsîn.

Serkêşên komara (dewleta Tirk) ku bi yek zimanê fermî hatiye avakirin domdarên nîjadperestên Îttîhadiyên 1876'an bi xwe in. Ji xwe bi vê makzagonê ve girêdayî serhildanên netewa berfirehî mezin bûne û ya dewleta Osmanî ji holê rakir jî ev makzagon û îdeolojiya vê makzagonê bi xwe ye.

Heger Tirkiye naxwaze weke Osmaniyan ji ser rukala dinyayê wenda bibe divê dev ji nîjadperestiya Tirkîtiyê berde. Mafê netewan û kêmnetewan qebûl bike û civatê ji nû ve li ser bingeha pirnetewetiyê vejîne. Taha Akyol, ji bîr dike ku hetanî îro jî dîroknasên Tirkan dewleta sefawî weke dewlata Tirkî binav dikir. Lê Taha Akyol bi xwe vê dîroka Tirkan derew derdixe û dibêje Sefawî dewleta Farisî ye. Ew Jî ne raste dewleta Sefawî ne dewleta Farisan e. Min ev dem di nivîsa li ser Îranê de nivîsiye.

Li sê perçeyên Kurdistanê serhildanên Kurdan di bin serweriya Şêxan û serokeşîran de berdewam kir. Vê sîstemê heta 1960'î berdewam kir. Li Iranê bi reforma xakî ve, li Iraqê bi şoreşa 1958'an ve, li Trikiyê piştî darbeya leşkerî ya 1960'î, lawaz ketibe jî hînê serweriya şêx û eşîran li Kurdistanê nehatiye şikandin. Tevgera Kurd ne dijî şêx û serok eşîran lê divê dijî sîstema şêxîtî û eşîretiyê raweste. Nasnameya Kurd ya neteweyî êdî divê weke nasnameya netweyekî, hevbeşiya xwe derbixe pêş.

### Nasnameya Kurdî ya îro

Nasnameya Kurdî ya neteweyî di 3 (sê) beşan de dikare bête şîrovekirin:

**1-Nasnameya klasîkî ya berî serdemiyê (modernîte):** em dikarin vê nasnameyê bi bermayên berî serdemiyê ve binav bikin. Bingeha vê nasnameyê, lehçeyên zimanê Kurdî, olperestiya olên cuda, eşîretî û herêmparêzî ne û guherîna van nasnameya îro zahmet e. Bihêzketina

hestên neteweyî, lawaziya van nasnameyên berî serdemiyê bi xwere tîne. Pirsgirêka sereke ya vê nasnameyê ew e ku bi gelek kiryarê xwe ve dijî berjewendiyên netewayetiya Kurdî dikeve. Li gelek herêman berjewendiyên lehçeyî û herêmî dibe pirsa sereke. Ji bo Kurd ji hev tênagihêjin, gelek lehçeyên zimanê Kurdî weke zimanekî cuda derdikeve rojevê û berjewendiyên wê dibe sereke. Olperestiya Kurdan ne îro lê herdem bûye pirsgirêka sereke. Ji bo ol û terîqetên cuda serhildanên Kurdan têk çûne. Olên Kurdan ya li ba dijmin cîh girtine yan jî alîkariya serhildanan nekirine. Ango, çanda Kurd çanda, eşîrî, qabîleyî, herêmî, olperestî ye. Van nasnameyên berî serdemiyê, di alozîkirin û şolîkirina nasnameya Kurdî de pirsên bingehîn in û loma jî dibin sedemên lawazîkirina nasnameya neteweyî. Lê îro tevgera Kurd, li her çar aliyên Kurdistanê di nava hewildanên hevbeşiyeke gelêrî de ne û ev tendensa neteweyî, vê nasnameya yekemîn lawaz dike.

**2-Nasnameya serdemî:** Vê nasnameya Kurdî weke nasnameyeke modern xwe bi nav dike û nasnameya Kurdî ya kevnare jî nasnameyeke kevneşopî dibîne. Di vê nasnameyê de elementên netewayetiya Kurdî, lawaz in. Di nava vê nasnameyê de axaftina bi zimanê biyanî xurt e. Di nava vê nasnameyê de tendensên balkêş hene. Aliyekî vê nasnameyê weke malbat asîmîle bûne. Xwe Kurd bi lêv dikin lê nasnameya xwe ya Kurdî weke nasnameya sereke dernaxin pêş. Ji hestên neteweyî bêpar in lê weke mirovekî biyanî lê demokrat li pirsa nasnameya Kurdî dinêre. Helwesta wî/wê ne helwesta bidestxistina mafê netewayetî ye. Daxwazên xwe di çerçoweya çareseriya pirsa mafê çandê (kultur) de dibîne û nasnameya xwe bi zimanê netewa serdest ve bi sînor dike. Xebata ji bo mafê ziman û çanda Kurdî, weke karê xwe yê mirovayî şîrove dike. Di têkoşîna xwe de elementên Tirkiyeyî, Iraqî yan jî Îranî bi kar tîne û ji nasnameya Kurdî bi dûr dikeve.

Aliyê vê nasnameya Kurdî ya siyasî bingeha hest û helwestên xwe ji tevgera neteweyî ya çep, olperestî, sivil û "demokrat" lîberal werdigre. Nasnameya serweriya dewletê li ba wî/wê hînê jî bi navê neteweya serdest e. Nasnameya Kurdî, bi nasnameya serweriyê, aboriyê, zimanê fermî û perwerdeyê û bi ewlekarî û avahiya struktura mafê netewayetiya Kurd ve nahûne. Ji xwe bi Kurdî nizane yan jî kêm dizane û

derbirîna xwe bi zimanê neteweya serdest dike. Fêrbûna zimanê Kurdî li ba wî/wê armanca herî dawiye.

Di nava vê nasnameyê de aliyekî din jî heye ku xwe milîtanê doza Kurd dibîne, nasnameya Kurdî diparêze, lê ji bo bi Kurdî nizane û dûrî nasnameya neteweyî ketiye, di têkoşîna xwe de elementên biyanî ango elementên netewa serdest bikar tîne û van elementana dixe nava nasnameya Kurdî. Van elementên biyanî weke modernîte binav dike û bi van elementana serbilind e. Lê ji çanda Kurdî bidûrketî têkoşîna xwe ya ji bo nasnameya Kurdî berdewam dike.

Aliyê sêyem yê vê nasnameyê, xwe li himber nasnameya netewa serdest kêm dibîne. Nasnameya Kurdî weke kevneperestî dibîne û nasnameya neneteweya serdest jî pêşverû dibîne. Bi eşkereyî vê helwesta xwe nabêje. Lê di jiyana xwe ya rojane de helwesta wî/wê dertê holê. Bi zimanê Tirkî axaftin li ba wî/wê serbilindî û modernîteyeke mezin e. Nasnameyeke bêşekil û bê kesayetî(şexsiyet) ye û dikare di nava her cîhetî de cîh bigre.

Di nava vê nasnameyê de yê xwendevan û yê ne xwendevan jî hene. Yên asîmîle kirî û yên ne asîmîlekirî jî hene. Yên xwe Kurd dibînin û yên xwe Tirk jî dibînin hene. Balkêşiya vê nasnameyê ya xurt, li dû hêzê dipeke û kî li ku bi hêz be xwe weke wan bi nav dike. Bê rengî, bê îstîqrarî û bêkesayetî bingeha nasnameya wan e. Ya neyênî ew e kû, wê nasnameya xwe radestî tevgera neteweyî dikin û nasnameya tevgerê aloz dikin. Berjewendiyên xwe û yê malbata xwe di ser netewa- yetiya Kurd de dibînin û loma jî îbadeta hêzê (Kuvvet) dike.

### 3- Nasnameya serdemî, neteweyî û demokrat

Ev nasname di nava Kurdan de bihêz dibe. Lê îro ne hêza sereke ye. Bandora xwe li ser herdû nasnameyên dinê bi girseyî dike û nasnameya Kurdî dike qada sereke ya têkoşîna ji bo bidestxistina mafê neteweya Kurd. Ev nasname bi daxwaz, helwest û têkoşîna xwe, bi reaksiyonên neteweyî û navnetweyî ve rû be rû dimîne. Rûxandina asteng û bendên mezin daniye pêşiya têkoşîna xwe. Ev nasname, rêzê, ji hemû cudahiyên nasnameya neteweyî re digre lê, hemû nasnameya bi nasnameya yekîtiya netewa Kurd binav dike û ji bo hevbeşî û

konsensusa neteweyî têdikoşe. Dem bi dem serê ben ji dest berdide û elementên dijî nasnameyên dinê yên Kurdî dixe rojeva xebata xwe. Her wiha carina dijberiya nasnameya neteweyên serdest jî weke tendensa yekta ya neteweyî binav dike. Tendens û elementên vê nasnameyê wê bi hêz û bi dadwer dike, parastina mafê neteweya Kurd yê rewa ye û parastina çand û zimanê Kurdî ye. Xwe bi Kurdî derdibirîne, xebata zimanê Kurdî weke pirsa sereke li pênûsê dide û dixwaze serkêşiya tevgera Kurd bike. Lê hînê lawaz e û ji serkêşiya tevayiya tevgera neteweya Kurdî dûre. Neyêniya sereke di nava vê nasnameyê de, demî be jî bêyî konsensuseke neteweyî tev digere. Gelek carî di nava herdû elementên neteweyî de bêîstîqrar dimîne. Loma jî di qada têkoşîna siyasî de gelek carî lawaz dimîne. Ger ev nasname xwe ji elementên neyênî yên Kurdî bişo û xwe ji wan biparêze wê bikaribe potansiyela serkêşiya netewayetî têxe destê xwe. Lewra îro, têkoşîna neteweyî û domokratî ber bi vê tendesê ve bi hêz dibe. Neyêniya mezin jî, ev e kû, dagirkerên Kurdistanê bi her awayî pêşiya vê nasnameyê digrin û nasnameya herî xeter bi nav dikin.

Îro tevgera neteweyî di nava van nasnameyan de dihere û tê. Li tevayiya Kurdistanê tendensa nasnameya sêyem bihêz dibe û bandoreke mezin li ser nasnameya 2'yem û 1'em dike. Bidestxistinên başûrê Kurdistanê bihêzkirina vê nasnameya 3'yem bi xwe re tîne lê tenê başûr têra vê nasnameyê nake. Ev nasname ji başûr mezintir e û berjewendiyên tevayiya Kurdistanê daniye pêşiya xwe.

Tevgera bakurê Kurdistanê di nava xwe de hersê elementên nasnameya Kurdî diparêze û loma jî bêtir aloz e. Heta nuha di nava tevgera bakur de tendensên nasnameya duyem bi tevayî û bi hinek elementên nasnameya sêyem ve bihêz dibû. Lê xuyaye nasnameya sêyem di nava tevgera bakur de cîh digire û bi hêz dibe. Ev erêniya sereke ya tevgera bakur e.

### Di berbanga rûdanên dawîn yên li başûrê Kurdistanê de nasnameya Kurdî

Daxwazên rewa yên gelêrî ji yên ne rewa cuda kirin gelekî girîng e. Lewra hemû daxwazên ji bo guherîna civatê ne demokratîk in û ne rewa nin. Tevgerên gelêrî li welatên Bakurê Efrîkayê weke mîlad têne

binavkirin. Êdî weke bêje "berî Tahrîr û piştî Tahrîr" dest bi lêkolîn û şîroveyên serhildanên gelêrî dibin.

Li Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê demeke nû dest pê kiriye. Hemû desthilatdariyên dewlet û tevgerên van herêmana di bin bandora vê dema nû da xebata xwe û desthilatdariyên xwe di ber çavan re derbas dikin û helwestên nû derdixin pêş. Ev dem, dema rûxandina hemû bendên tirsa ji dîktatoran e. Êdî tu qeyd û merc nema karin dest û lingên gelan bi zincîrên esaretê ve girêbidin. Neteweya Kurd, Desthilatdariya Kurdistana Başûr û hemû tevgerên Kurdan, bi gelemperî tevgera Kurd ya neteweyî jî di bin bandora vê demê de dimînin.

Min di beşa yekem û duyem de pirsgirêkên nasnameya Kurdî bi kurtî be jî aniye zimên. Di beşa sêyem de jî dixwazim encam û çareseriyên nasnameya Kurdî bilêv bikim.

### Du aidiyetên nasnameya Kurdî henin

1- Nasnameya me ya herêmî, lehçeyî, olî û eşîrî ye ku em gelek caran xwe bi vê nasnameyê ve binaskirin didin. Ev nasname dervî daxwaz û vîna me nasnameyeke girîng e. Bi vê nasnameyê em cîhê xwe di nava civatê de xuya dikin. Gelek caran jî bi nasnameya xwe em beşdarî nava tevgera neteweyî dibin. Ev rastiyeke Kurdan ya berbiçav e. Dîroka vê nasnameyê kûr û dûr e. Ji kûraniya dîroka netewa Kurd derdikeve û xwe bi hemû cudayiyên xwe ve radestî nava tevger û hêza neteweyî dike.

2- Nasnameya neteweyî ye, ku hevbeşiya nasnameya Kurdî tîne zimên. Ew jî Nasnameya Kurdî ye. Lê ev nasnameya neteweyî jî weke min li jorê aniye zimên ne yekrengî û yekdengî ye. Nasnameya Kurdî ya neteweyî bi çend nasnameyan ve pêçayî derdikeve rojeva tevgera siyasî û çandî ya civata me. Kurmanc, Soran, Kirmanc(Zaza), Hewreman, Lor, Mukrî, Feylî; çiqasî weke herêm û lehçeyên Kurdiyê bêne binavkirin jî, weke nasnameyên Kurdî jî di nava civata me de cîh digrin.

Emê bi kîjan rê û rêçikan bikaribin balanseke neteweyî di nava van nasnameyên Kurdî de peyda bikin? Lewra pirsa sereke ya îro ev e. Ger em bixwazin van nasnameyên Kurdî yê, ji holê rabikin emê kîjan nasnameyê têxin cîhê wan û emê li dor kîjan nasnameyê bicivin ? Ev jî pirsa duyem ya nasnameya Kurdî ye.

Li vir dixwazim ji nêrînên Ibnî Haldûn îstîfade bikim. Haldûn bi bêjeya "Asabiyet" ê ve mijar û pirsgirêkên civatê tîne zimên. Weke tê zanîn asabiyet, bi maneya qabîle yan jî girêdaneke xwînî ya mirovan ve tê şîrovekirin. Asabiyeta Ibnî Haldûn jî ol e. Lê ev bi maneya teng e. Bi maneya fireh asabiyet, ruhê hevkariya civatê ye. Herwiha bi maneya firehî, asabiyet, weke zanistiya civakî ya xwe parastinê jî tê bilêvkirin.

Ger em vegerin ser pirsgirêka nakokî û cudahiyên nasnameya Kurdî, emê weke Ibnî Haldûn dibêje xwe bavêjin bextê zanistiya civakî û giyanê hevbeşiya nasnameya Kurdî. Ji bo em bikaribin di xebata xwe ya ji bo hevbeşiya nasnameyê de biser bikevin, divê em diyalektîk û felsefeya asabiyeta Ibnî Haldûn ya firehî bikar bînin. Lewra balansa pêwendiyên desthilatdariya siyasî (tevgerî, hukmî, yasayî) û pisîkolojiya hevkariya neteweyî û civakî, bi benê xavî ve bi hev girêdayî ne. Balansa pêwendiyên herdû aliyên civatê neyên parastin, giranî ber bi aliyekî ve mezin bibe ev balans têk diçe û balansa hêzên civatê aloz dibe. Ango pêwendiyên dînamîkên civatê, bi dozaja diyalektika giyana hevbeşiya civatê ve girêdayî dikare bê guherîn.

Hevkariya giyaniya civakî çi ye? Ev pirs jî girîng e. Ev hevkarî ya çandî,siyasî, aborî û dezgehiye. Hêzên civatê giranbihayên civatê yên serke weke hevbeşiya civatê dibînin. weke minak nasnameya "Kurd"î ji bo hemû nasnameyên Kurdiyê. Li başûr nasnameya Kerkûkê weke nasnameya Kurdî qebûlkirin. Ango giyaniya hevbeş ya hevkariya civatê, giranbihayiyên civatê bi xwe ne.

## Giyaniya hevbeşiya Kurdan

Îro li her çar perçeyên Kurdistanê nasnameya Kurdî di nava aloziyekê de ye. Li jorê min bi kurtî anîne zimên. Lê hevbeşiya nasnameya Kurdî ji hemû deman bêtir derdikeve pêş û bi girseyî li vê nasnameyê xwedî derketin dibe weke erk û watiniyên netewayetiya Kurdî. Ev jî ciyê kêfxweşiyê ye. Pirsgirêka başûrê Kurdistanê ya ji Silêmaniyê dest pê kir û heta nuha bi awayekî cuda berdewam dike, bingehiya hêza xwe ji aloziya vê nasnameyê werdigre. Weke tê zanîn tevgera Goranê di destpêka sala 2011'an de dest bi xwenîşandanan

kir û daxwazên gel yên rewa ji xwe re kir weke sîwan. Lê xuya bû ku armanca Goranê weke min li jor aniye zimên pirsa nasnameyê bi xwe bû. Bê gûman pirs û pirsgirêkên başûrê Kurdistanê tenê ne pirsa nasnameyê ne. Gelek nakokî û pirsgirêkên civakî, aborî jî hene û vana dervî pirsa nasnameyê dikarin çareser bibin. Hin alî û hêz di bin sîbera van pirsgirêkan de, bi awayekî cambazî pirsa nasnameya Kurdî derdixin pêş û bi vî awayî nakokiyên nasnameya Kurdî kûr dikin. Bi vî awayî jî, ji berjewendiyên netewa Kurd bidûr dikevin.

Hewildana desthilatdariya Kurdistanê jî bi hevbeşiya nasnameya Kurdî li daxwazên çareseriyên civata Kurd derket û beşdarî plan û dahfîka aloziya nasnameya Kurdî nebû. Ev jî cîhê serbilindayiya Kurdan e. Desthilatdariya Kurdistanê parastina bidestxistinên başûrê Kurdistanê, di pirsa çareseriyan de weke mijara sereke dît û giyaniya neteweyî ku hevbeşiya Kurdan e kir asta sereke. Ev helwest ji aliyekî ve rê li ber demokrasiya welat vedike û ji aliyekî din ve jî rê li ber dezgeh û tevgerên gelêrî û sivîl vedike ku armanca wan bi xwe bê tundrewî (şîdet) pêşkêşkirin û xebata ji bo çareseriyan ne.

Ev rûdanên Kurdistanê herwiha derfeteke dîrokî derdixe pêşiya tevgera neteweyî. Ji nuha û pê ve Kurd wê bêtir li ser pirsgirêkên nasnameya xwe rawestin û wê bêtir li çareseriyan bigerin.

Tevgera neteweyî, pêwîst e rastiya nasnameya Kurdî bibîne. Cudahiyên vê nasnameyê, yên olî, herêmî û lehçeyî bibîne û bi cudahiyên nasnameyê ve hevbeşiya wê bike xebata sereke. Xebata sereke ya nasnameya Kurdî, nasnameya "KURD" e. Nasnameya Kurdî ji bo piralî, pirrengî ye, divê pluralîzm bibe bingeha nasnameya hevbeşî. Ango nasnameya KURD'î bi pilûralîzma nasnameyên Kurdî ve dikare xwe derbibirîne. Evana Kurmanc, Soran, Zaza, Feylî, Yezîdî, Misliman û çînî ne. Bêjeya KURD, hemû bêje û cudahiyên nasnameya Kurdî di nava xwe de dipêçe û dibe nasnameya hevbeşiya neteweyî. Hemû nasnameyên li jorê hatine nivîsîn, divê bikaribin xwe bi azadî di nava nasnameya hevbeşî de derbibirînin. Divê prosesa xwezayî ya entegrasyona nasnameyên Kurdî, bi awayên zorê, bi tundrewî, ji hev nekeve. Divê tevgera Kurd ji helwestên şikandin û têkbirina prosesa entegrasyona nasnameyên Kurdî xwe biparêze û divê em bizanibin bêyî perwerdeya neteweyî ev nasname bicîh nabe. Di nava perwerdeya

tevgera Kurd ya her çar perçeyên Kurdistanê de, perwerdeya mêjûyî ya nasnameya Kurd divê pirsa sereke be.

Felsefeya asabiyeta Ibnî Haldûn, ji bo hevgirtina nasnameya neteweyî ya Kurd, yek ji riyên dîtina giyaniya neteweyî ye. Em tenê dikarin pirsgirêkên nasnameya xwe biserketina vê nasnameyê ve çareser bikin. Xweseriyên strukturî, siyasî, desthilatdarî yên nasnameyên KURD'î, hemû dikarin bi awayên aştiyane, bi giyaniya neteweyî bêne bicîh kirin. Tundrewî meşrûiyet û dadweriya mirov ji ber çavan bidûr dixe û zerar û ziyanê dide doza civatê û giyanê nasnameya neteweyî.

## Nameya Kurdan ya di 24/01-1923'yan de ji konferansa Lozanê re

"Di nava van rojan de (dema konferansa Lozanê) serokê delegasyona Îngiltereyê Lord Curzon ku bi daxwaza serxwebûna Kurdan ve radibe û xwedî li Kurdan derdikeve, me ecêbmayî û şaşmayî dihêle. Em Kurd ji qewmên Turanî nin. Ji bo adetên me û ji bo taybetmendiyên me yên millî (Qahremanî), Tirkan, me bi navê Kurdan ku tê maneya mêraniyê, bi nav kirine. Qahremanên weke Kurd hatine bi nav kirin, bi armanca domandina jiyana wan weke eşîr û qabîle bi navê Demînan, Haydaran, Kureyşan û Lolan bilêv kirine. Îro van eşîrên hatine binavkirin, weke beşêkî nîştîmanî bi navê Tirkên Rojhilat ve têne nasîn.

Ger rewşa Kurdan ya berî û piştî sala 1876'an bête lêkolîn, wê bê dîtin ku Kurdan bi bandor û encama xebata mîsyonerên Îraniyan ya li ser eşîran ve zimanê xwe yê eslî zimanê Tirkî hêdî hêdî ji bîr kirine. Ji ber vê yekê, eşîrên der dora Erzurum, Van, Bitlîs û Musulê, dest bi axaftina Kurmancî kirin ku ew bi xwe jî yek ji lehçeya zimanê Farisî ye. Eşîrên der dora Harput (xarpêt) û Diyarbekir ê, ku kêm di bin bandora mîsyonerên Îraniyan de mabûn, bi lehçeya têkelî Tirkiyê ya zazakî ve axivîn.

Evan Tirkên bi eslên xwe kurên Tirkan e, ku Yavuz Sultan Selîm Han (Xan), bi nameya ji şeyh (şêx), Îdrîs-î Bitlîsî re rêkiribû wan tevî nava welatê xwe kiriye. Ji wê rojê ve heta îro, di bin şefqet û serweriya merivên xwe Tirkan de bi aramî dijîn û bi lehçeya Tirkî ve diaxivin.

Li gor gotinên li jorê hatine nivîsîn, em ji serokê delegasyona Îngîltereyê Lord Curzunî re dipirsin; heger bi zimanê Farisî axaftin mi-

rov bibe Faris, Îngilîz jî di nav de, rewşa hemû netewa cîhê devjengiyê ye. Îngilîza ku welatên Rojhilat dagir kiriye û bi xeyala ku xaka hemû dinyayê têxe nava dewleta xwe ve, ji dêvla "Mustemleke"yê "Mandatiyê" ku wekî yek in bi kar tîne, êdî ji aliyê Kurdan ve hatiye naskirin. Ew Îngilîzan ku dixwaze hemû çavkaniyên dewlemendiyên dinyayê têxe destê xwe, em ecêbmayî dimînin, da Mûsilê, ku bi serjimara xwe ve, ji 12'an dehên wan Tirkin, û petrola wê ji bo me Tirkan zêde dibîne. Em Kurd di armanca serokê delegasyona îngîlterêyê Lord Curzunî de têgihîştin, ku bahsa bûyerên Bitlîs û Dersimê dike û dixwaze neteweyê yekgirtî Tirk û Kurdan bera hevdû bide.

Em Kurd, dizanin ku di nava sozên dîplomatên Ewropiyan de, berjewendiyên wan veşartî ne û ji ber vê yekê jî me hêza xwe ya serhildanê avakiriye. Me ji Rûsên, ku weke delegasyona Îngilîzan soza serxwebûna me Kurdan di 1917'an de dabûn, me ji wan re got: Em Tirk in; tu hêz nikare me ji nîştîmana me cuda bike. Me got; Aramiya me bi terkkirina we ya, ji vî xakî ye.

Îro hemû Kurd, ji dîplomatên Ewropiyan re û nemaze ji yên Îngilîzan re eynê bersivê didin. Kurd, serxwebûna xwe ne bi riya biyaniyên ku wan ji holê radikin, lê bi riya wan kesên ji malbata wan Tirkan û hukumeta meclîsa wan î mezin ya neteweyî ku wan temsîl dike ve bi dest dixin û emanetî wan dikin. Dawî em Kurd, ji serokê delegasyona Ingiltereyê Lord Curzunê re tika dikin ku ji bo me ramana icad neke, ji heyeta temsîliyê re û ji serokê wê hemşehriyê me yê şanaz hazretî Îsmet Paşa re serkeftinê dixwazin. 24/kanûn-î sanî(1) 339(24/01-1923.

Li ser navê Serokê cemiyeta umumî ya amele û esnafên Kurd Salîh Kahya, Îsazadeyê Ahmedê Erzurumî. Li ser navê umum Kurdên li Istanbûlê serokê eşîreta Lolanê û li ser navê serokê cemiyeta ciwanên Kurd, Duzerzade Mehemed Sabrî yê Dersîmî.[151]

Min xwest vê belgenameyê tercumeyî Kurdî bikim da ku nivîskarên Tirkan, yên nîjadperest yên weke Hasan Celal Guzel, ecûbeyeke wiha

---

151 Radikal haber No 246331, 3.2.2008/Tercume Hasan Celal Güzel, Kitap: Salahî R.Sonyel; *Gizli belgelerde Osmanlı dewletinin son dönemi ve Turkiyeyi Bölme Çabaları*, Kaynak Yayınları, Çapa Yekem gulan 2009. r. 291. Tercume Nezir Akat.

dikin bingeha peymana Lozanê. Nivîskarên Tirkan, ji bo meşrû kirina peymana Lozanê û ji bo îsbatkirina tunehiya neteweya Kurd, belgeyeke bênirx jî dikarin bikin belgename. Ev belgename ne berî 20-30 salî hatiye weşandin. Weke li jorê jî xuya dike di sala 2008'an de ji aliyê nivîskarê nîjadperest Hasan Celal ve hatiye tercume kirin. Ji kîjan zimanî, hatiye tercumekirin ne xuyaye. Yek armanca vê belgenameyê heye ew jî berxwedana tunekirina neteweya Kurd e. Ji bilî vê armancê jî belkî ya sereke ew e ku beşekî Kurdan dest dan destên Kemalîstan û dijî daxwazên Kurdan rawestiyan. Lê xuyaye ji Osmanî tercume kiriye kû, wê demê jî hînê bi zimanê tirkî belge nedihatin nivîsîn.

Hesen Celal Guzel, bi vê nameyê ve girêdayî dibêje Kurda qedera xwe bi ya Tirkanre kirine yek. Lê nîjadperestê Tirk, nameya Kurd Tealî Cemiyetî, ya bi nivîsîna ronakbîrê Kurd Elî Şan ve hatiye nivîsîn û li ser navê cemiyeta Kurd hatiye mohr kirin ku ji komîteya Sewrê re şandiye û vê nameyê derew derdixe û daxwazên Kurda bi zelalî daxwaz dike nanivîsîne.Nameya Kurd Tealî Cemiyetî vê nameya li jorê weke ya Ataturkî û çend xwefroşên Kurd ku dijî berjewendiyê Kurda binav dike, nayê hesabê nivîskarên Tirka belav bikin.

## Gotina dawîn

## Ji bo jiyaneke bi hevremayinê gotina demokrasiyê têr nake

Îro ji berê bêtir, cudahiyên civata Tirkiyeyê eşkere dibin û bi berfirehî têne minaqeşekirin. Nêrîn û helwestên têgihiştina cudahiyên etnîkî di rojeva siyasî ya Tirkiyê de cîhekî girîng digire.

Pirsgirêka Kurd û Kurdistanê di nava van devjeniyên siyasî de biryardêr e. Dewlet di nava vê hengamengê de, pêşiya geşepêdana çareseriyên vê pirsgirêkê digre û nahêle di nava xwezayiya xwe ya sosyo-polîtikî de bidome. Lewra Tirkiye bi geşepêdanên girîng ve avis e. Dewlet dixwaze ev avisî bi riya beravêtinê ve bi encam bibe.

Dema dewleta Tirk ya îro, dema atmosfera lihevkirin û dijberiyê ye. Ango hêzên her dû pêvajoyên dijberî hev di nava vê prosesa geşepêdana dewletê de aloziyeke mezin diafirînin.

Di nava prosesa globalîzekirina dinyayê de, li Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîkayê, û herwiha li Ewropayê û bi gelemperî li dinyayê nêrîn

û helwestên cuda bi bûyerên nedîtî ve geş dibin. Prosesa globalîzekirina dinyayê, hêzên statukoperest ji nû va dixe nava tevgerê. Di nava vî bayê globalîzekirina dinyayê de, dewleta Tirk, ji cudahiyên xwe ditirse û loma jî dixwaze pêşiya vê prosesê bigre. Dewlet bi helwesta xwe ve dixwaze prosesa guherînê di nava yekrengiya berê de lê bi awayekî cudatir bidomîne.

Qeneeteke xurt di nava raya giştî de cîh digre ku hukumeta AK partiyê jî weke partiyên tradisyonel yên Tirkan, bi giranî yekrengiyê diparêze û gotinên demokrasiyê tenê weke gotin bikar tîne. Dengên vê helwestê ne tenê di nava hêzên dijber lê herwiha di nava AK partiyê bi xwe de jî xurt dibin.

Îro li hemû aliyê cîhanê, berxwedanên dualîzmeke bêhempa mezin dibin. Bingeha van berxwedanan pêdiviyên guherînên civatî nin. Li Tirkiyê jî berhemên vê dualîzmê bi eşkereyî xuya dikin. Di qada desthilatdariya neteweya serdest de, ango hukumet, Mixalefet, artêş, dadgeh, unîversîte, medya û raya giştî ya Tirk di nava vê dualîzma cîhanî de bi du beşan ve dabeş dibin.

Beşa yekem: Statukoparest e û dijî guherînan bi helwesteke şovînî radiweste. Hemû hewildanên guherîna civatê weke pêngavên neyarî şîrove dike. Bingeha vê hêzê weke bermaye û raman yên Îttîhadiyan û Kemalîstan e. Şovenîst û nîjadperest in. Helwesta wan a sereke parastina yekpareyiya dewletê ye. Bi bûyerên dinyayê û yên nav xwe ve hêza xwe ya sereke wenda dike û lawaz dibe. Di qada nasnameya Kurdî de fundamentalîst e û bingeha vê hêzê jî siyaseta tarî ye.

Hêza duyem: Muhafazakar e û yekpareyî ya dewletê bi yek cudahiyê diparêze. Di nava vê hêzê de tendensên pare pareyî yê heye û bi vê mebestê ve jî ji bo hinek guherînên civakî tevdilive. Maf û azadiyên kesayetî heta ne dijî berjewendiyên wan be diparêze û struktura Îttîhadî û Kemalîstî li dijî berjewendiyê xwe dizane. Bi navê olperestî kar dike lê berjewendiyên nasnameya neteweya serdest di kar û xebata wê de sereke ye. Helwesta wê dikare rê li ber hêzên guherparêz veke. Ev helwest di qada nasnameya Kurdî de ne serhişk û destgirtî ye. Lê mafê Kurdî her di nava maf û azadiyên kesayetî de dibîne. Îro li Tirkiyê ew hêza sereke ye. Di pirsa çareseriyên nasnameya Kurdî de naxwaze hêza yekem li dijî xwe bihêz bike û loma jî gavan bi tirs tavêje. Bingeha wê jî

siyaseta durûtî ye. Bermaya "Hurriyet û Îtilaf" û "Teraqî perwer"ê ye. Pêngavên biçûk ku bêyî bingehiya yasayî hatine avêtin weke pêngavên yekta û çareseriya pirsgirêkê bi nav dike. Gavên avêtiye weke diyariya dewletê rêdide û ji Kurdan dixwaze ku bi van pêngavan ve qayil bibe û dengê xwe neke. Ji aliyekî ve bi navê biratiyê ber bi Kurdan ve kar dike Ji aliyekî din ve jî "pisgirêka Kurdî" înkar dike û bi bayê şovenîzma kevnare tevdigere. Ji bo çareseriya pirsgirêkê pêngavên pêwîst navêje. Berpirsê vê nearamiyê jî dîsa dewlet bi xwe ye.

Rewşa îro û helwesta hukumeta AK partiyê ji bo em bikaribin li ser nêrînên cuda yên çareseriyê bi awayekî azadî biaxivin pêwîstî bi rewşeke aram heye. Di nava demokrasiyê de ya girîng, ne mekanîzma dewletê bi xwe ye. Ya girîng û yekta rêzgirtina giranbihayiyên civatê ne. Lewra rêzgirtin bi xwe pêvajoyeke qebûlkirin e ku ew bi xwe weke çanda gel di rojevê de cîh digre. Îro ji hêjayiyên civata Kurd re rêz nayên girtin. Dewlet bi awayên tundrew weke hercar, dixwaze "dadweriya" hêza xwe bi civatê bide qebûl kirin. Dema civat dadweriyê bi hêza tundrewî ve girêbide û qebûl bike, wê demê him sedem û him jî encamên civatê têne guherîn. Ew hêza bikaribe, hêza berî xwe lawaz bike bê gûman li ser mafê wê hêzê dibe desthilatdar û bi awayekî cuda him sedeman û him jî encaman diguherîne. AK partî, hêza Kemalîstan ku bingeha wê, artêş,brokrasî û sîstema dadgehî ya Tirk e, lawaz kiriye lê li ciyê wê hêza Îslamiya Tirk ava kiriye.

AK partî û hukûmeta wê, valahiya lêgerîna nasnameyeke nû ya civatê, bi aîdiyetên olperestiya Îslamî, (sunnî) ve bersiv dide. Hukumet ketiye lêca avakirina Împaratoriya Osmanî. Dijî hemû "bêdadweriyên" dervî xwe radiweste, lê bêdadweriya heroj li ber sere wan bi bûyerên mezin rûdide nabîne.

Vê hukumetê, tevgera "Serokatiya Tirkên li derve" ava kiriye. Ev dezgeh hemû hêzên faşîst, nîjadpereset û şovenîst di nava xwe de dicivîne. Weke "Yekîtiya Karê Diyanetê û Islamiya Tirk" (Ditib), Îttifaka Dadwerî û Aşîtiyê"(BFF), "Yekîtiya Hêzên Mîllî Göruş"(UETD) çend dezgehên weke nimûne ne. Lê ji bilî wana, bi dehan dezgeh û kesayetiyên oldar, mizgeft û komele di nava vê serokatiyê de cîh digrin. AK partî bi vê hêzê ve dixwaze ne tenê di nava welat de herwiha li derveyî welat jî, dijî Kurdan hêzeke nîjadperest û olperest bi hêz bike.

Xebat û çalakiyên van dezgehana ji aliyê konsolosxaneyên dewleta Tirk ve têne organîzekirin. Ango ew bixe şebekeyên organîzekirî yên dewletê ne. Ew li hamû aliyê cîhanê dijî mafê Kurdan kar dikin û dijî "terorê" xwenîşandanan lidar dixin. Hêza dewletê ya derve ye û Tirkên derveyî welat jî dikin hevparê gunehkariya xwe. Li welatî, Polîs ketiye bin bandora cemaetên AK partiyê. Hêza artêşa faşîst kêm kiriye lê hêza olperestî û Tirkîtiyê di nava artêşê de bi hêz dike. AK partî van hêzana hemûyan dixe xizmeta cahda ji bo yekpareyiya dewleta Tirk.

Bi navê "perwerdeya olî çeka herî mezin ya dijî terorê ye" ji aliyê wezareta perwerdeyê ve pirtûka bi navê" zanistiya ewlekariya millî" îro li hemû dibistanan weke pirtûka dersa Olî û millî tê xwendin. Derseke mecbûrî ye. Armanca vê perwerdeyê "zanebûna dijî terorê" ye. Ango tekoşîna dijî terorê bi rêya Îslamê ye. Hukumet bi vê perwerdeyê serê zarokên me dişo û gaveke guherîna civatê amade dike.

Hukumet di her gotin û axaftinên xwe de aştiyê tine zimên. Hemû bûyer û kiryarên hukumetê, rûpûşkên ser vê aştiya durû eşkere dikin. Lewra hemû kes dizanin kû, ger çareserî ji sedemên nearamiyan re neyên dîtin û gav ji bo bicîhkirina wan neyên avêtin, awazên aştiyê tenê awazên sexte nin. Bi awazên sextewarî jî aştî pêk nayên. Lewra dewleta Tirk di dîroka xwe ya 90 salî de her dem bi vê sextekariyê aştî xwestiye.

Dualîzma Kurdan Jî ji ya Tirkan ne kêmtir e. Ew bi xwe jî du beş in.

Beşa yekem: Statukoperest e. Ji guherînên bingehîn ditirse û loma jî, bi yekpareyiya struktura civatê ve tevdigere. Tendensên guherînên bingehîn di nava vê hêzê de bi hêza duyem ve girêdayî dikare lawaz bibe yanjî xurt bibe. Tundrewî bingeha hebûna wê ye. Bêjeya demokrasiyê di her qada siyasî de bikar tîne lê mixabin ji aliyê helwesta demokrasiyê ve lawaze. Civateke yekrengî bingeha îdeolojiya wê ye û bi gelek awayî jî pirrengiyê weke neyar dibîne. Di nava xebat û çalakiyan de siyseteke rojane bikar tîne. Ji stratejî û programeke bi îstîqrar bêpar e. Hestên neteweyî di nava vê hêzê de ne xurt in. Pêkanîna konsensuseke neteweyî tenê bi helwesta xwe ve girêdayî dibîne û tendensên "siyaseta sipî" lawaz dike. Utopîk û makyewelîst e û loma jî kaosa bêjeyan ava kiriye. Li bakurê Kurdistanê hêza sereke ye. Fedekarî, welatparêzî, canfîdayî di nava heval û hogirên vê hêzê de xurt

in. Ewê tirsa gel şikandiye û bi vî awayî jî bingeha serhildana neteweyî xurt kiriye. Ev hêz rojeva siyaseta Kurdan tayin dike û Tirkiyeyîtiyê bingeha siyaseta xwe dibîne. Bi daxwazên xwe yên siyasî ger bi zelalî nabêje jî, Kurdan weke etnîkek dîrokî dibîne lê ne weke netewe.

Beşa duyem: Di nava xwe de ne yekpareyî ye. Bela wela ye û ne li ser hev e. Lê bi helwesteke neteweyî tevdigere. Di nava xwe de konsensuseke siyasî pêk neaniye û di qada tekoşînê de lawaz e. Tendensên pirrengî yê di nava vê hêzê de xurt bin jî, hînê nebûye sereke. Bi lawaziya xwe ve tirsonek û bê helwest dimîne. Xwe ji metodên klasîkî azad nekiriye û di bin bandora Tirkiyeyîtiyê de dimîne. Bi nasnameyeke neteweyî, lê bi alozî tevdigere. Helwesta wê ya Kurdistanî hînê jî ne weke tê xwestin xurt e.

Di nava vê aloziyê de çareserî çî ye? Pirsgirêka Kurd û Kurdistanê pirseke neteweyî û xakî ye. Çareseriyên vê pirsgirêkê jî di çerçoweya van pirsan de divê bêne rojevê. Hemû pêşniyarên bi navên çareseriyên pirsa nasnameya Kurdî ve têne pêşkêşkirin, bi çareseriyên pirsên netewayetî, xakî û statuyî ve bi girêdaneke dîrokî ve neyên hunandin û bersiva pirsa statuya nasnameya desthilatdariya neteweyî nedin, ewê nebin çareseriyên pirsgirêka Kurd û Kurdistanê.

Li vir pirseke sereke heye? Daxwazên Kurdan û kiryarên dewletê ne. Kiryarên dewletê yên reformî, maf û azadiyên kesayetî û wekî din, ne daxwazên Kurdan bi xwe nin. Kurd dijî reformên dewletê dernakevin lê van reformana weke çareseriyên pirsgirêka Kurd li pênûsê nade. Reformên dewletê hetanî nuha bi mebesta parastina yekpareyiya dewletê ve girêdayî pêk hatine. Parastina yekpareyiya dewletê ne karê Kurdan bi xwe ye.

Lewra pêwîst e ku pirsgirêka Kurd bi rewşa pêwendiyên nasnameya dewletê ya desthilatdar û bi rewşa nasnameya Kurd ya ku ji hemû mafî bêpar e bê nîqaşkirin. Ger çareseriyên têne pêşkêşkirin bi mebesta guherîna pêwendiyên nasnameya serdest ya desthilatdar û nasnameya bindest ya Kurdan ve neyên vejandin, wê nikaribin pirsê çareser bikin. Lewra bingeha pirsgirêka neteweyî ya Kurd, pirsa guherîna mêzîn û balansa navbeyna neteweya desthilatdar û neteweya ne serwer ango nasnameya Kurd e. Maf û watiniyên nasnameya desthilatdar guherîna vê mêzîna wekheviya yasayî, dadwerî û statatuyî, girîngtir

dike. Ger çareseriyên têne pêşkêşkirin, bi van erk û watiniyan ve neyên pêçandin, wê bibin sedemên kaosa hevok û bêjeyên siyasî. Li Tirkiyê, têkoşîna ji bo demokrasiyê, ji nêz ve bi daxwazên nasnameya Kurdî ve girêdayî ne. Vê têkoşîna ji bo demokrasiyê, yan jî ji bo guherîna struktura dewletê, guherîna serweriya etnîsîteya serwer yan jî neteweya dewletê bi taybetî naxin rojeva devjeniyê. Têkoşîna hêzên "demokrat" yên sivîl, lîberal, sosyalîst, olperest di nava atmosfera çerçoweya serweriya nasnameya dewletê û hukumraniya etnîsîteya serwer de têne sînorkirin. Li Tirkiyê hêza "demokrat" serweriya siyasî, îdarî û statuyî ya etnîsîteya serwer xwezayî dibîne. Li Tirkiyê, vê hêza "demokrat" di çareseriya pirsgirêka Kurdistanê de, guherîna sîstema dewletê ya statukoyî naxe rojeva têkoşîna xwe. Hînê jî pirsa Kurdistanê ne weke pirsa neteweyeke lê weke pirsa çanda cuda û weke pirsgirêka kesayetî binav dike. Pêşniyarê çareseriyê jî di vê çerçoweyê de pêşkêşî tevgera Kurd dike. Tevgera Kurd bi gelemperî, bêgûman dijî vê helwestê radiweste û mafê Kurdan weke mafê neteweyî û xakî binav dike, ango mafê "kollektivî".

Îro civat bi helwestên guherîna makzagona dewletê ve mijûl e. Daxwazên guherîna yasayên dewletê, ango makzagona dewletê, ku îro bêtir di rojeva Tirkiyeyê de cîh digre, bi daxwazên Kurdan yên serweriya siyasî, aborî, îdarî, ewlekarî û perwerdeyî ve neyên girêdan û neyên hunandin, wê daxwazên guherînê nikaribin bersiva hêvî û hestên netewa Kurd bidin. Lewra daxwazên Kurdan divê li ser bingeha ji nû va vejandin û guherîna strukturî ya netewe-dewletê be û wekhevi û yeksaniya desthilatdariya netewa jî bingeha hunandina vê strukturê be. Çareseriyên pirsgirêka netewa pirsa desthilatdariya siyasî, dadwerî û îdarî bi xwe ye. Civata Kurd weke civatên dinyayê, ew jî bi cudahiyên civakî ve hatiye pêçandin. Cudahiyên civatê di qada siyasî û tevgerî de jî dertên holê. Lê aloziya daxwazên Kurdan yên neteweyî ne di berjewendiya tu hêzên Kurdan de ye. Lewra parastina nasnameya Kurd, bi daxwazên neteweyî ve pêçandî dikare bibe hêvî û konsensusa neteweyî û dikare bibe awaza tekoşînê.

Êdî dema xebata Kurdan ya li gor daxwazên netewa Kurd weke pêdivî ye. Pirsgirêka Kurd û Kurdistanê pirsgirêka xakî û neteweyî ye. Dabeşkirina Kurdistanê pirsgirêkeke bingehî di derbirîna nasname

û pirsgirêka Kurdan de peyda kiriye û pirsgirêk aloztir kiriye. Loma ḥemû pêşniyarên tekoşîna neteweyî divê li ser neqebûlkirina dabeşkirina Kurdistanê bêne pêşkêşkirin. Ango daxwazên Kurdan li her çar perçeyên Kurdistanê, pêwîst e ku nebin sedemên nakokiya daxwaza neteweyeke yekgirtî. Neteweyek dikare bêyî vîna xwe hatibe dabeşkirin. Lê nayê wateya ku, netewe bixwe, xwe li gor dabeşbûyina netewe derbibirîne. Netewa Kurd, yek netewe ye û bêjeya Kurd jî sîwana hemû lehçe û herêmên Kurdistanê ye. Li beşên Kurdistanê cudahiya daxwazên Kurdan xweserî ye. Lê nabe bibe encama dijberiya daxwazên yekgirtiya neteweyî. Divê Kurd di daxwazên xwe de ne tenê li perçeya xwe bifikirê, divê daxwazên Kurdan bi gelemperî bide ber çavan.

Çareseriyên pirsgirêka neteweyî piralî û pirrengî nin. Ji bo çareseriyên pirsgirêkên hemû netewan şablonek yan jî modeleke tewawkirî tune ye. Li gor struktura dîrokî û hêza siyasî ya nevxweyî û navneteweyî çareseriyên vê pirsgirêkê dertên rojevê. Lê pirseke sereke di pêşkêşîkirina pirsa çareseriyan de dertê holê. Ew jî tenê mafê netewe ye ku ew çawa dixwaze bijî. Serbixwe, federasyon, konfedersyon yan jî bi mafê xweser(otonom). Ev hemû model weke çareseriyên pirsgirêka neteweyî têne bi nav kirin. Li gelek welatan modelên cuda hatine tecrubekirin. Salên 1990-2011'yî bi tecrubeyên giring ve tije ne. Lewra tu hêz bêyî konsensusa neteweyî ne xwedî maf e ku li ser navê netewe daxwazên xwe weke çareseriyên pirsgirêkê bi îpoteka siyasî radestî civata Kurd bike û weke rêya tek û tenha bilêv bike.

Ez bawerim ku, bidestxitina maf û azadiyên netewa Kurd li bakurê Kurdistanê, wê ne weke başûrê Kurdistanê bicarekê ve bê bidestxistin. Pêvajoya bidestxistina mafê neteweyî wê bi proseseke cuda ve bidome. Carina wê bikaribe pêngavên ji aliyê dewletê têne avêtin jî, rast bibîne lê bi zelalî mafê xwe yê neteweyî diparêze. Ango wê bidestxistina mafên neteweyî di nava gelek merheleyan de derbas bibe û pêvajoyeke dûr û dirêje. Lê ev nayê maneya ku em ji nuha ve xwe li gor wan daxwaza sînor bikin. Di nava daxwazên Kurdan de ya sereke fermîkirina zimanê Kurdî ye (Kurmancî-zazakî). Lewra bêyî fermikirina ziman, statuya neteweyeke tuneye. Îro fermîkirina ziman ne tenê mafê netewan e, ew herwiha mafê kêmnetewan û etnîkên cûda ye jî. Li dinyayê nimûneyên wiha bi sedan in. Mafê tu hêza Kurd tuneye ku

dev ji fermîkirina zimanê Kurdî berde. Tevgerek tenê ji bo fermîkirina zimanê Kurdî, têbikoşe wê bandora xwe li dinyayê, li Tirkiyê, ji teqandina hezar tivinga zêdetir bike. Bêgûman dema teqandina tivingan nayê inkar kirin lê ev teqandin ne îro ye.

Yekparetiya Tirkiyê bi helwestên neteweya Tirk ve girêdayî ye. Tirk wekheviyê û yeksaniyê bixwazin wê yekparetî ya dewletê bimîne. Ger ev nebe pare pareyî dibe alternatif.

Kurd di nava sînorên dewletê de li Herêma xwe-Kurdistanê-,divê xwedî mafê organîzekirina dewleta xwe be. Federasyon, konfederasyon jî bi xwe mafê avakirina dewletê ye. Îro tevgera bakurê Kurdistanê bêyî îpoteka yek siyesetê, bi konsensuseke neteweyî ve bi awayên medenî û sivîl dikare xebatê bike, dewletê mecbûr bike û alîkariya raya giştî ya cîhanî werbigre. Lê divê metodên xebatê û tekoşînê biguhere. Divê Mafê Kurdan yê rewa bi eşkereyî biparêze. Divê baş bête zanîn ku Başûr, hebûna Kurdan e. Hemû metodên başûr dikişîne nava aloziya şerekî bê wate, ji berjewendiyên neteweyî bêpar in.



**NEZÎR AKAT:** Di sala 1955'an de li gundê Heftêxuwan ya Qosera Mêrdînê hatiye dinê. Di xortaniya xwe de beşdarî tevgera Kurd bûye û bi darbeya leşkerî ya sala 1980'yî re mehkûm bûye û derketiye derveyî welêt. Akat li Stockholma Swêdê dijî. Ev pirtûka wî ya duyem e.

***Mijara vê pirtûkê*; teorî û mînakên paradîgmaya pêla 3'yem in. Di navenda teorî û mînakên paradîgmaya pêla 3'yem de; awayên avakirina civata pirçandî û awayên dewleta serbixwe ya pirçandî pêşkêşî me dikin. Ji bo çareseriya pirsgirêka Kurdistanê mînakên di vê pirtûkê de hatine şîrovekirin, perspektifên berfireh pêşkêşî tevgera Kurd dikin.**